

KT

Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê

Enstîtûya Zimanên Zindî

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî



Teza Lîsansa Bilind

BERAWIRDKIRINEK LI SER DESTANA MEMÊ ALAN Ê DESTANA ODYSSEIA

Şehmuz CEYLAN

16950001001

WAN-2019

TC
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



MEMÊ ALAN DESTAN İLE ODYSSEİA DESTANI ÜZERİNE BİR
KARŞILAŞTIRMA

Şehmuz CEYLAN

16950001001

Danışman

Doç. Dr. Nesim Sönmez

VAN-2019



T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Şehmuz CEYLAN'ın “**Berawirdkirinek Li Ser Destana Memê Alan û Destana Odysseia**” adlı bu çalışma, 03/07/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

İmza: 

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Mahmut DÜNDAR

İmza: 

ÜYE : Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

İmza: 

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

Prof. Dr. Mehmet DEMİREL
Enstitü Müdürü
03/07/2019


KURTE

Destana Memê Alan di nava edebîyata kurdî da hîmeke qahîm danîye lewra ji bo gellek xebatan bûye çavkanîya sereke. Ev destan çî di edebîyata klasîk a kurdî be çî ya gelêrî be û çî jî ya modern da be hertim ji xwe ra cihek taybet peyda kirîye. Li alîyê din destana Odysseia jî him ji bo edebîyata yewnanan him jî ji bo edebîyata cîhanê ciheke wê ya giring heye. Vê destanê hema bêje di nava hemû netewe û edebîyatên neteweyên cihê da reng vedaye.

Ev xebata me ji pêşgotin, destpêk, sê beşên cuda û encamê pêk dihê. Me destpêka teza xwe kirîye du beş: Beşek li ser çanda devkî, destan, mîtolojî û têkilîya destan û mîtolojîyê pêk dihê, beşa din a destpêkê jî li ser edebîyata berawirdî pêk dihê. Di beşa yekem da em li ser destana Memê Alan rawestîyan. Me ev beş li ser du serenavan li hev anîye. Serenavê pêşîn li ser naveroka destanê ye, serenavê din li ser jî analîza lehengên destanê ye. Di serenavê naveroka destanê da em li ser muhtewaya destanê bi girêdayî hin binnavên me dîyar kirin digel hin çavkanîyan, rawestîyan. Di serenavê analîza lehengan da jî em bi berfirehî li ser lehengan û liv û tevgerên wan yên di destanê da derbas dibin, rawestîyan û me hilsengandinên xwe digel şîroveyên xwe pêk anîn.

Di beşa duyem da em li ser destana Odysseia rawestîyan. Me ev beş jî wekê beşên destana Memê Alan di bin du serenavan da li hev anî. Di serenavê naveroka destanê da em li ser muhtewaya destanê digel hin binnavên me dîyar kirine bi girêdayî hilsengandin û şîroveyên xwe em li ser rawestîyan. Di beşa lehengên destanê da jî em bi girêdayî jêgirtinên ji destanê li ser analîza lehengan li gorî liv û tevgerên wan yên di nava destanê da derbas dibin, digel hilsengandinên xwe bi berfirehî sekinîn. Di beşa sêyem da em li ser berawirdkirina destanên Memê Alan û Odysseia rawestîyan. Di vê beşê da em pêşîyê li ser muhtewaya danberheva destanan rawestîyan piştra jî me her du destan j' alîyê lehengan ve dane berhev. Di vê beşê da me bi berfirehî destanên xwe dane berhev û me alîyên wan yên nêz û cuda digel jêgirtinên ji destanê bi girêdayî hilsengandinên xwe pêk anî. Di encamê da jî me têkilîya xwirt ya di navbera her du destanan da selimand.

Peyvên Sereke: Memê Alan, Odysseia, Destan, Edebîyata Berawirdî, Berawirdkirin, Hilsengandin.

ÖZET

Memê Alan destanı Kürt Edebiyatı'nda sağlam bir temele sahip olmakla beraber yapılan birçok çalışmanın da temel kaynağı olmuştur. Bu destan hem klasik Kürt Edebiyatında hem Kürt Halk Edebiyatında hem de Modern Kürt Edebiyatında önemli bir yer edinmiştir. Öte yandan Odysseia destanı da hem Yunan Edebiyatı hem de dünya edebiyatı için önemli bir yere sahiptir. Bu destan için diyebiliriz ki birçok farklı ulusu ve edebiyatlarını etkilemiştir.

Bu çalışmamız ön söz, giriş, üç ayrı bölüm ve sonuçtan meydana gelmektedir. Tezimizin giriş kısmını iki bölüme ayırdık: Bir bölüm sözlü kültür, destan, mitoloji ve destan ile mitoloji ilişkisinden oluşuyor; diğer bölüm ise mukayeseli edebiyat üzerinedir. Birinci bölümde Memê Alan destanı üzerinde durduk. Bu bölümü iki ana başlık altında ele aldık. İlk ana başlık destanın muhtevası üzerinedir, diğer ana başlık ise destanın kahramanlarının analizi üzerinedir. Destanın muhtevası başlığında bazı kaynaklarla birlikte belirlediğimiz bazı alt başlıklara bağlı kalarak destanın içeriği üzerinde durduk. Kahramanların analizi ana başlığında ise destadaki kahramanların hal ve hareketleri üzerinde etraflıca durup analizlerimizi yorumlarımızla beraber meydana getirdik.

İkinci bölümde Odysseia destanı üzerinde durduk. Bu bölümü de Memê Alan destanının bölümleri gibi iki ana başlık altında inceledik. Destanın muhtevası başlığında belirlediğimiz bazı alt başlıklara bağlı kalarak analiz ve yorumlarımızla destanın içeriği üzerinde durduk. Destan kahramanları başlığında ise destandan aldığımız alıntılarla destanda geçen kahramanların hal ve hareketlerinin analizi üzerinde tahlillerimizle birlikte etraflıca durduk. Üçüncü bölümde ise Memê Alan ve Odysseia destanlarını mukayese ettik. Bu bölümde destanları evvela içerikleri yönünden mukayese ettik ardından da kahramanları yönünden mukayese ettik. Bu bölümde destanlarımızı etraflıca karşılaştırdık ve destanlardan aldığımız alıntılara bağlı kalarak benzer ve farklı yönlerini analizlerimizle beraber meydana getirdik. Sonuç bölümünde ise iki destan arasındaki güçlü ilişkiyi saptadık.

Anahtar Kelimeler: Memê Alan, Odysseia, Destan, Mukayeseli Edebîyat, Mukayese, Analiz.

ABSTRACT

The epic of Memê Alan has a strong foundation in the Kurdish Literature, also it is a basic resource for many works about literature. This epic has an important place on the Kurdish Classic Literature, Folk Literature and Modern Literature. Likewise, the epic of Odysseia has an important place on the Greek and World Literature. We can say that this epic affected many different nations and their literature.

This certain work is composed of preface, introduction, three different parts and conclusion part. We separated the introduction part of our thesis into two parts: The first part is consist of the relationship between oral culture, epic and mythology. The other part is about the comparative literature. In the first part, we dwell on the epic of Memê Alan and divided this part into two main titles. First main title is about the content of the epic; the other main title is about the analysis of the characters in the epic. In the former one, we focused on the content of the epic by adhering the subtitles which were identified with their sources. For the second one, we dwell upon the characters and their behaviour in detail, and we generated our analysis through the interpretation.

In the second part, we urged upon the epic of Odysseia. We divided this part into two main titles as well, in the same way of the epic of Memê Alan. We mentioned to the context of the epic, with adhering to some subtitles that were determined in the content part. In the second part of which main idea is the characters of the epic, we dwell on the analyzing of behaviour of the characters with some quotations from the text. In the third part, we compared the epics of Memê Alan and Odysseia. At the first, we compared two epics through their contents and then through the characters. The comparison continued in detail, and through the quotations from these certain texts, we mentioned to the similarities and the differences of them. In conclusion part, we found the strong relationship between these two epics.

Keywords; Memê Alan, Odysseia, Epic, Comparative Literature, Comparison, Analysis.

NAVEROK

KURTE	iii
ÖZET	iv
ABSTRACT	v
PÊŞGOTIN	xi
KURTEBÊJE.....	xii
DESTPÊK	1
1. Çanda Devkî, Destan, Mîtolojî, Têkilîya Destan û Mîtolojîyê	2
1.1. Çanda Devkî.....	2
1.2. Destan	3
1.3. Mîtolojî	5
1.4. Têkilîya Destan û Mîtolojîyê	6
2. Edebîyata Berawirdî.....	7
BEŞA YEKEM.....	10
DESTANA MEMÊ ALAN	10
Giringîya Destana Memê Alan	10
Kurteya Destana Memê Alan	11
1. Naveroka Destanê	13
1.1. Di Destanê Da Dem.....	13
1.2. Di Destanê Da Mekan	15
1.3. Di Destanê Da Vebêjer	19
1.4. Zimanê Destanê.....	20
1.4.1. Di Destanê Da Şayesandin	21
1.4.2. Di Destanê Da Şibandî.....	26
1.4.3. Di Destanê Da Hin Taybetmendîyên Din	29
1.5. Di Destanê Da Nîrxên Çandî	36
1.5.1. Di Destanê Da Mêvanperwerî	36
1.5.2. Di Destanê Da Qurbandayîn (Boraqdayîn)	41
1.5.3. Di Destanê Da Tradîsyon.....	42
1.5.4. Di Destanê Da Bawerî	48
1.6. Di Destanê Da Tîpolojîya Jinê	49
1.7. Di Destanê Da Tîpolojîya Mêrî.....	51
1.8. Di Destanê Da Civak.....	51
1.9. Bûyerên Derasayî	54

2. Analîza Lehengan	55
2.1. Memê Alan	55
2.1.1. Lehengîyên Memê Alan.....	56
2.1.2. Aqilmendîya Memê Alan.....	61
2.1.3. Evîndarîya Memê Alan.....	64
2.1.4. Hin Taybetîyên Din ên Memê Alan.....	67
2.2. Zîna Zêdan	72
2.2.1. Evîndarîya Wê.....	72
2.2.2. Aqilmendîya Wê.....	76
2.2.3. Delalîya Wê.....	78
2.2.4. Hin Taybetîyên Din ên Zîna Zêdan	80
2.3. Bekoyê Ewan	83
2.4. Lehengên Din ên Destanê.....	89
2.4.1. Hevrêyên Memê Alan.....	89
2.4.1.1. Her Sê Celalî	90
2.4.1.2. Beglî.....	93
2.4.2. Mîr Ezîn.....	94
2.4.3. Sitîya Zêdan	95
2.4.4. Qîza Beko.....	96
2.4.5. Şivan	96
2.5. Di Destanê Da Lehengên Mîtolojîk (Derasayî) û Tiştên Sembolîk.....	97
2.5.1. Xocê Xidir.....	97
2.5.2. Her Sê Qîzên Padîşahê Perîyan	100
2.5.3. Bozê Rewan	102
2.5.4. Sembola Sêvê.....	103
2.5.5. Sembola Hinarê	103
BEŞA DUYEM	105
DESTANA ODYSSEIA	105
Giringîya Destana Odysseia	105
Kurteya Destana Odysseia	106
1. Naveroka Destanê	108
1.1. Di Destanê Da Dem.....	108
1.2. Di Destanê Da Mekan	110
1.3. Di Destanê Da Vebêjer	115

1.4. Zimanê Destanê.....	117
1.4.1. Di Destanê Da Şayesandin.....	118
1.4.2. Di Destanê Da Şibandin.....	122
1.4.3. Di Destanê Da Hin Taybetmendîyên Din	126
1.5. Di Destanê Da Nirxên Çandî	132
1.5.1. Di Destanê Da Mêvanperwerî	132
1.5.2. Di Destanê Da Qurbandayîn (Boraqdayîn)	139
1.5.3. Di Destanê Da Tradîsyon.....	143
1.5.4. Di Destanê Da Bawerî	146
1.6. Di Destanê Da Tîpolojîya Jinê	146
1.7. Di Destanê Da Tîpolojîya Mêrî.....	148
1.8. Di Destanê Da Civak.....	148
1.9. Bûyerên Derasayî.....	150
2. Analîza Lehengan	152
2.1. Odysseus.....	152
2.1.1. Lehengîyên Odysseus	153
2.1.2. Aqilmendîya Odysseus	156
2.1.3. Evîndarîya Odysseus	160
2.1.4. Hin Taybetîyên Din ên Odysseus	163
2.2. Penelopeia.....	169
2.2.1. Evîndarîya Wê.....	169
2.2.2. Aqilmendîya Wê.....	171
2.2.3. Delalîya Wê.....	173
2.2.4. Hin Taybetîyên Din ên Penelopeiyê	174
2.3. Telemakhos.....	176
2.3.1. Lehengîyên Wî	177
2.3.2. Aqilmendîya Wî	179
2.3.3. Hin Taybetîyên Din ên Telemakhos	181
2.4. Lehengên Din ên Destanê.....	182
2.4.1. Nestor.....	182
2.4.2. Menelaos	183
2.4.3. Hevrêyên Odysseus	184
2.4.5. Welatîyên Phaiakê	186
2.4.6. Xwazgînîyên Penelopeiyê	188

2.4.7. Şivan	189
2.5. Di Destanê Da Lehengên Mîtolojîk.....	190
2.5.1. Yezdan Athene	190
2.5.2. Yezdan Poseidon	194
2.5.3. Yezdanên Din ên Mîtolojîk	196
2.5.3.1. Kalypso	196
2.5.3.2. Kirke	197
2.5.3.3. Kyklop	197
2.5.3.4. Zeus	197
2.5.3.5. Hermieas	198
2.5.3.6. Aphrodite	198
2.5.3.7. Here	198
BEŞA SÊYEM	199
BERAWIRDKIRINA DESTANÊN MEMÊ ALAN Û ODYSSEIA.....	199
1. Berawirdkirina Naveroka Destana Memê Alan û Odysseia	199
1.1. Berawirdkirina Demê Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da	199
1.2. Berawirdkirina Mekanên Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da	200
1.3. Berawirdkirina Vebêjêran Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da	203
1.4. Berawirdkirina Zimanê Destanan Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da	203
1.4.1. Berawirdkirina Şayesandinan Di destanên Memê Alan û Odysseia Da	204
1.4.2. Berawirdkirina Şibandinan Di destanên Memê Alan û Odysseia Da	204
1.4.3. Berawirdkirina Hin Taybetmendiyên Din Di destanên Memê Alan û Odysseia Da	205
1.5. Berawirdkirina Nirxên Çandî Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da	206
1.5.1. Berawirdkirina Mêvanperwerîyê Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da.....	206
1.5.2. Berawirdkirina Qurbanîyan (Boraqdayîn) Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da...209	
1.5.3. Berawirdkirina Tradîsyonan Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da	209
1.5.4. Berawirdkirina Bawerîyan Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da.....	214
1.6. Berawirdkirina Tîpolojîya Jinan Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da	214
1.7. Berawirdkirina Tîpolojîya Mêran Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da	216
1.8. Berawirdkirina Civakan Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da	216
1.9. Berawirdkirina Bûyerên Derasayî Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da.....	217
2. Berawirdkirina Lehengan	218
2.1. Memê Alan û Odysseus	218
2.1.1. Berawirdkirina Lehengiyên Memê Alan û Odysseus	218

2.1.2. Berawirdkirina Aqilmendîya Memê Alan û Odysseus	220
2.1.3. Berawirdkirina Evîndarîya Memê Alan û Odysseus	221
2.1.4. Berawirdkirina Hin Taybetîyên Din ên Memê Alan û Odysseus	222
2.2. Berawirdkirina Zîna Zêdan û Penelopeia	224
2.2.1. Berawirdkirina Evîndarîya Zîna Zêdan û Penelopeiyê	224
2.2.2. Berawirdkirina Aqilmendîya Zîna Zêdan û Penelopeiyê	225
2.2.3. Berawirdkirina Delalîya Zîna Zêdan û Penelopeiyê	225
2.2.4. Berawirdkirina Hin Taybetîyên Din ên Zîna Zêdan û Penelopeiyê	226
2.3. Berawirdkirina Lehengên Din ên Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da	227
2.3.1. Berawirdkirina Lehengên Arîkar ên Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da	227
2.3.2. Berawirdkirina Lehengên Astengêr ên Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da	229
2.4. Berawirdkirina Lehengên Mîtolojîk (Derasayi) û Tiştên Sembolîk Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da	231
ENCAM	234
ÇAVKANÎ	237

PÊŞGOTIN

Destan parçeyêke giring ê çanda devkî ye ku di destanê da gelek tiştên aîdê wî gelî mirov dikare peyda bike. Di destanan da ji zimanê mîletî bigire heta îdraqa mîletî ya ji bo dînê pê bawer dike, jîyana wan, çanda wan û hwd mirov dikare li rast were. Destan ji rabirdûyê heya niha ciheke taybet ji xwe ra peyda kiriye û bûye binçîneya gelek xebatan. Destan hêza mîletan a qedîmbûna wan dipeytîne. Di roja me ya îro da em dîzanin ku gelek xebatên edebîyata modern, çî çîrok be çî şano û çî jî roman be, xwe li ser hîmê destanê ava kiriye. Ji ber ku di her serdemê da destanan nûjenbûna xwe parastîye lewma giringîpêdana destanan her dem di rewacê da bûye.

Di vê serdema me ya îro da bêguman şaxeke zanista edebîyata modern a giring edebîyata berawirdî ye. Edebîyata berawirdî ji ber ku qadeke nû ye lewma zêde xebat li ser wê nehatine kirin. Bi girêdayî vê yekê li ser destanên me û destanên cîhanî yên qedîm tu danberhev nehatibûn kirin. Lewma min xwast bi metoda edebîyata berawirdî ra ez vê qadê kêmek be jî dagîr bikim. Bêguman destana Memê Alan ji mîletê kurd ra berhemeke zêrîn û dêrîn e heman wisa destana Odysseia jî ji bo mîletê yewnan destaneke giranbiha û navûdeng e. Hebûna van her du destan digel nêzîkahîya wan tim balê dikişîne li ser xwe lewma vê yekê rengvedana xwe li ser vê xebatê kir ku ev xebat pêk were.

Di maweya pêkînana vê xebatê da arîkarîya gellek kesên hêja çêbû ku bi vê mebestê bo me cihê dilşadî û şanazîyê ye ku em navên wan bînin ziman. Di peydakirina çavkanîyan da û sererastkirina tezê da, em malavayîyên xwe li pêşkêşî Mûjgan Salîkê dîkin. Di warê wergerandinê da ji ber arîkarîdayînan, spas bo Aram Zal, Gonca Salîk Babat û Havîn Kîyeyê. Spas ji bo Mutlu Can ku bi fikr û pêşnîyazên xwe bû arîkarê pêkînana tezê. Malavayîyên taybet bo hevalê min Metin Gür ku gelek arîkarîyên hêja gihandine min. Spas bo hevalbendê min yê malê Şehmuz Arslan ku di maweya pêkînana tezê da bû cihê sebr û sebatê. Spas bo Ramazan Pertev ku ewî bala min kişande ser vê mijara teza me. Helbet malavayî û şabaşîyên taybet bo birêz Nesîm Sönmez ku hem bû sedemê teşwîqkirina nivîsandina tezê û hem jî bû sedemê zaf arîkarîyên hêja.

KURTEBÊJE

AMD
BN
BNB
BNR
BZ
C
Ç
HB
HBB
HWD
J
M
R
WAM
WER
WEŞ
Z

RAVE

Amadekar
Berhema Navborî
Berhema Navborî binêre
Binêrin
Berîya Zayînê
Cild
Çap
Heman Berhem
Heman Berhem Binêre
Her Wekî Din
Jimare
Mirin
Rûpel
Werger Aîdê Min e
Wergêr
Weşanxane
Zayîn

DESTPÊK

Babeta Tezê

Babeta vê xebatê li ser analîza leheng û naveroka destanên Memê Alan û Odysseyayê ye. Em bi berfirehî li ser danberheva van destanan bi girêdayî hin krîtîkên me dîyar kirîne, rawestîyan.

Armanca û Giringîya Tezê

Armanca xebata me ya sereke selimandina nêzîkatîya destanên Memê Alan û Odysseia, digel ferq û cudahîyên wê bû. Me bi vê xebata xwe xwast ku sînorên cîhana edebîyata kurdî bi berhemên gelên din ve baştir derkeve holê. Ji ber ku heta niha di edebîyata kurdî da li ser Odysseyaya binavûdeng ya yewnanî ti danberhev nehatine kirinê, lewma me xwast em vê valahîya heyî, kêmek be jî dagîr bikin.

Sînora û Çarçoveya Tezê

Xebata me bi Memê Alan a Roger Lescot û Odysseia ya Homeros va sînordarkirî ye. Di vê xebata xwe da em di warê danberhevê da bi tenê girêdayî van destanan man. Ev sînora herwiha çarçoveya xebata me jî dîyar dike.

Metoda Tezê

Di xebata xwe da em li gorî rêbaza vekolîna girêdayî metnan ango destanan çûn. Di xebata xwe da me pêşîyê ji bo ku merama me baş bihê fêmkirinê, bi berfirehî em li ser her du berhemên rawestîyan. Li gorî rêbaza xwe me her du berhem li gorî lehengên wan û muhtewayên wan bi girêdayî ji jêgirtinên destanan da, dane berhev.

Astengîya Tezê

Di xebata me da du astengîyên sereke derketine li pêşberî me. Ya pêşî ji ber ku destana Odysseia heta niha bo kurdî nehatîye wergeranê lewma me ji Odysseyaya ku bo tirkî hatîye wergerandinê, sîd wergirt. Zehmetîya din a ku derketîye li pêşberî me bêguman kêmxebatên li ser destana Odysseia bû. Di edebîyata kurdî da mixabin heta niha ne wergera vê berhema qerase hatîye kirinê û ne jî li ser wê xebat zêde hene lewma ev yek ji me ra bûne muşkîle.

Di bingeha nixandîna subjektîfî da tekezîya hebûna rengvedana rexneyê heye lewma ev xebata me jî ji bo her cure rexneyan û pêşniyaran vekirîye.

1. Çanda Devkî, Destan, Mîtolojî, Têkilîya Destan û Mîtolojîyê

1.1. Çanda Devkî

Xwîner nivîsê hetta ji derfeta nivîsînê bêhaybûna çandekê û çawanîya vê yekê ancax dikare bi zehmeteke mezin wê texeyyul bike.¹ Çanda devkî, têgeheke zaf muphem (şêlî) e. Di civakeke ne xwendewar da çanda devkî, ji nifşekê bo nifşeke din bi rêya gotinan veguhastina hemî tiştan – bi gotineke din tevahîya çandê – dihewîne.² Ji van gotinan jî tê xuyanê ku çanda devkî xudan sînoreke mezin û berfireh e. Bi rastî mirov nikare ji bo çanda devkî sînorekê deyne û an jî sînorekê xêz bike. Ji ber ku berîya nivîsê gotin hebû û civakan tiştên xweş, nexweş, xembar, dilxweşker û hwd bi rêya gotinan ji kesekê bo civakê vediguhan. Di wê veguhastinê da ango çanda devkî da hemû tiştên wekî nirx civakê ji xwe ra pejirandibû, cih digirt. Di çanda devkî da destan, çîrok, çîrçîrok, efsane, mîtolojî, stran û hwd zaf cih digre. Di çanda devkî bîra neteweyan heye ku hemû pîrozwerî û nirxadayînen xwe li wir da dinixumînin.

Di çanda devkî da bîra kollektîf ciheke girîng digere. Dema ku behsa bîrê tê kirin mebest ne bes tenê bîreke şexsî ye divê bê zanîn ku veguhezêrê herî girîng yê çandê, bîra kollektîf e.³ Ji ber ku di bîra kollektîf da mîna bîra şexsî agahî wekî xwe namîne lewma bîra kollektîf bîra şexsî ji nû ve saz dîke û bîra şexsî di vê çarçoveyê da dixebite.⁴

Pêşîyê çanda devkî derketîye holê. Çanda devkî sirûştî û şênber e. Di vê çandê da bîr ciheke jîyanwerî digre. Bihîstîn/guhdarkirin girîng e û bi girêdayî deng e. Girêdana bo raborîyê, çanda bav û kalan û qebîletî hertim li pêş e. Di dorhêla vê çandê da her berhema pêk hatî dikare were guherînê, dikare cure lê zêde bin, bi timî di nava herikîn û gerekê da ye. Ji ya ku dînî wêdetir, ya efsûnî, ji “cewher”ê zêdetir ya dervemayî girîng e. Çanda devkî; mirovan ji ketûmîyê (dengnekirin) ber bi cîhana têrdengî (aşkera) ve dibe. Çavkanîya agahîyan girîng e; meselbêjê qebîleyê, vebêjerê çîrokan, mirovên pîr û zana pîrozwer in. Bi gotineke din çîrok demarê gîyanî ya çanda devkî ye, vebêjerê çîrokan dilê qebîlê an jî civatê ye. Takekesên wê pêkhêner; civakî ne. Bi mebestên rexne, jinûvexwandin û her wekî dinê vegeerîna destpêkê ne çêbûnbar e. Çareserkirina bûyeran, lêhûrbûna wan ne rewşeke lêrasthatinê ye. Ji bo mirovên dûrî rewşê û ji bo mirovên bîyanî yan jî dûr, arîşeya peywendê (kontekst) peyda dibe. Di navbera pêkhêner û guhdêr da komunîkasyonê (ragihandin) zindî heye. Wekehevîbûna guhdêrî ya bihîsî ya ji bo serlehangî û rûdanê esas e; ya ku coşê jî pêk tîne ev rewş e. Di navbera mirovan da hevbandorî (têkilî) û rûbirûbûn misoger e.⁵

Taybetmendîyên ji hizir û raman û vegotina çanda devkî, dertên dikarin wiha bihêne rêzkirin: Dubare, rîtîm û gotinên qalibî misoger in. Liv û tevgerên bedenî girîng in. Li cihê hevoka esasî emilandina hevoka pêreyî dihê tercîhkirinê. Li cihê vegotina tehlîlîkirî vegotina

¹ Ong, J. Walter, Sözlü ve Yazılı Kültür – Sözüün Teknolojileşmesi, wer. Sema Banon, weş. Metis, Stenbol 2010, r.46.

² Goody, Jack, “ Sözlü Kültür”, Milli Folklor Dergisi, 2009, j.21, r.128.

³ Ricouer, Paul, Hafıza, Tarih, Unutuş, wer. M. Emin Özcan, weş. Metis, Stenbol 2012, r.112.

⁴ Ersoy, Ruhi, Sözlü Tarih ve Folklor İlişkisi- Baraklar Örneği Disiplinler Arası Bir Yaklaşım Denemesi-, weş. Akçağ, Enqere 2009. r.37.

⁵ b.n. Sözlü ve Yazılı Kültür, r.46-86.

gumlatkirî (bloc) dihê hîlbijartin. Vegotina bi girêdayî zîhnî ya kevneperestî-adetperestîyê heye. Vegotin girêdayî rewşên şênber in. Vegotina girêdayî parvekirina hestan berbelav e. Di vegotinê da erkîti (fonksiyonîti) û nêzîkbûna jîyana mirovan li pêş e. Vegotina têkoşînerî û ya li ser gengeşeyan (polemîk) heye.⁶

1.2. Destan

Destan, cureyekî edebî ya kevin e. Peyva ‘‘Dastan an Destan’’ peyveke Îranî ye. Di kurdî da hem peyva destan hem jî peyva ‘‘Beyt, Qiset’’ tete bikaranîn. Li hemberî vê peyvê li Rojava ‘‘epos’’ tete bikaranîn. Epos bi eslê xwe grekî ye û tete me’neya çîrokên menzûm. Epos, ew serborîyên wesifdar û derasayî yê xweda, xwedawend, wekxweda û lehengan e ku bûyerên mezin ên qewimîne û di bîra civakê da bi cih bûne.⁷

Destan peyveke farisî ye û tete wateya epopeyê. Em dikarin bibêjin destan ew berhem e ku bûyerên wekî lehî, şewat, şer, erdhej û koçberî dihewîne ku di hişmendîya civakê da cihekî girîng digrin. Ev berhem jî bûyer, cih û ji lehengan pêk tene. Cih û demên destanan bi tevahî ne rasteqîn in û li gor cih û demên ku tene nivîsandîne dikarin rastî hin guhertinan werin.⁸

Destan ji destpêka mirovayîyê ve tene gotin û cureyekî kollektîf e. Ji bo vekolîna li ser miletekî yek ji çavkanîyên sereke guman ne tete da destan in. Çimkî destan di bîra civakî ya gel da cihê xwe digre û li wir da jî çand heye, nerî heye, bawerî heye, lehengtî heye û serborîyên girîng ên civakê hene. Li ser destanan bêguman zaf pênase hatine kirîne. Li gorî lêkolîner Erman Artun destan, ji berhemên menzûm yê ku, behsa derasayî an jî rastîyê dîkin, efsaneyan û dîrokê bi hev ve dikelijînin, hin bûyerên lehengi û bûyerên mezin yê civakî bi rengekî helbestî vedibêjin re, tete gotin.⁹

Destan, hîsên bilind yê neteweyê, ramanên wan û armancên wan ên hevpar didin der. Destanên her neteweyê nînin. Lê neteweyên ku dîroka wan ber bi dewrên dêrîn ve diçin, xwedî destan in. Derketina meydanê ya destanan ji sê merheleyan pêk tete: kakil (a bûyerê), merheleya bûyîne û merheleya tesbîte. Ji ber ku bandoreke mezin û kûr ya bûyerên ku di destanan da diqewimin li ser civakê heye, nabe ku lehenge van bûyeran jî mirovên ji rêzê bin. Lehenge destanan xwedî taybetmendîyên xwerû û derasa ne. Ew hê di welidîna xwe de bi rengekî derasa tene dinyayê.¹⁰ Destan weke di rastîyê de çêbûye, wek wêneyeke pîr nêzîkî rastîyê dide dîyarkirin. Gerdîş, çand û zanista gel (folklor), destanan tene holê û bûyerên di destanan de wek cihê xwe di dîrokê de dide nîşan. Bûyerên di destanan de, weke rastîya wan hatîye pejirandin, derdikeve ber çavan. Yek ji taybetmendîya destanan ew e ku hemû netewî ne.¹¹

⁶ Goody, Jack, Yazılı Sözlü Arasındaki Etkileşim – Okur-Yazarlık, Aile, Kültür ve Devlet Üzerine İncelemeler-, wer. Osman Bulut, weş. Pinhan, Stenbol 2013, r.109-143.

⁷ Pertev, Ramazan, ‘‘Danasîn û Rewşa Giştî ya Xebatên li ser Folklor û Edebiyata Kurdî ya Gelêrî’’ Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Dîrok-Teorî-Rêbaz-Literatur-Berawirdî-1, weş. Avesta, Stenbol 2015, r.221-222.

⁸ Baba, Mustafâ Okan, Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü, Heyamola Yayınları, İstanbul 2007, r.38.

⁹ Artun, Erman, Türk Halk Edebiyatına Giriş, Weş, Karahan Kitabevi, ç.6, Adana 2001, r.25.

¹⁰ Kaya, D, Ansilopedik Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü, weş. Akçağ, Ankara 2007, r.222 (jêgirtin ji Hikmettin Atti Berawirdkirinek Li ser Destana Memê Alan û Mem û Zîna Ehmedê Xanî).

¹¹ Xezna, Dogan, Lêkolînek Li ser Pirtûka ‘‘Wêjeya Kurdî Duh û Îro’’ ya Nivîskar M. Nezîr Osê, kovara Vesta, Weşanên Aram, Stenbol, r. 114.

Ji bo ku destanek derkeve holê, divê bûyerên girîng ên wek şer, koçberî, di serê civakê ra derbas bûbin. Destan ji hêla dîrokî, fikrî û hunerî ve hêmanek pir girîng e. Ji bo ku neteweyek bibe netewe divê gelek dem derbas bibe ku mirov bikare bi hêsanî bigihêje destpêka dîroka wê neteweyê. Ji ber van sedeman tenê di destanan da mirov dikare taybetmendiyên mîtolojîk ên van civakan bibîne.¹²

Destan beriya her tiştî berhemeke edebî ye lewma di xwe da estetîkekê jî dihewîne. Destan malê gel e, j'alîyê gel ve bi awayekî zanyarî têne çekirinê. Bîra civakî ya gel bingeha destanê pêk tîne. Edebîyata lîrik çî menzûm çî nesîr çî jî hem menzûm hem nesîr be jî em dikarin ji edebîyata vegotinê re bibêjin destan. Destan di nav xwe de gelek cureyên edebî yên wek dîrok, roman û çîrok dihewîne. Bi bihurîna demê ew ê van cureyên edebî ji destanê veqetin û bibin cureyên serbixwe.¹³

Destan cureyêke edebî ya devkî ye ku di nava neteweyan da bi salan hebûna xwe bi awayekî berdewam kirîye. Ger em bi giştî li destanan binerin em dikarin bibêjin ku destan bêtir ya li ser lehengîyan e yan jî li ser evîndariyê ne. Lê herwiha destanên li ser şer, xela, koçberî, bûyerên xwezayî û hwd jî hene. Her wek li jor jî hatîye ziman her neteweyekê destanan nîne belam destanên heyî yên navdar ên cîhanê jî wiha ne:

Ilyada (Yûnan)

Odysseia (Yûnan)

Şahname (Fars)

Gilgamêş (Sumer)

Ramayana (Hînd)

Kalevela (Fîn)

Nibelungen (Alman)

Beowulf (Îngilîz)

Îgor (Ûris)

La Cid (Spanî)

Chansende Roland (Fransî)

Şînto (Japon)

Oğuz Kağan (Tirk)

Digel van destanên navdar ên cîhanê herwiha li ba kurdan jî zaf destan hene ku di nava van destanan da yên herî berbelav û navûdeng weha ne:

¹² Rayman, Hayrettin, *Halk Edebiyatı Anlatı Türleri*, Gazi Kitapevi Yayınları, 2010, Ankara, r.92.

¹³ Dumezil, Georges, *Mit ve Destan 1, Hint-Avrupa Destanlarında Üç İşlev İdeolojisi*, wer. Ali Berktaş, Yapı Kredi Yayınları, 2012, r.43.

Memê Alan
Sîyabend û Xecê
Dimdim/ Xanê Lepzêrîn
Zembîlfiroş
Kerr û Kulik
Binevşa Narîn
Ristemê Zal
Mîrza Mihemed
Evdalê Zeynikê
Dewrêşê Evdî
Filîtê Quto¹⁴

Di vê xebata xwe da jî me du destanên qedîm ên du neteweyên cuda ji xwe ra kire bingeha xebata xwe. Ev her du destanên hêja û dêrîn nasnameya neteweyên xwe ne ku mirov dikare her kodên dêrîn û kevn ên aîdê yewnan û kurdan di van her du destanên giranbiha da peyda bike. Bêguman him li cem yewnan him jî la kurdan zaf destan cî digirin belam me ji bo xebata xwe zîqbûna û bala zanîna xwe da li ser destana Memê Alan û Odysseia.

1.3. Mîtolojî

Gellek dijwar e ku mirov li ser mîtolojîyê pênaseyekê bike ku ev j' alîyê her kesî ve bê qebûlkinê.¹⁵ Wekê Seyidoglu jî anîye ziman li ser mîtolojîyê mirov nikare pênaseyê hevpar bike. Lewra em ê bêtir cih bidine gotinên kesên ên navdar yê li ser mîtolojîyê. Mîtolojî bi qasî dîroka mirovahîyê dûr û dirêj e. Dema em li hebûna mîtolojîyê ya di nava gelan da dînerin em dibînin ku ew bêtir di destanên gelan da derdikeve li beramberî me. Di demên antîk da ji bo mirovahî jîyana xwe bike xudan wate û wateyekê bide cîhanê, serî li hin tekstên îlahî didan. Ev tekst, tekstên mîtîk bûn. Mît aferînerîya cîhanê û destpêka mirovahîyê bi şeweyê çîrokî vedigot. Mît her dem çîroka destpêka aferînerîyê ye, mesela destpêka aferînerîya darekê, aferînerîya ajalekê ji xwe re dikir mijar. Mît tenê destpêka tiştên xwezayî ji xwe re nedikir mijar. Herwiha mît destpêka liv û lebatên mirovahîyê jî ji xwe re dikir mijar. Mît çîroka aferînerîyê ye.¹⁶

Mîtolojî, çîrokên ku di dewrên herî destpêkê da, di dewrên arkaîk da pêk hatine, neqil dike. Mijarên mîtolojîyê, bi piranî pêşketinên li ser afirînê û serencamên aîdê cîhana

¹⁴ Notên darsa edebiyata gelêrî ya Remezan Pertev.

¹⁵ Seyidoğlu, Bilge, Mitoloji Üzerine Araştırmalar, Metinler ve Tahliller, weş. Bizim Gençlik, Kayseri 1995, r.10.

¹⁶ Erşahin, İbrahim, Halk Kültürü ve Edebiyatı Sözlüğü, weş. Ötüken, İstanbul 2011, r.244.

metafizîkî ne. Yanî heyînên pêşî çawa derketine meydanê, çawa pêk hatine û di nav kîjan şertan da gav avêtine cîhana heyînê.¹⁷

Di mîtan da lehengên sereke derasayî ne. Ev lehengên sereke di destpêka cîhanê de bi helwesta xwe ya aferîner derdikevin pêş me. Di mîtan de ev lehengên sereke gelek caran cîhanê ji kaosê xelas dikin û helwesta xwe ya aferînerî nîşan didin. Ev cîhana ku em tê de dijîn ji aliyê mîtan ve tîrê dirûvandin.¹⁸

Mirov dikare bibêje ku mîtoloji nexşeya civakê ya herî kevn e. Kodên çandî herî zehf di vê qadê de tîrê ziman. Kriptoyên nîşên hezar salan ku di nav xweza û civakê de jîyana xwe rêsandîye herî baş di wê de tîrê ziman. Mîtolojiya her gelî hinek jî dişibe wî gelî. Yezdanên her gelî di şayesandinên mîtolojîk de hinek jî dişibin mirovên wî gelî. Ne tenê gel; erdnîgarî, kişwer û xwezaya ku ew gel li ser niştecîh e bi xwe jî sîtavên xwe di mîtolojiyê de dibînin. Xweda û Xwedawendên erdnîgarîya Kurdistanê çawa ku naşibin yê gelên Asyaya Navîn, ên gelên Asyaya Navîn jî naşibin ên Afrîkayî. Her mîtoloji di xweserîya gelê xwe de ye.¹⁹

Di nav civakên arkaîk de mîtoloji cihêkî pîr girîng digre û bermayîyên van civakan tenê berhemên mîtolojîk bûn. Lê belê em nikarin mîtan ji civakên arkaîk cihê binirxînin. Her çiqas di mîtan de vegotinek takekesî hebe jî em nikarin mîtan ji bîr û bawerîya civakê ji rîtûela wan û ji urf û edetên civakê cihê bikin û ji wan re bêjin helbestên lîrîk. Berevajîyê vê yekê mît hemû van tiştên ku me li jor hejmartine îfade dike.²⁰

Bêguman di destanên Memê Alan û Odysseia da jî bi tîrê xwe mîtoloji, hêmanên mîtolojîk û karakterên mîtoloji cih digire. Em dizanin ku mîtoloji ji destanan dinizile lewma mîtoloji bi hebûna xwe ra destan qedîmtir û dêrîntir dikin.

1.4. Têkilîya Destan û Mîtolojiyê

Di navbera destan û mîtolojiyê da têkilîyeke xwîrt heye. Em dizanin ku yek ji çavkanîyên destanan bûyerên mîfîk, mekanên mîfîk, lehengên mîfîk an jî tiştên bi van ve girêdayîne. Di destanan da pîr leheng hene ku mirov nikare wana wekî lehengên ji rêzê bi nav bike. Ji ber ku dema em li taybetmendîyên wan dinîhêrin em dibînin ku ew ji însanên asayî bi gellek aliyên xwe yê derasayî ve cuda ne.

Di her destaneke dêrîna da mirov li rastî rêçên bûyerên mîfîk, lehengên mîfîk an jî mîtolojiyê bi xwe dihê. Di bîngeha xwe da pêkhatina destan û mîtolojiyê yek e çimkî her du jî wekî ku rûdane, tîrê qebûlîrîne. Ev qebûlîrîna bêtir j' aliyê gel ve tîrê kirîne û mirov nikare bi rehetî ji bo vê yekê îspatekê deyne. Ger em li destana Memê Alan binerîn ji bo bajarê Mixribê Roger Lecot wiha dibêje: Çîroka Memê Alan li Bajarê Mexribê qewimî ye ku bajareke wisa di rastîya xwe de tune ye.²¹ Ev bajar her çiqas ne bajarekî dîyar be an jî ev bajar her çiqas

¹⁷ Eliade, Mircea, Mitlerin Özellikleri, wer., Sema Fırat, weş. Simavi, İstanbul 2001, R.10.

¹⁸ Rayman, Hayrettin, *Halk Edebiyatı Anlatı Türleri*, Gazi Kitabevi Yayınları, 2010, Ankara, r.8.

¹⁹ Yitik, Kamûran- Çeper, Ramazan, Ferhenga Mîtolojiya Kurdî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2017, r.11.

²⁰ Georges Dumezil, Mît ve Destan 1, Hint-Avrupa Destanlarında Üç İşlev İdeolojisi, wer. Ali Berktaş, Yapı Kredi Yayınları, 2012, r. 43.

²¹ Lescot, Roger, Memê Alan, Avesta, Stenbol, 2010, r. 13.

bajarekî xumam be jî lê di nava civaka kurd da ev bajar wekî heyî digel çîroka wê dihê qebûlkinê.

Wek dawî, zîqbûna hevpar ya ramana tevahîya cîhanê, mirovan di tevahîya rûzemîna me da û bi dirêjahîya dîrokê ve bi hev ve girêdide. Pirsên bersivdayî yên efsaneyan (destan), bi awayeke sirûştî li ser rawestîna her cure temayan, ji civakekê bo civakeke din cîyawazîyê nîşan bide jî di çandên cuda da mijarên ku danehevek efsaneyî ya pirr dişibin hev, pêk anîye.²²

2. Edebîyata Berawirdî

Dîroka mirovatîyê bigre heta sirûştê hemû tişt bi berawirdkirinê dest pê dike. Mirov ji bo tiştê heyî fam bike û tiştên nû keşif bike pêdivîyê bi tiştên mîna xwe an jî ji xwe cuda hîs dike. Piştî nasîna van tiştan tiştê heyî pêşve dikeve û kamil dibe. Edebîyata berawirdî jî zanistekê ku xwe dispêre du tiştan. Di wan du tiştan da du edebîyat an jî du berhem cî digrin. Pênaseyên li ser edebîyata berawirdî zaf in ji wan hinan ev in. Edebîyata berawirdî binbeşeke zanista edebîyatê ye. Li vir edebîyat di wateya xwe ya giştî de ye û edebîyata berawirdî bi her sê şaxên sereke yên edebîyatê; edebîyata klasîk, edebîyata modern û edebîyata gelêrî re têkildar e. Edebîyata berawirdî rêbaz û metodek e ku mirov dikare wê rêbaz û metodê di van her sê warên edebîyatê de bi kar bîne. Ji ber vê yekê jî edebîyata berawirdî weke, rexneyê û vegotinzanîyê gaveke pêşketî ya xebatên edebîyatê ye û ji bo ku di vî warî de xebat bîn kirin divê pêşî bingeh û formasyona edebîyatê hatibe bidestxistin. Eger formasyona edebîyatê gava yekem be, edebîyata berawirdî dibe gava duyem. Bêyî avêtina gava yekem gava duyem nikare bê avêtin.²³

Wêjeya berawirdî yek ji şaxên zanista edebîyatê ye ku di sedsala 19an de wekî qadeke zanistî di xebatên akademîk de cihê xwe digire. Wêjeya berawirdî şaxekê zanista wêjeyê ye. Berawirdkirin ji navê xwe jî dîyar e, bi du berhemên çêdibe. Berawirdkirin hem di nav berhemên neteweyekê de hem jî di navbera berhemên navnetewî de jî tê kirin. Ligel vê, berhemên tînan berawirdkirin dikarin hem ji berhemên hemdem hem jî ji yên nehevdem bibin. Peywir û erkê edebîyata berawirdî, di navbera du berhemên de ji aliyê naverok, teşe û ramiyariyê ve destnîşankirina wekhevî, dijayetî û hevparîya wan e. Wêjeya berawirdî hunereke sistematîk e ku di wêjeyê de wekhevî, bandor û nêzîkatîyê dike mijarên lêkolînên xwe.²⁴

Yên ku cara pêşî di warê edebîyata berawirdî de xebitîne, Sorbiene, J. Dryden, Elias Schlegel, Montesquieu û Madame de Stael in. Yê ku edebîyata berawirdî pêşve birine, Goethe, Rückert, Franz Bopp, Julim, C. Gustav Carus, François Villeman, Thomas Mann û Henrich Mann in. Edebîyata berawirdî cara pêşî li Fransayê ketîye nav bernameya zanîngehan. Di vî warî de pêşengê fransî Abel François Villemian di sala 1827an de ev têgeh bi kar anîye. Di sala 1829an de dersa Villeman a di babeta bandora nivîskarên fransî yên sedsala XVIIIem li ser edebîyatên bîyanî wekî dersa yekam a edebîyata berawirdî tê qebûlkirin. Li Fransayê di vî warî de kesên di yên girîng Jean Jacques Ampere, Philarete

²² Rosenborg, Donna, Dünya Mitolojisi- Büyük Destan ve Söylenceler Antolojisi- wer. Koray Aytekin- Erdal Cengiz, weş. İmge, Enqere 2003, r.8.

²³ Adak, Abdurrahman, Edebîyata Berawirdî, pirtûkçeya çapnebûyî, Mêrdîn 2015, r.4.

²⁴ Kefeli, Emel, Karşılaştırmalı Edebiyat İncelemeleri, weş. Kitapevi, İstanbul 2000, r.9.

Chasles, Frederic Ozanam, Lois Benloew, A. Delatouche û Baldensperger in. Moriz Carriere, Friedrich Hirt, Ernst Robert Curtius, Max Koch pêşengên almanî; Hugo Meltz û Lownnitz pêşengên macaristanî; Francesco de Sanctis, Artura Graf û Artura Farinelli pêşengên îtalî; Marc Monnier, Louis û Paul Betz pêşengên swîsrî; Georg Brandes pêşengê holandî û Mathew Arnold pêşengê ingilîz e.²⁵

Edebîyata berawirdî dikare hem navneteweyî hem jî neteweyî be. Bijareya pêşî aîdê ekola Fransîyan, bijare duyem jî aîdê ekola Emerîkîyan e. Di destpêkê de ekola Fransîyan serdest bû lê piştê ekola Emerîkîyan cihê wê girt. Ji ber ku li Ewropayê ji sedsala XVIIIem şûnde hizra neteweyî bi ser ket, şûna edebîyata latînî ya berbelav êdî edebîyatên neteweyî hatin pêşxistin û Ewropîyan xwastin ku edebîyatên xwe yê neteweyî li nav dewletên kolonyal belav bikin. Edebîyata berawirdî li Ewropa rengekî neteweyî bi dest xist û ket bin xizmeteke neteweyî. Lê bele kesên wek Paul Van Tieghem û pey wî re akademîsyenên Ewropî yê ku piştî şerê cîhanê yê yekem koçî Emerîkayê kirine, di wê baweriyê de ne ku edebîyata berawirdî dikare pêwendîyên ku di nav netewe, ziman û dewletan de qut bûne careke dî saz bike û wan nêzî hev bike²⁶

Amerîka piştî Şerê Cîhanê yê Duyem ji wêjeya berawirdî re bûye bihişt. Ji du sedemên sereke yê vê rewşê; ya yekê ev e ku Amerîka xwedî civakeke kozmopolît bûye. Sedema dî jî gelek zanyarên wêjeyê, komparîstên fransîz û alman ji ber şerî xwe spartine vî welatî. Yek ji van koçberan jî René Wellek (z.1903, Vîyana-m.1995) bû ku di salên 1940î de ji Çekoslovakayê koçî Amerîkayê dike. Wellek bi kevneşopîya lîngûîstîka Pragê dikemile û dibe nûnerê zîrek ê vê qadê. Wellek bi rexneyên xwe yê li ser ekola fransî di derdorên navneteweyî yê wêjeya berawirdî de bizaveke xurt pêk tîne. Bi van rexneyan dijberê ekola fransî ekoleke nû di vê qadê de cihê xwe digire. Wellek li şûna têgeha wêjeya netewî ya serbixwe fêhma “li dewsa afirînerîya wêjeyî ya cîhanî qet nebe yekîtîya afirînerîya Rojava” anîye. Bi vê yekê sînorên di navbera wêjeyên netewî de ku fransîyan didît, ji holê radikir. Li gorî wî di lêkolînan de divê wêje wekî yekpare bê dîtin. Qesta Wellek dema ku digot ekola fransî qadê bi sînor dike, gotina wan “rapports de fait” (raporên diyarde) bû ku tenê bi têkilîyên wêjeyê ve mijûl dibû. Wellek nêrîna Carré ya ji dûrketina wêjeya gelemper jî şaş didît. Sedem jî ew bû ku ne di mijara lêkolînê de ne jî ji aliyê rêbazê ve cudahîyek di navbera wêjeya berawirdî û wêjeya gelemper de nedidît.²⁷

Dema peyva edebîyata berawirdî li ber guhê meriv dikeve demildest tekilîya edebîyatên ji hev cihê tê hişê meriv. Armanca edebîyata berawirdî, tesbîtkirina taybetîyên hevbeş ên berhemên edebîyatên cuda ye.²⁸ Ji van gotinan jî dertê holê ku ji bo pêşvebirin û qewîkirina wêjeyê, pêdivî bi nasîna wêjeyên gelên din hene. Di bingeha hemû tiştan da berawirdkirinek heye, ji bo ku neteweyek xwe pêşve bibe lazim e ku bi neteweyeke din ra bikeve nava reaksiyonekê. Heke em jî bixwazin ku wêjeya xwe ya qedîm asofirehtir bikin û pêşve bibin lazim e em têkilîya edebîyata xwe digel edebîyatên din ên qewî, deynin.

²⁵ b.n.b, Adak, r.11.

²⁶ Aydın, Kamil, Karşılaştırmalı Edebiyat Günümüz Postmodern Bağlamında Algılanışı, weş. Birey (çap 2) İstanbul 2008, r.20-21.

²⁷ b.n.b, Aytaç, r.72-75.

²⁸ Engünün, İnci, Mukayeseli Edebiyat, weş. Dergah İstanbul, 2011, r.18-19.

Edebîyata berawirdî her çiqas edebîyateke têr û tije û dêrîn jî be mirov nikare bi rehetî bibêje ku ev edebîyat bi tevahî hatîye dîsîplînîzekirin. Lêbelê ji destpêkê ve têgeha “wêjeya berawirdî” di xwe de wateyeke problematîk dihewîne. Ev yek jî bûye sedem ku xebatên akademîk yên vê qadê qels bimînin.²⁹ Ji ber dîyarnekirina sînorên wê û muretteb nebûna wê li ser vê qadê hêj jî nîqaş berdewam in.

Di vê teza xwe da me ji edebîyata berawerdî siûd wergirtîye. Lewma ev qada edebîyatê wê derfetê dide me ku em edebîyata xwe baştir nas bikin. Em digel derfetên edebîyata berawirdî hay ji edebîyata xwe dibin. Berhemên cîhanê yên edebîyatê rê nîşanî me dide ku ka edebîyata me di çi astê da ye. Eger em li berhemên dî yên cîhanê yan jî yên neteweyeke bîyanî binerin û li ser vekolin hingê dê derfeta xizmetkirina bo edebîyata me û çanda me bigihije pileyeke bilind. Mirov bi tenê nikare li gor rê û rêçikên heyî berhemên neteweya xwe binirxîne çimkî hebûna berhemên din wê derfetê dide mirovî ku mirov bi asoyeke berfirehtir û subjektiftir li berhema neteweya xwe binere. Bi vê lênihêrînê ra li ba mirovî ruheyetek rexnegirî, vekolînî pêşve dikeve û li ser berhemên neteweya xwe bêtir hûr û kûr dibe. Ev hûrbûna li ser berhemê mirovî dikemilîne, paşxaneya mirovî ya heyî kûrtir dike û edebîyata neteweya mirovî tekûztir dike. Me jî bi vî xebata xwe ya berawirdî ya Memê Alan û Odysseia xwast ku edebîyata me pêşvetir be, asofirehtir be û qama wê her biçe di nava edebîyatên cîhanê da dîyartir be.

²⁹ Rene Wellek-Austin Warren, *Edebiyat Teorisi*, wer. Ö. Faruk Huyugüzel, weş. Dergah, İstanbul, 2013, r. 53.

BEŞA YEKEM

DESTANA MEMÊ ALAN

Giringîya Destana Memê Alan

Destana Memê Alan mirov bi rehetî dikare bibêje ku destana herî navdar û berbelav ya kurdan e. Destana Memê Alan him ji alîyê babeta xwe ve him j' alîyê fesahet û rûmeta xwe ve nirxeke bingehîne ji Edebîyata Kurdî ra. Wekê Roger Lescot dihîne ziman Destana Memê Alan ji bo kurdan xwedî nirxekî neteweyî ye. Ji çiyayê kurd (Kurd Daxî) ta bigihêje deryaçeya Urmiyê, kesek tune ku, baş an xirab, qet nebe çend rêzan ji vê destanê nizanibe bisitire. Guhertoyeke vê destanê bi ermenî jî heye ku analîza wê ji hêla F. Macler ve hatiye kirin. Tenê li herêmên ku zaraveyên din ên kurdî (Zaza, Baba kurdî) tên axaftin, ev efsane belav nebûye.³⁰ Vê destana tekûz û giring bingehêke qahîm ji edebîyata me ra danîye ku em dizanin cara pêşîn di beyteka Melayê Cizîrî da em li rastî navên lehengên vê destanê dihên ku ew beyt jî wiha cih digire:

Mûyekî ez ji te nadim bi du sed Zîn û Şêrînan

Çi dibit ger tu hesêb kî min bi Ferhad û Memê³¹

Ji ber ku destana Memê Alan destana herî navûdeng e lewma gelek edîb û şairên kurd ev destan ji bo berhemên xwe û mebesta dilê xwe kirine hîmê esasîn. Em dizanin ku Piştî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî Destana Memê Alan ji xwe ra bingeh digire û bi navê "Mem û Zînê"³² mesnewîyeke tekûz û kamil jê dertîne. Xanî di vê berhema xwe da him Memê Alana folklorîk ji gelek alîyan va diguherîne him jî bi vê minasebetê sedemê nivîsana xwe digel hunertî û edebîtiya derdixê holê. Piştî Xanîyê nemir ji layê Mele Mehmûdê Bazîdî kurteya Mem û Zîna³³, ku xwe dispêre Destana Memê Alan, Ehmedê Xanî bi awayekî peşankî di sedeya XIXan da dihê nivîsînê. Herweha, digel ku pêwendîyeke xurt jî di nava yekem şanoya kurdî Memê Alan ya Evdîrehîm Rehmî Hekarî û Destana Memê Alan nebe jî cardin navê vê şanoyê "Memê Alan" e.³⁴ Destana Memê Alan jêderkeke giring e bo edebîyata me lewma gelek kesan piştî xwe spartîye vê destanê. Ev destana qerase li her çar alîyên Kurdistanê bigire heya Kafkasyayan jî belav bûye. Em dizanin ku di salan 1936î da j' alîyê Hecîyê Cindî û Emînê Evdal ve di kitêba Folklorî Kurmanca da sisê guhertoyên Destana Memê Alan cih

³⁰ h.b.r.7.

³¹ Melayê Cizîrî, Dîwan, (amd. Selman Dilovan), Weş. Nûbihar, Stenbol 2012.

³² Ehmedê Xanî, Mem û Zîn (amd. Huseyn Şemrexî) Weş. Nûbihar, Stenbol 2011.

³³ Mele Mehmûdê Bazîdî, Mem û Zîn, Weş. Lîs, Stenbol 2007.

³⁴ Evdîrehîm Rehmî Hekarî, Memê Alan, Weş. Lîs, çapa duyem, Dîyarbekir 2016.

digire.³⁵ Her du birayên Celîl angî Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl di kitêba xwe ya bi navê Zargotina Kurda da ku ev pirtûk ji du cîldan pêk dihê cih didine sê guhertoyên Memê Alan.³⁶ Di vê kitêbê da jî varyanta ewil pitir pexşankî ye lê her duyên din pitir di formê helbestkî da ne. Sadiq Bahaeddîn Amêdî di kitêba xwe ya bi navê “Folklorî Kurdî” da cih dide gelek keresteyên folklorîk ên herêma behdînan ku di vê pirtûkê da varyanteka Memê Alan jî cih digire. Ev varyanta Memê Alan pitir bi awayekî pexşankî hatîye nivîsandinê û forma helbestkî tê da kêma cih digire.³⁷ Qanatê Kurdo jî li ser destana Memê Alan zaf sekinîye ku li Stocxholmê di salan 1996î da kitêbek bi navê “Mem û Zîn, Duwanzde Varîyant” çap dîke. Di vê kitêbê da jî duwazde guhertoyên Memê Alan tê da cih digirin ku yek jê soranî ye. Bi kurtî Destana Memê Alan wekî kaniyekê ye ku ji bo edebiyata kurdan diherike. Xebatên li ser vê destanê û rengvedanên vê destanê heta sedeya me ya îro jî digel xurtbûna xwe berdewam dîke.

Destana Memê Alan destaneke berbelav e ku tenê ne j’alîyê kurdan va herwiha j’alîyê gelek vekoler û Kurdologên bîyanî ve jî xebat li ser hatine kirinê. Efsaneya Memê Alan ji mêj ve ji hêla Ewrûpiyan ve tê zanîn. Hê di 1980an de A. Socin guhertoya pêşî amade kiribû. Di pey wî re jî A. Von Le Coq (1903), Oscar Mann (1906, 9) û Hugo Makas (1926) gelek guhertoyên (versiyonên) din ên Memê Alan derxistine holê.³⁸

Di vê xebata xwe da me jî xwe ra Memê Alana ku ji layê Roger Lescot ve hatîye berhevkirinê jî xwe ra bîngêh girt. Em dizanin ku Roger Lescotê Kurdolog bi arîkarîya Celadet Alî Bedirxan li ser Memê Alan li Sûrîyê xebateke berfireh pêk dihîne. Ew piştî pêkînanana xebata xwe di sala 1942yî da digel wergera wê ya fransî li Beyrûdê çap dîke.³⁹

Kurteya Destana Memê Alan

Destana Memê Alan li ser hîmê evîndarîyekê pêk hatîye. Memê Alan serlehengê vê destanê ye ku wî navê xwe jî daye destanê. Ji destanê jî em dizanin ku Memê Alan kurê Elî Begê ye ku Elî Beg Mîrê bajarê Mixribê ye. Piştî ku Memê Alan dihê dinê em dibînin ku ew di nava maweyek kurt da mezin dibe. Memê Alan piştî ku mezin dibe j’alîyê gelek aliman ve dersan dibîne. Rojekê ajaleke derasayî dîkeve tora masîgirên Mixribê, piştra ew bi zor û zehmet vî ajalê derasayî angî Bozê Rewan ji nava avê derdixin. Ji ber ku gelek pesnê Bozê Rewan dihê kirinê lewma Memê Alan wî hespî digire û ji xwe ra xwedî dîke. Piştî neqlekê em dibînin ku her sê qîzên perîyan ji me ra eyan dibin û komecivînek di nava wan da dibore. Ev

³⁵ Cîndî, Hecîyê, & Evdal, Emînê, Folklorî Kurmanca, Weş. Avesta, Stenbol 2008.

³⁶ Celîl, Ordîxanê, & Celîl, Celîlê, Zargotina Kurda (du cîld), Weş. Aram, Amed 2004-2014.

³⁷ Amêdî, Sadiq Bahaeddîn, Folklorî Kurdî, Weş. Lîs, Dîyarbekir 2013.

³⁸ h.b.r.8.

³⁹ h.b.r.8-9.

komecivîna dibe sedem ku Memê Alan û Zîna Zêdan hev bibînin û evîndarê hev bibin. Piştî ku her du esilzade hev dibînin, evîndarê hev dibin û êdî nikarin bêyî hev tebatê bikin.

Memê Alan piştî dîtina Zîna Zêdan êdî dixwaze demildest ji bo peydakirina wê bikeve li ser rêya Cizîra Botan. Di navê da dê û bavê Memî ji bo ku wî ji rêya çûyîne vegebinin çî ji destê wan dihê dikin belam Mem ji bo çûyîne bibiryar e û naxwaze ji ya xwe were xwarê. Memê Alan emir dide Beglîyê destebirayê xwe da ku amadekarîyên çûyîna wî bike. Beglî van yekan dike û Memê Alan berê xwe dide xerîbistanê. Memê Alan em dibînin ku di rê da wînda dibe û Xocê Xidir dikeve di şiklê kesekî kal da û tê arîkarîya wî dike û rê li raberî wî dike. Digel rê rakerîrîne Xocê ji ber talûkeyên heyî şîretan li wî dike da ku ew li xwe miqate be. Memê Alan bi gotina Xocê Xidir dike û berê xwe vedigerîne Cizîra Botan. Ji ber ku Bekoyê Ewan di remilavêtinê da dizanîbû ku dê Memê Alan were lewma qîza xwe şandibû pêşîya wî da ku Mem pê bixape; belam Memê Alan ji ber şîretên Xocê Xidir nakeve kemîna Beko û Qîza wî. Memê Alan piştî çend kotûkêşan ji destê Beko Ewan û Qîza wî difilite. Ji ber ku dizane Zîna Zêdan birayê Mîrê Cizîrê ye lewma dizane ku karê wî karekî dijwar û zehmet e. Lewma dema ku çareya derdê xwe digere gelek kes mala her sê Celalîyan raberî wî dikin. Êdî ew pê bawer dibe ku dermanê wî mala Celalîyan e û xwe davêje bextê wan. Celalîyê di nava destanê da wekî kesên mîrxas û jêhatî dihêne simbolîzekirinê. Ew dixwazin sedemê hatina mêvanê xwe hîn bin û çareyekê jê ra peyda bikin. Memê Alan piştî demekê sedemê hatina xwe ji wan ra dibêje belam piştî ku Çekoyê qelendîyê Zîna Zêdan vê dibihîze di destpêkê da vê yekê qebûl nake, bertek nîşan dide. Hesen û Qeretaçîn li hemberî vê tevgera Çeko nerazîbûnê nîşan didin û ji bo pêkanîna soza xwe ya li hemberî mêvanê xwe kuştina birayê xwe jî didin li ber çavên xwe. Çeko piştî hewldanên birayê xwe dev ji berteknîşandinê berdide û rewşa heyî qebûl dike. Êdî ji vir şûnda zehmetîya herî mezin li hemberî Memê Alan radibe û yekser dixwaze bigihe Zînê.

Memê Alan her çiqas bifikire ku zehmetîya herî mezin Çeko ye jî belam wî hêj fesadî û zikreşîya Bekoyê Ewan nedîtîye. Bekoyê Ewan ji ber ku ji berê da hez ji malbata Celalîyan nedikir ji ber hatina Memê Alan êdî bêtir zehlê wî ji malbata Celalîyan diçe. Beko di destanê da kesekî nerênî ye lewma ji bo ku serleheng têk biçe çî ji destê wî dihê dike. Piştî ku Memê Alan û Zîna Zêdan li ser Kanîya Qestelê hev dibînin û Bekoyê Ewan ji vê rewşê hayedar dibe êdî tam pê piştrast dibe ku Mem ji bo Zînê hatiye bajêrî. Ji ber ku hêzek Bekoyê Ewan tune lewma dixwaze vê zikreşîya xwe ya li hemberî Memê Alan û Celalîyan bi navbeykarîya Mîrî ango bi hêza Mîrî, pêk bîne. Beko ji ber ku dizane Mîr ji çûyîna desthilatdarîya xwe û ji Celalîyan ditirse lewma vê zafiyeta Mîrî baş bi kar dihîne. Piştî demekê wesa lê dihêt ku êdî Mîrî Cizîrê dibe pêlistokek di destê Beko da. Beko çî ya ku dixwaze bi awayekî li Mîr dide qebûlkirinê. Beko tim li dekûdolaban digere, lewma dixwaze bi awayekî Memê Alan têk bibe. Piştî demekê ji Mîr ra dibêje ku Mem ji bo têkberîna desthilatdarîya te hatî û Celalî jî piştgirên Mem in. Mîr li hemberî vê bûyerê zû qanih dibe û tam dikeve di bin karîgerîya Beko da. Beko bi hinceta seferekê berê hemû kesî ji Cizîrê ba dide. Armanca Beko di rê da jehrîkirina Memê Alan e belam Memê Alan bi awayekî fêlbazane tev digere, xwe birîndar dike û berê xwe dide Cizîrê. Li Cizîrê tu kes tune û Zîna Zêdan di koşka xwe da bi tenê ye. Kata ku Zîn û Mem bi tena serê xwe ne di nişkê va Beko û Mîr li wan eyan dibe. Mem bi awayekî zîrekane Zînê dixwe bin dawê kurkê xwe. Beko dizane ku Memê Alan li dû fêlbazîyekê ye lewma fesadîyan ji

Mîr ra dike da ko Mem û Mîr bikevin hevrikîyan. Memê Alan di mala Mîr da asê dimîne belam mûyekê ji xwe şaş nake û li hemberî Mîrî serî danaynê. Hesen çawa ku meseleyê dizane tavil ji bo rizgarkirina Memê Alan dest bi hin rûdanan dike. Hesen bi awayekê Memê Alan ji nav destên Mîrî xilas dike belam hemû sedema hatina Memî jî ji wî ra dibêje.

Memê Alan ji bo bigihije Zîna Zêdan ji serê destanê heta dawîya destanê ji her cure fedakarîyan ra amade ye. Memê Alan piştî çûyîna Celalîyan li Cizîrê bi tenê dimîne û Beko dixwaze vê fersende biemilîne. Mîr, Memê Alan vedixwîne mala xwe ji bo mêvandarîyê û şahîyan ji bo Memî lê dixê, lîstikan dilîzin û kêfa Memê Alan dihîne cih. Memê Alan bi Mîr ra kişikê dilîze û hertim serdikeve li hemberî vê bûyerê Beko bi şeytanî tevdigere, dibîne ku piştî Memî li Zînê ye û Zîn li wî temaşe dike. Tavil cihê Mîr û Memî dide guherandinê û çawa ku çavê Memî bi Zînê dikeve aqil ji serî diçe. Di lîstikê da têk diçe, Bekoyê Ewan bi awayekî digel Mîrî Memî desteser dike. Memê Alan piştî ku zindanî dibe di xewna xwe da kalekî xwe yê mirî dibîne, hay ji çarenûsa xwe û roja mirina xwe dibe. Memê Alan dema ku Zîn dihê li ba wî, êdî ji çarenûsa xwe ra serî datîne. Hemû tiştî ji Zîna ra dibêje û hinara ku Zînê jê ra anîye digel ku dizane Qîza Beko axûyê marî têxistîye tê da jî dixê û dimire. Wekî gelek tiştan ev destana kurdan jî bi têkçûna evînekê diqede an jî ser nakve.

1. Naveroka Destanê

Di destana Memê Alan da em ê pêşiyê li ser naveroka destanê rawestin ku em di bin vî sernavî da em ê li ser hin binenavan rawestin. Ew binenavên ku em li ser bisekin ev in: di destanê da dem, mekan, vebêjer, di destanê da ziman –ku di bin vî binenavî da jî em ê li ser şayesandin, şibandin û hin taybetmediyên din ên destanê ne bisekinin-, di destanê da nirxên çandî –ku di bin vî binenavî da jî em ê li ser mêvanperwerî, qurbandayîn, tradîsyon û bawerîya di destanê da bisekinin-, tîpolojîya jinê, tîpolojîya mêrî, civak û bûyerên derasayî ne.

1.1. Di Destanê Da Dem

Dem, ew têgeh e ku hemû çalakîyên mirovî yê heyî daxilî hebûna xwe dike. Mirov, bi çand, mawe û rewendên xwe yê zimanî di nava demê da cih digire.⁴⁰ Di gellek berhemên edebî da demek dîyar nîne ku mirov aşkere li ser bisekine. Di destana me da jî ger em bi çavekî giştî lê binerin em dikarin bibêjin ku her çiqas dem û mekan hebin jî, ew bêtir xumam in. Di destanê em ê li ser du cure deman rawestin yek dema arkaîk (derasayî) e yê din jî dema rasteqîn e.

Di destana me da dema derasayî yek ji cihên giring digire. Di destanê da mirov nikare li ser her dema rûdanek diqewime mînakan bide lewma em ê li ser hin mînakan bi girêdayî hilsengandinên xwe rawestin. Di destana me da em dizanin ku demên herî zêde derasayîti tê da tê xuyanê demên kombûna qîzên perîyan û axaftina Memê Alan digel kesekî mirî ye. Em dizanin ku ew rûdan digel ku di mekaneke nedîyar da nin herwiha ew di demeke nedîyar da nin jî. Dema ku vebêjerê destanê qala wan kêlîyan dike, wiha dirêse:

Hebûn sê qîzên Padişahê Perîyane

⁴⁰ Narlı, Mehmet, Romanda Mekan ve Zaman Kavramları, Kovara Zanistên Civakî, r.92.

Navê xwişka mezin Tavbano ye, navê xwişka navîn, Heyvbano ye; Stêrbano navê biçûka xweyingan e

Rojekê derketin, çûn ser kanîya Gulane

Ji xwe danîn postên kewane

Ketine nava hewza gulane⁴¹

Em herin dîyarê xewna Memê Alane

Dema ji qehr û meraqa di gûçkê zindanê da kete xewa şevane

Di xewna xwe da dît ko dîsa rûniştîye li ser textê xwe yê çarling, li bajarê Mixribîyane

Li dorhelê rûniştî ne birayê wî Beglî, tevî kurên giregir û begane

Dîya pîr û kalê bavan, tevî her du kokimên apane

Hate vê miclisê Emer beg, kalê Memî, şêxê Qureşîyane⁴²

Her wekî di van hevokên li jor jî baş tê xuyanê ku demeke dîyar nîne. Di piranîya destanê da em dizanin ku dema vebêjerê destanê di nava demekê da qala rûdanekê dike, ew dem ne dîyar e. Em xwe di carekê da di nava rûdanê da dibînin û dem nehatîye aşkerakirinê.

Di destanê da herwiha wekî me anîye ziman ji bilî dema derasayî herwiha dema rasteqîn jî cih digire. Dema rasteqîn li gorî demê derasayî bêtir cih digire û mînakên wê ji dema derasayî xwirttir in. Di destanê da her wekî dema derasayî dema rasteqîn jî ne dîyar e ka di kîjan wextê da pêk dihê. Bêguman mirov dikare ji bo dema rasteqîn gelek mînakan bide lê belê ger ku em bi çend mînakan nîşan bidin, ew kêlî wiha:

Rojekê, di nava xortan da bû şorê cenawerê behrê û ecebane

Hinekan dianî behsa hûtane

Hinekan vedikir şora marane⁴³

Salê Memê gihêştine panzdane

Mem kirin padîşahê bajarê Mixribîyane

Rojekê, Mem rûniştibû li ser textê çarling, mîna rojê ko nuh hiltê li çîyane⁴⁴

Dema ko ketine kevîya ava şet simê Bozê Rewane

Bi tenê, li wî alî şet, radibe dûmane

⁴¹ h.b.b.r.32.

⁴² h.b.b.r.141.

⁴³ h.b.b.r.28.

⁴⁴ h.b.b.r.29.

Pêl davêne serê pêlane

*Delxe davêne serê delxane*⁴⁵

Wekî di van hevokan û gelekên din da jî tê xuyanê ku demeke aşkere nîne. Aşkerenebûna demê him ji bo dema derasayî him jî ji bo dema rasteqîn heman e. Ango di her duyan da jî dema ku rûdanek pêk were em xwe di carekê da di nava wê rûdanê da dibînin. Vebêjer dema ji bûyereke derbasî bûyereke din dibe, di carekê da derbas dibe û ew dema ku rûdanên diqewimin jî ne aşkera ne. Di destanê da her çiqas rûdan aşkera bihêne ber çavan jî lê dema rûdanê xumam e.

1.2. Di Destanê Da Mekan

Di her cureyeka edebî da mekan cih digre. Ev mekan dikare bibe mekanekî muxeyyel an jî mekanekî rastîn lê mirov nikare bêyî mekanê cureyek edebî bifikire. Destan jî cureyeka edebî ye û di wê da mekan her heye. Mekan, -di rewşa herî hêsan de- di berhemê de sahneya rûdana wê kêlîyê ye. Yek ji wan hêmanên ku lehengê mirovan pêk tîne mekan e û mirov nikare bêyî mekanê lê dijî were fikirînê.⁴⁶ Di destana me da jî gellek mekan derbas dibin û ev mekan hebûn û asta destanê qewîtir dikin. Di vê destana me ya tekûz û qedîm da em dikarin bibêjin ku didu mekan, li gor taybetîyên xwe cih digrin. Yek ji wan mekana, mekana derasayî (arkaîk) ya din jî mekana rastîn e. Em ê bi pêşîyê berê xwe bizivînine mekanên arkaîk û paşê jî em ê li ser mekanên rastîn rawestin û hilsengandinên xwe ji jêgirtinên ji destanê da bikin.

Di destanê da yek ji mekanên arkaîk (derasayî) cihê kombûna qîzên Padişahê Perîyan e. Ev mekanê heyî ne mekanekî rastîn e û cihekî dîyar nîne. Di destanê da ew cihê kombûna qîzên perîyan ne cihekî dîyar û aşkera ye, ew cihekî xumam û nihênî ye. Mixabin di destanê da jî li ser vî cihî şibandineka berfireh tine. Di destanê da cihê ku perî lê kombûna wiha hatîye şayesandinê:

Hebûn sê qîzên Padişahê Perîyane

Navê xwişka mezin Tavbano ye, navê xwişka navîn, Heyvbano ye; Stêrbano navê biçûka xweyîngane e

Rojekê derketin, çûn ser kanîya Gulane

Ji xwe danîn postên kewane

Ketine nava hewza gulane

Stêrbano nihêrî ko cemala ko Xwedê daye her du xwişkane, ne daye tu kesane

Postê xwe li xwe kir û rakir yên her du xweyîngane

*Di ser wan ra firî, da perwazane*⁴⁷

⁴⁵ h.b.b.r.50.

⁴⁶ Çetili, İsmail, Metin Tahlillerine Giriş 2, Hikaye-Roman-Tiyatro, Ankara 2004, r.77-78.

⁴⁷ h.b.b.r.32.

Di destanê da cihê din ê derasayî bêguman cihê ku xewna Memê Alan ya tê da dibore ye. Em dizanin ku Memê Alan bi awayekî bêbextîyane ji aliyê Mîr Ezîn û Bekoyê Ewan ve dihête zîndanîkirin. Piştî zîndanîkirina xwe ew xewneka balkêş û xumam dibîne. Em dizanin ku ew di wê xewnê da bajarê xwe û eqrebayên xwe dibîne. Ger mirov bi çavekî rêzê lê binêre dê bibêje ku ev mekan mekanekî ji rêzê û rastîn e belam bi me ev şîrove û hilsengandin, tişteke ne di cih da ye. Çima? Ji ber ku em dizanin ew xewna ku ew dibîne ne xewneka ji rêzê ye û di wê xewnê da gelek balkêşî diqewimin. Di wê xewnê da kalê Memê Alan yê muxlaq tê li pêşberî wî, him qala mirina wî him qala roja derketina li pêşîya Xudê Teala dike him jî qala mirina hebandîya wî dike. Bi girêdayî vê yekê xewna Memê Alan xewneka têrbalkêş e û ne ji rêzê ye lewma digel bûyerên xwe mekanê wê jî mekanekî derasayî an jî arkaîk e. Ji ber ku her çiqas şibandinek li ser welatê wî hebe jî ew welat ne welatê wî yê aşkera û dîyar e bereks ew êdî mekaneka xumam û derasayî ye. Ew mekanê arkaîk (derasayî) û xumam bi vî awayî hatîye şayesandin:

Em herin dîyarê xewna Memê Alane

Dema ji qehr û meraqa di gûçkê zindanê da kete xewa şevane

Di xewna xwe da dît ko dîsa rûniştîye li ser textê xwe yê çarling, li bajarê Mixribîyane

Li dorhelê rûniştî ne birayê wî Beglî, tevî kurên giregir û begane

Dîya pîr û kalê bavan, tevî her du kokimên apane

Hate vê miclisê Emer beg, kalê Memî, şêxê Quresîyane⁴⁸

Di destanê da ji bilî mekanên arkaîk (derasayî/mîtolojîk) herwiha mekanên rastîn jî cih digrin. Di destanê da dema mirov lê dinere mekanên rastîn ên ku tene li beramberî me pitir wiha ne: behr, qeraxên behre, keştî, robar, şet, çîya, koşk, qonaxî, qesr, çol, kerbela, hin bajar, peresetgeh, zindan û hwd. Em ê niha bi mînak ev cihên ku evne derbas bûne an jî navê wan derbas bûne bidin.

Behr, her tişta ku ji wê derdikeve, her tişta ku ji bo wê vedigere û sembola bêabadîni ya razber e.⁴⁹ Em dizanin Memê Alan ji bajarê Mixribê ye ku ev bajar jî li gor agahîyên di destanê da li ber kêleka behrekê ye. Ji vê yekê di destanê da behr mekanekî giring û balkêş e. Di destanê da hindî ku Memê Alan li welatê xwe anku Mixribê ye li wê derê ev mekan zaf dibore. Belam piştî ku êdî ji Mixribê derdikeve em lê dinerin êdî behr wekê mekan derbas nabe. Di destanê da çend cihên ku wek mekan behr derbas dibin wiha ne:

Rojekê, di nava xortan da bû şorê cenawerê behrê û ecebane

Hinekan dianî behsa hûtane

Hinekan vedikir şora marane

⁴⁸ h.b.b.r.141.

⁴⁹ Enginün, İnci, "Tanpınar ve Semboller", Türk Dili Dergisi, sal 2000, r.435.

Hinekan digot: "Di behrê da heye hemberê hemî heywanê li rû erdane"

Hinekan digot: "Heywanek heye di binê behrê de, di şiklê hespan e"

Ma îşê hespan çi ye di binê behrane?⁵⁰

Her kes direvine ber ve behrê, dengê qireqir û gotinên wane

Memî got: "Çi ye? Çi bêtar?" Beglî got: "Îro, torvanan tora xwe avêtine behrê bi çend çîyan e

Daket hewşê û çû ber kendalê behrê, tevî gelek xortane⁵¹

Qey koranî bi çavê te de hatîye. Tu serê xwe derxe, ji xwe re binêre li behra û dengizane

Binêre li orînê qeptana û li tîkîna gemîyane⁵²

Memê Alan dema ku dikeve li ser rêya Cizîra Botan di rê da li rastî hin cihên avîn ên wekî şet an jî çeman tê. Ew cihên ku şet an jî çem tê da diborin wiha ne:

Kalo got: "Gava darî ber şetê Cizîra Botane

Şet î pehn û mezin e, li ser nînin kelek û darê gemîyane

Dema ko ketine kevîya ava şet simê Bozê Rewane

Bi tenê, li wî alî şet, radibe dûmane

Pêl davêne serê pêlane

Delxe davêne serê delxane⁵³

Nihêrî ko av kûr e, bilindîya rîman e

Berê hêsp bi şûn da vegerand, xwe gihande saxê bi heftê û du belane

Got: "Ez ê ber bi çêm da dakevim, belkî ez bibînim şivan û rêwîyane."⁵⁴

Di destanê da yek ji mekanê din çîya ye. Di destana me da çîya jî gellek caran dibore cihên ku wek mekan an jî çîya tê da dibore wiha ne:

Bajarê Mixribê bajarekî ezîm î pir giran e

Li ser heft çîyan e⁵⁵

⁵⁰ h.b.b.r.28.

⁵¹ h.b.b.r.29.

⁵² h.b.b.r.36.

⁵³ h.b.b.r.50.

⁵⁴ h.b.b.r.52-53.

⁵⁵ h.b.b.r.25.

Delxe davêne serê delxane

*Lêdixînin kûna (quntara) çîyane*⁵⁶

*Giş bi derkevin serê çîyan û bikolin meterîs û tawîyane!*⁵⁷

Di destanê da herwiha ji derveyî cihên vekirî û ji derve herwiha cihên tarî û asê jî hene. Yek ji wan cihan zindan e. Em dizanin ku Memê Alan bi bêbextîyane dihête zindanîkirin anku ew di derekî tarî da asê dimîne. Ev derê ku tê da asê dimîne anku zindana ku tê da asê dimîne dibe sedemê fikirîna wî li ser hin tiştan. Mem di zindanê da jîyana xwe ya çûyî û hin poşmanîyên xwe li wir bi bîr tîne. Biryarên giring ên ku wî û evîna wî eleqedar dike li wir dide. Ji ber van yekan wek mekan zindan cihekê giring û balkêş e. Di destanê da cihên ku li ser zindanê ye wiha ne:

Berê xwe da binanîya birce, dakir zindaneke kûr û tarî

*Mem wê şevê di zindanê tarî da raneket, heta sibê ro hate taştîyane*⁵⁸

Piştî ko dest pihêt girêdan, bi şûn da avêtine erdê li pê xwe kêşane

*Di bin daîra Mîr Ezîn da davêjin bine zindane*⁵⁹

Di destanê da yek ji mekanên ber bi çav bêguman qonax (koşk, qesr) in. Her çiqas bi awayekî berfireh jî teswîra qonaxa nehatibe kirin jî, qonax cardin cihekê giring digre û zaf di destanê da dibore. Ji ber ku him cihê ku Memê Alan ji dayik bûye him cihê ku lê bûye mêvan û him jî mala heskirîya wê Zîna Zêdan qonax e. Di destanê da wek mekan cihê ku qonax diborin wiha ne:

Me dev ji dayîrê rengînî, ji qonaxê mezin berdane em ketine çolan û kerbelane

*De, rabin, berê xwe bidin bajarê Mixribê û qonaxê xwe nê giran e*⁶⁰

*Min di qata qonaxê a jorîn da danîye textekî zêrîn, bi çar lingane*⁶¹

*Giştikan hatin li pêş qonaxa Memî, girtin govend û dîlane*⁶²

*Hemî rabûne ser banê qesr û qonaxan, rûniştine li ser kursîyane*⁶³

*Heya ko bû sibê, Sitî di pêşîya şînê da li dora qonaxê digerîyane*⁶⁴

⁵⁶ h.b.b.r.50.

⁵⁷ h.b.b.r.114.

⁵⁸ h.b.b.r.137.

⁵⁹ h.b.b.r.141.

⁶⁰ h.b.b.r.26.

⁶¹ h.b.b.r.38.

⁶² h.b.b.r.46.

⁶³ h.b.b.r.104.

⁶⁴ h.b.b.r.147.

1.3. Di Destanê Da Vebêjer

Em dizanin ku Destana Memê Alan j' aliyê Roger Lescot va piştî lêkolîneke têr û tijî dihête berhevkirin. Roger Lescot di destpêka Memê Alan da bi berfirehî der barê Memê Alana ku berhevkirî da agahiyên dorfireh dide. Di wir da dîyar dike wî ev xebata xwe piştî guhdarkirina bîst dengbêjan pêk îname. Di nav van bîst dengbêjan da varyanta ku ji layê Miço ve hatiye strîne ji xwe ra kiriye bingeh. Herwiha wekî guhertoyek arîkar jî ji xwe ra ya dengbêjê bi navê Sebrî dike jêderk û bi vî awayî guhertoyeke têkel pêk dihe. Wekî Roger Lescot dibêje ku ew di beşa kişikê (setrenc) da gelek ketiye tengaviyan û wî dawî ji kesek bi navê Stranvan ev beş girtiye. Piştî girtina vê beşe jî wî varyanteke têkel a ku ji aliyê gelek dengbêjan ve hatiye strîn berhev kiriye û çap kiriye.

Her wekî me anîye ziman destana Memê Alan ji aliyê strîna gelek dengbêjan ve pêk hatiye. Lewma ev destana me destaneke têkel û pir-vebêjer e ango j' aliyê gelek vebêjeran ve hatiye hûnandin. Destana me her çiqas j' aliyê gelek vebêjeran ve hatibe strîn jî lê heman wusa di destanê da vegêraneke îlahî (heterodîgtîk) cih digire. Di destanê da her çiqas vebêjer biguherin jî rewşa vegêranê naguhere. Baş e berîya ku em li ser vê meseleye û mînakên di destanê da kûr bibin lazim e em pêşiyê rûyê xwe badin ber bi pênase û taybetiyên rewşa vegêrana îlahî.

Rewşa vegêrana îlahî, ew vegêran e ku vegêrê wê şîrove û mudexeleyan dike, agahiyên berfireh dide. Xwediyê otorîteyê berfireh e ku dinyaya vegêranê û têkiliya karakteran baş dizane. Di vê vegêranê de cihên "nişandan"ê hebin jî, beş bi giranî tên "qisetkirin."⁶⁵ Mirov dikare bibêje ku vegêrana îlahî hemû tiştên çêbûne, çêdibin û dê çêbin dizane. Ew bi çavê kesê sêyem li rewşê dinêre û serdestê hemû tiştî ye. Di destana me da jî dema em bi giştî lê dinêrin em dibînin ku di destanê da vegêranê şexsê sêyem ango îlahî (heterodîgtîk) serdest. Di destanê da ji bo vê mirov dikare çend mînakên bide ku bo nimûne:

Her sê bira rabûne û ji xwe re meşîyane

Berê xwe dane qesr û qonaxê xwe nê girane

Û vekirin devê xezîna û defîname

Pere rijandin li serê zikaka û binê ewcane

Ji bona xatirê feqîr û foqarane⁶⁶

Bi xwe re digot: "Ecêb, va ne îşê cin û perîyan e?"

Paşê, hate bîrê, got: "Law, ne me şeva çûnî guhertin gustîrên tilîyane?"

Li destê xwe nihêrî ko rast e, ne bi derewan e

Beglî, birayê Memî yê sadiqane

Serdarê hezar û pênc sed xortên kurdane

⁶⁵ Alan, Remezhan, Destpêkek ji bo Zanista Edebîyata Modern, Weş. Peywend, Stenbol 2015.

⁶⁶ h.b.r.27.

Nihêrî ko ro hate dema taştîyane

Piştê rohelat, saet hate didiyane

Dîsa Mem derneket ji nivînane

Ne jî, ji bona nimêjê dakete mizgeftane

Ne jî, jê hatin tu emr û fermane⁶⁷

Em herine dora Zînê xwedîya hesreta dilane

Piştî ko bihîst Mem tune, winda bûye di bajarê Cizîra Botane

Zanibû ko lê kirine bêbextîyeke pir e mezin û girane

Dîsa weke berê kete paş derîyane⁶⁸

Qîza Beko hinarek peyda kir û bi ser şûjinê qul kir; di şûnê ra berda nav hewên hinarê axuya marên kaşane

Di wê gavê da, hinar peyda nabin di nav Bajarê Cizîra Botane⁶⁹

Wekê li jor jî tê xuyanê ku kesê destanê vedibêje haya wî ji hemû bûyerên heyî û tiştên dê biqewimin heye. Ev taybetmendîyên vegêranê îlahî ye ku ew bi çavekî şexsê sêyem li bûyerê mêze dike. Vegêranê îlahî di destanê da serdest e û hemî tişt di bin venêrîna wî da ye. Ew bi awayekî kontrolkirî meseleyê vedibêje, rewşa vegêranê di bin serwerîya wî da ye û di nava destanê da zû bi zû hebûna xwe aşkera nake. Bêguman mirov dikare ji destanê jêgirtinên pitir jî ji xwe ra bike mînak belam ji ber çarçoveya teza xwe evqas mînakdayîn bes in.

1.4. Zimanê Destanê

Li gorî bilêvkirina berhevkarê destanê Roger Lescot, wî ji bo pêkanîna berhema xwe bi qasî bîst dengbêj guhdar kirîye. Piştî guhdarkirina van dengbêjan pirr guherto derketine meydane û wî jî bi têkelbûna van guhertoyan ev destan pêk anîye. Ji ber ku destan piştî guhdarkirina bîst dengbêjan pêk hatîye loma bivê nevê destan dê li gor bêjerê xwe rengeke din bigre. Zimanê destanê mixabin bi girêdayî dengbêjan pirr di jêrbandora zimanê tirkî û 'erebî da maye. Bêjeyên erebî yên ku di destanê de pirr diborin wiha ne: midirlixan, walîlixan, define, sindoq, xezîne, eyda qurbanê, Rebê Alemê, Mihela Qureyşîyan, feqîr, foqare, yetîm, mele, ixtîyar, cimaet, tekbîr, selawat, esselamûlelykûm, limêja şafîîyan, selatek ya Muhemmed û h.w.d.

Cihê ku peyvên tirkî diborin jî bi gelemperî wiha ne: qapîyan, qapîk, warocax, yasîyan, yapicî, yesane, delxane, korocax, çayir, boş, qolordu, geçîd û hwd. Her çiqas destan kêr zêde, di bin karîgerîya zimanên bîyanî de be jî, cihên din ên destanê bi kurdîyeka xwerû, zelal û fesîh in.

⁶⁷ h.b.r.43.

⁶⁸ h.b.r.139.

⁶⁹ h.b.r.140.

Di pirranîya destana me de qafiyeya ku hatîye bikaranîn ‘ane’ ye lê di hin deran de ihtimala guherîna dengbêj an jî nelihevanîna dengbêjî, qafiyeya guherîye. Cihên ku qafiyeya ji bilî ‘ane’ hatîye bikaranîn bi van qafiyeyan berdewam bûye: -nî, -emo, -îne, -înim, -êye, -o, -ame û hwd. Ji bilî guherîna qafiyeyan carna em dibînin ku di nava destanê de bi pexşankî jî destan didome. Her çiqas bi pexşankî destan berdewam bike jî di hin deran de cardin zêde dûr nakişîne, vedigere awayê xwe yê berê. Herwiha di nava destanê de carna em dibînin ku dengbêj hebûna xwe di nava destanê de aşkera dike. Wek mîna di rûpela 29î ya destanê de dengbêj wiha dibêje: Ez serê te ne êşînim û pir nekîm şorane. Ji ber ku dengbêj li vir de hebûna xwe aşkera dike dema qala bûyerekê dike piştî aşkerabûna xwe yanî van gotinên xwe derbasî bûyerekî din dibe. Dengbêj her wekî ku di nava sohbetekê de be xwe nîşan dide. Ji bilî rûpela 29î di rûpelên (42, 49, 69, 74, 120, 127, 138, 139, 140, 141, 147) de jî daxilbûna/aşkerabûna dengbêjî xuyaye.

Em ê di bin vî serenavî da li ser şayesandin, şibandin û hin taybetmendiyên din ên destanê rawestînin.

1.4.1. Di Destanê Da Şayesandin

Bêjeya şayesandinê ku ji radera ‘‘sûret’’ê ya erebî a babîya tefîleyê pêk tê, şikildayîna tişteke an jî sûretdayîna wê, mîna ku pênaseya wê bi wêneyan bikin, mîna çêkirina, wênekirina objeyekê an jî şikaldana wê ye.⁷⁰ Bêguman di her berhemeka edebî da ciheke taybet yê şayesandinan heye. Mirov nikare bêyî şayesandinê berhemeka edebî an jî bi taybetî destanekê bifikire. Lewma lazim e nûskarê berhema edebî berhema xwe di warê şayesandinê da têr û tije bike. Dema ku şayesandina xwe kir, divê xwîner xwe li wê cihê hatîye şayesandinê hîs bike û texeyyula xwînerî asofîreh bike. Di vê destana me ya navdar da jî şik ne tê da ku şayesandinên tekûz cihê xwe digrin. Di her rûpeleke wê da şayesandineka ezamet heye. Em ê niha li ser hin şayesandinên ku me tesbît kirine, bisekinin.

Destpêka vê destana me ya tekûz bi şayesandina bajarê Mixribê dest pê dibe:

Bajarê Mixribê bajarekî ezîm î pir giran e

Li ser heft çîyan e

Li ser sê sed û şêst û şeş qapîyan e

Her qapîkê li ser sê sed û şêst û şeş walîlixan e

Her walîkê li ser sê sed û şêst û şeş midirlixan e

Temam di destê Elî Begê, Emer Begê, Elmaz Begê de ye, sê biran e

Xwedîyê tewlê nijda, boşê dewa, xarê mîyan e

Mifta devê sindoqên zêra barê çel û pênc bergîlan e

Xwedîyê xezîn û defînê giran e

⁷⁰ Develioğlu, F. Osmanlıca Türkçe Ansiklopedik Lügat, Ankara 1982, Weşanên Aydın, r.1242.

Xwedîyê sûk û çarçîyan e⁷¹

Piştî vê şayesandina bajarê Mixribê, destana me bi awayekî zelal, xwerû û edebî diherike. Di destanê da vebêjerê destanê her dîmenê bi awayekî xwîrt û edebî bi wênekirina dîmenan tîne li ber çavên me. Dema ku Memê Alan nêzî Cizîra Botan dibe, li ber rûbareke Cizîrê sahneyek wiha têtê' l beramberî me:

Dema ko ketine kevîya ava şet simê Bozê Rewane

Nihêri ko şora kalo rast e, ne kelek û ne jî darê gemîyan e

Bi tenê, li wî alî şet, radibe dûmane

Yek rûniştîye li ber kelîşoyane

Dinya bihar e, micalê palîya cihan e û kulîlkê hinaran e

Felat sor bûye mîna xwîna mêrane

Pêl davêne serê pêlane

Delxe davêne serê delxane

Lêdixînin li kûna çîyane⁷²

Vebêjerê destanê vê kurtekêlîyê bi awayekî edebî û tekûz tîne li ber çavên me. Di nav vê dîmenê da tenê şayesandin cih nagre, herwiha edebîti, gotinxweşî û şibandinên newaze jî cihê xwe digrin.

Demê Memê Alan tê Cizîra Botan ji bo peydakirina dermanê dilê xwe berê xwe dide mala her sê Celalîyan. Piştî ewqas zehmetî û derdkêşanan digihije li ber derîyê Celalîyan. Ew dîmena wê kêlîyê digel edebîtiya xwe wiha tê li beramberî me:

Mem di nêv xelkê ra ajot, giha ber derê Celalîyane

Nihêri her sê bira jî hazir in, bi ser xwe da bi dar da kirine çengelê silehane

Mem peya bû, silav da li her sê birane

Her sê bira bi hev ra hatin pêşîya mêvanê xerîb, sekinîn li ser ingane

Bala xwe dane rewş û tevgera vî mêvani, ko ne mînaye tu kesan e

Her halê wî mîna yê padişan e

Merî lê dinihêre, dizane ko ji bav û kalan da ji mala mezinan e

Bi çelengîya rû, nahêle ji bona merîyane

⁷¹ h.b.b.r.25.

⁷² h.b.b.r.50.

Hele, hespê wî padişanê hemî hespan e

Merî hişmetkar dibe ko lê binihêre û ditirse jê û nezera çavane

Hesen revî, hate pêşîya mêvên, kire himbêza xwe û destê xwe gerand li kêlek û navkêlane

Rakir, linga ne gihandine erdê anî, danî mezela jorîn, cihê mêrane

Çeko direvî, jê ra radixistin mehfûr û doşegê Bûrsê, tevî balgihane

Qeretacîn dikire qirîn ji xulam û seyîsane

Dihatin, Bozê Rewan dikişandine axor, tewla hespane⁷³

Vebêjerê me an jî dengbêjê me şayesandinên xwe yên ji rêzê jî di nava edebîtî û xweşiktîyekê da dike. Dema ku dişayesîne an jî tahkîye dike, wekê li vir da jî dîyar e, di kêleka her gotinekê da edebîtîyekê an jî gotinên xweş bi cih dike. Di dereke din a destanê da dema ku Rihan bi fermana xatûna xwe, Zîna Zêdan, dike ku biçe avê ew dîmen wiha tê şayesandinê:

Hema Rihanê rakir cotê elbane

Revîya, çû Kanîyê, elb tijî kirin ji ava gulane

Li vegeerê, rîya wê kete ber mala Hesen, Çeko, û Qeretacîn, her sê birane

Nihêrî ko xelkê Cizîrê li dora qesrê kom bûne, civîyane

Hinek hilkişîne ser xanîyane

Qîz û jin ketine devê pencerane⁷⁴

Teswîrên destanê digel edebîtî û fesîhîya xwe ya herîkbar her cihê xwe digrin. Bêguman di destanê da hebûna teswîra asta destanê biqîmettir dike. Dema ku Mem berê xwe dide ser Kanîya Qestelê, qîzik bi dîtina wî li dora wiha kom dibin:

Giştik hatin li kêlek hev sekinîyane

Mîna eskerê ko di resm û geçîdan da disekinîn li pêş zabitane

Qîzên Cizîrê jî wanî li pêş Mirê Mixiribîyan sekinîyane

Memî hespê xwe da ber zengûyane

Heywan rabû xar û çargavîyane

Hat sekinî li ser nihêtê Kanîya Qestelê, di nav koma qîzikane⁷⁵

⁷³ h.b.b.r.68-69.

⁷⁴ h.b.b.r.70.

Dengbêj an jî vebêjerê destanê da di van dîmenên ezamet da jî tê xuyanê, van dîmenan wesa tîne radixe li ber çavan ku heçku ew li wir e. Di van dîmenan an jî şayesandinan da zindîtîyek wesa heye ku heçku dengbêj li ba Memê Alan e. Her gava wî dibîne, her henesa wî hîs dike û li ser her nêrîna wî hûr dibe. Her hûrgilîya heyî bi awayekê edebî teswîr dike anko wêne dike. Ev yek şik ne tê da asta berhema wî jî bilindtir dike.

Şayesandinên tekûz ên dengbêj di nava edebîtîyeka xwirt da her berdewam dibin. Dema ku Memê Alan û Zîna Zêdan li ser Kanîya Qestelê ketine di nava suhbeteka têrbievînî da, ew dîmena dîlnazik wiha tê şayesandinê:

Çeko û Qeretacîn hatine ser Kanîya Qestelê, ava Gulane
Nihêrîn ko Memî Zîn daye bin çengane,
Mîna teyrê ko seyda xwe digire û dide nava pencane
Hêdî hedî dide ber nîkul û dimkane
Wî jî Zîn daye kêleka xwe û rûniştîye li ser nihêtane
Rihet rihet pê ra dikîye şorane
Tew xebera wî tune ji êrîşê dizan û ebebozane
Tu dibê qey rûniştîye di qesra xwe da, li Bajarê Mixribîyane
Tirs û kuşima wî tune ji kesane
Çeko û Qeretacîn hatin nizîkî wane
Qe ne bihîstin çeqareqa lingê hespane
Serên xwe dane ber hev, û bi ser hev da dikine naz û henekane⁷⁶

Teswîreka bêhempa ya digel tahkîyeyekê cardin li pêşberî me ye. Di vê şayesandina ezamet da jî dengbêj hunera xwe bi awayekê berz didomîne. Ew her tiştî heyî wesa tîne li ber çavan ku dema xwîner van şayesandina dibîne heçku ew jî li wir û di nava wan kêlîyan da bijî, xwe hîs dike. Vebêjer an jî dengbêj her dîmenê bi awayekî zindî radixîne li ber çavên me.

Teswîrên destana ma bêguman zaf hene û asta edebîtîya wan jî di her rûpelê da pîleyaka bilind da ye. Dema ku Memê Alan digel Mîr Ezîn şetrencê dilîze, ew dîmenên muazzam wiha tê teswîrkirinê:

Mem lehîzvanekî zor bû, lê Mîr pê ne dizanî
Mem û Mîr, herwekî biçûna navê, hevdû gerandin

⁷⁵ h.b.b.r.99.

⁷⁶ h.b.b.r.108.

Temaşageran zanî xurt e Memê Alan
Mîr Ezîn nikare hilîne bar û barbarî
Bi rimh û gurz û şeşperî, Mem kete nav eskerên Mîr
Sefa pêşin xera kir, di baskan ve kete hundir
Siwar ji hespa de xistin, peyar dan ber lingên fila
Bera birc û barû da pêşî, ji dijmin stand
Li şah hate wer, rex û ferzîn kirin hêsîr⁷⁷

Di nava her şayesandineka dengbêjî da bêguman ruhekî têredêbî heye û ev yek xwe radixe li ber çavên me. Dengbêj her dîmeneka ku vedibêje heçku ku ji nû ve bijî, wesa vedibêje.

Beko çû werîsek anî, dest û lingên Mem pê girêdan
Mem rabû, xwe ji cih hinek tev da
Werîs bû piç û parî, ji hev de ket, qetî
Vêga Beko kete binanîya bircê, zencîrek anî
Memê Alan dîsa dey ne kir; dest û pê sist kirin, berdan
Beko mêvanê xwe pihêt girêda, xelek û girêk li hev badan
Mem bihnekê damayî ma, qey pêtek ji devî derket, pê pif kire zencîr
Hesin sor bû, helî, herikî, ket erdê. Bû marekî fêris
Beko ji ber mêr revî, xwe da alî, xwe kire pîs
Mem kenî, fikand, nehvirî, mar tevizî, berê xwe da banî
Mar kete quleke bircê, Beko bihna xwe da, li ber Mem gerî⁷⁸

Di van teswîrên dengbêjî da û di gelekên dî da şayesandinên qewî edebî û xweş cih digrin. Dema mirov li van şayesandinan dinêre wesa hîs dike ku heçku dengbêjê vê destanê di dewra Memê Alan û Zîna Zêdan da jîyaye. Dîmenan wesa tîne li ber me radixîne ku me dibe serdema Mem û Zînê. Bêguman di destana me da zaf teswîr hene lewma mirov nikare yek bi yek li ser wan raweste. Ji ber wê me hin şayesandinên di nava destanê da derbas dibûn, girtin û ji xwe ra li ser wan hilsengandin û nirxandinên xwe kirin.

⁷⁷ h.b.b.r.135-136.

⁷⁸ h.b.b.r.137.

1.4.2. Di Destanê Da Şibandin

Şibandin, bi hêleke xwe ve şibandina heybereke lawaz ya bi heybereke bi hêz ra ye. Ev huner ji bo hêzdarkirina vegotinê yan jî ji bo dîyarkirina zêdehî ya taybetiyên vegotinê, tê bikaranîn. Çar heb hêmanên bingehîn yê vegotinê hene: tiştê ku tê şibandinê, tiştê ku hatiye şibandinê, aliyê şibandinê, daçeka şibandinê.⁷⁹ Tabî ev hêman şibandinê dema ku ji bo kesayetan bîn bikaranînê wê demê hêman wiha tene birêzkirinê: yê/ ya ku tê şibandinê, yê/ ya ku hatiye şibandinê, aliyê şibandinê, daçeka şibandinê. Şibandin ji ber ku tiştêkî giring e lewma di her berhemeka edebî da nûskar an jî vebêjerê berhemê serî li şibandinên dide. Ji ber ku destan jî yek ji cureyên edebî ye loma bêyî şibandin mirov nikare destaneka xwirt bifikire. Heke di hundirê berhema heyî ya edebî da şibandin hebin hingê him asta berhemê bilindtir dibe him jî çêja wê berhemê xweştir dibe.

Di vê berhema me ya bilindpave da dema mirov lê dinêre, dibîne ku bi têra xwe dengbêjî cih daye şibandinan. Dengbêj an jî vebêjer bi vê yekê ra him xwastîye berhema xwe edebîtir bike him jî xwastîye tiştên heyî bi gotinên fambar bîne li ber çavan. Em ê niha li ser hin şibandinên ku di destanê de diborin li gor hêmanên şibandinê li ser wan bi mînakdayîn rawestin.

Hate ber textê Zîna Zêdane

Rihet lihêf rakir li ser çavane

Nihêrî ko ne cin e, ne perî ye, esil beşer e û insan e

Çavê reş û belek, birî û bijangan xwe berdane ser kêlekê rûyane

Enîya gewr e, madenê zîvane

Biskên birewa xwe berdane ser hinarîkên rûyane

Bisk û qeter berdane ser gulîyane

Xwe berdane ser textê piştê û qolincane

Taximekî hûr jê re wûnane, berdane ser pêsir û sepetê derzîyane

Serên bisk û gulîyên sor mîna serê marê teyar badane

Ew çende hişk in, weke polane

Ko li zengûyên hespan kevin, wê qul kin, têkevin parxanê heywane⁸⁰

Di van hevokên edebî û xweşik da em li rastî şibandineka têr û tije tên. Em dikarin bibêjin ku di van hevokan da her çar hêmanên şibandinê jî cihê xwe digrin. Li vir da marê teyar candarek e ku ev candar ji bo ziravî û hişkbûna tiştêkî tê emilandinê. Marê teyar tiştê ku tê şibandinê ye çimkî marê teyar remza hişkî û ziravîyê ye. Bisk û gulîyên Zîna Zêdan jî li vir da tiştê hatiye şibandinê ye, anku ew biskên Zîna bal bi serê marê teyar ve hatiye wekandinê.

⁷⁹ <https://tr.wikipedia.org/wiki/Benzetme>.

⁸⁰ h.b.b.r.34.

Alîyê şibandinê di vir da hişkî û reqî ye, wata hişkîya marê teyar e. Daçeka şibandinê jî yanî ew amûra ku hatîye bikaranînê jî “mîna” ye. Di van beytên li jor digel şibandin û hêmanên wê herwiha têredebitî û şairanetîyek jî cihê xwe digre. Dengbêj ji bo dîmena heyî ya vegotî li ber çavên me zelaltir û fambartir bike, ew gulîyên Zînê şibandine marê teyar. Ku ev marê teyar di nava xelkê da baş tê zanîn û serê wê bi hişkî û reqtîya xwe navdar e.

Ji çavan bûye gurîna hêstirane

*Bi ser devûrûyê Memî da mîna çilkên baranê Nîsanê rijîyane*⁸¹

Di van hevokan da çilkên barana nîsanê ji bo bihêzkirina wateya rondikên Memê Alan hatîye bikaranînê. Çiku em dizanin çilkên an jî dilopên baranên nîsanê zaf xurt û navdar in, dengbêjî jî ev yek danîye li ber çavên xwe û ji bo ku gurîna hêstiran a nedîyar baş were famkirinê ev yek kirîye. Dema dêna xwe bidin van hevokan em ê bibînin ku şibandin digel her çar hêmanên xwe yên bingehîn, hatine emilandînê. Barana nîsanê tişta ku tê şibandinê ye, yanî ew tişta xurt e, rondik an jî hêstirên Memê Alan tişta ku hatîye şibandinê, yanî ew tişta lawaz e. Di vê hevokê da alîyê şibandinê çilkên baranên nîsanê an jî gurîna baranên nîsanê ye. Daçeka şibandinê jî bi “mîna”yê hatîye nîşandanê.

Hesen çav di seri de sor bûne mîna çavên ejderhane

Sing radibe û datê mîna pêlên behrane

*Por lê gij bûye, mîna strîyane*⁸²

Di van hevokên edebî û têrxemilandî da tenê şibandinek cih nagre, tam sisê şibandin cih digrin. Dengbêj vê destana tekûz her haleke Hesen şibandîye tiştekekê. Di van hevokan da jî şibandin digel çar hêmanên bingehîn cihê xwe digre. Di van da yên ku tên şibandinê çavên ejderhayan, pêlên behran û rewşa strîyan e. Yên ku hatine şibandinê jî çav, sing û porê Hesen in anku ew ên lawaz in. Alîyê şibandinan sorbûna çavên ejderheyên, rabûn û daketina pêlên behran û gijbûna strîyan e. Ji bo her sê şibandina jî daçeka hevpar a “mîna”yê hatîye emilandînê. Di van hevokên têredebitî û şairane da dengbêjê me bêguman asta hunera xwe di her kêlîyeka şibandinên xwe da payebilind kirîye. Vebêjerî tenê şibandinek bi kar neanîye wî ji bo hêza hunera xwe xwirttir bike ji bo her rewşekê serî li şibandinekê daye.

Mem jî bê izna Mîr hatibû hêla malê, daîra jinane

*Zînê xwe civandi bû hev di bin kurkê Memî da, mîna kewane*⁸³

Di van beytên li jor cardin hunermendê vê destana tekûz hunermendîya xwe derxistîye li holê. Wî wekê her caran hevokên xwe bi şairaneyî bestîyan û ristîyane. Di van hevokan da jî em dibînin ku şibandin digel her çar hêman xwe yên bingehîn hene. Li vir da candara ku tê şibandinê kew e, anku ew tişta qewî û xurt e. Ya ku hatîye şibandinê Zîn e anku ew a lawaz e. Alîyê şibandinê xwecivandina Zînê ye ya wekê kewan e. Daçeka şibandinê jî cardin “mîna”

⁸¹ h.b.b.r.43.

⁸² h.b.b.r.92.

⁸³ h.b.b.r.125.

ye. Di van hevokên bêqisûr da dengbêjê me rewşa Zîna Zêdan a ku tê da ye bi gotinên qerase anîne li ba hev. Wî di vê şibandinê da xwecivandina Zînê ya di bin kurkê Memê Alan da şibandîye rewşa kewekê. Ku em dizanin kew dema xwe dicivîne li ser hev dîmeneka bêhempa der tê meydanê.

Destên xwe bavêjin şûr, û silehên xwe hilînin

Berê xwe bidine mala Mîr Ezîn, emê îro yan bidin, yan bistînin!

Ez li we dixwazim hon mêran weke perên darên payîzê di erdê da raweşînin⁸⁴

Di van hevokên li jor jî dîyar e cardin dengbêjê me ji bo sivikkirina wateyê û bilindkirina asta wê serî li wekandinekê daye. Di van beytan da jî em cardin lê rast tîna ku şibandin digel her çar hêmanên xwe yên bingehîn hatine emilandinê. Li vir da tiştê ku tê şibandinê perên darên payîzê ne, wata aliyê xurt e. Tiştê ku hatîye şibandinê jî mîr in anku ew tiştê ku lawaz e. Aliyê şibandinê raweşîna perên darên payîzê ne. Daçeka şibandinê anku amûra wekandinê jî ‘‘weke’’ ye. Vebêjerê destanê dixwaze têkberina mêran bişibîne rewşeke fambar û zelal lewma jî ji bo vê kuştina mêran diwekîne raweşîna perên darên payîzê. Em dizanin ku dema dibe payîz her belgeke dara payîzê bi erdê ra dibe yek anku digel hev li rêz dadiweşin erde.

Di vê destana me ya qerase da bêguman em rastî li gelek şibandinên tekûz hatin. Di her şibandineka vebêjerê destanê da edebîtî û şairtîyeke muazzam cihê xwe digre. Vebêjer rewşa heyî ne bi gotinên jirêzê bereks bi gotinên giranbuha, edebî, fesîh, zelal û şairane tîna li ba hev. Di destanê da carna şibandin digel her çar hêmanên xwe yên bingehîn tê emilandinê lê carna jî şibandin digel sê hêmanan jî tê emilandinê. Di destanê da hin şibandinên ku me tesbît kirîne wiha ne:

Dengê mela mîna yê dengê dengê şalûlan û bilbilan e⁸⁵

Rojekê, Mem rûniştibû li ser textê çarling, mîna rojê ko nuh hiltê li çîyane⁸⁶

Navê wî Beglî bû lê gurekî mîrane⁸⁷

Hinga, reng û rûyê Memî vebû weke berê, mîna belken gulane⁸⁸

Heywan diçû mîna birûska ko datê ji ezmanane⁸⁹

Çirayên wî bajarî mîna stêrkên ezmanan e⁹⁰

Di bin Memî da, Bozê Rewan çêdikir mîna xezala çolan e⁹¹

⁸⁴ h.b.b.r.148.

⁸⁵ h.b.b.r.27.

⁸⁶ h.b.b.r.29.

⁸⁷ h.b.b.r.29.

⁸⁸ h.b.b.r.47.

⁸⁹ h.b.b.r.48.

⁹⁰ h.b.b.r.48.

⁹¹ h.b.b.r.49.

*Felat sor bûye mîna xwîna mêrane*⁹²

*Mîna eskerê dewletê sekinîn û qor girêdane*⁹³

*Mîna gaye cot hevalê haletane*⁹⁴

*Mîna kevirê hîmê dîwarane*⁹⁵

*Mîna teyrê ser destane*⁹⁶

*Mîna gurê çile, zik birçî û dev bi xwîn im*⁹⁷

*Mîna teyrê ko xwe berde ser koma kewane*⁹⁸

*Serê min bûye mîna berê aşane*⁹⁹

1.4.3. Di Destanê Da Hin Taybetmendîyên Din

Bêguman destana Memê Alan destaneka pirrêl e. Mirov dikare di vê destanê da li ser gellek tiştan raweste û li ser wan hilsengandinên xwe bike. Di vê destana tekûz da yek tiştên ku li ber çavê me dikev û balê dibe li ser xwe, şîret ango nesîhet in. Şîret an jî pend ji serborî û terubeyan pêk tên. Dema ku kesek nesîhetê dide di heman deme da ji wî kesê nesîhetdayî ra dibe rênîşandêr û rêberek. Di destanê da nesîhet carna ji aliyê lehengên mîtolojîk (derasayî) ve carna jî ji aliyê kesên ji rêzê ve tê dayînê. Em ê niha şîret anku nesîhetên heyî yên di destanê da tesbît bikin û li ser wan rawestin.

Di destana me ya tekûz da bêguman cihê şîretê dîyar û zaf giring e. Hêj di destpêka destanê da em dibînin ku rêvebirin Mixribê Elî Beg, Emer Beg û Elmas ji ber ku zarê wan tine û bêmiraz in, dikevîne çolan. Di wê navê da Xocê Xidir li wan eyan û beyan dibe û şîretên wiha li wan dike:

Digo: "Gelî bira, megirîn! Rebê Alemê delîlê heyîrîyan e

Îro roja Eydê Qurbanê ye, we dev ji qonaxê xwe berdane

Gerek zîlamê mîna we vekirana devê xezîna û defînê girane

Û pere birijandana, gelî bira, li zikaka û li ewcane

Ji bona xatirê feqîr û foqrane

Neşsa ko birçî be, gerek we têr bikira, û zîlamê ko tazî be, gerek we bilîbs bikira

⁹² h.b.b.r.50.

⁹³ h.b.b.r.65.

⁹⁴ h.b.b.r.81.

⁹⁵ h.b.b.r.86.

⁹⁶ h.b.b.r.87.

⁹⁷ h.b.b.r.93.

⁹⁸ h.b.b.r.106.

⁹⁹ h.b.b.r.117.

Hûn hatine, ketine çol û kerbelane
We li xwe kirîye cilê derwêşane
De, rabin, berê xwe bidin Bajarê Mixribê û qonaxê xwe nê girane
Herin Bajarê Mixribê, vekin devê xezîna û defîname
Pere birijînin li zikaka û li ewcane
Serjêbikin qurbana û dehîyane
Ji bona xatirê feqîr û foqrane
Berê xwe bidin Mihela Qureyşîyane
Ji Elî begê re bixwazin qîza Mîrê Qureyşîya, bi qewlê eshabane
Qelenê wê bidin diwazde qirûş û nîvane
Îşellah, neh meh û neh roj û neh saet û neh deqîqa wextê qedîyane
Xwedê teala wê şîn bike warê windane
*Tenbîya min li we be, tu nava lê mekin, heyani go ez li we bibim beyane.*¹⁰⁰

Xocê Xidir di nava destanê da tim heval û hogirê qencî û çêyîyê ye. Xocê Xidir di destanê da him arîkarê Memê Alan e him jî arîkarê heval û nasên Memê Alan e. Xocê Xidir ji Elî Beg û birayên wî ra dibe derman ku da ku ew herin, ji bo bavê Memê Alan keçekê bixwazin. Elî Beg û birayên wî jî ya Xocê Xizir dikan, Elî Beg bi qîzekê ra dizewice û Memê Alan bi vê minasebetê ra tê dinê. Xocê Xidir kesekî şîretbêj û rênîşandêr e, lewranî bav û apên Memê Alan li gor wan şîret û pendan bi rê ve diçin.

Xocê Xidir hertim di xêra Memê Alan da ye, piştî ku Memê Alan dikeve li ser rêya Cizîra Botan, ew wek rênîşandêrekî cardin tê û di gel Memê Alan heya nêzî Cizîra Botan tê. Piştî ku têne li wê derê ji Memê Alan ra pendên wiha dike:

Min divê li te bikim çend şîretane
Kalo got: ‘Gava darî ber şetê Cizîra Botane
Şet î pehn û mezin e, li ser nînin kelek û darê gemîyane
Ji alî din radibe dûmane
Kelîşo danîye qîza Bekoyê şeytane
Dixwaze ko te bixapîne bi navê Zîna Zêdane
Lê tu bawer meke; ew qîza Beko Awan e

¹⁰⁰ h.b.b.r.26-27.

Bavê wê zanîye ko tu wê herî bajarê Cizîrê, bi kitêba remlane

Qîza xwe şande pêş te, dike te biqelibîne li gola xwînîyane

Bibe sebeba serê te û Bozê Rewane¹⁰¹

Xocê Xidir em dibînin ew cardin di gel şîret û nesîhetên xwe tê li pêşberî me. Xocê Xidir li cihê ku Memê Alan dê bikeve tengasîyê da, tê û jê ra dibe arîkar. Ew li hember tehlûkeyan şîretan li Memê Alan dike ku ev şîret jî dibin sedem ku Memê Alan ji hin tehlûyên heyî rizgar bibe û nekeve xefka bêbextan.

Memê Alan piştî şîretên Xocê Xidir berê xwe dide Cizîra Botan, wekê şîretên Xocê Xidir bi rê ve diçe. Dema ku dibîne Qîza Beko li wir e û dixwaze wî bixapîne, ew ji ber şîretan li wê naxape. Li hember wê baqilane tevdigere, Qîza Beko li hember aqilmendîya Memê Alan têk diçe. Qîza Beko bi nexwastin jî be, piştî girtina sozekê ew jî li hember tehlûkeyên heyî yên li pêşberî Memê Alan şîretan li wî dike. Pêşîyê qala Cizîra û civaka wê dike, piştî qalan Zînê û hin tiştên din dike. Piştî van şîretan şîretên xwe yên dawî wiha li Memî dike:

Ko tu ji cem min çûyî, kalekî rîspî, di dest da kitêbeke remlane

Bi hikmê remlan dizane ko tu wê werî bajarê Cizîra Botane

Li rîya te dipêye, li kêleka bajêr, li serê kûç û zikakane

Gava wê çav bi te keve, wê were pêşîya te bêje: ‘Çikî kerem ke malane’

Tu guh mede wî, ew bavê min, Bekoyê şeytan e

Dema hate ber te, guh medê, û hespê xwe bide ber zengûyane

Bi lez û bez hespê xwe rake çargavane

Hingê kes nikare were pêşîya Bozê Rewane

Gava tu darî nava bajêr, xelkê pir gazî te kin, wê bêjin, ‘Li cem me bibe mêvan çend rojane!’

Tu guh mede kesî: giş derewa dikin, ew ne ji bo te ye, bi tenê ji bo gewheran e

Li kesî mesekine, tim bipirse û bêje: ‘Mala Hesên, Çeko û Qeretacîn kîjan e’?

Ko tu li wan bûyî mêvane, ew keleha li polat in, wê ji derdê te ra bibin dermane

Bila tu zani bî ko, heta nexapî bi bavê min, Bekoyê şeytane

Mala wî koxeke biçûk e, mîna pîna mirîskan e

¹⁰¹ h.b.b.r.50.

Ko tu têkevî, wê bifetisî, nema vedigerî ji dîya pîr û kalê bavane.''¹⁰²

Qîza Beko di destanê da her çiqas keseka li dijî Memê Alan be û yek ji sembolên xirabîyê be jî, li vir şîretan li Memê Alan dike. Ev şîretên Qîza Beko dibin sedem ku Memê Alan ji hin xetereyan derbaz bibe, heta belku dibe sedem ku Memê Alan ji mirina ji destê Bekoyê Ewan jî xilas bibe.

Memê Alan piştî ku li gor rênîşandayîn û şîretên Qîza Beko ji destê Bekoyê Ewan rizgar dibe, li rastî kesekî êsîr tê. Ew kesê êsîr jî li halê Memê Alan dilşewat dibe, dixwaze ji wî ra bibe arîkar, lewma wiha pendan dide:

Êsîr got: 'Ka çi te heye? Rewşa te ne ya xwedîyên peran e

Tu siwarekî bi tenê yî, li pê te tune karwanekî mezin û girane

Ne jî tu dikarî bi xwe ra bigerîni xezîne û genc û difînanê

*Eger tu bi çar qirûşê di bêrika xwe dixapî, te hay hebe, bi perê bêrikê, kes nikare here derê camêrane*¹⁰³

Memê Alan di gellek cihan da bi arîkarîya şîretbêj û nesîhetdana ji zaf talûkeyan rizgar dibe. Ew dema ku tê mala her sê Celalîyan, Hesên di gel birayên xwe her cure arîkarî, fedakarî û mêvandarîyê ji Memê Alan ra dikan. Dema ku Hesên hay ji derdê dilê Memê Alan dibe, ji bo ku ew biçê û Zînê bibîne çi ji destê wî tê dike. Hesênê Celalî ji bo ku Memê here ser Kanîya Qestelê li ba Zîna Zêdan, li hincetan digre, jê ra rêyan peyda dike û dûvre di gel rênîşandarîyê wiha nesîhetan li Memê Alan dike:

Hesên got: 'Di qanûna xelkê Cizîra Botane

Eger dewar û tarîş û yan jî însan here nav erdê merîyane

Merî dikare wî dewarî an însanî ji xwe ra bîne, û heqê kes tune ji merîyane

Xwedîyê wî tiştî li cem hikûmetê nikarin dehwê bikin li kesane

Em niha dikin bi te din tapî û qoçbanê Kanîya Qestelê, ko malê me her sê biran e

Here bêje: 'Ez merîkî ticar im, min Kanîya Qestelê kirîye ji her sê birane''

Ne qîz deng dikin û ne jî îşê peyan e.''¹⁰⁴

Hesên jî wekê kesên din şîretbêj û rênîşandêr e. Ew jî ji bo ku Memê Alan nekeve tengavîyan û ji hin tengasîyên dijwar derkeve ya ji destê xwe tê dike. Memê Alan di piraniyan destanê da li hember şîretan aktîf e, guhê xwe dide şîretan li gor wan şîretan tevdigere. Di her şîretekê da rêçeka serborîyê heye lewma jî di destana me da jî ev rêçene xwe aşkera dikan.

¹⁰² h.b.b.r.56.

¹⁰³ h.b.b.r.59-60.

¹⁰⁴ h.b.b.r.97.

Mirov dikare bi rehetî bibêje ku di piranîya destanê da şîret cih digrin, heta ta astekê ev destane destanekî dîdaktîk e jî.

Bêguman ev destana me ya tekûz destaneka pîrhêl e lewma mirov dikare zaf tiştên giranbiha jê derxe. Dema em li destana xwe ya tekûz dinêrin em dibînin ku tê da gotinên xweş, edebî, wecîze, gotinên pêşîyan, biwêj, gotinên qalibî (gotinên dubare) û hwd zehf cih digrin. Em ê niha di destana xwe da van tiştan tesbît bikin û hilsengandinên xwe li ser wan bikin.

Destana Memê Alan destaneka têredebî ye. Dema em mirov li berhemeke edebî dinêre lazim e çêjeka edebî jê werbigre ji ber ku têredebîya berhemê pîleya wê berheme berjor dike û wê dike xudannirx. Gotinên xweş yên destanê dewlemendîya destanê baştir derdixe li holê. Di destanê da ew derên ku xweşgotinî û edebîtî tê da cihê xwe digrin wiha ne:

Serên bisk û gulîyên sor mîna serê marê teyar badane

Ew çende hişk in, weke polane

Ko li zengûyên hespan kevin, wê qul kin, têkevin parxanê heywane¹⁰⁵

Ji çavan bûye gurîna hêstirane

Bi ser devûrûyê Memî da mîna çilkên baranê Nîsanê rijîyane¹⁰⁶

Min nedî ko kes birînê rîman bi ava gula da kewane

Ez di dil da birîn bûme, hon tînin ser min şêx û melane

Ez çavên xwe digrim, ko bibînim xîyala Zîna Zêdane

We ji min ra anîye qeflê soytarîyane¹⁰⁷

Hespê xwe avête nav zenguyane.

Di bin Memî da, Bozê Rewan çêdikir mîna xezala çolane¹⁰⁸

Dinya bihar e, micalê palîya cihan e û kulîlkê hinaran e

Felat sor bûye mîna xwîna mêrane

Pêl davêne serê pêlane

Delxe davêne serê delxane

Lêdixînin li kûna çîyane¹⁰⁹

¹⁰⁵ h.b.b.r.34.

¹⁰⁶ h.b.b.r.43.

¹⁰⁷ h.b.b.r.47.

¹⁰⁸ h.b.b.r.49.

¹⁰⁹ h.b.b.r.50.

*Ro hilatîye ji mala Xwedê ji alîyê jêre,
 Şewqê xwe daye dinyayê û hawêrdore.
 Ez nizanim, ne sibe ye û ne êvar e.
 Çaxê te bi xêr e¹¹⁰
 Ji nih va, dilê wê rabû mîna behrane
 Pêlan xwe davêtin seri heya lingane
 Dîsa derd û kulan serî hildane¹¹¹
 Werin milê xwe bidine yê min, mîna gaye cot hevalê haletane¹¹²
 Hîn îro stêrka min rijîya li ezmanane¹¹³
 Roj şewqê we dide dinyaê, li me her dîyan tenha hilnehat¹¹⁴*

Bêguman di van hevokên qerase da jî tê der ku ka rengê asta edebîtiya destana me çend xuyaye. Vebêjer an jî dengbêjê destanê ev destane bi gotin giranbiha û xweş li hev anîye. Vebêjerî di asteka bilind a edebî da berhema xwe ristîye.

Wecîze anku aforîzma. Dema mirov li wecîzeyan dinêre dibîne ku wecîze ji alîyê kesên xudantecrube û aqilmendan ve tê dayînê. Kesên ku wecîzeyekê dide ew xwe dispêre serborîyên xwe û di wan serborîyan da gotinên kurt û têrwate hene. Bêguman alîyekî wecîzeyê dikeve di nava sînorên şîretan da jî. Di destanê da wecîzeyên ku diborin wiha ne:

*Hinga, Memî digot: ‘‘ Şorê kalan tev cewher e, divê navêjî bin lingan e¹¹⁵
 Tirsî min e ji xewê ye, xew dijminê mirovan e û şev keliha mêran e¹¹⁶
 Zînê got: Samê te pir e, mîna romîyane!¹¹⁷
 Çûyîn bi dev gengaz e, lê vegeer ne bi destê merîyan e¹¹⁸
 Heçîyên xîreta mîlet dikişîne, divê bizane ko halê mîlet çawan e¹¹⁹
 Şertê merî hakim ne wisan e
 Berê dipirsîn sebebê tiştane¹²⁰*

¹¹⁰ h.b.b.r.51.

¹¹¹ h.b.b.r.73.

¹¹² h.b.b.r.81.

¹¹³ h.b.b.r.87.

¹¹⁴ h.b.b.r.143.

¹¹⁵ h.b.b.r.30.

¹¹⁶ h.b.b.r.35.

¹¹⁷ h.b.b.r.38.

¹¹⁸ h.b.b.r.44.

¹¹⁹ h.b.b.r.116.

Memê min, bila xobarî nekeve dilê te, dinê nabe milkê tu kesane

Eger merî bimîne deh salane, na merî bimîne hezar şalane

Ji merî baqil ra mîna hev e, qet tê da nabîne tu ferqane

Dinya bi xwe mîna xewan e¹²¹

Gotinên pêşîyan û biwêj gotinên anonîm in, malê gel in, şopa çanda miletekî ne. Di vê destana me ya kurdî da jî bêguman gotinên pêşîyan û biwêj zaf cih digrin. Di destanê da cihên ku gotinên pêşîyan û biwêj tê da derbaz dibin wiha ne:

Serê mêrê çê daîm mij û dûman e¹²²

Qisûr efa mêran e¹²³

Gur namirin bi du parîyan¹²⁴

Merê xerîb kor e, tişteki nizane¹²⁵

Emrê çûyî venagere li xwedîyan¹²⁶

Girî îşê pîrekan e¹²⁷

Mêr dimirin kira wan dimîne tevî navê wan¹²⁸

Mêr tene girêdan bi şorane¹²⁹

Kî berx e kî beran e¹³⁰

Şerm karê pîrekan e¹³¹

Jin parsîya kêr in, dibin ser hev de û rûreşîya dê û bavan e¹³²

Rastî karê mêran e¹³³

Di dinê da du caran bext nabe hevalê merîyan¹³⁴

¹²⁰ h.b.b.r.126.

¹²¹ h.b.b.r.142.

¹²² h.b.b.r.36.

¹²³ h.b.b.r.40.

¹²⁴ h.b.b.r.54.

¹²⁵ h.b.b.r.54.

¹²⁶ h.b.b.r.63.

¹²⁷ h.b.b.r.64.

¹²⁸ h.b.b.r.75.

¹²⁹ h.b.b.r.83.

¹³⁰ h.b.b.r.93.

¹³¹ h.b.b.r.96.

¹³² h.b.b.r.102.

¹³³ h.b.b.r.110.

¹³⁴ h.b.b.r.110.

*Ez tî mam di nava du çemane*¹³⁵

*Serê hatî birîn nayê kirin bi peran*¹³⁶

*Para berxê nêr her gav kêr e*¹³⁷

Di destanê da hin gotin an jî qalib hene ku xwe di piranîya destanê da dubare dikin. Bi qasî ku me tesbît kirî ev gotinên qalib ku zaf cih digirin wiha ne:

*Dilê min î lîyan e*¹³⁸

*Merikî xerîb*¹³⁹

*Mêvanê xerîb*¹⁴⁰

1.5. Di Destanê Da Nirxên Çandî

Bêguman her neteweyeke dêrîn xudan nirxên çandî û dîrokî ne. Destan ji ber ku nirxên çandî yên gelan radixe li ber çavan lewma di vê destana me da jî zaf tiştên aîdê nirxên çandî cih digirin. Di destanê da em di bin vê sernavê da em li ser mêvanperwerî, qurbandayîn, tradîsyon û bawerîyê rawestîyane.

1.5.1. Di Destanê Da Mêvanperwerî

Di vê destana me ya tekûz da yek ji nirxên li ber çav in bêguman mêvanperwerî an jî mêvanhezî ye. Dema meriv bala xwe dide destanê bi rehetî rengvedana kevneşopîya kurdan a bo mêvanên xwe dibîne. Wekê tê zanîn li cem her neteweyeke qedîm û dêrîn cihê mêvan giring û mezin e. Li ba kurdan jî ev yek nirxeke mezin e û ji bo mêvanên xwe dilsoz in. Dema em li kevneşopîya kurdan dînerin em dibînin ku di piranîya malên wan da odeyek taybet bo mêvanan heye (çiqaş ku îro ev yek ji ber bajarîbûnê kêr jî be). Kurd nirxeke mezin didin mêvanên ku qesta wan kirine. Li ser mêvandarî û mêvanperwerîya kurdan Bayezîdî wiha dibêje: Ekrad herçî ko xîmenişîn in, wekû mêvan betin, rast dajon derê konî. Xweyîyê malê jî radibe û pêşve tîn û hespêd wan digirin û girêdidin. Eger şayed xweyî malê mîr hazir nebin, jinêd wan biderdikevin pêşîya mêvanan û hespêd wan digirin û girêdidin. Û ewan mêvanan dibine konî. Êdî zêde ji mîrêd xwe îkram û î'tirazî (qedirgirtin) dikin.¹⁴¹ Wekê Bayezîdî jî amaje pê kirîye, li ba kurdan mêvandarî tiştêkî xucest e û xudanqîmet e, ew her mêvana ku li mala wan e, xwedî lê derdikevin û her cure qedr û giringîyê pê didin.

Di destanê da tişta herî berbiçav û dilrakêşer bêguman qîmetdayîna bo mêvanî an ku mêvanperwerî ye. Di destanê da ev nirxdayîna bo mêvanan di asteka bilind da ye. Dema ku Memê Alan ji bo dermanê dilê xwe berê xwe dide Cizîra Botan di rê da wenda dibe. Piştra berê xwe dide li mala yekî, ji wî ra dibe mêvan. Dema ku dibe mêvan jî ji ber ku rêwindayî bûye lewma naxwaze ev xebera rêwindabûna wî bigihîje ti kesî. Bi girêdayî vê bi awayeke

¹³⁵ h.b.b.r.121.

¹³⁶ h.b.b.r.142.

¹³⁷ h.b.b.143.

¹³⁸ h.b.b.51.

¹³⁹ h.b.b.60.

¹⁴⁰ h.b.b.68.

¹⁴¹ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradîye, r.76.

tund gefan li xwedîyê malê dixwe, ferman dide wî ku da ew wî zû şîyar bike, li hember vê nobrantîya Memê Alan xwedîyê malê bertekekê nîşan nade, bihenûn dibe û sehneyek wiha pêk tê:

Xwedîyê malê got: ‘Li ser seran û her du çavane

Madem îşev li min bû mêvan Memê Alan, Padişahê Kurdane.’

Heya sibê, xwedîye malê rûnişt, xew ne kete çavane

Sibê, berî berbangê, Mem rakir ji xewane

Jê ra derxist Bozê Rewane.¹⁴²

Xwedîyê malê li hember vê dilhişkîya Memê Alan ti tiştêkî neqenc lê venagerîne, ew li ber emrê mêvanê xwe yê qedirbilind disekine. Ji bo ku bi awayekê baş mêvanê xwe bihêwirîne çî ji destê wî tê dike û daxwazên mêvanê xwe bi cih diîne.

Dema ku Memê Alan tê Cizîrê, bi şîretên Qîza Beko dixwaze here li mala her sê Celalîyan. Ji ber wê ji kesekî ku lê raber tê mala Celalîyan dipirse û ji wî dixwaze ku wî bibe mala van her sê şêran. Belam ew kesê ku pirs lê hatî kirî, pirskirina mala yekî bo mêvanîyê wekê tiştêkî eyb û şermende dibîne. Li hember vê yekê diqehire û wiha lê vedigerîne:

Êsîr lê vegerand, got: Dilê min î

*Xwezîya te em gişka bikuştana û xwîna me birijanda ber lingê vî hespê
xwe, Bozê Rewane*

Tek te ne gota: Raber min bikin qesra van her sê birane

Qene îşev tenê li mala min bibe mêvane¹⁴³

Wekê ji van gotinan jî dîyar e kurd j’alîyê mêvanekî ve pirsyarkirina mala yekî wekê heqaret dihesibînin. Vê yekê qebûl nakin û bi dilnexweşî ji bo kesê mêvanê pirskirî vedigerînin. Li ser vê yekê Mela Mehmûdê Bayezîdî di pirtûka xwe ya dêrîn da wiha dibêje: Mêvan sakin dikin (bi cih dikin, dihêwirînin). Eger qe cih tune be jî li yalî malê, li kenarekî xweyî malê digel jina xwe û li kenarê dinê mêvan radizin. Nabî cih jî tune bin dîsanî mêvanan ji derê malê venagerînin. Lewra li nik wan mêvan neêwirandin (nehewandin) û ji derê malê vegerandin qewî şerm û ‘eybekî mezin e. Û hurmeta mêvanan dikin bilanî millet axir jî bitin.¹⁴⁴ Mêvanhebandin li ba kurdan ji berê heta niha cihekî giring digre. Ew di çî rewşê da bin jî dixwazin mêvanê ku qesta wan kirî, li ba wan bimîne. Ji ber vê pirskirina mala yekî ji alîyê kesekî an jî mêvanekî ve wekê sixêf û dijûn tê hesibandinê. Demildest li hember vê yekê bertek nîşan didin.

Memê Alan piştî ku biryar dide Bozê Rewan ji bo bifiroşe diçe mezadê. Li wir kalekî ticar lê peyda dibe, dixwaze vî xortê delal û qeşeng bike mêvanê xwe û wiha jê ra dibêje:

¹⁴² h.b.b.r.48.

¹⁴³ h.b.b.r.58.

¹⁴⁴ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r.77.

Ticar li Memî vegerand û got: ‘‘ Lawo mala me hatîye nasîn bi sefarîya mêrane

Tu weke merîkî bi birîn î, qedra mêl di çav te da ne xweyan e

Birînê xortan ê pir li kezebê ne, bi manîya hezkirina dilan e

Ne dûr e koy ê te jî li van doran e

Eger îşkê wanî li te qewimîye, îşev li apê xwe bibe mêvane

Ez ji te ra vekim derê dikanan û mixazane

Ko bi wan nebû, vekim genc û defînanê

Rake heya dilê te dixwaze perane

Tu ê bi tenê raberî apê xwe bike wî cihî bi tilîyanê

Ez ê mihelê xerq kim bi mêl û zêrane

Ji te ra bi qedînim vê meraqa dilanê

Heya niha, karê vê malê me ev e, em ê mêl berev bikin, paşê bidin di rîya dilê camêrane.’’¹⁴⁵

Di van gotinên xwerû û xweş tîxuyanê ku Bazirgan dixwaze jî bo kesê ku dê bibe mêvanê wî bi her cure fedakarîyan bike. Bazirgan jî bo bicihînanaxwaz û xwastekên dilê mêvanê xwe amade ye her tiştî bike. Ew jî bo mêvanê xwe xerckirina hemû mal û milkê xwe dide ber çavan. Ev yek asta giringîpêdan û dilfedakarîya bo mêvanî raberî me dike.

Memê Alan li hember vî Bazirganî minetdar e. Belam Bazirgan jî dibîne ku li ber ra dayîna mal û milkan dê êşa dilê Memê Alan rihet neke lewra berê wî dide ber bi mala her sê Celalîyan. Memê Alan jî ber ku kesekî xerîb e li her kesî mala her sê Celalîyan dipirse lê belê di her pîrskirinekê da, kesên ku pîrs li wan hatîye kirin bi tundî û bi dilnerehetî li wî vedigerînin. Ji ber ku li ba wan pîrsyarkirina mala yekî wekê eybekê mezin dihête dîtîne. Di ser ra jî bi îsrar dixwazin ev kesê xerîb bibe mêvanê wan. Belam Memê bi timî vê daxwaza wan li wan vedigerîne, di dawîyê da hew xwe digre û li hember vê tradîsyona wan rexneyeke wiha tund dike:

Biran, ez dikim şorekê bikim, bila tiştê nêre dilê we giştikane

Mîna ye ko va bajarê we, bajarê kêmaqil û dinan e

Ma merî ko dare derekê, yanê adeta xelkê we ko rastî kê hat, here mala wane?

Derdê min pîr î giran e, ew jî bi tenê li mala her sê biran dibe dermane.

Ez reca ji we dikim ko hon bilezînin

¹⁴⁵ h.b.b.r.63.

Eger hon dixwazin çêyîkê bi ser min xînin

*Yek destê xwe bavêje lîwana hespê min, min li mala her sê Celalîyan
bigihînin¹⁴⁶*

Ji ber ku Mem biçê kî derê israreka balkêş heye bo mêvankirina wî û gelê li wir pirsikirin û nîşandana mala Celalîyan wekî çewtî û dijûn dihesibînin loma Mem rexne li vê 'edeta wan a li hember mêvanperwerîya wan dike. Memê Alan jixwe di piranîya destanê da li hember urf û edetan kesekî modern û nûxwaz e. Lewma çiqas ji destê wî tê li bereksê civatê tevdigere, rexneyên xwe li hember kesên tradîsyonparêz bi tundî dike. Ew ji ber ku dixwaze tavil bigihije mala Celalîyan lewma naxwaze berpêlka demê li wî bikeve. Tesîra rexneyên Memê Alan li ser kesên Cizîrî çêdibe, ew Memê Alan dibine mala Celalîyan.

Celalîyên nîyazpak û dilêr pêşwazîyeka xweş bo mêvanê xwe dikin. Ew li ber mêvanê xwe dibine perwan e, li ber daxwazên wî di amadebaşîya da dimînin. Ew ji ber seredana gundîyan ya bo Memê Alan nikarin sedemê hatina wî bielimin. Heta sê rojan mêvandarîyeka ji dil û can ji wî ra dikin. Piştî ku sê roj timam dibin, Hesen ji Memê Alan ra wiha dibêje:

Bira, heqê mêvanîyê sê roj in, li cem Kurdan e

Ji sê rojan bi şûn da mêvan dibe xwedîyê malane

A te sê roj timam bûne, îro roja çaran e¹⁴⁷

Kesek ji bo ku bibe mêvan divê cihê lê bûye mêvan, heta demekê bimîne. Digel maweya kêma ya mayînê ne dîyar e, herî zêde dikare sê rojan bimîne. Heke ev maweya mayînê ji vê dirêjtir be, ev yek ji bo xwedî malê dibe sedema hin arîşeyan.¹⁴⁸ Her wekî di van gotinan da jî tê xuyanê, divê mêvan herî zêde sê rojan bimîne an jî sedemê hatina xwe ji xwedîyên malê ra bibêje. Hesen li gorî tradîsyona bav û kalen xwe tevdigere, ew heta sê rojan ti tiştan ji mêvana xwe Memê Alan pirs nake, qedrê wî baş digre. Ew û birayên wî li dora mêvanê xwe dibin perwane ji ber ku li ba gelek milletên qedîm û li ba kurdan jî mêvandarî sê roja lewma roja sisêyan sedemê hatina mêvanê xwe jê dipirse.

Li ba kurdan hatina mêvanekî û ezimandina mêvanekî tişteki pîroz tê dîtîn û hesibandînê. Jixwe dema em li nerîtên kurdan dînerin, di pêşgotinên wan da jî vê yekê rengvedana xwe girtîye, mêvanê hatî wekê mêvanê Xudê dihesibînin û li gor wê tevdigerin. Di destanê da jî sembola mêvanperwerîyê û mîrxasîyê bêguman her sê Celalî ne. Her sê Celalî ji bo mêvanên xwe di asteka bilind da fedakarî û mêvandarîyê dikin. Asta mêvandarîya wan ji sonda wan a di navbera wan da ya ji bo mêvanê baş tê der. Ew asta bilind û paye ku asta fedakarîya wan e, bi van gotinên her yek Celalîyan wiha ye:

Niha ko li ser mala min bi xwe be, û ko dilketîya wî Sitîya jina min be, ko dîya zarokan e

Heya niha, helala min bû û ji îro bi şûn da, ji min ra weke xwîşkan e

¹⁴⁶ h.b.b.r.66.

¹⁴⁷ h.b.b.r.75.

¹⁴⁸ Karadağ, B, Sünette misafirlik ve misafir ağırlama, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zaningeha Marmarayê Enstitûya Zanistên Civakî, Stenbol 2008, r.60-61.

Hon her du bira rûniştine, şehde bin, min bi kêfa dile xwe da Mîrê Mixribîyane

...

Got: Bi vî şûrî, bi vê himêlîyê, ji hêla min va jî, hatina vî lawikî eger ser çar koşeyê bajêr be jî, qedîyane

Na ko ser malê me be û nefsê me, her sê birane

Eger hati be ji bo Zînê, qalandayîya min ya sê salane

Xwedîya biskê birewa û qeterên gulîyane

Heya niha, xwestika min bû, û ji niha bi şûn da, xweyînga min e ji dê û bavane

Va gotina min, bi şehdeyê we her du birane

Min jî hiba kir û da Mîrê Mixribîyane

...

Bi vî şûrî, bi vê himêlîyê eger ne bi ser jin û destgirtîyê we be

yê mayî bispêrine min ko, çi be, li ser serê min, bi şehdîyê we her du birane¹⁴⁹

Mêvanperwerî û qedirdana ji bo mêvanî di van gotin û sonda Celalîyan da baş tê der. Celalî ji bo pêkînanana xwasteka mêvanê xwe kuştina xelkê, wêrankirina didine li ber çavên xwe. Heta asta vê mêvanhezîyê digihije astek wisa ku Hesên amade ye ku dev ji avêtina telaqên xwe berde, Çeko amade ye ku dev ji qelendîya xwe ya bi salan berde. Di destanê da Celalî him j' alîyê gotinê ve him jî j' alîyê pêkînanana van gotina ve xwedî heman helwestê ne. Ew wekê gotina xwe dikin, ji bo mêvanê xwe her cure fedakarîyê dikin. Memê Alan wekê kesekî xerîb û payebilind dibîne lewma ev kesê ku xwe avêtîye bextê wan, bi paş da bi dest vala venagerînin. Çeko ji bo Memê Alanê mêvanê xwe dev ji qelendîya xwe berdide.

Her sê Celalî piştî ku bi agirê dilê Memê Alan dihesin, çi ji destê wan tê, di asteka bilind da vê yekê dikin. Hesên piştî kup ê dihesê Memê Alan di koşka Mîr Ezîn da asê maye ji bo ku wî xilas bike dest bi her cure çareyan dike. Hesên ji bo dûrxistina Mîr Ezîn li ba Memê Alan pêşîyê dest bi kuştina hesp û dewaran dike, dibîne ku ev yek têrê nake wêca dest bi şewitandina qesr û qonaxa xwe dike. Em piştî vê kêlîyê asta fedakarî û dilsozîya Hesên ya ji bo mêvanê wî dibînin. Ku ew sahne wiha ye:

Sitî bi der ket ji koşka Zînê, bi destan îşaret da Hesên ko nayê, sebebê wê Bekoyê şeytane.

Hema Hesên rahişte milê kurê xwe yê biçûk, avête nav arê darane¹⁵⁰

Di destanê da dema em lê dinêrin hezkirinek, nirxdayînek û ezimandinek mezin bo mêvanî heye. Kesên di destanê da hertim dixwazin kesên xerîb bibe mêvanê wan, ew feqîr jî bin

¹⁴⁹ h.b.b.r.83-84.

¹⁵⁰ h.b.b.r.129.

dixwazin parîyê nanê xwe bikine devê mêvanê xwe. Di destanê da bêguman sembola mêvanperwerîyê û fedakarîya ji bo mêvanan ji alîyê Celalîyan te baş dihête der. Ew ji bo mêvanê xwe her cure fedakarîyê dikin. Di bingeha mêvanperwerî û mêvanhezîya wan da dostanî, hevaltî û camêrdî heye.

1.5.2. Di Destanê Da Qurbandayîn (Boraqdayîn)

Wekê me pir caran anî ziman destana me destaneka pirhêl û kamil e. Em dikarin ji destana xwe gelek mijarên curereng peyda bikin. Di destanê da yek ji tiştên ku bala me dikşîne, qurbandayîn e. Kesên di destanê da ji ber bawerîya xwe ji bo Yezdanê xwe qurbanan didin. Di her olan da qurban ciheke xwe ya taybet heye û millet li gor bawerîya xwe qurbanan ji bo Yezdanê xwe ser jê dikin. Mebesta serjêkirina qurbanan bêguman bawerî, heyrantî, şûkranî û hê zaf tiştên din e. Mirov ji ber bawerîyên xwe bo dînê xwe her dem xwe hewceyî wê tiştê dîtîye ku qurbanan pêşkêşî Yezdanên xwe bikin. Sedemên bicîanîna qurbandayîne em dikarin di bin pênc xalan de berhev bikin:

1. Heyrantî: Mirovan ji ber hin curesedeman heyrantî bi hin tiştan (asîman, heyv, tav ajal h.w.d) kirîye. Ev hîsên xwe jî ji bo ew heyberên ku jê re heyranmane re, bi pêşkêşîya qurban re anîne zimên.

2. Şûkrandarî (spasî): Mirovê ku karîye li dinyayê ji gelek nîmetên cur be cur îstîfade bike, ji bo Yezdan an jî Yezdanên ku fikirîye qencî bexşî wî kirine, bi pêşkêşkirina qurbanê re sipasîya xwe (şûkrana xwe) bi lêv kirîye. Ango qurbandayîne wekî amûrekî ramîye.

3. Dilxweşkirin (dilkirîn): Di dînên prîmîtîv de, ji bo damirandina xezeba Yezdan/Yezdanan an jî ji bo ku ji sûcên ku pêk anîne xwe ji cezayên wan xilas bikin qurban pêşkêş kirine. Qurbandayîn wekê amûra dilxweşkirinê (dilkirîna) bi kar anîne.

4. Boraqdayîn: Mirovan xwastine/daxwaz kirine hin xwastekên wan ji layê Yezdan/Yezdanan ve werin pejirandinê. Piştî ku boraqa wan hatîye cî, li himber vê lûfta Yezdanî jê re qurban pêşkêş kirine.

5. Kefaret: Mirovan ji ber xirabîyên ku kirine û li himber kiryarên xwe yê tawanbarîyê qurban pêşkêşî Yezdanan kirine.¹⁵¹

Em ê niha li gor van pîvanan ew sahneyên ku di destanê da li ser qurbandayîne derbaz dibin, rawestî û li gor van kirîtîkan hilsengandinên xwe bikin.

Dema em li destana xwe dinerin em dibînin ku destan di rojeka Eyda Qurbanê dest pê dibe. Em dizanin ku yek ji girîngtirîn nirx bo dînê îslam, Eyda Qurbanê ye. Di eydê da ji bo Xudayê Teala û di rêya wî da qurban têne serjêkirinê. Di destanê da sehneya li ser Eyda Qurbanê wiha ye:

Rojek ji rojê Xwedê, bi ser wan de hatîye Eyda Qurbanê, xwarzî diherin malê xalane

...

Elî begê, Elmaz begê, sibehê Eydê Qurbanê, rahiştindarê erebane û xelîlane¹⁵²

Di vê rojê da em dizanin ji bo dilxweşkirina Yezdan ev ritûel pêk dihêt. Ger em li gor krîtîkên xwe yê li jor biçin em ê di vê rojê da ji van krîtîkan du heban bibînin. Yek Spasî an jî şûkranîya ji bo Yezdan e ku wî zaf tiştên cure be cer kirîye nesîb. Mirovan jî li hember vê

¹⁵¹ Bekki, Selahaddin, Türk Mitolojisi'nde Kurban, Akademik Araştırmalar, Sal 1, Jimar 3, Zivistan 1996, r.16-28.

¹⁵² h.b.b.r.25-26.

yekê şûkrana xwe bi serjêkirina qurbanan bo Yezdanê xwe anîne cih. Di vê rojê da herwiha krîtîkeka me ya li jor jî cardin di xwe da dihewîne. Ew krîtîk jî dilxweşkirin anko dilkirîn e. Mirov ji bo ku xwe ji nexweşîyan û ji xezeba heyî ya Yezdanî biparêze serî bi serjêkirina qurbanan dide. Di vê yekê da nîyazpakîyek heye, dixwazin qurbanê wekê amûrekî dilxweşîyê bi kar bînin û nexweşîyên ku dê ji aliyê Yezdan ve bo wan bê, xwe jê biparêzin.

Di destanê da em dibînin ku bavê Memê Alan û apên wî ji ber reşbîniyeka giran û ji ber nebûna zarokekî ketine çolan. Ew di nava xemeke giran da ne, di wê navberê da Xocê Xidir li wan peyda dibe û ji wan ra wiha dibêje:

Herin Bajarê Mixribê, vekin devê xezîna û defînanê

Pere birijînin li zikaka û li ewcanê

Serjêbikin qurbana û dehîyanê

Ji bona xatirê feqîr û foqrane

...

Serjêkirin qurbana û dehîyanê

*Ji bona xatirê feqîr foqrane*¹⁵³

Di van hevokan da em dibînin ku Xocê Xidir ji bav û apên Memê Alan dixwaze ku ew hin tiştan bînin cih. Di vir da her ne rasterast jî be boraqdayînek heye. Ji ber ku bav û apên Memê dixwazin zarek ji wan ra çêbe da ku mal û milkê wan nemîne ji ti kesan ra. Ew, ji bo daxwaza bicihînan xwasteka xwe qurbanan didin anko boraq û dehîyan didin. Li vir da krîtîka boraqdayîne –ne rasterast jî be- hatîye cih.

Herwiha li gor krîtîkên me, me dît ku sê heb ji wan hatine bi cih belam du heb nehatine cih. Di destanê da ji bilî van krîtîkan em dibînin ku ne ji bo Yezdan û lê belê ji bo kêfxweşîyê jî serjêkirin ango qurban heye. Ku ew sahne wiha ye:

Îro serjê ke gelek pezane

*Xeberê bide xelkê bajarê Cizîra Botanê*¹⁵⁴

Ji van hevokan derdikeve li holê ku mebesta van kesan ne qurbankirina qurbanekê ye bo Yezdan an jî bo rêya wî. Mebesta wan bes dilxweşkirina hev û şahîya wan e. Ev yek şanî me dide ku serjêkirina ajalekê an jî qurbankirina wê ne tenê bo Yezdanan herwiha ji bo xwe jî vê yekê dikan.

1.5.3. Di Destanê Da Tradîsyon

Di destana me da yek ji mijarên ku em ê li ser bisekinin tradîsyon e. Dema em vê peyva tradîsyonê dibihîzin û dibînin bêguman zaf tişt tene bîra me. Tradîsyon di xwe da zaf tiştan dihewîne, nasname û taybetmendiyên gelan di tradîsyona wan da cihê xwe digre. Ev

¹⁵³ h.b.b.r.26-27.

¹⁵⁴ h.b.b.r.113.

tradîsyon ji do bo îro anku ji do bo nifşên îro bi timî dihête veguhastinê. Em ê jî niha li ser tradîsyon û mînakên tradîsyonê yên di destanê da diborin, rawestin.

Di tradîsyona gelên qedîm da edetên wan, nirxdayînên wan, nerîtên wan, çanda wan û bi giştî nasnameya wan cih digre. Di destanê da dema ku Zînê Zêdan û Memê Alan di odeya Memî da ne, bera hev davêjin. Di wan berahevavêtinê da em li rastî tradîsyoneka keçên kurdan tên ku li wir da Zîna Zêdan sînoren nerîta xwe wiha ji Memê Alan ra dibêje:

Ez nikarim rabim, destê xwe bidim destê peyane

Bigirim li koşk û hewşane

*Tema her kireke jinan radibe ser zarane*¹⁵⁵

Piştî ku Zîna Zêdan û Memê Alan hev dibînin, dibin heskirîyê hev. Zîna Zêdan li dû dîtina wan dema dibîne Memê Alan ne li ba wê ye sahneyeke wiha diqewime:

Zînê carîya vegerandin cîyê wane

Gava bi tenê ma, ji xwe danîn cil û çekên xatûnane

Li xwe kir kirasekî reş, yê erebane

Ko ne hêja ye du qirûş û nîvane

Bi carê xwe kir belgihê carîyane

*Ne ma bi kesî ra dike şor û xeberane*¹⁵⁶

Di van kêlîyên li jor em li rastî tradîsyonekê tên ku wekê li jor jî xuyaye, piştî nedîtina kesekî an jî ji wî kesî dûrketin dibe sedema matem û êşeke giran. Zîna Zêdan jî ji ber ku ji evîndarê xwe dûrketîye, ketîye heman haletê. Mirov bi rehetî dikare bibêje ku ev tradîsyona dûrketina ji yarê û reşgirêdan di nava tradîsyona milletên qedîm da her hebûye û niha jî deforme bibe jî berdewam e.

Memê Alan piştî xewna şevan berê xwe dide bajarê Cizîra Botan ji ber ku kesekî xerîb e lewma zaf rê û rêçan nizane. Dema ku tê li ber robarekê ku derbas be û nikare derbas be, şivanek jê ra dibe arîkar û ew jî ji wê robarê derbas dibe. Li ser vê yekê Memê Alan wiha li şivanî vedigerîne:

Memî destê xwe kire bêrika xwe, tijî kir ji zêr û perane

Xist destê şivên got: ‘Menihêre li kêmi û qisûrane

Xwedê hez ke ko me careke din hevûdû dît bi çavane

Ez dikarim bipirsim li halê camêr û qencane.’¹⁵⁷

¹⁵⁵ h.b.b.r.39.

¹⁵⁶ h.b.b.r.42.

Li van gotinên Memî da em li rastî tradîsyonekê tên ku di wê tradîsyonê da jibîrnekirina qencîyan heye. Li ba kurdan ji yekî qencîdîtin xudanqîmet û nirx e, wê qencîyê ji bîr nakin û li hember vê qencîyê jî çî bi manewî be çî bi madî be tişteki dikan. Li ser qencîyê Mela Mehmûdê Bayezîdî di pirtûka xwe da wiha gotîye: Û Ekrad îhsan (qencî) û kerem (comerdî) û qencîyê ji yekî bibînin ji bîr qe (qet, hîç) nakin, dayim (hergav) ewê qencîyê di nêva meclisan da dibêjin û xirabî jî kezalik (herweha).¹⁵⁸ Wekê gotinên Bayezîdî Memê Alanê kurd vê qencîyê ji bîr nake û zêr û peran dide şivên.

Memê Alan dema ku li Cizîrê ye dixwaze rasterast ji bo çareserkirina meseleya xwe ya dilî berê xwe bide li mala her sê Celalîyan. Dema ji kesên Cizîrî mala van Celalîyan dipirse bi giştî ew wiha li Memê Alan vedigerînin:

Wan gelê hevalan gotin: “Kekê, em hev digirîn ko adetê me raber yekî kirin qonaxan eyba giran e

*Ko malê me çitonî be jî, kerem ke, îşev bi tenê li cem me bibe mêvane*¹⁵⁹

Wekê me di beşa mêvaperwerîyê da bi giştî anî ziman di destanê da nirx û qedreke mezin bo mêvan heye. Dema kesek ber bi yekî ve biçe û xerîb be, tavil dixwazin wî kesî bikin mêvanê xwe. Lê dema ku yek nebe mêvan û bixwaze biçe mala yekî û mala wî bipirse ev yek dibe sedemê arîşe û gelemşeyan. Di van gotinên xelkê Cizîra Botan da jî ew dilsarîya xwe li hemberî pîrskirina mala yekî nîşanî Memê Alan didin. Anku bajarê Cizîra Botan adet, nerît û helwestên xwe yên li hemberî pîrskirinê anîne ziman ku pîrskirina mala yekî li ba edetên wan şerm û eyb e.

Her sê Celalî di destanê da bi mêrxasî û mêvanperwerîya xwe li ber çav in. Ew ji bo mêvanê xwe fedakar û dilsoz in. Dema ku Memê Alan dibe mêvanê ew ji bo çareserkirina meseleya wî her yek ji wan wiha sondan dixwe:

Min got ko ezê dehwa te biqedînim, a bi vî şûrî û bi vê himêlîyê be ko kul û derdê te, kul û derdê me Celalîyan e,

Ez ê ko kî be, jê ra bînim, tewre mîft û belaş e bê perane

Wê dobê, Çeko destê xwe lèxist li şûr û himêlîyane

Got: “Ji hêla min va jî, eger hatina vî mêvanê me ji bo çî be, ez ê bikim, madam bi dil û rayê we her du biran e

Ko destê xwe deyne ser kijan keçê, ko ew jî ji mala me Celalîyan e

- Ma ez dikim şora Hesên bişkênînim?

- Ezê dilketîya wî bînim, ro li taştîyane.”

Wê calê, hate dora Qeretacîn, biçûkê her sê birane

¹⁵⁷ h.b.b.r.53.

¹⁵⁸ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r.63.

¹⁵⁹ h.b.b.r.66.

Destê xwe da ser şûr û himêlîyane

Got: ‘‘Birayê biçûk tim gole û xulamê hemî biran e

Hezar carî bi vî şûrî û bi vê himêlîyê ko, dehwa mêvanê me di bajarê Cizîrê çi be, ezê biqedînim bi dil û çavane

Weleh, ez pir jê hez dikim, bê mêvanî jî ji min ra mîna biran e.’’¹⁶⁰

Wekê di vê pasaja ji nava destanê da jî xuyaye, her sê Celalî li ser şûr û himêlîyê xwe sondê dixwin. Sondxwarin yek ji tradîsyona muhîm û giring e li ba kurdan. Sondxwarin nîşana sembola bicihînana wê tiştê ku dê pêk were ye. Her sê Celalî jî ji bo ku bi gotina hev tam bawer bin û wê gotinên bikin reftar li ser şûrê xwe sond dixwin. Gelo çima li ser şûr ne li ser tiştê din? Ji ber ku em di destanê da jî dizanin ew kesên mêrxas û talankar in lewra ji bo wan çekên wan xwedîqîmet e. Ew nirxeke mezin didin çekên xwe lewranî bi rehetî li ser çekên xwe sond dixwin. Li ser qîmeta çekan li ba kurdan Bayezîdî wiha dibêje: Ekrad hesp û çekêd xwe, memnû’ ne (qedexa ye) eslen bi emanet nadin birayê xwe jî. Ekrad dibêjin ko mirov jina xwe bi emanet biditin, ne ko hesp û alatêd xwe î herbê bi emanet biditin. Li cihê emîn jî dîsanî alatêd wan î herbê li ber serê wan dibî. Lehzeyekê (kurtedemekê) alatan ji xwe bi dûr nakin. Lewranî Ekrad dibêjin ko mirov hinde qedêrî zehmet û giraniya çek û ratiban dikişîtin, ji boy rojekê hewceyî dibe ko wê rojê çek û ratib hazir nebin. Lewranî çekan qet li xwe bi dûr nakin. Û ihtiyatî (pêşamadeyî) dikin ko belkû ji nişkê ve hewce bibitin. Heta weqtê ko nimêjê jî dikin, dîsanî çek û ratibêd wan hazir li piştê ne.¹⁶¹ Her wekî di van gotinên Bayezîdî da jî dîyar e ka nirxdayînek çawa bo çekan heye. Lewma sondxwarina her sê Celalîyan jî li ser çekan e ji ber ku ew nirxeke mezin didin çekên xwe.

Celalî kesên sozgir û camêr in lewma nirxeke mezin didine sozgirtinê dema ku Çeko dibihîze Memê Alan ji bo qelendîya wê, Zînê hatîye dilsist û dilzîz dibe. Çeko dixwaze ji sozê dayî vegere belam Hesen û Qeretacîn bi tundî li hemberî vê yekê derdikevin. Ji ber ku mala Celalîyan bi mêrxasîya xwe hatine naskirinê lewma naxwazin bicihneînan sozê wan bibe sedemê sistîyekê di nava xelkê da li hemberî wan. Heta acizîya wan digihije astek wisa ku kuştina birayên xwe jî didine li ber çavên xwe. Ji ber ku ji wan ra bicihneînan sozan eybeke giran e û ev yek li ba wan tine. Ku ew sahne jî wiha ye:

Te him xirab kir navê mêrane

Him jî te xirab kir navê kurdane

Êdî nema, serê me tu cara ranabe li pêşberê kesane

Wey sed xwezî bi mirina me her sê biran û ne bi van kirinane¹⁶²

Dema ku Memê Alan û Zîna Zêdan li ser Kanîya Qestelê ketine di nava axaftinê da Memê Alan ji Zîna Zêdan dixwaze ku ew hêzara li ser çavê xwe û çarşefa li ser rûyê xwe

¹⁶⁰ h.b.b.r.83.

¹⁶¹ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r.90.

¹⁶² h.b.b.r.94.

bide alîyekê. Belam Zîna Zêdan li hemberî vê yekê derdikeve û naxwaze vê yekê bike û sedemê wê jî wiha dibêje:

Berî, giştikan xwe hazir kirine, destê wan li ser şûr û silehan e

Hele, tu carê binhêre lî şûrê wan, giştik çar tilîyan ji kalan kêşane

Ma çavê min rijîyane ko ez vê çarşefê li ser çavê xwe rakim li cem van qîzane?

Welah, welah, ko ez çarşefê bilivînim li ser çavên xwe, bajar gişkê hilweşe van derane

Wê me her dîyan bavên ber devê şûrane

Ma tu nizanî ko berê xelkê Cizîrê bûne sê bendane

Wê li ser me bi hev kevin, mîna guran li erdê hildin laşê mêrane.

Xwîna mêran wê bimeşe li erdê, mîna çemane

Wê li ser Kanîya Qestetê bibe şîngîna şûran û tasên mertalane¹⁶³

Zîna Zêdan li gor edet û nerîtên xwe dixwaze tevbigere ji ber ku dizane heker ew hêzara li ser rûyê xwe bilivîne ev yek dê bibe sedemê kuştina. Ji ber ku hin kesên li wê derê ketine temaşeya wan û li bendê ne ku ew xeletîyekê bikin da ku rahêline wan. Ev yek li gor xelkê Cizîrê dikeve di nava sînoren namûsê û namûs jî li cem wan giring û pîroz e. Heke mirov ji van sînoran derkeve ev yek dibe sedemê xeterî û xwînretinê. Li ser meseleya namûsê Bayezîdî tradîsyona kurdan ya li ser namûsê wiha tîne ziman: Lakin ji boy şola xirab (zinêkarî û tiştên girêdayî namûsê) elbette mirovan dikujin. Heta jinêd xwe û keç û da û xwehêd xwe elbette qetil dikin¹⁶⁴ Îlla ko xirabîyê bibînin û yeqîn (bawer) bikin, elbette bilamecal (bê erê û na, bivê nevê) ewê jinê dikujin û mêrî jî. Êdî xûn tune. Kesek li wan nabî xweyî. Ekrad li hemû qebhatan dibine xweyî lakin li şola xirab (zîyanê) nabine xweyî. Lewranî li nik wan qewî eyb e (pir şerm e).¹⁶⁵ Wekê Bayezîdî jî anîye ziman li cem kurdan namûs û sînoren wê dîyar in lewma derbasbûna van sînoran dibe sedemê xeternakî, kuştinan. Zîn jî vê yekê baş dizane û li derdora wan jî kesin amade ne ku bên û rahêline wan lewma naxwaze hêzara li ser rûyê xwe rake da ku ji xelkê ra ev yek bibe sedemê rahêlanekê.

Dema ku Memê Alan dimire û xebera vê yekê digihije Sitîya Zêdan ew li ber xwe dikeve û şîna Memê Alan digel qîzên Cizîrê digre. Ku ew sahne jî wiha ye:

Li hêla din, Sitîyê li dorhêla xwe civandine qîzên Cizîra Botane

Bû haho û girîdeng gihêşte ezmanane

Her kes ji kesera dilê xwe ra ji bona Memî digirîyane

¹⁶³ h.b.b.r.101.

¹⁶⁴ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r.47-48.

¹⁶⁵ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r.55-56.

*Heya ko bû sibê, Sitî di pêşîya şîne da li dora qonaxê digerîyane*¹⁶⁶

Ji van dîmenan em dibînin ku piştî mirina Memê Alan Sitî şîne digre û digerîne. Ev rîtûela heyî tiştêkî tradîsyonîya kevn a aîdê kurdan e. Ev yek belku bi demê ra rabûye lê dema em vê destana xwe ya miqades dinerin, em hay li vê rîtûelê dibin. Li ser şîngirtina li ba kurdan Bayezîdî di kitêba qedîm da ev yek îname ziman: Li mewta (mirina) ciwanan zêde şîn û matem digirin. Libasêd (cil û kinc) reş werdigerin û serêd xwe reş girêdidin. Û jin û keç û xweh, gulîyêd xwe jê dikin, qewî zêde matem û şîne dikin. Eger ew mirî mêr e û xweyî hesp û çek û taxim e, hespêd wî dixemilînin û çek û silhêd (wî) li ser hespan girêdidin, ewan hespan li berayîkê cenazeyî dikêşin. Û ew jin û keç û da (dayik) û xwehêd wî delo (de lo yan de lawo) û lawjek dibêjin: “Wî li min babo, wî li min bira! Wî li min pismam” dibêjin û digrîn û deng û sedaya bavo bavo ya wan diçite felekê. Yanî mirovekî bîyanî jî rast şîna wan bêtin elbette dilê wî disoje û digirî. Bi vî terzî bi ihtîşam (hurmet û qedirgirtin) dibin çal dikin. Û ew jinêd ko gulîyêd xwe birîne ewan gulîyan li ser qebra wî meyyîtî (mirî) li kêlekêd wî dilawêsînin (dadiqilînin).¹⁶⁷ Wekê Bayezîdî jî ev tradîsyona bi demê ra –mixabin- rabûye, anîye ziman ku piştî mirinê şîngirtineke rîtûelwarî li ba kurdan hebû. Sitî jî piştî mirina Memî vê rîtûelê anko tradîsyonê pêk tîne, şîne girêdide digel keç û bûkên Cizîrî.

Sitî piştî şîngirtina bo Memê Alan diçe li ba pismamê xwe Mîr Şem dixwaze ew nameyekê binivîsîne, bide Mîr Şem da ku ew bibe bigehîne Hesên û birayên wî. Ew sahneya nameşandinê wiha ye:

Sitîyê kaxezek ji Hesên ra nivîsî û mirina Memî tê da kir beyane

*Pozê kaxezê şewitand, îşareta mirîyane*¹⁶⁸

Destana me ji bo beşa tradîsyonê têr û tijî ye û di nav da zaf kereste hene. Em cardin di vê sahneya li berjor da ji tradîsyoneka din a kurdan hayedar dibin. Ku ew jî namegerî ye belam ne namegerîyeke ji rêzê ye ji ber ku di di nameya hatîye şandin da em lê rast tîn ku pozê nameyê tê şewitandin. Şewitandina pozê nameyê her wekî di destanê da jî aşkera ye, sembola mirina yekî dinimîne. Sitî vê tradîsyona heyî dizane û li gor vê tradîsyonê hereket dike. Li ser namegerîya di nava kurdan û tradîsyona wan da Bayezîdî jî wiha dibêje: Îcarê di kaxezê de selam û du’an dinûsin û zîkr dikin ko, hamilwêreqe (yê ku kaxet pê re ye, namebir) baxeber e, yanê qewatîne lîsanî heye, hûn bi wî i’tibar bikin (lê ewle bin, bawerîyê pê bînin).¹⁶⁹

Dema ku xebera mirina Memê Alan digihîje Beglî, ew digel xortên di berfermana wî da dikevîne rê û dihêne bo tolvedana Memê Alan ev sahneya tolhildanê wiha ye:

Beglî emir da got: ‘ Li dora bajêr belav bin û qenc bikolin çeperane

Em ê heyfa Memî bistînin ji van bêbext û telaqreşane.’

¹⁶⁶ h.b.b.r.147.

¹⁶⁷ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r.52.

¹⁶⁸ h.b.b.r.147.

¹⁶⁹ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r.99.

...

Emir da eskerên xwe, got: ‘Herin, bi xar kin qesr û qonaxane.’

Sê roj û sê şevan di nav bajarê Cizîrê da bû axir dewrane

Ko kî di ber diketin dikuştin, di ber heyfa Memê Alan Padişahê Kurdane

Van her sê rojan, Mîr Ezîn, Mîr şem tevî her sê Celalîyane

Di çadîran da li cem Beglî girtî mane

Roja sisîyan, di nav Bajarê Cizîrê da xanîyê bilind qet ne mane

Giştik bi erdê ra dûz bûn bi destê xortên Kurdane

Beglî emir da leşkerane

Tev da bi der ketin ji bajarê Cizîra Botane

Hinga, Beglî da izna Mîr Ezîn, Mîr şem û her sê Celalîyane

Bajarê xan û xerabe teslîmê wan kir, hate ser tirba Memê Alane

Got: «Memo, bila di dilê te va eyan be, min heyfa te hilanî ji bêbextane»

Hinga, bi xwe siwar bû li Bozê Rewane, Leşkerê wî çadir bar kirin, meşyane

Berê xwe dane welatê Mixribîyane¹⁷⁰

Wekê ji van beytên li berjor jî dîyar e, Beglî tola Memê Alan vedaye û ji Cizîrîya ra ev yek nehiştîye. Tolhildan di tradîsyona miletan –bi taybetî jî di demên berê da- da cihê xwe girtîye û miletan ji neheqan ra ti caran tola xwe nehiştîye. Ji ber ku Memê Alan kesekî nîyazpak û qenc bû û bi neheqî hate jehrikirinê lewma Beglî jî hate û tola wî hilda anko ev tolhildane ne belasebeb qewimî. Beglî li gorî edet û toreyên xwe bi rê ve çû û heyfa heyî hilanî.

1.5.4. Di Destanê Da Bawerî

Bawerî, bi wateya xwe ya ferhengî ‘j’alîyê takekes an jî j’alîyê gel ve, qebûlkirina fikrînekê, dîyardeyekê, objeyekê û qebûlkirina rastîya heyberekê ye.¹⁷¹ Di dîrokê da hertim pêdivîya mirovan bi dînekê û bawerîyekê hebûye lewmanî hertim li dû dîn û bawerîyekê gerîyayne. Mirovan jîyana xwe li ser rengvedana dîn û bawerîyê ava kirine û li gor wê jîyana xwe bi rê ve birine. Di destana me ya dêrîn da jî bawerî ciheke taybet digre û mirovên di destanê da bawerîya xwe bi Xwedayê dînê îslamê dihînin. Di destanê da bawerîyeka xwirt a bo dînê îslamê heye.

Di destanê da bi pesindayîn qala dîn, kesayetên dînî/îslamî, mezhebî û motîfên mislimantîyê tê kirinê. Di destanê da cihên ku bi bawerîya îslamê ve têkildar in wiha ne:

¹⁷⁰ h.b.b.r.152-153.

¹⁷¹ Boratav, Pertev Naili, 100 Soruda Türk Folkloru, Weşanên Gerçek, Sal 1994, Sitenbol, r.7.

*Gawirê Rimêlê li miqabilê wan dibine misilmanane*¹⁷²

*Xwedê teala wê şîn bike warê windane*¹⁷³

*Ne jî, ji bona nimêjê dakete mizgeftane*¹⁷⁴

*Divê tu sibê zû min hişyar bikî, dema limêja şafîyane*¹⁷⁵

*Memî kire qirîn û ban kir ewlîyan û enbîyan û Emer beg, şêxê Qureyşîyane*¹⁷⁶

Ger mirov tenê li van hevokên di nava destanê da jî derbas dibe binêre, dê jê derxe ku mirovên di destanê da bawerîya xwe bi dînê îslamê anîne, kesên misilman in, şafîî ne û bawerîya wan ya li hemberî dînê wan xurt e.

Herwiha di destanê da yek ji dîyardeya bo dînî bêguman qurbandayîna bo Xwedê ye. Mirovên di destanê da ji ber ku kesên bawermend in lewma di rêya Xudê da qurbanan didine feqîr û jaran. Qurbandayîna wan ya ji bo di rêya Xudê da, rîtûeleka giring e û hêza bawerîya wan derdixe li pêş. Herwiha ger em bînine hizira xwe ku Memê Alan di xewna xwe da kalê xwe Emer Begê dibîne, di wê xewnê da Emer Beg mizgînîya axretê dide wî. Ev yek bêguman bawerî û dupata bo cîhana dî li nîşanî me dide.

1.6. Di Destanê Da Tîpolojîya Jinê

Yek ji giringtirîn kesayetên civakê bêguman jin in. Ji di her qada jîyanê da li ber çav in û cihê xwe di civakê da digrin. Jin û mêr her çiqas du hêmanên bingehîn ên civakê jî bin, bargiranîya civakê û mêrî hertim li ser piştê jinê ye. Ew ji aliyê fizîkê ve xwedan taybetiyên cihê ne. Di vê destana me da jî jinê cihê xwe yê taybet girtîye û li gorî hin taybetiyên xwe yên xweser têne beramberî me. Em ê niha li ser jinê û liv û tevgerên wê rawestin û li gor azmûgerîya xwe ji jêgirtinên nava destanê da, hilsengandinên xwe bikin.

Di destanê da sê jinên sereke der têne li pêşîya me yek ji wan Zîna Zêdan e, ya din Sitî ye û ya din jî Qîza Beko (Zîn) ye. Di destanê da lehenga herî ber bi çav Zîna Zêdan e. Ew qîza mîrekî ye, qelendîya mêrxasekê ye û herwiha hezkirina Memê Alan e. Zîn di nava destanê da bi piranî keseka girtî û mihafazakar e. Dema ku ew û Mem di şeveke xumam da j'alîyê perîyan ve têne li ba hev, Zîn mihafazakarî û girtîbûna xwe ji Memî ra wiha dibêje:

Got: "Dilê min li yan e, se cara li yan e!"

Emrê min, yemsîkê, sêzde ye, dikeve çardane

Ji roja ko ez ji dîya xwe re bûme, û heyânî roja îro, min nedîye rûyê zilama û xortane

*Şeva îşevê, tiştê di serê min de hatîye, bila nayê serê kesekî misilmane*¹⁷⁷

¹⁷² h.b.b.r.26.

¹⁷³ h.b.b.r.27.

¹⁷⁴ h.b.b.r.43.

¹⁷⁵ h.b.b.r.48

¹⁷⁶ h.b.b.r.132.

Zîn her çiqas keseka mihafazakar û girtî be jî carna derdikeve der sînoren vê mihafazakarîya xwe. Ji ber ku em dizanin ew keseka qelendî ye belam digel vê jî ti caran xwe ji heskirina Memê Alan nade li aliyekê. Mihafazakarîya xwe tenê ji bo Memê Alan pêpes dike. Dema ku Memê Alan ji bo dîtina wê dihête Cizîra Botan, ji bo dîtina wê ber bi Kanîya Qestelê ve diçe. Zîn digel ku keseka mihafazakar e jî û li ber çavê xelkê li ser kanîyê digel Memê Alan diaxive. Li ser nerevîna jinan li ber zilaman an jî suhbetkirina wan pirtûka qedîm a Bayezîdî tîne bîra me. Bayezîdî di pirtûka xwe ya qedîm da li ser vê yekê wiha dibêje: Waqî'a (bûyer) revîna ji mêran di nêv wan da adet nîn in. Jin û keçêd wan ji kesî narevin. Wekû milletê Efrencîye ew jî serbest in. Lakin bi wê ihtiqadê (bawerîyê) ko ew xirabîyê nakin. Îlla eger yekê ji wan şola xirab kirîn, çare nînin elbette wê dikujîn.¹⁷⁸ Wekê di van gotinan da jî baş tê xuyanê ku jina kurd keseka serbest e û wekê mêrên xwe bisteh digel mêrên bîyanî daxivin. Zîn jî heman wisa li ber çavê xelkê digel Memê Alan bi awayekî serbest diaxive, jê nareve an jî li ber wî şerm nake. Dema em bi giştî li lehenga Zîna Zêdan dinerin em dibînin ew keseka digel mihafazakarîya xwe evîndar e. Evîndarîya wê di asteka bilind da ye, ew piştî dîtina Memê Alan dibe hezkirîyê wî û heta ku ew tê reşan li xwe girêdide. Bi timî ji bo wî digrî, ji odeya xwe dernakeve, di nava huzneka giran da ye. Ew ewqas evîndar, dilsoz û sozdarê Memê Alan e ku ji bo wî dev ji qelendîyê xwe yê bi salan berdide. Ji bo ku bigihije Memê Alan hemû tiştan dide li ber xwe. Jixwe piştî mirina Memê Alan ew dikeve di nava êş û xemeke giran da, heta ku ew jî dimire.

Tîpolojîya din a jinê Sitî ye. Ew di nava destanê da keseka serbixwe ye, sama mêrê wê li ser wê heye û dema mêrê wê ne di mal da ye wekê mêrê xwe tevdigere. Dema em li destanê binerin em dibînin xofeka Hesên li ser Sitîyê heye ku ew jî di nava rûpelên destanê da wiha tê eşkere dibe:

Sitî bi xulkê Hesên qenc dizane

*Ji tirsan, nika bû bike şor û gotinane*¹⁷⁹

Di nava destanê da bi piranî Sitî keseka serbixwe ye û li gor wê tevdigere. Hindî ku mêrê wê li malê ye ew di haleka pasîf da ye lê dema ku mêrê wê ne li malê be ew dikeve şûna mêrê xwe û mala xwe bi rê ve dibe. Anku ew êdî dibe serdest û rêvebira mala xwe. Dema Memê Alan diçe mala Mîr Ezîn ji bo şahîyê xeberê nade Sitîyê, Sitî li hember vê yekê dibîne ku Memê Alan ne li holê ye tavilê bang li xulamên malê dike û emir dide wan ku ew li Memê Alan bigerin. Ev rola Sitîyê ji pirtûka Bayezîdî beşa li ser jinê tîne bîra me ku li wir da li ser rola jinê wiha dibêje: Ê jin û keçêd wan qewî şolker (çalak û sivikkar in) û cesûr û xweyî hiner in. Kulav û berr û xalî û têrran çêdikin. Ê malêd ko xulam tunînin hesêbeke (bihesibîne) xulamê malê jin in. Herçî şola malê bibe jin dikin. Heta hespêd mêrêd xwe jî, jin xweyî dikin. Mêr bi xeyrî şerî tev şolekî (karekî) qewî nabin (ji bilî şer zêde têkilî karekî din nabin). Bazar û dayin û istandin jî bi jinan dibin. Ê tenê meclîsê (civatê) û iqtiza bikitin (were xwestin) tevî şêwr û umûrî (kar û bar) dibin û kerem û ikrama xelqê dikin.¹⁸⁰ Sitî wekê

¹⁷⁷ h.b.b.r.35.

¹⁷⁸ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r.48.

¹⁷⁹ h.b.b.r.85.

¹⁸⁰ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r.48-49.

Bayezîdî taybetmedîyên jina kurd înyayê ziman, wesa ye. Dema mêrê wê ne li malê ye bargiranîya malê hemî li ser piştê wê ye. Mîna mêrê xwe malê bi rê ve dibe. Dema ku dizane Memê Alan emrê Xudê kirîye qîzên Cizîrê li dora xwe dicivîne, şîne girêdide. Ji bo ku xebera mirina Memê Alan bigihîje Hesên û birayên Hesên, nameyekê dinivîse û bi rêya Mîr Şem ji bo Hesên dişîne.

Di destanê da tîpolojîya din a jinê Qîza Bekoyê Ewan e. Ew ji bo ku bigihîje Memê Alan serî li her cure tiştên neqenc dide belam nikare serbîkeve. Qîza Beko di destanê da di tîpolojîyeka nebaş û xirab da tê li beramberî me. Ew di destanê da carna serî li qencîyê bide jî mebesta wê berjewendîyên wê ne.

Dema em li destanê da dinerin em dikarin li ser tîpolojîya jinên di destanê da li ser her yekê nîrxandin û hilsengandinên xwe bikin. Herçî Zîna Zêdan e, ew keseka mihafazakar û sozdar e bo Memê Alan, di destanê da her çiqas bi kesekî ra girêdayî be jî dev ji nerît û kevneşopîya bav û kalan bernade. Jixwe dema em gotin û dîyalogên wê yê di nava destanê dinerin em vê yekê dibînin. Herçî Sitî ye, ew keseka serbixwe ye di destanê da hindî ku mêrê wê li malê ye pasîf e anku bi girêdayî soza mêrê xwe ye û sadiq e. Belam dema ku mêrê wê ne li mal e ew hemû kar û barên malê digre ser milê xwe. Mîna rêveberekê tevdigere, dizane ku dê çawa li hemberî bûyerên heyî malê bi rê ve bibe. Û herçî ku Qîza Beko ye ew jî tam motîfa jina xirab dinimîne. Mîna bavê xwe li tiştên neqenc dinere, xirabî li ser lehenga wê rûniştîye. Bi giştî mirov dikare ji bo tîpolojîya jinên di destanê da diborin bibêje ku ew carna mîna serdestan tevdigerin carna mîna bindestan hereket dikin û carna jî di navbera van her duyan da tên û diçin.

1.7. Di Destanê Da Tîpolojîya Mêrî

Di civakê da yek ji kesayetên civakê pêk dihîne mêr e. Ew ji do heta îro li gor jinan zêdetir aktiftir û serdesttir in. Di destanê da jî ev serdestîya wan li ber çavan e. Jixwe dema em li navê destanê jî dinerin em vê serdestîya mêrî hê baştir dibînin. Her çiqas ev destan ji evîna du kesan pêk hatibe jî navê xwe ji kesekî mêr girtîye.

Dema em li destanê dinerin em dibînin her çî Memê Alan çî Hesên be, çî Beglî be, çî Mîr Ezîn be an jî her çî mêrên din ên di nava destanê da bin, li gor jinan serdesttir in, azadtir in. Mêr di nava destanê da dikevîne ser rêyan, dikevîne macerayan, dikevîne serencaman û tiştên bi vî rengî. Ti sînorekê dîyar li ber wan, li gorî jinan, nîne. Ger em li lehengê Memê Alan bînerin em ê vê yekê safitir bikin. Memê Alan li gorî Zîna Zêdan di destanê da aktiftir tevdigere. Yê ku dikeve macerayan ew e, yê ku ji bo berjewendîyên xwe derewan dike ew e yê ku dilhişk cardin ew e.

Ji ber ku em li ser yek bi yek lehengên mêr sekinîn lewma ne hewce ye ku em cardin heman tiştan rêz bikin û bi heman hilsengandinan ra bikevine dubareyan.

1.8. Di Destanê Da Civak

Yên ku civata heyî pêk dihînin mêr û jin in, em ê niha di sînoreke dîyarkirî de derbazî civaka ku di destanê de cih digre, bibin. Mebesta me ya di bin vê binbeşê de ji civakê hew ew e ku ka ev civakeke dayîksalarî ye yan bavîksalarî ye. Em ê hilsengandin û nîrxandinên xwe

di vê çarçoweyê de bikin. Berîya ku em derbazî vê krîtîka xwe bibin lazim e em pêşîyê pênase û pêzanînekê li ser dayîksalarî û bavîksalarîyê bidin.

Bêguman civak ji berê heta nûke li ser gelek nirx, edet, nerît, ol, lehengî û h.w.d pêk hatîye. Her civak curerengê pêk tîne, berdewamîya hebûna xwe li gor reaksiyon û guherînên cuda dijî. Mirov dikare civatan wekî civakên cotkarîyê (çandinî), civakên endustrîyel, civakên agahîjêgirtinê û h.w.d bibîne. Lê belê her çiqas çend cure civak hebin jî bi me civat di destanan de ji du civakên sereke pêk tî. Ya pêşî civaka dayîksalarî ye û ya din jî civaka bavîksalarî ye. Baş e civaka dayîksalarî çî ye û mebest jê çî ye? Dayîksalarî di civakê de rola serdest ya jinê bi taybetî ya maderê ye. Matriarka an jî dayîksalarî ew binavkirina ku ji cureyek pergali ya rêxistina civakî ye. Bingeha vê pergale ji fikra serdestîya jinê pêk tê; famîlya (binyat) j'aliyê jinan ve tê dîyarkirinê, serwerî di destê jinan de ye. Di van civakan de ji mêran bêtir hurmet ji jinan re tê nîşandanê. Di çarçoweya prensîba serdestîya jinê de, çanda civakê, edetên wê, bawerî û mîtolojîya wê, ji civaka bavîksalarî cîyawaztir teşeyekê digre.¹⁸¹ Piştî agahîyên li ser civaka dayîksalarîyê niha em ê bi mînakên derbazî vê civakê bibin.

Em ê niha li ser hin pasajên di destanê da rawestin, pêşîyê wan wekê mînakê bidin dûvra em ê li ser wan hilsengandinên xwe bikin:

Herin, ji min ra bicivînî qîzên began û axan û giregirane

Bila nemînî, werine vir, îro şeş meh in ko derneketime ger û seyranane

Dilê min heye ko herime ser kanîya Qestelê, û vexwim ji ava gulane

Hinekî bigerim li ser mêrg û çayîrane¹⁸²

...

Her sê Celalîyan dest avêtin qevdê şûrane

Zîne dît ko îş î xerab e, rabû pêşî wane

Got: ‘‘Hesen ez ketime bextê we mêrane

Mem cû ji kîsê min, carê jî dilê min meşewitînî bi xwîna birane

Hon dizanî ko Mîr Ezîn li şûna heft ocaxan e

Dîsa sûcê wî tune di van tiştane

Ev bela han gişkî anî serê me Bekoyê Awane

Mem şehîd bû û mir bi axuya ko qîza Beko kiri bû hinarane

Ez jî wê bimrim piştî Memî bi heft rojane.’’

¹⁸¹ <https://tr.m.wikipedia.org/wiki/Anaerkillik>.

¹⁸² h.b.b.r.74.

Tacîn û Çeko rahiştine milê Hesên ji bo reca Zînê, ber ve zindanê birin û gotin: ‘‘Hesên, Mem î li vir e, va zindan e.’’¹⁸³

Ger em li van beytên li jor binerîn em ê bi rehetî bikarin bibêjin ku di van beytan da em li rastî serdestîya jinê tî. Ji ber ku ya ku nîrx tê dayînê jin e, ya ku rêz lê tê girtinê jin e, ya ku şeran bi dawî dike, ya ku daxwazan bi cih tîne jin e û ya ku aqilmend cardin jin e. Piştî van hilsengandinên xwe lazim e em pirtûka qedîm a Bayezîdî binerîn ka li wir da li ser jinê çî gotîye. Di wê pirtûka qedîm a Bayezîdî da beşek li ser qedrê jinê ya di civaka kurdî da heye li wir da wiha dibêje: Lakin jin di nêva wan da murexxes in (destûra wan heye, kes nêzîkî wan nabe, serbest in). Ew destê xwe li jinan hilnagrîn û ‘edawetê (dijminahîyê) digel jinan nakin û qewî zêde xatira jinan (di) çav ra dikin. Jin biçe rica xûnê jî, dibexşin.¹⁸⁴ Wekê gotinên Bayezîdî jin di nava civaka kurdan da xwedan ciheka giring in, ew qîmetê dibînin. Ger em li van beytên li berjor da jî û di gelek cihan da binerîn em ê bibînin ku jin li gorî mêran serwertir tevgerîyane.

Piştî van mînak û hilsengandinên li ser civaka dayîksalarîyê em ê niha derbasî civaka bavîksalarîyê bibin. Ji bo derbasbûna li ser wê jî lazim e em civaka paderşahîyê û taybetmendîyên wê bizanin. Bavîksalarîtî, cureyek ji pergalên rêxistina civakê ye ku xwe dispêre desthilatdarîya mêrî. Bingeha vê pergalê jî fikra serwerîya mêrî pêk tê; famîlya (binyat) j’alîyê mêran ve tê diyarkirinê, serwerî di destê mêran de ye. Di van civakan da ji jinan bêtir hurmet ji mêran ra tê nîşandanê. Di çarçoweya prensîba serdestîya mêrî de, çanda civakê, edetên wê, bawerî û mîtolojîya wê, ji civaka dayîksalarî cîyawaztir teşeyekê digre.¹⁸⁵

Di destanê da bêguman wekî mînakên civaka dayîksalarîyê herwiha mînakên bavîksalarîyê jî cih digrin. Ew mînakên ku di destanê da cih digrin wiha ne:

Gotê: ‘‘ Min jî nezanî kire qisûr, qisûr efa mêran e

Tu kira min bidî lingane.’’¹⁸⁶

...

Bajarê me îro bûye sê bendane

Bendek, ya kurên Mîr Tacîn in, ev bend tê pê ji ticarane

Bendek, ya kurên Mîr Celal in, Hesên, Çeko û Qeretacîn serekê diz û eşqîyane

Benda sisîyan, ya kueê mîr Zengîn, mîrê Cizîra Botan e

Ev benda hana hemî mezin û beg û axa û zana ne

Serekê van her sê bendan ji bavekî ne, hîn tu bav ne ketine nava wane¹⁸⁷

¹⁸³ h.b.b.r.149.

¹⁸⁴ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r.58.

¹⁸⁵ <https://tr.m.wikipedia.org/wiki/Ataerkillik>.

¹⁸⁶ h.b.b.r.40.

¹⁸⁷ h.b.b.r.54.

...

Ma ev nizane ko ez jinek im, tu caran jin nagerin li welatan, li pê mêrane

*Adetê dinê ew e ko mêr digerin li pê jinane*¹⁸⁸

Di van beytên li jor da em dibînin ku yê ku serwer e, yê ku rêvebir e û yê ku efûkir mêr e. Di van beytan da taybetîyên baviksalarîyê dîyar û ber bi çav in. Hemî tişt li gorî wê serwerîya mêrî bi rê ve diçe.

Ger em bi giştî li destanê binerin em ê bibînin ku him ji bo civaka dayîksalarîyê him jî ji bo civaka pedersahtîyê mînak hene. Ger zîqbûna mirovî li ser pergala dayîksalarîyê be hew dê bikare li ser wê mînakan peyda bike belam di heman demê da zîqbûna mirovî li ser pergala baviksalarîyê be dê karibe li ser baviksalarîyê mînakan bibîne.

1.9. Bûyerên Derasayî

Di destanê da bûyerên balkêş û derasayî zaf hene lê belê li gor me bûyera herî derasayî û ya ku ji bûyerên din balkêştir xewna Memê Alan e. Xewn di warê mîtolojî û derasayîyê da cihek zaf giring digre. Ji destpêka mirovahîyê heya niha mirov tim li dû şîroveyên xewnên xwe û wateyên wan yên sembolîk gerîyane. Li ser xewnê lêkolîner Doğan Kaya wiha gotîye: Motîfa xewnê; di cureyên mîna destan, çîrokên gelêrî û efsaneyan da derdikeve li pêş me û der barê bûyînên dahatûyê da nîşaneyan dide.¹⁸⁹

Bêguman xewna Memê Alan bi têra xwe balkêş û derhişî ye. Memê Alan j'aliyê Bekoyê Ewan û Mîr Ezîn va bi awayekî bêbextane tête zindanîkirinê. Zindan ji wî ra dibe cihê lêhûrbûna li ser jîyana wî û hin tiştên din. Dema ku di zindanê da ye xewneke ecêb dibîne û diçe warê mirîyan. Çima me di vir da got çûye warê mirîyan? Ji ber ku em dizanin di destanê da dema ku bavê Memî dê bizewice di temenekî mezin da ye (şêst û pênc salî ye). Piştî ku dizewice jî Mem çêdibe û nêzî çarde panzde salîya xwe berê xwe dide Cizîra Botan. Anku bavê wî di temenekî zaf mezin da ye. Em dizanin ku yê tê xewna Memê Alan Kalê Memî ye yanî Şêxê Qureyşîyan e. Di destanê da li ser vî kesayetê xumam tişteke nehatîye gotinê em hew dizanin ew kalê Memî ye û tê xewna wî û tiştên dê bêne serê wî ji wî ra dibêje. Lewma bi me hebûna vî kesî û hebûna van tiştên xumam û muxlaq wê yekê nîşanî me dide ku Memê Alan – di xewnê da be jî – rêwîngtîyek ber bi warê mirîyan ve kirîye û li wir şîret li wî hatine kirine. Li wir ji wî ra qala mirina wî, ka dê çawa bimre û qala mirina hezkirîya wî jî jê ra hatîye gotinê. Herwiha kalê wî ji wî xwastîye ku ew hinara ku tê da jehr heye lazim e wê hinarê bixwe. Memê Alan piştî xewnê li ser xwe ve tê, di zindanê da bi Zînê ra hevdişîyê dibîne, xewna xwe jê ra dibêje û yên ku dê bêne serê wan dibêje. Piştî vê yekê wê hinarê dixwe û jîyana wî tamam dibe. Di vê xewnê da mizgînîya roja axretê li Memê Alan dihête kirinê. Mirov dikare bibêje ku ev yek herwiha sembola bawerîya cihaneka din e jî.

¹⁸⁸ h.b.b.r.70.

¹⁸⁹ Kaya, Doğan, Anksilopedik Türk Halk Edebiyatı Terimler Sözlüğü, Weşanên Akçağ, Ankara 2007, r.621.

2. Analîza Lehengan

Em ê di bin vî sernavî da li ser lehengên çalak û giring ên ku di destanê da diborin rawestin. Lehengên ku em ê li ser rawestin wiha ne: Memê Alan – ku di bin vî sernavî da jî em ê li ser lehengîyên Memê Alan, aqilmediya Memê Alan, evîndariya Memê Alan û hin taybetmendîyên din ên Memê Alan bisekin-, Zîna Zêdan – ku di bin vî sernavî da jî em li ser evîndariya Zîna Zêdan, aqilmediya Zîna Zêdan, evîndariya Zîna Zêdan û hin taybetmendîyên din ên Zîna Zêdan rawestin-, Bekoyê Ewan, Lehengên Din ên Destanê [ku di bin vî sernavî da jî em ê li ser hevreyên Memê Alan -ên mîna her sê Celalî Hesên, Çeko, Qeretacîn û Beglî, rawestin, dûvra em ê li ser Mîr Ezîn, Sîtiya Zêdan, Qîza Beko û Şivan bisekinin] û Lehengên Mîtolojîk (ku di bin vî sernavî da jî em ê li ser Xocê Xidir, Her Sê Qîzên Padîşahê Perîyan û Bozê Rewan rawestin). Herwiha em ê li ser du simbolên giring ên derasayî jî di bin vî sernavê da li piştî lehengên mîtolojîk, rawestin.

2.1. Memê Alan

Lehengê me yê vî destana tekûz ku navê xwe jî daye destanê, Memê Alan e. Di destana xwe da em ê li gorî kronolojîyê herin û hilsengandinên xwe jî di vî çarçoveyê da pêk bînin. Destana me bi şayesandina bajêrê Mixribê dest pê dike û tê da qala serweriya Elî Begê, Emer Begê û Elmaz Begê dike. Em ji destpêkê da têdigihin ku ev her sê birayên dewlemend û serwer xudan dunde nînin. Digel ku temenê wan mezin e û ewqas dewlemend in jî mixabin yek ji wan heta wê gavê jî nezewicîye. Ji ber vî di nava reşbînîyeke mezin da, di Eyda Qurbanê da berê xwe didin çol û kerbelayan. Ew her sê bira li wir ji ber derd û kulên xwe ji hev ra bi awayekî dilsojane diaxivin. Tirsê wan ya mezin ew e ku ew rojekê bimirin û mal û milkê wan ji bîyanî û mîratçîyan ra bimîne. Di wê navê da em dibînin Xoce Xidir di nava wê reşbînîya wan da digihije wan û sêvekê dide birayê mezin Elî Beg. Piştî dayîna sêvê ji wan birayan ra wiha dibêje:

Digo: Gelî bira, megrîn! Rebê alemê delîlê heyîrîyane

Îro roja Eyda Qurbanê ye, we dev ji qonaxa xwe berdane

Gerek zilamê mîna we vekirana devê xezîne û defîne giran e

Û pere birijandana, gelî bira, li zikaka û li ewcane

Ji bona feqîr û foqrane

Nefsa ko birçî be, gerek we têr bikira û zilamê ko tazî be gerek we bilîbs bikir

Hûn hatine, ketine çol û kerbelane

We li xwe kirîye cilê derwêşane

De, rabin, berê xwe bidin bajarê Mixribê û qonaxê xwe nê giran e

Pere birijînin li zikaka û li ewcane

Serjêbikin qurbanan û dehîyane

Ji bona xatirê feqîr û foqrane

Berê xwe bidin Mihela Qureyşîyane

Ji Elî Begê ra bixwazin qîza Mîrê Qureyşîya, bi qewlê eshabane

Qelenê wê bidin diwazde qirûş û nîvane

Îşelleh, neh meh û neh roj û neh saet û neh deqîqa wextê qedîyane

Xwedê teala wê şîn bike warê windane

*Tenbîya min li we be, tu nava lê mekin, heyanî go ez li we bibim beyane.*¹⁹⁰

Piştî van şîretan, her sê bira gotinên Xoce Xidir bi cî tînin û Elî Begê dizewice. Li dû zewca Elî Begê zarok jê ra çêdibe û ji bo navdayînê jî Xoce Xidir tê û navê Memê Alan lê dike û diçe. Destana me jî bi vî awayê dest pê dike û li gor rêzebûyerên xwe diherike.

Em ê niha li gor liv û tevgerên Memê Alan yên di nava destanê da diborin, bi girêdayî lehengî, aqilmendî, evîndarî û hin taybetîyên wî yên din (çi erênî be çi nerênî be) bi mînakdayîn û jêgirtinên di destanê da, li ser wan rawestin û hilsengandinên xwe bikin.

2.1.1. Lehengîyên Memê Alan

Evîndarê mezin Memê Alan di şert û mercên derasayî da tê dine. Ew ji ber ku tekaneyê malê ye lewma serwerîya bajarê Mixribê ji wî ra dimîne. Ew bi ilm û zanîneke bêhempa mezin dibe, her gotina wî j' alîyê malbata wî ve dihête cih. Nêzî hezar û pênc sed xortên kurdan ji wî ra dibin xulam û leşker. Serê van leşkeran jî Beglî ye ku ew tim li ber fermana Memê Alan amade ye.

Destana Memê Alan bi têra xwe destanekî derasayî û mîtolojîk e. Di şeveke ji rêzê da keçên Mîrê Cinan, Zînê ji bajarê Cizîrê radikîn tînin koşka Memî, daxwaza wan ew e ku Memê Alanê çeleng û Zînan Zêdana delal hev bibînin. Dema Zîn û Mem çav bi hevdu dikevin, ew her du dikevîne di nava suhbeteke kûr da, Mem dema behsê xwe dike ji Zînê ra wiha dibêje:

Ez hikimê sed û yek salan didime wane

Emran didime qereqol û bekçîyane

Singiwan dixine serê tîfîngane

Quntaxên tîfîngan berdidin erdê, pêşîya lingane

Ew her diwanzde ode mexsûsî van celeb merîyan e

Di qata ortê da rûdinin derebegî û mezinên kurdane

Di qata sisîyan da rûdinin xortên wekî min, salê wan sêzde ne, hîn

¹⁹⁰Lescot, Roger, Memê Alan, Weşanên Avesta, çapa 3.r.26-27.

nuh pêkirine çardane.

Hemî dixwînin li ser mielimane

Êdî navkêlên wan diêşin li ser text û kursîyane

Enîşkên wan gî kul bûne, hingî ko didine ser textane

Di nav tilîyên wan da dibe çirkeçirka serê qelemane

Ji tirsî min newêrin serên xwe rakin ji kitêbane

Herçi xortên mezin mijûl dibin bi doz û dehwanê

Dirêjîya royê, karê wan rakirin û danîna ewraqan e

Min di qata qonaxê a jorîn da danîye textekî zêrîn, bi çar lingane

Di her çar gûçên wî da danîne kevîrên elmas ên giranbihane

Hezar û pênc sed xortên delenbegîya

timam bi min re sidqane can bi cane

Saet ji mixrib heyânî sibehê singîwa davên devên tifmgane

Li dora daîrê min ê belek, dibe tîqîna harîsa û beqçîyane¹⁹¹

Ji van beytên li jor jî dîyar e ku Memê Alan kesekî xudan serwerî ye. Zaf xortên kurdan di bin sîwana wî da ne. Ew lehengekî xudaxof e li ser xelkê, hemû kes bi gotina wî radibe û rûdinê, tirsî wî ji ti kesî nîne. Kesekî emirdar e, ji bo ko Zîn bizane ew kesekî ne ji rêzê ye, ew bi berfirehî qala xwe û kirinên xwe dike. Memê Alan wekî ku xwe çawa bi lêv kiribe, wesa ye.

Piştî Memê Alan û Zîna Zêdan hev dibînin aşiqê hev dibin, êdî Mem ji bilî Zîna Zêdan ne tişekî ne jî kesekî difikire. Ew dixwaze êdî here bajarê Cizîrê û bi Zîna Zêdan ra bibe yek. Lê malbata wî ji bo ku wî ji vê fikra wî bi dûr bixe hemû tiştan dike. Memê Alan li ser fikra çûyîna xwe micid e û naxwaze jê vegere. Dawîyê bav û kokimên apan yên Memî ji wî ra wiha dibêjin:

Gotin: ‘Eman, Memo, tu çi dikî? Bê te nîne tu hevîya me her çarane.

Were, guh bide me, mekeve ber bayê xewneke şevane

Ewa ko şeva çûnî li te bûye mêvane

Ew şeytan e, dikeve şiklê qîzane

Dikene bi kal û xortane

¹⁹¹ h.b.b.r.37-38.

Ji bona xewneke şevan, me giştikan mexîne şîn û yesane

Meêşîne dilê dost û xêrxazane

*Mekenîne devê neyar û dijminane*¹⁹²

Bavê Memî bi van gotinan dixwaze digel birayên xwe wî ji vê rêyê û ji sewdayê vegeşîne. Ji ber ku ji bilî Memê Alan tu kesê wan tine ku li mal û milkê wan bibe xwedî û li ser wan raweste. Her çiqas bi van gotinan dixwazin Memê Alan ji çûyîne vegeşînin jî lê belê Memê Alan êdî biryara xwe daye û ji wan ra wiha dibêje:

Memî got: ‘Bavo, ji xwe ra mekin gunehane

Hon li rûyê min disekinîn, bi xatûnan ra dibêjîn: ‘Va şeytan e!’

Di hundirê min da çêbûye derdekî mezin û kuleke girane

Rehên canê mîn sist bûne di qotê serî da, heya binê lingane

Di hinavê min da vêketîye arê darane

Rivên û pêlî davêjê taqê ezmanê heftane

Dermanê min tune li bajarê Mixribîyane

Dermanê min pir î dûr e, li bajarê Cizîra Botan

Tasek ava Kanyia Qestelê, li ser destê Zîna Zêdan

Wê ji min ra bibe hekîm û dermane.

*Honê li min helal bikin şîrê bera, û êmegê gane*¹⁹³

Mem ji van gotinên jî dîyar e ji ya xwe nayê xwarê û bavê wî jî digel apên wî ti serederîyê nikarin bi Memo bikin. Li hember van gotinên Memî bavê wî bi neçarî serê xwe diçemîne. Ev der tişteke gellek ‘ecêb derdixe holê ku di nava ‘edet û nerîtên kurdan de lihemberderketina gotin û kirinên bavî li cem Kurdan hema hema bêje -ji bo wê demê bi taybet- qet tine. Lê wekî ku Michael L. Chyet jî tîne ziman : ‘...dijî desthilata bavê xwe derdikeve.’¹⁹⁴ Ev yek him li cem kurdan –lihemberderketina gotin û desthilata bavî- tişteki ‘eyb û nedîtîye him jî bi xwe tişteke nû ye. Em dikarin van gotinên Memî û kirinên wî wek lehengîyeke mezin binirxînin. Ji ber ku Mem ji bo evîna xwe di nava lehengîyeke mezin da ye, ew ji ber Zîna Zêdan him dev ji dê û bavên xwe berdide him jî dev ji desthilatdariya xwe berdide. Destjêberdana van hemû tiştan asta lehengîya Memî bo evîna xwe nîşanî me dide ku mirov dikare bibêje di nava destanê da ev lehengîya Memî ya yekem e.

¹⁹² h.b.b.r.45.

¹⁹³ h.b.b.r.45.

¹⁹⁴ Chyet, Michael L., Mem û Zîn, Çira, Kovara Kulturî ya komelaya nivîskarên kurd li Swêdê, Sal 2, Hejmar 7, Payiz 1996, r.28-33.

Memê Alan ku li Mixribê mezin bûye û heta mezin bûye jî li wir maye ji bo evîna xwe warê xwe diterikîne û berê xwe dide xerîbistanê. Xerîbistana li hember wî bi tîra xwe talûke û xeternak e lê ew heta mirina xwe jî dide ber çavê xwe û diçe. Piştî ku ji hin xeternakîyan rizgar dibe, li gor şîretên Qîza Beko berê xwe dide mala her sê Celalîyan. Ji ber ku ew dizane tekane rêya çareserîya vê girftara evîna wî, dê ew Celalî çareser bikin.

Mem dema diçe li wir digel ku dizane Zîna Zêdan qelendiya Çeko ye jî dîsa dev ji wê bernade û hemû talûkeyan dide li ber çavê xwe. Piştî hatina Memo bi çend rojan seferek bo ser eceman çêdibe, Cizîrî û Mem jî di nav da berê xwe dide seferê. Lê ji ber ku Memê Alan dizane Cizîrê tu kes nemaye û Zîna Zêdan jî tenê ye lewma xwe birîndar dike û bi fermana Mîr Ezîn vedigere bajêr. Rasterast berê xwe dide qonaxa Mîr li ba Zînê. Dema ew û Zîn di nava suhbata dilan da ne, ji nişkê da Beko û Mîr Ezîn tene ba wan. Mem tavil Zînê dixwe bin ebayê xwe da û li ber Mîrî ranabe û di cihê xwe da nalive. Mîr li hember vê yekê hêrs dibe belam Memê Alan ne mêrekî dera hanê ye, li ber mîr nagere û wiha lê bêminetane vedigere:

Memî got: ‘‘ Mîro dilê min î liyan e!

Ez dinhêrim gotinên te ne gotinên hakim û mîrane

Şertê merî hakim ne wisan e

Berê dipirsin sebebe tiştan e

Paşê hinga gotina xwe dikin bi adet û qanûna welatan e

Berê bipirse balo ez çewa hatime van der û cihan e!¹⁹⁵

Mem digel ku mîr tê hundir jî li ber wî ranabe, ew di cihê xwe da nalive. Ev yek tabî ne li gor rê û rismên kurdan e. Heke kesek temenmezin bihê kesê temenpiçûk li hember hatina wî wek sembola rêzgirtinê li ber wî radibe ser pîyan. Lê Memê Alan ranabe û di cihê xwe da nalive. Li ser vê yekê Michael L. Chyet wiha dibêje: ‘‘Xortên gundên Kurdistanê newêrin bi axayan re bikin, wek Mem bi mîr re dike. Qey kê dît û bihîst ku xortek ranabe ser xwe, gava ku kalek an axayek dikeve odê?’’¹⁹⁶ Wekî ku Chyet jî îfade kirîye Mem li dijî ‘edetên bapîran derdikeve, Mem li hember ‘edetên yekî serhildêr e. Ya ku xortên kurdan dikin û wekî ‘edet dibînin li cem Memê Alan tiştêkî ne ewqas giring e. Herwiha divê em xwe li vir bispêrin kitêba dêrîn a Bayezîdî. Memê Alan ji ber ku kesekî leheng e û ji gotina xwe ya heq bi paş ve venagere lewra bi mîrxasane tevdigere. Bayezîdî li ser mêranîya kurdan wiha dibêje: ‘‘Û di xebardan û cewabê da bê perwa dibin (bêtirs û bê hayjêkirin). Hakim bit jî elbette cewaba heq dibêjin û natirsin. Bilanî ewî te’zîr (işkençe) jî bikin. Elbette wê cewabê dê bibêjîtin. Di xebardanê (de) xweyî cesaret in. Eger bibine kuştinên jî dîsanî jî xemê nînin. Yanî bi rastî jî kuştinê wekû milelêd (miletên, gelên) mayî ji kuştinê natirsin û dilê in.’’¹⁹⁷

¹⁹⁵ h.b.b.r.126.

¹⁹⁶ b.n.b, Chyet, Michael L,r.28-29.

¹⁹⁷ Bayezîdî, Mela Mehmûdê, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, Ravekirin, tîpguhêzî û lêkolîn Jan Dost Weşanên Nûbihar, İstanbul 2012, r.63.

Mem li hember Mîrê Cizîra Botan û Bekoyê Ewan serî naçemîne û li hember wan gotinên xwe dibêje. Digel ku ew di mala Mîr da ye jî û Celalî ne li ba wî ne jî, ew netirs e û kesekî wêrek e. Wêrekî û lehengîya wî tenê bi van gotinan naqede herwiha ew di sahneyeka din a li hemberî mîr da xwe bi xwe amadekarîyên xwe dike û dîmenek wiha tê beramberî me:

Rûhê ko Xwedê dayî, wê carê here, û îro çêtir e ji hemî rojane.

Nihêri ko Mîr Ezîn û Beko jî di wê fikrê da ne

Destên xwe birine ser qevdên şûrane

Memî jî bi destê çepê rahişte porê Zînê di bin hewranî da, qeterê gulîyane

Bi destê rastê, rahişte qevdê şûr û rabû ser her du çongane.¹⁹⁸

Mem lehengîya xwe li hemberî Mîr bi tena serê xwe digel dayîna talûkeyan li ber çavên xwe didomîne. Ew amade ye ku şerê mîr û yên derdora wî bike. Destê wî li ser şûrê Lahor e, bi dilêrî, li hember mîr û yên derdora wî disekine. Ev yek lehengîya Memo û dilwêrekîya wî nîşanî me dide.

Memê Alanê dilêrîya xwe li hemberî Mîr Ezîn didomîne. Dema ku Zîna Zêdan bi awayekê rizgar dibe di bin ebayê Memî da, Beko wan dibîne û dike qêrîn. Mîr bi qêrînê vedigere û li hember Memî şûrê xwe dikşîne. Mem li hember vê yekê bêdeng namîne û ew jî bi şûrê xwe tê pêşberî Mîr, ne ji xwe ne jî ji mirina xwe ditirse. Bi awayekî lehengane li hemberî mîr radiweste. Piştî Hesenê Celalî tê mesele di serê Mîr Ezîn da çareser dike, hingê mîr şûrê xwe dixwe qalanê. Memê Alan hetta ku mîr şûrê xwe nexwe qalanê, ew jî şûrê xwe naxe qalanê. Ji ber ku ew dilêr e û ji tu kesî natirse. Amadeyî hemû tiştên nerênî ye.

Memê Alan çawa dibihîze kurê Hesen di nava mala ku agir pê ketîye da ye, qet natirse û sahneyek wiha diqewime:

Memî zani bû ko ev giştik di rûyê wî û Zînê da ne

Memî kire qirîn û ban kir ewlîyan û enbîyan û Emer beg, şêxê Qureyşîyane

Hema xwe avête nav arê darane

*Di nava êr da demekê gerîya, paşê bi der ket, ko kurê Hesen di desta da ne
Tiştêk pê ne bûye, û ne şewitîye heta bi cil û paçane*

Rakir da dest Sîfîyê, got: Xwîşka min, ha ji te ra kurê te wî han e¹⁹⁹

Mem, li hember zehmetîyan sîngê xwe datîne û xwe davêje, di nava êgir da ji bo xilaskirina kurê Hesen. Li vir da Mem ji kirina xwe hayedar e û dizane ku lawik ji ber wî avêtine di nava êgir da. Memê Alan li hember vê yekê bêyî ku bikeve teredutê xwe davêje nava agirî û lawê wan ji mirinê xilas dike. Ev yek him asta lehengî û dilêrîya Memê Alan şanî me dide him jî naxwaze ji ber wî tiştêk bi yekî bê. Ji ber wê mirina xwe jî dide ber çavan

¹⁹⁸ h.b.b.r.127.

¹⁹⁹ h.b.b.r.130.

û xwe bêyî tirs xwe davêje nava agirî. Lehengîyên wî li vir naqedin ew dixwaze qonaxa şewitî ya Celalîyan bi kîsê xwe ji nû ve ava bike. Bi can û dil vê yekê dixwaze lê Hesên vê daxwaza wî red dike.

Memê Alan di mînakên li jor jî dîyar e kesekî dilêr, wêrek û mêrxas e. Ew ti caran ne ji mirinê ditirse ne jî xwe ji ber talûkeyan dide alîyekê. Dema em vê destana xwe ya tekûz binêrin em dikarin bi rehetî hilsengînin ku Memê Alan kesekî ne ji rêzê ye, ew ji bo evîna xwe û hevrêyên xwe, xwe dide ber zehmetîyan. Ew li hember nerîtên berê yên feodal kesekî nûjen e û bi mêrxasane li hember van yekan radiweste. Li dijî wan derdikeve.

2.1.2. Aqilmendîya Memê Alan

Memê Alan di nava destanê da kesekî pirhêl e, ew digel lehengîyên xwe bi aqilmendîya xwe jî tê pêşberî me. Dema em li destanê dinerin, di tengasîyê da ew li gor hişmendîya xwe tevdigere û ji nav wan tengasîyan bi hişmendîyane rizgar dibe. Em ê niha li ser liv û tevgerên wî yên hişmendane rawistin û hilsenganên xwe li gor jêgirtên di nava destanê da bikin.

Di destana me ya tekûz da aqilmendîyên Memê Alan zaf cî digrin. Em dibînin dema Mem mezin bûye, tim behsê cenawirekî di nava behrê da tê kirinê ko ev cenawir dişibe hespekî. Tabî ev hesp jî Bozê Rewan e ku dê di vê serpêhatîya Memê Alan da ji wî ra him bibe hespek him jî bibe hevrêyek. Di destpêka destanê da gellek caran dixwazin Bozê Rewan ji nava avê derxin belam ti kes nikare derxe. Beglî tê li ba Memo, Memo ji ber ku dizane ew jî nikare derxe lewma di destanê da sahneyek wiha tê pêşberî me:

Memî bi Beglî ra xeber şande ji xalê xwe Emer begî ra hat tevî kalane

Beglî hat tevî hezar û pênc sed xortê kurdan, xwe dane benane

Ben kişandin, bû hufehufê pêlan û çikeçirkê ben û şîrîtane

Bi der ket binanîyê torane

Dîtin ku di şebekê toran da, cenawerek dixewîne, di şiklê hespan e²⁰⁰

Memo baqilane tevdigere û gazî xalê xwe dike da ku ew Bozê Rewan ji nava behrê derxin. Ji ber ku ew dizane kesên li derdorê nikarin Bozê Rewan derxin lewma gazî xalê xwe dike. Li vir da em dibînin ku Memo hay ji hêza xwe û hevalên derdora xwe heye. Lewma gazî xalê xwe dike ku ev yek baqilane tevgerîna Memê Alan nîşan dide. Ew piştî anîna Bozê Rewan jî ji bo kedîkirina Bozê Rewan jî cardin berê xwe dide xalê xwe. Lewma ew dizane çare û dermanê vê yekê xalê wî ye.

Memê Alan piştî ku berê xwe dide bajarê Cizîra Botan, di ser rêya wî da Xoce Xidir tê beramberî wî. Xoce Xidir piştî ku Memê Alan heta ber bi Cizîrê ve tîne li wir çend şîretan Memo dike. Memo guh dide van şîretên Xoce Xidir û li gor wan şîretan tevdigere. Dema ku tê ber robarekê dixwaze ji wir derbaz bibe lê ji ber ku cihê kûr û cihê tenik yê avê nizane ku der e lewma dikeve şîkê. Qîza Beko bi fêl û hîlan tê beramberî wî û dixwaze wî bixapîne û

²⁰⁰ h.b.b.r.30.

xwe wekî Zîna Zêdan nîşan dide. Lê Memê Alan baqilane tevdigere û guh nade wê. Ew ji ber ku nikare Memê Alan bixapîne lewma dixwaze wî di cihê kûr ê robarokê de derbaz bike. Memê Alan bi awayekê ji wê dûr dikeve û ji wê naxape. Piştî ku ji wê dûr dikeve bi arîkarîya şivanekî derbazî alîyê din ê avê bibe. Lê Qîza Beko dev ji wî bernade û dixwaze belayekê bîne serê wî. Lê Memê Alan bi tu awayê bi wê naxape. Qîza Beko ji ber ku nikare bi aqilê Memî lewma dixwaze sozekê ji wî bistîne ku heke ew Zîna Zêdan bibe, piştî wê, wê jî bi xwe ra bibe. Mem li hember vê yekê jî baqilane tevdigere û soz didê. Wêca Qîza Beko piştî sozgirtinê dest bi şîretan li wî dike ku ev şîretên Qîza Beko dibe sedemê rizgarîya Memî ji hin tiştan. Mem li hember vê yekê jî bo ku ji wê dûr bikeve wiha dibêje:

Memî got: ‘Kelîşo, pîroz bin hezar carî li te û xwedîyane.

Ko ez Zînê bînim, tew metirse, ez ê te jî bavêjime terkîya Bozê Rewane

Heywan hespê behrê ye, wê rake me her sîyane.’

Di wir da xatir xwest ji qîza Bekoyê şeytane²⁰¹

Memê Alan bi fêlbazî û hişmendîyane li himberî Qîza Beko tevdigere ku ev yek dibe him sedemê rizgarîya ji destê wê him jî dibe sedem ku ew ji destê Bekoyê Ewan rizgar bibe. Ji ber ku Bekoyê Ewan pîlanên namerdane ji bo Memo pêk anîbûn lewma bi arîkarîya Qîza Beko û hişmendîya Memî nebûya ne pêkan bû ko ew ji destê Beko bifilite.

Memê Alan piştî ku tê mala Celalîyan êdî ew dibe kesek bêdeng û li bendê ye ku Celalî bîn û ligel wî baxivin da ku derd û kulên dilê wî bipirsin û jê ra bibin derman. Piştî sê rojan Mem dibe mêvan, êdî Hesênê birayê mezin ê Celalîyan tê digel Memê Alan diaxive dixwaze derdê dilê wî hîn bibe. Memê Alan ji ber ku dizane Zîna Zêdan qelendîya Çeko ye lewma di carekê da ji Hesên ra derdê dilê xwe nabêje. Bi gotinên xwe yên nejrêzê û giranbiha dixwaze Hesên merema dilê wî bielime. Belam Hesên ji van gotinên wî ténagehe û di dawîyê da Memê Alan bi gotineke beraqilî ji wî ra wiha dibêje:

Gotê : ‘Ez ketime bextê te û birane

Ez merîkî xerîb im, şor gişkî nayêne gotin, merî braqil zane dawîya tiştane

Tasek av ji kanîya Qestelê ji derd û kûlen min ra şifa û derman e.’²⁰²

Piştî vê gotina beraqilane ya Memî, Hesên meseleya hatina mêvanê xwe baş tédigehe û ev yek dibe sedem ku Celalî ji bo hevgehîna Mem û Zînê ya ji destê wan bê bikin.

Memê Alan hêj ku digel Zînê baş nerûniştîye û merema dilê xwe negihadîye mala Mîr Ezîn, bi şeytanîya Bekoyê Ewan, hemû xelkê Cizîrê berê xwe didine sefereke ji derewan pêkhatî. Mem li hember vê seferê beraqilane tevdigere vê berpêlka Bekoyî ji bo xwe dike tişteki erênî û di nav ramanên xwe da wiha difikire:

Memî jî di dilê xwe da digot: ‘Hîn nih hat firsenda dîtina Zîna Zêdane.

²⁰¹ h.b.b.r.56.

²⁰² h.b.b.r.80.

Xelk tev da ji bajêr bi der ketin, ne man tu kes bê jinane

Niha kes tune di mala Mîr Ezîn, û di mala her sê birane

*Eger ez ne bi van siwaran ra bûma, esê minê bi Zînê ra bikira kêfeke girane*²⁰³

Memê Alan ji van beytên li jor jî dîyar e ji bo berjewendîyên xwe aqilê xwe baş bi kar tîne. Ew bi fêlbazî nêzî meseleyê dibe. Ji ber ku dizane ti kes li bajarê Cizîrê tine û hemû kesan berê xwe daye seferê lewma aqilmendane tevdigere û vê fursendê baş diemilîne. Ev beraqilane hereketkirina wî dibe sedem ku ew vegere Cizîrê li ba hebandîya xwe Zînê.

Mem piştî ku Celalî û kesên derdorê berê xwe didine şerê li ser eceman, Bekoyê Ewan û Mîr Ezîn vê yekê wekî fursendekî dibînin û Memê Alan tevî hin kesan gazî şahîyê dikin. Piştî xwarin û vexwarin û xweşuhbetan Mîr Ezîn dixwaze ya dilê Memo bielime û jê ra leyîstina şetrencê daxwaz dike. Tabî li vir da berîya ku em derbazî dîyalog û serpêhatîya vê meseleyê bibin divê em berê xwe bidine berhema me ya qedirbiha ya Adat û Rusûmatnameyê Ekradîye ya Bayezîdî. Sedemê lênihêrîna me dê ew be ku, ev lîstok di nava kurdan da cihekî girîng digre û lazim e li ser vê lîstokê jî mirov xwe bispêre çavkanîyeka dêrîn. Niha em ê li ser vê lîstoka şetrencê ku wekî Bayezîdî neqil kirîye rawestin û dûvre derbazî sahneya vê lîstokê bibin. Ê bi xeyr ji van, şetrenc û tame û gustîr, evne jî heyîne. Bi şertekî me'lûm (naskirî) dilîzin û yaxo name'lûm dilxwaz dilîzin. Herçî kesê ew lîz (leyîstik, lîstik) birî, ew her çî ko dilê wî bixweze (bixwaze) distînin. Mesela: Hespêd qenc û tiştêd nadir (kêmpeyda) distînin. Dibe kod i şertê dilxwaz (de) keçan jî distînin. Xweha wî û ya keça wî distînin. Nikûlî di şertê dilxwaz da nî, nabitin. Her çî bixweze elbette dê bidinê.²⁰⁴ Piştî van agahîyên hêja û nirxdar niha em vegehin li ser şetrenca di navbera Memê Alan û Mîr Ezîn da. Mîr Ezîn -wekî agahîyên li ser vê lîstokê jî me li jorê da- bi şerta dixwaze digel Memî bilîze û Mem jî vê yekê qebûl dike. Ji ber ku lîstoka şetrencê lîstokeka bi stratejî ye û ji bo wê jî divê mirov aqlê xwe baş bi kar bîne. Memê Alan ji ber ku kesekî baqil e lewra di vê lîstokê da baqilane tevdigere. Heta sahneya li ser şetrencê û j'alîyê Memî ve têkbirina Mîr Ezîn wiha dihête sahnêkirin:

Mem lehîzvanekî zor bû, lê Mîr pê ne dizanî

Mem û Mîr, herwekî biçûna navê, hevdu gerandin

Temaşageran zanî xurt e Memê Alan

Mîr Ezîn nikare hilîne bar û barbarî

Bi rimh û gurz û şeşperî, Mem kete nav eskerên Mîr

Sefa pêşin xera kir, di baskan ve kete hundir

Siwar ji hespa de xistin, peyar dan ber lingên fila

²⁰³ h.b.b.r.117.

²⁰⁴ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradîye, r.92-93.

Bera birc û barû da pêşî, ji dijmin stand
Li şah hate wer, rex û ferzîn kirin hêsîr
Beko madê xwe kir, di fena wî derkete pûç
Mem tu firsend neda, pey hev ji Mîr birin sê dest
Beko di îş xerab e, Mîr dişkê, bi Mem re maye serdestî
Ewî soz da bû Mîr, Mem bigre, lê bi bindestî²⁰⁵

Wekê li beytên li jor jî diyar e Memê Alan bi stratejîya xwe ya beraqilane bi cih tîne û zora mîrî dibe. Her wekî me anîye ziman şetrenc lîstikeke ne ji rêzê ye û lazim e ji bo wê lîstikê mirov xudanaqil û xudanzir be. Anku ne ewqas hêsan e ku mirovek ji rêzê di vê lîstika dêrîn da bi ser bikeve. Memê Alan jî di vê lîstika dêrîn da zaf baqilane hereket dike û di lîstikê da ser dikeve. Ji ber ku nikarin di vê lîstika dêrîn da zora Memî bibin û nikarin bi aqilê wî serederîyekê bikin lema dest bi dek û dolaban dikin. Cihê wî û Mîr Ezîn di lîstikê da dihête guhertinê. Ji ber ku Zînê paş Memî ew temaşe dikir lewra Memî ew nedidît û bi rehetî ser diket. Piştî ku cihê wan tê guhertin çavê Memî li Zînê dikeve û aqil terka serê wî dide. Ev jî dibe sedem ku li hember mîrî têk biçe û ji wan ra bibe dîl.

Memê di piranîya destanê da kesekî baqil e, ew li gor aqilê xwe tevdigere. Dema ku dixwaze hereket bike pêşîyê difikire, her awayê tîne li ber çavan û piştra li gor wê hereket dike. Ew di destanê da kesekî hişmend e û tevgerên wî jî mînaka vê yekê ne.

2.1.3. Evîndarîya Memê Alan

Bingeha vê destana me ya qedîm pala xwe daye evîneka bêhempa ya ku bi salane li ser zimanê her kurdekî ye. Em dizanin ev destan li dor tevna evîna Memê Alan û Zîna Zêdan hatîye raçandinê. Destan ji serpêhatîya Memê Alanê evîndar pêk dihêt ku wî ji bo vê evîne her tişt daye ber xwe û ji bo vê evîne dev ji hemî tiştan berdaye.

Evîna Memê Alan û Zîna Zêdan ne bi awayekî normal pêk dihêt. Ew bi arîkarîya Qîzên Mîrê Cinan hev dibînin û evîndarî hev dibin. Jixwe piştî ku ew hev dibînin û evîndarî hev dibin êdî aqil diçe sewda di cihê wê da dimîne. Memê Alan piştî dîtina Zîna Zêdan ji hal dikeve û naxwaze ne kesekî bibîne û ne bi kesekê ra baxive. Hew fikra wî çûyîna bajarê Cîzîrê û gihiştina Zîna Zêdan e. Ji ber ku Memê Alan tekaneyê malê û prensê bajarê Mixribê ye lewra dê û bavên wî naxwazin ew ji wan dûr bikeve. Heta ji bo vê yekê çî ji destê wan tê dikin. Ji bo ku ji wî ra bibe derman bavê wî her tiştî dike. Li ser vê yekê sahneyek wiha tê beramberî me:

Ne man qîzên wezîr û beg û axane
Her yekê xwe bi awakî xemiland û dane ber kokîyane
Dema refê wan qîzan diborîn di nava zikak û kolane

²⁰⁵ h.b.b.r.135-136.

Pê ra agir berdida dilê xortane.

Giştikan hatin li pêş qonaxa Memî, girtin govend û dîlane

Dengê def û zirnan û tilîliyan xwe didane taqê ezmanane

Dîsa dilê Memî nexwest ko serî biderxe bi şibakane²⁰⁶

Ji beytên li jor jî dîyar e Memê Alan li hember evqas qîzên Mixribê bê liv û tevger e. Bavê wî ji bo ku wî ji rêya wî vegeirîne ji bo ku Zînê bi wî bide jibîrkinê çî ji destê wî tê dike belam Mem guh pê nade. Memê Alan li hember qîzên Mixribê kesekî qahîm e, ew qahimîya xwe di asteka bilind da diparêze. Memê Alan ewqas qahîm e ku dema qîzîk têne li ber paca wî û dest bi govendê jî digrin, qet xwe ser ve nabe. Heta serê xwe jî pacê jî dernaxe ji bo dîtina wan qîzikan.

Memê Alan êdî ji vê rewşa heyî diqehire û li hember bav, mam, xal û nasên xwe bi tundî tevdiqere. Ew naxwaze ji bilî Zînê tiştek çêbe û biqewime, ew dixwaze merema dilê wî bihête zanîn. Lewra bi rexneyane wiha li xalê xwe vedigerîne:

Memî got: ‘ Xalo, dilê min î lîyan e

Îro dilê min bûye yataxa derd û kulane

Hon nikan ji min ra bibînin çare û dermane

Gene meşînin serê min bi van tiştane

Min nedî ko kes birîne rîman bi ava gula da kewane

Ez di dil da birîn bûme, hon tînin ser min şêx û melane

Ez çavên xwe digrim, ko bibînim xîyala Zîna Zêdane

We ji min ra anîye qeflê soytarîyane²⁰⁷

Mem ji ber ku dixwaze merema wî baş bihête zanîne lewra bi rexneyane li hember eqreba û dostên xwe radibe. Ew ji van beytan jî dîyar e ji bilî Zînê ne di fikra kesekê/î û tiştekî da ye. Hew ew Zîna xwe difikire, kesên ku ji bo dilxweşkirina wî jî dihêtin ne di xema wî da ne. Belam ji ber ku ev hal wî diqehirîne lewra dixwaze bi tundî li hember van tiştên diqewîmî derkeve û li eqreba û nasên xwe bidete zanîn ku armanca wî hew Zîna Zêdan e.

Mem ji bo evîna xwe serî li hemberî bavê xwe radike ku ev yek di nerîta kurdan da ne tiştekî ji rêzê ye. Ew ji bo evîna xwe dev ji hemî tiştan berdide û berê xwe vedigerîne bo evîna xwe Zîna Zêdan. Ji ber ku di beşên dî da em li ser serîhildan Memo rawestîyabûn û me mînakê vê yekê dabûn lewma ne hewce ye em cardin heman tiştê wek mînak bidin û bikevin dubareyê. Lê mirov dikare bibêje ku Memê Alan ji bo evîna xwe serî li hember bavê xwe radike û dev ji hemû tiştên xwe berdide û rûyê xxwe badide ber bi Cizîra Botan a ku Zîn li

²⁰⁶ h.b.b.r.46.

²⁰⁷ h.b.b.r.47.

wê derê ye. Di rê da zaf talûke têne serê wî lê hêz û vîyana evîna wî, wî li ser lîngan digre. Wî hêzdartir dike, qahîmtir dike û bi hêsanî ji ser van berpêlkan gav davêje.

Memê Alan piştî ku digihije Cizîra Botan digel ku dizane Zîn qelendîya Çeko ye jî lê ti caran fikra devjêberdana Zînê nayê hişên wî. Wî ji bo Zînê dev ji mal û milkê xwe, dê û bavê xwe berdaye û mirin danîye li ser rêya xwe. Ew di evîna xwe da ewqas saxlem e ku her gavek wî bêyî fikirîna gihiştina Zînê derbaz nabe. Piştî ku Memê Alan û Zîna Zêdan li ser kanîya Qestelê li rastî hev tên Memê Alan dixwaze Zîna Zêdan hay ji radeya evîndarîya wî hebe lewra jî wiha jê ra dibêje:

Memî got: Ez Mem im, wergî dîn im

Va şeş meh in bi pê vî îşî ketim, text û tacê xwe dihêlînim

Ma ez nizanim vî canê xwe derbeke din li welêt venagerînim

Zînê, bila tu zanî bî ko Hesên, Çeko û Qeretacîn bi min ra bûne bira, êdî ez xemê li tu kesian nakişînim²⁰⁸

Di hişê Memê Alan da tenê gihiştina bi Zîna Zêdan heye lewra jî tevgerên xwe di çarçoveya evîndarîya xwe da diket. Dema ku diçine şer ji bo evîna xwe û vegera li ba Zînê biazilane tevdigere û xwe birîndar dike û tê li ba Zînê. Dema tê li cem wê jî wiha dibêje:

Memî rahişte destê Zînê, got: De rûne, xatûn, ez heyranî van çavan e

Ji bona ko bigihême, min destê xwe avête qulpê derewane

Li stoyê xwe danî kirasê tirsonekane

Lingê xwe da ber devê şûrane²⁰⁹

Memê Alan ji van beytên li jor jî dîyar e ku ji bo evîna xwe hemî tiştên neçê kirine. Ji ber ku li ba kurdan neçûyîna şer û ji şer bi paşvevegerîn ne tiştêkî çak e lewra Memê Alan ji vê yekê hayedar û li ber xwe ketîye. Di heman demê da ew ji bo ku here li ba evîna xwe digel derewan pîyê xwe jî birîndar dike. Ew wekî ku me anîye ziman her cure talûke, xetere û mirinê dide li ber çavan. Ji bo ku here li ba Zînê hemû cure kirasên xirab li xwe dike. Ev yek jî asta hêza evîna wî û şîyana evîna wî nîşan dide.

Memê Alan ti caran xwe ji bo evîna xwe nade alîyekî, ew hertim ji bo evîna xwe beramade ye. Dema ku ew di koşka Zînê da ne û digel ku dizane Mîr Ezîn bêt û wan bibîne dê bibe sedemên tiştên nebaş bo wî jî lê ew cardin bi sergermî tevdigere. Dema ku ji bo wî mijar evîna wî be, ew ti caran xwe li ber zehmetîya nade paş. Piştî ku Mîr Ezîn tê ser wan da digre jî Mem qet Mîr Ezînî nake xema xwe da. Li hember mîrî radibe, şûrê xwe ji qalanê derdixe, digel ku tenê ye jî ji bo evîna xwe amade ye bide û bistîne jî.

²⁰⁸ h.b.b.r.104.

²⁰⁹ h.b.b.r.120.

Memê Alan her wekî me anî ziman kesekî zaf hişmend e û tevgerên xwe jî di vê çarçoveyê da davêje. Dema ku ew li hember Mîr Ezîmî di şetrencê da bi ser dikeve, Bekoyê Ewan dizane ku nikare bi ser aqilê wî bikeve. Lewranê ew li hember aqlê wî evîna wî wekî sistîyekê dibîne û vê yekê jî baş bi kar tîne. Ew sahneya heyî vebêjerê destanê wiha tîne li beramberî me:

Çavê dildayî kete çavên dildarê

Eqil terka serî da, hiş ji dil rabû, can ji ten bû çû firî²¹⁰

Ji vê kurtedîmenê jî dîyar e ya ku piştta Memê Alan dişkîne evîna wî ye. Ew j' alîyê aqlî ve kesekî tekûz e belam hişên wî li hember evîna wî sist dibe û ji serî diçe. Ew ti caran nikare li hember evîna xwe serederîyekê bike bi timî dilzîz e bo evîna xwe. Heke mijar evîna wî be ew ji ti tiştan xeman nagre. Memê Alan ji bo evîna xwe ewqas wefadar û sozdar e ku dev ji dê, bav, xal, ap û welatê xwe û mîrîtiya xwe berdide. Ew ji bo evîna xwe tu caran nakeve şikê, ya ku ji destê wî tê dike.

2.1.4. Hin Taybetîyên Din ên Memê Alan

Memê Alanê serlehengê vê destana me ya qerase di destanê da bi rengên cuda yên tîpolojîk tê beramberî me. Ew di destanê da kesekî pirrhêl e. Memê Alan her çiqas bi lehengî, aqilmendî û evîndarîya xwe derkeve li pêşberî me jî ew di hin rewş û haletên cuda da jî xwe di destanê da dîyar diketin. Yek ji alîyê wî ye derdikeve li pêşberî me, şîretdayînên wî ne.

Mem piştî dîtina Zîna Zêdan êdî hew debara mayînê li Mixribê dike. Ew dixwaze tavil ji wir here û bigihije yara xwe ya delal Zîna Zêdan. Ji bo çûyînê bi gazî Beglîyê destbirayê xwe dike ku di wan gotinên wî da him fermanan dide wî him jî şîretan ku ew jî wiha ne:

Eger tu î jêhatî yî û karê ko ez dibêjim pêk bikiarî bibîni

Tu zûka herî xwe bi tewlê nijdîyran bigihîni

Hespê boz ji qeyd û merbandan bifitilîni

Zîn û zenguyan bi ser dî, tengan bişidîni

Welatê xerîbîyê çetin e, xwe bi derê oda xeznê gihîni

Heqîba min ji zêr û cewahîran tijî bikî, li terkîya Boz bişidîni²¹¹

Mem her çiqas temenpiçûk jî be, ew wekî kesekî xudanserborî tevdigere. Di gotinên wî yên şîretwarî da ev yek xwe dîyar dike. Ew dizane ku welatê xerîbistanê ne derekî asan e ku wekî tê texeyyûlkinê.

Memê Alan piştî dîtina Zîna Zêdan êdî hew debara xwe li welatê xwe dike, ji bo wê dev ji hemû tiştên xwe berdide û berê xwe dide bajarê Cizîra Botan. Dema ku ew diçe li wir

²¹⁰ h.b.b.r.136.

²¹¹ h.b.b.r.44.

dizane ku kesên dê kula dilê wî bikewînin, Mala Celalîyan e. Lewra jî berê xwe dide li wir. Hesênê Celalî dixwaze sedemê hatina wî fêr bibe belam Memê Alan digel şermkirina xwe naxweze bi awayekî servekirî jê ra bêje loma digel gotinên di cih da bi awayekî şîretane wiha jê ra dibêje:

Gotê : 'Ez ketime bextê te û birane

Ez merîkî xerîb im, şor gişkî nayêne gotin, merî bîaqîl zane dawîya tiştane

Tasek av ji kanîya Qestelê ji derd û kûlen min ra şîfa û derman e.'²¹²

Memê Alan bi van gotinên sergirtî û şîretwarî dixwaze li Hesên bide zanîn sedemê hatina xwe. Ew herwiha halê xwe yê heyî di nava gotinên şîretwarî da aşkira diket. Li wî dide zanîn ku ew ne kesekî ji wan e û lewra jî divê di vê çarçoveyê da ji wî ra arîkarî bêne kirinê.

Memê Alanê leheng û binavûndeng her çiqas bi aqilmendî û mêrxasîya xwe bête zanînê jî carna ew di nava destanê da hereket û tevgerên ne li gorî mêrxasîya xwe pêk tîne. Dema ku dê biçine şerê li ser eceman Memê Alan bi fêlbazî tevdigere û ji bo neçûyîna şer dikeve li dû hincetan. Piştra diçe ba Hesên û ji wî ra wiha dibêje:

Îro ne xwe dibînimê, nexweşî giran e

Serê min bûye mîna berê aşane

Pişt li min bûye kulingê demircîyane

Hestîyê movîka piştê min di hev da ketine, mîna maxê ser xirbane

Pêşîya çavên min reş dibe, nabîne tu derane

Ez nikarim xwe bigirim li ser piştê Boze Rewane

Ma ezê bi vî hesabî çawan herim şerê dijminan û Ecemane?

*Şalê tu izna min bistîni ji Mîrê Botane*²¹³

Memê Alan, piştî van gotinan ji bo ku here li ba Zînê û neçe şerî bêyî tereddût pîyê xwe birîn dike. Û bi vê hincetê Mîr Ezîn wî dişîne bajarê Cizîra Botan û ew ji çûyîna şerr difilite. Li vir de tiştê balkêş heye ku li cem kurdan ji neçûyîna şerî tiştêkî nexweş û ne di cih da tê hesibandinê. Li ser neçûyîna şerr di pirtûka Bayezîdî ya dêrîn da gotinên wiha cih digrin: Wekû dinê ekserêd (piranîya) wan (kurdan) di muharebe (ceng) û şerrî de temennî dikin (hêvî dikin). Eger mirovek bi ecela xwe fewt bibe (bimire) dibêjin: mixabin, xwezîya di şerrî de fewt bibûya. Wekû dinê, Ekrad di şerrî de ji yekûdu şerm dikin. Eger di dil de jî cesaret tunebin, elbette ji şerma oldaşan (hevalan) dê şerrî bike û yane bête kuştin. Ekrad di şerrî de gazî yekûdu dikin û xîret didine yekûdu. Eger mirovek bireve, paşê êdî qedrê wî namîne û jin û mêr tif dikin rûyêd wî û mesxere (qerf û tinazîyan) jê dikin û di meclîsan (civatan) de di qûna fincanê da didine wî mirovê revî. Muddeyekî (demekê) jina wî jî ewî

²¹² h.b.b.r.80.

²¹³ H.b.r.117-118.

nadite xeberdan û her rojê ewî pîs dikin. Yanî di Ekradan da di şerrî da revîn ji mirinê bedtir e (xirabtir û pîstir e). Mirov razî ye, lakin wan rezaletan razî nîne. Ji boy vê xeberê narevin.²¹⁴ Di pirtûka xwe de Bayezîdî bi berfirehî li ser vê mijarê rawestîyayîye. Di xwezaya kurdan da neçûyîna şer an jî ji şerrevîn cihê fedîkirinê ye. Kesê ku di şeran da paşvevegere ev yek di nava civatê da nayête qebûlkirinê û li hember wî bertek tête nişandanê. Mem jî mixabin ji bo evîna xwe naçe şerî, ev yek bi me her çiqas ji bo evîne be jî ne tişteki li gorî mîrxasîya Memê Alan e. Ew di vir da bi dilsistî tevdiqere û paşve vedigere. Di destanê da dilsistîya Memê Alan ya herî mezin jî neçûyîna wî ya şerî ye.

Memê Alan di destanê da kesekî erênî ye û pir caran wek kesekî rastgo tê li beramberî me. Lê carna jî li beramberî vê yekê tevdiqere û ji bo berjewendîyên xwe serî li derewan dide. Ev yek di çarçoveya nîrxandina lehengê wî da tişteki erênî nîne. Dema ku Memê Alan berê xwe daye Cizîra Botan ew li hemberî Qîza Bekoyê Ewan tê. Ji bo ku ji destê wê bifilite, li gorî berjewendîyên xwe dest bi derewan dike jê ra. Ku wiha jê ra dibêje:

Ko ez Zîne bînim, tew metirse, ez ê te jî bavêjime terkîya Bozê Rewane

Heywan hespê behrê ye, wê rake me her sîyane²¹⁵

Memê Alan carna dema dikeve rewşeke asê da ji bo ku ji wê rewşê rizgar bibe dest bi emilandina derewan dike. Ew dema ku naçe şer û vedigere rasterast berê xwe dide li ba Zîna Zêdan. Piştî demekê dema Mîr Ezîn di ser wan da digre ew ji Mîr Ezîn ra wiha derewan li hev tîne:

Berê bipirse balo ez çewa hatime van der û cihane!

Berê ez hatim peya bûm li mala her sê birane

Min pirsî li hekîmane

Xwedê xirab ke mala nerind û derewînê Cizîra Botane!

Bi min ra gotin: ‘‘Hekîm peyda nabin li cem Celalîyane

Eger tu dixwazî cihê hekîmane

Here Birca Belek, tuê ji birîna xwe ra bibinî dermane.’’

Tema ez î xerib im, nizanîm adetane

Di berê da gotine merî xerib kor e, tu tiştan nizane

Ez jî rabûm min berê xwe da Birca Belek, cihê hekîmane

Ez hatime vê odê, nizam ko hêla mêran, an hêla jinan e²¹⁶

²¹⁴ b.n.b. Adat û Rusûmatnameê Ekraîyê, r.59-60.

²¹⁵ h.b.b.r.56.

²¹⁶ h.b.b.r.126.

Ji van beytên wî jî dîyar e ew di halekî asê da ye loma jî lazimîya wî bi derewan heye ku ev yek jî dê bibe sedemê rizgarbûna wî ji rewşa asê. Memê Alan digel ku ji bo dîtina Zînê rasterast berê xwe dabû oda Zînê jî lê cardin ya rast ji Mîr Ezîn ra nabêje û meseleyê bi alîyeke din va dikîne.

Memê Alan ji bo berjewendîyên xwe û birêveçûyîna karê xwe carna serî li derewan dide. Di vir da jî serî bi derewan daye. Lê derewkarîya wî ne tenê li himberî kesên ji rêzê herwiha ji bo hezkirîya wî jî heye. Dema ku ew ji bo axaftina digel Zînê tê ser Kanîya Qestelê ji Zînê ra wiha dibêje:

Ez ne hatim ser Kanîya Qestelê nav koma keçikan, xelkê bi xwe bikenînim

Hewqasa pere didim, milkîya Kanîya Qestelê ji her sê biran distînim

Ev bûne sê roj dixebitim tapîyan bi hikmê peran bi derxînim

A tapî vaye, min kirine bêrika xwe û têda digerînim

Ez hatime ko her çar terefên Kanîya Qestelê tevî milkê wê bibînim²¹⁷

Memê Alanê ku ji bo evîna xwe ewqas rê dayî li ber xwe û ji bona dilbera xwe Zîna Zêdan, di vir da jî xwîyaye bi rehetî dest bi derewan dike. Ew ji bo berjewendîyên xwe derewkirinê dike tiştêkî ji rêzê û ev yek jî li gorî hilsengandinên me ne li gorî tîpolojîya wî ye.

Serlehengê destana me Memê Alan di destanê da yek ji alîyê wî yê nerênî liv û tevgerên wî yê nobranwarî û dilhişkî ye. Ew di destanê da bi vî alîyê xwe gelek caran tê li pêşberî me. Di destanê da dema ku Bozê Rewan ji binîya avê derdixin û tînin Memê Alan bi awayekî dilkevîrane wiha ji xulamên xwe ra dibêje:

Memî emir da bîst û pêne seracane

Gişkî hatin, sekinîn ser lingane

Memî got: 'Ez ji we dixwazim hon tev çêkin taximekî ji bona Bozê Rewane

Eger ez tê da bibînim qisûr û kêmiyane

Ezê we gişkan bi dar da kim, bi sêpîyane!'²¹⁸

Memê Alan hin caran ji bo kesên di destanê da derbaz dibin, li jor jî mînaka wê heye, dilkevîr e û di nava gotinên wî da gefxwarin hene. Ew li hember bicihneînan emrên xwe gefa mirinê li xulamên xwe ra dixwe. Ew wekî gotina xwe ye û li ser kes û karên destanê, kesekî xudanxof e.

Nobrantîya Memî ne tenê ji bo kesên ji rêzê ye ew herwiha ji bo nas û eqrebayên xwe jî bi dîlnerehmane radibe. Li hember wan jî gotinên dilkevîrane bi kar tîne ku ev yek ne li gor

²¹⁷ h.b.b.r.105.

²¹⁸ h.b.b.r.31.

dilrehmîya wî ya di destanê da ye. Di destanê da dema ku eqrebayên wî dixwazin wî ji çûyîna bo Cizîra Botan vegehrîn, çî ji destê wan tê dîkin. Belam Memo li hemberî van ti caran bersiveke erênî nade wan. Ji ber ku wî ya kirî di serê xwe da, jê venagere. Li hember gotinên xalê xwe Emer Begî, ew bi tundî lê vedigerîne û wiha jê ra dibêje:

We ji min ra anîye qeflê soytarîyane

Qey tu bê li min kêma maye qîreqîra mirid û dewrêşane

Min got: Belkî ez nebim sebeba serê van serserîyane

Bi navê Xwedê, ko ez rabim, tu ya xêrê ji min nagihê wane!

Wê serê van bifire li ber şûrê celatane!

*Bila herin mala xwe, kesî dîn tune li van derane!*²¹⁹

Ew gefxwarina li hemberî kesan wekî tiştê ji rêzê dibîne û dilhişkîya xwe jî dixê di nava van tiştan da. Memê Alan carna asta dilhişkîya xwe digihîne wê astê ku êdî çî kes li hember wî be ferq nake û ji gotina xwe ya dilkevirane wî/wê bêpar nake. Dema ku Memê Alan li Cizîra Botan digel Zînê Zêdan ketîye axaftinê, jî Zînê dixwaze ku ew tasek av bidîyê. Belam Zîn ji ber ku hemû kes li wan temaşe dike lewma naxwaze vê yekê bike. Zîn dizane ku ew avê bide Memî dê ev yek bibe sedemê pir fesadî û tiştên nebaş. Mem guh bi ti tiştan nade û hew dixwaze fermana ku dayî Zîn wê fermanê bîne cî. Dema ku Zîn vê yekê nake bi awayekî nobranwarî wiha lê vedigerîne:

Memî got: Ez Mem im, wergî dîn im

Va şeş meh in bi pê vî îşî ketim, text û tacê xwe dihêlînim

Ma ez nizanim vî canê xwe derbeke din li welêt venagerînim

Zînê, bila tu zanî bî ko Hesên, Çeko û Qeretacîn bi min ra bûne bira, êdî ez xemê li tu kesan nakişînim

Tu dixwazî ko ez carê şûrê xwe ji kalên bikişînim

Ez neketime xema mezin û giregirê Cizîrê, tirsê min ew e ko pê ra xwîna feqîr û fiqarê bê sûc birijînim

Niha ko tu pir bi dilê min bidî, ezê werim, bi destê xwe vê hêzarê li çavê te hilînim

*Tasek av bi dest te dim û paşê li ser destê te hilînim, Daxwaza xwe bi zorê ji te bistînim*²²⁰

²¹⁹ h.b.b.r.47.

²²⁰ h.b.b.r.104-105.

Memê Alan ji van gotinên wî jî dîyar e ew di vir da wek kesekî nobran tevgerîyaye. Wî her çiqas ji bo evîna xwe dev ji warê xwe, mîrtîya xwe û dahatûya xwe berdabe jî, bo Zîna Zêdan lê mixabin li vir cihê heyfê ye ku ew berkesî van kirinên xwe tevdigere. Ew him ji bo Zîna Zêdana hezkirîya xwe him jî ji bo kesên çî ji rêzê bin çî ji nas û lêzimên wî bin, carna wiha bi dilkevîrane tevdigere. Di tevgerên wî yê dilkevîrane da jî gotinên wî yên gefxwarîyê jî hene.

2.2. Zîna Zêdan

Lehenga me ya din Zîna Zêdan e anku hezkirîya Memê Alan. Zîna Zêdan jî wekî Memê Alan ji malbateka mezin tê. Ew xwîşka Mîrê Cizîra Botan, Mîr Ezîn e. Dema em li destanê dinerin em dibînin ku Zîn qelendîya Çekoyê Mala Celalîyan e. Lê digel ku ew qelendîya yekî ye jî piştî ku Qîzê Mîrê Cinan wan tînin li ba hev êdî Zîn ji bilî Memî ti kesî nafikire. Ew her li benda hatina Memê Alanê evîndarê xwe ye. Em ê niha li gorî liv û tevgerên Zîna Zêdan yên di destanê da diborin, li ser rawestîna û hilsengandinên xwe bikin.

2.2.1. Evîndarîya Wê

Dema em li destana xwe binerin em ê bibînin ku Zîna Zêdan piştî Memê Alan ji her tiştî dûr dikeve. Ew cilên reş li xwe dike û dikeve di nava reşbînî û huzneka mezin da. Ev reşbînî û rûtirşîya wê berdeyam dike hate ku Memê Alanê hebandîyê wê tê.

Zîna dema ku bêyî vîna wê, wê tînine li cem Memê Alan ji xew şîyar dibe û li dora xwe dinere. Ew wesa hizir dike ku li Cizîra Botan di mala xwe da li ser textê xwe yê razanê ye lê hew dinere ku kesek bîyanî li di wê odeyê da ye. Pêşî matmayî dimîne lê paşê li ser xwe ve tê û li himber wî kesê bîyanî bi awayekî tund dikeve suhbetê. Ew wesa hizir dike ku kesê di odê da bi zorê hatîye oda wê û ne ji bo tiştê bixêrê hatîye. Belam piştî axiftinên wan û galegalên wan, wesa tê derdixin ku ew ode ne ya Zîna Zêdan lê ya Memê Alan e. Zîna Zêdan li hember vê yekê lavahîya ji Memê Alan dike da ku ew ti kesî li wan nehêsîne. Memê Alan jî bi mîrxasane tevdigere û vê yekê qebûl dike. Ew hatina wan ya li ba hev wekî tiştê mucîze û xêrê dibînin. Lewma li wê derê çîrûska evîna wan lê dikeve û sahneyek wiha diqewime:

Textên xwe kişandîne her hev, û bi hev ra ketine şorane

Di nava hev da danîn sonda girane

Sond xwarin bi pêxember û ewlîyane

Mem ji stoyê xwe da danî humeylîya meqbûl, û anî şûrê nêrgiz, ev her du danîn nav bera û textane

Got: "Emê îşev pev ra rakevin, mîna xwîşk û birane; Gava sibê bû, emê bang kin şêx û alimên bajarê Mixribîyane

Bi emrê Xwedê û qewlê pêxember, bila bibirin mara me her dîyane."

Bi hev ra guhartin qaşê gustîrane

Li ser ya Memî, nivîsîye "Memê Alane."

Li ser ya Zînê, nivîsiye ‘‘Qîza Walîyê Cizîra Botan Zîna Zêdane.’’

Hêdî hêdî, bi şor û xeber danê, ketine xewa, şevane²²¹

Her weku ji van dîmenên li jor jî dîyar e Memê Alan û Zîna Zêdan piştî van bûyeran aşiqî hev dibin. Ew ji bo belgeya vê eşqê û wefadarîyê jî gustîlên xwe li hev diguherin. Sedemê gustîlguherîna wan bêguman sozdayîna wan a bo hevdu ye. Êdî Memê Alan û Zîna Zêdan bi van rûdanan ra dibine evîndarê hev û ev evîna wan heta mirina wan berdewam dibe.

Piştî ku li Zînê dibe sibe û ji xew şîyar dibe, dibîne ku Memê Alan ne li wir e û ew jî di qonaxa xwe da ye. Li hember vê yekê têk diçe, rûtirş dibe û wesa hizir diket ku, ya ku hatî serê wê ji xewneka şevan pêk dihat. Lê piştî ku li tilîya xwe dinere û dibîne ku ew gustîl ya Memê Alan e û navê wî li ser nivîsiye, wêca di nav dilşadiyekê huznekê jî dihundirîne. Zîn piştra dikeve xemgînîyê û li ser xemgînîya wê û halê wê, vebêjerê destanê wiha dibêje:

Zînê carîya vegerandin cîyê wane

Gava bi tenê ma, ji xwe danîn cil û çekên xatûnane

Li xwe kir kirasekî reş, yê erebane

Ko ne hêja ye du qirûş û nîvane

Bi carê xwe kir belgihê carîyane

Ne ma bi kesî ra dike şor û xeberane

Carîyan xeber dane Mîr Ezîn, mîrê bajarê Cizîra Botane

Ko Zîn ketîye bi nexweşîyeke girane²²²

Zîna Zêdana delal piştî wê şeva xweş a digel Memê Alan êdî ji xwe diçe, ji hiş dikeve û dikeve nava êş û kuleka mezin da. Ew êdî dikeve di nava rewşeka giran da û cilên reş li xwe dike. Ku li vir da lixwekirina cilên reş sembola tiştêkî nebixêrê ye. Ew mirûztirş dibe heta ku Memê Alan tê bajarê Cizîra Botan.

Zîna Zêdan berîya hatina Memê Alan di nava êş û şîneka girin da ye. Ew ne li bendê ye ku dê Memê Alan were û wê ji vê haletê nexweş da rizgar bike. Piştî ku carîyeyek wê hatina Memê Alan xeber dide wê, ew bi ser xwe ve têtin. Li hember vê yekê dixwaze bi hincetekê ji mal derkeve û berê xwe bide li ser Kanîya Qestelê ji bo vê yekê jî wiha ferman dide carîyên xwe:

Herin, ji min ra bicivînin qîzên began û axan û giregirane

Bila nemînin, werine vir, îro şeş meh in ko derneketime ger û seyranane

Dilê min heye ko herime ser kanîya Qestelê, û vexwim ji ava gulane

²²¹ h.b.b.r.40-41.

²²² h.b.b.r.42.

*Hinekî bigerim li ser mêrg û çayîrane*²²³

Zîna Zêdan piştî qayîl dibe ku kesê hatî Memê Alan e û ne ti kese tavil ferman dide carîyên xwe da ku ew herin û bêjne qîzên axayan û bûkên wan. Da ku pevra herine li ser Kanîya Qestelê. Zîna Zêdan dizane ku ew here ser Kanîya Qestelê dê bi awayekî Memê Alan jî bê. Ew ji bo evîndarê xwe Memê Alan qesta çûyîna ser Kanîya Qestelê dike. Ji ber ku dizane tekane rêya dîtina Memê Alan derekî li derveyî qonaxa wan e.

Piştî ku Zîna Zêdan û Memê Alan li ser Kanîya Qestelê hev dibînin dikevîne di nava suhbeteka kûr û dûr da. Ya di dilê xwe da dibore ji Memê Alan ra dibêje, dixwaze Mem wî birevîne û bibe bajarê xwe anku Mixribê. Li vir da em asta hezkirina Zîna Zêdan dibînin, ew digel ku dizane li ber çavê xelkê wan temaşe dike, axaftina digel Memê Alan xetereyê mezin e jî, ew cardin dev ji vê yekê bernade û diaxive. Ew ji bo hezkirîyê xwe Memê Alan mirinê dide li ber çavê xwe û hemû xelkê Cizîra Botan ji bo hezkirîyê xwe paşguh dike. Herwiha digel van tiştan em dizanin ew qelendîya Çeko ya bi salan e. Çeko hez wê dike û dixwaze bi wê ra bizewice. Belam Zîna Zêdan ji bo Memê Alan dev ji hemû tiştê xwe bi taybet jî qelendîyê xwe Çeko berdide. Tekane xwesteka wê gihiştina Memê Alan e. Ji bo hezkirîyê xwe hemî tiştan dide li ber çavê xwe.

Piştî ku Memê Alan li bajarê Cizîra Botan êdî rûyê Zîna Zêdan geş e û kêfa wê di cih da ye. Lê ev rûgeşî û rûxweşîya wê zêde nakêşe û hew dibîne ku Memê Alan digel Cizîriya berê xwe dide ser seferekê bo şer. Li hember vê yekê cardin rûtirş dibe û kulên dilên wê dibin zaf. Belam Memê baqilane tevdigere û bi firsendekê ra vedigere Cizîra Botan li ba evîndara xwe. Piştî ku Zîna Zêdan Memê Alan dibîne cardin xweşîyek li wê peyda dibe. Li ser vê yekê dîmenek wiha raberî me dike vebêjerê destanê:

Bi hev ra digotin: ‘Mîr venagere heya pênc û şeş mehane

Heya wê çaxê kerem ji Xwedê ye, ev e dermanê derdê aşiqane.’

Di kêlekê hev da rûniştin, dikine şor û mesqerane

*Çongê xwe dane ser hev, hûrik dikine gilî û gazindane*²²⁴

Ji vê dîmena li jor jî dîyar e ku piştî ku hevdu dibînin aqil terka serê wan diçe, dikevîne li ber bayê evînê. Zîna Zêdan digel ku dizane ew û Memê Alan di koşka wan da ne û ihtimala hatina birayê wê heye jî lê cardin vê yekê paşguh dike. Li hember evîna wê aqilê wê têk diçe. Hemû rîskên heyî dide li ber çavan û bi hezkirîyê xwe ra dikeve nava kûrahîya evîna xwe.

Zîna Zêdan girêdayî hezkirîyê xwe Memê Alan e, wê jî mîna Memê Alan hemû tiştên erênî û nerênî daye li ber çavê xwe. Evîna xwe ya li hember Memê Alan wekî tişteke ji rêza nabîne ew her pabendî vê evînê ye. Dema ku Memê Alan tê girtin û wî dixine di bine zindaneka tarî da Zîna Zêdan diçe li ba wî. Hinarekê bi xwe ra dibe ji bo ku ew wê hinarê bixwe û piçek be jî li ser xwe were. Belam ew hinara ku dibe, nizane ku dê bibe sedemê

²²³ h.b.b.r.74.

²²⁴ h.b.b.r.120.

mirina Memê Alan. Piştî ku Memê Alan xewna xwe ya neb'xêrê ji wê ra dibêje, Zîna Zêdan zaf li ber xwe dikeve û naxweze Memê Alan bi wê hinara ku wê anîye bixwe. Li ber Memê Alan digere, dixwaze wî îqna bike ji bo nexwarinê belam Memê Alan ji ya xwe nayê xwarê. Dawîyê ew ji Memê Alan ra dibêje:

*Madam ko yê mirin be, himbêza xwe vegire, ezê xwe çek kime cem te zindanê,
gene serê te di gava mirinê da bidime ser çongane*

Bila em her du bi hev ra bimirin, di heps û zindane

*Ez naxwazim di pê te ra hewa dinê bimînim û bibînim tu kesane*²²⁵

Zîna Zêdan naxwaze Memê Alan bi hinara wê anî ra biçe dîyarê rehmetan ku heke biçe jî naxwaze ew bi tenê here. Dixwaze ew jî bi hezkirîyê xwe Memê Alan ra here anku bimre. Em amade ye ji bo mirin abi Memê Alan ra, êdî dizane piştî mirina Memê Alan ji bo wê wateya jîyana wê namîne. Li vir da cardin asta hezkirin û fedakarîya Zîna Zêdan tê beramberî me.

Piştî ku Memê Alan dimre, Zîna Zêdan li ser xwe ve diçe û dike qêrîn. Wê rewşa Zîna Zêdan vebêjerê destana me, wiha tîne li beramberî me:

Dema Zîne dît ko Mem mir, li xwe xist, dikire qirîn û emane

Revî, cawbir anî, gulîyê mor tevda dane ber meqesane

*Bi ser laşê Memî da avêtine, binê heps û zindane*²²⁶

Zîna Zêdan li hember mirina evîndarê xwe wefadarîya xwe nîşan dide û porê xwe tavil dibire. Li vir em dixwazin balê bikşîne li ser vê tevgera Zîna Zêdan lewra ev tevgerên Zîna Zêdan nerîteka berê ya di nava gelê kurd da şanî me dide. Dema li cem kurdan bav, bira, pismam, mêr an jî hebandîya keçikekê (jinik) mir, ew radibe gulîyên xwe dibire û wan gulîyan davêje li ser qebra wî an jî li ser ewî kesê mirî. Li ser vê yekê Mela Mehmûd di berhema xwe da wiha dibêje: “Li mewta (mirina) ciwanan zêde şîn û matem digirin. Libasêd (cil û kinc) reş werdigerin û serêd xwe reş girêdidin. Û jin û keç û xweh, gulîyêd xwe jê dikin, qewî zêde matem û şînê dikin. Û ew jinêd ku gulîyêd xwe birîne ewan gulîyan li ser qebra wî meytî (mirî) li kêlekêd wî dilawêsîn (dadiqilînin).²²⁷ Wekî ku Bayezîdî jî anîye ziman ev nerîte li cem kurdan heye û hêj jî –ne li bajaran be- li gundan ev nerît xwe diparêze.

Piştî mirina Memê Alan êdî Zîna Zêdan jî li benda mirina xwe dimîne. Ew li dû mirina hezkirîyê xwe êdî hew debara jîyana xwe dike. Vebêjerê destanê wefadarî û evîndarîya Zîna Zêdan ya piştî mirina Memê Alan wiha tîne li ber çavên me:

Di pê Memî ra, Zîn kete pişt derîyane

Bi roj û bi şev tim digirîyane

²²⁵ h.b.b.r.145.

²²⁶ h.b.b.r.146.

²²⁷ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r.52.

Ji sondê ra ne dikete gewrîya wê parîk nane

*Nema lê bi dûr diketin qîzên giregirane*²²⁸

Zîna Zêdan ji van beytên li jor jî dîyar e, piştî mirina Memê Alan ti tişt ji wê nayê ew hew bi şev û rojan ji bo hezkirîyê xwe digrî, rondikan dibarîne û li benda dora mirina xwe dimîne. Zîna Zêdan ji destanê jî dîyar e piştî bi dîtina Memê Alan evîndarê wî dibe, dev ji qelendîyê xwe yê bi salan berdide. Dema Memê Alan û ew têne li ba hev ji bo wê cihê xweşî û rûgeşîyê ye. Lê kêliyên ji bilî Memê Alan ji bo wê cihê rûtirşî û reşbînîyê ye. Ew di nava destanê da ji serî heta binî wefadarê Memê Alan û evîna xwe ye.

2.2.2. Aqilmendîya Wê

Zîna Zêdan digel evîndarîya xwe herwiha di nava destanê da wekê keseka hişmend jî tê beramberî me. Zîna Zêdana sozdar û evîndar di destanê da dema tevdigere baqilane tevdigere û kirinên wê ne dûrî aqil in. Wekî hezkirîyê xwe Memê Alan ew jî bi aqilmendî tê li pêşberî me.

Zîna Zêdan cara pêşîn Memê Alan di qonaxa wî da dibîne. Ew ji xewa xwe şîyar dibe û hew dibîne ku li cem kesekî bîyanî ye, bertekê li hemberî vê yekê nîşan dide û digel Memê Alan dikeve devjenîyekê. Zîn wesa lê hizir e ku ew kesê bîyanî hatîye oda wê. Di heman demê da Memê Alan jî di heman hizrê daye û ew jî li hember Zînê bertekan dide. Piştî ku ji bo îspatkirina vê meselê Memê Alan gazî Beglî û xulamên xwe dike û Zîn pê bawer dibe ku ew ne qonaxa wê ye, baqilane tevdigere û ji Memê Alan ra wiha dibêje:

Zînê nihêrî ko xewa wê şaş e giran e

Hema rabû, revîya, xwe avête dest û lingê Memê Alan e

Gotê: Min ji nezanî kire qisûr, qisûr efa mêran e

*Tu kira min bidî binê lîngan e*²²⁹

Zîna Zêdan ji beytên li jor jî dîyar e baqilane tevdigere. Piştî vê tevger û gotinên wê yê baqilane Memê Alan jî ji ya xwe tete xwarinê û li hember Zîna Zêdan devjenîyê datîne alîyekê û pevra dikevîne suhbetekê.

Zîna Zêdan piştî şeva dîtina Memê Alan dibe evîndarê Memê Alan. Evîna xwe di hundirê xwe da vedişêre. Ew piştî ku ji dûrî Memê Alan dibe dikeve xemgînîyeka mezin heta ku ew tê. Piştî hatina Memê Alan baqilane tevdigere û berê xwe digel hin qîzîk û bûkên Cizîrê, dide ser Kanîya Qestelê. Piştî kêliyê Memê Alan jî tê li ba wê, lê Zîna Zêdan keseka aqil e, lewma digel hestên xwe aqilê xwe jî daxilî rewşa heyî dike. Dibîne ku hemû kes li wan temaşe dike, lewma bi tevdir tevdigere. Memê Alan her çiqas bixwaze bi wê ra bikeve di nava suhbetekê ew lê venagerîne. Piştî ku dibîne Memê Alan kesekî dilêr e û paşgav nabe, wiha li Memî dixwaze bide famkirinê û dibêje:

Zînê got: Lolo! Memo, ez bi heyrana wê bejna mîna tayê rihanê li qelem me

²²⁸ h.b.b.r.149.

²²⁹ h.b.b.r.40.

Ko tê da tune tûk û gulmit. Ji derdê min ra xweş şîfa û bi merhem e

Her gav kedera dilê min e bi kul û bi elem e, Seba xatirê te, ez çito ranakim serê lêvane

Ema paşê bide, bajarê me yê Cizîrê binihêr, ko çiqas xelk hene, li me dikin temeşane

Ebebozê bajarê me, karê wana dek û dibare ne

Sibê heya êvarê, digerin, dibên: Xwedêo, tu ji me ra bişîni şer û dehwiyanê!

Dibên: Xwedêo, lê niha, vî xortê xerîb ji qîzên me yên Cizîrê ra şorek bikira, yan peya bibe li cem wane!

Berî, giştikan xwe hazir kirine, destê wan li ser şûr û silehan e

Hele, tu carê binhêre lî şûrê wan, giştik çar tilîyan ji kalan kêşane

Ma çavê min rijîyane ko ez vê çarşefê li ser çavê xwe rakim li cem van qîzane?

Welah, welah, ko ez çarşefê bilivînim li ser çavên xwe, bajar gişkê hilweşe van derane

Wê me her diyan bavên ber devê şûrane

Ma tu nizanî ko berê xelkê Cizîrê bûne sê bendane

Wê li ser me bi hev kevin, mîna guran li erdê hildin laşê mêrane.

Xwîna mêran wê bimeşe li erdê, mîna çemane

Wê li ser Kanîya Qestetê bibe şîngîna şûran û tasên mertalane

Ez nekevime ber rûhê xwe û wê koma merîyane

Lê xelkê bêje: Heyfa Padişahê Kurdan, Memê Alane

Ko li welatê Cizîrê çû bê pişt, di rûyê toleke jinane!

Tu li gorê min ke, serê vî heywanî rihet vegeirîne, here ber derê Hesên, Çeko û Qeretacîn, wane

Ji Xwedê berjêr ewana wê ji derdê min û te ra bibînim dermane²³⁰

Zîn bereksê tevgerên Memî yên hestîyarane, bi aqilane tev digere. Ji ber ku dizane ku li cem welatê wan peyva namûsê tiştêkî giran e û axaftina wan her duyan li ser kanîyê dê biçê zora pîrr kesan û fesadan loma ne li gor dilê xwe lê li gorî aqilê xwe hereket dike. Mem çiqas bixwaze ku bi wê ra li ser Kanîya Qestelê bi dûr û dirêj baxive jî Zîn wesa nake û li gor ‘edetên Cizîrê bi wî ra daxive û li hember xeterîya van karê wan wî hişyar dike. Di berhema

²³⁰ h.b.b.r.101-102.

Mela Mehmûd de li ser jinên Kurdan wiha dibêje : ‘Jinêd Ekradan zaf ji mêran bi ‘eql û kemal û îdrak û merofayî ne²³¹.’ Tesbîta Bayezîdî ya li ser jinên Kurdan di cih da ye û em rastîya vê tesbîtê di van gotinên Zînê yên ku li hember hişyarîkirina Memî da bi kar anîne, dibînin.

Zîna Zêdan li ser Kanîya Qestelê bi timî baqilane tevdigere. Ew rewşa heyî baş dihilsengîne, naxwaze li gorî hestên xwe tevbigerê û ev yek jî bibe sedema xetereyên mezin. Lewma bi timî di avêtina gavên xwe da û di axiftinên xwe yên li himberî Memê Alan da hişmend e. Belam Memê Alan dema mesele bête ser evîna wî ya li himberî Zîna Zêdan aqil terka wî diket. Mem bi israr dixwaze ji destê Zîna Zêdan avê vexwe lê Zîn rewşê temaşe dike û dibîne ku gotina wê hatîye bi cih û wiha li Memî vedigerîne:

Zînê got: ‘Min ji te ra çi goti bû? Hele carê binhêre li paş xwe, li bajarê Cizîra Botane!

Di nava bajêr da, giregir û axa ne mane

Hemî rabûne ser banê qesr û qonaxan, rûniştine li ser kursîyane

Tu niha dibê Kanîya Qestelê li bajêr pir e dûr e, kesek nabîne merîyane

Herhal, niha dûrbîn dane ber çavane

Dinhêrine li dorhêla Kanîya Qestelê û li vî êxlîyê qîzîkane

Gava hinek me di vî halî da bibînin, li van derane

Ji bona me her dîyan şermeke giran e.’²³²

Zîna Zêdan meseleyê hê di pêşîyê da baş têdigihe û dizane ka dê dawîya bigihije çi rewşê. Ew keseka pêşbîne, baqilane tevdigere belam Memê Alan li hemberî evîna xwe sist dibe, ti tişt nayên hişê wî, hew dixwaze bi Zînê ra têkeve nava suhbetekê û tasek avê ji destê bigre. Zîn di van sahnayên li ser Kanîya Qestelê da bi timî li gorî aqlê xwe tevdigere û naxwaze qewimîneke mezin ji ber wan rûbide û ev yek jî bibe sedemê nexweşîyan.

Zîna Zêdan di piranîya destanê da wekî keseka hişmend tê li beramberî me. Erê ew keseka evîndar e lê di heman demê da aqilê xwe zû bi zû li hember dilê xwe nade alîyekê. Di nava destanê da evîndarîya wê çiqas be bi hişmendî tevgarîya wê jî ewqas e. Anku ew di avêtina her gaveka xwe da bi aqilane tevdigere.

2.2.3. Delalîya Wê

Zîna Zêdana delal û xweşik anku xoşdivîya spehî yaa Memê Alan. Zîn di nava destana me da kesekî pirhêl e, em li ser hin alîyên wê rawesitîyan niha em ê li ser delalîya wê ya di nava destanê da bi mînakdayîn, rawestin. Em ji destanê dizanin ku Zîn kesek pir berkeftî ye û qelendayîya pismamê xwe Çeko ye. Lê piştî ku ew û Mem hevdu dibînin êdî ev prensesa xweşik dibe evîndarê Memê Alan.

²³¹ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r.87.

²³² h.b.b.r.104.

Jixwe sedemê destpêkirina evîna Memê Alan û Zîna Zêdan delalîya wan bû ku ev yek hê di destpêka destanê da di axaftina navbera qîzên perîyan da tê li beramberî me. Ew du kesan wekî çeleng û delal dibînin û wesa pê bawer in ku li ser çelengîya wan ti kes nînin. Yek Memê Alan e ya din jî hebandîya wê Zîna Zêdan e. Zîna Zêdan dema ku j'alîyê qîzên perîyan ve tê koşka Memî, Memê Alan wê dibîne û teswîra wê û delalîya wê di wê kêlîyê da wiha tê kirin:

Mem peya bû li ser textê padîşane

Hate ber textê Zîna Zêdane

Rihet lihêf rakir li ser çavane

Nihêrî ko ne cin e, ne perî ye, esil beşer e û insan e

Çavê reş û belek, birî û bijangan xwe berdane ser kêlekê rûyane

Enîya gewr e, madenê zîvane

Biskên birewa xwe berdane ser hinarîkên rûyane

Bisk û qeter berdane ser gulîyane

Xwe berdane ser textê piştê û qolincane

Taximekî hûr jê re wûnane, berdane ser pêsir û sepetê derzîyane

Serên bisk û gulîyên sor mîna serê marê teyar badane

Ew çende hişk in, weke polane

Ko li zengûyên hespan kevin, wê qul kin, têkevin parxanê heywane²³³

Ew hê di destpêka destanê da bi delalîya xwe ya bêhempa tê li beramberî me. Jixwe ji van gotinên wênekirî jî dîyar e ka ev prensesa xweşik çiqas sipehî û delal e. Ji bo delalîya wê vebêjerê destanê gotinên ji rêzê bi neanîye delalîya di nava edebîtîyeka tekûz da li hev anîye.

Her wekî me anîye ziman Zîn qelendîya Çeko ye, ew bi delalîya xwe binavûdeng e. Dema ku Qîza Beko behsa wê û rewşa ku ew tê da ye behs dike, wiha dibêje:

Niha, ya ko tu ji bo wê darî, Zîn e

Dotmama Hesên, destgirtî û qelendayîya Çeko, ezîza Qeretaçîn e

Xwedê zane, Çeko van rojan dike bizewice, Zînê bi der xîne

Mîr şem û Mîr Sévdîn di rîya wê da sekinîne

Xeber dane Hesên ko em giştik pismamên hev in, û ne bîyanî ne

²³³ h.b.b.r.34.

Te Sitîya çavbelek bir, Zîn jî ya me ye; yê ko qala Zînê bike, bila xwe ji bo mirinê hazir ke, bişidîne

Hesen got: ‘Ev sê sal in, me ne hişt malê karwan û ticarane

Me gişkê civand, kire zikê Zînê û Mîr Ezîn, Mirê Botane

Gava em dikin berin, hon niha hatine, bûne pismamê qîzane

Tu dizanî, ez î dîn û girgîn im. Ezê şûrê nêriz ji kalên bikişînim

Min digot: ‘Ezê Zînê piştî çend rojan bi der xînim

Madam ko hat bi vê yekê sekinî, helalê Xwedê li min heram be, ko ezê niha, ro li taştîyan, ji mal bi der nexînim

Ezê hinga zora we bînim .’²³⁴

Em ji van beytên li jor dibînin ku delalîya Zîna Zêdan navdar e û ew bûye sedemê hin arîşeyan di nava xelkê da. Pismamên wê ji ber wê dikin ku pev biçin, her yek Zînê ji bo xwe dixwaze. Ew amade ne xwîna hev birijin ji bo Zîna Zêdan. Zîna Zêdana vê delalî û sipehîtiya xwe tenê ji hebandiyê xwe Memê Alan ra dihêle ne bi tu kesekî din ra.

2.2.4. Hin Taybetîyên Din ên Zîna Zêdan

Zîna Zêdan jî wekê Memê Alan di nava destanê da keseka pirhêl e. Em heta niha li ser evîndarî, aqilmendî û delalîya wê rawestîyan. Niha em ê di bin vê sernavê da li ser hin alîyên wê yên din ên ku me tesbît kirine rawestin û hin hilsengandinên xwe li ser bikin.

Yek ji alîyên din ê Zîna Zêdan ku li ber çav e şîretdayînen wê ne. Dema ku ew û Memê Alan li ser Kanîya Qestelê ketine axaftina di nava axaftineka kûr da, Zîn bi timî baqilane tevdigire û naxwaze bûyereke nerênî ji ber wan rûbide. Ji ber wê gellek caran şîretan li Memê Alan dike. Li ser rewşa wan a ku tê da wiha ji Memê Alan ra dike şîretan:

Ma çavê min rijîyane ko ez vê çarşefê li ser çavê xwe rakim li cem van qîzane?

Welah, welah, ko ez çarşefê bilivînim li ser çavên xwe, bajar gişkê hilweşe van derane

Wê me her diyan bavên ber devê şûrane

Ma tu nizanî ko berê xelkê Cizîrê bûne sê bendane

Wê li ser me bi hev kevin, mîna guran li erdê hildin laşê mêrane

Xwîna mêran wê bimeşe li erdê, mîna çemane

Wê li ser Kanîya Qestetê bibe şîngîna şûran û tasên mertalane

Ez nekevime ber rûhê xwe û wê koma merîyane

²³⁴ h.b.b.r.55.

Lê xelkê bêje: Heyfa Padişahê Kurdan, Memê Alane

Ko li welatê Cizîrê çû bê pişt, di rûyê toleke jinane!

Tu li gorê min ke, serê vî heywanî rihet vegerîne, here ber derê Hesên, Çeko û Qeretacîn, wane

Ji Xwedê berjêr ewana wê ji derdê min û te ra bibînim dermane²³⁵

Ji van gotinên Zînê Zêdan ên li jor jî dîyar e ku ew keseka şîretbêj e. Ew naxwaze di carekê da bikevine li ber bayê evîna xwe û ji ber wan bûyerên nexweş rûbidin. Ji ber wê bi îtidalî tevdigere û şîretan li Memê Alan dike ku rakirina çarşefa li ser rûyê wê û axaftina digel wî dê bibe sedemên bûyerên xeternak. Li vir em ê cardin berê xwe bidin çavkanîya xwe ya dêrîn ya Bayezîdî. Ev mesele dikeve di nava sînorên serxwebûn û azadîya jinê da û li ser vê meseleyê Bayezîdî wiha dibêje: Waqî'a (bûyera) revîna jinan ji mêran di nêv wan da adet nînin. Jin û keçêd wan ji kesî narevin. Weku miletê Efrencîye ew jî serbest in. Lakin bi wê ihtiqadê (bawerîyê) ko ew xirabîyê nakin. Îlla eger yekê ji wan şola xirab kirin, çare nînin elbette ewê dikujîn.²³⁶ Ji van gotinên Bayezîdî jî dîyar in ku jinên kurdan serbest in û bîsteh bi mêran ra daxivin. Jixwe Zîn jî dema bi Mem ra daxive serbest e belam ji ber ku ew qelendîya Çeko ye û êdî kêr zêde xelk jî jê hayedar in sedemê hatina Memê Alan lewma bi aqilane û şîretbêjane li ber Memê Alan digere. Ew dizane ku xelk bi ya dilê wan hesîyaye û hê ku ti kes nehatine divê ji wir biçin. Ji van gotinên wê têne der ku ew keseka torezan jî.

Memê Alanê evîndar li hember şîretên Zînê ti reftarekê nîşan nade, ew li gorî hest û evîna xwe tevdigere. Di talîyê da Zîna Zêdan him ji bo başfamkirina meseleyê him jî wek şîret li Memê Alan vedigerîne û wiha dibêje:

Zînê got: Lolo, Memo, dilê min bi kulan û bi jan e

Madam ko tu guh nadî ser şorê merîyane

Di berê da, xelkê kêmanî xistine derê me jinane

Dibêjin: «Jin parsîya kêr in, dibin ser hev de û rûreşîya dê û bavane

Were, destê xwe bavêje destê min, û min çek ke ser piştê Bozê Rewane

Berê xwe bide welatê xwe, Bajare Mixribîyane

Bila heywan me her dîyan bere, bigihîne xwedîyane

Emê xelas bin, û bifilitin ji şor û gotinane

Ne jî li ser me dimîne tirsê mêrane

Ne jî ji bo me dirije xwîna tu kesane²³⁷

²³⁵ h.b.b.r.101-102.

²³⁶ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r.48.

²³⁷ h.b.b.r.102-103.

Zîna Zêdan ji bo ku him Memê Alanê evîndar û sergerm qanîh bike û dilê wî henûn bike him jî ji bo ku bala xelkê Cizîra Botan nekşîne li ser xwe û Memê Alan çi şîretên ji destê wê tê dike. Di van gotinên wê da dîyar in ku ew him naxwaze evîna wan bibê sedemê rûreşîyekê him jî bibê sedemê xwînrijandinekê. Şîretan li Memê Alan dike ku wê birevîne û ji vê rewşa tengavî wan her duyan derxîne.

Zîna Zêdan Prensesa Cizîra Botan e, tevgerên wê jî li gor prensesbûna wê, rengvedanekê li ser statuya wê vedide. Anku ew xudanstatu ye û tevgerên xwe jî di vê çarçoveyê da davêje. Dema ku bi awayekê dihesê Memê Alan hatîye bajarê Cizîra Botan vê fursendê baş bi kar dibe û ji ber statuya xwe ferman dide xidamên xwe da û wiha ji wan ra dibêje:

Herin, ji min ra bicivînin qîzên began û axan û giregirane

Bila nemînin, werine vir, îro şeş meh in ko derneketime ger û seyranane

Dilê min heye ko herime ser kanîya Qestelê, û vexwim ji ava gulane

Hinekî bigerim li ser mêrg û çayîrane²³⁸

Zîn statuya xwe ya heyî baş bi kar tîne tavilê gazî keç û bûkên axayan dike. Fermana xwe dide û li ser gotina wê jixwe keç û bûkên axa û began kom dibin û tên diçe li ser Kanîya Qestelê.

Dema em bi giştî li vê destana xwe dinerin em dibînin Zîna Zêdan piştî dîtina Memê Alan dibe evîndarê wî. Hertim li benda wî ye û ji bo vê evîna xwe, xwe dilqahîm digre belam em carekê jî be digel hêvîşikestina wê herwiha şîyana wê jî têk diçe. Ew êdî kêr jî di ramanên xwe da jî be dev ji Memê Alan berdide. Ku ev pasaja li ser wê dîmen û ramîna Zîna Zêdan wiha ye:

Mehên Zîne timama bûne şeşane

Tu xeber derneketin ji hêla Mem û ji bajarê Mixribîyane

Serekî direj Zîn fikirî di xewna şevane

Got: "Mala min bişewite, ji bona xewneke şevan, min xwe kire cihê bodelane

Min cilê xwe avêtin û di histîyê xwe da danî kîrasekî erebane

Xwe hepis kirîye di nava çar dîwarane

Ev giştik ji bona Memê Alan, padişahê bajarê Mixribîyane

Ma gelo niha qet ez bi bîra wî dikevim?

Belkî jî niha ji xwe re eciband keçek ji keçên mezinên Mixribîyane

Belkî ez nakevin bîra wî di xewnane

²³⁸ h.b.b.r.74.

Ma li min çî qewimîye, destgirtîyê min Çeko, qesabê mêran e
Ez bi tenê xwe davême ber wehmane
Min ji saetekê pirtir ne di Mem, Padişahê Kurdane
Belkî jî bi şor û emelê xwe ne camêr be, her wekî cemala serçavane
Ko ne wer bûya, elbet, heyânî niha, wê bi der keta li pêşîya xeberane
Ma ev nizane ko ez jinek im, tu caran jin nagerin li welatan, li pê mêrane
Adetê dinê ew e ko mêr digerin li pê jinane
Ko eger bi min ra î rast bûya, wê heya niha qasidê wî bihata van derane
Qey zihar ko di dilê wî de tune van yekane
*Êdî ji bo wî dilê xwe êşandin ne karê aqilan e.*²³⁹

Em di nava destanê da cara pêşîn û dawîn rast li wê yekê tîn ku Zîna Zêdan êdî li hember nehatina Memê Alan şîyanşikestî ye. Ev di destanê da dilsistîya Zînê ya herî mezin e, wê ji bo Memê Alan dest bi qelendîyê xwe yê salan berdabû. Lê di vê derê da em dibînin ku vê carê wê dev ji Memê Alan berdaye. Herwiha Zîna Zêdan wesa pê bawer e ku lazim e xort li dû qîzan bigerin. Ev yek jî nîşaneyê sembola kevneşopîyêka baviksalarîyê ye.

Zîna Zêdan di nava destanê da her çiqas kesekî rûnêrm û dilnêrm be jî carna ew jî dibê keseka dilhişk û dilkevîr. Ew li hember xidamek xwe wiha gefan dixwe:

Zînê got: Carî Rihanê îro derewek kir, nakeve sere merîyane
Ez dikim bi xwe dakevim kanîya Qestelê, bikevime pê van derewane
Eger hineke din jî gotin hatîye padişahê bajarê Mixribîyane
*Ezê Rihanê ef kim, lê ko derew be, ez zanim ko bînime serê wê çî bêtarane.*²⁴⁰

Zîna Zêdan di destanê da her çiqas keseka pîyar be jî di van gotinên wê yên nobran da em herwiha gefxwarina wê ji bo xidama wê jî dibînin. Anku carna dilrehmîya wê vediguhêre şiklekî dilreq jî.

2.3. Bekoyê Ewan

Dema mirov li destana Memê Alan dinêre dibîne du evîndarên sereke yên vê destanê hene. Yek Memê Alan e û ya din jî Zîna Zêdan e. Ev her du evîndar ne bi dilê wan jî be hevdu dibînin û piştî dîtina hevdu evîndarê hev dibin. Ji bo ku bigihijin mirazên dilên xwe ew her astengîyê piştguh dikin û di ser ra baz didin. Belam evîna wan naçe serî û mirazê wan nayê cih. Sedemê herî mezin ê negihîştina Mem û Zînê bêguman Bekoyê Ewan e. Beko ji bo evîna Mem û Zînê berpêlka herî mezin e. Em ê niha li ser lehengê Bekoyê Ewan rawestin û li gorî

²³⁹ h.b.b.r.69-70

²⁴⁰ h.b.b.r.73

tevgerên wî yên di nava destanê da bi mînakên ji destanê hilsengandin û nirxandinên xwe bikin.

Memê Alan piştî dîtina Zîna Zêdan hew debar dike û textê xwe ji bo berdilka xwe diterikîn e û berê xwe dide Cizîra Botan. Dema ku nêzî Cizîrê dide li rastî rûbarekê tê, dixwaze ji wir derbaz bibe lê nikare. Hew dibîne keçek li wir e û dixwaze wî bixapîne, ji wê keçikê bawer nake û bi arîkarîya şivanekî derbazî alîyê din ê rûbarê dibe. Piştî ku derbazî alîyê din dibe, ew keçik cardin jê ra dibe bela û lê Memê Alan bi tu awayê rê nade li ber wê keçikê û dawîyê jî piştî hildana sozekê keçik (Qîza Beko) bela xwe jê vedike û şîretan li wê dike. Di dema şîretên wê da em rastî li navekê tên, ew nav Beko ye, Bekoyê Ewan e. Qîza Beko di şîretên xwe da Memê Alan hişyar dike û li hember bavê xwe ji wî ra wiha dibêje:

Ko tu ji cem min çûyî, kalekî rîspî, di dest da kitêbeke remlane

Bi hikmê remlan dizane ko tuwê werî bajarê Cizîra Botane

...

Bila tu zani bî ko, heta nexapî bi bavê min, Bekoyê şeytane

Mala wî koxeke biçûk e, mîna pîna mirîşkan e

Ko tu têkevî, wê bifetisî, nema vedigerî ji dîya pîr û kalê bavane²⁴¹

Dema em li van şîretên Qîza Beko dinêrin em hê di destpêkê da li rastî xêrnexwazî û ewantîya Bekoyê Ewan tê. Wî kirasê şeytantîyê li xwe kirîye û li benda Memê Alanê bêguneh rawestîyaye. Li vir da yek ji tiştên balkêş ew e ku, em lê rast tên, Bekoyê Ewan kesekî remilavêj e. Vê taybetîya xwe ya remilavêjîyê bi kar tîne û dizane ku dê Memê Alan bê. Ev taybetîya remilavêjîyê karekî şeytanane ye û ev kar jî, sereke karê wî ye.

Bekoyê Ewan piştî zanîna hatina Memê Alan bo Cizîra Botan, tê li hemberî wî û wî pêşwazî dike. Dixwaze wî bike mêvanê xwe û belayekê bi serê wî da bîne. Ji ber wê bi awayekî derasayîyane diçe nameyêke mohra bav û apên Memî li ser peyda dike û dide destê Memî. Li vir da tiştê balkêş ew e ku, em nizanin ka wî ev yek li ku peyda kirîye û çawa peyda kirîye. Digel van pirsên bêbersiv bi awayekê dixwaze Memê Alan pê bixape belam ji ber şîretên Qîza Beko, Mem pê bawer nake û bi dîtina fersendekê ra ji nav destên wî difilite.

Bekoyê Ewan hertim li dû şeytantîyekê ye, ew çaverê ye ku bi awayekê Memê Alan ji holê rake. Ji bo vê jî her li benda fersendekê dipê. Roja li ser Kanîya Qestelê mihebeta Zîna Zêdan û Memê Alan li ber çavê xwe tê kirinê, wê rojê hemû kes li gor xwe li ser vê hevdişinê desst bi tevnê fesadîyan dîkin. Ev tevnê fesadîyan her ku diçe berbelavtir û mezintir dibe. Karê fesadîyê dikeve di nava sînorên Bekoyê Ewan da lema jî kesek tê û meseleyê ji Bekoyê Ewan ra dibêje. Ji ber ku Beko bi qasî ku zehlê wî ji her sê Celalîyan diçe ewqas jî ji wan ditirse. Loma li çareyan digere ku wan ji holê rake. Hêz di destê wî de tine ji bo pêkanîna jîholêrakirina her sê Celalîyan û Memê Alan. Hêzê li cem Mîrê Cizîrê, Mîr Ezîn, dibîne lê ji ber tîrsa Mîr Ezîn û kuştina xwe rasterast meseleya Mem û Zînê ji Mîr re venabêje. Ew ji ber

²⁴¹ h.b.b.r.56.

ku kesekî ewan e dizane ku sameka Mîr Ezîn ji her sê Celalîyan heye. Vê yekê jî dixwaze baş bi kar bîne. Awayê fesadîya xwe diguherîne û meseleye bi şêweyeke din wiha ji Mîr Ezîn ra dibêje:

Bekoyê şeytan çû cem Mîr Ezîn, digot: Mîro, dilê min liyan e!

Xwe biparêze li pismamê xwe, Hesên, Çeko û Qeretacîn, her sê birane

Li serê te digerînine şor û tevdîrane

Tu hildayî ser darê û di bin te da dikin bibirin gulîyane

Mêrine dilxwar û zikreş in. Beqalekî welatan hatîye, li mala wan bûye mêvane,

Jê ra dibêjin Memê Alan, Padişahê Kurdane

Dibêne, yanî kurê Mîrê Mixribîyane

Dikin te ji mîrîtî bi der xin, wî li şûnga te bikin mîr û hakimê bajarê Cizîra Botane

Ji mala we ra, ji bo rastîyê, min sond xwarîye bi bav û kalane

Gava min bihîst ev yeka hane

Ez bezîyam û hatime cem te û dibême ka te çi emr e û çi ferman e?²⁴²

Beko ji ber ku lawazîya Mîr Ezîn a li himberî her sê Celalîyan dizane, vê yekê wekê ji van gotinên li berjor jî dîyar in baş diemilîne. Ew hêza Mîr Ezîn û şeytanîyên xwe zaf pêbawer e lewma jî vê yekê baş li hev tîne. Bi fêlbazî Mîrî dixapîne, Mîr Ezîn ji ber ku li wî dixape Beko jî dest bi plana jiholêrakirina Memê Alan dike. Tiştê ku di serê Beko da heye ji Mîr Ezîn ra dibêje, Mîr jî ji ber tîrsa windakirina Mîrîtîyê gotinên Beko bi cih dibîne. Ew hemû tiştan bi plangerî û şeytanî dike lewma jî ji Mîr ra plana xwe wiha aşkira dike:

Emê xeberê bidin zabitan û leşkerane

Gava hatin, rûniştin li ser nane

Ezê fermanekê bi navê Mîr binivîsînim, ko Ecem serî rakir û têne ser bajarê me Cizîre Botane

Herçî dest çu digirin ji çarde salî heya bi kalê şêst û pêncane

Ne kor, ne kulek, ne xerîb û ne jî mîr, bila gişkî hilgirin sîlehane

Bajêr berdîn û bihêlin ji bo pêrekane

Siwar siwar bin, ji îro da heyani sibe bi van çaxane

Xwe bigihînin serê çîyane

²⁴²h.b.b.r.112.

Li pê dijmin rawestin, şalê neyê, nekeve bajarê Cizîra Botane

Irz û 'eyalê me nekeve ber lingane

Vê fermanê bixwîne ji bo wane

Tu bêje: Ne wexta sekinînê ye, yelah kes mesekinin li van derane

Giş bi der kevin serê çîyan û bikolin meterîs û tawîyane!

Tu min deyne ser nan û erzaqane

Ezê di nanê Memî kim axûya Silêmanî, ko nemîne du saetane

Bimire û kes bi sebebê mirina wî nizane

Emê bi vî awayî xelas bin ji şîrê wane²⁴³

Ji van gotinên Bekoyê Ewan jî têne der ew kesekî şeytan û xêrnexwaz e. Ji bo ku Memê Alanê lehenge sereke yê destanê ji holê rake an jî têk bibe her tiştê ji destê wî tê dike. Ew di destanê da hew ji bo xirabî û tiştên neçê tevdigere. Piştî ku plana xwe ji Mîr Ezîn ra vedibêje û j'aliyê Mîr ve tê pejirandinê wêca dest bi plansazîya xwe ya namerdana dike. Hemû tişt li gor dilê wî diçe, kêfa wî di cih da ye. Lê wî hê Memê Alanê hişmend nas nekirîye, ew Memê Alanî wekî kesek ji rêzê kêmtecrube dibîne û dihesibîne. Belam Mem her çiqas ji plana Bekoyê Ewan hayedar nebe jî ew bi hişmendane tevdigere û plana Beko ya derewîn têk dibe. Beko li bendê ye ku Memê Alan were û wî jehrî bike lê tişt li gor dilê wî naçin û hew dibîne Memê Alan digel Mîr û di nav siwaran da nîne. Li hember vê yekê plana wî têk diçe û bi şeytantîyek din cardin kesên ku bo şerî hatine vedigerîne Cizîrê.

Bekoyê Ewan tim bi dilxirabî tevdigere, armanca wî ya sereke têkbirina her sê Celalî û Memê Alan e. Ew Mîr Ezînî him wekê kesekî hêzdar dibîne û him jî ziafîyetên wî yê heyî baş bi kar tîne. Dema ew pêşîya Celalîyan vedigerine Cizîrê, dizane ku Memê Alan li ba Zîna Zêdan e. Lewra bi fêlbazî û şeytanî berê Mîr dide herema jinan, dema diçe li wir wekî texmîna wî derdikeve û Mem li hêla jinan da ye. Li hember vê yekê Beko dixwaze vê firsendê baş bi kar bîne û ji bo navtêdana meseleyê ji Mîr Ezînê qeherî ra wiha dibêje:

Beko got: Binihêre, mîro, min ji te ra ne got dirvê Memî yê xayînan e

Te digot birin bû û min vegerand ko here birîna xwe bike dermane

Ma çî îşê wî heye li hêla heremê, nav jinane?

Ji te ra ev yeka bû eybeke girane

Gava xelkê bajêr bibihîse van tiştan,

Par û hêvîya me nema di xelkê van bîst û pênc mihelane²⁴⁴

²⁴³h.b.b.r.114.

²⁴⁴h.b.b.r.125-126.

Beko li hember Mîr Ezîn bi şeytanî tevdigere, dixwaze wî li hemberî Memê Alan baş biazirîne û paşê Memê Alan an bide girtinê an jî bide kuştinê. Mîr li hember van gotinên şeytan ên Beko bêtir li hember Memê Alan hêrs dibe. Mîr jî wekî xwastina Beko tevdigere, ji ber ranebûna wî, ji ber hatina wî ya hêla odaya jinan û ji ber nedîtina birîna Memî pîrr tengazar dibe û ew bi Beko ra destê xwe davêjine li ser şûrê xwe. Sitî bi awayekê ji Memê Alan û Mîr hayedar dibe, meseleyê ji mêrê xwe Hesên ra dibêje. Hesên ji bo ku Mîr û Bekoyî dûrî Memê Alan bike her cure fedakarîyê dike. Belam çî dike nake nikare bi Mîr Ezîn ji odeyê derxe ji ber ku li ba wî Bekoyê Ewan heye û ew jî her kirina Hesên pûç derdixe. Ew kesekî xêrnexwaz e lewra tam li gorî taybetîya lehengê xêrnexwazî, fesadî û namerdîyê tevdigere. Her cara ku Mîr dixwaze ji odeyê li ba Memê Alan derkeve û berê xwe bide bi alîyê Hesên ve lê ew bi awayekê Mîr dixapîne. Piştî van gotin û kirinên Beko em dibînin ku êdî Mîr bi tevahî dikeve di bin karîgerîya Bekoyê Ewan da. Mîr dema dibihîse Hesên agir bi mala xwe daye û dixwaze bi gotina xwîşka xwe, here hawara pismamê xwe belam Beko wiha agirê dilê Mîr da gurtir dike:

Bi dizî di guhê Mîr da got: 'Xwedê bişewitîne mala wan kesane

Ko tu kirî Mîrê Cizîra Botane!

Ma tu guh didîyê gotinê jinane?

Belkî ar ketibe kadîna wane

Dixwazin te birevînin li pêş Memê Alan bi fên û fûtane,

Sibe jî bi ser hev da serê te kin û bêjin: 'Mîr revî li ber Memê Alane!''

Rûne, di cihê xwe da giran be mîna kevirê koşane.'²⁴⁵

Beko êdî Mîrî dike pêlîstokek di destê xwe da, Mîr bi gotina Beko radibe û rûdinê. Ew meseleyê baş dizane ji ber wê dixwaze Mîr jî meseleyê fam bike. Belam ji ber ku cureta wî tine ji Mîr ra bêje lewra naxwaze wî li dûrî Memê Alan bike. Ji bo ku Memê Alan têk bibe ew derfeta heyî baş bi kar tîne û li himberî her rûdanekê bi şeytanî tevdigere. Ew bi dek û dolabên xwe nahije ku Mîr ji cihê xwe rabe. Herwiha li vir da tiştê din a ku ji me ra balkêş hat ew e ku Bekoyê Ewan kesekî feodal e û ti hirmeta wî ji jinan ra tine. Dema ku Mîr dixwaze rabe biçê, ew li hember Mîr derdikeve ku ew ê çawa guh bide jinekê. Ji van gotinên wî da em alîyê wî yê feodal û paşverû jî dibînin.

Beko di destanê da hertim li dû nexweşî û xêrnexwazîyan e carna ne bi dilê wî jî be ew li bereksê lehengê xwe tevdigere. Ev tevgerîna wî carna dibe sedemên rûdanên erênî jî. Dema ku Bekoyê Ewan bi awayekê Mîr û Memê Alan di odeyê da bi zeff dike, dixwaze belayekê ji destê Mîr bîne serê Memê Alan. Belam hew dibîne ku Mîr li dû gotina Sitî derdikeve ji derve û ew jî dibîne ku ji bin kurkê Memê Alan yê li ser pêyên xwe kişandî da jinek derdikeve. Bi vê dîtîna ra dike qêrîn û Mîr dizane tiştê çêdibe û li paş ve vedigere hundir û we dizane ku kesa revî çûyî odê ya Zîn yan jî jina wî ye lewma bi şûran ew û Mem radibine hevdu. Li wir sahneyek wiha pêk tê:

²⁴⁵ h.b.b.r.129.

Beko dizanî bû ko tiştêk wê çaxê were ser Memî nikane xwe xelas bike ji destên her sê birane

Hema revî, hat kete nava wane²⁴⁶

Ji vê sahneye jî xwîyaye ku Bekoyê Ewan bi dilê wî jî be dibe sedemê tiştêkî erênî. Ew li vir da li bereksê tîpolojîya xwe ya di destanê da tevdigere. Ew her car dibe sedemên tiştên nexweş û neçê belam vê carê bi nexwastin be jî dibe sedemê rûdaneka erênî. Lê divê mirov vê yekê jî bîr neke ku sedemê vê kirina wî ya erênî jî cardin di binyada xwe da, xwe dispêre xwefikirînekê. Anku ew ne ji dil dibe sedemê neşerkirînekê bereks ji ber ku ew dizane her sê Celalî dê wî bikujin lewma dikeve di nava Mîr û Memê Alana da.

Piştî ku sefer radibe li ser eceman, her sê Celalî berê xwe didine seferê, Mem jî dixwaze bi wan re here lê Celalî nahijin ku ew bê. Li ser vê Mem li mal de dimîne, ev jî dibe fersend ji Beko ra da ku dek û dolabên xwe bîne cih. Mîr ji ber kiryarên dawî pirr diponije Beko jî vêya wekî fersend dibîne û diçe li ba Mîr, wî cardin li gor xwe bi awayekê dixapîne û Mîr dike esîrê gotinên xwe. Mîr jî tiştê ku ji devê Beko derdikeve rast dibîne. Li ser vê Beko planekê çêdike, li gor wê gazî Memî dikin, lîstika şetrencê datînine li ber xwe da ku bi fêlbazîyekî Memî têk bibin. Berîya ku dest bi şetrencê bikin Beko û Mîr dixwazin bi şertanê bilîzin, Mem vê yekê qebûl dike û dest bi şetrencê dikin. Bekoyê Ewan di wê hizrê da ye ku wê bi Memê Alan di şetrencê da têk bibin. Belam Memê Alan ne mêrekî dera hanê ye ew bi aqilmendî tevdigere û her carê Mîr Ezînî di şetrancê da têk dibe. Beko li ser vê yekê dikeve fikarin ji ber ku ew dizane nikare bi mêranî Memê Alan têk bibe û lê dinêre Zîna Zêdan li pişt şibaka Memî ye û li Memî temaşe dike vê yekê wekê keys dibîne û wiha ji Mîr Ezînî ra dibêje:

Beko kenî, pê şa bû, gote Mîr: Mîrê min, ezbenî

Di lehîstikê de siûda mirov carina bi cih têt

Ji lewre divêtin Mîr û Mem cihên xwe bi hev din

Bila Mem here şûna Mîr, Mîr li şûna wî rûnit²⁴⁷

Beko kesekî bi mêrxasane tevnagere û hertim di fikira têkbirina Memê Alan da ye lewra vê bi dîtina Zînê ra vê dike firsend. Ji ber ku dizane ne ji alîyê aqil va ne jî ji alîyê mêrxasîyê va nikare Memê Alan lewra vê firsendê li hemberî Memê Alanê evîndar baş bi kar tîne. Ew rêya dek û dolabên şeytanane baş dizane lewma dev ji van bernade û bi namerdane dikeve li ser van rêyan. Ew dibe sedem ku Memê Alanê bêguneh û evîndar têk here û bibe dîl.

Heta vê derê me dît ku Bekoyê Ewan bi şeytanî û namerdane li hemberî Memê Alan tevdigere û ji bo têkçûna wî serî li her cure tiştên xêrnexwazîyê dide. Baş e divê em vê yekê safî bikin ku ka çima Bekoyê Ewan li hemberî Memê Alan evqas aciz e û naxwaze ew serbîkeve. Ji bo bersiva vê pirsê divê em pêşîyê berê xwe bidine naveroka destana xwe. Di

²⁴⁶ h.b.b.r.130.

²⁴⁷ h.b.b.r.136.

cihekî destanê da em lê rast tèn ku sedemê vê zehlçûyîna wî wiha ji aliyê vebêjerê destanê ve tê zimên:

Beko mîna şeytanekî mezin nava rîyê xwe yê kose tev didane

Ji xwe, berê hez ne dikir ji Hesên, Çeko û Qeretacîn, her sê birane

Jê ra rê vebû ko bike şeytanîyane

Mem jî hati bû, bûbû mêvanê wane

Beko difikirî mîna şeytanane

*Dixwest rêkê bibîne, pê winda bike Memî û Celalîyane*²⁴⁸

Ji van gotinên li jor jî aşkera ye ku ew ji ber ku ji Celalîyan hez nake û dixwaze wan tev li Memê Alan ji holê rake. Ji bo vê yekê jî hevdîtina Memê Alan û Zîna Zêdan baş bi kar tîne û vê yekê ji xwe ra dike firsend li hemberî heznekarên xwe. Lê her çiqas di van gotinan da ew bixwaze Celalîyan tevî Memê Alan ji holê rake jî lê cardin ev bersiv têra pirsê me nake. Li gorî ku me ji destanê derxistî yek ji sedemên here mezin ê zehlçûyîna Bekoyê Ewan li hemberî Memê Alan ew e ku, ew dixwaze bibe xwedîyê Bozê Rewan û zêr û gencîneyên Memê Alan. Divê em baş bînin bîra xwe ku berîya ku Mem were Cizîra Botan, Bekoyê Ewan remilan davêje û dizane ku kesekî dewlemend dê were Cizîra Botan. Lewra amadehîyên xwe dike, ji xwe ra nameyekê bi mohra bav û apên Memê Alan peyda dike. Tê pêşîya Memî û wî bi awayekê ber bi mala xwe ve dibe belam Memê Alan ji ber şîretên qîza wî, li wî naxape û ji nav destê wî direve û ev yek wî hê hêrstir dike û êdî tim dibe sedemên têkçûyînen Memê Alan. Herwiha divê neyê jibîrkinê ku Bekoyê Ewan kesekî feqîr e, dema em sahneya malê wî bînin bîra xwe em baş têbigihin ku ew di maleka gemar û feqîr da ye. Lewma dixwaze bi dek û dolab gencîneyên Memê Alan û Bozê Rewan ji wî bistîne.

Di piranîya destanê da Bekoyê Ewan kesekî neyînî tê destnîşankirin. Jixwe ew bi xwe di nava destanê da bi navên xirab tê nîşandan. Beko di tevahîya destanê de ji lehengê xwe qet tavîz nade, di serî heta dawîyê kesekî fesad, hîlebaz, bêbext, newêrok û derewkîn e.

2.4. Lehengên Din ên Destanê

Ji bilî van lehengên sereke yên ku di vê destana me ya qerase da diborin em ê di bin banê vê sernavê da binirxînin. Ji ber ku di destanê da em nikarin hemû lehengan bigrin û li ser wan hilsengandinên xwe pêk bînin. Em ê hin lehengan li gorî aktîfbûna wan a di destanê da û li gorî xwe hilbijêrin û hilsengandina wan bikin.

2.4.1. Hevrêyên Memê Alan

Di nav hevrêyên Memê Alan da em dikarin bibêjin him her sê Celalî him jî Beglî cih digre. Hindî Memê Alan li bajarê Mixribê ye hevrêyê wî û destbirakê wî Beglî li ba wî ye lê dema ku ew ji Mixribê derdikeve û berê xwe dide Cizîra Botan êdî li dewsa wî her sê Celalîyên mêrxas cih digrin. Em ê niha hevrêyên Memê Alan li gorî tevgerên wan, ewana binirxînin û bihilsingînin.

²⁴⁸h.b.b.r.112.

2.4.1.1. Her Sê Celalî

Di vê destana me ya binavûdeng da yên ku bi awayeka canfidayane hevrêtîyê bi Memê Alan ra dikin bêguman Hesên, Çeko û Qeretacîn e anku her sê Celalî ne. Ew, dema ku Memê Alan ji wan ra dibe mêvan û heta ku li cem wan e, bi canfedayane û bi mêrxasane li ber fermana Memî ne. Ji bo mêranîyê ti caran xwe nadine paş û heta ku ji wan tê ew ji mêrxasîya xwe ti caran tavîz nadin.

Her sê Celalî di nava destanê da kesên canfida û mêrxas in, dema ku Memê Alan bi Qîza Beko ra dikeve axaftinekê Qîza Beko wiha qala her sê Celalîyan dike:

Hesên, Çeko û Qeretacîn, sibê heya êvarê girêdidin silehane

Karê wan pê da nijde û talan e

Dirijînin xwînê, dikujin mêrane²⁴⁹

Em ji van gotinên qîza Beko jê derdixin ku ew kesên talanker, xwînrij û mêrkuj in. Jixwe mirov şertên berê bifikire wê bibîne ku di nava kurdan de talan û xwînrijtin pirr hebû û ev yek tiştekî ji rêzê bû. Di berhema xwe da Bayezîdî jî tîne ziman ku: Ekradêd semtê Bohtan û Hekarîyan kêmbi ecelêd (mirina xwezayî) xwe dimrin. Ekserî tene kuştin. Lewranî ew ta'îfe gelekî şerqeda ne û tîz meşreb in.²⁵⁰ Her wekî Bayezîdî jî anîye ziman, kurd ji bo şerê navxweyî û hevkuştinê pirr zîrek bûn. Her sê Celalî jî wekê sembola nîjada xwe xwînrej û rêbir in.

Memê Alan kesekî xerîb û temenpiçûk e bi girêdayî vê yekê jî serborîyên wî kêmbi in. Ew dema dikeve li ser rêya Cizîra Botan ji bo eşqa dilê xwe, tek û tinê ye. Zehmetîyên heyî li paşguh dike, li gor hestên xwe tevdigere. Lê piştî ku tê Cizîrê dikeve tengavîyan, ji ber ku ew nizane biçê li ba kî. Dema ku li dû dermanê vê yekê digere, kalek ji wî ra mala Celalîyan bi pesndayîn wiha destnîşan dike:

Madam ko dawîya îşê te bi kuştina mêran e

Bila te bibin qonaxa Hesên, Çeko û Qeretacîn, her sê birane

Gava yek peya dibe li mala wane, Canê xwe telef dikin di rîya wane

Bi her awayî derman dikin kula dilê mêvanane²⁵¹

Em ji van gotinên li jor baş têdigihin ku mala her sê Celalîyan ji bo çareserkirina mesela evîna Memê Alan cihekî tekûz e. Ji ber ku weku xelk jî pê amaje dike, Hesên, Çeko û Qeretacî wekî sembola mêranî û qencîyê tê nîşandan. Ev her sê Celalî ji bo mêvanên xwe û hezkirên xwe canfida ne, xudanxîret in, bibext in û mêvanhez in. Ji ber wê jî Memê Alan piştî

²⁴⁹h.b.b.r.55.

²⁵⁰ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradîye, r.88.

²⁵¹h.b.b.r.65.

ku êdî tam piştrast dibe bi mêrxasîya her sê Celalîyan demildest dixwaze here mala her sê Celalîyan.

Her sê Celalî pismamên Mîrê Cizîrê, Mîr Ezîn in. Mêrxasî û sama her sê Celalîyan ne tenê li ser zimanê kesên ji rêzê ne, herwiha sîyaneteka Mîr Ezîn jî ji pismamên xwe anku ji her sê Celalîyan heye. Dema ku ew li ser her sê Celalîyan tîne bîra xwe, wiha li ser wan dirame:

Hele, di dehwîyên kuştina mêran û revrandina qîznû jinane

Pir caran, kes nedihate cem mîr û îşê xelkê diqedîn li mala her sê birane.

Gava diqarîn, Mîr nedihesibandin bi tu tiştane²⁵²

Mîrov ji van fikrînên Mîr Ezîn têdigihe ku xof û sameka Celalîyan li ser wî heye. Digel ku Mîr Ezîn, Mîrê Cizîrê ye jî belam ji wî pitir Celalî di nava xelkê da sîyanetê dibînin. Cizîrî û mîlet ji bo çareserkirina meseleyên xwe yê mezî û giring berê xwe didine qonaxa van her sê egîdan. Ew xudanbext in lewma tekane rawestgeha Memê Alan ji bo mala wan e.

Memê Alan dema ku yekser berê xwe dide mala her sê Celalîyan, Celalî qedrê wî baş digrin. Mêvanperwerîyek baş li wî dikin, ew jî dizanin ku Memê Alan ji bo meseleyeke mezî û muhîm hatîye mala wan. Ji ber vê yekê dixwaze Memê Alan sedema hatina xwe bi wan bide zanîn belam Memê Alan wek kesekî fedîyok tevdigere û nikare cisaret bike di carekê da sedemê hatina xwe bêje. Di vê navê da Hesên him jî bo cisaretkirina Memê Alan hem jî ji bo nîşandan mêrxasîya her sê Celalîyan wiha dibêje:

Ez Hesên im, wergî dîn im,

Ji bona mêvanê xwe, kela li polad im, mîna qapîya tûncîn im

Gava yek wekî te xwe li min digire, ez derbekê devê wî dilivînim

Ko çî di dilê wî da heye bi der dixînim

Madam tu li min bûyî mêvan, ezê serê xwe û her du biran di rîya te da deynim

Eger dawa te çî be, ro li nîvro, li kêlekê hikûmeta Cizîrê, berî saetekê biqedînim²⁵³

Hesên ji bo çareserkirina kula dilê mêvanê xwe serê xwe û serê her du birayên xwe di vê rêyê da amade ye ku bide. Jixwe di gotinên xwe da digel pesndayîna xwe fedakirina canê xwe jî dide li ber çavên xwe. Ew digel birayên xwe bi mêrxasî amade ne ku canê xwe di rêya mêvanê xwe da bidin lewma jî dixwazin demildest bielimin sedemê hatina wî. Dema mîrov li van gotinên Hesênê birayê mezî ê Celalîyan dinere baş têdigihe ku, her sê Celalî di destanê

²⁵² h.b.b.r.113.

²⁵³ h.b.b.r.76.

da tam sembola takê kurd e. Wekê kurdan ji bo mêvanê xwe an jî ji bo kesê ku xwe avêtîye bextê wan, canfida ne û di amadebaşîyê da ne.

Celalî digel mêrxasîyên xwe ji bo mêvanê xwe amade ne hemû tiştên erênî û nerênî pêk bînin. Piştî ku Hesên bi awayekê ji meseleya Memê Alan têdigihe diçe li ba birayên xwe û ji birayên xwe ra meseleyê vedike. Ji ber ku Hesên soz daye mêvanê xwe û bi telaqên xwe soz xwarîye loma li ber digere da ku bi awayekî lez soza xwe bi cih bîne. Loma ji birayên xwe jî soz digre û ew jî qebûl dikin gotina birayên xwe. Li vir her yek ji Celalîyan soz dixwin ku sozên wan jî ne sozên ji rêzê ne û soz û sondxwarinên wan wiha ne:

Niha ko li ser mala min bi xwe be, û ko dilketîya wî Sitîya jina min be, ko dîya zarokan e

Heya niha, helala min bû û ji îro bi şûn da, ji min ra weke xwîşkan e

Hon her du bira rûniştine, şehde bin, min bi kêfa dile xwe da Mirê Mixribîyane

...

Got: Bi vî şûrî, bi vê himêlîyê, ji hêla min va jî, hatina vî lawikî eger ser çar koşeyê bajêr be jî, qedîyane

Na ko ser malê me be û nefse me, her sê birane

Eger hati be ji bo Zînê, qalandayîya min ya sê salane

Xwedîya biskê birewa û qeterên gulîyane

Heya niha, xwestika min bû, û ji niha bi şûn da, xweyînga min e ji dê û bavane

Va gotina min, bi şehdeyê we her du birane

Min jî hiba kir û da Mirê Mixribîyane

...

Bi vî şûrî, bi vê himêlîyê eger ne bi ser jin û destgirtîyê we be

yê mayî bispêrine min ko, çi be, li ser serê min, bi şehdîyê we her du birane²⁵⁴

Her sê Celalî ji bo ku xwe bawer bin û ji bo ku her sê ji bo bicihînana vê meseleye sozên giran dixwin. Dema mirov li van gotinên wan dinere dibîne ku asta mêvanperwerî û mêrxasîya wan di çî astê da ye. Ew digel ku kesên ne ji rêzê ne jî ji bo mêvanê xwe hemû tiştê xwe dikin feda. Heta asta vê fedakarîyê ewqas bilind e ku ew ji bo mêvanê xwe dev ji jin û destgirtîyên xwe berdidin. Ew ti carî naxwazin li hember mêvanê xwe bikevine şermê û daxwaza dilê wî neînine cih. Piştî ku ew dizanin ku Mem ji bo Zînê hatiye wekî tişteki asayî Çeko di destpêkê da bertekekê li hember vê yekê nîşan dide belam Hesên û Qeretacîn bi şidet li hember vê yekê derdikevin, ew li hember Çeko didin. Heta ji bo daxwaza bicihînan

²⁵⁴ h.b.b.r.83-84.

mêvanê xwe kuştina birayên xwe jî dide li ber çavên xwe. Li dû van yekan Çeko jî soza xwe ya dayî digre û dev ji Zînê berdide. Piştî wê êdî Celalî bi timî ji bo rapêça dilê Memê Alan anku mêvanê xwe di beremrê Memî da ne.

Memê Alan piştî nasîna Celalîyan êdî ji xwe bawer e, di nava Cizîrê da piştqahîm e lewranî hereketên wî rihettir dibin. Dema ku Celalî rê li ber evîna wî vedikin, ew diçe li ser Kanîya Qestelê li ba Zîna Zêdan. Digel ku naveroj e û hemî Cizîrî li wan temaşe dikin jî ew bêminet e ji ber ku Celalîyan dilêr li pişt wî ne. Dema ku hin kes ji bo êrişê têne Memê Alan Celalî bi mêranî derdikevine li pêşberî wan û ew kes ji ber tirsê Celalîyan paşgav vedigerin. Asta fedakarîya Celalîyan ji bo Memê Alan ne yek e ne dido ye, ew hertim dilsoj û dilsozê mêvanê xwe nin. Dema ku Mem di koşka Mîr da asê ye Hesên her cure fedakarîyê dike. Ji bo ku mêvanê xwe ji cem Mîr xilas bike, ajalên xwe dikuje, agir berdide mala xwe û heta ew lawikê xwe jî davêje di nava êgir da. Di pirranîya destanê de mirov bi rehetî dikane bibêje ku ev her sê Celalî wekî sembola kesên mêrxas, mêvanperwer û bibextîyê ne. Bersiva kurdên ku divê çawa bin, ev her sê Celalî ne.

2.4.1.2. Beglî

Beglî di destanê de kurê xaltîya Memî, xwarzîyê Emer Begê û serdarê 1500 xortan e. Beglî heval û candostê Memî ye, her tim di bin emr û fermanên Memî de ye. Jixwe Memê Alan Beglî dike, hevrêyê xwe yê nêzîk û Beglî serleşkerê wî ye jî. Beglî di nava destanê da ji bo prensê xwe kesekî canfida û dilsoz e.

Piştî ku Memê Alan bi dîtina Zîna Zêdan serxweşê evîna wê dibe, êdî ji hal dikeve. Ew naxwaze ti kesî bibîne. Beglîyê biracanê wî li hember vê yekê xemgîn dibe û li ber xwe dikeve. Beglî dixwaze çareyekê ji meseleya birayê xwe ra bibîne lewma digel hemû cisareta xwe diçe li ba wî û jê ra bi mêrxasane wiha dibêje:

Got: ‘Bira, eman, hatîye serê te çi ecêba girane?’

Em duhî çûbûn nêçira pezkovîyane

Eger çavê te ketîye li qîzeke beg û axayên Kurdane

Hema tu li birayê xwe bike fermane

Ne bi ya min, bi ya Xudayê keremê, Padişahê padişane

Di nava bîst û car saetan da, ji te ra bînim ji nav bajarê Mixribîyanne

Eger meraqeke din ji te re bûye xweyane

Bêje, ezê niha biqedînim û wextê ji xwe naborînim, saetê nekim didîyane.’²⁵⁵

Beglî gurekî mêran e di nava destanê da. Ew hertim li ber fermana prensê xwe ye, heta ku prensê wî diçe bajarê Cizîra Botan, Beglî hemû tiştê wî amade dike. Beglî, mixabin di destanê da zêde cî nagre. Ew di serê destanê û dawîya destanê da rolekê digre weku din zêde naxwîye. Dema ku Mem dimire, Beglî ji bo tolvedana prensê xwe tê bajarê Cizîrê. Ew li

²⁵⁵ h.b.b.r.43.

hember mirina prensê xwe zaf li ber xwe dikeve lewma Cizîra Botan serobino dike û vedigere welatê xwe.

2.4.2. Mîr Ezîn

Mîr Ezîn, Mîrê Cizîrê, pismamê her sê Celalîyan û birayê Sitî û Zînê ye. Ew digel ku hakimê Cizîrê ye jî belam tirseka Celalîyan li ser wî heye. Di destanê da Mîr Ezîn zêde bi îradeya xwe û fikrên xwe tevnagere ew her di bin bandora Bekoyê Ewan da ye.

Mîr Ezîn di destanê da ji hatina Memê Alan heta ku wî dixwe zindanê, tim bi awayekê neyînî li hember Memê tevdigere. Ji bek ku ew Mîrê Cizîra Botan û her sê Celalî pismamê wî ne lewrani zaf jidestçûyî desthilata xwe ditirse. Bekoyê Ewan jî ji ber ku vê lawazîya Mîr ya li hemberî desthilatdarîyê dibîne lewma dixwaze vê lawazîya Mîr a li hemberî desthilatdarîyê bi kar bîne. Mîr Ezîn zêde di bindora Bekoyê Ewan da ye lewma ew li gorî planên Beko bi rêve diçin. Ew dixwazin Memê Alan bi awayekê ji holê rakin belam ji ber ku Memê Alan kesekî jîr û hişmend e lewma piraniya planên wan têk dibe. Dema ew bi awayekê ji plana wan xilas dibe û vedigere Cizîra Botan, zêde nakêşe Mîr û Beko jî li dû wî tên. Dema ku tên dibînin Memê Alan di herema jinan da ye Mîr zaf hêrs dibe, di ser ra jî Bekoyê Ewan bi gotinên fesadîyane hêrsa Mîr Ezîn mestir dike. Mîr Ezîn êdî xwe hew digre û wiha ji Memê Alan ra dibêje:

Got: "Memo, dilê min î lîyan e

Bira di dinê da kes neke çêyîyane,

Bawer nebe bî nezan û xerîbane!

Te bi min ra got: "Li min bûye birîneke şûrane."

Min jî ji te ra got: "Here mala Hesên û ji birîna xwe ra bibîne dermane

Tu hatî bajarê Cizîrê, ne sekinî li tu cih û derane

Ne jî ji birina xwe ra dît dermane

Te rast berê xwe da Birca Belek, hêla heremê, koşkê jinane

*Ev yeka ne karê camêr û mêran e!*²⁵⁶

Sedemên hêrsbûna Mîr ne tenê gotinên Bekoyê Ewan bûn, bêguman. Ji ber ku ew Mîrê Cizîrê ye û sembola desthilatdarîyê ye lewma kesên ji bilî xwe, wek kesên ji rêzê dibîne. Ji wan kesan hurmetê divêtin, rêzê divêtin û qedrê divêtin lê belê Memê Alan bereksê desthilatarî an jî hakimperestîya wî tevdigere. Li ser hakimperestîya Mîran Bayezîdî wiha dibêje: Û ehlê Ekrad eger xwecihî û eger rewend, qewî zêde hakimperest û axaperest in. Zêde ita'eta (fermanpejirandina, milxwariya ji bo) hakimman û mîr û axan dikin.²⁵⁷ Her wekî Bayezîdî jî anîye zimên kurd zêde ita'eta mîrên xwe da ne belam Memê Alan li hemberî vê yekê tevdigere. Ji ber ku ew Mîr e lewma dixwaze Memê Alan bi hatina wî ra rabe ser pîyan

²⁵⁶ h.b.b.126.

²⁵⁷ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, r.62.

û sembola hurmetdayînê nişanî wî bide. Herwiha ji ber ku wî birîna pîyê Memê Alan nedîtibû û baş pê ewle nebû û ji ber ku Memê Alan hatibû li mala wî û ketibû hêla jinan lewranî hêrsa wî yek be bi van ra dibe sed û yek. Ji ber van rûdanan bertek li nişanî Memê Alan dide û bi tundî wî rexne dike, belam nizane ku yê li hemberî wî ne kesek ji rêzê ye û ew jî wekî wî Mîr e heta Padişahê Kurdan e. Memê Alan li ber wî ti gotina danaqurtîne, li ber wî dide, gotinên wî bi bêminetane lê vedigerîne.

Mîr Ezîn di destanê da mirov bi rehetî dikare bibêje ku li gorî aqilê xwe tevnagere, ew di destanê da hema bêje bûye pêlîstokê Bekoyê Ewan û bi îradeya xwe tevnagere. Kesekî dilsist e, jixwenebawer e û bext lê nîne.

2.4.3. Sitîya Zêdan

Sitî xwişka Zînê û jina Hesênê Canpola ye. Di nava destanê de Sitî keseka dilnazik, aqilmend, serbixwe ye û di heman demê da jî xofeka Hesên li ser wê ye. Ew dema ku Hesên li malê ye pasîf e lê dema ku Hesên ne li malê ye mîna mêrê xwe, wekê malxwêyekê tevdigere.

Memê Alan dema di koşka Mîr Ezîn da li ba Zînê Zêdan e, Mîr di ser wan da digre. Sitî ji vê meseleyê hayedar dibe. Ji bo ku mêvanê xwe ji vê asêbûna wan xilas bike, wiha ji mêrê xwe ra dibêje:

Li hêlekê, mêvanê te ketîye tengîyeke girane

Li hêla din, xweyînga min maye di bin kurk û hewrane

Eger jê ra çarek nayê dîtin, rezîlîya mezin e, bi eban e

Zû here, eger bi kuştina birayê min be jî, Zînê xelas ke ji vê arî û rezîlîya hane²⁵⁸

Ji van gotinên wê jî dîyar e, Sitî ji mîna mêrê xwe Hesên mêvanhez û mêvanperwer e. Ew dixwaze Memê Alan di rewşa wî ya asê da bi awayekê xilas bikin, ji bo vê jî hawara xwe digihîne mêrê xwe da ku ew tiştekê bike. Herwiha ew di van gotinên xwe da aşkera dike ku ew keseka torepêr e, ditirse ku Zîn di bin kurkê Memê Alan da bête dîtinê û ev yek jî bibe sedemê rûreşî û tiştên neqenc.

Sitî ku wateya navê wê dibe ‘şabanî, qralîçe’, dema Celalî ji malê diçin ew peywira Hesên digre li ser xwe û wesa malê birêve dibe. Dema Mem dimre, xulam li ser daxwaza wê Bozê Rewan ji tewlê derdixin û Sitî ‘edetek berê ye kurdan tîne cih ku li gor wê ‘edetê ji bo şîna Memî hemî qîzên Cizîrê kom dike. Bozê Rewan ji tewlê derdixe, darê şîne datîne li ser piştê Bozê Rewan û heya sibê şîna xwe digre. Piştê diçe li cem pismamê xwe Mîr Şem, ji bo Hesên nameyekê dinîvîse, ku di nameyê da mirina Memî aşkera dike, wî dişîne li cem Celalîyan.

²⁵⁸h.b.b.r.128.

2.4.4. Qîza Beko

Qîza Beko cara pêşîn j' aliyê Xocê Xidir ve bo hişyarkirina Memê Alan, tê pêşberî em. Xocê Xidir hemû fen û hîleyên Qîza Beko, ji bo Memê Alan dibêje da ku ew pê nexape. Wekî Xocê Xidir gotî, bûyer diqewimin Qîza Beko Zînê tê pêşberî Memî. Çi dike nake Memê Alan li hemberî gotinên wê naxape. Ew ji ber ku dibîne Memê Alan kesekî hişmend û serwext e lewma dixwaze bi bêbextîyan wî tîk bibe belam Memê Alan li hemberî van jî tîk naçe. Piştra Qîzo Beko ji Memê Alan ra wiha dibêje:

Qîza Beko got: 'Divê tu bi min di soz û bextê mêrane

Eger Xwedê kir mirazê te bi Zîna Zêdane

Tuê bi destê min jî bigirî, bibî Bajarê Mixribîyane

Eger Zîn serdilka te ye, wê bi min va bibin didîyane

Bozê Rewan î xurt e, dikare bibe me her sîya heya bajarê Mixribîyane

Ez jî wê raber te bikim der û berane

*Ko li derdê te ra bibînim çare û dermane.'*²⁵⁹

Qîza Beko Zîn, di destpêkê da dixwaze Memê Alan bixapîne belam ji ber ku nikare hişmendîya Memê Alan tîk bibe lewra ew li hemberî Memê Alan tîk diçe. Ew di destpêkê da bi awayekî dilxirabane li nêzî Memê Alan dibe lê piştî ku nikare Memî lewma di carekê da dibe keseka baş û qenc ji bo Memê Alan. Ew hemû agahîyên rast yê li ser Cizîrê, hemû xeternakîyan ji Memê Alan ra dibêje. Zîna Bekoyê Ewan piştî hin agahîyan şîretên bi dûr û dirêj li Memê Alan dike da ku ew li hemberî ti kesî tîk neçe. Jixwe dema em li destanê binêrin em dikarin bibêjin bi arîkarîya şîretên Zîna Beko, Memê Alan di pirr deran da ser dikeve. Li gorî şîretên wê tevdigere, ji destê Bekoyê Ewan direve û li hember zehmetîyan tîk naçe.

Di destanê da zêde keseka aktîf nîne piştî sehneya digel Memê Alan cara dawîn di sahneyeka din da tê' beramberî me. Qîza Beko dema di sehneyeke din de tê pêşberî me vê carê ji bo bijehrîxistina Memî li dû xirabîyekê ye. Bi awayekê tê Zînê dixapîne, hinara bijehr dide Zînê, Zîn jî dide Memî û Mem jî bi xwarina wê hinarê dimire. Dema em bi giştî li wê binêrin ew hem di lehengeke erênî de tê li pêşberî me hem jî di lehengeka nerênî da tê li pêşberî me. Ew him dibe sedemên rizgarbûna Memê Alan ji hin tiştan him jî dibe sedemê mirina Memê Alan.

2.4.5. Şivan

Di destanê da yek ji lehengê ku tê li pêşberî me Şivan e. Di destanê da dema ku Memê Alan nikare ji avê derbas bibe şivanek tê tana wî. Ev şivan her çiqas di destanê da cihekî kêr jî girtibe lê cardin lehengekî arîkarê serlehengê destanê ye.

²⁵⁹ h.b.b.r.54.

Memê Alan dema ku dixwaze ji avê derbas bibe bi hêvîya dîtina şivanekî an jî rêwîyekî diçe. Li wir şivanek tê li hemberî wî, Mem silavê dide şivanî, şivan piştî lêvegerandina silavê, wiha ji Memê Alan ra dibêje:

Gotê: ‘Mêvano, tu bi xêr û selamet hatî, li ser çavane

Bêje hele ka te çî emr û çî ferman e ²⁶⁰

Şivan lehengekî erênî ye ew li ber emr û fermanê Memê Alan amade ye û dixwaze arîkarîya wî bigihîje Memî. Şivan arîkarîyê dide Memê Alan, rê li ber derbasbûna wî ya jî avê raberî wî dike. Di dema Memî ya tengasîyê da jê ra dibe arîkar û Memê Alan jî bi arîkarîya şivanî jî avê derbas dibe. Di destanê da navê vî şivanî nîne lê ew sembola xêrxwazî, qencî û paqijîyê ye.

2.5. Di Destanê Da Lehengên Mîtolojîk (Derasayî) û Tiştên Sembolîk

Vê destana me ya tekûz xwe li ser gelek hîmên cur bi cur ava kirîye. Di destanê da ger em bi çavekî elastîke lê binihêrin em ê bibînin ku di destana me da kesayetên mîtolojîk (derasayî) û tiştên sembolîk zaf cih digrin. Ji ber ku lehengên mîna Xocê Xidir, Mîrê Cinan, Tavbano, Heyvbano, Stêrbano û Bozê Rewan lehengên derasayî ne lewma me ew di bin vî ser navî da kom kirin.. Digel van kesayetên ku me qala wan kirî em ê herwiha qala du sembolên giring, sêv û hinarê, ku di pîranîya mîtolojîyên gelan û dînen semawî de jî diborin, bikin.

2.5.1. Xocê Xidir

Di nava destanê da yek ji kesayetê derasayî an jî balkêş bêguman Xocê Xidir e. Berîya ku em li ser lehengê wî yê di nava destanê da rawestin divê em pêşîyê qala wî bikin û bi dîr ra jî lazim e em di li ser girîngîya wî ya di nava kurdan da rawestin.

Xocê Xidir di nava destanê da ne kesekî ji rêzê ye, ew dema di destanê da xuya dibe, pîranî arîkarîyek an jî xêrek wî digihîje hinan. Navê wî Reşê Şevê ye. Bi îslamîyetê re wekî gelek lehengên mîtolojîk, Xizir jî bi motîfên îslamî nav guherand. Xizir di mîtosên kurdan de di golên avê de yan jî li kêleka çeman dijî. Hakimî av û axê ye. Der barê xwezayê de, bi taybetî der barê sewal û nebatan de hemû tişt dizane û xwedî hêzên efsûnî ye. Li gorî mîtosan Xizir di nav gel de wisa hatiye bawerkirin ku kesên bixwazin Xizir xwe şanî wan bide û were serdana wan, wekî ku mêvanekî zehf girîng pêşwazî bikin, divê 40 rojan amadehîyê bikin. Mal û derdora malê baş tî paqijkirin, her roj xwarin û çeşni tî amadekirin. Heke ev rîtuêl bê qusûr pêk bê dê Xizir roja çilemin şekl û şemalê xwe biguhere û xwe şanî wan bide. Êdî Xizir naskirin û jê hêvî û xwestek arezûkirin, li wan kesan dimîne.²⁶¹ Wekê li vir da jî hatiye behskirinê Xocê Xidir kesekî xudan hêzên efsûnî ye, ew di dîne îslamê da wekê kesekî pîroz tê hesibandinê. Xocê Xidir, jixwe wateya navê wî jî di ‘erebî de tê beramberî kesk, şaxa kesk an jî cihê ku keskîtiya wê pîr. Sedemê wateya keskîyatîya wî jî li gor rivayetan dema cihekî pûç û vala rûdinişt ew der tevahî keskatîyek (şînkatî) digirt.²⁶²

²⁶⁰ h.b.b.r.53.

²⁶¹ Yitik, Kamûran- Çeper, Ramazan, Ferhenga Mîtolojîya Kurdî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2017, r.232.

²⁶² Doç. Dr. Selahattin DÖĞÜŞ Sütçü İmam Üniversitesi, Fen-Edebiyat Fakültesi, Tarih Bölümü, Anadolu’da Hızır-İlyas Kültü Hıdırellez Geleneği, Teza Çapnekirî r.80.

Xocê Xidir ji bilî di destana Memê Alan de di Mem û Zîna Xanî de û di helbestên Melayê Cizîrî de jî dibore. Digel Edebîyata Kurdî di jîyana kurdan de jî Xocê Xidir cihekî xwe yê taybet heye. Li cem kurdan berê bi navê Xidirnebî rojîyek hebû. Di Adat û Rusûmatnameyê Ekraad a Bayezîdî beşek heye bi sernavê Xidirnebî. Li wir de li ser vê wiha dibêje: *Û panzde roj wekû dimîne parêza (rojîya) fillan î dirêj, Ekraad Xidirnebî dibêjin. Ciwanêd Ekraadan bekar (nezewicî) keç û lawêd wan sê rojan rojî digirin. Şeva çarê fitarê dikin û avê venaxwin, radizên. Goya her çi kesê di xewnê da avê bidite wî keçê, ew dibe nesîbê wî (qismetê wê di zewacê de) dibe û yaxo herçî keça avê bidete wî lawî ew law dibite nesîbê wê keçê. Goya eva li nik Ekraadan bê şubhe ye.*²⁶³ *Wekê di van hevokan da jî aşkera ye ku Xocê Xidir di nava jîyana kurdan ya rojane da jî cihekî taybet digre. Wî herwiha di nava gotinên kurdan yên rojane da jî -bi taybet li cem kurdên elewî- cihekî qedirbilind girtîye. Zeynelabîdîn Zinar di malpera çandnameyê de di nivîseka xwe de li ser axaftina rojane ya kurdên Dêrsîmê de wiha dibêje ku li ba Kurdên “Elewî” yên Dêrsîmê, giringîyeke taybet a Xoçeyê Xizir heye. Li gor ku Zinar tîne ziman kurdên wê derê axaftina xwe ya rojane de jî pîr navê Xocê Xizir diemilînin: Niha jî kal û pîrên Dêrsîmê, dema radibin û rûdinin, dibêjin Ya Xizirê Kal, dema yekî Dêrsîmî dikeve xeterekê, dibêje Ya Xizirê Ser Kelekê, bi vîna daxwaz û arîkarîyê ji bo Xizir dibêjin Ya Bavê Bêkes û Bêxwedîyan.*²⁶⁴

Di nava destanê da Xocê Xidir kesekî taybet û derasayî ye. Dema em li destanê dinerin ew him di çêbûna Memê Alan da him jî di arîkarî gihandina bo Memê Alan da roleke aktîf û erênî digre. Ew di destanê da di roleke erênî da ji bo xêrxwazîyê tev digere.

Berîya ku Memê Alan çêbe, bav û apên Memî xwe davêjin çol û kerbelayan di wê navê da Xocê Xidir li wan peyda dibe, arîkarîya dide wan, têrxemîya wan têk dibe, şîretan li wan dike. Ev sahneya ku qewimîbû wiha ye:

Rebê alemê Xocê Xidir li wan kir beyane

Carekê, nerî ko Elî begê û Emer begê û Elmaz begê ji xwe re rûniştine û girîyane

Dilê wî bi wan şewitî, sêvekê ji paşila xwe derdixe, dide destê Elî begê mezinê birane

Digo: “Gelî bira, megirîn! Rebê Alemê delîlê heyîrîyan e

Îro roja Eydê Qurbanê ye, we dev ji qonaxê xwe berdane

Gerek zilamê mîna we vekirana devê xezîna û defînê girane

Û pere birijandana, gelî bira, li zikaka û li ewcane

Ji bona xatirê feqîr û foqrane

²⁶³ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekraadîye, r.79.

²⁶⁴ <http://candname.com/dostaniya-xoceye-xizir-u-musa-pexember>.

Neşfa ko birçi be, gerek we têr bikira, û zîlamê ko tazî be, gerek we bilîbs bikira

Hûn hatine, ketine çol û kerbelane

We li xwe kirîye cilê derwêşane

De, rabin, berê xwe bidin Bajarê Mixribê û qonaxê xwe nê girane

Herin Bajarê Mixribê, vekin devê xezîna û defînane

Pere birijînin li zikaka û li ewcane

Serjêbikin qurbana û dehîyane

Ji bona xatirê feqîr û foqrane

Berê xwe bidin Mihela Qureyşîyane

Ji Elî begê re bixwazin qîza Mîrê Qureyşîya, bi qewlê eshabane

Qelenê wê bidin diwazde qirûş û nîvane

Îşellah, neh meh û neh roj û neh saet û neh deqîqa wextê qedîyane

Xwedê teala wê şîn bike warê windane

*Tenbîya min li we be, tu nava lê mekin, heyanî go ez li we bibim beyane.*²⁶⁵

Xocê Xidir di destana Memê Alan da sembola çeyî û qencîyê ye. Wekê di van beytên li jor jî dîyar e, ew ji kesên neçar e dibe derman. Xocê Xidir bi dayîna sêvê û şîretan ra dibe sedemê çêbûna lehengê sereke yê destanê, Memê Alan. Bav û mamên Memî li gorî şîretên Xidir tevdigerin, ew navekî li kurê xwe nakin ta ku Xocê Xidir tê û navê Memê Alan li wî dike û wî bernavkê Padîşahê Kurdan lê zêde dike.

Xocê Xidir, Memê Alan diparêze û çî arîkarîya ji destê wî tê ji wî ra dike. Dema ku Memê Alan dikeve li ser rêya Cizîra Botan û rêya xwe winda dike, Xocê Xidir tê li pêşberî wî. Ji Memê Alan ra dibe arîkar, wî tîne nêzîkî Cizîra Botan. Lê berîya ku biçe hin şîretên wiha li Memê Alan dike:

Min divê li te bikim çend şîretane

Kalo got: ‘Gava darî ber şetê Cizîra Botane

Şet î pehn û mezin e, li ser nînin kelek û darê gemîyane

Ji alî din radibe dûmane

Kelîşo danîye qîza Bekoyê şeytane

²⁶⁵ h.b.b.r.26-27.

Dixwaze ko te bixapîne bi navê Zîna Zêdane

Lê tu bawer meke; ew qîza Beko Awan e

Bavê wê zanîye ko tu wê herî bajarê Cizîrê, bi kitêba remlane

Qîza xwe şande pêş te, dike te biqelibîne li gola xwînîyane

Bibe sebeba serê te û Bozê Rewane²⁶⁶

Xocê Xidir, Memê Alan di rewşa heyî ya tengasîyê da derdixe. Yek ji taybetîya Xocê Xidir ew e ku di cihê tengasîyê de, di wexteke nedîyar de û bi lehengên cur be cur arîkarî dide mirovan.²⁶⁷ Piştî ku Memê Alan tîne li nêzîkê Cizîrê, hewceyî bi şîretan dibîne. Ev şîret û hişyarîyên li jorî dibin sedem ku Memê Alan ji xefkên heyî rizgar bibe. Xocê Xidir ji Memê Alan ra kesekî şîretkar e, wî diparêze û ji tengasîyê derdixe.

2.5.2. Her Sê Qîzên Padişahê Perîyan

Di destanê da sê qîzên Padişahê Perîyan diborin. Navê ya mezin Tavbanû ye, ya li dû wê Heyvbanû ye û ya piçûk jî Stêrbano ye. Ji destanê em dizanin ku sedemê pêkînan vê evîne anku sedemê çîrûska eşqa Memê Alan û Zîna Zêdan ev perî ne. Di destanê da em berîya ku derbasî li ser hilsengandina liv û tevgerên wan bibin lazim e em pêşîyê qala giringîya motîfa perîyan bikin.

Perî keçên mîtolojîk ên pir bedew û delal in. Di mîtolojîyên gelek gelan de cihê xwe digirin. Peyva ‘perî’ ji peyva ‘paîrika’ya Avestayê tê. Ev peyv di pehlewkî de bi awayê ‘parîg’, di farisî û erebî de jî bi awayê ‘perî’ tê binavkirin. Li gorî bawerîya îslamê perî ji êgir hatine afirandin û zarokên cinan in, anku keçên cinan in. Li gorî zerdûştîyê jî perî ji avê hatine afirandin û alîkarên yezdanan in. Piştî Avestayê, di dema sasanîyan de Avesta ku ji nû tê şîrovekirin, tê de perî bi wateyên neyînî û wek alîgirên Ehrîman didin xuyan û ev şîrove şaş in. Lewre di zerdûştîyê de bi gelemperî yên ku wek perî/fîrişte (her du jî di heman wateyê de tên bikaranîn) tên binavkirin alîgirên Ahûra ne û di dema mazdaîzmê de jî ev xwedawend in.²⁶⁸

Di destanê da ev her sê perîyên mîtolojîk û balkêş wekê me anî ziman, dibine sedemê evîneka abadîn. Ew wekê li jorê jî hatine pênasekirin, kesên delal û xweşik in. Ev her sê xwişk herwekî di destanê da jî xwîyaye qîzên Padişahê Perîyan e. Navê ya mezin Tavbano ye ya navîn Heyvbano ye û ya piçûk jî Stêrbano ye. Dema ku rojekê ev her sê xwişk dikevine dereke avîn da li wir xwişk wan a piçûk li hemberî delalî û spehîtiya wan heyîrî dimîne. Li ser vê yekê kurtearîşeyek di nava wan da dibore, ev arîşe jî ber bi Memê Alan û Zîna Zêdan ve diherike. Xwîşka piçûk a perîya Stêrbano, postê kewan yên her du xwîşkên xwe radike û dixwaze li temaşeyî cemala wan a delal binere. Lê piştra suhbeta wan ber bi delalîya du kesan ve diçe ku ew sahne jî wiha ye:

Stêrbano nihêrî ko cemala ko Xwedê daye her du xwîşkane, ne daye tu kesane

²⁶⁶ h.b.b.r.50.

²⁶⁷ b.n, Anadolu’da Hızır-İlyas Kültü Hidirellez Geleneği, r.78.

²⁶⁸ b.n, Ferhenga Mîtolojîya Kurdî, r.172-173.

Postê xwe li xwe kir û rakir yên her du xweyîngane
Di ser wan ra firî, da perwazane
Her du xwîşkan kirine bang û emane
Gotin: " Te çira rakir postê me her du xweyîngane?"
Wê got: " Min hîn nedîye mîna cemala we her dîyane!
Ez dikim çîkî binihêrim li cemala we her du xwîşkane."
Gotin: "Xwelîya dinyaê bibare li serê me her sîyane!
Dido hene, yek qîz e, yek xort e, bi çelengîyê kesek nagihê wane
Yek kurê mîrê Mixribîyan e
Ew mîr Padişahê Kurdan e
Ya din, bavê wê walîyê -bajarê Cizîra Botan e
Keça mîr Zengîn, Zîna Zêdan e."
Stêrbano got: «Bi kitêba bavê me, heta hon ra her min nekin Memê Alan û Zîna Zêdane
Ez nebînim cemala van her du lewend û eşqîyane
Ez daneynim postê we her dîyane."
Her du xwîşkan jê ra qerar danîn, bi qewlekî tam, û bi dilekî sadiqane
Gotin: «Tu deyne, em li xwe kin postane
Emî îşev herin bajarê Cizîra Botane
Zîne çek kin tabûta Şahê Perîyane
Bidine sel pîyên çend perîyane
Rakin ji bajarê Cizîra Botane
Li xwe xînin per û bazikane
Şeva li yasîyan be, qerara tev bi şorê jinane
Em ji te ra Zîne deynin di qonaxa Memê Alan, payitexta Mixribîyane
Emê di şiklê kewan in, wê çaxê, emê xwe bavêjin devê kulekane

Emê binihêrin li cêmala wan her du lewend û eşqîyane. ²⁶⁹

Wekê di van axiftinan jî dîyar e, her sê perî ji bo ku çelengitirîn û delaltirîn kesan bînine li ba hev ji mekaneke xumam û nedîyar berê xwe didine Cizîra Botan û Mixribê. Di van sahneyan da em dibînin her sê perî kesayetên derasayî û mîtolojîk in. Ew kesên xudan perwaz in û fir didin. Di mekaneka nedîyar û xumam da dijîn. Dema ku tèn Zînê dibine, li wir em dibînin sêhrê li Zînê dikin û di ser ra jî ayetên perîyan li ser Mem û Zînê dixwînin. Ji van kirinên wan da jixwe alîyê wan ê derasayî pitir derdike pêş.

2.5.3. Bozê Rewan

Bozê Rewan anku kurîyê behrê. Di destanê da hespê Memê Alan e ku bi têra xwe ew hespekî mîtolojîk û derasayî ye. Hesp ne tenê di berhemên nivîskî yên mîna Memê Alan herwiha di çanda wan û jîyana wan rojane da jî cihekî taybet digre. Di civata kurdan da ji berê ta niha qedrekî mezin ji hespan ra heye. Bayezîdî di kitêba qedîm da li ser hespan wiha dibêje: Hespêd wan qewî zêde bi dewam û şolker dibin (beza ne û çalak in). Lewranî dibêjin şev û rojê lê siwar dibin û zaf zorê didine hespan û di şeran da jî Ekrad hespêd bi eylem diemilînin (bi kar tînin) û çiqas ko ne bûye tengî, zorê li hespêd xwe nakin û dihewişînin (di axur û tewîleyê de dihêlin).²⁷⁰

Di nava destanê da jî li ber çavan e ku qedrek mezin ji hespî ra anku ji Boz Rewan ra hatiye dayînê. Jixwe dema em li Bozê Rewan dinerin em dibînin Bozê Rewan ajaleka mîtolojîk e. Bozê Rewan wekê me anî ziman hespekî derasayî ye, wî ji nava behrê derdixin. Li ser taybetîyên Bozê Rewan di destanê da wiha tê neqilkirinê:

Hinekan digot: ‘Heywanek heye di binê behrê de, di şiklê hespan e.’ Kalekî digot: ‘Eger ku yê lê be bextê mêrane

Rojekê têkeve dest ev cenawerê wekî hespane

Merî lê siwar be, pê qonaxe rojan dibire bi saetane

Ne vedixwe avê, û ne dixwe êmegê cotane,

Tim lê siwar bî û li ser piştê peya nebî bi roj û şevane

Dare, hikmê wî heye heya şeş mehane.’’

Hinekan digot: ‘Heye hikmê wî heya salekê û didîyane!’²⁷¹

Wekê di van hevokan da jî dîyar e, ev hesp hespekî mîtolojîk û derasayî ye. Ew ji hespên rêzê cuda ye, ji behrê tê derxistinê. Bi şev û rojan bêyî ku av vexwe dihere û ti caran tihî û birçî nakeve. Rêya mehan ev hesp bi rojan xilas dike. Di destanê da jî yek ji arîkarê Memê Alan e ku bi saya wî Memê Alan di demeke zû da digihije Cizîra Botan.

²⁶⁹ h.b.b.r.32-33.

²⁷⁰ b.n, Adat û Rusûmatnameê Ekrađiye, r.64.

²⁷¹ h.b.b.r.28.

2.5.4. Sembola Sêvê

Di destanê de em dizanin ku sê birayên bi navê Elî Beg, Emer Beg û Elmas Beg hene, ev her sê bira digel temenmezîniya xwe bê dûnde ne jî. Di Eyda Qurbanê de ji ber vê bê hêviya xwe berê xwe didine çol û kerbelan li wir ji bo halê xwe pîrr disojin. Di wê gavê de Xocê Xidir li wan peyda dibe. Dema ku li wan peyda dibe sêvekê ji paşila xwe derdixê û dide birayê mezin Elî Begê birayê mezin û li wan tenbî dike ku ew derê xezîneyên xwe vekin, li feqîr û hejaran re belav bikin. Piştî wê jî biçin keça qîza Mîrê Qureyşîyan ji Elî Begî re bixwazin. Wekî gotina Xocê Xidir dikin, diçin qîza Mîr dixwazin û piştî zarokek ji wê zewacê tê dinê. Heta vê derê hemû tişt xweş e û piçekê derasayî ye lê çima Xocê Xidir sêv da Elî Beg yan jî çima ne tişteke din, sêv? Em ê niha li dor vê pîrsê bersivan bigerin û bala xwe bidine çîrokên sêvê û dîroka sêvê.

Em dizanin sêv jî bi qasî destpêka dîroka mirovan kevn e û tiştêkî pîroz e. Cara pêşîn sêv wekî fêkiyeke memnû (qedex) tê pêşîya me. J'alîyê Yezdan ve ji bo ku Adem û Hewa sêvê nexwin, têne hişyarkirin lê belê bi xapandina şeytên re Adem û Hewa wê sêvê dixwin û digel qewirandina ji bihiştê dibin kesên fanî jî.²⁷² Destpêka çîroka sêvê wiha ye. Em dizanin ku sêv digel vê çîroka xwe di tesktên dînî -wekî Qur'an, Tewrat û Încîl- de jî pîrr dibore. Her çiqas di vê çîroka xwe de wekî tiştêk memnû û nerênî bête li ber çavan jî em dizanin ku digel nerênîya xwe pîrr di nava pîrr tiştên balkêş de jî dibore. Bo nimûne mirov çîroka kêşehêza erd em bînin bîra xwe. Em dizanin ku Newton rojekê di binê darekê de pirtûkê dixwîne sêvek li serê wî dikeve û bi saya vê sêvê kêşehêza erdî tespît dike. Di mîtolojîya Yewnan de em dizanin ku Parîsê kurê Priamosê Mîrê Troyê, dema rojekê her sê Yezdanên Yewnan, Hera, Athena û Aphrodite tên pêşberî wî û sêvekê dirêjî wî dikin. Li ser sêvê wiha hatîye nûsîn 'a herî delal'. Dema sêvê didine wî her Yezdanek li hember sêvdayîna wî sozêkê dide wî. Athena soza 'baqilî û qabilîyeta leşkerî, Hera soza hêz û qudretê û Aphrodite jî soza jina herî delal a cîhanê didetê. Piştî ku Parîs sêvê dide Aphroditeyê, Aphrodite jî soza xwe digre û Heleneya derdixê pêşberî wî.²⁷³ Digel van çîrokan mirov dikare li ser sêvê bi dehan çîrokên balkêş û mîtîk binûse lê ji bo ku mijar zêdetir berfireh nebe, ev mînakên hatî dayîn bo cîyê zanîna dîrok û çîrokên sêvê bes e.

Li gor ku Mustafa Cemiloğlu bi lêv dike di piranîya destan, çîrokên gel û çîrçîrokan de sêva ku j'alîyê Hz.Xizir (pîr, derwêş û welî) ve tê dayîn wekî 'motîfa zurrîyetê (dûndeyê) tê nirxandin û ev sêv dibe berdewamîya nijadan.²⁷⁴ Em cardin vegerin destana xwe, me dît ku piştî dayîna sêva Xocê Xidir, Elî Beg bû xwedî dûnde û sêv li vir de wekî ku hatî nûsîn sembola zurrîyetê ye.

2.5.5. Sembola Hinarê

Çawa ku qîza Bekoyê Ewan dibihîze ku Mem ketîye zindanê ji axuya marê hinekî distîne, serê hinarê qul dike û bi derewan dibe wekî dîyarî dide Zînê da ku ew jî bibe bide Memî. Dema ku Zîn hinarê dide Memî bi xwarina wê hinarê re Mem dimire. Li vir de wekî

²⁷² Yılmaz, M. Nuri (1998) Kuran-ı Kur'an ve Meali, Ankara: Kürsü Yayıncılık.

²⁷³ Köhlmeier, Michael, Tanrıların Masalları, (Wer. Atilla Dirim), Weşanên Yurt, Ankara 2014, r.65.

²⁷⁴ Cemiloğlu, Mustafa, Halk Hikâyelerinde Doğum motifi, Bursa 1995.r.178-189.

sêvê em ê li ser fêkîya hinarê jî rawestin. Çimkî bi qasî sêvê hinar jî têra xwe derasayî û mîtolojik e.

Em dizanin ku hinar jî wekî sêvê yek ji fêkîya bihiştê ye.²⁷⁵ Ji ber ku hinar yek ji fêkîyên bihiştê ye loma ew jî xwedî çîrokên cur be cur e. Ger em li mîtolojîya gelan û dînên semawî binerin, li ser hinarê nêrînên hem nêzî hev hem jî bereksê hev tije hene. Bo nimûne li gor Delikligöz li cem Xristîyanan, sembola ku di taswîra Hz.Meyrem û Îsa de xuya dike nar e, tê hizirkirin ku nar wekî sembola qîyametê û jîyana herehereyî temsil dike²⁷⁶. Li cem Zerdeştan nar wekî sembola zayokî, nemirî û dewlemendiyê tê qebûlkirin.²⁷⁷ Di mîtolojîya Yewanan de bêhtir nar bal bi Xwedawendan ve tê nîsbetkirin.²⁷⁸ Di pîranîya van gotinên me de hinar wekî tişteke erênî hate xuyakirin lê di mîtolojîya Yewnan de herwiha hinar, li cem Yewnanan bi Yezdan Hades re tê bibîranîn û mirinê bi bîr dixê.²⁷⁹ Me di destanê de dît ku piştî xwarina hinarê Mem dimire, di van wateyên hinarê de wateya herî dawî nîşanî me da ku hinar carna dibe mirin bi xwe. Wek sembolekê hinarê di vê destanê de rewşeke nerênî girtîye.



²⁷⁵ Bebek, Adil, “Cennet Meyveleri Örneğinde Ahiret Hayatına Kelamî Bir Bakış”, Fırat Üniversitesi, İlahiyat Fakültesi Dergisi 10: 2, Elazığ 2005, r.6.

²⁷⁶ Delikgöz, Ömer - Alıç, Fulya “Osmanlı İstanbul’unda Bulunan Bazı Müslim ve Gayrimüslim Mezarlıklarındaki Kimi Semboller”, Hacettepe Üniversitesi, Türkiyat Araştırmaları Dergisi 13 (Güz), Ankara 2010, r.7.

²⁷⁷ Stover-Mercure 2007, s.1088; Matt Bennett, “The Pomegranate: Marker of Cyclical Time, Seeds of Eternity”, International Journal of Humanities and Social Science, Vol.1, No.19, Decemvir 2011, r.1088.

²⁷⁸ Göğebakan, Yüksel, “Anadolu’da Ana Tanrıça Kültü Olarak Kadın”, İnönü Üniversitesi, Sanat ve Tasarım Dergisi, Özel Sayı, Cilt.1, Malatya 2011,r.54.

²⁷⁹ Jean-René Jannot, “The Lotus, Poppy and Other Plants in Etruscan Funerary Contexts”, Etruscan by Definition: The Cultural, Regional and Personal Identity of the Etruscans, Papers in honour of Sybille Haynes, MBE, Edited by J.Swaddling-P.Perkins, British Museum Research Publication 173, London 2009,r.81.

BEŞA DUYEM

DESTANA ODYSSEIA

Giringîya Destana Odysseia

Destanên Îlyada û Odysseia destanên herî berbelav ên neteweya Yewnanan e. Ev her du destanên qerase bêguman heta niha ji gelek xebatan ra bûye sedemê lêkolîn û vekolînan. Îlyada destana bûyerekê ye, Odysseia destana kesayetekê ye. Xwînerê hevdem jî ji Odysseia ra nabêje destan, wê bêtir zêdetir dişibîne romanekê, filmekê. Bi rastî jî ji aliyê mijara xwe ve dişibe romanekê, j'aliyê damezirandina xwe ve dişibe filmekê.²⁸⁰ Destana Odysseia ji serpêhatîyên Odysseus pêk tê ku em di wir da dibînin Odysseusê navdar bi dehan serpêhatîyan dijî û li rastî gelek astengîyan tê. Di destanê da vebêjerê destanê bi teknîka flashbackê me carna ji serî dibe dawîyê carna jî ji dawîyê tîne serî. Destan ji pênc beşên bingehîn pêk tê ku ev beş wiha dikarin werin rêzkirin:

- I. Telemakhia (ji beşa Iem ta beşa IVem)
- II. Di girava Kalypso da (Beşa Vem)
- III. Li Welatê Phaiakan (ji beşa VIan ta beşa IXan)
- IV. Serencamên Odysseus (ji beşa IXan heta beşa XIIan)
- V. Li Ithakeyê (ji beşa XIIIan ta beşa XXIVan)

Ji van pênc beşên bingehîn a yekemîn, duyemîn, çaremîn û pêncemîn j'aliyê dengbêjê Odysseiyê ve ku ew kî be, tê vegotin, beşa bingehîn ya destana Odysseia ya ku serpêhatîyên Odysseus pêk tê, Odysseus bi xwe wekî bîranîn vedibêje.²⁸¹

Bêguman ev destana qerase him ji aliyê naverokê ve him jî ji aliyê serpêhatîyan ve ji destana din a qerase Îlyadayê cihêtir e. Di destanê da em dibînin ku carna çîrok di nav çîrokê da ye û carna jî serpêhatî di nava serpêhatîyeke din da ye. Vebêjerê destanê ev destanê bi awayekî şairane pêk îname. Di vê destanê da herwiha em li rastî berxwedanên mirovî yên li hemberî sirûştê jî tên. Di destanê da Odysseus tim di nava çalakîyan da ye çalakîyên wî jî pitir li hemberî xwezayê ne. Ew her çiqas bi kesayetan ra jî bikeve di nava çalakîyan da jî lê pitir şerekî wî yê hişmendane heye.

Li ser nivîsakarê destanên Îlyada û Odysseia bêguman bi salane zaf nîqaş dihêne kirin li gorî hinan ev destanên qerase ji aliyê kesekê ve hatine nivîsîn lê gorî hinan jî ev destanên qerase ji aliyê kesayetên jev cuda ve hatine nivîsîn. Digel van li ser dîroka nivîsandina wan jî dîrokek dîyar nayê xuyanê. Em hatin li ser xala bingehîn a arîşeya Homeros. Ev helbest kengê derbasî nivîsê bûne? Kevneşopîya berê di vê mijarê da tekez e. Piştî ku wekî helbestên pirtî pirtî hatine nasandin Îlyada û Odysseia di dawîya sedsala şeşan da ji aliyê tîranên Atînayî ve

²⁸⁰ h.b.b.r.ix.

²⁸¹ h.b.b.r.ix.

dihêne berhevkirin û bi formên xwe yên ku îro li ber destê me ya, hate weşandin. Li ser fikira ku ev her du berhem ji aliyê kesên cihê ve hatine pêkînan ku parêzerên vê fikirê kesên veqetîner in, li vê rewşê nihêrîne, berpêşkirin ku ev ne berhemên hunerî yên helbestên tevdeyî ne lê berhemên berhevkirî ne. Parêzerên fikira pêkhêneran (yekkirî) ku li ser fikira Îlyada û Odysseia ji aliyê heman kesî ve hatine nivînsandin e, bi korkorane çavên xwe ji delîlan ra niqandine. Kesên veqetîner bêtir li Almaniyayê, kesên pêkhêner li Îngilistanê derketîne pêş.²⁸² Li ser vê arîşeyê Azra Erhat jî xudan gotine ew her çiqas li ser vê mijarê tiştanan bibêje jî lê zêde nakeve kûrahîya vê arîşeyê. Ev sedem hemû nîşan didin ku destana Odysseia li gorî ya Îlyadayê çî ji alî damezirandinê ve be çî jî ji aliyê nivîskarîyê ve arîşeyên tevlîhevtir derxistine holê. Em nikarin têkevin hûrgilîya van nîqaşan, lê belê em vê jî bibêjin ku hawirdora rasteqîn a Odysseiayê li hizirê li cem me peyda dike ku ev destana duyemîn piştî Îlyadayê derbasî nivîsînê bûye.²⁸³ Wekî Erhatê jî amaje pê înyayê mirov nikare têkeve nava vê arîşeya heyî. Ji ber ku têketina vê mijarê dê sînoren dîyarkirî derbas bike û dê bibe sedemê ji dûrketina mebestê.

Destana Odysseia destaneke sereke ye ku ji aliyê teknîkê ve jî gelek cudahîyên wê ji destana Îlyada heye. Bêguman her du destan her çiqas ji aliyê heman kesî ve hatibe nivîsîn jî teknîkên wê ji hev cuda ne. Di destana Odysseia da em bêtir hewildanên mirovekî hişmend li hemberî her cure rewşê dibînin. Homeros di vê destanê da mijar li hev siwar nekirine, mijar yek bi yek vekirine û li ser wan rawestîyaye. Di destanê da zimanekî edebî daxilî her rûdaneke ji rêzê kiriye vê yekê asta heyî berztir kiye.

Kurtiya Destana Odysseia

Destana Odysseia jî li ser hîmê evînekê gul vedaye. Em dizanin ku serlehengê vê destanê Odysseus e û wî navê xwe jî daye vê destana tekûz. Odysseus kurê Mîrê Ithakeyê ye û tekane yê malbata xwe ye ku ew şunwarê Mîrê Ithakeyê ye. Vê destana kamil him evîndarîya Odysseus him jî serencamên Odysseus ji xwe ra bingeh girtîye. Odysseus digel Penelopeiyê salekê zewicî dimîne, piştî salekê zarokê wan yê bi navê Telemakhos çêdibe. Odysseus evîndarê jina xwe ye belam ji ber ku şerê Troyê rû dide lewma bi neçarî dev ji malbata xwe û warê xwe berdide û berê xwe dide şereke mezin. Li ser çûyîna Odysseus bîst sal derbas dibin û êdî dema vegera Odysseus dest pê kirîye. Ji ber ku salên dûr û dirêj derbas bûne lewma kurê wî mezin bûye û ji bo jina wî jî zaf xwazgînî peyda bûne. Di rewşeke wiha da em dinêrin ku Yezdanên Olymposê kom dibin û bi girêdayî daxwaz û xwastekên Atheneyê biryara destûra Odysseus didin.

Athene piştî biryara Yezdanên Olymposê êdî dixwaze tavil dest bi çalakîyê bike da ku Odysseus di demeke zûtir da vegere mala xwe. Ji ber ku Telemakhosê kurê Odysseus temenê wî zêde mezin nîne lewma Athene dixwaze him wî di nav xelkê da binavûdeng bike him bişîne li dû şopa bavê wî û him jî dixwaze ew xudan tecrûbe bibe. Lewra tê û di şiklên kesên cuda da şîretan li Telemakhos dike bi şîretên wê ra êdî Telemakhos jî biryarê dide û dikeve li dû şopa bavê xwe. Telemakhos ji ber ku kesek zêde tecrûbedar nîne lewma Athene hertim digel wî ye û tim şîretan li wî dike. Telemakhos di vê rêwîngîtiya xwe da dixwaze ku şopa

²⁸² Thomson, George, *Tarih Öncesi Ege II*, Wer. Celal Üster, Weş. Payel, İstanbul 1991, r.317-318.

²⁸³ h.b.b.r.xviii.

bavê xwe bajo wata ka bizane ew sax e yan mirîye. Di vê şopajotinê da Telemakhos diçe li ba mîrên mezin ên Yewnanistanê, herwiha ev mîrên mezin dostên bavên wî yên berê ne. Telemakhos bi vê çûyînê ra him dostên bavê xwe dinase him jî piştî şerê Troyê çî bi bavê wî hatiye wî fêr dibe. Telemakhos ji bo maweyek gelek dirêj li dûrî welatê xwe dimîne û di vê navê da him ji bin barê gefên xwazgînîyan xilas dibe him jî dibe kesen xudan tecrûbe.

Odysseus bi salane li ba Kalypsoyê ye û hertim welatê wî, kurê wî û jina wî di bîra wî da ye. Ew ji ber ku li ba Kalypsoyê ye û Kalypso jî Yezdaneke lewma nikare ji ba wê bireve an jî daxwaza çûyînê bide. Athene dixwaze ku êdî Zeus tam wê fermanê bide ku êdî Odysseus ji ba wê Yezdanê bifilite. Zeus ferman dide Hermeias da ku ew biçe ji Kalypsoyê ra bibêje bila êdî Odysseus azad bike. Piştî hatina Hermeias Kalypso nexwaze jî bi naçarî destûra çûyîna Odysseusî qebûl dike. Odysseus piştî vê destûrê demildest ji xwe ra çardarîkekê çêdike û berê xwe dide bo warê xwe. Di rêwîngtîya wî da em dibînin ku ew ber bi qeraxên Welatê Phaiakê ve diçe û ji wan ra dibe mêvan. Kesên wê derê bi taybet jî mîrê wî welatî Alkinoos qedreke mezin dide Odysseus. Li Welata Phaiakê Odysseus li rastî ezimandinek baş dihê û ji bo wî zaf şahî têne lidarxistinê. Kesên wê derê ji ber ku samîmîyetek mezin nîşanî wî didin lewma ew jî bi samîmî tevdiqere û nasnavê xwe digel serpêhatîyên xwe ji wan ra aşkera dike. Di nava van serpêhatîyên xwe da Odysseus jî serî heya dawîyê hemû serpêhatîyên xwe ji wan ra dibêje.

Odysseus piştî şerê Troyayê dixwaze digel hevrêyên xwe vegere mala xwe lê ji ber ku rêyek dirêj li pêşberî wan e lewma bivênevê li rastî gelek rawestgehan dibin. Di veqerê da yekem rawestgeha wan Kikon in. Odysseus digel hevrêyên xwe welatê Kikona serobino dike û li wir rastî şereke mezin tê û ji wir direvin. Odysseus dema ku tê nêzî şikefta Kyklopî dixwaze ji wî ra bibin mêvan belam Kyklop gefeke mezin e li ser Odysseus. Kyklop pêşîyê wan di şikefta xwe da asê dike piştra jî her roj hevrêyek Odysseusî dukuje. Odysseus bi awayekî hişmendane tevdiqere û wî Kyklopî têk dibe û çavê wî kore dike. Piştra digel hevrêyan berê xwe vedigerînin dere din. Ew dema diçin mala Aiolos ji wî ra dibin mêvan, Aiolos qedrê Odysseus û hevrêyên wî digire. Bi awayekî efsûnî wan dişîne ber bi welatê wan ve belam ji ber ku hevrêyên Odysseus kesên zikreş û hesûd in wê efsûna ku bûye sedemê çûyîna wan xira dikin û ew cardin vedigerine cihê xwe yê destpêkê. Odysseus li hember vê rûdana hevrêyên xwe her çiqas aciz jî bibe neçar e ku digel wan cardin bikeve li ser rêya veqerê. Odysseus û hevrêyên wî di rê da li rastî gelek deveran dibin û gelek caran jî ji bo zewqa xwe welatan talan dikin. Odysseus dema ku qesta Xwedawend Kirkeyê dike di destpêkê da Kirke ji wî ra bi awayekî dijminane tevdiqere lê piştî ku ew û Odysseus li hev tînin êdî ji wî ra dibe kesek dost. Kirke di jîyana Odysseus keseka giring e ew ji bo ku Odysseus çarenûsa xwe hîn bibe wî ber bi welatê mirîyan ve dişîne. Odysseus digel hevrêyên xwe bi awayekî derasayî diçe warê mirîyan li wir piştî ku digel mirîyan diaxive hay ji çarenûsa xwe û hevrêyên xwe dibe. Odysseus piştî ku ji vir derdikeve cardin tê li ba Kirkeyê û piştra jî ji cem wê cuda dibe. Odysseus cardin digel hevrêyên xwe dikeve li ser rêyeke dûr û dijar. Di vê rêwîngtîyê da Odysseus gelek caran li rastî bertekên hevrêyên xwe tê. Ew çiqas bixwaze jî wan êmîn bike belam ew qet êmîn nabin. Odysseus ji ber ku çarenûsa xwe dizane lewma ji hevrêyên xwe tika dike ku ew çêlên Tavê nexwin belam ew guh nadin Odysseus û hemî têk

diçin. Yê ku tekane ji têkçûnê rizgar dibe Odysseus e û ew jî piştî demekê berê wî dikeve li ba Kalypsoyê. Bi salan digel Kalypsoyê mîna jin û mêran dijî ta ku biryara vegeza wî dihê dayîn.

Odysseus piştî ku serpêhatiyên xwe ji Welatîyên Phaiakayan ra dibêje ew biryar didin û wî dibin welatê wî. Çîleya Odysseus piştî ku tê welatê wî bi dawî nabe, ew dema tê malê dibîne ku ji jina wî ra xwazgînî derketine û malê wî talan dikin. Odysseus kesekî têrsebr e lewma xwe ji bilî kurê xwe Telemakhos jî tu kesekî din ra aşkera nake. Ew tim li dû plangêrîyekê ye û dixwaze tola xwe veke. Piştî ku hemû planên xwe dike êdî ji şivan û çend kesên din ra xwe aşkera dike û xwazgînîyan yek bi yek têk dibe. Piştî têkbirina xwazgînîyan Odysseus nasnavê xwe aşkera dike belam jina wî di destpêkê da bawer nake lê piştî ku Odysseusî tabîê çend ceribandinan dike êdî ji wî bawer dike û digihijin hev. Odysseus dema ku diçe li ba bavê xwe li wir xizmên xwazgînîyan dihên ji bo ku wî bikujiin lê cardin Athene digihije tana (hawar) wî û wan li hev tîne. Bi vê yekê ra destan diqede.

1. Naveroka Destanê

Di destana Odysseia da em ê pêşîyê li ser naveroka destanê rawestin ku em di bin vî sernavî da em ê li ser hin binenavan rawestin. Ew binenavên ku em li ser bisekin ev in: di destanê da dem, mekan, vebêjer, di destanê da ziman –ku di bin vî binenavî da jî em ê li ser şayesandin, şibandin û hin taybetmediyên din ên destanê ne bisekinin-, di destanê da nirxên çandî –ku di bin vî binenavî da jî em ê li ser mêvanperwerî, qurbandayîn (boraqdayîn), tradîsyon û bawerîya di destanê da bisekinin-, tîpolojîya jinê, tîpolojîya mêrî, civak û bûyerên derasayî ne.

1.1. Di Destanê Da Dem

Hemû tiştên pêk tên û diqewimin di nava demekê da rû didin. Mirov bi hebûna xwe ve digel mekanê heyî di nava demekê da ye. Di destanan da bêguman mirov nikare demeke dîyar aşkere bike ku bi vê yekê ra xwe bispêre dîrokekê. Di destana me da jî demek dîyar nîne, di destanê da du dem têne pêşberî me yek dema derasayî ye ku ev dem li rûzemînê naqewime û di nava mekanekî derasayî da dem dihereke. Dema din jî dema rasteqîn e ku di vê demê da em lê rast tên ku ew demek di nava rûzemînê da diqewime. Niha em ê him li ser dema arkaîk (derasayî) him jî li ser dema rasteqîn rawestin.

Destana Odysseia j'alfiyê arkaîkbûna xwe ve xwe gelek parastîye lewma jî di tê da gelek keresteyên arkaîk cih digirin. Di destanê da bêguman keresteyên li ser dema arkaîk (derasayî) jî zaf mînak cih digirin lê em ê yek bi yek li ser wan ranewestin. Em ê bêtir li ser du mînakên dema derasayî rawestin ku ew jî yek dema kombûna Yezdanên Olymposê ye yan din jî dema çûyîna warê mirîyan a Odysseus e. Em dizanin ku kombûna Yezdanên Olymposê di mekanek xumam da anko li Olymposê pêk dihê belam demeka wê ya aşkera nîne. Vebêjerê destanê kombûna Yezdanên Olymposê yên di demeke nedîyar da wiha radixîne li ber çavan:

Poseidon, wê rojê çûbû li ba Rûşewitîyên li dûr rûdinin,

yên li rexeke cîhanê rûdinin mirovên Rûşewitî ne,

bûyîne du par, hin ji wan li rojhilat rûdinin, hin ji wan li rojava,

ji bo standina ga û beranên qurbanî çûbû wê derê,

*li wê derê ketibû kêfxweşîyê, di nava şahîyê da,
 Yezdanên dî jî di koşka Zeus de kom bibûn,
 wê demê, bavê Yezdanan û bavê mirovan dest bi gotinê kir.²⁸⁴
 Demek şûnda em daketin keştîyê, li ber qeraxê,
 me pêşîyê keştî kêşa li ser deryaya îlahî,
 wê derê ye welatê Kimmeran û bajarê wan,
 min dîtîye nedîtîye mijeke têr û bi ewran hatîye rapêçan,
 tava diçilwile tu caran bi tîrêjên xwe wan nabîne,
 ne dema ku berjorî asîmana bistêrk dibe,
 ne jî dema ji asîman vedigere erdî.
 Wesa raxistîye şevêkî bedoxir
 li ser van mirîyên hejar²⁸⁵*

Di piranîya destanê da em lê rast tên ku Yezdanên Olymposê li Olymposê gelek caran kom dibin. Wek li jor jî dîyar e ku dema kombûna wan nedîyar e. Heman wusa dema ku Odysseus jî diçe warê mirîyan ew dem jî nedîyar e. Vebêjer dema qala rûdanekê dike an jî me dibe demekê ji nişka ve ew dikeve nava demê. Mirov nikare li ser ew dema heyî aşkere fam bike. Dem hertim xumam e.

Ji bilî dema derasayî herwiha dema rasteqîn jî cihê xwe yê taybet di nava her kêliyên destanê da digire. Di destanê da bêguman mînakên dema rasteqîn zaf e belam dema rasteqîn jî wekî dema derasayî di nava xumamtîyekê ango di nava nedîyarîyekê da ye. Em xwe di nava rûdanekê dibînin, di vê rûdanê da dema diherike nedîyar e. Bûyer zû diqewimin, zû berdewam dikin û ji nişka ve jî xilas dibin. Di destanê da bêguman mînakên dema rasteqîn zaf hene belam em ê çend mînakên vê yekê wiha bidin:

*Di wê navberê da Odysseusê Yezdanî yê pîrr derdkêşayî ramîya,
 bi derbeyekê re canê wî bîstanda û li erdê bixista,
 yan na bi hêdî li wî bixista û wî dirêjî erdê bikira?
 Rêya duyem bêtir ji wî re baş hat,
 heke hêdîka li wî bixista dê Akhayan fam nekirina ku ew kê ye.²⁸⁶
 Xwazgîni cardin vegerîyane lîstêkê û kilama ku dilê mirovî êmin dike,*

²⁸⁴ h.b.b.r.4.

²⁸⁵ h.b.b.r.185.

²⁸⁶ h.b.b.r.310.

hetta êvarê li gorî dilê xwe kêf kirin.
Di vê navê da şeva tarî hat û danişt.
Her yek ji wan ji bo razanê ber bi jûra xwe va çûn.²⁸⁷
Dema hate dîtîn ku berbanga tilî bigul a zûdem hilhatê,
Lawkê Odysseus ê xoşevîst ji nav nivînan rabû,
lixwekir şûra xwe ya sertûj û hilawêste li ser milê xwe,
bi pîyê xwe yê çilwilî ve girêda sandalên xwe.
Dema ku ji mezelê derket mîna Yezdanekî bû.²⁸⁸

1.2. Di Destanê Da Mekan

Di berhemên edebî de ji bo nirxandin an jî hilsengandina wê berhemê mekan cihekî girîng digre. Mekan, -di rewşa herî hêsan de- di berhemê de sahnaya rûdana wê kêliyê ye. Yek ji wan hêmanên ku lehengê mirovan pêk tîne mekan e û mirov nikare bêyî mekanê lê dijî were fikirînê.²⁸⁹ Mekan di vê destanê de jî bêguman cihekî xwe yê girîng heye. Dema em li vê destana ku kokên wê digihêjin demên berê binêrin, em dikarin bibêjin ku di vê destanê de du mekanên sereke hene. Yek ji wan mekana mîtîk e ya din jî mekana rastîn e. Niha em di destanê de pêşiyê, bi mînakdayîn, li ser mekanên mîtîk rawistin paşê jî em derbazî mekanên rastîn bibin.

Yek ji wan mekanên ku diborin mekanên mîtîk in. Di mekanên mîtîkî de bêtir dema em lê dinêrin em dibînin ku, di derbazbûna mekanên mîtîkî de Olympos cihekî girîng digre û mekana mîtîk a herî zêde dibore jî hema bibêje ew der e. Di destanê de şayesandina hêlîna Yezdanên Yewnan, Olympos wiha ye:

Atheneya çavasîmanî wiha got, derkete Olymposê.
Warê domdar ê Yezdanan dibêjin ew der e,
tev li Olymposê nabin ba û filan,
ne berf dikeve li wir, ne baran dibare li wir,
asîmana bêewr berbelav dibe şipîşîn,
tîrêjên sipî digerin li hawîrdorê.
Li wir derbaz dikin Yezdan rojên xwe yên dilşa²⁹⁰

²⁸⁷ h.b.b.r.16.

²⁸⁸ h.b.b.r.19.

²⁸⁹ b.n, Metin Tahlillerine Giriş 2, Hikaye-Roman-Tiyatro, r.77-78.

²⁹⁰ h.b.b.r.102.

Di destanê de mekana arkaîk Olympos, wekî me anî zimên zaf dibore û hin tişt ber bi wê ve têne nîsbetkirinê ve jî carna. Di destanê çend cihên ku navê Olymposê tê de derbaz dibin wiha ne:

*Yezdanên di jî di koşka Zeus de kom bibûn*²⁹¹

*Di pengizînekê de ji lûtkeyên Olymposê hate xwarê*²⁹²

*Heta ku daxwaza Yezdanên Olymposê pêk neyê*²⁹³

Binêr di dawîyê de desteser kir Ares

*Yezdanê herî lezgîn yê li Olymposê rûdinê*²⁹⁴

Hermeias piştî vê kete nava girava daristanan

*Bi rê ket ber bi Olymposa bilind ve*²⁹⁵

Van çavtirsandik dida Yezdanên Olymposê,

digotin, em ê teqereqa şerrî bibine, li Olymposê

*digotin, em ê siwar bikin, Çîyayê Ossayê li ser Olymposê*²⁹⁶

*Ji ser ewran, ji lûtkeya Olymposa ku tîroşkan berbelav dike*²⁹⁷

Ji van beytên ku di destanê de jî derbaz bûne tê xwîyanê ku Olympos cî û meskenê Yezdanan e. Jixwe pîrr biryarên ku pêk tên jî li Olymposê derdikevin. Ew der ji Teswîra wê jî dîyar e ku derekî arkaîk, ne baran heye ne berf heye, ew der cihê şahîya Yezdanan e.

Di destanê de piştî Olymposê mekana herî arkaîk ku bala me çûye ser, bêguman warê mirîyan e. Em ji destanê dizanin ku dema Odysseus ji bo zanîna çarenûsa xwe berê xwe dide warê mirîyan li wir tiştên derasayî pêk tên. Ew ligel mirîyan an jî dîmenên kesayetên daxive. Ev beş bi tevahî derasayî û arkaîk e. Dîmenên an jî beytên li ser warê mirîyan wiha ne:

Zaf qelebalix bûn, ref bi ref diçûn û dihatin

li ser çalê digel qîreqîrên xofnak ji wan derdihat,

*tirseke xwe li min peyda kiribû, tirseke zer û kesk.*²⁹⁸

*Çawa tu berîya me gihayî Elpenor, li welatê taristanê*²⁹⁹

²⁹¹ h.b.b.r.4.

²⁹² h.b.b.r.6.

²⁹³ h.b.b.r.109.

²⁹⁴ h.b.b.r.136.

²⁹⁵ h.b.b.r.175.

²⁹⁶ h.b.b.r.195.

²⁹⁷ h.b.b.r.344.

²⁹⁸ h.b.b.r.186.

²⁹⁹ h.b.b.r.187.

*Tu çawa hatî layê min, bi saxesax, li welatê taristanê yê têrmij?
Mirovên jîndewar zû biz û nikarin van deran bibînin,
çemên mezin hene di navberê de, şîpên sawdar hene:
Pêşîyê Okeanos tê, tu nikarî derek wê ya nermeav peyda bikî,
heke keştîyeka te ya saxlem tune be tu nikarî derbaz bî wê dere³⁰⁰
Odysseusê zaf fêlbaz, lawê Laerts, yê ku Yezdanan xwedîkirî,
hêj te çi şolên mezin pîlan kirine, mirovê xofdar, kê dizane,
te çawa cesaret li xwe de dît bo daketina Hadesê,
li vir mirî rûdinên, yên ku ji ramînê bêpar in,
dîmenên mirîyan yên karê wan bi dawî bûyî.³⁰¹*

Ji van beytan jî û di destanê de jî dîyar e ku ev der yanî warê mirîyan dereke tarî û taristan e. Li vir yanî di warê mirîyan de hikûmdarî di bin destê Hades û Persephone de ye. Yên ku li vir xwedîhêz in, ew in. Her wekî li beytên li jor jî dîyar e, ji bilî Odysseus û hevrêyên wî ti kesên zindî tune li wir. Yanî ji bo ku kesek biçe li wir lazim e mirî be lê belê ji ber ku Odysseus kesekî balkêş û derasayî ye, ew diçe wira. Ev der cihekî xofdar e, mirî li vir rûdinên, mirîyên ku li dûrî fikirîn û ramînê. Welatê mirîyan di nav mekanên arkaîk de yek ji wan mekana ne ku him balkêşî him jî bi derasayîtiya xwe ve di destanê de cî digre.

Di destanê de ji bilî mekanên arkaîk herwiha mekanên rastîn jî zehf tê de cî digrin. Em ê niha digel mînakan wan cihên derbaz bûne bidin. Di destanê de koşk, seray, behr, çem, robar, girav, çîya, şikeft, perestgeh, keştî, daristan, deşt, qeraxên behre û h.w.d zaf tê de cî digrin.

Behr, her tişta ku ji wê derdikeve, her tişta ku ji bo wê vedigere û sembola bêabadîniya razber e.³⁰² Ji ber ku serpehatîyên serlehengê vê destanê piranî li behrê an jî li cihên ku av hene lê derbaz dibe lewma jî behr wek mekan di destanê de zaf derbaz dibe. Ji bo çend cihên ku behr lê derbaz dibe mînak:

*Mîna qeqlîbazekê xwe noqî ava têrmewc kir
mewcên reş li ser wî de girtin
Heke mewc çardarka min parçe bikin ti çara min namîne,
ez ê xwe bavêjime behre, dest bi melevanîyan bikim.³⁰³*

³⁰⁰ h.b.b.r.190.

³⁰¹ h.b.b.r.200.

³⁰² b.n, Tanpınar ve Semboller, r.435.

³⁰³ h.b.b.r.95.

*Berbanga kezihonandî ya delal wextê ku anî roja sêyem,
ba di carekê de aram bû, behr bû mîna rûnivînekê.
Odysseus bi çavên xwe yên tûj lê nihêrî
di ser komegirekî mezin a behrê de,
ha li vir bû erd³⁰⁴
Serobino bû keştîya ku ji ber birûska Zeus ya bikerkûd lêketî,
heval tev pêkve ketine behrê.
Mewcan hevalên min tev birin.³⁰⁵*

Dema em li destanê dinêrin yek wan mekanên ku herî zêde tê pêşberî me çem e. Di destanê de cihên çem tê de derbaz dibin ji bo wan çend mînak:

*Wiha got, çemî jî herikîna xwe da rawestandinê
Mewc girtin, behr rast kir mîna rûnivînekê,
Odysseus xilas kir, ew kişande derava xwe³⁰⁶
Çarîk Xwedawendê ji ser sînga xwe hilçand
ew avête behrê, avête çema ku diherike
pêleke mezin çarîk da ber xwe,
Ino çarîk bi destê xwe hilgirt.
Odysseus jî ji çemî derket, xwe dirêj kire li nava bîşeyan de³⁰⁷*

Weke di mîtolojiyê de jî di destanan de jî dijmin li çîyan e.³⁰⁸ Di destanê de jî çîya cihêkî girîng digre. Jixwe yek ji wan cihê ku serpêhatîya Odysseus lê derbaz bûye jî, çîya ye. Li wir wekî tê zanînê di serê çîyayekê de di nava şikeftê de bo demeke dirêj asê dibe. Ji bilî vê derê çend cihên din de jî çîya wek mekanekê tê beramber me û bi giştî cihên ku tê de çîya derbaz dibin re çend mînak wiha ne:

*Em ji qûntarên Çîyayê Neion tèn, ji Ithakeyê
ya ku ez ê qala wê bikim ne karê gelê min, karê min e³⁰⁹
Ez rûdinê li Ithakeya ku ji dûr ve xwîyaye,*

³⁰⁴ h.b.b.r.96.

³⁰⁵ h.b.b.r.219.

³⁰⁶ h.b.b.r.98.

³⁰⁷ h.b.b.r.98-99.

³⁰⁸ Bayat, Fuzui, Mitolojiye Giriş, Istanbul: Ötüken Neşriyat, sal 2016, r.103.

³⁰⁹ h.b.b.r.38.

*ji ber ku çîyayekî mezin li ser heye,
 Çîyayê Neritos ku belgên wê dixuşxuşin,
 derdora wê rapêçandîye gelek giravan³¹⁰
 Rûdinên li ser girên bilind ên çîyan, di şikeftên qefkirî de,
 hemû kes mala xwe bi rê ve dibe, jina xwe, zarokê xwe,
 di xema wan de ye tu kes, guh nadin kesî.³¹¹*

Di destanê de yek ji wan cihên ku derbaz dibe şikeft e. Di vê mekanê de em dizanin ku Odysseus bo demekê asê dimîne. Ji ber ku asê dimîne lazim e tavil jê derkeve, ji bo derketa xwe ew pirr çareyan digere. Li wir de hin fikir têne hişê wî û ji wir bi awayekî baqilane derdikeve. Mirov dikare bibêje ku şikeft wek mekanekê ji bo Odysseus dibe cihê têrram in û fikirîneke kûr. Herwiha bi giştî cihên ku ji bo mekana şikeftê derbaz dibe di destanê de ev in:

*Bi rê ve çû ber bi şikeftê ve,
 di wê şikeftê de Nympeya kezîhonandîya delal rûdinişt
 Em tavil gihane li ber şikeftê, lê belê me ew nedît di hundur de,
 sewalên xwe yên qelew biribûne çereyê.³¹²*

...

*Di wê navê de wî ajot bo ber derîyê şikeftê ve
 pezên qelew, hemû mihên mê yên ku dê bêne dotinê,
 li derve hişt tev yên nêr,
 yên beran, yên nêrî tev li derve hiştin, li hewşê de.
 Piştî jê rakir zinarekî gir û mezin,
 danî ew li ber devê şikeftê, devê wê girt³¹³*

Koşk (seray, qesr) di destanê ew cih e ku Odysseus dibe mêvan, ew cih e ku xwazgînî li mala Odysseus in carna jê ew cih e ku hevrêyên Odysseus tê de zindankirî ne. Di destanê de cihê ku koşk (seray, qesr) tê de derbaz dibin jê wê re çend mînak:

*Koşka biban ya bilind a Alkinoosê zîndewerê mezin
 dibiriqîya mîna rojê, mîna heyvê!*

³¹⁰ h.b.b.r.145-146.

³¹¹ h.b.b.r.148.

³¹² h.b.b.r.85.

³¹³ h.b.b.r.152.

Di her du alîyên wê de dîwarên tuncî bilind dibûn
ji destpêkê heta ber bi hunduran ve,
curexêz hebûn di van dîwaran de ji mîneya şîn,
derîyên ji zêrê vedibûn ber bi hundurê xanîyê saxlem ve,
derazûngên wê ji misê zer, şêmûgên wê ji zîvê bûn,
her du alîyên wê û mîrkuşên derîyan ji zêrî bûn.³¹⁴
Dema ku me di pişt sergirê zinarekî re raçavkirina derdorê dikir,
min dûmanek dît, ji rêya fireh ya ji erdî difûrîya,
Ji qesra Kirke derdiket ev dûman,
li dûr, di bîşeya pîrr de, li dûrî daristanê³¹⁵

1.3. Di Destanê Da Vebêjer

Em dizanin ku nivîskar û vebêjerê destana Odysseiayê Homeros e. Homeros dengbêjekî gel bû.³¹⁶ Yê ku di şahîyên mezin da helbestên epîk dixwandin dihatin xelatkirin. Yê ku pîşeya dengbêjtîyê dikirin bajar bi bajar digerîyan, her derê ku diçûnê bi hev ra diketin pêşbirkê. Navenda sereke ya dengbêjan Delos bû. Ji bo şahîya Apollon ya li Delosê jin û mîrên ku di temenên cihê cihê da dihatin, ji bo pêşbirka muzîkê ji her bajarekî koro tevlî dibûn. Dihê gotin ku Homeros jî li Delosê tevlî van pêşbirkan dibû.³¹⁷ Homeros dengbêjekî navdar bû û wî ev destana tekûz li hev anîye. Homeros, ji bo metnên xwe ne karakterek e lê di asta yekem de vegêrê wan e.³¹⁸

Wekê tê xuyanê destana Odysseia ji alîyê dengbêj Homeros ve hatiye vegotin û derbasî nivîsê bûye. Di destanê da em dibînin ku dengbêj hebûna xwe aşkera nake û li gorî vegêrana îlahî tevdigere. Di piranîya destanê da vegêrana îlahî serdest e belam di beşên IX-XIIan da em dibînin ku vebêjerê destanê ji bo ku Odisseus qala serpêhatîyên xwe bike hefsarê axaftin û vebêjerîyê dide destê Odysseus. Dema ku Odysseus dest bi serpêhatîyên xwe dike bi çavê kesê yekem rûdanan ji me ra vedibêje. Vebêjerê îlahî her çiqas hefsarê axaftinê bide destê Odysseus anko bide vegêranê şexsê yekem jî em di gelek deran da lê rast dihên ku vebêjerê îlahî cardin di nava vebêjerê şexsê yekem da hebûna xwe aşkera dike. Vebêjerê destanê dema ku dihêle Odysseus behsa serpêhatîyên xwe bike hin caran ew bi xwe midaxilî rewşê dibe û rewşa Odysseus ya demkî ji me ra radigihîne.

Di destanê da her çiqas bi giştî hefsarê axaftinê di bin destê vebêjerê îlahî da be jî lê em ê di hin beşan da em lê rast tînin ku vebêjerê yekem derdikeve li ser dike. Ev vebêjerê

³¹⁴ h.b.b.r.116.

³¹⁵ h.b.b.r.170.

³¹⁶ b.n., Tarih Öncesi Ege II, r.287.

³¹⁷ b.n., Tarih Öncesi Ege II, r.239.

³¹⁸ b.n., Destpêkek ji bo Zanista Edebîyata Modern, r.122.

yekem di bin kontrola vebêjerê îlahî da ye. Lewma em ê bi giştî cih bidin vegêranê îlahî belam em ê di heman demê da li ser vegêranê şexsê yekem jî rawestin. Vegêranê îlahî di çîrokê (vegotinê) da cih nagire ango di çîrokê da ji aliyê karakterek ne di çîrokê da cih digire lê ji aliyê vebêjerekê ve dihê vegotin. Vebêjerê îlahî (desthilatdar), çîrokekî kesên di eleqedar dike vedibêje. Vebêjerê îlahî çîrokê ji derve dibîne; bi piranî cîhana çîrokê û hemû tiştê ku karakteran eleqedar dike (hizirînên karakteran yên hişî û yên binhişî jî tê da) dizane û bi hêzeke berfireh xwedî li vê desthildarîyê ye.³¹⁹ Di destanê da mirov dikare ji bo vebêjerê îlahî gelek mînanan peyda bike lê ger em çend mînanan nîşan bidin:

Xwazgînî cardin vegeŕiyane lîstkê û kilama ku dilê mirovî êmin dike,

hetta êvarê li gorî dilê xwe kêf kirin.

Di vê navê da şeva tarî hat û danişt.

Her yek ji wan ji bo razanê ber bi jûra xwe va çûn.

Jûreka Telemakhos di hewşê xweşik da,

avayîyeka bilind bû, li dûr bi tena serê xwe.³²⁰

Dema hate dîtin ku berbanga tilî bigul a zûdem hilhatê,

Lawkê Odysseus ê xoşevîst ji nav nivînan rabû,

lixwekir şûra xwe ya sertûj û hilawêste li ser milê xwe,

bi pîyê xwe yê çilwilî ve girêda sandalên xwe.

Dema ku ji mezelê derket mîna Yezdanekî bû.³²¹

Benderek heye li bajarê Ithakeyê yê Phorkysê pîr ê deryayê

du difînên ku li benderê dirêj dibin ripîrast dibin

û bi asêgehên zinarî ve ev kendavik dorpêç dikir.³²²

Çawa ku şêrek bi ketina nava girseya mirovan de matmayî bimîne,

çawa ku ji ber derdora kemîna dorteng dibe, bitirse,

dema ku wiha digevizî girt xewa xweş, Penlopeiaya jî.³²³

Wekî me anî ziman di destanê da em di hin beşan da li rastî vebêjerê şexsê yekem jî dihên. Rewşa vegêrana şexsê yekem, hem vegêr e û hem jî lehengekî çîrokê ye. Bi van nasnameyan bûyeran tecrûbe dike an dibe şahidê wan. Di vegêranê de “qisetkirin” hebe jî

³¹⁹ Jahn, Manfred, Anlatıbilim, Werger: Bahar Dervişcemaloğlu, Weş. Dergah, Stenbol 1994, r.72.

³²⁰ h.b.b.r.16.

³²¹ h.b.b.r.19.

³²² h.b.b.r.93.

³²³ h.b.b.r.79.

bêtir “nîşandan” li pêş e.³²⁴ Di destanê da mînakên ji bo vebêjerê şexsê yekem di beşên IX-XIIan ên di destanê da diborin. Ger mirov çend mînakan jê bide:

min tavil rahişte singê wî, min xiste nava pelan de
di alîyekê de min ez li ber hevrêyan gerîyam, min cisaret da wan
radestî tirsê nebin û nebe ku hûn dev jê berdin, min gote wan, min tenê nehêlin.
Min singê zeytîne nêrî, di êgir de soresor dibû,
hê şîn bû, lê dê bi sotinê niha biketîya.
Ji kişandina singî di nêv êgir da û rahêlana min bû yek
*digel min hemî hevrêyan êrîş birin*³²⁵
we çî fam kir kûçikno, ma ez ê cardin venegerîyama xanîyê xwe
ji bajarê Troyayîyan, xanîyê ku we rût û pût kirî?
we çavsorî kir, hûn bi xidamên min ra raketin,
herwiha hûn ji jina min ra bûne xwazgîni hê ku ez sax,
hûn qet ji Yezdanên li jor netirsîyan,
rojek bêt, ji we tol bê hilgirtin, we ev nefikirî?
*hûn ê niha tev bikevin xefka mirinê.*³²⁶

Wekê li jor jî dîyar e him me mînakên vebêjê îlahî da him jî me mînaka vebêjê şexsê yekem da. Ji ber ku di destanê da bêtir vegêrana îlahî serdest e lewma zîqbûna me jî bêtir li ser vegêrana şexsê sêyem bû. Di destanê da mînakên ku ji bo vebêjerê îlahî derbas dibin, em dibînin ku di wir da vebêjerê destanê hay ji hemû tiştan heye. Di destanê da Vebêjerê şexsê sêyem dizane ku ka dê çî biqewime û çî qewimîye. Vebêjer hemû tiştan radixîne li pêşberî me.

1.4. Zimanê Destanê

Di destana Odysseia da ûslubekî xurt yê aîdê destanê tê li hemberî me. Di destanê da mirov dikare bibêje ku zimanekî herîkbar û fesîh heye. Di destanê da vebêjer dema ku qala keseyatên leheng dike wan bi vegotîneke derasayî û epîkane derdixe li pêşberî me. Her wekî di beytên destanê da jî xuya dibe ku vebêjer ji bo ku zimanê xwe tim zindî bihêle û nekeve monotontîyê zaf cih dide dîyalogan. Hebûna dîyalogan di destanê da herîkbarîya metnê zêdetir dike.

³²⁴ b.n., Destpêkek ji bo Zanista Edebîyata Modern, r.122.

³²⁵ h.b.b.r.157.

³²⁶ h.b.b.r.370.

Di destanê da vebêjerî serî li ûslubek, edebî daye. Di destanê da carna em lê rast dihên ku him zimanekî edebî heye him jî zimanekî rojane heye ku, vebêjerî her du digel hev baş kelijandîye. Bêguman ev yeke asta hunerwerîya vebêjerî jî derdixe holê. Di destanê da vebêjerî ji duberekirinan, ji şibandinan, ji mubalexekirinan, ji meteforan û hwd zaf wec wergirtîye. Di destanê da herwiha em li rastî ûslubeke terwende jî dihên ku ev yek rengvedana pisporê destanê ye.

Em ê di bin vî serenavî da li ser şayesandin, şibandin û hin taybetmendiyên din ên destanê rawestin.

1.4.1. Di Destanê Da Şayesandin

Şayesandin an jî teswîrkirin, dema ku mirov bixwaze dîmeneka heyî bi gotinan vebêje pêwistî bi wênekirina peyvan çêdibe. Mirov ji destpêka nîvîsê heya niha bêguman gellek tiştên xeyalî, xwezayî, xweşik û edebî bi rîya wênekirina peyvan teswîrkirin e. Di dema teswîrê de bêguman divê nûskarê berhemê xudan şîyaneka qewî be ku di kata şayesandinê da tişta heyî wekê ku mirov li wir be, baş bîne li ber çavan. Wexta ku berhem baş bê şayesandinê şik ne tê da ku qedr û nirxê berhemê jî bi girêdayî şayesandina di berhemê de ewqas dibe xwe giranbihayekê. Di destana Odysseia ya Homeros de jî bêguman şayesandin cihekî xwe yê girîng digere û dilîze. Niha em ê şayesandinên qewî yên ku di destanê de diborin li ser wan rawestin.

Destpêka destana me bi banga Yezdanan an jî Musayan wiha dest pê dike:

*Ji min ra vebêje Yezdanê, mirovê têrfêlbaz ê yeman,
ew Troyaya xuceste wexta ku ji nav birîbû,
piştra jî li van deran û li wan deran şerpize bibû,
çiqas cî dîtibûn, çiqas mirov nas kirîbûn,
dilê wî çiqas êş dîtibûn di deryayan da,
kata ku dixwast rizgar bike canê xwe,
kata ku dixwast rê li ber hevrêyên xwe veke...*³²⁷

Destan piştî banga bi Yezdan re bi komecivîna Yezdanan ra berdewam dibe. Piştre destan bi awayekî zelal diherike tê û em dibînin ku Telemakhos digel kul û derdên nebûna bavê xwe, ji ber neçûyina xwazgînîyan û zordariya wan di nava tengasîyeke mezin de ye. Derdora xwazgînîyan û rewşa heyî wiha tê şayesandinê:

*Xwazgînî cardin vegeyîyane listkê û kilama ku dilê mirovî êmin dike,
hetta êvarê li gorî dilê xwe kêf kirin.
Di vê navê da şeva tarî hat û danişt.*

³²⁷ h.b.b.r.3.

*Her yek ji wan ji bo razanê ber bi jûra xwe va çûn.
Jûreka Telemakhos di hewşê xweşik da,
avayîyeka bilind bû, li dûr bi tena serê xwe.
Telemakhos ji bo nivistinê bi têrraman û têrraman,
Eurykleia, keça Opsê Lawpeisenor,
li çar aliyê wî diçû û dihat,
çira digirt bo rîya wî bi pak û paqij.³²⁸*

Piştî vê şayesandina tekûz em di gellek cîyên din ên di destanê de rastî wênekirina peyvan ango teswîran tîn. Dema ku Telemakhos piştî biryara digel xwazgînîyan û rûsipîyên Ithakeyê dixwaze civînekê pêk bîne vebêjerê destanê rabûna Telemakhos ji nav cîyan û lixwekirina cilûbergên wî wiha dişayesîne:

*Dema hate dîtî ku berbanga tilî bigul a zûdem hilhatê,
Lawkê Odysseus ê xoşevîst ji nav nivînan rabû,
lixwekir şûra xwe ya sertûj û hilawêste li ser milê xwe,
bi pîyê xwe yê çilwilî ve girêda sandalên xwe.
Dema ku ji mezelê derket mîna Yezdanekî bû.³²⁹*

Ev kurtekêliya Telemakhos j'alîyê vebêjerê destanê va bi awayekî edebî û şairane hatîye şayesandinê.

Dema ku Telemakhos û xelkê Ithakeyê di nava civînê de ne di wê navberê de sahneyeka din a têrbiteswîr wiha pêk tê:

*Zeusê deng bixwirt du eylo berdan,
ji berjoran bifîrîn hatin, ji lûtkeya çîyayekî,
pêşîyê xwe berdan û ketine li ser rîya bayê
bi baskên xwe yên vezilandî li ba hev ketine firîné,
dema ku hatine li ser qada bizivîn a civatê
bi baskên xwe yên tijî bihejîn û bihejîn firîyan
çavên wan yên mirinbelavkar li ser serê mirovan hatibûne zîqkirinê.³³⁰*

³²⁸ h.b.b.r.16.

³²⁹ h.b.b.r.19.

³³⁰ h.b.b.r.24.

Vebêjerê destanê cardin kurtekêlîyekê bi awayekî bêqisûr tîne û radixe li ber çavên me. Li vir de digel şayesandîna biquwet herwiha tahkîyeyeka xwîrt jî heye û tiştêkî din jî heye ku balê dikêşîne li ser xwe. Em dizanin ku di Mîtolojîya Yewnanan da yek ji sembolen Zeusê Yezdan, eylo ye.³³¹ Vebêjerê destanê jî di nava destanê da vê yekê digel şayesandinê bi rîya ciwankarîya telmîhê bi bîr tîne.

Dema ku Telemakhos digel hevrêyên xwe dikeve rê ji bo çûyîna li ba Menelaos, vebêjerê me yê destanê çûyîna wan wiha dişayesîne:

*Dema ku hate dîtin berbang a tilî bigul a zûdem hiltê
çûne ber bi hespan ve, cardin li siwareyên belekî siwarbûn,
ji derî derketin, ji hewşa olanvedayî derketin,
şîrqadin qemçûr ji bo ku bikevine rê,
hesp pengizîn bi lezayî ber bi deşta genîman ve.
Hespên biçalak ewqas bi lez diçûn ku,
hê zû dem derbaz nebûyî rê kuta kirin.
Cardin roj çû ava, tarîtiyê rê dagirtin.³³²*

Vebêjerê destanê him dişayesîne him jî tahkîye dike. Şayesandinên Odysseyayê him têra xwe edebî ne him jî zelal û fesîh in. Di herikîna destanê da zaf şayesandin hene. Di cîyeke din ê destanê de dema ku Odysseus dê ji cem Kalypso biçe ew roj wiha tê şayesandinê:

*Dema ku hate dîtin berbang a tilî bigul a zûdem hiltê
Bilezûbez li xwe kir işlikê xwe Odysseus, xeftanê xwe,
Nympheyê jî hewranîyê xwe yê zîv ê bireng danîbû li ser pişta xwe,
ev hewranîyeka gelek xweşik û tenik bû,
navtenga xwe bi doxîneka zêr a xweşik ra girêda,
nixumand porê xwe bi çarîkekê ve³³³*

Ev şayesandîna li jorê bi vî awayî berdewam dike û diçe. Vebêjer dema ku behsa van şayesandinên xwe dike heçku li wir be, heçku ew jî hevrêyekî Odysseus be van tiştan yek bi yek dişayesîne. Hemû tiştan bi hûrgilî vedibêje, peyvan bi wêne dike. Teswîrên vebêjer naveroka destana wî xwîrttir dike.

³³¹ ji bo agahiyên berfireh biner: <https://tr.wikipedia.org/wiki/Zeus>.

³³² h.b.b.r.51.

³³³ h.b.b.r.90-91.

Şayesandineka din a destanê ku li wir de Odysseus di nava deryayê da hewla xwexilaskirinê dike û rîya rizgarîya xwe digere, ew dîmenên heyî wiha têne şayesandinê:

*Dema ku em wiha bi xwe ra diaxivî,
pêleka mezin ji berjor ber bi berjêr ve lêda,
bi gurmîni li çardarê ket, sorobino kir.
Odysseus xwe gelekî bi dûrî çardarê dît,
serê dûmenê ji destê wî pengizîbû
bahoza ku ji bayên tevlihev ketibû
rastûr ji navê da kiribû du qet,
çardarik bi serena wê ve bi dûr avêtibû, avêtibû deryaya mezin.
Odysseus demekê di bin avê da ma,
xwe ji nav lepên mewceke mezin neşêya rizgar bike,
cilûbergên ku Kalypsoyê dabûn jî jê re gelek giran hatibû.
Her çawa be piştra derkete ser avê,
ji devê wî avên tehl dipengizîn,
mîna lehîyê av ji serî heya binî dadirijîya.³³⁴*

Şayesandineka din a vebêjer wiha tê pêşberî me. Vebêjer dema van tiştan dişayesîne yek bi yek tiştên heyî, heçku li ber çavên wî biqewimin vedibêje. Ew bi wênekirina van hevokan, dîmenên heyî rasteqîntir dike.

Phaiakî dema ku serlehengê me tînine welatê wî Ithakeyê, vebêjerê destanê ew bendera ku Odysseus datînin wiha dişayesîne:

*Benderek heye li bajarê Ithakeyê yê Phorkysê pîr ê deryayê
du difînên ku li benderê dirêj dibin ripîrast dibin
û bi asêgehên zinarî ve ev kendavik dorpêç dikir.
Van difînan xwe ji mewcên gir ên bayên har
diparastin bender ji ber derveyî
û dema dihatin ji bo lenger berdanê keştîyên girs ên saxlem,
bêyî ku bêne girêdanê dikarîbûn nelivin.*

³³⁴ h.b.b.r.93-94.

dareka têrpel ya zeytûnê heye li alîyeke kendavikê
û li ber wê, şikefteka cindî û kêmrone,
ev der cihê pîroz ê Naiadyên ku wek Nympheye tê zanîne:
kabikên ji keviran, cer rêzkirine di vê şikeftê da,
ji bo sazkirina selmêşkan mêş tene wira.
Dezgehên dirêj û dirêj rêzkirine cardin ji keviran,
Nympheyî patyên xwe yên belekî dirêsin, bi dilxweşî.
Kanî jî hene, bi dirêjayî dicoşin,
dido jî derîyên şikeftê hene,
yek li Bakur dinere, ji insanan ra vekirî,
ya din li Başûr dinere, ew der ya Yezdanan e,
rîya nemirane, mirov nikarin ji wî derî ra derbaz bibin.³³⁵

Dema mirov li van hevokên li jor dinere pê qanîh dibe ku vebêjer an jî nivîskarê destanê ev derên ku qala wan dike yan jî wan diresimîne, yek bi yek gerîyaye. Heke negerîyabe jî texeyyûleka bêhempa pêk anîye. Di her bêjeyeke vê şayesandinê de behremendîyeka tekûz heye. Vebêjer bi van şayesandina asta berhema xwe nixdartin kirîye. Bêguman di vê destanê da yek ji tiştên herî li ber çav şayesandin bû. Ji ber ku şayesandin hema hema bêje di her rûpeleka destanê de cî digre lewma jî mirov nikare yek bi yek li ser wan şayesandin ango teswîrkirinan raweste.

1.4.2. Di Destanê Da Şibandin

Şibandin, bi hêleke xwe ve şibandina heybereke lawaz ya bi heybereke bi hêz re ye. Ev huner ji bo hêzdarkirina vegotinê yan jî ji bo dîyarkirina zêdehî ya taybetîyên vegotinê, tê bikaranîn. Çar heb hêmanên bingehîn yên vegotinê hene: tiştên ku tê şibandinê, tiştên ku hatîye şibandinê, alîyê şibandinê, daçeka şibandinê.³³⁶ Tabî ev hêman şibandinê dema ku ji bo kesayetan bîn bikaranînê wê demê hêman wiha tene birêzkerinê: yê/ ya ku tê şibandinê, yê/ ya ku hatîye şibandinê, alîyê şibandinê, daçeka şibandinê. Şibandin ji ber ku dikeve bin banê edebîyatê lewma jî di her cureyê edebîyatê de yan jî binbeşeke edebîyatê de xwe nîşan dide. Ev çî roman be çî helbest be çî destan be an jî çî tişteke din be. Nivîskar ji bo xwirtkirina vegotina xwe û lawazên heyî di berhema xwe de serî bi şibandinê dide. Bi şibandinê re him berhema nivîskar xudanêzêtir dibe him jî alîyê berhemê yê hunerî zêdetir dibe.

Bêguman di vê berhema me ya qerase û bingehîn de jî bi tîra xwe nivîskar an jî vebêjerê destanê serî li şibandinan da ye. Di berhemê de nûskarê me ji bo serwextkirina hin tiştên heyî bi rîya şibandinê him wateya wan hêsan kirîye him jî bi van şibandinan re ew tiştên

³³⁵ h.b.b.r.224.

³³⁶ <https://tr.wikipedia.org/wiki/Benzetme>.

heyî fambartir kirîye. Em ê niha li ser hin şibandinên ku di destanê de diborin li gor hêmanên şibandinê li ser wan bi mînakdayîn rawestin.

*cerên tije yên meyê ên şêrîn ên wekî hingîvê*³³⁷

Di vê hevoka jor de mey ji bo bihêzkirina wateyê wê bi hingîvê ve hatîye şibandinê. Ji ber ku di hingîvê de çêjeke şêrîn û xweş heye lewma hatîye xwastin ku bi rîya vê şibandinê alîyê kêzkan an jî nedîyar baş bê xwirtkirin û bihêzkirinê. Di vê hevokê de her çar hêmanên bingehîn ên şibandinê hatine bikaranîn. Hingîv tiştê ku tê şibandinê ye, yanî ew tiştê xwirt e, mey tiştê ku hatîye şibandinê ye, yanî ew tiştê lawaz e. Di hevokê de alîyê şibandinê yanî alîyê hingîvê ye xwirt jî şêrînê ye, daçeka şibandinê jî bi “wekî”yê ve hatîye nîşandanê.

Têdikeve di şikefta şêrekî girs e de xezalek

Du têtîkên nûzanî yên berşîr dixê xewê,

derdikeve diçêrê li ser evrazên çîmendîr ên çîyê,

dema ku şêr vedigere şikefta xwe dibîne têtîkan li wir,

ji her duyan re jî tîne mirina sawdar.

*Odysseus jî dê mirinek wesa ji wan ra bîne.*³³⁸

Di van beytên li jor de em cardin li rastî şibandineke xwirt, zelal û fesîh tînin. Di van beytan de her çar hêmanên şibandinê çîyê xwe digrin. Di vir de şêr candareke ku ev candar gelek caran ji bo kesên cisaretî û xudanhêz tê emilandinê. Şêr, yê / ya ku tê şibandinê ye ji ber ku şêr yek ji sembolen xudanhêzî û cisaretê ye. Odysseus jî li vir de kesê ku hatîye şibandinê ye, yanî ew bal bi şêrî û hêz û cisaretê wî ve hatîye wekandinê. Alîyê şibandinê di vir de saw e yanî sawa şêrî ye. Daçeka şibandinê jî yanî ew amûra ku hatîye bikaranînê jî “wesa” ye. Di van beytên li jor de digel şibandin û hêmanên wê herwiha edebîtî û şaîranetî jî xwe derdixê li pêşberî me. Ji bo ku kes hêza Odysseus baş bizanibin wî wekî şêrekî destnîşan dide vebêjerê destanê. Wî wek kesek cisaretî nîşanî me dide. Xwazgînîyên jina wî jî wek kesên xezal nîşan dide yanî ew kesên li hemberî şêrekî mîna xezalekê, lawaz in. Ango Odysseus nêçîrvan e, xwazgînî jî nêçîr in yanî nêçîra Odysseus in.

Çawa ku şêrek bi ketina nava girseya mirovan de matmayî bimîne,

çawa ku ji ber derdora kemîna dorteng dibe, bitirse,

*dema ku wiha digevizî girt xewa xweş, Penlopeiaya jî.*³³⁹

Di van hevokên li berjor da cardin em dibînin ku şibandin digel hêmanên xwe hatine bikaranîn. Di van beytan de şêr candarê ku tê şibandinê ye. Xewa Penlopeiayê jî tiştê ku hatîye şibandinê ye yanî ji bo serwextkirinê ew alîyê dîyarker e. Alîyê şibandinê jî bêguman xweşîtahîya xewê ye. Daçeka şibandinê jî “wiha” ye. Vebêjer ji bo xwirtkirina gotinên xwe

³³⁷ h.b.b.r.30.

³³⁸ h.b.b.r.64.

³³⁹ h.b.b.r.79.

cardin li serî şibandinê da ye. Di vê şibandina wî de herwiha edebîtiyeke xweş û lihevhatî tê pêşberî me. Jixwe ti caran vebêjerî wekî di vê mînakê de jî dîyar e, nexwastîye bi gotinên ji rêzê û bêserûber bi kar bîne. Lewma jî wî him şibandinên xwe him ji digel şibandinên bixurt wî edebîti jî xistîye di nava van beytên xwe yên li jor de.

min peyda kir, li cem keştîyê hevrêyên xwe yên xoşevîst,
bi îskîni diman û rondik dibarandin û dibarandin
çawa ku golik li derve derbaz bikin şevê
bi hilpetikîn û vepertikîn bêne bidûrxistinê pevra,
bi ziktêrkirinekê re û li ser vegeşîna hewşê ya çêlekan,
çawa ku li çewlikan bi cih nebin û bi ore or
bi çargavî li doralîyên maka xwe zivirin,
wan jî heman wisa, bi dîtina çavan ra wexta min dîtin
xwe avêtine min bi girîn û zarîn³⁴⁰

Di van beytên li jor de em vê carê jî li rastî şibandineka din a vebêjerê destanê tîn. Wî vê carê candareke ber bi çav an jî ya xwirt bi kar neanîye. Ji bo fesîhkirin û sivikkirina wateyê an jî rewşa heyî şibandinekê li ser têjîkekê (golik) dide. Wek heman carî vê carê jî her çar hêmanên şibandinê bi kar tîne. Golik bi xwe li vir de candara ku tê şibandinê ye, ji ber ku ji bo tiştê heyî mînaka wê an jî alîyê wê tê şibandinê. Hevrêyên Odysseus jî kesên ku hatine şibandinê ye, yanî rewşa wan dişibe rewşa golikan. Alîyê şibandinê jî rewşa golikan a matmayîne ye. Daçeka şibandinê jî "heman wisa" ye ku jixwe peywira daçeka şibandinê di navbera tiştê şibandinê û tiştê hatîye şibandinê de pirek e ango amûrek e.

Di deştê da çawa ku çar hêşa siwareyekê
di bin şeqînîya qemçûran da çawa ku xwe pêkve bavêjne pêşîyê,
çawa ku bi lez bi rê de biçin bi pêdare pêdare,
pêşîya keştîyê jî wisa radibû pêdarê weha³⁴¹

Di van beytên li jor vebêjerê me hêza xwe ya hunerî tîne û bi edebîtiyeke giranbuha ve dike yek. Wekî beytên din vê dere jî cardin şibandin digel her çar hêmanên xwe hatine pêşberî me. Di van beytan da candara ku tê şibandinê hêşa ye, yanî şibandin li ser wê hatîye kirinê. Tiştê ku hatîye şibandinê jî keştî ye yanî keştî bi hêşa ve hatîye wekandinê. Hêla şibandinê jî rewşa an jî xweşçûyîn hêşayan e, wata keştî bi lezçûyîna xwe ve wekî rewşa hêşayan hatîye wekandinê. Di van beytan de daçeka şibandinê jî "wisa" ye. Di şibandinên vebêjer de

³⁴⁰ h.b.b.r.178.

³⁴¹ h.b.b.r.223.

şibandinên wî piranî di nava şayesandinekê de têne emilandinê. Vebêjer ji bo xwirtkirina şibandinên xwe zimanekî xwerû û xweş tîne ba hev.

Di şibandinên destanê de her çiqas şibandin digel çar hêmanên xwe bêne emilandinê jî, carna her çar hêmanên şibandinê bi hev ra nayêne emilandinê. Di awayên wiha de şibandin an du an jî herî zêde bi sê hêmanên xwe ve têne emilandinê. Di van şibandinan de, ji xwirtkirina kes an jî tiştên din peyva ‘‘Yezdani’’ zaf tê emilandinê. Ji bilî vê peyvê ji bo xwirtkirinê şibandinên din jî têne bikaranînê û bo nimûne:

*Odysseusê Yezdani*³⁴²

*Odysseusê hişmend û fêlbaz*³⁴³

*Telemakhosê rû Yezdani*³⁴⁴

*Mîna hingîv şêrîn*³⁴⁵

*Odysseusê zaf fêlbaz*³⁴⁶

*Heçku laşê te ji polayê ye*³⁴⁷

*Wekî çiqle*³⁴⁸

*Şivanê Yezdani*³⁴⁹

*Mêvanê Yezdani*³⁵⁰

*Jina Yezdani*³⁵¹

*Şivanê berazan ê Yezdani*³⁵²

*Telemakhosê hêzdar ê Yezdani*³⁵³

*Berbangâ Yezdani*³⁵⁴

*Mîna mîrekê*³⁵⁵

Akhayên Yezdani

³⁴² h.b.b.r.39.

³⁴³ h.b.b.r.40.

³⁴⁴ h.b.b.r.46.

³⁴⁵ h.b.b.r.188.

³⁴⁶ h.b.b.r.200.

³⁴⁷ h.b.b.r.214.

³⁴⁸ h.b.b.r.228.

³⁴⁹ h.b.b.r.236.

³⁵⁰ h.b.b.r.248.

³⁵¹ h.b.b.r.256.

³⁵² h.b.b.r.285.

³⁵³ h.b.b.r.309.

³⁵⁴ h.b.b.r.322.

³⁵⁵ h.b.b.r.324.

1.4.3. Di Destanê Da Hin Taybetmendîyên Din

Şîret ango nesîhet. Ev peyv di her warê qadên jîyana me de derdikeve li pêşberî me. Ev peyv ji ber ku peyveke elastîke ye lewma hewcedarîya wê pênaseyeke berfireh tine. Mirov ji serborîyên xwe yên heyî dikare ji kesên bêtecrûbe re û kesên nekamil re ew tiştên ku hatine serî wî, bi girêdayî hin gotinên rênîşandêr, dikare veguhêze. Bêguman di vê destana qerase de jî wekî her destanan bi têra xwe pend û şîret cîyê xwe digrin. Di destanê de şîret pir derbaz dibin. Şîretên ku heyî carna j'aliyê Yezdanan va carna jî j'aliyê mirovan va tene gotinê. Şîretên ku derbaz dibin him lehengan ji tengasîyan xilas dikin him jî rêyekê li hember wan vedikin. Em niha bi hin mînakên re şîretên heyî bidin û li ser wan nirxandinên xwe bikin.

Di destpêka destanê da Athene ji bo ku serlehengê navdar Odysseus vegere welatê xwe di nava liv û tevgeran de ye. Ew piştî ku Yezdanên Olymposê bo vegeerîna Odysseus ya welatê xwe qanîh dike, demildest diçe li cem lawikê Odysseus, Telemakhosî. Li wir piştî hin axaftinan ji wî re wiha dibêje:

*Ji dil şîretek min heye bo te, heke tu guh bidî min,
bîst bêrikkêşan li keştîyê siwar bike,
lê bila bibe keştîyeka raxistî û xemilandî
here lê bipirse mirovê ji dûrî welatê xwe, bavê xwe,
belkî ji fanîyekî xeberek bê ji te ra,
belkî jî tu ji gotegotekê ji Zeus hatî, guh lê bibî,
gotegot navdarîyê berbelav dike ji devekî bo deveke din, bo derên dûr.³⁵⁶*

Ji ber ku Athene di destanê da him arîkarê Odysseus e û him jî arîkarê kesên ji Odysseus re dost û heval in, lewma arîkarê hertim dide wan. Arîkarîya Atheneyê bêtir bi şîretan pêk tê. Telemakhos kesekî kêmtocrûbe û temenpiçûk e lewma hewcedarîya wî bi rênîşandarekê/î re heye. Athene ji bo vegeerîna Odysseus û navdarîya Telemakhos rêyekê datîne li ber Telemakhos û şîretan lê dike da ku ew bikeve dû bavê xwe û xwe jî ji vê tengasîya ku j'aliyê xwazgînîyan ve pêk hatiye, xilas bike. Jixwe piştî van şîretên Atheneyê Telemakhos dikeve li ser şopajotina bavê xwe.

Odysseus piştî ji destê Kalypso rizgar dibe berê xwe ji bo vegeerîna dide welatê xwe. Di vegeerîna de pêşîyê rêya wî dikeve welatê Phaiakê. Li wir bi arîkarîya dotmîr Nausikkayê berê xwe dide koşka Alkinoosî. Dema ku digihije nava Phaiakê, Pallas Athene bi awayekî şiklguherî tê beramberî Odysseus û rê nîşanî wî dide da ku bigihije koşka Alkinoos. Dema ku Odysseusî tîne ber koşkê ji wî re wiha şîretan dike:

*Va ye ew mala ku te digot nîşanî min bide, mêvano,
Mîrên ku Zeus xwedîkirine li hundir di şahîyê da ne,*

³⁵⁶ h.b.b.r.11-12.

haydê bêyî fedî têkeve hundir,
mirov lazim e ji serktina karekî bêtirs be,
heke ku ew mirov ji derve hatibe.
Bi ketina koşkê re rasterast here li cem keybanûyê:
Navê wê Arete ye, ew xwe jî dilpak e,³⁵⁷

Athene hertim bi şîretdayîn tê pêşberî me. Vê carê jî ji bo ku Odysseus têkeve koşkê him rê nîşanî wî dide him jî pendên giranbiha dide wî da ku ew xwe xerîb hîs neke û zûtir bigihije mebesta xwe. Odysseus jî pendên Atheneyê dihundirîne û li gor rênîşandanê wê bi rê ve diçe.

Odysseus dema ku li welatê Phaiakê ye li wir ji bo wî şahî têne lidarxistinê. Di şahîyan de lîstik têne lîstinê. Li wir kesekî bi navê Euryalos tê li himber Odysseus û zimandirêjîyê li wî dike. Odysseus li hember vî zimandirêjîya wî wiha jê re dibêje:

Ya ku ji devê te derdikve tu nabihîzî xorto,
aqilê te li ser kumê te ketiye.
Yezdan ji insanan re nade hemû tiştên delal, tiştên qenc,
bejn û bal û hiş û zarxweşî hemû li cem kesekî peyda nabe.
Yezdan ji hin kesan ra bedewî nedaye lê
te hew nêrî bi axaftinekê re, hemû çav li ser zîq dibin,
bi gotinzanîya xwe, xwe li xelkê dide hezkirinê,
dê li wî binerin mîna Yezdanekî li her cihê ku jê derbaz dibe.
Hin kes jî ji layê delalîyê va dişibin Yezdanan lê,
axaftinek wî heye, xirab û xirab.
Tu jî wesa yî, mîna Yezdanekî qeşeng,
ji layê aqil va jî, hêjar û belengaz.³⁵⁸

Odysseus li himber bêhurmetîya vî xortî berteka xwe tîne ziman lê belê di nava berteknîşandana wî de herwiha gotinên şîretwarî jî hene. Çavkanîya şîretên wî bêguman jîyana wî û serborîyên wî ne. Odysseus ji ber ku bi salan e di nava sefereke dûrûdirêj de ye lewma jî bi têra xwe xudantecrûbe ye. Ew li himber kesekî temenpiçûk bi pêkanîna tecrûbeya xwe re bersiveke binecih dide wî kesî.

³⁵⁷ h.b.b.r.115.

³⁵⁸ h.b.b.r.130-131.

Odysseus dema ku ji bo rizgarkirina hevrêyên xwe ji destê Kirkeyê berê xwe dide koşka wê, Yezdan Hermeias tê pêşberî wî û şîretên wiha lê dike:

*Kirke dema ku bi şivka xwe ya dirêj ra li te bide,
tu jî demildest bikşîne şûrê xwe ji ber xwe ve,
mîna xwastina mirina wê êrîş bibe li ser Kirkeyê.
Dê ziravê wê bizde, dê bixwaze te bibe li ser nivînên xwe,
nebe ku tu qebûl nekî, kêm nebîne çûyîna li ser nivînên Yezdanê,
dê li te baş bête nihêrîne, dê hevrêyên te jî rizgar bibe,
lê bila pêşîyê sonda mezin a dilşadan bixwe, bide zorê wê,
bila sond bixwe ku careke din li xirabîya te negere,
bêpar neke te ji hêza te û ji zilamtîya te,
dema ku tu şilf û tazî bî, ripûrût.³⁵⁹*

Yezdan Hermeias bi rênîşandan û şîretên xwe yên li jor him dibe sedem ku Odysseus ji mirinê, ji belayeka mezin rizgar bibe him jî dibe sedem ku hevrêyên Odysseus ji berazbûnê xilas bibin. Bi rênîşandêrîya Hermeias re Odysseus digihije miraza dilê xwe û ji belayeka mezin rizgar dibe.

Odysseus piştî mêvandarîyeka dirêj a ligel Kirkeyê dixwaze vegere bo welêt. Kirke jî li hember vê yekê rêzê ji wî re nîşan dide. Ji ber ku Odysseus ji bo zanîna qedera xwe dê berê xwe bide warê mirîyan lewma Kirke wî wiha tembî dike:

*Lê belê dema ku tu ji Okeanosê bi keştîya xwe re derbaz bî,
Li wir Qeraxa Nizim heye û rêla Persephoneyê,
tê sipîndarên bilind bibînî, bîyên hişk,
li qeraxa kûr a gêrav a Okeanosê keştîya xwe bikşîne bejahîyê,
piştî derkeve rê, ber bi avzêyên Hadesê,
li wir bo Akheronê Pyriphlegeton û Kokyotos diherike,
çemên ku ji Styksê jî tèn diherikine li wir.
Di pevgihana van her du rûbaran de zinarek heye,
wiha li nêzî wir be egîdo, gotina min bike:*

³⁵⁹ h.b.b.r.174.

li wir çalekê vede dirêjahî û firehîya wê arşinek
 li ser çalê ji hemî mirîyan re qurbanekê serjê bike,
 pêşiyê bi şîrê hingîv, piştra bi meya şêrîn, piştra bi avê,
 piştra jî li ser çalê arê sipî wer ke,
 di layekê da jî ji bo serê mirîyan yên bêhêz bikeve lavelavan,
 soz bide bo qurbanîdayînê çawa ku tu vegerî Ithakeyê
 çêlên sitewr ê herî baş di koşka xwe de,
 digel dîyarîyên herî baş xemilandî li ser lodeke êzingan.
 Herwiha tenê ji Teiresias re boraqa beranekî bide,
 beranekî ripîreş, di nav kerîyên te de yê herî ber bi çav, yê herî dilkêş.
 Dema ku bi boraqdayînan re tu bikevî lavelava dûndeya navdar a mirîyan,
 herwiha beranekî bike qurban û mihekî ripîreş jî,
 serên wan zivirîne bo Akheronê û wesa serjê bike,
 lê tu zivirîne serê xwe, li çemê ku diherike binêre,
 çaralîyên te dê çawa di carekê da bi gîyanê mirîyan tije bibe.
 Piştra li hevrêyên xwe vegere, wan bi cesaret bike,
 bila hilgirin ajalên ku bi şûrên bêinsaf hatine serjêkirinê,
 bila çermên wan rûçikînin û zaf baş bişewitînin,
 bila di nabeynê de ji Yezdanan jî ra bikevin lavelavan
 bila ji Hadesê xudanhêz re bikevin lavelavan û ji Persephoneya sawdar re.
 Tu jî li wir rûnê lê şûrê xwe yê tûj li ber pişta xwe derêxe,
 heta ku Teiresias li te vegere
 serê mirîyan ê bêhêz nêzî xwîne neke.
 Ha di wê demê da ey rêvebirê mêrxasan, dê hingê bê zana
 û dê ji te ra bêje rêya ku tu dê biçî, rêya ku dê çiqas bikêşe
 û dê rêya ku deryaya bi masî de çawa biçîyê, ber bi axa kalan ve.³⁶⁰

³⁶⁰ h.b.b.r.181-182.

Kirke bi van gotinanên xwe re rêyekê dide ber Odysseus ku di wê rêyê da hem şîret hene hem rênîşanî hene hem jî çarenûs û xilasîya Odysseus heye. Kirke bi van rênîşandanên xwe yên têr bişîret dike ku Odysseusî jig elek xetereyên heyî rizgar dike. Odysseus wekî gotinên rênîşandara xwe dike û ber xwe dide warê mirîyan. Di çûyîna xwe de li gor tembiyên Kirkeyê tevdigere. Wê çî gotibe heman tiştî dike. Odysseus piştî ku çarenûsa xwe bi rêya şîretdayînan Kirkeyê fêr dibe, li wir yanî warê mirîyan de Teresias jî şîretan li wî dike. Ew êdî qedera xwe baş dize û vedigere cardin li ba Kirkeyê.

Kirke piştî vegera Odysseus bi dû û dirêj jê ra tiştên ku dê bêne serî wî, xetereyên li pêşîya wî digel şîret û rênîşandayînan ji wî ra dibêje. Ew hertim şîretên heyî û rênîşandanan ciddî digre û li gor wan tevdigere. Jixwe dema ku Odysseus vedigere welatê xwe dizane ku ew bi şîretan gihaştîye welatê xwe, bi taybetî jî bi şîretên Atheneyê ew vegeryaye welêt. Lewma vê yekê bibîr tîne Odysseus û ji lawikê xwe Telemakhos re wiha dibêje:

*ez jî niha bi şîretên Atheneyê hatime vira*³⁶¹

Di vê destana qerase de mirov dikare bi rehetî bibêje ku, ev destan di heman demê da destaneka dîdaktîk e. Di destanê da her wekî me li jor jî mînakên wê dan bi têra xwe şîret, pend û tiştên elimînê tê da cîyê xwe digrin. Ji bilî van mînakên li ser şîretan dayîn bêguman ji wan zêdetir şîret û tiştên dîdaktîkî hene. Ji ber ku zêdemînakdayîn dê sînorên tezê û armanca wê berfirehtir bike lewma bi ya me, dayîna evqas mînakan têra xwe heye.

Di destanê da gotinên xweş, edebî, wecîze, gotinên qalibî (gotinên dubare û hwd zaf diborin. Ji ber ku ev destana qerase destaneka pirhêl e lema jî mirov dikare di gellek alîyan de nirxandin û hilsengandinên xwe li ser bike. Em ê jî niha bi mînakdayîn li ser wan rawestin.

Bêguman di her berhemeke edebî da lazim e berhem di xwe de edebîtîyekê jî – heta astekê be jî- biparêze û bihundirîne. Edebîtî an jî gotinxweşî asta berhema heyî bilind dike. Wê berheme xwîrt dike û jirêzebûnê xilas dike. Di vê berhema me ya qerase de jî bi têra xwe edebîtî û gotinxweşî cîyê xwe digrin.

Di destanê da cîyên ku edebîtîyê û gotinxweşîyê di xwe da dihundirînin, bi hin mînakan ger em destnîşan bikin wiha ne:

*Dema hate dîtin ku berbanga tilî bigul a zûdem hilhatê*³⁶²

*Bi gotinên baskdar gazî wî kir, jê re got ku*³⁶³

Roj ji nava deryaçeya sipehî derket

di asîmana rengtuncboyaxkirî de ronî veda ji nemiran re

*li ser axa biadan ji mirîyan re ronî veda*³⁶⁴

³⁶¹ h.b.b.r.278.

³⁶² h.b.b.r.19.

³⁶³ h.b.b.r.28.

³⁶⁴ h.b.b.r.35.

Şêrê ku li serê çîyan mezin bûye û hêza xwe bawer e
di bin baranê, bahozê de çawa ku rêve biçê,
her du çavên wî mîna du pêtan bisojin,
ji bo ku ji hewşîyên herî tenha de birevîne kerîyan,
amade ye ji gamêşan re, ji mihan re êrîşê bibe,
amade ye êrîşê bibe pezkovîyan,
zikê birçî fermandayê, ji bo vê,
wesa bi rêve diçû Odysseus ber bi keçikên kezihûnadî ve.³⁶⁵
çimkî te bi gotinên xwe re dilê min veda³⁶⁶
di bin mijûlangên wî de wer dibûn rondikên jandar³⁶⁷
Wê demê hatin, hem jî zaf hatin,
mîna bişkivîna pelganên biharê, mîna kulîlkan³⁶⁸
tu bi xêr hatî Telemakhos, ronahîya şêrîna her du çavên min³⁶⁹
laşê wê diheliya, mîna berfa ku li ser lûtkeyên çîyan diheliya³⁷⁰
dengbêjek tembûrzan çawa ku
ji rûvîyên mîyê yên tewandî tèleka nipînû
bi hêsanî vezilîne û li her du alîyên tembûrê pê bigre,
Odysseus jî heman wisa veziland kevana mezin, qet zehmetî nekişand³⁷¹

Ji beytên li jor jî dîyar e ku di destana me da gotinên xweş, edebî û lihevhatî carna di nava şayesandinan de carn jî di nava şibandinên xweşik de têne li pêşberî me. Di nava destanê de bi têra ev gotinên xweş û edebî cî digrin ku ev mînakên me dayî jî çend ji wan bûn.

Wecîze gotinên zêde ne dirêj û gotinên têrwate ne. Wecîze bêguman piştî encamdana serpêhatîyekê pêk tê. Ji ber ku di xwe de tecrûbeyan dihewîne lewma jî tê da kêma zêde şîret jî hene. Wecîzeyên ku di destanê de diborin wiha ne:

gotegot navdarîyê dibe ji devekî bo deveke din, ji derên dûr re³⁷²

³⁶⁵ h.b.b.r.106.

³⁶⁶ h.b.b.r.131.

³⁶⁷ h.b.b.r.143.

³⁶⁸ h.b.b.r.146.

³⁶⁹ h.b.b.r.272.

³⁷⁰ h.b.b.r.327.

³⁷¹ h.b.b.r.367.

divê keçîkek rê nede li ber gotegotan³⁷³
di serê piranîya xortan de aqil peyda nabe³⁷⁴
Em benîademên li ser rûzemînê
em li hember hêrsbûnê zaf lawaz in³⁷⁵
Ti caran ji ber tiştên xirab ne li hêvîya qencîyê be
kesê sivik dê bigehe kesê giran³⁷⁶
ti der mîna mala dê û bavan germtir nîne
mirov li axa herî zengîn a koşka xelkê bijût jî
cardin bi dûr ve mirov bîra mala bavê xwe dike³⁷⁷
çimkî hesin mirovî ber bi xwe ve dikîşîne³⁷⁸
qencî gellek ji xirabîyê rasertir e³⁷⁹

Di destanê da hin gotin an jî qalib hene ku xwe di piranîya destanê da dubare dîkin. Bi qasî ku me tesbît kirî ev gotinên qalib ku zaf cih digrin wiha ne:

Dema hate dîtin ku berbanga tilî bigul a zûdem hilhatê³⁸⁰
gotinên baskdar³⁸¹
bêbask man gotin³⁸²

1.5. Di Destanê Da Nirxên Çandî

Destan li ser nirxên giring ên nirxên çandî pêk dihên, di van nirxên çandî da bêguman aîdiyeteke neteweyî xwe diparêze. Di vê destana me da jî bêguman zaf nirxên çandî ên yewnan cih digire. Em ê di bin vê sernavê da li ser mêvanperwerî, qurbandayîn (borak), tradîsyon û bawerîyê rawestin.

1.5.1. Di Destanê Da Mêvanperwerî

Di destanê da yek ji nirxên ku ber bi çav e û bala mirovî dikîşîne bêguman mêvanperwerî ye. Li cem her miletekî qedîm bêguman mêvanperwerî û mêvanhezîyek heye. Ji ber ku destan yek ji nasnameya miletekî ye lewma jî em di wan de kêr zêde nirxdayînên

³⁷² h.b.b.r.12.

³⁷³ h.b.b.r.111.

³⁷⁴ h.b.b.r.122.

³⁷⁵ h.b.b.r.123.

³⁷⁶ h.b.b.r.136.

³⁷⁷ h.b.b.r.146.

³⁷⁸ h.b.b.r.280.

³⁷⁹ h.b.b.r.380.

³⁸⁰ h.b.b.r.19.

³⁸¹ h.b.b.r.71.

³⁸² h.b.b.r.322.

miletan û çanda wan dibînin. Her miletek li gor bawerî û ritûelên xwe nêzîkbûnek heye bo mêvanan an jî mêvanên xwe. Li ser mêvanperwerîyê him zaf tişt hatine gotin him jî zaf tişt hatine nivîsandinê. Mêvanperwerî, nîrxekî girîng e ku têkilîya di navbera însanan de baştir dike. Însan dibin mêvanên hev, bi hev re radibin û rûdinên û wextên xweş derbaz dikin. Ev jî dibê wesîle ku munasebeta di navbera wan de xweştir bibe. Bi vî rengî têkilîyên di nav civakê de jî xwirttir dibin. Ji ber vê hindê gelek muhîm e ku em xwedî li vê nîrxê derkevin û wê bigihînin nîfşên nû.³⁸³

Di vê destana qerase de jî em rastî mêvanperwerîyeka tekûz û bêhempa tîn. Hê di rûpelên di destpêkê de em li rastî mêvanperwerîyekê an jî li rastî nîrxdayîna li ser mêvanperwerîyê tîn. Dema ku Athene bi şiklê fanîyekî de tê koşka Odysseus, Telemakhos dema wê di nava hewşê de dibîne wiha jê ra dibêje:

Silav ji te ra mêvanê, tu bi xêr hatî li mala me,

Paşê bêje tu çima hatî, pêşîyê xwarinê bixwe.

Wiha got û rê nîşan da, Athene jî bi dûre ket hundir.³⁸⁴

Hê di destpêka destanê de em li rastî pêşwazîkirineka bêhempa ya li hemberî mêvanê tîn. Telemakhos bêyî sedemê hatina mêvana xwe an jî pîrskirina navê wê û tiştinên din bike, pêşîyê bi gotinên xweş pêşwazîyê li mêvana xwe dike. Telemakhos mêvandarîya xwe bi van gotinên xwe re nahêle di berdewamîya van gotinên xwe de, êdî dor hatîye li ser îkram an jî qedirgirtina ji mêvanê re:

Av li destan kir xidamê ji mesîneke zêrîn a sipehî de,

li ser menceleke zîv de destên xwe şûştin,

cardin wê xidamê maseyeke sîqalkirî danî li ber wan,

xanima şehne a rûmetbilind nan danî li ber wan,

piştra zaf û zaf xwarin anî.

Sifrevanî jî lalîk dana li ber wan,

lalîk cure bi cure goştan tije bû,

taskên zêrîn dana li ber lalîkan,

bi hat û çûn, xulamê tas tijîkirin bi meyê re.³⁸⁵

Telemakhos qedrê dide mêvana xwe. Ew berîya ku mêvana xwe nas bike an jî pîrsekê li wê bike, wê dibê mala xwe. Her cure xizmetê ji bo wê dide kirinê. Yanî wekê ku ew mêvan

³⁸³ Akbalik, H, Değerler Eğitimi Bağlamında Hacı Bektâş-ı Veli'nin Eserlerinde Yer Alan Eğitsel Unsurlar, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî ya Zanîngeha Atatürk ya Enstîtûya Pedagojîyê, Erzurum 2015, r. 115.

³⁸⁴ h.b.b.r.7.

³⁸⁵ h.b.b.r.7.

kesekî ne ji rêzê be, kesekî nas an jî dostek wî be, wesa li wê dinere. Em ji van beytên li jorê bi rehetî dibînin ku qîmetdayîn û nirxdayînek bo mêvanan heye.

Dema Telemakhos li ser şopa bavê xwe ye, pêşîyê berê xwe dide Pylosê ji bo ku bipirse ka hevalê bavê wî, Nestor çi xeber heye li ser heye. Dema ku diçine wê derê dîmenek wiha tê li himber me:

*Dema ku bîyanî dîtin hemûyan pevra ber bi van ve baz da,
bi destên xwe silav dane wan û keremkirin bo rûniştinê.
Peisistratosê kurê Nestor pêşîya hate li ba wan,
girt destê her duyan jî û ew daxilî şahîyê kirin,
li ser kevilên raxistî yên nerm ên li ber qeraxê deryayê,
di navbeyna birayê xwe Thrasymedes û bavê xwe.
Ji bo wan ji pizûrê parek cuda kir,
mey dagirte pîyaleyka zêrîn³⁸⁶*

Xelkê Pylosê dema ku mêvanan dibînin, tavil dest bi hurmetnîşandanekê li hember wan dikin. Yê kut ê pêşwazîya mêvanan ne keseke ji rêzê ye, ew kurê mîr e ango Peisistratos e. Ew qedirnîşandana ji mêvanê xwe re baş didin nîşandanê. Bi destê mêvanê xwe digrin û wî dibîne li cem mîr û mîrzayan didine rûniştandinê. Ev yek rêzgirtin û nirxaniya li hember mêvanan nîşan dide. Ti pirsan li mêvanên xwe nakin heta ku kêfa şahîya xwe tînine cî. Piştra em dibînin nêrîta xwe ya li hember mêvanên xwe wiha di nava suhbetekê de derxine li pêşberî me:

*Piştî tamgirtina ji şahîyê tê pirsîn
ji mêvanan, ka ew kî ne.³⁸⁷*

Hema bêje di tevahîya destanê de ev nerît an jî kevneşopîya bo mêvandarîyê heye. Ew ti caran ji mêvanan pêşîyê napirsin ka ew kî ne û çima hatine. Hertim pirs û سوالên xwe piştî ezimandinan wan dikin. Li vir de jî heman tişt xwîya ye.

Telemakhos piştî Pylosê berê xwe dide ber bi Mîr Menelaosî ve. Dema ku yek ji xulamên Menelaos dibîne ku mêvan ber bi wan ve tê bi awayekî nezane ji Menelaos re dibêje ez wan peya bikim an jî berê wan bidim cîyeke din. Lê li hember van gotin wî kesî Menelaos wiha lê vedigerîne:

*Tu berê wiha cahil nebû kurê Boethos,
tu çima wiha gotinên wiha zarokane dikî,*

³⁸⁶ h.b.b.r.36.

³⁸⁷ h.b.b.r.37.

*ez û tu, heta ku em hatine vira,
ma qey em nebûn mêvan, ma me nane xelkê qet nexwar?
Bi dilê Zeus be ku xilas bûyîbe zehmetiyên me!
Here hespên wan tewil bike,
wan bîne, bila li vir bibine mêvan.³⁸⁸*

Menelaosê mêvanhez di serê ewil de li hember vê nezanîya xulamê xwe şaş dimîne li hember wî bertekekê nîşan dide. Paşê li wî bîr tîne ku ew jî bûne mêvanê xelkê, wan jî nanê xelkê xwarîye. Ew li hember mêvanan kesekî qedirgir e û dixwaze kes bêne mala wî û ji wî re bibin mêvan. Jixwe piştî hatina Telemakhos û hevalên wî, Menelaos wan têr û pak dike. Hurmetê nîşanî wan dide.

Dema Odysseus bi arîkarîya Nausikaa berê xwe dide qonaxa mîrê Phaiakîyan li wir pêşiyê bi lavakarî berê xwe dide mîr û keybanûyê û arîkarîyê ji wan dixwaze. Piştî arîkarî û lavakarîyê diçe din ava xwelîya argûnê de rûdinê. Li hember vê yekê yek ji welatîyên Phaiakê li hember vê yekê bi hêrs dibe û wiha ji mîrê xwe re dibêje:

*Çênebû ev Alkinoos, bi kêr nayê ya b'rastî,
rûniştina mêvanî li erdî, di nava xwelîya argûnê de.
Em tev bêdeng man da ku tu biaxivî.
De rake, bide rûniştandinê mêvanî li ser textekî rûzîv,
bila meyê li hev xin, fermanê bide xulaman,
em qurban serjê kin ji Zeusê birûskavêj re,
ew e yê ku hevrêtiya lavekaran dike.
Bila serkara jinan jî li hundir xwarinan bide mêvanê me³⁸⁹*

Ji beytên li jor jî xwîya ye ku xelkê Phaiakayê mêvanperwer û mêvanhez in. Ew ji ber ku mîrê wan li hember Odysseus ango mêvanî xemsar tevdigere lewma bi rehetî mîrê xwe rexne dikin. Her çiqas mîr kesayetekî girîng û mezin be jî xelkê Phaiakê ji ber qedirnegirtin an jî terkexemîya mîrê xwe ew bi gotinên rexnewarî li wî bi bîr tînin ku divê ew him qedrê bide mêvanê xwe him jî wî baş bide ezimandinê.

Mêvanperwerîya Alkinoos û Phaiakîyan li hember Odysseus hertim di nava samîmîyet, xêrxwazî û qedirgirtinekê de didome. Alkinoos asta mêvanperwerîya xwe ya li hember mêvanê xwe digihîne astek wisa ku jê re wiha dibêje:

Mêvano, di sînga min de dilê min

³⁸⁸ h.b.b.r.54.
³⁸⁹ h.b.b.r.118.

nizane tiştê virtûvala, hêrsên bêwext,
ya rast difikirim ez, dipêvim û dinirxînim, hesêb dikim hemî tiştî,
xwezî Zeusê Mezin, Athene, Apollon bike nesîb
kesê wekî te difikire, mêrekî tovrind,
bixwaze keça min, ji min re bibe zava,
tu yê li vir bimaya, min ê xanîyek daba te,
herwiha min ê mal û milk bidîya te,
lê heke tu li vir bixwazî bimîni³⁹⁰

Di vir de em dibînin ku Alkinoos digel qedirgirtina bo mêvanê xwe herwiha asta mêvaperwerîya xwe berzîr dike. Ku mêvanperwerîyek wisa samîmî û ji dil heye ku xweyîyê malê dixwaze mêvanê wan li cem wan bimîne û hetta bi keça wan re jî bizewice. Alkinoos li hember mêvanê xwe hertim xudanhez e, wî baş diezimîne. Qedrê wî baş digre. Ji xwarin û vexwarina wî heta cihê raketina wî û tiştên bi vî rengî de, dixwaze ya herî baş ji mêvanê wî re be.

Hezkirina xelkê Phaiakê bo Odysseus hertim di nava astekî bala û qedirgirtineke ezamet de ye. Ew ji bo mêvanê xwe şahîyan li dar dixin. Ast bi ast mêvanhezî û mêvanperwerîya xwe bilindtir dikin. Di şahîyan de qedrê wî digrin. Di dema şahîya taybet a jî bo Odysseus de, Alkinoos radibe serê xwe û ji beşdarên malmezin ên ku hatine şahîyê ra wiha dibêje:

Rêberên Phaiakê, şewirmendên wê, guh bidin min,
mirovekî zaf jîr tê ji min ra mêvanê me,
haydê em li gor nerîtên xwe dîyarîyên mêvanîtyê bidinê,
di nava vî gelî de hûn diwazde mîrên xudandeng in,
hûn hemû bi serê xwe ne, azad in,
ku ez jî mîrê sêzda me di nav we de,
her yek ji we îşlikeke pajiq yê baş bidinê û xeftanekê jî
û kulînceyek pêşkêşî mêvanê me bikin ji zêrê herî nirxdar.
Zûka em dîyarîyan bînin û rêz bikine li vir,
bila wan bike destê xwe mêvanê me,
dilê wî rihet, bila bi dilxweşî biçê şahîyê.³⁹¹

³⁹⁰ h.b.b.r.123.

Mîrên Phaiakê gotina mîrê xwe yê mezin dikin û dîyarîyên xwe pêşkêşî mêvanê xwe dikin. Tabî li hember evqas xêrxwazî û samîmîyeta Phaiakîyan Odysseus jî êdî naxwaze navê xwe û serpêhatîyên ku hatine serê wî veşêre û hemû tiştên ku di xerîbîyê de hatine serê wî ji xelkê Phaiakîyan ra vedibêje.

Di serpêhatîyên Odysseus de dema ew dibe mêvanê Kirkeyê Kirke jî qedrê wî baş digre. Lê tabî divê mirov vê bîne li ber çavan ku pêşîyê Kirke dixwast Odysseus û hevrêyên wî ji xwe re bike ajal û xulam. Piştî ku digel Odysseus pêk tîn êdî her cure arîkarîyê dide Odysseus. Mêvandarîyeke baş nîşanî wî û hevrêyên wî de. Kirke em dizanin ku yek ji wan kesayetan e (Ji ber ku di beşên din de li ser Kirke û arîkarîyên wî yên bo Odysseus hate rawestînê lewma me hewce nedît em bi berfirehî qala mêvanperwerîya wê ya bo Odysseus bikin.) ku bûye sedem Odysseus ji zaf xeterîyên dûr bimîne û bigihîje welatê xwe.

Odysseus piştî vegotina serpêhatîyên xwe ji xelkê Phaiakê re êdî dema wî ya çûyîne hatîye. Ew qencîyên Alkinoos, Arete û xelkê Phaiakê ji bîr nake û wefadarîya xwe bi van gotinan tîne zimên:

*Dilşad bî şabanîyê, hertim dilşad,
ta ku pîrejîn bî û heta ku bê serê te jî
mirina ku tê serê hemû mirovan.
Ez ji bo çûyîna welatê xwe dikevime rê,
di nav xweşîyê de bimîne digel zarokên xwe,
digel gelê xwe û digel şahê xwe di nav xweşîyê de bimîne.³⁹²*

Odysseus ji ber hinde arîkarî û xêrxwazîyên xelkê Phaiakê bê wefa namîne. Pesnê xwedîya malê dide, rêzdarîya xwe nîşanî wan dide. Piştî sipasguzarîya xwe berê xwe bi arîkarîya xelkê Phaiakê dide bo welatê xwe.

Piştî ku Odysseus digihîje welatê xwe Ithakeyê berê xwe dide çardaxa Eumaiosê şivan. Li wir li cem şivanî dimîne şivan qedrê wî digre û wiha jê re dibêje:

*Heke kesek ji te hejartir bê ber derîyê min mêvano,
nikarim neezimînim wî, dibe bê rêzdarî,
çimkî bîyanî û xwazok tev ji Zeus tîn
tu kêr didîyê jî lê tu xweş dikî ya dilê wan³⁹³*

Eumaiosê şivan çiqas ji destê wî tê qedrê mêvanê xwe digre. Di berdewamîya ezimandina mêvanê xwe de em dizanin ku ew her cure arîkarîyê dide mêvanê xwe. Lê li vir

³⁹¹ h.b.b.r.138.

³⁹² h.b.b.r.223.

³⁹³ h.b.b.r.237.

de tiştta ku bala mirovî dikişîne bêguman sedemê mêvanperwerîya wan e ku di gelek cîyê dastanê da jî tê beramberî me. Em ji van beytên li jor derdixin ku ew kesên bîyanî û xizan kesên ku ji Zeus hatîne, dihesibînin û li gor wê qedrê didenê. Heta di cîyek din a destanê de Eumaios wiha dibêje: *ditirsim ji Zeusê ku mêvanan diparêze.*³⁹⁴

Dema ku Odysseus li cem Eumaios e, Telemakhos jî ji xerîbîyê vedigere û yekser berê xwe dide li cem wan. Li wir bêyî ku bavê xwe nas bike, dilê wî bi mêvanê xizan ve dimîne. Dixwaze ew kesê ku xwe avêtîye bextê wan biparêze û lê xwedî derkeve. Lewma jî wiha dibêje:

*Madem hat, xwe avête bextê te vî bîyanîyî,
ez ê cilûbergên paqij bidemê, tirgalekê, xeftanekê,
şûrekê ku her du alîyên wê tûj in, ez ê li sandaleyên bikime pîyê wî de
û ez ê wî bişînim ew li ku derê bixwaze.
Lê heke tu bixwazî bila hewşê bimîne û wî biezimîne,
ez jî bişînim li vir cilûbergên wî,
çi lazim be ez bişînim, nanê wî, xwarina wî filan,
bila ji te re û ji hevalên te re êdî nebe zêdebarek.
Lê ez nikarim wî bibim û bikime nava xwazgînîyan de,
ji ber ku ew zaf sergermî ne, zaf şaqizî ne,
heke rabin û xirabîyekê jê ra bikin, ez ê pê biêşim.*³⁹⁵

Ji van beytên li jor jî dîyar e ku Telemakhos kesekî mêvanperwer û mêvanhez e. Ew ji bo kesê ku wek mêvan hatîye bi dilsozî gotinên xwe li hev tîne. Ew naxwaze kesê ku xwe avêtîye bextê wan destvala vegerîne. Lewra tiştên herî baş ên ku mêvanê xwe biezimîne, dihizire û li gor wê dixwaze tiştinan pêk bîne. Telemakhos li ser vê yekê pirhêl difikire. Ew naxwaze mêvanê hatî bibe malê tirsî wî ew e ku xwazgînî li hember mêvanê wî nexweşîyekê bikin û ew jî li hember vê yekê tiştê neke. Ji ber ku xwazgînî kesên dilxirab û neçê ne lema ihtimala her tiştê nexweş heye.

Di destanê de her çiqas hezkirin, rêzdarî û hurmet ji mêvanan re hebe jî carna nehezkirinek jî ji bo mêvanî peyda dibe. Odysseus dema ku dibe mêvanê Aiolos destpêkê de Aiolos her cure mêvandarîyê ji wî re dike û piştî jî bi awayekî derasayî dibe sedem ku ew nêzî warê xwe bibe. Piştî Odysseus ji ber hesûdîya hevrêyên xwe nikare bigihije welêt, cardin vedigere li ba Aiolos lê Aiolos vê carê bi awayekî hişk wiha lê vedigerîne:

Zû here ji vê giravê, zilamê rezil, bicehinime dê,

³⁹⁴ h.b.b.r.246.

³⁹⁵ h.b.b.r.273-274.

*Mêvankirina te jî, rêwîkirina te jî tu nebê ji min ra qedexe bû,
tu ber bi ne'leta Yezdanên dilşad ketîyî carekê,
madem ku nemiran tu ne'elet kirîne, ji vir bi cehnime!
Wiha got Aiolos, ez ji mala xwe qewirandim³⁹⁶*

Di destanê de mêvannehezî kêş jî be di çend cihan de tê beramberî me. Ji bilî Aiolos em dizanin ku Kyklop jî mêvanperwer nîne. Kyklop ji ber ku Odysseus û hevrêyên wî baş neezimand û mêvanperwerî ji wan re nekir, bela xwe ji Odysseus dibîne. Ew çavekî ku tenê heye jî winda dike û j'alîyê Odysseus ve tê korkirinê, ajalên wî jî Odysseus digel xwe dibe. Ji bilî Kyklop jî xwazgînî ne camêr in ne jî mêvanhez, ew jî ji alîyê Odysseus ve têne têk birinê.

Di destanê de bi gelemperî nirxdayînek ji mêvanan re heye. Kesên ku diçin dibin mêvan ji alîyê xwedîyê malan ve baş têne ezimandinê. Ji mêvanê hatî re her cure îkram têne dayîne. Mêvanê xwe xelat dikan, bi rêzdarî wî diezimînin. Ji bo rehetîya mêvan hemû tişt tête kirinê. Ji ber ku kesayetên di destanê de mêvanên heyî wekî mêvanên Zeus an jî kesên ji Zeus hatine dibînin. Lewma jî bi rêzdarî tevdigerin. Ji mêvanî tiştêkî naxwzin yan jî ne li benda dayîna tiştêkî mêvanî ne. Li hember vê yekê jî mêvan jî ti bêrezerdarîyan ji xwedîyê malê re nake, pesnê wî dide, nirxê dide wî. Bi giştî mirov dikare bibêje ku di destanê de mêvanperwerîya heyî di nava hevaltî, dostanî, xêrxwazî, wefa û rêzdarîyê de dewam dike.

1.5.2. Di Destanê Da Qurbandayîn (Boraqdayîn)

Di destanê de yek ji hêmanên ku balê dikşîne li ser xwe bêguman serjêkirina qurbanan (qurbandayîn) an jî boraqdayîn e. Dema mirov li tevahîya destanê dinêre ev mijar pirr tê pêşberî me. Lehengên ku di destanê de cî digrin, nirxeke mezin didine bawerîya xwe ya bo Yezdanên xwe. Ji ber wê jî him di xweşî him nexweşî û him jî berîya wan de qurbanan an jî boraqîyan didin ji Yezdanên xwe re. Mirov ji ber bawerîyên xwe bo dîne xwe her dem xwe hewceyî wê tiştê dîtîye ku qurbanan pêşkêşî Yezdanên xwe bikin. Sedemên bicîanîna qurbandayîne em dikarin di bin pênc xalan de berhev bikin:

1. Heyrantî: Mirovan ji ber hin curesedeman heyrantî bi hin tiştan (asîman, heyv, tav ajal h.w.d) kirîye. Ev hîsên xwe jî ji bo ew heyberên ku jê re heyranmane re, bi pêşkêşîya qurban re anîne zimên.

2. Şûkrandarî (sipasî): Mirovê ku karîye li dinyayê ji gelek nîmetên cur be cur îstîfade bike, ji bo Yezdan an jî Yezdanên ku fikirîye qencî bexşî wî kirine, bi pêşkêşkirina qurbanê re sipasîya xwe (şûkrana xwe) bi lêv kirîye. Ango qurbandayîne wekî amûrekî fikirîye.

3. Dilxweşkirin (dilkirîn): Di dînen prîmîtîv de, ji bo damirandina xezeba Yezdan/Yezdanan an jî ji bo ku ji sîcên ku pêk anîne xwe ji cezayên wan xilas bikin qurban pêşkêş kirine. Qurbandayîn wekî amûra dilxweşkirinê (dilkirîna) bi kar anîne.

4. Boraqdayîn: Mirovan xwastine/daxwaz kirine hin xwastekên wan ji layê Yezdan/Yezdanan ve werin pejrandinê. Piştî ku boraqa wan hatîye cî, li himber vê lûfta Yezdanî jê re qurban pêşkêş kirine.

5. Kefaret: Mirovan ji ber xirabîyên ku kirine û li himber kiryarên xwe yên tawanbarîyê qurban pêşkêşî Yezdanan kirine.³⁹⁷

Em ê niha li gor van pîvanan ew sahneyên ku di destanê da li ser qurbandayîne derbaz dibin, rawestin û li gor van kirîtkan hilsengandinên xwe bikin.

³⁹⁶ h.b.b.r.167.

³⁹⁷ b.n, Türk Mitolojisi'nde Kurban, r.16-28.

Di destanê de dema ku Telemakhos ketîye li pey şopa bavê xwe, em dibînin ku yekem rawistgeha wî Pylos e. Dema ku digihije li wir em xwe nava sahneyeka qurbandayîne ya ji Yezdan Poseidon ra dibînin. Xelkê Pylosê ji bo dilxweşkirina Yezdanê xwe jê ra qurbanê ser jê dikin. Ew sahne wiha ye:

*Qurban dihatine birîne li ber qeraxên behrê,
gayên ripîreş dihate pêşkêşkirin
ji bo Yezdanê ku erdî dilerizîne û bibijîyê wî lacîwerd e³⁹⁸*

Piştî Telemakhos û hevrêyên wî ji Nestor re dibin mêvan, ew pêşîyê zikê xwe baş têr dikin û di navê re jî Nestor dest bi serpêhatîyên xwe dike. Di nav wan serpêhatîyan de Nestor wiha dibêje:

*Ji bo ku em ji belayê bifilitin divê em bi demildest,
Divê me berê dûmena xwe bidîya Euboîyê ji deryayên bêbal û pal rasterast.
Nermabayekê dest bi wîzîne kir,
Keştîyan bi demildest deryaya têrmasî qelaştin,
Em bi şev gihane Lengergeha Geraistosê.
Şikir ku me rêyeka dirêj a behrê derbaz kiribû.
Me ji Poseidon re zaf hêtên gayî li wir şewitand.³⁹⁹*

Em ji van sahneyan tê derdixin ku Nestor di wextê zeman de ketîye li ber tengavîyeke mezin. Piştî ku ew û hevalên wî ji wê tengavî û belayê xilas bûne, ji bo Yezdanê xwe ango Poseidon qurban (ajal, ga) ser jê kirine. Li vir de em dibînin ku piştî gihane rihetîyê ji bo şûkdarîyê ango sipasîyê ji Yezdanê xwe re ji bo filitîna wan, ajalek kirine qurban. Mebesta wan bêguman bes sipasdarî ye.

Nestor di nava axaftinên xwe de bes cî nade serpêhatîyên xwe herwiha cî dide serencam an jî serpêhatîyên giring ên ku qewimîne jî. Em ji destanê tê derdixin ku yek ji şahên Yewnanistanê Agamennon dema ji Sefera Troyayê vedigere li welatê xwe ji alîyê jina xwe û hezkirîyê jina xwe ve tê kuştinê. Nestor jî gotinê dibe li ser serpêhatîya jina Agamennon û behsa wê û hezkirîyê wê Aigisthos dike. Aigisthos piştî jina Agamennon bi awayekê dixapîne û bi xwe re dibe, sahneyek wiha pêk tê:

*Zaf hêtên qurbanan şewitand li pêşkêşgehan de
cangên neqîşandî û zêr da wek boraq,*

³⁹⁸ h.b.b.r.35.

³⁹⁹ h.b.b.r.41.

*bi ser ketibû tiştê ku qe ne li hêvîyê bû.*⁴⁰⁰

Di van beytên li jor de cardin em li hember rîtûeleke dînî tên. Kesekî daxwazek kirîye ango boraqek daye û piştî ew boraqa wî yanî xwasteka wî hatîye cî, ku ew ne li benda pêkanîna vê tiştê bûye jî, ji bo vê yekê him qurban ser jê kirîye him jî zêr û tiştên giranbiha bo bicîanîna boraqa xwe daye. Em dikarin li gor kirîtikên ku me li jorê anîne ziman bi rehetî bibêjin ku li vir de hem xala boraqdayînê dikare bê dîtinê hem jî xala şûkrandarîyê. Ji ber ku him wî boraqa xwe daye û xwasteka wî hatîye cî him jî piştî ku daxwaza wî hatîye cî ji kêfxweşîyê û ji bo şûkranî an jî sipasîyê qurban ser jê kirine, cangên neqîşandî û zêr dane wek boraq.

Piştî rawestgeha Pylosê rawestgeheka din a Telemakhos Lakedaimon e. Telemakhos li wir dibe mêvanê Menelaos û Menelaos jî ji wî re qala serencam û serpêhatîyan dike. Di nav wan serpêhatîyan de ya ku me eleqedar dike ev e:

*Dema ku em gihane Çemê Aigypnos yê ji Yezdanan hati
min keştî dane rawestandîne û bi sedan qurban pêşkêş kirin
min bidawîanî ji xezeba heyî ya Yezdanan re*⁴⁰¹

Menelaos û hevrêyên wî piştî ku ji Şerê Troyayê vedigerin, zaf bela têne pêşberî wan. Menelaos dema ku ji wan belayên herî mezin xilas dibe, tê û qurbanan ser jê dike ji bo Yezdanan. Li vir de li gor kirîtikên me du tiştên sereke hene yek dayî kefareta wî ye. Ku wî ji ber ku bi çûyîna Şerê Troyayê re digel hevrêyên xwe talaneke mezin kirîye ku ev jî dibe tawan û xirabî lewra ji bo xilasîya vê tiştê divê kefaretekê bide. Ew jî kefareta xwe bi serjêkirina zaf ajalan dide. Herwiha ji bo ku ew Yezdanên xudanxezeb aram û hêmin bike yanî li gor kirîtikên me ji bo dilxweşkirin an jî dilkirîna Yezdanan jî ew qurbanan ser jê dike.

Di destanê de nirxdayîna bo qurbanê di asteka here bilind de mirov dikare bibîne û bixwîne. Di berdewamîya axaftina Menelaos de em dibînin ku Telemakhos dê êdî biçê, wextê çûyîna wî hatîye. Menelaos dikare wî xelat bike û paşê bişîne. Axirî navên zaf xelatên ku dê bidîyê tê de derbaz dibe. Di berdewamîya sehneyê de tiştêk wiha tê beramberî me:

*herwiha ez ê piyaleyeka zaf delal jî bidim te,
ji bo ku tu berpêşîyan pêşkêşî Yezdanan biki*⁴⁰²

Di vê sahneyê de em asta nirxdayîna wan a bo qurbandayîna ji Yezdanan re, gihaye çî astê dibînin. Ew zaf ji Yezdanên xwe bibawer in ji wan ditirsin û timî dixwazin di rêya wan de yan qurbanan bidin yan jî ji bo qurbandayîn kesinan teşwîq bikin. Xulase mirov dikare bibêje ku yek ji sedemên xelatdayîna wan ew e ku kesin ji Yezdanan re qurbanan ser jê bikin.

⁴⁰⁰ h.b.b.r.44.

⁴⁰¹ h.b.b.r.72.

⁴⁰² h.b.b.r.73.

Odysseus dema ku dibe mêvanê Alkinoos, em lê rastên ku Alkinoos gellek caran qurban û berpêşan pêşkêşî Yezdanan dike. Ku yek ji wan sahneyên ku qurbanan ser jê dike ewha ye:

*Di mehzenan de şereban li hev bixe Pontoos,
ji me hemîyan re li vir belav ke, em berpêşîyan pêşkêşî Zeus bikin,
ew e yê ku hevrêtyê bi lavakaran dike⁴⁰³*

Ji van beytan li jor jî dîyar e ku cardin qurbandayînek an jî berpêşîyek ji Yezdanan re tê kirinê. Di van beytan de em li gor kirîtîkên ku me li jor dîyar kirine, lê binerin, em dikarin bibêjin ku li vir de hem heyrantîya ji Yezdan Zeus re heye hem jî şûkrandarîyek ji wî re heye. Ji ber ku Alkinoos Yezdan Zeusî him wek hevrêyekî lavakaran dibîne û jê re dibe heyran û him jî ji ber hebûna wî berpêşîyan pêşkêşî wî dike.

Bêguman di destanê de sahneya ku herî zêde balê dikşîne li ser xwe, sahneya ku Odysseus diçe warê mirîyan e. Em li wir de arasteyî sahneyeka derasayî û balkêş tên. Odysseus ji bo zanîna qedera xwe bi arîkarîya Kirke diçe warê mirîyan lê berîya ku biçe li wir divê qurbanekê bide berpêş. Ku ew sahneya tekûz wiha ye:

*Li wir qurban ji alîyê Perimedes û Eurylokhos ve hatine girtinê,
min jî li ber xwe kêşa şûrê xwe yê tûj
û min çalek kola, fîrehî û dirêjahîya wê arşinek,
min li ser çalê ji hemû mirîyan re berpêş pêşkêş kir,
piştî jî min li ser çalê arê sipî wer kir.
Layê din min ji bo serê mirîyan yê bêhêz pîrr lavayî kirin,
min soz da ku dema ez vegerim Ithakeyê ez ê qurban bidim
çêlekên sitewr yên herî baş di qonaxa xwe de,
digel xelatên herî delal ên berhevkirî, li ser komek êzingan de.
Herwiha min soza boraqdayîna beranekê da bes ji bo Teiresias,
beranek ripîreş, di nava kevîyên min de yê herî liberçav, yê herî dilrakêş.
Piştî ku min li ser ruhê mirîyan ê binavûdeng bi lavekarî boraq dan,
min pez girtin, li ser çalê ser jê kirin,
xwîna wan herikî, bêhna ripîreş girt her der û gîyan piçikîn⁴⁰⁴*

⁴⁰³ h.b.b.r.119.

⁴⁰⁴ h.b.b.r.186.

Di sahneya ezamet û balkêş de ger mirov balkêşî û derasayîtiya wê danête alîyekê û tenê li ser alîyê ku me di vê binbeşê de eleqedar dike binêre, dê hilsenganinên wiha pêk werin. Me heta niha qurbanîdayîn an jî boraqdayînên xwe li gorî pêşkêşkirina ji bo Yezdanan da. Lê balkêş e ku di vê sahneya krîtîk de vê carê ji Yezdanan re qurban nayêne serjêkirinê û herwiha ji bo Yezdanan boraq nayên dayînê. Em dibînin ku vê carê qurban û boraq ji mirovên mirî re hatine danînê. Mirov piştî vê mînakê dikare sînore qurbandayîn û boraqdayînê berfirehtir bike û şîroveyê bibe li ser wê yekê ku digel Yezdanan herwiha ji bo mirovên mirî jî qurban têne serjêkirinê. Ev tişt ritûeleke balkêş û paganîst e bêguman. Ji ber ku di dînen heyî de bes qurban ji Yezdanan re ye ne ji bo kesên mirîne. Em piştî vê yekê dikarin bibêjin ku mirovên mirî jî bi qasî Yezdanan xwedîqîmet û pîrozahîyê ne.

1.5.3. Di Destanê Da Tradîsyon

Di jîyana rojane de peyva tradîsyonê zaf tê li hemberî mirovî. Ev peyv, peyveke pirhêl û dorhêlfireh e. Mirov dikare di tradîsyonê de çanda mîletî, nerîta mîletî, edet û toreyên mîletî bibîne. Jixwe tradîsyon ne karê demekê ye û di maweyeke kurt de pêk nehatiye. Ew ji nifşên berê bo nifşê nû maye ango tradîsyon veguhestine. Em ê niha di destanê de tiştên ku dikevîne bin vî sernavî bi mînakdayîn binirxînin û hilsengandinên xwe li ser bikin.

Di destanê de em dikarin li dû gelek rêçên toreyî, edetî, nerîti ango tradîsyonel bikevin. Di destanê de hêj di rûpelên serî de em li rastî gotineka Telemakhos tîn ku di wê gotinê de him tradîsyoneka vî mîletê destanê tê beramberî me him jî ew gotin mirov dikare tam di çarçoweya nerîteka nobranwarî û bavîksalarîyê binirxîne. Ku ew gotina Telemakhos ku ji dîya xwe re dibêje wiha ye:

*Axaftin karê mêran e, pêşîyê jî ji bo min,
tekane xwedîyê vê malê ez im.⁴⁰⁵*

Di destanê de dema Telemakhos û hevrêyên wî di koşka Menelaos in, axaftin û suhbet di nava wan de rû dide. Di wan axaftinan yekî de kurê Nestor ji Menelaos re wiha dibêje:

*qet ne şerm e ku hingê meriv bigrî
ji bo insanên ku serî li ber çarenûsa xwe danîne û mirine.
Em porê xwe diqusînin, bi girîn û zarîn em wan bi bîr tînin,
em deynê xwe yê dawîn didin mirîyên bêşens re.⁴⁰⁶*

Di van beytan de em li rast tradîsyoneka balkêş tîn ku di vê tradîsyonê de nerîteka piştî mirîyan hatiye kirinê, heye. Em dizanin ku li ba gellek mîletan piştî kesekî ciwan an jî hebandî por tê qusandinê. Ev tradîsyon belku îro deforme bûbe û ji holê rabûbe lê belê di van çavkanîyên berê de, ev nirxene hebûne û bi awayekî zelal hebûna xwe berdeyam kirine. Porqusandin li vir de jî ji ber kesekî ciwan hatiye kirinê ku ew kes kurê Nestor yê ciwan e. Piştî ku ew mirîye ji bo wî şîn hatiye girêdanê, por hatiye qusandinê û ji bo wî zaf rondik

⁴⁰⁵ h.b.b.r.14.

⁴⁰⁶ h.b.b.r.59.

hatine barandinê. Rondikbarandin jî her çiqas nîsbet bi bal jinan ve bê kişandinê jî lê li vir de kesê ku qala girî û zarînê kirîye û xwe jî daxilî vê kirîye, kesekî mêr e. Yanî girîn û porqusandina wî kesî wek tiştê normal hatîye dîtine ji bo mêran jî.

Di destanê de em li rastî hevokên kurt lê têrûtijî yên li ser tradîsyonên berê tîn. Dema ku Odysseus digel Nausikaa diştexile, Nausikaa qala tradîsyoneke wan an jî tradîsyoneke gerdûnî dike. Di wê tradîsyonê de em him hişmediya jinê dibînin û him jî sînoren ku wê ji xwe re diyar kirine, dibin. Ku ew hevoka tradîsyonî ya Nausikaa ya ji bo Odysseus gotîye wiha ye:

Lazim e keçek cî nede paşbêjîyekê (xeybkirin)⁴⁰⁷

Odysseus dema ku berê xwe dide koşka Alkinoos, Athene tê bi şiklê keçekê de rê li nîşanî wî dide. Piştî ku tene li ber derîyê koşkê Athene tê û dirêj qala kesayetên malbata Alkinoos dike. Bi taybetî jî qala Areteya jina Alkinoos dike. Di wan axaftinên qalkirinê de gotineke wiha ji bo Areteyê bi kar dibe:

Wê dikemijand hemû şerên mêran⁴⁰⁸

Di vê hevokê de em li rastî du tiştên sereke tîn ku yek ji wan ew e ku, nirxdayînek ji bo jinan heye. Nirxdayînan ji bo jinê karekî erênî û çak e. Herwiha di vir de em li rastî wê yekê tîn ku şerê welatîyên Phaiakê bi deste jinê jî tê kemijandinê. Ango ev tradîsyona ku bal bi civata dayîksalarî ve diçe tradîsyona rola şerrawestandin û guh lê dana jinê jî nîşanî me dide.

Di rêwîngîya Odysseus de rawestgeha wî ya dawî welatê Phaiakayan e. Li wir gellek qedr û qîmet jê re tê dayînê û ew dibin sedem ku Odysseus ji van rêwîngîyên xwe yên dûr û dirêj kuta bike û hesreta xwe ya bo mala xwe bi dawî bike. Dema ku Odysseus li welatê Phaiakê ye li wir ji bo wî şahî tene lidarxistinê. Di wan şahîyê de Alkinoos dixwaze malmezinên Phaiakê û ew Odysseusî xelat bikin. Lema ji wan kesên malmezin ên ku hatine li wir re wiha dibêje:

Rêberên Phaiakayan, şewirmendên wê, guh bidin min,

wekî mirovekî zaf şerîn tê ji me ra mêvanê me

haydê em xelatên mêvantîyê li gor toreya xwe bidin wî⁴⁰⁹

Di destanê de herwekî me anîye ziman yek ji nirx û edeta herî li ber çavan e, bêguman mêvanperwerî ye. Di destanê de mirov dikare ji bo tradîsyona mêvanperwerî gellek tiştan bibêje û binivîse. Lê belê ji ber ku di beşa mêvanperwerîyê de em bi berfîhehî li ser vê yekê rawistîyan lewma hewce nake em cardin li ser bisekinin. Di van beytên li jor de jî em dibînin ku welatîyên Phaiakê ezimandina asta ji bo mêvanê xwe mestir dikin. Ew dixwazin xelatan bidin mêvanê xwe lê ne xelatên ji rêzê bêtir xelatên li gor toreya xwe. Ev şanî me dide ku ew

⁴⁰⁷ h.b.b.r.111.

⁴⁰⁸ h.b.b.r.115.

⁴⁰⁹ h.b.b.r.138.

ji mêvanperwerîyê bigre heta xelatkirina mêvanê xwe tekane krîtîka wan toreyên wan e. Ji ber ku xelkên di destanê de bi girêdayî adet û toreyên xwe ne û pêngavên xwe jî di vê çarçoweyê de davêjin.

Di destanê de dema ku Penelopeia digel Eurynomeyê di nava suhbetekê de ye, kodên nerîtên xwe an jî yên tradîsyona xwe wiha derbazî nava axaftina xwe dike:

*Niha tu Autooneyê û Hippodameiyê ji min re bişîne
bila bîn, bila ew jî digel min dakevine li ser sofreyê,
şerm dikim ez tenê herime di nava zilaman de⁴¹⁰*

Ji van beytên li jor jî dîyar e ku Penelopeia jineke şermoke ye. Ew naxwaze bi tena serê xwe bi awayeka serbest here di nava civata zilaman de. Ev yek şanî me dide ku civata Penelopeia civateka girtîye. Jin tenê nikare bi awayeka azadane here li cem mêran. Digel wan rûnê. Penelopeia di bin rengvedana edetên xwe de tevdigere.

Tolhildan, tolrakirin an jî heyfhilanîn. Di destanê de bi me yek ji edetên gelan tolhildana wan e. Ku ev yek ji zemanên berê bigre heta niha hebûna xwe bi awayekî zindî berdewam kirîye. Li cem hin miletan tolhildan tiştekî guneh û nerênî tê dîtinê û ev yek nayê qebûlkirinê. Belam li cem hin miletan jî ji ber ku di edetên wan de tolhildan heye lewma jî tiştek ji rêzê û bo hin caran jî mecburî tê dîtinê. Di destanê de jî ji ber ku tolhildan heye lewra nabe ku mirov li ser vê yekê baz bide.

Di destanê de dema ku Odysseus diçe ji bo arîkarîxwastin û mêvandarîyê li ba Kyklopî, ew digel ku daxwaza hevalên wî nayîne cî herwiha çend ji hevrêyên Odysseus dike û dixwe. Odysseus vê yekê qebûl nake, bi awayekî hişmendane tevdigere û tola hevrêyên xwe û êşkişadinên ku Kyklopî kirine, radike. Ev yek di tradîsyona li xelkê destanê de heye û heyfhilanîn tiştekî mecburî û lazim tê dîtinê. Herwiha dema em dibînin ku Odysseus tê mala xwe dibîne ku xwazgînî li mala wî hene. Wan xwazgînîyan ji ber ku kul û êşek giran dayne jina wî û mala wî lewma dest bi kuştina wan dike. Piştî kuştina hin jî ji wan xwazgînîyan re jî wiha dibêje:

*we çî fam kir kûçikno, ma ez ê cardin venegerîyama xanîyê xwe
ji bajarê Troyayîyan, xanîyê ku we rût û pût kirîye?
we çavsorî kir, hûn bi xidamên min ra raketin,
herwiha hûn ji jina min ra bûne xwazgînî hê ku ez sax,
hûn qet ji Yezdanên li jor netirsîyan,
rojek bê, ji we tol bê hilgirtin, we ev nefikîrî?
hûn ê niha tev bikevin xefka mirinê.⁴¹¹*

⁴¹⁰ h.b.b.r.312.

Ji van beytên li jor jî dîyar e ku tolhildan bi awayekî qewî li ber çavan e. Odysseus jixwe kesekî tolhildêr e. Ew ti caran ji tolhildanê xwe nade layekê. Li vir de jî ji ber ku bi salan xwazgînîyan mal û milkê wî xwarin û ji jina wî re bûne xwazgînî hê ku ew sax. Lewma tola xwe ji wan re nehişt û ew tev kuştin. Yanî li gor edet an jî tradîsyonê tevgerîya û ew kuştin.

1.5.4. Di Destanê Da Bawerî

Bawerî, bi wateya xwe ya ferhengî ‘‘ j’alîyê takekes an jî j’alîyê gel ve, qebûlkirina fikrînekê, dîyardeyekê, objeyekê û qebûlkirina rastîya heyberekê ye.⁴¹² Di bawerîyê de noqsanî nabe kesê ku bawer dike divê bawerîya wî tam û kamil be. Di destanê de jî ev yek li ber çavan e. Kesên ku di destanê de cî digrin, bawerîyeka wan ya paganîstî heye. Ew bawer bi Yezdanekê tenê nakin. Bawerîya wan li ser Yezdanên Yewnanî yên dewra antîk e. Em dizanin di wê dîn û bawerîyê de Diwazde Yezdan hene. Di nav wan diwazde heban de sereke Yezdan û bavê Yezdan û mirova Zeus e. Di destanê de zaf girîngî ji bo wî û ji bo Yezdanên din digrin.

Di destanê de yek ji wan dîyardeyên ku bawerîya bo Yezdanan nîşan dide ji bo Yezdanan serjêkirina qurbanan e. Herwekî me di beşa qurbandayînê de jî bi berfirehî mînakên qurbandayînê dan, di bawerîya wan de qurbandayîn rîtûelekî girîng e. Ew di xweşî û nexweşîyên xwe de û di wextên tengavîyan de hertim ji ber bawerîya xwe ya bo Yezdanan vê rîtûela xwe pêk tînin. Ji ber ku di beşa qurbandayînê de em bi berfirehî li ser vê mijarê rawestîyan loma cardin mînakdayîn dê bibe sebebê dubarebûnê lewra ne hewce ye em heman tiştan bidin û hilsengadinan li ser bikin.

Di destanê de em dizanin ku Odysseus çûbû warê mirîyan ji bo zanîna çarenûsa xwe. Heke em li gor vê yekê û wan sahneyan bifikirin em dikarin bibêjin ku çûyîna warê mirîyan ya Odysseus îspata û bawerîya dinya dîn e. Ango em dikarin bibêjin ku bawerîya kesên di destanê de bo bihişt û dogehê heye.

1.6. Di Destanê Da Tîpolojîya Jinê

Yek ji takekesên civakê jinên in, jin j’alîyê fitrat û fizîkî ve ji mêran cudatir in. Jin di her warê jîyanê de cî digrin. Ew carna dibe keseka rêber carna jî dibe keseka bindest carna jî di navbera her duyan de tê û diçe. Ev takekesa girîng wekî her warî di vê destanê de jî cîyê xwe girtîye. Em ê niha li gorî cîgirtina wê ya di destanê de bi girêdayî azmûngerîya xwe hilsengandinên xwe bikin.

Di destanê de di tîpolojîya jinê de ya ku herî zêde ber bi çav e, bêguman Penelopeia ye. Ji ber ku me di beşên din de li gor hin krîtîkên dîyarkirî bi berfirehî analîza wê kiribû lewma ne hewce ye em cardin bikevin heman dubareyan. Em niha tenê li ser hin alîyên wê yên ku di nava civakê de çawa cî digre, rawestin. Penelopeia ji ber ku mêrê wê bi salan e ji cem wê çûye û venegerîyaye lema zaf bargiran bûye. Ew piştî çûyîna mêrê xwe û hetta vegera mêrê wî tam 20 salan lazim e mala xwe û zewaca xwe ya heyî berdewam bike. Penelopeia jî heman tiştê dike. 20 salan mala xwe, zewaca xwe û lawikê xwe Telemakhos bi rê ve dibe. Ew

⁴¹¹ h.b.b.r.370.

⁴¹² Boratav, Pertev Naili, 100 Soruda Türk Folkloru, Weşanên Gerçek, Sal 1994, Sitenbol, r.7.

ji ber aqilmedîya xwe bi salan xwazgînîyên xwe yên heyî dixapîne, bi hinceta dûrîna kefenekê. Ew tenê bi xwazgînîyan re mijûl nîne herwiha mala xwe jî bi rê ve dibe. Ji ber ku kurê wî Telemakhos hêj kesekî kamil nîne lewra pirrî caran di mala wan de valahîyeke otorîterwarî pêk tê. Di beşa jor a li ser Penelopeiyê de jî me anîye ziman, ew vê otorîteya heyî digel şîretdayîna bo kurê xwe, ew bi xwe tîne cî. Ango rola keseka birêvebir de ye. Bi kurtasî em dikarin ji bo Penelopeiyê bibêjin ku ew di fikrên xwe de azad e, girêdayî mêrê xwe, valahîyên otorîteyî ew dadigire, keseka aqilmend e ku bi salan mala xwe bi rê ve dibe û di destanê de bi awayeka aktîv cî digre.

Yek ji tîpolojîya jin a din jî, Helene ye. Em ji Ilyadayê dizanin ku sedemê qewimîna şerê Troyayê Helene ango hezkirina qedexe ya di navbera jineka zewicî (Helene) û Parisî de bû sebeb ku şereke mezin were pê. Di nav van jinan de ya herî delal Helena, di nava Akhayên ku ji bo wê ketine pêşbazîyê de, hilbijartibû mêrê xwe; di serî de ji ber ku bi azadane hilbijartibû lewma di guherîna fikra xwe de azad bû. Di vê rewşê de yê ku li hember derdiket mêrê wê bû û Akhayan jî li ba wî cî girtin.⁴¹³ Em ji vê jêgirtinê tê derdixin ku Helene keseka azad e di pêkanîna fikr û raman û hilbijartinên xwe de. Ew herwiha dema mijara li ser çûyîna wê ya digel Parisî vedibe, xwe rexne dike ji ber çûyîna xwe û xwerexneya wê wiha ye:

Ez bûm sedem ku Akhayê biçine Troyayê,

ji ber min rûsegê⁴¹⁴

Piştî Helene tîpolojîyên din ên ku ber bi çav in Nausikaa û dayîka wê Arete ne. Ev her du ji xelkên Phaiakê ne. Arete şabanîya Phaiakê ye, qîza wê dotmîra Phaiakê ye. Dema ku Odysseus digihije li ber qiraxên welatê Phaiakê, ya ku arîkarî dide Odysseus û dibe sedem ku ew bê koşka wan, Nausikaa ye. Nausikaa dema Odysseus bi awayekî rût û tirsnak de dibîne, digel ku xidamên wê tev direvin, ew nareve. Bi awayekî cîsaratene li beramberî Odysseusî radiweste, daxwazên wî guh lê dibe, li gor wê rê nîşanî Odysseus dide. Ew rê û rismên xwe dizane, lewra arîkarîya bo kesekî belengaz li ba wê nirxekî mezin e, ew jî ya ku divê bê kirinê dike û digel fikrên xwe yên azad rê nîşanî Odysseus dide.

Herçî Arete ye ku zêde di nava destanê de bi awayeka aktîv jî cî nagre lê belê tiştê balkêş ew e ku dema Odysseus digihije koşka Şah Alkinoos pêşîyê bi lavakarî xwe davêje li ber lingên Areteyê, daxwaz û êşên xwe bi dilsojane jê re vedike. Tabî divê em vê jî bîne bîra xwe ku Arete li hember vê tiştê nake, yê ku biryara heyî û dîyar dide mêrê wê ye. Herwiha dema Odysseus piştî ku dê biçê sipasguzariya xwe li pêşkêşî Areteyê dike. Ev yek şanî me dide ku Arete keseka navê wê derbaz dibe ye lê di heman demê de di nava destanê da keseka pasîv e. Gotinên dawî û biryar bêtir yên mêrê wê ne, ew bêtir bédeng e.

Bi giştî mirov ji bo tîpolojîya jin ya ku di destanê de dibore, dikare du nirxandinên bingehîn bike. Yek di tîpolojîya Heleneyê de dema em li vê yekê binêrin em ê bigihjin wê encamê ku tîpolojîya Heleneyê şanî me dide ku jineka azad heye di destanê de, ew her çiqas bûye sedema kuştin û talanên mezin jî lê wê cardin ev yek bi îradeya xwe ya azad pêk anîye.

⁴¹³ Thomson, George, Tarih Öncesi Ege II, Wergêr Celal Üster, Weşanên Payel, İstanbul 1991, r.155.

⁴¹⁴ h.b.b.r.58.

Ew wekî zilaman ketîye rêwîgînyekê, serencam di serê wê de derbaz bûne û ji mala heyî ya ku wê sînordar dike, dûr ketîye. Ya didoyan di tîpolojîya Penelopeiyê de ger em lê binerin em ê bibînin ku ew bereksê Heleneyê girêdayî mêrê xwe ye, digel ku bîst salan jî mêrê wê wînda ya lê ew tu carî fikra devjêberdana mêrê xwe nafikire. Ew jineke sadiq e, wefadar e. Ji bo ku dev ji mêrê xwe bernede û bi yekî din re nezewice, her cure xapandina li hember kesên xêrnexwaz (xwazgînî) pêk tîne. Lê ew ti caran dernakeve ji sînorên mala xwe, her di wê çarçoveyê de dimîne. Ew jî di fikrên xwe de azad e, ji ber ku wê ti caran serî li himber zordestîya tîpolojîyên mêr (xwazgînî) netewandiye.

1.7. Di Destanê Da Tîpolojîya Mêrî

Yek ji takekesên din ên civakê mêr e. Ew him j'alî mejî him jî j'alî fizîkî ve ji jinan cudatir in. Di gelek tiştên ku hatîye afirandinê de rola sereke ji wî re maye. Jixwe di vê destanê de jî takê ku serekeleheng e mêr e û ev destan jî li dor serpêhatîyên wî hatine xemilandin û honandinê.

Di destanê de çî Odysseus be çî Telemakhos be çî Nestor be çî Menelaos be an jî çî mêrên din yên di destanê de bin, hemû ji sînoran ku ji jinan re hatine xêzkirinê re dûr in. Ew tim di nava serpêhatî, serencam û macerayan de ne. Ger em li serpêhatîyên Odysseus bi kurtenêrînekê binêrin, em ê vana bibînin. Ew bereksê jina xwe ya wefadar û sadiq, her tiştê çê û neçê dike. Bi Yezdanên mê, re radikeve. Dema vê yekê dike qet jina xwe nafikire (jixwe bifikirîya bêguman ev tişt nedikirin) û dike. Xwe ji ti zewqên dinyewî dûr nagire, her cure zewqê ditamije. Azadane tevdigere, aktîv e. Ji bo berjewendîyên xwe her cure derewan dike û egoîst e.

Ji ber ku me yek bi yek serpêhatîyên Odysseus û tîpolojîyên mêr yên din nêrîye lewra hewce nake ew cardin wan tiştên heyî dubare bikin.

1.8. Di Destanê Da Civak

Piştî em li ser tîpolojîya jinê û mêrî ya di destanê de rawestîyan, em ê niha di sînoreke dîyarkirî de derbazî civaka ku di destanê de cî digre, bibin. Mebesta me ya di bin vê binbeşê de ji civakê hew ew e ku ka ev civakeke dayîksalarî ye yan bavîksalarî ye. Em ê hewsengandin û nirxandinên xwe di vê çarçoweyê de bikin. Berîya ku em derbazî vê krîtîka xwe bibin lazim e em pêşîyê pênase û pêzanînekê li ser dayîksalarî û bavîksalarîyê bidin.

Bêguman civak ji berê heta nûke li ser gelek nirx, edet, nerît, ol, lehengî û h.w.d pêk hatîye. Her civak curerengê pêk tîne, berdewamîya hebûna xwe li gor reaksiyon û guherînên cuda dijî. Mirov dikare civatan wekî civakên cotkarîyê (çandinî), civakên endustrîyel, civakên agahîjêgirtinê û h.w.d bibîne. Lê belê her çiqas çend cure civak hebin jî bi me civat di destanan de ji du civakên sereke pêk tên. Ya pêşî civaka dayîksalarî ye û ya din jî civaka bavîksalarî ye. Baş e civaka dayîksalarî çî ye û mebest jê çî ye? Dayîksalarî di civakê de rola serdest ya jinê bi taybetî ya maderê ye. Matriarka an jî dayîksalarî ew binavkirina ku ji cureyek pergali ya rêxistina civakî ye. Bingeha vê pergale ji fikra serdestîya jinê pêk tê; famîlya (binyat) j'alîyê jinan ve tê dîyarkirinê, serwerî di destê jinan de ye. Di van civakan de ji mêran bêtir hurmet ji jinan re tê nîşandanê. Di çarçoweya prensîba serdestîya jinê de, çanda

civakê, edetên wê, bawerî û mîtolojîya wê, ji civaka baviksalarî cîyawaztir teşeyekê digre.⁴¹⁵ Piştî agahîyên li ser civaka dayîksalarîyê niha em ê bi mînakan derbazî vê civakê bibin.

Dema ku Odysseus digihije Phaiakê bi arîkarîya Nausikaa ber bi koşka Alkinoos û Arteyê ve diçe. Piştî ku digihe bajêr, ji bo rênîşandanê Athene di şiklê keçikekê de dikeve pêşîya Odysseus û wî digehîne ber koşkê lê berîya ku ji wir here ji Odysseus re li ser Areteyê wiha dibêje:

*Alkinoos ji xwe re ew wek jin girt,
ewqas rêz da Arete, ewqas rêz daye ku,
çu jin di serzemînê de wiha jê re rêz nehate girtinê,
yên li ber ferma mêrê xwe, çu jinên ku di mala xwe dijîn,
hem zarên wê, hem jî mêrê wê ji dil rêz girtin ji wê re,
miletî jî mîna Xwedawendekê lê nihêrî,
wê bi gotinên xweş silav dida dema ku dihate bajêr,
zaf aqilmend bû, ji ber ku keseka dilpak bû,
dikemijand wê hemû şerên mêran.
Heke ew jin ji dilê xwe daxwaz bike ji te ra,
bila hêvîya te hebe ji bo dîtina hebandîyên xwe,
ji bo vegerîna banê bilind yê mala xwe, axa bavê xwe.⁴¹⁶*

Him di van beytên li jor û him jî dema ku Odysseus xwe bi lavahî davêje li ber lingê Areteyê de em li rastî serwerîya jinê tî. Di van beytan de ger mirov hilsengandinekê bike, bi rehetî dikare bibêje ku li vir de serwerîya jinê ango dayîksalarîyek heye. Ji ber ku ya ku nixr tê dayînê jin e, ya ku rêz lê tê girtinê jin e, ya ku şeran bi dawî dike, ya ku daxwazan bi cî tîne jin e û ya ku aqilmend cardin jin e.

Jin li vir de ji mêrî bêtir cî digre, bêtir li ber çavan e û bêtir xwedîgotin e. Jixwe piştî ku Odysseus dê ji Phaiakê derkeve, cardin malavayîyê li Areteyê dike. Ew dizane ku ya serwer e jin e û li gor wê jî tevdigere.

Piştî mînaka dayîksalarîyê niha em dikarin civaka ku ji baviksalarîyê pêk tê an jî civata ku taybetmendîyên baviksalarîyê cî digrin, derbaz bibin. Berîya ku em derbaz bibin lazim e em li ser baviksalarîyê pêzanînên xwe binivîsin. Baviksalarî, cureyek ji pergalên rêxistina civakê ye ku xwe dispêre desthilatdarîya mêrî. Bingeha vê pergalê ji fikra serwerîya mêrî pêk tê; famîlya (binyat) j'aliyê mêran ve tê diyarkirinê, serwerî di destê mêran de ye. Di

⁴¹⁵ <https://tr.m.wikipedia.org/wiki/Anaerkillik>.

⁴¹⁶ h.b.b.r.115.

van civakan de ji jinan bêtir hurmet ji mêran ra tê nîşandanê. Di çarçoweya prensîba serdestîya mêrî de, çanda civakê, edetên wê, bawerî û mîtolojîya wê, ji civaka dayîksalarî cîyawaztir teşeyekê digre.⁴¹⁷ Niha em di çarçoweya çend mînan de dikarin derbazî civaka bavîksalarîyê bibin.

Dema ku Telemakhos dikeve li dû şopa babê xwe yek ji rawestgeha wî Pylos e. Dema ku ew digihije li wir em dibînin ku kesên ku tên pêşwezîya Telemakhos û hevrêyên wî dikin mêr in. Yên qedr û qîmeta Telemakhos û hevrêyên wî dikin cardin mêr in bi taybetî jî Nestor e. Em dikarin bibêjin ku hema hema di vê beşa Pylosê de qet jin cî nagirin. Cihê ku navê jinan jî dibore wisa ye:

*Kerem kin, bila di koşka navdar de şahîyekê amade bikin jin,
bila paldankan jî bînin, êzing û ava dibiriqe.*⁴¹⁸

Di van beytan de jî li ber çav e ku jin hew tenê ji bo xizmetdîtîna tene bikaranîne. Mêr di van beytan de jî dîyar e serwer e, ew e yê ku fermanan dide, ew yê ku fermanan bi cî tîne û ew e yê ku civakê bi rê ve dibe. Ango serdestîyeke ber bi çav ya mêrî yanî ya bavîksalarîyê heye.

Di destanê de mirov dikare him ji bo civaka dayîksalarî re him jî ji bo civaka bavîksalarî re mînan peyda bike. Vê destanê tenê zîqbûna xwe li ser dayîksalarî an jî bavîksalarîyê pêk neanîye. Car hatîye civak di nava rewşeke dayîksalarîyê de bi rê ve çûye, li gor rêgezên wê hin pêkanîn hatine çêkirin. Lê car jî hatîye ku civat di çarçoweya rêgezên bavîksalarîyê bi rê ve çûye.

1.9. Bûyerên Derasayî

Bêguman di destanê da cihê herî derasayî û balê dikşîne li ser xwe çûyîna Odysseus bo warê mirîyan e. Em dizanin ku dema Odysseus li ba Kirkeyê ye ji bo zanîna çarenûsa xwe lazim e ew berê xwe bide warê mirîyan. Odysseus li gor şîret û rê nîşandanên Kirkeyê berê xwe dide warê mirîyan. Warê mirîyan wargehê Yezdan Hades e û di destanê da jî cîyekî tarî û taristan e. Odysseus ji bo jêhaybûna çarenûsa xwe divê bi ruhê Thebaili Teiresias bişiwêre. Dema diçe li wir çend qurbanan ser jê dike û xwîna wan li ser şûrê xwe wer dike û li bendê dimîne ku ruhê mirîyan bêne xwînê. Piştî demekê ruhê hemû mirîyan tên bo xwînê. Lê Odysseus dixwaze ji bo zanînan çarenûsa xwe Teiresias bê û tê jî. Thebaili Teiresias di efsaneyê de jî navê wî dibore ew, zana û pêşbînê herî navdar e.⁴¹⁹ Piştî ku ew û Odysseus tene ba hev Teiresias her tiştê ku dê bête serê Odysseus jê ra dibêje. Rê nîşanî wî dide û tiştên ku divê ew neke jê ra dibêje û heta li ser mirîna Odysseus jî jê ra agahîyan dide.

Bêguman ev beş beşeke balkêş û derasayî ye, çûyîna warê mirîyan beşeke cuda û zaf derîhiş e. Di warê mirîyan da Odysseus digel serfermandarên herî mezin ên ku çûne şerê Troyayê daxive. Guh dide derd û kulên wan, xwezîya xwe dikşîne, ji wan agahîyan digre, ji bo wan dilsoj dibe. Piştî zanîna çarenûsa xwe Odysseus ji warê mirîyan derdikeve û berê

⁴¹⁷ <https://tr.m.wikipedia.org/wiki/Ataerkillik>.

⁴¹⁸ h.b.b.r.49.

⁴¹⁹ b.n, Mitoloji Sözlüğü, r.279.

xwe cardin dide koşka Kirkeyê. Warê mirîyan di dawîya destanê da cardin tê pêşîya me. Lê vê carê ew der ne bi çûyîna kesekî ra tê pêşberî me, em dibînin ku vebêjerê destanê me di carekê da dibe li wir. Dema em diçe li wir jî em dibînin mirîyên navdar di nava xwe da ketine suhbetekê. Di destanê da em têdigihjin ku bawerîya dîneke qahîm heye û ew pê bawer in ku dinyaya din jî heye. Ji ber ku warê mirîyan û cîdana beşekê li ser vê yekê ev îddaya me piştrasttir dike.



2. Analîza Lehengan

Em ê di bin serenavî da li ser lehengên çalak û giring ên di destana Odysseia da diborin, rawestin. Lehengên ku em li ser rawestîyane wiha ne: Odysseus – ku di bin vî sernavî da jî em ê li ser lehengîyên Odysseus, aqilmedîya Odysseus, evîndarîya Odysseus û hin taybetmendîyên din ên Odysseus rawestin-, Penelopeia – di bin vî serenavî da jî em ê li ser evîndarîya wê, aqilmedîya wê, delalîya wê û hin taybetmendîyên din ên Penelopeiyê rawestin-, Telemakhos – ku di bin vî serenavî da jî em ê li ser lehengîyên wî, aqilmendîya wî û hin taybetmendîyên din ên Telemakhos rawestin-, Lehengên Din ên Destanê – ku din vî serenavî da jî em ê li ser lehengên mîna Nestor, Menelaos, Hevrêyên Odysseus, Welatîyên Phaiakê, Xwazgînîyên Penelopeiyê û Şivan rawestin-, û Lehengên Mîtolojîk (ku di bin vî binenavî da jî em ê li ser Yezdan Athene, Yezdan Poseidon û li ser Yezdanên din ên mîtolojîk ên mîna Kalypso, Kirke, Kyplo, Zeus, Aphrodite û Here bisekin).

2.1. Odysseus

Serlehengê vê destana qerase ku navê xwe jî daye destanê, Odysseus e. Di nava destanê de em ê li gor kronolojîya destanê herin û analîzên xwe jî li gor vê rêzê bikin. Destana me bi denglêkirina Xwedawendan dest pê dike ku di vê denglêkirinê de qala serlehengê me û êşên wî yên kişandî, bi çend gotinan, dike. Piştê em xwe hew di nava komecivîneke Yezdanan de dibînin. Di komecivînê de helbet mijara Yezdanên Olymposê Odysseus e. Bi xwastek û libergerînên Yezdan Atheneyê re ew di serî de bavê xwe Zeus piştê jî Yezdanên din qanî dike ku êdî wexta vegeza Odysseus bo warê wî hatîye û bi kurtasî jî wekê xwasteka wê dibe û Yezdanên Olymposê jî vê yeke qebûl dikin. Piştî qebûlîkirinê, Athene demildest berê xwe dide warê Odysseus, Îthakeyê da ku li wir digel Telemakhos – kurê Odysseus e- li ser bavê wî û rewşa bavê wî baxive û berê Telemakhos bide şopajotina bavê wî. Telemakhos piştî axaftina digel Atheneyê – ku Athene ti caran rasterast bi şikl û şemala xwe ya Yezdanî danakeve li hember mirovan, bi şiklê kesayetî tê pêşberî wan- hesreta bavê wî dikeve dilê wî û digel hin hevalên xwe berê xwe dide xerîbistanê. Pêşîyê diçe Pylosê li ba hevalê bavê xwe, Nestor û piştê jî rûyê xwe vedigerîne Spartayê li rex Menelaos. Belam her du hevrê û hogirên Odysseus, haya wan ji man û nemana Odysseus nînin. Di berdewamîyê de em dibînin cardin Yezdanên Olymposê kom bûne û li ser çarenûsa Odysseus daxivîn. Athene pêşîyê li ber bavê xwe Zeus paşê jî li ber Yezdanên din digere da ku ew bi Yezdanan re di demeke zû de Odysseus ji dûrbûna xaka wî xilas bikin û berê wî bidin Îthakeyê. Di komecivîna Yezdanan da Zeus bang li kurê xwe Yezdan Hermeias û çarenûsa Odysseus wiha dîyar dike:

*Madem ku tu tim dibî agahîyan,
ragihîne biryara me ji Nympheya kezî xweşkok re
Odysseusê têrsebir dê vegere welatê xwe jî,
tu kes dê rê nîşanî wî nede,
ne Yezdan ne jî mirovên fanî,
ji textikên veserkirî bi çardarekî re
bi kişandina tengavîyan re dê bigihije di roja bîstan de*

Skherieyê, axa Phaiakayan,
ji dûndeyên Yezdanan e Phaiakî,
dê wekê Yezdanekê bihesibînin wî,
dê wisa zêde bronz, wisa zêde zêr, zaf libas bidin wî ku,
heke Odysseus ji Troyê bi silametî vegeŕîya û bistanîda para xwe ya talanê,
dê ti carî evqas tişt ne bianîya.
piştŕe dê wî bi keştîyekê ra bişînin welatê nazdar ê bav û kalên wî
vegerîne çarenûsa wî,
cardin dîtina hezkarên xwe, xanîyê xwe yê serbanbilind⁴²⁰

Wekê di van hevokan da jî dîyar e, çarenûsa Odysseusê xemkêş hem rêwîtiyek dirêj û têtengavî ye hem jî vegeŕîna li bal hebandiyên xwe ye.

Em ê niha li gor liv û tevgerên Odysseus yên di destanê de bi girêdayî lehengî, aqilmendî, evîndarî û hin taybetiyên wî yên din (çi erênî be çi nerênî be) bi mînakdayîn û jêgirtinên di destanê de, li ser wan rawestin.

2.1.1. Lehengiyên Odysseus

Ji destana Îlyadayê jî em dizanin ku yek ji şerkerê ku diçe bo talan û wêrankirina Troyayê serlehengê me Odysseus e.⁴²¹ Jixwe Odysseia jî ji serpêhatî û vegeŕa Odysseus a bo warê wî pêk tê. Niha li gorî lehengiyên Odysseus yên di destanê da bi mînakdayîn em ê li ser wan rawestin û hilsengandinên xwe bikin.

Di nava destanê da Odysseus pirr dilsojê hevrêyên xwe ye lê mixabin hevrêyên wî li hember rênîşandayîn û rêbertiya Odysseus jî pirrî caran bi ya wî nakin. Di serpêhatîyeke wî û hevrêyên wî de dema ew piştî bi rojan giravekê dibînin û berê xwe didine giravê Odysseus çend hevrêyan dişîne da ku bizane ev welatê ku bûne peya, welatê kê ye. Welatê ku lê peya bûne welatê “Lotosxwiran” e (lotos gîyayekî bîyanî ye û li gor destanê heçî kesê ku dixwe nikare xwe ji xwarina wê xilas bike). Hevalên wî jî mixabin dikevîne xwarina vî gîyayî û xwe nema jê xilas dikin. Lê Odysseus li hember vê rûdanê baqilane tevdigere peywira lehengiya xwe bi cih tîne û hevrêyên xwe ji xwarina wî gîyayî xilas dike. Ew bûyer jî devê Odysseus wiha tê zimên:

Ji yên me kî xwaribe ji fêkîya lotosê ya biçêj,
ji ser xwe çû û nexwast vegere keştîyê.
Nefikirîn ji bilî mayîna li wir ya bo xwarina lotosê,

⁴²⁰ Homeros, Odysseia, Wergêr Azra Erhat-A.kadir, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul 2014, r.84 (w.a.m).

⁴²¹ Homeros, İlyada, Wergêr Azra Erhat-A.kadir, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul 2014

hiş ji serê wan biribû wê nebatê, dabû bîrkinê vegera wan.
lê min li rondika çavên wan nenihêrî, min ew rakişandin bo keştîyê,
piştire min ferman da hevrêyên din ên nazdar,
haydê, min got, zû li keştîyên bilez siwar bin,
tirsîyam, yek ji wan lotosê bixwe, bi bîr ve bike vegeê.⁴²²

Ji vê serpêhatîya wan a bo welatekî da Odysseus, wekî di piranîya destanê de, li hevalên xwe difikire û naxwaze bêyî hiştina kesekî jî biçe bo welatê xwe. Di van hevokên Odysseus da em rastî wefadarîya Odysseus ya bo hevrêyên wî tîn ku ew tenê xwe nafikire digel çûyîna xwe jî dixwaze hevrêyên wî jî vegezin bo welatê xwe. Odysseus bi çespanandin raberî me dide ku ew ne kesekî egoist e an jî tenê xwe difikire ye.

Piştî rêwîtiyeke din Odysseus û hevrêyên wî ber bi bejahîyê an jî giraveke din ve tîn. Ev girava ku lê peya bûne, girava dêwên har û hov e. Di vê giravê de dêwên bi navê Kyklop dijîn. Ev dêwene ji mêvanperwerî, çêtî û tiştên qenc bêpar in. Her li xwe difikirin û li hember kesên bîyanî tim barbartîya xwe derdixin der. Odysseus xwe davêje bextê yek ji wan dêwan û diçe şikefta wî de lê ew dêw wekî yên din hov e û demildest li mirina Odysseus û hevrêyên wî digere. Odysseus digel çend hevrêyên xwe di şikefta dêwî de asê dimînin. Her roj dema dêw diçe li ber pezên xwe derîyê şikeftê bi kevirê mezî digre û diçe. Ji ber ku hêz û şîyana Odysseus têra rakirina wî kevirê qerase nake lewma, wekî her caran tiştê jî destê wî tê, fikirîn û plansazî ye. Ew digel hevalên xwe yên mayî difikire û wî dêwî bi vexwarina meyê serxweş dikin û piştire jî dixwaze wî dêwî kor bike an jî bikuje û vê dîmenê wiha radixe ber çavan:

min tavil rahişte singê wî, min xiste nava pelan de
di alîyekê de ez li ber hevrêyan gerîyam, min cisaret da wan
radestî tirsê nebin û nebe ku hûn dev jê berdin, min gote wan, min tenê nehêlin.
Min singê zeytîne nêrî, di êgir de soresor dibû,
hê şîn bû, lê dê bi sotîne niha biketîya.
Ji kişandina singî di nêv êgir da û rahêlana min bû yek
digel min hemî hevrêyan êrîş birin⁴²³

Serlehengê me Odysseus piştî korbûna dêwî ji hevrêyên xwe ra plansazîyeke nû datîne û bi fêlbazî, xwe bi pezên dêw re girêdidin û ji şikeftê de derdikevin û ji belaya dêwî û mirinê rizgar dibin. Wekî kurtekêliya li jor jî xwîya ye Odysseus di tengasîyê de cardin hevrêyên xwe û xwe ji nav lepên dêwî xilas dike. Odysseus her çiqas dilêr jî be dixwaze ev dilêrîya wî tesîrê li hevrêyên wî jî bike û wan jî ji mirinê xilas bike. Odysseus wekî mêrxasekê pêşîyê ew êrîşê dibe li ser dêwî da ku hevrêyên wî jî ji vê yekê cisaretê bigrin û rahêlin dêwî. Wekî

⁴²² h.b.b.r.148.

⁴²³ h.b.b.r.157.

gotina wî diçe hemî tişt û ji dêwî rizgar dibin. Em cardin dibînin ku bi fêlbazî û mêrxasiya xwe ra Odysseus derdikeve ser dikê û berpîrsiyartîya dikeve li ser milê wî, bi cih tîne.

Wefadarî, sozdarî û dilsoziya Odysseus ya bo hevrêyên wî tim di nava destanê da tê pêşberî me. Odysseus hevrêyekî wisa ye ku bêyî ku xweşîya xwe tenê bifikire, tim bala wî û hişê wî li ser hevrêyên wî ne. Di serhatîyeke din a digel hevrêyên xwe da Odysseus dema ku pê dihese hevrêyên wî tev bûne girtî û dîlketîyê Yezdanê bi navê Kirke hemû tiştî heta dîlketin û mirina xwe jî dide ber çavên xwe û diçe bo koşka Kirkeyê. Tabî dema diçe Yezdan Hermeias jî tê û hin arîkarîya didê lê ew berîya hatina Yezdan Hermeias jî ramana rizgarkirina hevrêyên xwe kirîye di serê xwe de. Yezdan Kirke her çiqas di nav xweşîyê de jî mazûvaniya wî bike cardin eqlê wî li ser hal û hawala hevrêyên wî ye. Di dîmeneke destanê da em cardin bi devê wî, di teswîreke wiha de digel axaftinekê bi Kirkeyê ra wiha dibînin:

*Nîşanî min bide Kirke, mirovek hiş di serî de,
nebîne bi çavan rizgarîya hevrêyên xwe,
xweşik xweşik bixwin, vexwin, kêf bikin ji xwe ra!
heke ji dil bixwazî xwarin û vexwarina min,
tu xilas bike hevrêyên min ên xoşevîst, bibînim wan bi çavên xwe.⁴²⁴*

Odysseus piştî ku bi arîkarîya xelkê Phaiakê digihije warê xwe Ithakeyê, diçe dibe mêvanê şivanê mala xwe lê tabî ji wî re qala xwe nake û xwe wek xwazokekî nîşan dide. Piştî ku kurê wî Telemakhos ji şopajotina bavê xwe vedigere û ew jî tê ba şivanî, di klubeyê da, êdî Odysseus xwe ji kurê xwe ra dide nasandinê û yekser planekê digel kurê xwe ji bo kuştina xwazgînîyên jina xwe difikire. Dema Odysseus wek xwazokekê tê bo qesra xwe, xwe aşkera nake heta ku dem tê. Li ser çûyîna Odysseus nêzî 20 sal derbaz bûne û mala wan bi xwazgînîyên jina wî re tije bûne. Tabî ev xwazgînî digel vê bê hurmetîya bo keybanûya xwe herwiha malê Odysseus jî her ro dixwin û wêran dikin. Odysseus têrsebr e lewma li gor plana di serê xwe de tevdigere.

Odysseus tebata xwe ya li hember bê hurmetî û bê rêzdarîya xwazgînîyan heta dawîyê diemilîne. Ew wek di pirranîya metnê de baqilane tevdigere. Mirina xwazgînîyan plan dike, pêşîyê dixwaze wan bê çek bihêle paşê jî bi wê tîra xwe yek bi yek wan xwazgînîyên jina xwe dikuje. Belam piştî ku serxwazgînîyê mezin Antinoos dikuje, yên wê derê hêj nizanin ku ew kes Odysseus e. Li hember vê bertekan nîşanî Odysseus didin. Lê bele Odysseus bi mêrxasî qîr dike li ser wan û derdikeve li ser dikê, ji wan ra wiha dibêje:

*we çi fam kir kûçîkno, ma ez ê cardin venegerîyama xanîyê xwe
ji bajarê Troyayîyan, xanîyê ku we rût û pût kirî?
we çavsorî kir, hûn bi xidamên min ra raketin,
herwiha hûn ji jina min ra bûne xwazgînî hê ku ez sax,*

⁴²⁴ h.b.b.r.177.

*hûn qet ji Yezdanên li jor netirsîyan,
rojek bê, ji we tol bê hilgirtin, we ev nefikiri?
hûn ê niha tev bikevin xefka mirinê.⁴²⁵*

Odysseus piştî vê qêrîna mêrxasane hemû xwazgînîyan dikuje. Wekê li vir de û di pirranîya destanê da Odysseus ne ji mirina xwe ditirse ne jî ji bo hezkarên xwe ji mirinê dût dikeve. Yê ku cisaretê dide pêş xwe Odysseus e, yê ku cisaretê dide hevalên xwe ew e, yê ku bi mêrxasane tevdigere cardin ew e. Odysseus di pirranîya destanê de - ku li jor jî bi mînak me analîz û şîrove kir - tam li gor leheng û mêrxasekî tevdigere û j' alîyê mêrxasîyê ve kesekî kamil e.

2.1.2. Aqilmendîya Odysseus

Di nava destanê de tiştê here berbiçav a Odysseus, bêguman aqilmendîya wî ye. Odysseus tim dema ku tiştê bike pêşîyê çêyî û ne çêyîyên wê kirina xwe difikire paşê wê kirina xwe pêk tîne. Niha bi mînakan em ê li ser alîyê Odysseus yê têgihiştî û li gorî rewşa ku di nêv de ye ka çawa aqilê xwe bi kar tîne, rawestin.

Di rûpelên pêşî yên destanê de dema Yezdanên Olymposê dikevine di nava komeciwinê de qala Odysseus jî tê kirin. Dema Yezdan Zeus qala Odysseus dike wî wiha tîne ziman:

*qet ez ji bîr dikim Odysseusê Yezdanî
di nava fanîyan de j' alîyê aqil de yê herî berz e⁴²⁶*

Tenê ne Yezdan bi heman awayî mirovên fanî jî dema qala wî dikan, wî j' alîyê aqil ve li ser xwe û gelek insanên de dibînin. Ku yek jî pesinkarê aqilê Odysseus hevrêyê wî Mentor e. Mentor dema qala hevalê xwe Odysseus dike di nava hevokên xwe de pesnê jîrtîya wî wiha tîne ziman:

j' alîyê aqil ve ti kes ne bi qama Odysseus bû⁴²⁷

Odysseus her wek beytên li jor jî xwîya ye ew di nava Yezdan û mirovan de kesekî bi aqilê xwe tê naskirinê ye. Odysseus dema bi çardarekî re ji cem Kalypsoyê diçe û xwe berdide behrê, piştî demekê tê welatê Phaiakan. Li wir dema jî behrê derbazî li ser axê dibe hemû tiştî bi berfirehî wiha difikire:

*çi hatine serê min, çi!
hêj jî dê çi bê sere min kî dizane!
heke ez derbaz kim vê şeva neb' xêr li qeraxa vê rûbarê,
ditirsim têkeve hundirê min ev xusika mîna cemedan,*

⁴²⁵ h.b.b.r.370.

⁴²⁶ h.b.b.r.5.

⁴²⁷ h.b.b.r.39.

*ev xwiska ku çarmedor girtîye têkeve hundirê min,
 dê min bitevizîne, dê bistîne rihê min ê yek henaseyî.
 mîna qeşayê ba tê li berbangê.
 biçime li ser vî girî, têkevime daristana bisih,
 di bin tûmikên pirr de xwe dirêj bikim,
 lê heke germî layekê, betilîn layekê,
 min têk bibin, ez bikevime xeweke şêrîn,
 heke ez ji gurr û huran re bibim xwarin.
 ponijî û fikirî, ya baş xwespartin bû
 li daristana berpala ya vê rûbarê.⁴²⁸*

Ji jêgirtinên me yên li jor jî bi rehetî mirov dikare bibîne ku Odysseus hemû ihtimalên heyî difikire. Serlehengê me dema li ser tiştêkî difikire ne j'aliyekê de yan jî ne tenê aliyê çê herwiha aliyê neçê jî difikire. Di ramanên xwe de digel xwe daxive, ya baş û biewle çî be ji bo xwe wê hildibijêre. Tevgera wî tim li ser encamên ramanên wî ne.

Odysseus dema di nava behrê de çardarika wî bi sîpel û mewcan serobino dibe. Yezdan Ino arîkarîyê dide wî û tekezîya xilasîya wî ji nava avê de jî didetê. Yezdan Ino çarîkekê (laçîk) dide wî da ku ew wê çarîkê bigre û dev ji darîkê ku ji wê çardarika mayî berde. Belam Odysseus wiha difikire:

*'Wey ku ya hatî serê min! Ji nemiran yek
 cardin ji min re dek û dolaban çêdikin?
 Heke na çîma ji min ra bibêje ji çardarîkê peya be?
 Vê carê ez zû bi zû guh nadim gotina wê,
 'ha ev e cihê xilasîya te' ku axa jê ra dibêje
 ji çavên min gelek dûr in.
 Ya baş ez ji ya xwe şaş nebim:
 Ta ku qetên pêveka çardarîkên min hebin,
 ez ê jî li ser wê bi hemû tiştan re li ber xwe bidim,
 heke sîpel qet bikin çardarîka min çareserî ji min ra namînin,*

⁴²⁸ h.b.b.r.99

*hingê ez ê xwe bavêjime behrê, dest bi melevanîyê bikim. ''*⁴²⁹

Odysseus her çiqas arîkarîya Yezdanekê bibihîze jî cardin ew bêtir li xwe û aqlê xwe bawer e. Lehengê me wekî her car pêşîyê di çarçova suhbeteka digel xwe hebûna hemû ihtimalên heyî bi berfireyî difikire. Piştî fikirîna xwe terciha xwe li ser bawerîya aqilê xwe pêk tîne. Ew ji gotina Yezdanekê zêdetir, ji ber serborîyên xwe, li ya xwe bawer e.

Odysseus dema li welatê Phaiakan e li wir şahî tîn lidarxistin. Kesên wê derê dixwazin Odysseus jî tev li van listokên wan bibin. Odysseus di serî de vê qebûl nake lê piştî israreke mezin vê yekê dipejirîne û wan bi jîrtîya xwe têk dibe. Odysseus piştî vê yekê bi mîrxasî tê pêşberî me ji wan kesên li wir re netirsîya xwe û têkbirina wan tîne ziman. Belam Odysseus ji ber ku bûye mêvanê Laodamas lewma wiha dibêje:

*lê bila tekez Laodamas dernekeve li pêşberî min,
wî ez li mala xwe kirime mêvanê xwe,
çawa meriv dikare bi dostê xwe re şerekî bike?
Dema merivek, li welateke bîyanî, di listokekê de
meydanxwestinê ji kesê ku wî diezimîne re bike,
ew ji namerdan namerttir, ji rezîlan reziltir e.*⁴³⁰

Odysseus li beytên jor jî dîyar e ku digel aqiltîya xwe herwiha xwedîhurmet e. Ji ber ku kesekî ew kirîye mêvan nabe ku li hemberî wî têkeve di reaksiyoneke nebaş de. Ew digel hurmeta xwe herwiha kesekî qedirzan e. Nankortîyê li hember kesê lê bûye mêvan ra nake, hurmeta xwe diparêze bo wî. Ev yek nîşaneyê asta aqilmendîya Odysseus nîşan dide.

Odysseus dema serpehatîyên xwe vedibêje di nava wan serpehatîyên wî de carekê digel hevrêyên xwe pevra bo vegera welêt rîya wan dikeve warê Kyklopan. Li wir j'aliyê dêwekî ve di şikeftê de tîne asêkirinê. Odysseus bi ketina xefka dêw re tim li çareya ji wir derketinê û filitîna ji destê dêw dirame. Odysseus di destpêkê de her çiqas li ber dêw bi zimanekî şêrîn bigere jî dêw li ber nayê û her carê hevrêyên wî dikuje û dixwe. Odysseus planekê di serê xwe de ava dike û hevrêyên xwe ji planê hayedar dike. Plana wî li ser kuştina dêwî ye, pêşîyê singekî peyda dike, paşê digel çend hevrêyên xwe berpîrsîyarîya kuştina dêwî dixê li ser stûyê xwe. Odysseus kesekî jîr e hemû tiştên dê bêne rûdanê difikire lewma jî pêşîyê meyê îkramê dêw dikin da ku ew sermest bibe û bi rehetî êrîş bibin wî. Odysseus aqilmendîya xwe didomîne pêşîyê suhbetekê digel dêw dike. Dêw navê wî dipirse ew jî wiha bersiv dide:

*Navê min Tukes e, wiha banî min dikin,
dayka min, babê min û hemû hevalên min.*⁴³¹

⁴²⁹ h.b.b.r.95

⁴³⁰ h.b.b.r.132

Dêw jî meya xwe vedixwe heta ku ji ser hemdê xwe diçe. Piştî ku ji ser hemdê xwe diçe Odysseus cisaretê dide hevrêyan û bi pêşengîya wî êrîşê dibine li ser dêwî û çavê wî yê tekane kor dikin. Dêw bi hawar û qêrîna dikeve, tabî hemû hevalên dêw tîne tana wî. Jê ra bang dikin:

*çi bû bi te wiha Polyphemos, çima diqêrî bi êş û jan,
di nîveka şeva Yezdanî de tu me wiha bê xew dihêlî?
Ji nemiran yekî kêrîyên te revandin çi?
Yan na yek te têk dibe bi fêlbazî yan jî bi zorê?⁴³²*

Lê ji ber ku Odysseus bi tevdir tevgerîya bû lema plana wî yek bi yek dihate cî. Dêw ji ber ku navê Odysseus wekê ‘tukes’ zanîbû lewma wiha bersiv dide hevalên xwe:

Min, Tukes têk dibe, hevalno, ne bi zorê bi fêlbazî⁴³³

Ji ber ku hevalên dêwî ji ber bersiva wî serê wan tevlihev dibe lewma yekser ji wir diçin. Odysseus bi fêlbazîya xwe û bi aqilê xwe plana xwe tîne cî. Lê belê Odysseus bi vê re tenê namîne ji ber ku ew hêj asê ne di şikeftê de lewma Odysseus wiha dirame :

*Lê ez diramîyam li ser rîya herî baş,
min ê dostên xwe û xwe çawa ji mirinê rizgar bikirîa,
min ji serê xwe ra derbaz dikir her çare, her fêlbazî,⁴³⁴*

Odysseus xwe bi xwe jî tîne ziman ku ew tim li ser vê meselê difikire. Digel cisareta wî aqilê wî yek ji alavên herî pêşketî ye. Ji ber ku ew aqilê xwe pir baş bi kar tîne lewma bi rehetî dikare fêlbazîyên balkêş bifikire. Odysseus ji bo reva ji destê dêw xwe û her hevrêyek xwe bi binê beranekê ve girêdide û ji destê wî dêwê hov xilas dibin. Odysseus tenê ji destê dêw xilas nabe herwiha tola hevalên xwe jî ji dêw hildide. Aqilê Odysseus digel fêlbazîyên wî, ne tenê wî herwiha hevalên wî jî ji mirinê xilas dike. Jixwe di nava destanê de yek ji bernavê Odysseus ‘Odysseusê fêlbaz e’ û ev di nav beytan de pîrr derbaz dibe.

Dema di sehneyeka destanê de Athene digel Odysseus diaxive wî wiha pênase dike:

*Ji bo ku ji fêlbazîyên te derbaz bibe
yezdanek jî divê têrhîlebaz û têrfêlbaz be,
tu çi mizewir î, tu çi şareza yî, ji derew û hîleyan têr nabî⁴³⁵*

⁴³¹ h.b.b.r.157

⁴³² h.b.b.r.158.

⁴³³ h.b.b.r.158.

⁴³⁴ h.b.b.r.158.

⁴³⁵ h.b.b.r.230.

Wekê gotinên Atheneyê jî ew Odysseus pirr baş nas dike. Odysseus bi fêlbazî, plansazî û aqilmedîya xwe pir pêşketî ye û wiha jî tê naskirinê. Ew ti caran ji ya xwe dûr nakeve, li gor aqilmedîya xwe plana pêk tîne. Lê aqilmedîya xwe ne ji bo tiştên xirab, bêtir ji bo tiştên baş bi kar tîne.

Odysseus piştî ku digihije warê xwe wekî xwazokan nîşan dide. Sedemê vê aqilmendîya Odysseus, bêguman ew e ku naxwaze him xwazgînîyên jina wî, wî nas bikin him jî li gor plangêrîya xwe naxwaze xelk wî nas bikin. Odysseus dema di şiklê xwazokan tê qonaxa xwe ji bilî Telemakhos hema bêje çu kes wî nas nake. Ew tê qonaxê lê belê xwazîniyên wê derê hez bi wî û tevgerên wî nakin. Li dijî wî derdikevin lê Odysseus baqilane tevdigere û xwe li wir digire. Dema li wir e xwazokek din ê bi navê Iros tê, Odysseus dibîne û jê ra gefan dixwe. Belam Odysseus xwe li ser ve nabe. Paşê Iros hêrsa wî her diçe zêdetir vedike, dawîyê Odysseus jî derdikeve li hember wî, ji bo gemşê. Dema berîya ku dest bi gemşê bikin vebêjerê destanê dîmenek wiha li ser Odysseus tîne pêşberî me:

Di wê navberê da Odysseusê Yezdanî yê pirr derdkêşayî ramîya,

bi derbeyekê re canê wî bîstanda û li erdê bixista,

yan na bi hêdî li wî bixista û wî dirêjî erdê bikira?

Rêya duyem bêtir ji wî re baş hat,

heke hêdîka li wî bixista dê Akhayan fam nekirina ku ew kê ye.⁴³⁶

Ji sehneya li jor jî xuyaye ku Odysseus cardin li gor rêgezên aqilê xwe tevdigere û li gor her ihtimalên heyî gava xwe davêje. Odysseus ne keseke ji rêzê an jî ehmeq e ku tevgerên wî ji hişmendîya wî dûr be. Ew heke bi yek derbê Iros bikuje, kesên wê derê wî nas nekin jî belkê bi wî re kevin şerekî an jî wî ji qonaxê derxin. Odysseus van tiştan tîne li pêş çavên xwe û bi derbeke hêdîka rikeberê xwe têk dibe û bala hemû kesî nakêşe li ser xwe ve. Odysseus dema digel jina xwe jî daxive xwe ji bo wê jî aşkera nake. Ji ber ku hêj bo plana wî maye di axaftina ligel jina xwe de çîrokeke dinê jê ra vedibêje û bala wê nakêşe li ser aşkerabûna xwe.

Odysseus di mînakên di bin vê beşê de jî xuyaye ku encamên tevgerên wî yên serketî tim ji ber hişmedîya wî ye. Ew her car tiştên erênî û nerênî tîne hişê xwe û li gor wê tevdigere. Odysseus di piranîya destanê de tim di nava fikirînê de ye û li gor wan fikaran gavên beraqilane davêje.

2.1.3. Evîndarîya Odysseus

Em dizanin ku Odysseus dema ji welatê xwe diçe bo şerê Troyayê hê nû zewicî ye û zarokek wî yê berşîr heye. Odysseus jina xwe ya teze û ciwan dihêle, diçe şerî. Dema wext tê bo vegera wî, li ser çûyîna wî tam bîst sal derbas bûne. Odysseus jî wekê Penelopeiyê evîndar e û dixwaze vegere hêlîna xwe. Jixwe destana me jî li ser vegera Odysseus e ku Odysseus dixwaze bigihîje yara xwe ya jêdûrketî. Wata yek ji sedemên ku ev destan pêkanîye, evîn e.

⁴³⁶ h.b.b.r.310.

Odysseus ji welatê xwe dûr li cem Yezdan Kalypsoyê ye an jî girtîyê Kalypsoyê ye. Ew dixwaze vegere welatê xwe lê nikare rasterast vê bibêje heta ku Yezdan Kalypso rê li ber çûyîna wî veneke. Yezdan Kalypso hez bi Odysseus dike, jixwe Odysseus jî bi salane li ba wê ye. Ji ber hezkirina xwe ya bo Odysseus naxwaze ew biçe lê Odysseus ji ber hesreta evîna Penelopeiyê dixwaze demildest bikeve rê. Kalypso vê yekê dibîne, ji bo ku ev fikra wî biguhere wiha jê ra dibêje:

*Lê belê dê hê çî bê serê te, heke bizane dilê te,
berîya ku tu bigihijî warê bavê xwe,
te bizanîya piştî vê dê çî bihata serê,
tu çiqa bêrîya jina xwe Penelopeiyê dikî bike,
tê bimayî li ba min, bibayî zêrevan ji vê malê re,
heta min ê tu bikira nemirek (Yezdan).
Dilşa me ku ne kêmtê wê me j'alîyê bejn balê ve,
nehatîye bihistin ku, jinên fanî bi Yezdanan re
j'alîyê bedenî ve bikevin pêşbazîyê.
Odysseusê têrsebir lêvegerand, jê re got:
Yezdana mezin, li min negre,
ez ne ku van hemîyan nizamim,
hem j'alîyê bejn û balê, hem j'alîyê delalîyê
Penelopeiyaya li ber te ne tiştêk e,
çawa be jî ew keseka fanî ye,
lê ji bo te ne pîrbûn heye, ne jî mirin.
Lê çî b'kim ku şev û roj aqilê min li ser wê ye,
tekane xwasteka min dîtina roja hevgihînê ye.
Heke cardin ji nemiran yek êşê bide
li ber min jî li ser behra mîna meyê,
çî b'kim ez ê li ber wê êşê jî xudantebat bim,
dilê di singê min de ewqas qahîm e.
Min çî derd kêşane, min li ber wan ber xwe daye*

di behran de, di şeran de berîya vê.

Ez amade me ji bo êşên piştî vê jî bîn⁴³⁷

Di diyalogon li jor jî xwîyaye ku Yezdan Kalypso ji bo ku Odysseusî ji daxwaz û xwasteka xwe vegeerîne çî ji destê wê tê dike. Pêşîyê dixwaze bi tiştên ku dê bêne serî wî bitirsîne, paşê jî ji bo mayîna Odysseus teklîfa nemirbûnê yanê Yezdanîtyê lê dike. Ji ber ku ew jî ji Odysseus hez dike û naxwaze ji Odysseus ji cem wê biçê. Belam Odysseus li vir li hember van teklîfên Yezdanê qahîm dimîne. Pêşîyê baqilane tevdigere, wê naxwaze biazirîne, bi zimanekî şêrîn pesnê wê dide heta li ser Penelopeiayê dibîne. Paşê jî ji bo wuslata xwe him teklîfa mayîne him jî teklîfa Yezdanîtyê napejirîne. Jixwe di van gotinên berjor de jî xuyaye ku Odysseus ji bo ku bigihije evîna xwe Penelopeiayê hemû teklîfên qerase dide alîyekê. Heta asta evîndariya Odysseus bo Penelopeiayê ewqas mezin ku hemû tiştên ku dê bêne serê wî bi mîrxasî pêşwazî dike. Ew ji bo wuslata xwe hemû tiştên xirab heta mirinê jî dide pêşîya xwe û dikeve rê.

Odysseus piştî ku bi rê dikeve pirr astengî tî pêşîya wî heta bi mirinê re gellek caran rû bi rû dimîne. Li hember gellek zordariyan, li hember gellek heqaret û kotekan ji ber qahimî û agirê evîna xwe ser dikeve. Odysseus dema wek parsek tê qonaxa xwe di hevdîtina wî ya digel Penelopeiayê de xwe ji xanima xwe re aşkere nake. Xwe wek parsek dide naskirinê û qala xwe digel serpêhatîyên xwe bi devê parsekekî vedibêje. Piştî ku Odysseus xwazgîniyan têk dibe êdî di navbera wî û Penelopeiayê de ti kes nemaye. Belam Penelopeia ji ber ku hêvîya xwe ji hatina Odysseus birîye, bawer nake ku ew hatîye. Heta li hember vê kurê wan Telemakhos ji diya xwe diqehire lê belê Odysseus wiha dibêje:

Dev jê berde Telemakhos, çawa bixweze bila wesa min biceribîne,

çawa be jî hê zêde dem derbaz nebû dê baş nas bike,

niha di nava qirêjê de me, cilên xirab li ser milên min hene,

ji ber wê min bi kêmî xwe dibîne, bawer nake ez Odysseus im.⁴³⁸

Her çiqas Penelopeiaya ji ber salên dirêj bawer neke jî ku ew Odysseus e, Odysseus vê yekê wek tiştêkî asayî dibîne lewma jî bêhna wî fireh e. Penelopeia dema ku dixwaze wî baş nas bike ka ew Odysseus yanî mîrê wê ye an yeke din e, bi ceribandina nivînê ku j'alîyê Odysseus ve hatî çêkirinê, wî diceribîne. Penelopeia ji xidama re dixwaze ku ew nivînên wan yê ku Odysseus çêkirine, raxe. Odysseus bi hêrs wiha dibêje:

Serobino kir, te bi van gotinan dilê min!

Kê ye yê ku nivînên min ji cih radike?

Vî karî bi arîkarîya Yezdan nebe ti kes nikare,

heke wê ji bo ciheke din bibe dikare Yezdanek encax wê bibe,

⁴³⁷ h.b.b.r.90.

⁴³⁸ h.b.b.r.388.

mirov çiqra can û cehêl be jî
cardin jî ne hêsane jicihlivandina wê,
ev razeke mezin e, bi hostatî pêk hatîye ew nivîn
ji ber ku min çêkir ew, bi tena serê xwe.⁴³⁹

Penelopeia piştî van gotinên hebandîyê xwe êdî tam pê qanîh dibe ku ew Odysseus e. Li van beytên berjor de Odysseus hem bîranîna xwe ya digel jina xwe tîne ziman hem jî ji ceribandina hezkarîya xwe bi serketî derbaz dibe. Êdî piştî bi salan Odysseus û Penelopeia digihijin mirazê xwe.

2.1.4. Hin Taybetîyên Din ên Odysseus

Bêguman Odysseus di nav destanê de bi têra xwe kesekî pirrêl e. Em ê jî li gor xwe hin taybetîyên serlehengê me yê ji bilî alîyên wî yên li jor, li ser alîyên wî yên din li gor zanîna xwe rawestin. Odysseus di nava van serpehatîyan de bi awayên gellek cuda tê pêşberî me. Ku yek ji wan jî, piştî hereket, liv an jî bûyerekê şîretdayînên wî ne.

Odysseus dem li welatê Phaiakîyan e ji bo wî şahî pêk tên. Di nava wan şahîyan de lîstok têne lîstinê. Euryalosê ku yek ji wan lîstikvanên şahîyê ye dixwaze Odysseus jî bê tevî pêşbazîya lîstokan bibe. Belam ne bi zimanekî şêrîn dibêje berkes bi zimanekî tal û bêhurmet dibêje. Odysseus ji ber van gotinên wî kerbên wî vedibin lê bersiveke têrşîret li wî vedigerîne:

Tu nabihîzî çî ji devên te derdikeve xorto,
mejûyê te li ku derê ye?
Yezdan nadin hemû tiştên wiha delal, tiştên baş,
bejn û bal û hiş û gotinzanî li ba mirovekî peyda nabe.
Yezdan ji hin kesan re sipehîti nedaye lê bele
lê dinerî carekê daxive hemû kes balê dide, hemû çav ber bi wî ve vedigerin,
bi gotinên xwe yên bipîvan xwe li xelkê dide hezkirinê,
li wî dinerin dema ku ji cihekî derbaz dibe, wekî Yezdanekî.
Kê jî j'alîyê delalîyê ve dişibe Yezdanan belam,
axaftinek wî heye xirab û xirab e.
Tu jî wesa yî, mîna Yezdanekî delal,
lê j'alîyê aqil ve, jar û hêjar.⁴⁴⁰

⁴³⁹ h.b.b.r.390-391.

⁴⁴⁰ h.b.b.r.131.

Odysseus piştî tehlîla lawikî şîretên xwe jî lê dike. Di van şîretan de vatişekî (diskur) hişk jî be, cih digre.

Odysseus dema li qonaxa xwe de wekê xwazokekê li ber xelkê digere da ku bêtir xwarin ji wan xwazgînîyan bistîne, ji xwazgînîyê bi navê Amphinomos pesnê wî dide. Tabî Odysseus jî li ser vê yekê piştî çend gotinan tevnê gotinxweşî û şîretan wiha pêk tîne:

Madem ku hişê te li serê te ye, madem tu ji wî çêbûyî,

ev tiştên ku ez ê ji te ra bêjim baş têxe serê xwe.

*Di nav mirovên ku li serzemînê dimeşin û benîademên ku henaseyê digrin de
ji insanan bêhêztir ti afirandîyî axa pîroz xwedî nake.*

Yezdan ji wî re tenduristî û dilşadîyê bexş dike,

ew jî, êdî ti serêşî nayêne serê min, dibêje,

lê dema Yezdanên dilşad ji xeman parekê bide wan jî,

xwe li ber nagre, çi ye ev dibêje, ya ku hatî serê min,

lê ev benîademên ku li serzemînê dijîn, çi di serê wan de ye,

mirov, bavê Yezdanan Zeus çi bixe serê wan, hema ew e.⁴⁴¹

Di van gotinên xweş yên Odysseus de wekê xwîyaye ne tenê şîretên giranbiha herwiha kêr jî be gotinên felsefîkî jî cî digrin. Odysseus ji ber ku bi salane di nava veher û seferan de ye lewma jî bi tîra xwe xwedîtecrûbe ye. Bi girêdayî vê yekê dema bi yekî ra dikeve axaftinê ji wan serborîyên xwe jî îstifade dike û wekî derwêşekê gotinên giranbiha pêk tîne.

Em şîretên Odysseus ne tenê ji devê wî herwiha ji devê jina wî Penelopeiyê jî dibihîzin. Dema berîya ku Odysseus bo sefera ser bi bajêrê Troyayê ve biçe şîretan li jina xwe dike. Penelopeia şîretên mîrê xwe Odysseus wiha tîne zimên:

Yezdan dê min veherîne welatê min ez nizanim,

an li wir, li Troyayê mirine çarenûsa min?

Dê li ser milê te bimîne ev berpîrsîyartî.

Li dê û bavên min miqete be, baş li wan binere,

ji niha baştir li wan binere, çi ku êdî ez ne li vir im.

Li ba lawê xwe bimîne heta ku rî li sûretê wî peyda bibe,

⁴⁴¹ h.b.b.r.311.

*piştire kê bixwaze dilê te bigihe wî, ji vê malê here.*⁴⁴²

Odysseus her dibetîya (çêbûnbarî) heyî dide li ber çavên xwe û paşê ji jina xwe re yek bi yek dibêje. Odysseus tenê li xwe nafikire herwiha li jina xwe jî difikire, ji ber ku dizane ihtimala venegerînê jî heye. Şîretên Odysseus ji jina wî ya wefadar ra belku hişk bèn xwîyanê belam bi têra xwe her tiştî dide li ber çavên xwe.

Serlehengê me di nava destanê de her çiqas bi lehengî, qahimî û hişmendîya xwe jî bê zanîne jî carna liv û tevgerên wî yên dilsist û neguncaw jî hene. Odysseus di piranîya destanê de bi mêrxasîya xwe tê naskirinê lê carna ew jî li hember hin tiştan sist dibe û ne li gor mêrxasîya xwe tevdigere. Dema Odysseus li cem Kalypsoyê ye dîmenek wiha di nava van sehneyan de peyda dibe:

Lê wî Odysseusê payebilnd nedît li hundir:

Li qeraxa behrê rûniştibû û digirîya ew,

hertim li wir wî xwe diêşand

bi rondikan, îsknînan, nalînan

*lêdinerî her du çav mîna kanîyan*⁴⁴³

Odysseus ji ber ku bi dilêrî û fêlbazîya xwe tê pêşberî me, em li vir ne li gor rewşên din ê di nava destanê de wî dibînin. Ji ber ku hêvî ji hemû tiştî birîye tenê ya ku ji destê têtin girîn e.

Rondikbarandina Odysseus di nava destanê de her berdewam e. Ew dema digrî naxwaze ti kes wî bibîne û bi tena serê xwe digirî. Odysseus dema li ba Phaiakyan e dengbêjek li wir li ser şerê Troyayê distrê û vedibêje. Odysseus ji ber ku ew jî tev li vî şerrî bûye lewma bi dilşewat dibe û sehneyek wisa tê pêşberî me:

Dengbêjê navdar ev destan vedigotin wiha,

Odysseus jî bi destên xwe yên têrquwwet hewranîya xwe rakirbû

kêşabû li ser xwe, rapêçabû rûyê xwe yê delal,

şerm dikir ji Phaiakîyan, nedixwest bibînin

rondikên ku ji bin mijûlangên wî,

katê ku dengbêjê navdar navber dida newayên xwe,

rondikên xwe jê dibir serê xwe ji hewranîyê radikir

*û her du çembilên cerê digirt, tişt berpêş dikir ji Yezdanan re*⁴⁴⁴

⁴⁴² h.b.b.r.315.

⁴⁴³ h.b.b.r.86.

Odysseus di vir de jî ji ber serpêhatîyên xwe dilsist dibe û dest bi girîyê dike. Tabî dema digirî naxwaze kesên li wir wî bibîne. Sedemê nexwastina wî jî ihtimaleke mezin ev e ku heke bizanin ew çima digrî dê bizanin ku ew Odysseus e. Li gor vê prosesê hêj Oydssesus xwe ji Phaiakîyan re aşkere nekirîye. Odysseus di berdewamîya destanê de jî gelek caran digirî. Carna bi veşartî carna jî li hember hin kesan rondikan dibarîne.

Odysseus, di piranîya destanê de wekê mêrxasekî li hember her cure şerî serî hildide û li ber xwe dide. Ew ti caran xwe ji ber şerî nade alî lê belê carna jî ew sist dibe, dilsistîya wî derdikeve meydanê. Tabî ev yek ne li gor kesekî mêrxas û dilêr e. Belam carna ew jî xwe qahîm nagre. Odysseus dema bi xwazgnîyan re dikeve di nava şerî de sehneyek wiha diqewime:

*Haydê here bîne, ji bo niha bi têra xwe tîrên min hene belam,
ez bi tena serê xwe me, ditirsim ku min ji ber derî derxin⁴⁴⁵*

Di van beytan de Odysseus ne li gor mêrxasîya xwe tevdiger û dilsist dibe. Odysseusê ku war û welat talan û wêrankirî ne li gor dilêriya xwe ya her gav tevdigere. Lê her çiqas di van beytan de serê dilsistîya wî xuya be jî. Di van beytên ku em ê niha li berjêr binivîsin de, êdî dilsistî û tîrsa wî tam xwîya dike:

*Dema ku dît çek li xwe kirin rimên xwe hejandin
Çokên Odysseus sistbûn, dilê wî lê da,
dê di nava vî karî de çawa derketiba.⁴⁴⁶*

Di van beytên li jor jî xuyaye ku Odysseusê ku bi tena serê xwe êrişan dibe ser kesan vê carê sist bûye û naçar maye. Odysseus êdî di van beytan de dilsistî û tîrsa xwe tam eşkere dike. Ew ji dehan serpêhatîyên xeternak rizgar bûye lê belê ti caran li hember şerî sere xwe venegeradiye belam vê carê digel dilsistîyê, ditirse jî. Tabî ev kirinên wî li hember mêrxasîya wî kêmasî ne.

Odysseus ji bo şerekî mezin û navdarîyê diçe Troyayê lê ji bo ‘eşqeke mezin dikeve nava kul û derdên mezin. Ew ji bo evîna xwe piştî bîst salan bi rê dikeve. Belam Odysseusê evqas hezkar û dildarê yara xwe yanî Penelopeiyê ye ecêba di wan salan de çi kir, çi j’alîyê evînê ve ji serê wî borî, em ê niha berê xwe bidin vê yekê.

Odysseus, em dizanin ku bi salan digel Yezdan Kalpysoyê dimîne û bi wê re wekê mêr û jin gellek salên xwe derbas dike. Heta dema Zeus ferman dide ku divê Kalypso Odysseusî berde, ew raketina xwe ya digel Odysseus aşkere dike û çûyîna wî ji neçarî be jî naxwaze û wiha dibêje:

Bi piranî jî hûn Yezdan zikreş in, eyb e ji we ra!

⁴⁴⁴ h.b.b.r.128.

⁴⁴⁵ h.b.b.r.372.

⁴⁴⁶ h.b.b.r.373.

*Hûn wek tiştêk mezin dibînîn raketina Yezdanekî bi mirovekî re,
hezkarîyê xwe wek hevserokî ji xwe re bîne, ya rastî⁴⁴⁷*

Odysseus her çiqas evîndarê jina xwe be jî mixabin wekê li vir de bi keseka din re radikeve, radibe û wek mêr û jin bi wê ra dijî. Odysseusê evqas evîndar carna li hember evîna xwe yanî jina xwe ya delal dilsistîyê nîşan dide û wê di wê demê da jî bîr dike. Tabî dilsistîya Odysseus ne tenê bo carekê ye. Di nava destanê de hin carên din jî heman tiştan dike.

Dema ku Odysseus digel hevrêyên xwe digihije warê Yezdan Kirkeyê, Kirke hevrêyên Odysseus bi awayekî zêft dike. Piştî ku ew zêft dike Odysseus Kirkeyê têk dibe. Dema Kirke dizane ku ew kesê ku ew têkberîye û li hember sêhrên wê têkneçûye Odysseus e demildest dixwaze pêre rakeve lê Odysseus destpêkê sozê dide wê ku, ew tiştêkê bi wî neke, dema ku Kirke sozê didê Odysseus dipejirîne û wiha dibêje:

Piştî ku xilas kir soza xwe, ez derketime li ser nivînên wê yên delal⁴⁴⁸

Odysseus li hember evîna xwe cardin dilsist dibe û digel yeka din bi rehetî, bêyî ku Penlopeiayê bifikire, radikeve. Ev kirinên Odysseusê ku ji bo evîna xwe mirin dayî li pêşberî xwe wekê tiştêkî sosret tê. Odysseus digel ku ewqas hezkar e jî lê carna jî evqas bi rehetî tolaz dibe û bi Yezdanekê re radikeve. Lê tiştê balê dikişîne li ser xwe ew e ku Odysseus ti caran bi yeka mirov re ango bi jineke ji rêzê re ranakeve. Ew bi qasî ku me tesbîtkirî digel Yezdanên jin radikeve û radibe.

Odysseus di destanê de hin caran wekê kesekî nobran û dilhişk jî tê pêşberî me. Odysseus wekê me li jor jî anî ziman, ji hevrêyên xwe ra kesekî dilrehim û dilnazik bû lê bele hin caran dilrehmîya wî vedigere dilhişkîyekê. Dema hevrêyek wî li hember wî gotinên ne li gor dilê wî jê ra dibêje, ew wiha difikire ji bo wî:

*Wî wiha got, ez jî di nava xwe de fikirîm û min biryar da,
min şûrê xwe yê stûr ê li ber piştê xwe derxistiba,
bêyî ku ez bifikirim ew lêzimê min ê nêzik e
min bi şûrê xwe bifiranda serê wî li erdê
lê belê hevrêyên min xwe avêtine min û ez zapt kirim,⁴⁴⁹*

Odysseus li van beytên li jor jî dîyar e ku carna xwe ji negirtinê jî be, kuştina hevrêyê xwe ji ber gotinekê dide ber çavên xwe û êriş dibe li ser. Odysseusê ku bi hişê xwe di nava destanê de tevdigere û li gorî hişmendîyê gavên xwe davê, carna dilsist dibe û dûrî hişmendîyê difikire û tevdigere.

⁴⁴⁷ h.b.b.r.87.

⁴⁴⁸ h.b.b.r.176.

⁴⁴⁹ h.b.b.r.179.

Odysseus dema li mala xwe ye û dadika wî ya ku ew mezin kirîye tê ku pîyê wî bişo birîna wî dibîne û pê dihese ku ev kes Odysseus e. Odysseus li hember matmayîna dadika xwe bersivêk wiha dide:

Madem te fam kir, madem Yezdanekî ev xiste dilê te

bêpejn be, bila nebîhîze di nava malê de tu kes.

Biner ji te ra bêjim, eva ku ez ê bêjim jî tê pêk bê ha:

Heke Yezdan bi destên min hemû xwazgînîyan têk bibe,

dema ku ez jinên din ên malê de bikujim

ez qet lê nanihêrim ku te şîr xwe daye min⁴⁵⁰

Odysseus carna asta dilkevîrîya xwe ewqas bilind dike ku li hember wî kî bisekine ferq nake. Bi gotinên dijwar û dilêş kesên li hember xwe dilhiştî dihêle. Li vir jî li hember dadika xwe ya salmezin wesa dike û gotinên ne li gorî mêrxasîya xwe pêk tîne. Tabî piştî ku Odysseus li hember xwazgînîyan bi ser dikeve, li rondika çavê qîzên ku digel xwazgînîyan e jî nanihêre û bi awayekî hovane wan darda dike. Ku ev yek li gorî mêrxasîya wî ne tiştêkî baş e, ew di van beşan de nobrantîya xwe derdixe li pêş.

Odysseusê bibiryar hertim hesreta evîna xwe û roja wuslatê difikire lê carna jî bereskê vê yekê tevdigere. Dema ku li qonaxa Kirkeyê de ye nêzî salekê ew hemû tiştî ji bîr dike û hew keyfa xwe dinere. Heta ku hevrêyên wî tîn û jê ra wiha dibêjin:

Be hey dîwaneo, roja fikirîna welatê te nehatîye qey,

heke di çarenûsa te de rizgarî û zivirîn hebe⁴⁵¹

Odysseusê Yezdanî digel ku ji bo vegeerê ketîye ser rîya derdkêşî û kulkişandinê jî carna ji ber zewq û sefayan vegera xwe, belkê ji bo demkî jî be ji bîr dike. Heta ku hevrêyên wî balê dikêşin û kêma jî be wî rexne dikin, paşê hay li xwe çê dibe û cardin dikeve ser rîya wuslatê û tahlûkeyan.

Odysseus dema piştî ewqas xeternakîyan vedigere Ithakeyê diçe ba şivanê mala xwe. Dema diçe li wir şivan ji wî re rêzê digre û ya ji destê wî tê bo Odysseus dike. Dema ku ew şivan nav û hewala wî jê dipirse ew wiha bersiv dide:

Ez pesnê xwe bi wê yekê didim ku ez li Girîta berbelav hatime dinê,

bavê min kesekî pîrr dewlemend bû

gelek kurrên wî hebûn li koşka wî de⁴⁵²

⁴⁵⁰ h.b.b.r.335-336.

⁴⁵¹ h.b.b.r.180.

⁴⁵² h.b.b.r.241.

Tabî axaftina Odysseus bo şivên berdewam dike û bi rehetî jê ra derewên di serê xwe de pêkanîne, vedibêje. Odysseus her çiqas di nava destanê da kesekî mêrxas û rastgo be jî carna ji bo berjewendîyên xwe bi rehetî dest bi derewan dike. Ji ber ku pir serpêhatî ji serê wî re derbas bûne lewma zaf kesan û cîyan nas dike. Bi girêdayî vê jî Odysseus bi rehetî dikare qala kesekî bike û xwe jî wekî wî kesî bide nîşandanê. Di vir de jî heman tiştî dike û ji şivanê dilsoz re xwe wekî kesekî bîyanî dide nîşandanê û li gor berjewendîyên xwe derewan jê ra dibêje.

Odysseus piştî ku di şiklê xwazokekê de tê mala xwe, xwe ji her kesî re wekî xwazok dide nîşandanê û ji wan re jî derewan bi rehetî dike. Lê tiştê balkêş ew e ku asta derewkirina Odysseus carna ji radeyê derdikeve û ji jina xwe ya bi salan re jî xwe wekî bîyanî dide nasandinê. Wexta jina wî navê wî dipirse ew wiha bersiv dide wê:

Navê min Aitohn e, ji Ideomeneus piçûktir im,

ew hem ji min mestir bû hem jî ji min hêzdartir bû.

Li wê derê min dîtibû Odysseus⁴⁵³

Odysseus ne tenê ji bo kesên bîyanî herwiha ji nêz û lêzimên xwe re jî ji bo derewkirinê rehet e. Digel ku bi salane jina xwe nedîtîye û digel wê neaxiftîye, dema jina wî tê pêşberî wî û ew bi devê xwe qala Odysseus (ango xwe) jê re dike. Ew tenê ne ji bo jina xwe û şivanî jî herwiha ji bo bavê xwe yê temenmezî jî derewan dike û xwe xelet dide nasandinê. Odysseus di nava destanê de bi rehetî li gor plan û berwejdîyên xwe derewan dike. Derewkirina wî bi me yek ji sistî û dilsistîya wî nîşan dide. Ji ber ku di piraniya destanê de ew wek kesekî mêrxas tê pêşberî me û xwe li ber ti tiştan nade li alîyekê. Belam di çend cihan de bereksê vê yekê tevdigere û bi rehetî derewan dike.

2.2. Penelopeia

Lehenga din a destanê Penelopeia ye. Penelopeia hezkirî û jina Odysseusê serlehengê destanê ye. Li gor destanê ew zewicî ne, piştî zewaca wan zarokê ji wan ra çêbûye. Hê ku zarokê wan Telemakhos berşîr e Odysseusji bo şerê Troyayê amadekarîya dike û berê xwe dide şer. Penelopeia digel zarokê xwe yê nûzayî û nûzewicîna xwe bi tenê dimîne. Nêzî bîst salan bi awayekî wefadar û ne zewicî li benda mêrê xwe wata Odysseus dimîne. Em ê niha di bin hin serenavan da analîza lehengê wê bikin.

2.2.1. Evîndarîya Wê

Em ji destanê hayedar in ku Penelopeia ji çûyîna Odysseus heta hatina wî û berdewam her hezkarîyê mêrê xwe Odysseus e û li bendê ye. Ew ji ber ewqas dijwarîyan jî ti caran dev ji mêrê xwe û evîna xwe bernade. Şev û rojan ji Odysseus re dinale û digirî. Di nava hesreteke bêhempa û êşeke giran de her kulan û azaran dibîne.

Penelopeia di piraniya sehne an jî dîyalogên ku tê pêşberî me de rondikan ji qedera xwe ya reş û Odysseus re dibarîne. Dema ku Telemakhos ji lê gerîna bavê xwe vedigere digel

⁴⁵³ h.b.b.r.326.

dîya wê çend dîyalogên wê çêdibe, yek ji wan dîyalogan de Penelopeia ji kurê xwe Telemakhos re wiha dibêje:

*Ez cardin derkevîm li qata jor Telemakhos, tu çî dibêjî,
cardin xwe dirêjî nivînên xwe bikim bi girî û girîyan,
Odysseus, dema digel Lawatreusan çû Ilyonê,
bi rondikan şil dibe ew nivîn,⁴⁵⁴*

Penelopeia piştî çûyîna Odysseus dest bi girîyan dike heta ku ew vegere li ba wê. Dilsoz e ji Odysseus re ew hertim bi xema hezkirîyê xwe ye. Ji van beytên li jor jî dîyar e Peneopeia ji ber hesreta Odysseus hertim rondikan dibarîne. Jixwe Penelopeia di nava destanê hema hema bêje di pirranîyê de çav bi şil e.

Evîndarî û hesretkêşana Penelopeiayê ji Odysseus re di piranîya destanê de jî dîyar e. Dema Odysseus dardikeve warê mirîya li wir dîya xwe dibîne. Bi dîya xwe ra daxive û kurtesohbetekê dike, li wir de dîya wê li ser jina wî Penelopeiayê wiha dibêje:

*Jina te bi tebateke mezin li malê li benda te dimîne,
di nava rojan de bi girîn û girînê xwe dike,
şevên wesa derbaz dike ku neyê serê dijmina jî,⁴⁵⁵*

Penelopeia j'alîyê gellek kesên di destanê da jixwe dilsoz û evîndarê Odysseus tê zanîn. Li vir de jî dîya Odysseus girîn û zarîn ku Penelopeia ji wî re dike vedibêje. Penelopeia bi girêdaneke mezin hez li Odysseus dike û her li benda mêrê xwe ye.

Di berdewamîya warê mirîyan de Odysseus bi Agamemnon ra jî sohbetekê dike ew jî ji bo jina wî Penelopei wiha dibêje:

*Lê ji destê jinan ji te ra mirin nayê Odysseus,
dilpak e, hizrên baş bo te dihizire
Penlopeiaya baqil û bêdeng, keça Ikarios.⁴⁵⁶*

Agamemnon ji ber ku j'alîyê jina xwe ve tê kuştinê lewma jî danberhevekê dide navbera jina xwe û Penelopeiayê da. Ew bi rehetî pesnê him evîna Penlopeiayayê ya ji Odysseus re him jî xusûsiyetên wê dide. Ango ji çavê xelkê Penelopeia keseka evîndarê Odysseus û kamil tê naskirin.

⁴⁵⁴ h.b.b.r.290.

⁴⁵⁵ h.b.b.r.191.

⁴⁵⁶ h.b.b.r.199.

2.2.2. Aqilmendîya Wê

Penelopeia her çiqas keseka evîndar, delal û sozdar jî be ewqas jî keseka aqilmend e. Ew di nava destanê da wek ne kesa ku tenê bi evîndarî û delalîya xwe herwiha bi aqilmendîya xwe jî pir tê pêşberî me. Piştî çûyîna Odysseus ew bi lawikê xwe Telemakhos re bi tenê dimîne lê belê ew heta ku kurê wê mezin jî dibe li ba kurê xwe dimîne û bi hincetan ji xwazgînîyên xwe dûr dikeve.

Penelopeia jî wekî mêrê xwe di piranîya destanê da li gor hişmendîya xwe tevdigere. Azra Erhat di destpêka pirtûkê de ji bo Penelopeiyê wiha dibêje: *Jina Odysseus Penelopeia, ew kes e ku Odysseus ew gihandîye, afirandîye.*⁴⁵⁷ Wekî gotina Erhatê Penelopeia jî di destanê da piştî Odysseus ya ku herî zêde bi hişê xwe tevdigere ew e. Jixwe ne wesa bûya bi salan bi hinceta dûrîna kifnê xwezûrê xwe xwazgînîyên xwe mijûl nedikir. Di destanê de jî dema mesele li ser Penelopeia û ev kiryara wê û mijûlandina xwazgînîyan bi vê yekê zaf tê bikaranîn. Heta yek ji xwazgînîyan xapandina wê bi sitem wiha tîne ziman:

*Xortno, madem ku Odysseusê Yezdanî mir,
ez ê bigihijime di nav we de ji yekî re,
lê ji kerema xwe piçeke din li bendê rawestin,
bila biqede ev rêsi, bila ji bedilhewa neçe ev tayik,
ez kifnekê ji Laertesê egîd re dirêsim,
heke roj bê û mirin wî têk bibe,
di gora xwe da ew zilamê dewlemend bê kifn razê,
jinên Akhayî dê piştire çi ji min re bejin.
Tu nabêjî wê, ew rêsiya mezin a ku dirêsa nava rojê da
li ber çirayekê bi şev verisand.
Em xapandin wiha tam sê salan,
sala çaran, bihara borî,
jinek hat, xebera wê fêlbazîyê da me*⁴⁵⁸

Penelopeia jî wekê Odysseus hişmendîyeke xurt bi kar tîne. Li hember dijwarîyan aqilê xwe derdixe holê û ji dijwarîyan rizgar dibe. Ew bi salan xwazgînîyên xwe wiha mijûl dike û wan li dûrî xwe dike. Heta ku rojekê pê dihesin. Piştî pêhesînê ew cardin çewsandina xwe li ser Penelopeiyê zêde dikin.

⁴⁵⁷ h.b.b.r.xxvi.

⁴⁵⁸ h.b.b.r.22.

Penelopeia piştî ewqas kulkişandinên ji xwazgînîyên xwe re biryareka baqilane dide. Ew diçe tîr û kevanê Odysseus tîne û ji xwazgînîyên xwe re wiha dibêje:

*Gelî xwazgînîyên dilbicoş, niha guh bidin min,
ku hûn, her roja Xudê hûn ji bo xwarinê êrîştî vê malê dikin,
çimkî bi salan e malxwê malê li xerîbistanê ye,
ev ji kiryarên we re tekane hinceta we ye,
bi min ra zewac, ji bo ku bibim jin ji we re.
Madem weha gelî xwazgînîyan ha ji we re pêşbazîyek,
ez datînim li ber we kevana mezin a Odysseusê Yezdanî,
kê bi destên xwe bi hêsanî vegire vê kevanê
û tîrê kê di nava diwazde biviran de derbaz bike
ez ê bigihjim wî û ji vê mala delal derkevim,
wek keçeke xama hatim, di nava bereketê de
û dê ev mal bikeve xeyalê min de⁴⁵⁹*

Penelopeia bi vê hişmendîya xwe ya pîroz listikekê dide destpêkirinê. Ew baqilane tevdigere, wekê Odysseus hertim ew jî li gor berjewendîyên xwe aqilê xwe bi awayekî tîkûz bi kar tîne. Ev listika wê dibe sedem ku xwazgînî tîk biçin û hemî bêne kuştinê. Tabî ihtimaleke mezin Penelopeia piştî ku xwazgînîyan fam kir dûrîna kifnê xwezûrê wê ji listikekê pêk tê, dest bi listikeke nû kir. Penelopeia bi vê listikê baş pê bawer e ku kesên wê derê nikarin bi ser kevin. Jixwe serneketina wan tê wateya dirêjkirina maweya bi xwazgînîyan re zewacê. Ango xwazgînî bisernekevin ew ê hineke din bi vî awayî xwazgînîyan mijûl bike.

Penelopeia wekî Odysseus ji xwe bawer e lewma jî zû biz û guh nade gotinên kesan ta ku bi rastîyê re rû bi rû bibe. Ew piştî çûyîna Odysseus êş û kulên pîrr dijwar dikêşîne lewma jî ji hatina Odysseus hertim bê hêvî ye. Ev bêhêvîbûna wê ewqas kûr e ku dema Odysseus ji listika wê ya bo xwazgînîyan de serdikeve û wan tevan jî dikuje û xwe aşkera jî dike û kesên wê derê jî Odysseus nas dike lê ew li hember vê fikre gavekê li paş dimîne û bi hişmendîya tevdigere. Odysseus li hember vê yekê dilxweş dibe tabî lê kurê wê bi hêrsane li hember ewqas xwejêdûrgirtina dayika xwe derdikeve. Penelopeia li hember hemû tiştan jî ya di serê xwe de pêk tîne û dixwaze bi bîranîneke xwe û Odysseus re wî baş biceribîne. Lewra wiha ji Odysseus re dibêje:

*Ne ez xwe di ser te ra digrim, ne jî te kêmi xwe dibînim
yê ku eccina lê xistî, êdî matmayîna min jî nema*

⁴⁵⁹ h.b.b.r.357.

*ez baş dizanim tu çawa bûyî, dema ku ji vir veqetîyayî
bi bêrên xwe yên dûvdirêj ji Ithakayê.
Dê dirêj ke li odeya nivistinê Eurykleia,
ew nivînên qahîm ên ku wî bi destên xwe çêkirine,
binecih bike wê sedra qahîm, mitêlê bavêje ser,
deyne ser ferencan, çerman, rûnivînên menewîş.⁴⁶⁰*

Penelopeia li hember Odysseusê fêlbaz lîstika xwe ya dawîn jî tîne cih, tabî Odysseus wekî her car ji vê lîstikê jî bi hêsanî bi ser dikeve. Penelopeia jî piştî serketina Odysseus tam qayil dibe ku ew mêrê wê ye. Penelopeia ji xwe tam bawer e ew nakeve di bin karîgerîya ti kesan de, li gor ya di mejûyê xwe de tevdigere. Ew mêrê xwe û bîranîn xwe yên taybet ên ku tenê ew û mêrê wê baş pê dizane, dike ceribandin ji Odysseus re. Ango Penelopeia elametekê ji mêrê xwe dixwaze ku pê baş bawer be.

2.2.3. Delalîya Wê

Penelopeia, delalîya ber dilê Odysseus. Wê bi delalîya xwe di nava destanê da deng vedaye. Piştî ku bîst sal jî li ser zewaca wê û temenê wê de jî diçe, ew hêj jî sipehî û cindî ye. Ji ber ku Odysseus çûye şerê li Troyayê ew bi temenê li malê digel zarê xwe maye. Piştî ku dem diherike û gellek kes êdî bê hêvî dibin ku wê Odysseus veneger. Lewra kuremîrên Ithakayê û yên derdorê ji Penelopeiyaya delal re dibin xwazgînî. Ew carekê evîndar bûye û evîna wê jî Odysseus e. Naxwaze ku bi yeke din ra bizewice. Lê belê kuremîrên derdorê him ji ber delalîya wê him jî ji bo pêre zewicîna wê, têne koşka wan û bi salan li wir dixwin û vedixwin. Ew ji ber ku ewqas spehî ye ji bilî zewacê kuremîrên wê derê tişteki din nafikirin.

Bêguman Penelopeia bi gelek alîyên xwe di nava destanê da cî digre lê em ê niha li ser delalîya wê ya di destanê da rawestin û nirxandinên xwe bikin. Di destanê da dema mesele tê li ser delalîya Penelopeiyê vebêjerê destanê, wê wiha teswîr dike:

*Penlopeiaya bêpêjin û baqil jî ji mezela xwe derket.
Dişibîya Artemisê yan jî dişibîya Aphroditeyê.⁴⁶¹*

Em di van beytan de delalîya Penlopeiyê dibînin lê vebêjerê destanê delalîya Penlopeiyayê û ya Yezdanên ku binavûdeng in berawird dike. Vebêjer delalîya Penlopeiyayê ewqas gewre dike ku wê jî j'alîyê delalîyê ve bi Yezdanan ra dike ye. Ev her du Yezdanên delal ên navborî em dizanin ku bi delalîya xwe deng vedane, bêguman şibandina wan asta delalîya Penlopeiyê cardin zelal dike.

Penelopeia her çiqas keseka delal jî be ew delalîya xwe li hember çûyîna mêrê xwe wekê tişteki ketûber (ji rêzê) dibîne û hetta ew ji ber çûyîna mêrê xwe li ser delalîya xwe wiha dibêje:

⁴⁶⁰ h.b.b.r.390.

⁴⁶¹ h.b.b.r.288.

*Penlopeiaya bêpêjin û baqil jî lê vegerand, got ku:
Eurynome ez dizanim ji ber hezkirina xwe ya bo min dibêjî, lê dev jê berde,
ez rûyê xwe bişom, sorayîyê li rûyê xwe jî bidim wê çi be?
Yên ku li Olymposê rûdinin delalîya min
roja ku mêrê min li keştîyên bilez siwar bû û çû, tine kirin.⁴⁶²*

Penlopeia li delalîya xwe hayedar e lê belê ji ber wefaya mêrê xwe, ew çûyîna mêrê xwe dişibîne çûyîna delalîya rûyê xwe.

Bêguman di destanê da teswîra herî baş, xweş û berfireh ya li ser Penlopeiyê Eurymakhos wiha dibêje:

*Penlopeiaya bêpêjin û baqil, keça Ikarios,
heke hemî Akhayan Argosê te biditana,
dê hêj gelek xwazgînî bihata û li mala we bi cî bûna,
dê şahî bikirana heta ku roj hilata,
çimkî tu di ser hemû jinan ra yî,
bi bejin û bal, delalî û aqilê xwe ve.⁴⁶³*

Di van beytên li berjor de em him li ser delalîya wê û him jî li ser aqiltîya wê j' alîyê kesên din ve rastî pesndayîna Penlopeiyê tîn. Ew bi delalîya xwe di nava xelkê de navdar e. Hemû kesên ku ji wê ra bûne xwazgînî vêya baş dizanin. Ji ber wê Eurymakhos bi awayekî jixwebawer li ser delalîya wê gotinên binecih dike.

2.2.4. Hin Taybetîyên Din ên Penlopeiyê

Penlopeia jî wekê mêrê xwe Odysseus di nava destanê da keseka pir bi hêl e. Piştî ku me çend alîyên wê yên zêde di destanê da cî digrin, rawestîyan. Em ê niha jî li ser alîyên din ên Penlopeiyê rawestin û nirxandinên xwe li ser taybetîyên din ê Penlopeiyê bikin.

Penlopeia digel hişmendî, evîndarî û delalîya xwe ew keseka şîretkar e jî. Dema ku Penlopeia dibîne dibe devjenîya kurê wê Telemakhos û xwazgînîyan ji Eurynomê ra wiha dibêje:

*Min dixwast ez çend gotinan ji kurê xwe ra jî bibêjim,
bila evqas tev li van merivên jirêderketî nebe,
niha dê li rûyê wî bikenin, lê dê piştra xirabîyan jê ra pêk bînin⁴⁶⁴*

⁴⁶² h.b.b.r.312.

⁴⁶³ h.b.b.r.314.

⁴⁶⁴ h.b.b.r.312.

Penelopeia wekî mêrê xwe keseka şîretbêj e. Ew talûkeya li hember kurê xwe Telemakhos dibîne lewra jî dixwaze wî li hember vê xetereyê hişyar bike. Bêguman Penelopeia bi hişmendî û têgihîştina xwe ne kêmi Odysseus e.

Ji ber ku kevanîya mala Odysseus Penelopeia ye lewra di nava mala xwe de ew keseka xwedîstatu ye. Penelopeia piştî ku dibihîze xwazgînî li hember xwazokekî (Odysseus) tiştên neqenc pêk tînin ji ber lawazbûna bêotorîteya Telemakhos hêrsdar dibe. Li hember van kirinên xwazgînîyan bertek nîşan dide û wiha sexera kurê xwe dibire:

*Mejûyê te, hişê te qet ne li cih e Telemakhos,
wexta tu zarok bûyî aqlê baştir di serê te bû,
lê niha tu mezin bûyî, tu gihayî xortanîyê,
xelk, dibêjin, lazim e ev zarokê zilamekî dilşad be,
lê ne hişê te bi kêrî tiştêkê tê, ne jî fikrên te,
bi qasî ku min bihîstîye gelek tişt li vir qewimîne:
ev bîyanî hatîye zelîlkirinê, te jî qe deng nekirîye.
Mirovekî belengaz ku xwe sipartibe koşka me
heke wiha bê ezimandinê dê çi be dawîya me?
Di nav mirovan da ev ji te ra rûreşîyek e.⁴⁶⁵*

Di nava van gotinên Penelopeiayê de şîretên binecih hene. Ew li hember kêmi-mêvandarîya lawikê xwe bi tundî wî rexne dike. Şîretan li lawik dike da ku ew di nava mala xwe de statuyekê bigre destê xwe û xwedîdeng be. Di van gotinên Penelopeiayê de hew ne şîret, gazinde û rênîşandan ji lawikê xwe ra hene herwiha dagirtina statuya di nava malê de jî cî digre. Digel ku Telemakhos gihîştîye temenekê jî nikare mala xwe bi rê ve bibe lewra jî bivênevê valahîyeke statuyê jî derdikeve li holê. Penelopeia vê valahîya statuyê dibîne û dizane ku lawikê wî nikare vê statuyê dagire lewra em vê berpîrsîyarîyê digre ser milê xwe û tam wek keybanûyekê tevdigere.

Penelopeia hertim li hember hatina Odysseus hêvîsikestî ye. Ew digel ku ji bilî Odysseus hez bi tu kesî nake û bi fêlbazî û hişmendî li hember xwazgînîyên xwe lîstikan pêk tîne jî lê ne bawer e ku dê rojekê mêrê wê vegere. Her çiqas hêvîsikestî be jî lê di piranîya destanê de di nava profileka qahîm de dimîne. Belam em wê carekê ji hêvîsiketî wêdatir di nava şîyanşiketînekê de û dilsistîyeka mezin da dibînin. Di pasajeka destanê de em lê rast tînin ku êdî şîyana Peneopeiayê sist bûye û dev ji nezewicînê berdaye. Wata dev ji Odysseus berdaye. Dema ku digel xwazokî (Odysseus) diaxive wiha jê ra dibêje:

ez ê lîstikekê bidim destpêkirinê, ewa ku pê biviran tê pêkanînê,

⁴⁶⁵ h.b.b.r.313-314.

*dema Odysseus, mîna parxanên keştîyan rêz dikir ew diwande heb,
piştra jê dûr diket, derbaz dikir tîra xwe nava hemûyan da,
ha bîsteke din ez ê xwazgîniyan têxime wê pêşbazîyê.
Di nava wan da kî ji wan bi asanî vegire kevanê
tîra xwe derbaz bike di nava wan diwanzde biviran de,
ez ê bidim li dû wî û vê koşkê biterikînim⁴⁶⁶*

Em cara pêşîn Penelopeiyê wiha dilsist dibînin. Ew di nava bîst salan de ewqas li hember zordarî, kul û keseran serî hildide lê vê carê êdî dev ji van tiştan berdaye. Ew êdî şîyana mayîna xwe û bendewarîya xwe ya qahîm sist dike û hetta zewaca digel xwazgîniyekê-ku ferq nake jê ra- jî êdî ji ber bêşîyana xwe, di xwe de dibîne.

Penelopeia digel rûnermîya xwe ew carna jî dibe keseka rûhişk. Li hember xidameka xwe bi awayekî tund radibe û ji wê ra gefan dixwe:

*Haya min ji alûdeyên te hene rûşûştîyê, dêlika bêar,
tê pê serê xwe hesabên van kirinên xwe rojekê bidî,
te dizanî hemû tişt, ji devê min b'xwe te bihîstibû,
mi gotibû ez ê digel wî bîyanîyî li sedrê hev bibînin,
ez ê mêrê xwe ji wî pirsim, bêhna min teng bû êdî.⁴⁶⁷*

Penelopeia li vê derê bi awayekî nobran digel gotinên gefxwarane ji xidama ra dilhişk dibe. Ew digel ku keseka rehm e lê carna alîyê xwe yê dilhişk jî derdixe holê.

2.3. Telemakhos

Lawikê Odysseus û Penelopeiyê Telemakhos piştî dê û bavên xwe yek ji lehengên sereke ye ku di nava destanê da tê pêşberî me. Telemakhos dema ku berdergûş e bavê wî, wî û dayika wî bi tena ser xwe dihêle û diçe şerî. Telemakhos piştî çûyîna bavê xwe bi nêzî bîst salan êdî kêr jî be kemilî ye. Tabî dema ku hay ji xwe dibe, ew di nava reşbînî û kaosekê de xwe dibîne. Piştî çûyîna bavê wî bi salan, ji ber ku kuremîrên Ithakayê û derdorê dayika wî, wek jinebî dibînin, jê ra dibin xwazgînî. Telemakhos jî di nava vê kaosê da hay ji xwe dibe. Ew neçar e ku çî bike.

Em ê li gor taybetî û alîyên Telemakhos yên di destanê da diborin, li ser wan rawestînin û analîzên xwe bikin.

⁴⁶⁶ h.b.b.r.338.

⁴⁶⁷ h.b.b.r.324.

2.3.1. Lehengîyên Wî

Telemakhos lawê Penelopeia û Odysseus, ew jî wekê dê û bavan xwe kesekî jêhatî û jîr e. Di nava destanê da ew jî bi qasî babê xwe nebe jî di nava liv û tevgerên lehengî û dilêrîyê de ye.

Telemakhos ji ber hatina xwazgînîyan di nava neçarîyekê de ye. Ew ji ber ku bi tena serê xwe nikare bi serederîyê li wan bike lewma jî mixabin rasterast digel wan nakeve şerekî. Lê ti caran jî li hember vê rewşê sertewandî nîne. Carna bi dilêrî û lehengî wiha li ber wan radibe:

*Gelî xwazgînîyên dîya min hûn zêde bi navê dikevin,
bihêlin em tama şahîyê bigrin, çima hûn diqêrin,
em xwe ji straneke dengbêjekî mezin ra bihêlin,
binêrin dengê wî mîna Yezdanekî ye.
Sipêdê em hemû li meydanê kom bin,
ez ê bi aşkera ji we ra tiştêkî li wir bêjim,
ez ê bêjim, ji vir herin, li dereke din vegirin sifreya xwe.
Bixwin diravên xwe, bangî hevdu bikin ji şahîyan ra.
Lê heke hûn bibêjin, bi me hêsantir e, kartir e,
xwarin û xilaskiriana hemû heyîyên kesekî bi tenê
şelînin wî hûn çawa bixwazin, şelînin
ez ê jî Yezdanên ku tim hene ji xwe ra bikim govan,
rojêkê bêguman dê Zeus heyfê ji we hilîne,
hûn ê tev di vê koşkê da bicehnimin,
hingê dernakeve kesek ku tola we hilîne⁴⁶⁸*

Telemakhos cara pêşîne ku bi awayekî dilêrî û lehengî li hember xwazgînîyên dîya xwe serê xwe radike. Êdî şîyana wî ya li hember wan bêaran nemaye, ew dixwaze ji koşka wî bicehnimin. Heta tenê bi serî hildanek li hember wan ra namîne û gefê li wan dixwe, wan gazî meydanê dike ku bi wan ra baxive. Ev kirinên Telemakhos bêguman karekî lehengî û dilêrî ye. Ji ber ku hem xwazgînî zaf in û ew tenê ye hem jî hemû tiştî dide ber xwe û çî tê devê wî ji xwazgînîyan ra dibêje. Ew dixwaze him otorîteya xwe- ku kuremîr e ew jî- qahîm bike him jî xwazgînîyan çavtirsandî bike.

Telemakhos piştî ku vê lehengîyê û gefxwarinê li xwazgînîyan dike, ew rojtira din li meydana Ithakayê kom dibin. Hemû aqilmend û mezin Ithakayê digel xwazgînîyan li

⁴⁶⁸ h.b.b.r.14-15.

meydanê têne ba hev. Telemakhos axaftinekê digel wan dike. Piştî axafitina xwe ya digel ehle Ithakayê biryara şopajotina bavê xwe û rêwîngîyekê de. Tabî ev rêwî dê ji wî ra çi bîne ne dîyar e. Belku jê ra bibe sedemê têkçûn an jî mirinekê jî lê ew bi lehengî vê biryarê dide û dikeve li ser rîya şopajotina bavê xwe.

Telemakhos dema li qonaxa xwe ye û bavê wî Odysseus jî tê Ithakayê- her çiqas xwazgînî nezanin jî ew kesê di şiklê xwazokan da Odysseus e- êdî dilêrîya wî ya li hember xwazgînîyan her ku diçe bilindtir dibe. Odysseus dema li qonaxa xwe ye j' aliyê xwazgînîyan ve gellek kêmtê dîtîne û li hember wî bertekê ne baş tên nîşandanê. Lê ew hemû tiştan binpê dike, guh nadê. Lê Telemakhos carna li hember xwazgînîyan jî ber van tevgerên wan bi tundî derdikeve û wiha dibêje:

Kerem ke li vir rûnê, digel zilaman vexwe meya xwe,

heke xwazgînî deng li te bikin, destê xwe li te bilind bikin

netirse, parastina te ji min ra dimîne,

ev koşk ya Odysseus e, ne ya her kesî ye ev koşk.

Hûn jî dev ji zimandirêjîyê, bi kêmxwe dîtîne berdîn,

dev ji dest bilindkirinê, şerderxistinê berdîn.⁴⁶⁹

Di nava destanê de Telemakhos berîya bavê xwe evqas bi hîdeddet li hember xwazgînîyan ranedibû, ew berîya Odysseus di nava reşbînî û naçartîyekê de bû. Belam piştî hatina bavê wî êdî ew hay ji hêza xwe dibe û li hember rûşûstîyan dengê xwe bilind dike. Bi awayekî bisteh serî meydanê ji wan ra dixwaze, gefan li wan dixwe û wan bê minnet dike. Di van beytên li jor jî Telemakhos xwazokî (Odysseus) li hember wan hovan diparêze. Êrîşa li ser wî qebûl nake û êrîşhatina li ser xwazokî wekê li ser xwe dihesibîne. Dixwaze bi dilêrî û lehengîya xwe xwazgînîyan çavtirsandî bike.

Telemakhos asta gefxwan û serîberzkirina li hember xwazgînîyan her ku diçe bilindtir dike. Telemakhos berê tinê gefên ji rêzê ji xwazgînîyan dikir lê piştî demekê wan bi mirinê tehdît dike:

Tu şukir bike ku sûida te hebû Ktesippos,

te li vî bîyanîyî nexist, wî xwe parast,

an na min ê ev rîma sertûj xista singê te,

dê hingê bavê te ji te ra ciha şahîyê şîn bikira.

Êdî ji vir şûnde ez li vir tiştên neqenc nebinim,

haya min ji hemû tiştan heye, ti tişt ji min derbaz nabe,⁴⁷⁰

⁴⁶⁹ h.b.b.r.349.

Êdî sebra Telemekhos ji wan ra nemaye, her ku diçe ev sebir dixitime. Lewma ew jî li gor vê çûyîne asta dijîtiya li hember wan xwazgînîyan bilindtir dike. Berê li hember wan tenê gotinên astnizim digot lê êdî ew digel astbilindîya gefan herwiha bi kuştina wan ji wan ra gefan dixwe.

Dema ku Odysseus û Telemekhos dest bi şerê li hember xwazgînîyan dikin, Telemekhos jî bi awayekî mêrxasane li hember wan xwazgînîyan şerr dike û li ber xwe dide. Ew jî digel bavê xwe kuştinê ji xwazgînîyan re tîne. Hetta ew di sehneyek wiha de jî cî digre:

Amphinomos jî ber bi Odysseus ve çû,
şûrê xwe yê tûj derxistibû, xwastibû wî dûrî derî bigre,
lê Telemekhos pêşî lê girt bi rima xwe ya bronz ra, ji pişt ve lêda,
bi hing û ding kete xwarê, enîya wî bi seranser li erdê ket.⁴⁷¹

Êdî ji Telemekhos ra tolvedana êş û kulên ku j' alîyê xwazgînîyan ve wî kişaye, hatîye. Telemekhos bi mêrxasî digel bavê xwe tola xwe, malên xwe û dayika xwe ji wan vedike. Ew bi tolvekirinê ra namîne herwiha berevanîya bavê xwe yê leheng jî dike. Dema ku yek ji wan xwazgînîyan bo êriş û kuştina Odysseus tê, Telemekhos digihije wî û wî li wir bi derbekê ve dike. Ew piştî kuştina xwazgînîyan jî mêrxasîya xwe didomîne. Piştî ku xizim û lêzimên xwazgînîyan pê dihesin ku, xwazgînî tev hatine kuştinê ew biryar didin ku biçin tola xwe ji Odysseus bistînin. Dema têne bo êrişê Telemekhos jî wekê bi mêrane li hember wan radiweste û di amadebaşîyê da dimîne.

2.3.2. Aqilmendîya Wî

Yek ji alîyên Telemekhos yê xurt ên di nava destanê da ber bi çav e bêguman baqilane hereket kirina wî ye. Telemekhosê kurê Odysseus wekê bavê xwe jîr û jêhatî ye. Ew jî dema dikeve tengasîyan wekê bavê xwe bi hişmendî tevdigere. Di destêpêka destanê da em dibînin ku ew bi xwazgînîyên diya xwe ra di nava devjenîyekê da ne. Antinoos him li hember wî zimandirêjîyê dike him jî ji wî dixwaze dev ji diya xwe berde û wê dûrî xwe bigre belam Telemekhos baqilane tevdigere û sehneyek wiha pêk tê:

Telemekhosê baqil lê vegerand, ji wî ra got:
Heke ew nexwaze naçe Antinoos,
ez ê wê çawa ji mala xwe biqewirînim bêje,
ya ku ez anîme dinê, mezinkirime ez ê çawa wê biqewirînim?
Bavê min kî dizane li ku deran e? Zindî ye an mirîye?
Heke ez wê bi xwe bişînime li ba Ikariosî,
ma ji min ra nabe sebeba dayîna cihêzê wê?

⁴⁷⁰ h.b.b.r.350.

⁴⁷¹ h.b.b.r.372.

*Heydê ya ku ez ê ji destê bavê wê bikşînim layekê, lê dayika min,
dê li derazînkê gazî Erinysan bike, ne'letan ji min ra bixwîne
dê Yezdan jî gelek belayan li ser min de bînin;
piştire ya ku ez ê ji mirovan jî bibînim, bînim
ne destê min de ye, ez nikarim ji wê ra bêjim here.⁴⁷²*

Telemakhos li ser hemû ihtimalên heyî, wek bavê xwe, serê xwe diêşîne. Ew li gor b'awayekî demkî nafikire û li gor wê demê tevnagere, baqilane tevdigere. Ew li hember xwazgînîyan baqilane tevdigere, him naxwaze ji dûrî dîya xwe derkeve him jî ji ber ku xwazgînî li hember wî hêzdar in ew zû bi zû wan hêrs nake.

Telemakhos piştî ku ji şopajotina bavê xwe vedigere warê xwe, rêwîyeke belengaz jî digel wî di keştîya wî de tê. Ew rêwî ji halê xwe dipirse ka çi bike, Telemakhosê baqil wiha lê vedigerîne:

*Heke demeke din bûya, kerem ke were'l cem me, mi dê gotiba,
ji bo ezimandina mêvanan ti kêmanîyên me nînin,
lê belê niha bi kêrî te nayê ew der, ez li wir nînim,
ne ti halê dîya min jî heye te biezimîne,
di qata jor de bi timî pateyan dihunîne, bi dûrî çavên xwazgînîyan.
Ez ji te ra yekî pêşnîyar bikim, here mala wî,
Eurymakhos e navê wî kurê Polybos ê ber bi çav,
Ithakeyî ji niha da bi çavê Yezdanekê li wî mêze dikin.⁴⁷³*

Telemakhos di vê rewşê da bi awayekî rastîbîn li meseleye dinêre. Ew dizane ku heke mêvanê xwe bi xwe ra bibe ew ê ji ber nexwedîtîya wî û li hember kêmdîtina xwazgînîyan bikeve şermê. Lewma baqilane tevdigere, ihtimalên heyî tîne li pêş çavên xwe û li gor wê yekê tevdigere. Ew digel rewşa xirab jî naxwaze mêvanê wî şepirze bibe lewma ji wî ra pêşnîyaran jî dike.

Telemakhos di sehneyeke din a digel dîya xwe ra, ku di wê sehneyê de li hember piçûkxistina xwazgînîyan a ji xwazokê mêvanê mala wan ra deng nedikir û dîya wî ew rexne dikir, li hember rexneyên wê bersiveke wiha jê ra dide:

*Sexerbirîna te naç zora min dayê,
ez li gor aqilê xwe û dilê xwe diramim, hemû tiştî fam dikim,*

⁴⁷² h.b.b.r.23.

⁴⁷³ h.b.b.r.268.

*êdî ne zar im, çêtî û neçêtîyê jev derdixînim,
belam her tişta ku ez difikirim ez nikarim pêk bînim,
li vê derê bi cî bûne mirovên mebestxirab
min matmayî dihêlin û dixapînin, ti kes ji min ra nabe piştgir.⁴⁷⁴*

Telemakhos li hember rexneyên dîya xwe bi hişmendî bersiv dide. Ewî hay ji hêza xwe û şîyana xwe heye. Dizane ku şerekî aniha bi xwazgînîyan ra dê bibe sedemê têkçûyîna wî lewma vê mesele û karîna xwe ji dayka xwe ra bi awayekî zelal aşkera dike. Ew bi xwe jî dibêje êdî ew ne zar e û li gor aqilê xwe tevdigere.

2.3.3. Hin Taybetîyên Din ên Telemakhos

Mîratgirê Odysseus û ronîya çavê Penelopeia, Telemakhos. Ew piştî bavê xwe ne tam kemilî be jî ya di destê wî tê dike. Him li hember xwazgînîyan di nava lehengî û aqilmendîyê de ye him jî ketîye li dû şopa mayîn an jî mirina bavê xwe. Ew hê di xortanîya xwe de rastî gellek nexweşîyan tê lê ti caran, her çiqas bikeve zorê jî, dev ji têkoşîna xwe bernade û her têdikoşe. Telemakhos di nava destana me ya qerase da bi gelek taybetî û alîyên xwe yê cihê tê pêşberî me. Em ê jî li gorî van liv û tevgerên wî, li ser lehengê wî analizên xwe bikin.

Telemakhos di destanê da her çiqas bi taybetmendîyên xwe yê baş û çê jî bê li pêşberî me, ew carna jî dûrî van taybetîyên xwe yê erênî ye. Ango bereksê van alîyên xwe yê çê, thin caran tevdigere. Dema ku dîya Telemakhos li hember gotinên dengbêjeke dilbişewat ji bo ku ew strana wî dengbêjî, Odysseus tîne li bîrê naxwaze ew dengbêj li ser strana xwe berdewam be. Tabî ev tiştekî sirtûştî ye ji ber ku Penelopeia hertim dilsotî û evîndarê Odysseus e, naxwaze cardin kul û keserên dilê wê, ji nû ve hilperin. Lê li hember vê yekê Telemakhos bertekeke wiha nîşanî Penlopeiayê dide:

*Haydê here li mala xwe, vegere li ser karûbarên xwe,
here ber xanûta xwe, li dirûnên xwe binere,
ferman li xirdamên xwe bike, bila hay ji şixûlan hebe,
axaftin aîdê mêra ye, di serî de aîdê min e,
ez im tekane malxwê vê malê.⁴⁷⁵*

Telemakhos di van beytên berjor de jî dîyar e, bi zimanekî hişk li hember dîya xwe radibe. Ew karê axaftinê wekî karê mêran dibîne û ji ber axaftina dîya xwe wê rexne dike. Tabî ev yek nobrantîya Telemakhos a li hemberî dîya xwe bi awayekî ber bi çav derdixe li meydanê. Ew bi zimanekî hişk xwe îfade dike û herwiha dixwaze xwe bide pejirandinê jî ku, ew xwedîyê wê malê ye. Ev yek dide nîşan ku otorîteyeka wî ya sist di nava malê da heye.

⁴⁷⁴ h.b.b.r.314.

⁴⁷⁵ h.b.b.r.14.

Telemakhos dema ku diçe bo lêgerîna bavê xwe ew dibe mêvanê Menelaos, dema ku li mala Menelaos sehneyek wiha diqewime:

*ev demeke ku ne dîyar e ew li ku ye,
zindî ye, mirî ye, kes nizane,
bavê wî yê kalemêr bi timî rondikan dibarîne,
herwiha lawikek wî yê piçûkok Telemakhos heye,
sebîkê wî ku li malê hiştî.
ha wiha got Menelaos,
xwasteka girînê li ba Telemakhos peyda bû.
Çawa ku Telemakhos bihîst navê bavê xwe,
dest pê kir ji palikan rondika,
çavên xwe bi hewranîya erxewanî veşart,⁴⁷⁶*

Telemakhos dilsojê bavê xwe ye. Ew bi nebûna bavekî mezin dibe, bê pişt e, bê xweyî ye û bê siparete ye. Ew tim di bîra xwe da bavê xwe vedişêre, her li ser şopa bavê xwe ye, li hember ewqas dijwarîyan bi saya fikra zindîbûna bavê xwe li ber xwe û li ber xêrnexwazan dide. Di van beytên berjor jî xwîya ye ku ew di bîranîneka Menelaos a li ser bavê wî de, bi bihîstina navê bavê xwe, rûyê xwe vedişêre û dest bi girîyê dike. Ew wekê dîya xwe di hesreta bavê xwe de ye û tim daxwaza dîtî û peydakirina bavê wî di hişên wî de heye.

Telemakhos her çiqas ji destê wî tê, li hember xwazgînîyan serê xwe radike, lê carna jî gelek dilsist dibe. Dema ku Odysseus di şiklê xwazokekê de li koşka xwe ye, Telemakhos hay jê heye ku ew, bavê wî jî, carna j'aliyê xwazgînîyan ve bi t'ede û kêmdîtî li hember wî pêk tîn. Belam li hember vê yekê Telemakhos bêdeng û pasif dimîne. Nikare otorîteya xwe nîşanî xwazgînîyan bide ta ku dîya wî li hember vê yekê rexneyan lê dike.

2.4. Lehengên Din ên Destanê

Em ê di bin vê sernavê de ji bilî karakterên sereke ên ku di destanê da diborin, li ser wan û liv û tevgerên wan bisekinin. Bêguman lehengên ku di vê dastanê da cî digrin zaf in. Ji ber wê em ê hin lehengan li gorî xwe hilibijêrin û li ser wan analîzên xwe bikin.

2.4.1. Nestor

Yek ji hevrêyên Odysseus û talankarê şerrê Troyayê Nestor e. Ew him berîya şerî Odysseus nas dike him jî digel wî di nava şerê Troyayê de digel hev li himber Troyayîyan şer dîkin. Ew piştî demekê bi sax û selametî ji şerê Troyayê vedigere belam Odysseus hê venegerîyaye. Lawikê Odysseusî, Telemakhos jî ji bo peydakirina bavê xwe dikeve dû şopa wî. Ew ji ber ku dizane bavê wî û Nestor hevrê û hevalên hev yên berê û yên şerî ne lewma

⁴⁷⁶ h.b.b.r.56-57.

berê xwe dide welatê Nestor, Pylosê. Dema Telemakhos digihije Pylosê li ba Nestor, ew li wir şahîyekê ji bo Yezdan Poseidon li dar dixin. Kesên wê derê û Nestor pêşwazîyê li Telemakhos û hevrêyên wî dikin. Pîrsêkê jî li ser kesayet û sedemê hatina wan ji wan pîrs nakin. Piştî ku di şahîyê de têr dixwin û vedixwin Nestor wiha dibêje:

Piştî ku tama şahîyê mirov bigre tê pîrsînê

ji mêvanan ka ew kî ne.

mêvanno, hûn kî ne?

Bi rêya deryayê hûn ji ku hatin?

Ji bo karekî hûn di deryayê da digerin,

an jî hûn wekê rêbirran terkedinya digerin

yên ku dev ji canê xwe berdidin û dibin bela ji xelkê re?⁴⁷⁷

Di van beytên berjor de jî mêvanperwerîya Nestor û ciwamêrîya wî bi awayekî ber bi çav xwîya dike. Ew kesekî qedirzan, mêvanperwer û dosthez e. Piştî ku bi aşkera ciwamêrîya xwe şanî Telemakhos dike. Telemakhos sedemê hatina xwe jê re dibêje û pîrsa bavê xwe dike. Nestor jî hemû serpêhatîyên xwe yê şerr û vegeerê ji Telemakhos vedibêje da ku Telemakhos li ser jîyan û peydakirina babê xwe tiştêkî bi dest bixe. Çi arîkarîya ku ji destê Nestor tê ji bo Telemakhos dike. Hetta lawek xwe bi Telemakhos re dişîne da ku ew li ser şopa peydakirina Odysseus berdewam bike. Lawikê Nestor jî wekê bavê xwe kesekî dilsoz e, hetta ku Telemakhos wî neşîne, ew li Telemakhos naçe.

2.4.2. Menelaos

Menelaos yek mîrên Yewnanistanê ye. Ew jî yek ji hevrêyê Odysseus û talankarê Troyayê ye. Menelaos jî wekê Nestor piştî çend salan vedigere welatê xwe. Em dizanin piştî Nestor, Telemakhos ji bo agahîstandina babê xwe berê xwe vê carê jî dide, li Menelaos. Çimkî Menelaos kesê herî dawîye ku wî Odysseus dîtîye.

Menelaos yek ji mîrên Yewnanistanê ye. Dema ku Telemakhos digel hevrêyên xwe digihije li ber koşka Menelaos, yek ji xulamên Menelaos tê û wiha ji Menelaos re dibêje:

Du mêvan hatin Menelaos, du egîd,

lazim e ji nesebê Zeusê bi qudret bin.

Ez bendên hespên wan yê bîlez vekim, bo min bêje,

an na ji w ara bêjim herin konê xwe li cîyekî din vegirin?

Li hember van gotinên nezan ên xulamê Menelaos, Menelaos bi hêrs lê vedigerîne:

Berê tu wiha ehmeq nebî, ey kurê Boethos,

⁴⁷⁷ h.b.b.r.37.

*çima tu wiha mîna zaran dipeyivî niha,
ez û tu, heta ku hatne vira,
ma em qet nebûn mêvan û me nanê xelkê nexwar?
Zeus bixwaze ku ev êşa me xilas bibe!
Here bendên hespên bîyanîyan veke, dê biçe,
here wan bîne, bila li vir mêvan bin.⁴⁷⁸*

Ji gotin berjor jî tê te der ku Menelaos kesekî mêvanhez û mêvanperwer e. Ew ti caran hatina mêvanekî bo mala wan li paş da venagerîne. Ji ber ku ew jî dema vegera di şerrê Troyayê de ji gellek kesan re dibe mêvan, nane gellek kesan dixwe. Ew mêvanperwerîya xwe dixwaze nîşanî kes û karên ku tê mala wî, bike. Piştî ku Telemakhos tê, Menelaos qedrê wî hîn zêdetir digre, mêvanperwerîyek baş jê re dike. Menelaos jî wekî Nestor hemû serpehatîyên xwe yên hatine serî û yên bi Odysseus re têkildare yek bi yek vedibêje ji Telemakhosî re. Menelaos piştî vegotinan jî mêvanperwerîya xwe ya bo mêvanan digel jina xwe Heleneyê didomîne. Ew gellek xelat û dîyarîyan jî bi pêşkeşî Telemakhos dike.

2.4.3. Hevrêyên Odysseus

Odysseus dema ku diçe bo şerrê Troyayê ew ne tenê ye digel hin hevrêyên xwe yên bajarê xwe Ithakeyê diçe. Hin ji wan bêguman di şerrê Troyayê de winda dike û hin ji wan jî digel Odysseus bi selamêtî dikevîne li ser rîya vegera bo warê xwe. Jixwe destana Odysseia jî li ser vegera wî ya bo li warê wî ye. Odysseus di vegeerê de heta ku digihije warê xwe gellek serborîyan derbaz dike digel hevrêyên xwe. Em ê jî niha li gorî liv û tevgerên hevrêyên Odysseus, wan analîz bikin.

Dema ku Odysseus û hevrêyên piştî talan û wêrankirina li Troyayê, ew li hin cihên din jî dest bi talankarî û têkbirina bajaran dikin. Odysseus û hevrêyên wê piştî Ilyonê tene bajarê Kikonan, li wir tarûmar dikin. Odysseus dixwaze tavil ji wir birevin û biçin lê belê hevrêyên wî ya wî nakin. Ew jî wê bûyerê wiha tîne ziman:

*Min ji hevrêyên xwe re got, zû bikin em ji vir birevin,
Lê ehmeqên mezin guh nedane gotinên min,
rûniştin zaf mey vexwarin
gelek kerîyên pez serjêkirin li ber qeraxên deryayê⁴⁷⁹*

Odysseus kesekî hişyar û hişmend e ew belayên ku dê bèn zû têdigihije, dixwaze tavil ji wir biçin lê belê hevrêyên wî guh nadidinê. Ew guhnedana hevrêyan wekî ehmeqtî dibîne û li dijî vê yekê derdikeve belam bi neçarî nikare bi wan hemûyan re serederîyê bike. Jixwe piştî guhnedana Odysseus ew ji wir bi têkçûneke mezin direvin.

⁴⁷⁸ h.b.b.r.54.

⁴⁷⁹ h.b.b.r.146.

Asta ehmeqtîya hevrêyên Odysseus di destanê de piştî her serborîyekê bilindtir dibe. Odysseus û hevrêyên wî dema ku digihijine girava Aiolos, Aiolos qedrê Odysseus û hevrêyên wî digere. Hetta arîkarîya vegeza malê jî dide wan. Odysseus digel hevrêyên xwe bi arîkarîya Aiolos ku dê bigihije welatê xwe lê mixabin cardin hevrêyên wî bi zikreşî û ehmeqtî derdikevin li ser dikê û ji xwe re û Odysseus re dibin asteng. Ew dema nêzî welêt dibin ji ber çavnebarîyê hevrêyên Odysseus, ew meşka ku bûye sedem wan bigihîne welatê wan, wê meşkê hevrêyên wî vedikin û ew cardin vedigerine di nava serencamên xirab û talûkeyan de. Berîya ku meşkê vekin jî axaftineke wiha zikreşane di nava wan hevrêyan de dibore:

Tu vê ecêbê binere, ev mêrik çawa hezkirin û rêzgirtinê ji hemû kesî dibîne,

biçe welatê kê, biçe axa kê jî!

Ji bo têrbûnê ma zaf dîyarî nestandin ji Troyayê?

Em jî bi wî re ji heman rêyan derbaz bûn, çi ket destên me?

Va ye em bi destên vala niha digihijine welêt.

Ji bo ku hevaltîyê ji wî bigre, kî dizane Aiolos çi dane wî,

haydê werin em lê binerin çi ne ev tiştana,

em lê binêrin ka di meşkê de zêr çiqas e, zîv çiqas e?⁴⁸⁰

Hevrêyên Odysseus cardin çavnebarî û bêhişîya xwe li hember Odysseus derdixin pêş. Ew him ji Odysseus re dibine bargiranîyek hem jî ji ber zikreşîya wan ew bi xwe têk diçin. Belku ji ber zikreşîya wan nebûya ew ê bigihijana welatê xwe. Belam çiqasî ku ew dûrî hişmendîya Odysseus û dûrî gotinên Odysseus hereket bikin, ewqas têk diçin.

Hevrêyên Odysseus ne tenê zikreş, çavnebar û bêhş in, ew herwiha kesên li hemberî Odysseus nankor in jî. Dema ku Odysseus hevrêyên xwe ji ajalbûnê xilas dike û cardin wan bi rîya Kirkeyê dike mirov, vedigere ba hevrêyên xwe. Odysseus dixwaze ku hevrêyên wî jî bi wî re werne koşka Kirkeyê û him zikê xwe têr bikin him jî ji ber ewqas bobelatan bi dûrî nexweşîyan, ji bo demekê jî be, dûr bikevin. Hevrêyek wî yê bi navê Eurylokhos li hember vê çûyîna digel Odysseus derdikeve û gotinên wiha nakorane bi kar tîne:

Hûn bi ku ve diçin, ey kesên bê şans, an hûn ji bo mirnê diçin?

Hûn dixwazin bo koşka Kirkeyê biçin,

li wir ewê we an bike beraz, an bike gurr, an jî bike şêr,

hûn ê bi zorê li ber derîyê wê bibin pasevan.

We ji bîra kir ku Kyklopî çi anî serm hevrêyan,

ketibûne hewşa wî li dûl Odysseusê yeman,

⁴⁸⁰ h.b.b.r.166.

*ma ne ji ber wî bû hemû hevrê mirin?*⁴⁸¹

Hesûdîya hevrêyan wekî li berjor jî dîyar e ku ast bi ast ber bi nankortîyê ve diçe. Ew digel ku qencîyên Odysseus û ehmeqtîyên xwe nabînin herwiha jî bi zikreşane û nankorane li dijî wî derdikevin. Sedemê mirina hevrêyan xwe dixine stûyê Odysseus lê belê rizgarîya ji destê wî dêwî û qencîyên Odysseus di carekê de ji bîr dikin. Li hember wan tiştên nerênî û neqenc û Odysseus ti caran dev ji hevrêyan xwe bernade. Li hember wan di nava xwedîlêderketin û berpîrsîyarîyekê de ye. Tiştên wan ên neqenc gellek caran tolare dike. Hetta gellek caran ji bo rizgarîya hevrêyan xwe û hal û rewşa wan xetere û mirinê jî dide li ber çavên xwe. Odysseus hertim li hember hevrêyan van hevrêyan bêaqil û nankor, dilbirehm e, dilsoz e û canfida ye. Jixwe di dawîyê de hevrêyan Odysseus ji ber guhnedan û soznegirîya xwe, têk diçin û tev dimirin.

Hevrêyan Odysseus her çiqas di gelemperîya destanê de di nava profileke ne baş de bin jî carna ew jî gavên baqilane û hişmedîyane davêjin. Dema ku Odysseus xwe di koşka Kirkeyê de di nava zewq û sefayê de xwe ji bîr dike, hevrêyan wî baqilane tevdigerin, banî wî dikin û wiha dibêjne:

*Dîwaneo, ma ramîna welatê te nehate hişê te,
heke di çarenûsa te de vegeer û rizgarî hebe
ji bo xanîyê te yê bandirêj û axa bav û kalan?*⁴⁸²

Di vir de tiştê balkêş ew e ku hevrêyan wî li dijî liv û tevgerên xwe yê ehmeqane hereket dikin. Ew weku her car tevnager in. Vê carê harîkarîya wan digihije Odysseus ku ew xwe di nava vê şahîyê de xwe ji bîr neke û fikirîna bo welêt, birame.

2.4.5. Welatîyên Phaiakê

Odysseus piştî bi salan dawîn rawestgeha wî ya li dûrî bajarê wî, Phaiak e. Ew piştî ku j'alyê Yezdanan ve biryara vegera wî tê dubarekirinê, ji bo welatê xwe bi rê dikeve. Tê li bajarê Phaiakê dimîne. Ew kesên li wir ji bo Odysseus kesên çawa ne, mêvanperwerî û qedirgirtina û qedirdayîna bo Odysseus çawa ne, em ê wê bibînin û li gor liv û tevgerên welatîyên Phaiakayîyan em ê wan analîz bikin.

Odysseus piştî ku digihije welatê Phaiakan, di haleke nebaş û perîşan de ye. Ew dema ku dikeve ber qeraxên Welatîyên Phaiakê, bi dengê hinek keçikan li ser xwe ve tê. Dibîne ku hinek keçik li wir in, bi naçarî û bi lavakarî ber bi wan keçikan ve diçe xwe davêje bextê keçikan. Keçik li wir ji ber rûtbûn û rewşa wî ya xirab ji tirsan direvin. Lê belê Dotmîra Phaiakan ango Nausikaa ji Odysseus natirse û li wir bi wêrekane dimîne. Odysseus xwe davêje bextê wê û pirr li ber digere da ku ew arîkarîya wî bike. Nausikaa jî wiha lê vedigerîne:

*Bîyanîyo tu qet jî naşibî, merivekî bêhiş û ehmeq.
Zeusê ji Olymposê ye ku para şadîyê dide mirovan,*

⁴⁸¹ h.b.b.r.179.

⁴⁸² h.b.b.r.180.

rojên baş, rojên xirab ewli gor dile xwe lêk vedike.
Heke wî ev êş dabe te xwe li ber bigre,
lê madem ku tu hatî welatê me, bajarê me,
tu ne ji cilûbergan kê dimînî, ne jî ji tişteke din,
çi pêwîst be ez ê hemûyan bidim te,
ez ê bidim kesê ku naçar mayî, çi pêwîst be ji bo kesê ku lavahîyan dike.
Ez ê şanî te bidim rêya bajêr,
ez ê navê kesê ku li vir rûdinên bêjim bo te,
Phaiakî li vî bajêrî rûdinên, di vê axê de,
keça wî me ez ya Alkinoosê dilbala,
di nav Phaiakayan de deste bavê min de ye hemû hêz⁴⁸³

Nausikaa ji beytên jor jî dîyar e ku li hember kesekî bîyanî an jî Odysseus bi cesaretane radiweste, natirse û di cîyê xwe de dimîne. Ew lavakarîyên Odysseus û rewşa Odysseus digre ber çavên xwe hemû tiştan jê re dibêje. Bi diltenikî pêşwazî li halê wî dike. Jixwe piştê Nausikaa dibe sedem ku Odysseus xwe bigihîne Mîrê Phaiakayan û vegere welatê xwe. Ew di nava destanê de ji Odysseus re keseka diltenik, dilsoj û qenc e. Çi arîkarîya ji deste wê tê ji bo Odysseus dike.

Piştî rênîşandan û arîkarîyên Nausikaa, Odysseus digihije li ber koşka Mîrê Phaiakayan ango Alkinoos. Odysseus xwe demildest davêje li ber lingên Alkinoos û Keybanû Areteyê bi lavakarî arîkarîya wan dixwaze. Alkinoos bi dilrehmî Odysseusî pêşwazî dike, bêyî ku nav û sedemê hatina wî bipirse, qedrê wî digre. Piştê ku Odysseus jî zikê xwe têr dike û ser xwe ve tê, ji welatîyên xwe re wiha dibêje:

Rêberên Phaiakê, şewirmendênê wê, guhê xwe bidine min,
dilê min di singê min de çi ji min re ferman dike, ji were bêjim:
Şahî qedîya, hûn dixwazin vegezin malên xwe,
wexta ku sibe zeriqî
gazî gellek kesên ji me mestir bikin,
biezimînin em di vê koşkê de mêvanê xwe,
em qurbanên baş ji Yezdanan re bidin,
piştra jî ka em goftûgo bikin vê mesele,

⁴⁸³ h.b.b.r.108.

*dê mêvanê me bi rênîşandana me çawa vegere,
ew warê bavê xwe yê dûr,
bêyî qeda û bela, bi dilşadi,
em hêvidar in ku di rê da ew qet tengavîyan nebîne
ta ku bigihije welatê xwe.⁴⁸⁴*

Ji van gotinên Mîrê Phaiakan ango Alkinoos jî dîyar e ku ew dê li hember Odysseus tiştên baş pêk bîne. Ew çî qa Odysseus li ba wan be, ewqas qedrê wî digrin. Tu kêmanîyan jî wî re çênakin û her tişt li gorî dilê Odysseus pê tê. Hetta kesên wê derê ewqas hez bi mêvanê xwe dikin ku ji wî re, şahîyan li dar dixin. Gelê Phaiakan jî Odysseus re dîyarî tînin kêfa wî ya çûyî hertim tînin çî. Tabî Odysseus jî ji ber samîmîyeta wan, navê xwe aşkera dike ji wan re. Hemû tiştê ku hatî serê wî digel razên xwe ji wan re vedibêje. Piştî ku serpêhatîyên Odysseus diqedin, kesên Ithakeyê digel xelatan wî dibin, digihînin welatê bav û kalan. Ankû Odysseus bi arîkarîya wan kesan digihije mirazê xwe Ithakeyê.

2.4.6. Xwazgînîyên Penelopeiyê

Odysseus piştî ewqas êş û keseran vedigere welatê xwe Ithakeyê lê belê her çiqas jî rêwîtiya têrtalûke û jandar xilas bibe jî arîşeyên wî dê li Ithakeyê jî berdewam bikin. Ew dema ku vedigere welêt dibîne ku lawê malmezîna Ithakeyê û yê derdora wê, ji jina wî re bûne xwazgînî. Odysseus li hember wan baqilane tevdigere, sebra xwe tîne ber çavên xwe û dema ku dem jî tê wan yek bi yek têk dibe û dîkujê. Em ê niha li gor liv û tevgerên xwazgînîyan li ser wan analîzên xwe bikin.

Em dizanin ku piştî çûyîna Odysseus kuremîrên derdorê tînin li mala Odysseus bi çî dibin. Tekane armanca wan zewicîna digel Penelopeiyê û mal û milkê Odysseus e. Ji bo vê yekê her cure tiştên neqenc dikin, hetta kuştina Telemakhos jî didine ber çavên xwe. Xwazgînîyê bi navê Antinoos armanca xwazgînîyan di serê destanê de ji Telemakhos re wiha aşkere dikin:

*heke dayîka te wiha ji rîka xwe danekeve,
wê demê divê tişteke bizanibe:
em ê mal û milkê te hemîyê bixwin û xilas bikin.
Heke dev ji aqilnîşandana Yezdanan bernede,
belku ji wê ra navdarîyeke mezin peyda bibe, lê
tê jî bibînî ka dewlemendîyek çawa tine dibe.
Vê bizane ku, heta ku dîya te digel Akhayekê nezewice
em ne vedigerin li ser karê xwe, ne jî çîyek din.⁴⁸⁵*

⁴⁸⁴ h.b.b.r.119.

Ew sedemên hatina xwe û wêrankirina malê Odysseus wiha tînin ziman. Serkêşê xwazgînîyan Antinoos e. Ew di nava destanê de kesekî ne nab û xêrnexwaze. Dema ku Odysseus di şiklê xwazokekê de vedigere koşka xwe, di serî de Antinoos piştê jî yê din tev bi awayekî dijminane û zikreşanane li hember Odysseus an jî wî xwazokî tevdigerin. Carna tê ku li dilhişkîya xwe li hember wî xwazokî bi lêdan û heqaretan jî derdixine li pêş. Xwazok dema ku xwazoktîyê dike, Antinoos derbekê li milê wî xwazokê belengaz dixê û piştê jî wiha ji wî re gefan dixwe:

*Nanê xwe bixwe û bêdeng rûnê bîyanîyo, yan jî ji vir lêxe û here,
an jî ji ber van gotinên xwe ji van xortan bitirse,
bila ji dest û pîyên te negrin û te ji vê malê dernexin
bila çermê te ji serî heta neynîka pîyê te nerûçikînin.⁴⁸⁶*

Xwazgînîyên xirabxwaz û neqenc digel lêdanên xwe, dilkevir û gefxwar in jî. Ew her cure tiştên xirab pêk tînin. Mal û milkê Odysseus him bi bêminetî talan dikin him jî ji mêvanan re qet dilsoz nînin. Kesên bêrêz û rênezan in. Her cure neheqîyê dikin. Piştî ku Odysseus planekê çêdike wan yek bi yek têk dibe. Kesên xwazgînî dema ku bi xwe dihesin Odysseus dê wan bikuje, bertilê teklîfî wî dikin belam Odysseus van tiştan red dike û wan bêrêzan hemûyan dikuje.

2.4.7. Şivan

Di destanê da yek ji lehengê giring û xêrxwaz şivan e anku şivanê berazan Eumaios e. Dema ku Odysseus digihije welatê xwe Athene berê wî dide ber bi şivanî ve. Çimkî ev şivanê berazan xudan bext e û mêvanhez e. Odysseus jî wesa dike berê xwe dide çardaxa şivanî ve û ji wî ra dibe mêvan. Şivan vê mêvanîyê qebûl dike, ya ji destê wî tê jê ra dike û di nava axaftinên xwe da tim pesnê Odysseus dike. Şivan bi girêdayî Odysseus e, dilsoj û dilsozê Odysseus e. Ew digel ku nizane mêvanê hatî jê ra Odysseus e cardin jî pesnê wî dide û di nava axaftinên xwe da wiha jê wî ra dibêje:

*Dema ku yek derket û navê efendîyê min anî li ser zimanê xwe
Di wê gavê da qet qet dibe dilê min ê sînga min da⁴⁸⁷*

Şivan kesekî xêrxwaz, mêvanhez û arîkar e. Wî perwerdehîya xwe li ber destê mîrê xwe anku Odysseus dîtîye, lewma kesekî dilnizm û wefakar e. Ji çûyîna Odysseus bigre heya vegera Odysseus ya bo welatê wî, şivan tim sadiqî wî dimîne. Dema ku hemû kes tê malê mîrê wî dişelîne, xelk dibe talankarê malê wî lê şivan wesa nake. Ew dilsoz û wefadar dimîne. Hezkirina wî ne tenê li himberî Odysseus e herwiha li himberî tevahîya malbata Odysseus e. Çi tiştê ku ji destê wî tê jî bo malbata Odysseus dike, lê himberî şelandin û dizîna mal û milkê Odysseusî dilteng dibe, bertek nîşan dide û naxwaze ti kes malê wî talan bike. Odysseusî jixwe ji berê da hez li wî dikir dema ku tê welatê xwe ji bo tolvedana li hemberî

⁴⁸⁵ h.b.b.r.23.

⁴⁸⁶ h.b.b.r.302.

⁴⁸⁷ h.b.b.r.240.

malwêrankarên xwe û li hember xwazgînîyên jina xwe bawerîya xwe piştî kurê xwe bi vî şivanî tîne ji ber ku dizane wî, bext heye.

2.5. Di Destanê Da Lehengên Mîtolojîk

Em dizanin vê destana qerase xwe li ser hîmê mîtolojî, lehengên mîtolojîk û h.w.d ava kirîye. Di vê destanê de em li rastî gellek lehengên mîtolojîk tînin. Ger mirov têkilîya van kesayatan û ya takên ji rêzê yê destanê binêre, wê bibîne ku têkilîyeke rasterast digel hev hene. Takekesên di destanê de bawerîya xwe bi Yezdanên Olymposê tînin. Ew ji bo Yezdanên xwe qurbanan ser jê dîkin, li kesên bîyanî xwedî derdikevin, rîtûelên xwe pêk tînin û di nava sînorên bawerîya xwe ya bo Yezdanan da jîyana didomînin. Em ê niha li ser lehengên mîtolojî rawestînin û hilsengandinên xwe pêk bînin.

2.5.1. Yezdan Athene

Di destanê de lehenga mîtolojîk a ber bi çav, çalak û herî zêde cî digre, bêguman Athene ye. Berîya ku em derbazî li ser hilsengandina wê ya di nava destanê de bibin, divê em pêşîyê li ser wê û çêbûna wê xwe bispêrin çavkanîyan. Piştî ku Zeus serdestîya Yezdanên Olymposê pêk anî, pêşîyê bi qîza Okeanos, Xwedawend Metisê re dibin yek. Metis bi yewnankî tê wateya aqil, hiş û hêza fikirînê. Xudanwate ye ku Yezdanê Yezdana ji xwe re wek yekem hevjin wek Metis hilbijartîye lê bele piştî ducanîhiştina wê, wê digel dolê xwe dixwe nava bedena xwe ku ev yek wateyeke kûrtir dihevine: Hêza ramînê û bi arîkarîya wê bidestxistina desthilatdarîya cîhanê ji wê yekê (hêza ramînê) ne cuda ye, berhem jî bes di serê (ramîn) wê de derdikeve.⁴⁸⁸ Her wekî dîyar e, Yezdan Athene keça Zeusê bavê Yezdana ye. Em ê niha di nava destanê de li ser lehenga wê, liv û tevgerên wê û taybetmendîyên wê rawestînin û bi girêdayî teksta xwe hilsengandinên xwe pêk bînin.

Di nava destanê de dema em bala xwe bi giştî bidine vê lehengê em dibînin ku ew hertim ji bo vegere Odysseus bo Ithakeyê di nava hewildanekê de ye. Ew bes ne ji bo Odysseus herwiha ji bo heval û hogirên Odysseus jî di nava hewildan û arîkarîyan da ye. Di destpêka destanê de dema ku komecivîna Yezdanan pêk tê, ew bit ika û daxwazan ji Yezdanan û bi taybetî jî ji bavê xwe Zeus dixwaze ku, êdî dawî li dûrbûna ji welatê wî re were. Û Odysseus vegere li ba hezkar û welatê xwe. Yezdan jî, bi taybet jî Zeus vê yekê qebûl dîkin û ev jî dibe sedem ku serencama vegera Odysseus bo Ithakeyê des pê bike.

Piştî ku pejirandina vegera Odysseus j'alê Yezdanan ve tê dayînê, Athene yekser berê xwe dide Ithakayê, piştî çend gotina şîretên wiha li Telemakhosê kurê Odysseus dike:

Ji dil şîretek min heye bo te, heke tu guh bidî min,

bîst bêrikkêşan li keştîyê siwar bike,

lê bila bibe keştîyeka raxistî û xemilandî

here lê bipirse mirovê ji dûrî welatê xwe, bavê xwe,

belkî ji fanîyekî xeberek bê ji te ra,

⁴⁸⁸ Erhat, Azra, Mitoloji Sözlüğü, Weşanên Remzi Kitabevi, ç.6, Sitenbol 2015, r.65.

belkî jî tu ji gotegotekê ji Zeus hatî, guh lê bibî,

gotegot navdarîyê berbelav dike ji devekî bo deveke din, bo derên dûr⁴⁸⁹

Athene ji van beytên li jor jî dîyar e ku ew rênîşandêr, şîretdar û arîkar e. Ew dixwaze bi rêya Telemakhos nerasterast be jî arîkarî bigihije Odysseus. Telemakhos ji ber ku di koşka xwe de kesekî pasîv û bêpişt e lewma nikare tiştêkê pêk bîne. Telemakhos hew bi sebreke mezin di nava bêdengî û bêhêzîyê de ye. Lê belê bi arîkarîya şîret û rênîşandanên Atheneya ew dikeve li dû şopa bavê xwe. Him ev yek dibe sedem ku navdarîya wî belav bibe û him jî dibe sedem ku ew demekê be jî di sînorên zordest ên xwazgînîyan xilas bibe.

Piştî ku Telemakhos bi rê jî dikeve, Athene di şikl û şemalên cuda de tê arîkarîya Telemakhos ku Telemakhos bi tê ra xwe bêtecrube û fedîyok e. Ew di şiklên cuda yên mirovan de rêbertîyê ji Telemakhos re dike. Dema ku Telemakhos dikeve tengasîyê tavil jê re Athene peyda dibe û wî ji bin barên giran rizgar dike.

Athene tim ji bo malbata Odysseusî di nava hewla arîkarî û rênîşanê da ye. Penelopeia ji ber mêrê xwe hertim hêvîşikestî û çavbirondik e. Athene pirr caran ji bo dilrehetkirin û dilxweşkirinê tête li ba Penelopeiyê. Piştî çûyîna kurê Penelopeiyê, ew êdî tam ji hal dikeve û dikeve nava kovanên giran da. Athene di vê rewşa wê ya dilrencî da di şiklê keçekê de tê û jê re hêvîyên wiha dide:

Tu radizêyî Penelopeia, di nav dilekî têrxemgînî da?

Yezdanên dilşad li girîna te ne razî ne, li xemgînîya te,

dê bi sax û silametî vegere lawikê te

li hember Yezdanan li te çu guneh nîn.⁴⁹⁰

Athene her çiqas xêrxwazîya Odysseus bixwaze Poseidon ewqas xêrnexwazîya Odysseus dixwaze. Poseidon ji bo Odysseus negihije warê xwe çî ji destê wî tê dike. Lê belê li hember vê yekê Athene bêdeng namîne û rêyên arîkarî ji Odysseus re digere. Piştî ku Odysseus ji cem Kaypsoyê diçe û berê xwe dide behrê, Poseidon wî di nava avê de zeft dike û ji bo kuştin û têkbirinê bi avê re êrîşan dibe li ser wî. Belam Athene îtidalîyê dixwe dilê Odysseus û wî ji mirinê rizgar dike.

Odysseus piştî arîkarîya Nausikaayê, ku bi rêya Atheneyê ev yek pêk tê, berê Odysseus dide Phaiakê. Athene cardin di şiklê keçeke piçûk da tê arîkarîya Odysseusî û wiha jê re şîretan dide:

Were mêvano, ez bi nîşanî te bidim mala ku tu lê digerî,

Pirr li nêzî mala bavê min ê tekûz e.

Qet deng neke û bike li dû min,

⁴⁸⁹ h.b.b.r.11-12.

⁴⁹⁰ h.b.b.r.80.

*li rûyê tu kesî nenêre, nebe ku pirsekê bikî,
li vir bîyanî bi çaveke nerênî têne dîtinê,
ji bo kesên ji derve tên rûgeş nînin⁴⁹¹*

Athene bi şîret û rênîşandanan Odysseusê di nava tengavîyan da xilas dike. Ew dibe sedem ku heta Odysseus bi sax û silametî bigihije li koşka Alkinoos. Jixwe heta ku Odysseus digihije li ber koşkê jî Athene li bal e. Piştî ku têne li ber derîyê koşkê jî Athene cardin şîretan lê dike û ber wî dide li ba Arete û Alkinoos. Bi xêra Atheneyê Odysseus li wir jî baş tê ezimandinê.

Odysseus hay jê heye ku Athene arîkarîyê dide wî. Lewma dema ku di şikefta Kyklop da asê maye ji neçarîya nizane dê çê bike û daxwaz û hêvîyên wiha ji Atheneyê dixwaze:

*Ez li wir behetî mabûm, difikirîm û li bendê bûm,
xwezî min tola xwe rakira, min digot, tolek tenê, ma dê çi be,
xwezî bi cî bianîya, min digot, Atheneyê ev xwasteka min!*

Odysseus dizane xilaskera wî Athene ye lewma jî arîkarî, xwastek û daxwazan piranî ji wê dixwaze. Jixwe Athene jî çi ji destê wê tê ji bo Odysseus dike.

Athene di nava destanê de piranî di şikl û şemalê kesayetên cihê de tê tana hezkirîyên xwe, bi taybetî jî ji bo Odysseusî. Dema tê arîkarîyê jî qet nabêje ku ew kê ye. Lê belê di dereke destanê de xwe ji Odysseus ra aşkera dike û wiha jê re dibêje:

*Te hê qîza Zeus nas nekir, Pallas Athene,
ez ku min tu hemî zehmetîyan parastîye,
ez ku bûme sedem hemû Phaiakî ji te ra bibin dost?
Va ye ez hatim, digel te ji bo gerîna fikreka veşartinê
ku bi şîretên min û fermana min ra malên dayîn te,
ew tiştên ku Phaiakên biesil dabûn te, dema tu vegeryayî bo malê.
Herwiha ji te ra bêjim çi derd amade kirine
di xanîyê te yê delal de, qedera te,
hê tu dê zaf li ber zehmetîyan bidî, zaf zehmetîyan,
tu dê tine jî tiştêkê nebêjî ti kesî,
ne ji bo jinekê, ne ji bo mêrekê, ne tiştêkê,*

⁴⁹¹ h.b.b.r.114.

*piştî evqas zehmetîyan veqerîna bo welatê xwe, nebêjî,
çi bê serê te tu dê bi bêdeng çavên xwe jê re bigrî,
tu yê li hember zordariyên mirovan serê biçemîni.⁴⁹²*

Athene xwe bi aşkerakirinê re tenê nahêle, herwiha li wî bîr tîne ku, wê her cure arîkarî daye wî. Ew bûye sedem ku Phaiakî jê re mêvandarîyê bikin, wî xelat bikin û rê li ber vegera wî ya bo welatê wî vekin. Piştî ku van tiştan tîne bîra Odysseus cardin, nexşerêyeke têrşîretane datîne li hemberî wî. Ew him bi şîretan Odysseus diparêze û him jî malê Odysseus. Piştîre bi şîretan jê dixwaze ku ew li hember her cure neheqîyan bêdeng û bêpêjn bimîne.

Athene tenê bi gotinan jê re nabe arîkar herwiha ew wî di şeran de li hember dijminên wî hêzdar dide xuyanîkirinê. Hêzê dide wî, cisaretê dixê dilê wî. Dema ku Odysseus di şerê kuştina xwazgînîyan sist dibe û ber bi têkçûnê ve diçe, Athene lê peyda dibe, cisaretê dixê dilê wî û bi van gotinan asta hêza wî bilind dike:

*Ne ew hêz li cem te maye Odysseus ne jî ew dilêrî,
ma ne tu bûyî li hember Troyîyan te neh salan şer kir
ji bo Heleneya bieslin, bêyî rawestan
ma tu nebûyî te di nava tevlihevîyan de zaf mirov kuştin,
ma ne bi şîretên te hatibû sitandinê kûçeyên delal yên bajarê Priamos?
Va ye êdî tu vegeryayî, tu gihayî mala xwe û tiştên xwe,
heta ku tu li himber wan li ber xwe bidî, bereks tu hember wan bi girîn û zarîn
î.
Haydê dosto, derbazî alîyê min bibe û binêr,
lawê Alkimos Mentor çawa dizane, binêre,
di nava zilamên dijmin de çawa deynê qencîyên xwe dide⁴⁹³*

Athene ji berytên li jor jî dîyar e naxwaze Odysseus têk biçê, ew heta serkeftina Odysseus li pişt wî ye. Dema ku Odysseus sist dibe tê arîkarîya wî, cisaretê dixê dilê wî, hêzê dide mil û lingên wî, xîretê dixê nava wî. Piştî cisaretkirina Odysseus, êdî ew jî xwe tam bihêz dibîne û wan têk dibe. Tola xwe bi rêya arîkarîyên Atheneyê ji xwazgînîyên rûreş distîne.

Dema mirov bi giştî destanê dinêre dibîne ku Athene hertim ji bo Odysseusî di nava hewla arîkarîyê de ye, ew ti caran naxwaze Odysseus an têk here an jî bikeve tengasîyan. Hertim di tengavîyên wî de jê re dibe sedemê xilasîya bûyerên xirab. Baş e ew çima arîkarîyê

⁴⁹² h.b.b.r.230.

⁴⁹³ h.b.b.r.376.

hertim dide Odysseus, çima wî ji dijminan diparêze, çima evqas ji wî re evqas xêrxwaz e? Bersiva van pirsan ji deve Atheneyê wiha, di nava destanê da, dertên:

Timî fikirîneke wiha şikbar di dilê te da heye!

Ji ber vê ez te wiha xemgîn nahêlim,

çimkî ti têgihîştî û fambar û hişmend î⁴⁹⁴

Ji ber ku Athene tim li pişt kesên wek xwe yên fambar e lewma jî Odysseus jî dikeve nava vê torê, hertim wî diparêze. Odysseus tam li gor kirîtkên Atheneyê ne, fambar, têgihîştî ye, ti caran bêyî ramînê gavekê navêje û hertim fikrek wî heye. Ji ber van tiştan Athene hertim arîkarîyê dide wî û jê re dibêje ew ê hertim wî biparêze jî.

2.5.2. Yezdan Poseidon

Di destanê de yek ji lehengê sereke yê destanê Yezdan Poseidon e. Dema em li destanê dinêrin em dibînin ku bi awayekî giştî, Poseidon li hember Odysseus e. Ew him naxwaze Odysseus vegere warê xwe him jî ji bo têkbirina wî, çî tiştê ji destê wî têtin dike. Di nava Yezdanên Olymposê de yê ku behrê dinimîne û serdestê tekane yê behrê Poseidon, di destanên Homeros de wek Poseidaon tê zanînê: Ev navê ji Poti-danê darijtîye heke em vî navî bidine li ber zimanên din ên Hînt-Awropî, tê wateya ‘ sedestê behrê’. Di Theohoniya Hesiodos de Poseidon, wek kurê Kronos û Rhelayê tê nîşandanê. Kronos mîna zarên xwe yên din jî dema ku Poseidon çê dibe, wî jî demildest dadiqurtîne. Piştî Zeus bi arîkarîya dayka xwe Rheiyê bavê xwe revand, ew bir û birayên xwe bi wî da vereşandinê. Piştî jî wê vereşandinê serdestîya behran da Poseidon. Poseidon piştî bi Amphitriteyê ra dizewice û Tritonê hildiberîne. Di destana da bernavkê ku ji Poseidon ra tê dayînê ‘Enosigaios’ e anko yê ku erdî dihejîne, diricifîne. Poseidon bi şeneya sêserî ne tenê behrê dinepixîne û serobin dike, herwiha ew axa ku dorpêç kirîye jî dinepixîne. Yezdanekî hêzdar e, li hember Zeus jî paşgav nîne.⁴⁹⁵

Di destanê de Odysseus hertim bi hêvîyeke mezin dixwaze vegere welatê xwe belam bi timî arîşe rûberî wî dibin û ji çûyîna wî re dibin asteng. Bêguman astengê herî mezin yê li hemberî Odysseus, Yezdan Poseidon e. Ew ti caran naxwaze Odysseus bi sax û silametî vegere warê xwe. Di her têkçûneka Odysseus de bi axlebe tesîrek wî heye. Di destpêka destanê de dema vebêjerê destanê qala hin tiştan dike, rewşa Odysseus û nehiştinên Poseidon wiha tîne ziman:

Lê belê Yezdan tev wê rojê jê ra dilsoj bûn,

tenê Poseidon hebû ku dilê wî jê ra nedima,

zaf diqehirî ji ber Odysseusê Yezdanî,

heta ku ew bigihîştî warê xwe dê biqehirîya⁴⁹⁶

⁴⁹⁴ h.b.b.r.231.

⁴⁹⁵ b.n, Mitoloji Sözlüğü, r.251-252.

⁴⁹⁶ h.b.b.r.3-4.

Em hêj ji destpêka destanê serwext dibin ku qehrîneka Poseidon li hemberî Odysseus heye. Ew qehrîna wî heta ku Odysseus bigihije warê bavê xwe dê berdewam bike.

Piştî ku Yezdanên Olymposê, Poseidon ne tê da, biryar didin ku bila êdî Odysseus vegere welatê xwe, Poseidon dereng be jî ji vê biryargirtina wan dihesê. Dema ku ew ji welatê Rûşewitîyan vedigere bûyerê dibîne ku Odysseus nêzî welatê Phaiakan bûye, li hember vê yekê zaf hêrs dibe û wiha dibêje:

*Ji bo Odysseus biryara hatî dayîne Yezdanan
dîyar e dema ez li welatê Rûşewitîyan bûme, wan guherandîye!
Hema bêje dê bigihije axa Phaiakan,
dê li wir ji belayên ku dê bêne serê wî rizgar bibe.
Belam ez dikarim hê zaf belayan jî bînim serê wî⁴⁹⁷*

Piştî van gotinên xwe, Poseidon behrê û avê serobin dike da ku Odysseus negihije welatê Phaiakan û li wir têk biçe. Poseidon zehlçûyîna xwe ya li hember Odysseus ti caran venaşêre, hertim dixwaze ew têk biçe. Ji ber ku Yezdanekî mezine lewma jî gellek tiştên ew dixwaze bi pêk tê.

Odysseus jê hay heye ku sedemên têkçûn û dûrmayîna wî Poseidon e anko ew dizane Poseidon naxwaze ew sax û silamet bigihije welatê xwe. Piştî Odysseus bi arîkarîya Phaiakan digihije welatê xwe, Poseidon hîn hêrstir dibe û ji Zeus ra wiha dibêje:

*Êdî ez di nava Yezdanên Nemir de bab Zeus,
çawa rêzgirtinê bibînim, bêyî ku fanî rêzê ji min ra negrin,
heta ku Phaiakên ji neslê min jî rêzê ji min ra nagrin.
Dizanim Odysseus dê vegere welatê xwe,
lê piştî êşkişandîneke mezin dê vegere,
madem ku te carekê soz da û nîşana vê yekê da,
min ew ji hevgehîna wî a bo welatê wî bêpar nekir⁴⁹⁸*

Poseidon piştî ku bi derdekî giran van tiştan ji Zeus ra dibêje, piştê bi destûra Zeus Phaiakên ku Odysseus gihandibûne welatê wan, têk dibe. Baş e heta niha em dizanin ku asta hêrsdarî û qehirînin Poseidon bo Odysseus bi timê berdewam e. Divê mirov li xwe bipirse ev hêrsa bêdawîn a Poseidon bo Odysseus ji ku tê û çima vê evqas dixwaze Odysseus têk biçe? Bersiva vê pirsê me di nava beytên destanê de veşartîne. Em dizanin ku Odysseus dem adi şikefta Kyklop de asê dimîne bi hişmedîyane tevdiqere, tekane çav wî kor dike û ji nav lepên

⁴⁹⁷ h.b.b.r.92.

⁴⁹⁸ h.b.b.r.225.

wî rizgar dibe. Piştî ku rizgar dibe, wî bi gotinên xwe diazirîne. Kyklop jî destê xwe bilind dike bo dua û daxwaza têkbirina Odysseus. Ji ber ku Kyklop kurê Poseidon duayên wî diqebilîne û dest bi dijmintîya Odysseus dike. Li vir tiştê ku pirsekê di serê me de şîn dike ew e ku mirov her çiqas jî destanê jî derxe sedema dijmintîya Poseidon bo Odysseus lê cardin jî bi dilrehet nabe ku tekane sedema dijminatîyê ev be. Çima? Ji ber ku em dizanin Odysseus û hevrêyên wî xwe ji bo mêvandarîyê davêjne bextê wî dêwî belam dêw digel ku mêvandarîyê ji wî û hevrêyên wî re nake heman wisa her şev dest bi kuştin û xwarina hevrêyên wî dike. Anko mirov bi mantiqane tevbigere dê bi rehetî bikaribe bibêje ku Odysseus ne belasebeb ew dêw kor kir. Odysseus tenê ji bo parastina xwe û hevrêyên xwe ev yek kir ku bi me jî ev tişt tişteki normal e û xweparastinê pêvetir ne tişteke din e. Belam tekane sipartgeha Poseidon û ya destanê çavkorekirina Odysseus ya wî dêwî ye.

2.5.3. Yezdanên Din ên Mîtolojîk

Em ê di bin vê binbeşê de hin lehengên din ên mîtolojîk ku di nava destanê de derbas dibin, li ser wan bisekinin û hilsengandinên xwe bikin. Di bin vê binbeşê de lehengên ku em dê li ser wan û liv û tevgerên wan rawestin wiha ne: Kalypso, Kirke, Kyklop, Zeus, Hermeias, Aphrodite û Here.

2.5.3.1. Kalypso

Yek ji lehengên xwînsêrîn Kalypso di nava perdeyeke xumam da ye. Navê wê jî wesa ye: Navê wê bi yewnankî veşartin, nepeandin ya ku ji lêkera "kalypstein"ê darijtîye. Homeros ji wê re bernavka ku ji Xwedawendên herî mezin ên Olymposê re daye dide ku ew bernavk dia theaon (Xwedawenda mezin, mezina Xwedawenda) e. Herwiha jê ra dibêje ew Nymphayek e jî.⁴⁹⁹ Kalypso di nava destanê da kêman çarî digre, ew tenê di beşekê da çarî digre û di wê beşê da jî zêde axaftinên berfireh nînin.

Athene piştî ku biryara vegehrîna Odysseus digre vê biryara xwe bi Yezdanên Olymposê ra vedike û ev biryara wê tête pejirandinê. Bi fermana Zeus, Hermeias diçe, Odysseusê ku bi salan e li cem Kalypsoyê dimîne, ji Kalypsoyê ra dibêje ku lazim e ew ji cem wê biçê û berê xwe bide welatê xwe. Ji ber ku Kalypso zaf hez bi Odysseus dike û ji destanê jî em dizanin ku wî Odysseus ji mirinê filitandîye lewma li hember vê biryara Yezdanan bi hêrsdarî wiha li Hermeias vedigerîne:

Hûn Yezdan jî zaf hesûd in, heyf ji we ra!

Hûn tişteki mezin dibînin raketina Xwedawendekê digel mêrekî,

hûn naxwazin mêrikê jê hez dikim ji xwe ra bikim mêr, bi rastî?⁵⁰⁰

Ji van gotinên Kalypsoyê jî dîyar e ew naxwaze Odysseus ji cem wê biçê. Ji ber ku wê Odysseus ji xwe ra wekî mêr hesibandîye û naxwaze jê veqete. Lê li hemberî biryargirtina Yezdanan jî naçar e, hew rexnekirin ji destê wê tê. Ew jî Yezdanan bi hêrsane rexne dike. Piştê diçe li ba Odysseusê derdkêş û jê ra dibe arîkar da ku ew bikeve li ser rêya vegeha bo welatê xwe.

⁴⁹⁹ b.n, Mitoloji Sözlüğü, r.167.

⁵⁰⁰ h.b.b.r.87.

2.5.3.2. Kirke

Xwedawenda sêhrebaz Kirke ew jî mîna Kalpsoyê di nava serpêhatîyên Odysseus de roleke sereke dilîze. Tê gotin ew keça Yezdanê Tavê Helios û keça Okeanosê keça Perseis e. Lê li gor hinan jî ew keça Hekateyê ye û sêhrebazîya xwe jî ji wê girtîye.⁵⁰¹ Kirke di destanê da di serî da ji Odysseus ra û ji hevrêyên wî ra bi awayekî dijminane tevdigere lê paşê bi wan ra dibe dost û zaf arîkarîyên wê digihije Odysseus.

Dema rojekê hevrêyên Odysseus derdikevine nêçîrê berê wan dikeve koşka Kirke, Kirke hevrêyên Odysseus bi xweşî pêşwazî dike. Piştî xwarinên xweş datîne li ber wan lê di nava wan xwarinan de dermaneke sêhrewar heye, dema hevrêyên Odysseus wan xwarinan dixwin, Kirke pê şivê (çov) xwe li wan dixwe. Piştî ku li wan dixwe ew tev dibin beraz. Bi sêhrewarî wan hepis dike û wan dixwe di goma xwe da. Odysseus piştî ku vê bûyerê dibihîze, ji bo rizgarîya hevrêyên xwe berê xwe dide koşka wê. Di wê navê da Hermeias tê arîkarîya wî û ji bo têkbirina sêhra wê arîkarî dide Odysseusî. Odysseus bi rênîşandan û arîkarîyên Hermeias ra Kirkeyê têk dibe û wê mecburî arîkarîdayînê dike. Di heman demê da jî Kirke li hember Odysseus û çelengîya wî heyran dimîne û ew jî mîna Kalypso hez bi Odysseus dike.

Piştî ku Odysseus hevrêyên xwe ji berazbûnê jî xilas dike, nêzî salekê li cem Kirkeyê dimînin. Lê piştî salekê hevrêyên wî bi bîr tînin ku lazim e êdî ew vegezin bo welatê xwe. Ew jî diçe vê yekê ji Kirkeyê ra dibêje. Kirke ji bo zanîna qedera Odysseus berê wî dide warê mirîyan. Berîya ku biçe jî şîretan lê dike û tiştên ku lazim e ew bike jî yek bi yek ji wî ra dibêje.

Dema em bi giştî tîpolojîya Kirkeyê dinêrin em dibînin ku ew ji yek ji wan kesan e ku rê nîşanî Odysseus dide, şîretan li wî dike û naxwaze ew têk biçe. Odysseus jî li gor şîretên Kirkeyê bi rê ve diçe û xwe ji gellek tiştên ne baş rizgar dike. Hetta em dikarin bi rehetî bibêjin ku Odysseus bi arîkarî û şîretên Kirkeyê ji gellek tengavîyan rizgar dibe.

2.5.3.3. Kyklop

Kyklop, dêwên yek çavî û çavgirover in.⁵⁰² Di destanê da dema rêya Odysseus û hevrêyên wî digihije warê Kyklopan, li wir diçine şikefta Kyklopek yê bi navê Polyphemos û xwe davêjine bextê wî. Ew û hevrêyên xwe li benda mêvanperwerî û pêşwazîyek baş in lê belê ew dêwê har ne kesekî baş e û ne jî kesekî mêvanperwer e. Ew dema dibîne mêvan ji wî ra hatine, tavilê êrîşî wan dike. Du heb hevrêyên Odysseusî dikuje û dixwe. Odysseus û hevrêyên wî di şikefta Kyklopî da asê dimînin û rêya rizgarîyê digerin. Piştî wî dêwî serxweş dikin, Odysseus êrîş dibe ser wî û tekane çavê wî yê heyî kor dike û ji destên wî bi hevrêyên xwe ra rizgar dibe.

2.5.3.4. Zeus

Yezdanê Yezdanan, bavê Yezdanan, mezinê wan e Zeus.⁵⁰³ Di destanê da dema em li vî lehengê mîtolojîk dinêrin, em dibînin ku ew di destanê de zêde aktîv nîne. Rasterast di destanê da ew nayê beramberî me. Bêtir di dema qurbanîdayînê û boraqdayînê da navê wî zaf dibore. Di destanê da pirr caran bi sembolên xwe jî tê beramberî me ku sembolên wî, teyrê

⁵⁰¹ b.n, Mitoloji Sözlüğü, r.177.

⁵⁰² b.n, Mitoloji Sözlüğü r.186.

⁵⁰³ b.n, Mitoloji Sözlüğü r.294.

eylo ye, birûskvedana asîmanî ye û gure gura asîman e. Her wekî me di destanê de jî beşek mezin ji bo beşa mêvanperwerîyê qedand, li wir de kesên mêvanên dihewînin, mêvanhezî û mêvanperwerîya xwe dispêrin Zeus.

2.5.3.5. Hermieas

Peywira wî peyambirîya Yezdanan e û bi taybet jî peymabirê Zeus e. Hermes, ji nava Yezdanên Olymposê da yek ji wan ê ku herî rengîn û resen e.⁵⁰⁴ Ev karakterê mîtolojîk di destanê da zêde aktîv nîne û zaf cî nagre. Di destanê da carekê ji bo biryara Yezdanên bigihîne Kalypsoyê tê û cara din jî ji bo arîkarîya Odysseus tê. Ku di wê arîkarîyê da em dizanin ku ew, Odysseusê naçar li hember têkbirina sêhra Kirkeyê hişyar dike û jê ra dibe harîkar.

2.5.3.6. Aphrodite

Xwedawenda evîn û delalîyê ye.⁵⁰⁵ Ev Xwedawenda mîtolojîk di destanê da zêde aktîv cî nagre. Ji destanê em dizanin ku ew jina Hephaistos e û rojekê Hephaistos wê û Ares li ser nivînan zeft dike. Weke din zêde di destanê da xwedanrol nîne.

2.5.3.7. Here

Keça Kronos û Rheiyê ye û xwişka Zeus û Yezdanên din ên Olymposê ye. Zeus piştî parvekirina dinyayê wê ji xwe ra wekî jin digre.⁵⁰⁶ Di destanê da zêde cî nagre. Ew sembola zewacê ye.

⁵⁰⁴ b.n, Mitoloji Sözlüğü r.140.

⁵⁰⁵ b.n, Mitoloji Sözlüğü r.42.

⁵⁰⁶ b.n, Mitoloji Sözlüğü r.136.

BEŞA SÊYEM

BERAWIRDKIRINA DESTANÊN MEMÊ ALAN Û ODYSSEIA

Em ê di bin vî sernavî da li ser her du destanên ku em bi berfirehî li ser wan rawestîyane û me hilsengandinên xwe li ser wan kirine, bisekinin. Em ê di bin vî sernavî da pêşîyê cih bidin berawirdkirina naveroka destanên Memê Alan û Odysseia piştra jî em ê li ser berawirdkirina lehengên her du destanan rawestin.

1. Berawirdkirina Naveroka Destana Memê Alan û Odysseia

Di berawirdkirina naveroka destanên Memê Alan û Odysseia da em li ser hin sernavên ku me dîyar kirine rawestin. Di bin vî sernavî em wekî beşên din ên destanan li gorî rêz û sîstemekê çûyîne. Lewma di bin vî sernavî da em li ser berawirdkirina demê, berawirdkirina mekanan, berawirdkirina vebêjê, berawirdkirina zimanî –ku di bin vî binenavî da jî em ê li ser berawirdkirina şayesandinan, berawirdkirina şibandinan û berawirdkirina hin taybetmendîyên din bisekin-, berawirdkirina nirxên çandî - ku di bin vî binenavî da em li ser berawirdkirina mêvanperwerîyê, berawirdkirina qurbandayîne, berawirdkirina tradîsyonan û berawirdkirina bawerîyan sekinîne-, berawirdkirina tîpolojîya jinê, berawirdkirina tîpolojîya mêrî, berawirdkirina civakan û berawirdkirina bûyerên derasayî rawestîyane.

1.1. Berawirdkirina Demê Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di destanên cîhanî û destanên Memê Alan û Odysseia da jî dem hêmaneke giring digire. Em dizanin ku her bûyera ku rû dide di nava demekê da rû dide belam ev demê heyî bi giştî demeke xumam e. Em di her du destanan da jî li ser demên arkaîk (derasayî) û demên rasteqîn rawestîyane. Di destanan da mebesta me ji demên arkaîk ew bû ku; ew dema ku diherike heke li ser rûzemînê nebe û li mekanên derasayî be, me ew dem kiribû dema derasayî. Herwiha heke dem li ser rûzemînê rû bide û li wê derê jî kesên ji rêzê hebin me ew dem kiribû dema rasteqîn.

Di destana Memê Alan da em li ser dema kombûna qîzên perîyan rawestîyane ku li ew di mekaneke xumam da kom dibin. Li wir em lê rast tînin ku digel mekanê wan herwiha dema heyî jî xumam e. Dema qîzên perîyan kom dibin mirov nikare demeke aşkere ji wê maweya wan ya kombûnê ra bibêje. Qîzên perîyan di mekaneke xumam da kom dibin ku kombûna wan li ser serlehengê destanê rengvedanekê vedike. Ji bilî dema kombûna qîzên perîyan herwiha em li ser dema xewna Memê Alan jî rawestîyane. Di wê dere da jî em lê rast hatin ku dem wekî yê din xumam e. Di destanê da dema arkaîktî tê da derbas dibe demeke nedîyar û xumam e. Em xwe di carekê da di nava wê demê da dibînin û di nişkê da jî ew dem bi dawî dibe.

Di destana Odysseia da demên arkaîk (derasayî) zaf cih digirin û bo vê yekê mînak zaf in. Belam em li ser çend mînakên rawestîyane. Di destanê da dema kombûna Yezdanan hê di destpêka destanê da tê pêşberî me. Ew Yezdanên Olymposê kom dibin û biryarên giring digirin. Ev biryargirtina wan rengvedanê li ser serlehengê destanê vedike. Di destanê da em di

nişka ve xwe di nava kombûna van Yezdanên Olymposê da dibînin. Ji bilî kombûna Yezdanên Olymposê herwiha em li ser dema çûyîna warê mirîyan a Odysseus jî rawestîyane. Digel mekanê xumam ê heyî yê warê mirîyan herwiha dema heyî jî di nava muxlaqîyetekê da ye. Dema heyî demeke xumam e ango demeke nedîyar e. Vebêjerê destanê dema qala wan kêliyan dike di nava xumamtîyekê da ew dema diherike ji me ra vedibêje.

Di destana Memê Alan da ji bilî dema derasayî herwiha em li ser dema rasteqîn jî rawestîyane. Di destanê da bêguman dema rasteqîn ji alîyê mînak da gelekî dewlemend e. Vebêjerê destanê dema heyî aşkere nabêje û di nişka ve derbasî wê deme dibe. Di destanê da wextê heyî ne serê wê aşkera ye û ne jî dawîya wê. Di nişka ve dest pê dike û di nişka ve diqede.

Di destana Odysseia da jî demên rasteqîn bi têra xwe xwedî mînak in. Vebêjerê destanê dema heyî di carekê da radixîne pêşberî me. Em xwe di carekê da di nava dema herikî da dibînin. Vebêjer pirî caran mekan û demê xumam digire û aşkera nake. Di destanê da ji ber bikarîna teknîka flashbackê em di carekê da diçine demên rabûrdiyê û carna jî di carekê da em diçin demên dahatûyê.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da çî dema derasayî be çî jî dema rasteqîn be bi awayekî xwirt cihê xwe digire. Digel dema derasayî herwiha dema rasteqîn jî cih digire ku dema rasteqîn di her duyan da jî bêtir ji alîyê mînak ve dewlemend e. Di her du destanan da jî dema heyî aşkera nîne, vebêjerên destanan dema qala bûyerekê an jî mekanekê dikin di nava xumamtîyekê da vê yekê pêk tînin. Di destanan da her du vebêjerên destanan dema heyî zelal nayne li ber çavên me. Dema ew behsa bûyerê dikin tu caran serê demê û dawîya demê dîyar nîne.

1.2. Berawirdkirina Mekanên Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di destanên Memê Alan û Odysseia da û di hemû destanên cihanî da hebûna leheng û mekanan di nava hev da ye. Em ji destanên xwe dizanin ku her dera ku bûyerek lê diqewime illeh di mekanê dîyar an jî xumam da ev tişt pêk dihe. Di destanên Memê Alan û Odysseia da me mekan kiribûn du beş yek mekanên rastîn bûn dido mekanên derasayî bûn.

Di destana Memê Alan da mekanên arkaîk (derasayî) yên ku diborin zaf nînin. Belam ew mekanên arkaîk jî yên ku me tesbît kirine du heb in û wiha ne. Ya pêşîn cihê kombûna qîzên Padîşahê Perîyan e. Ku ev der di destanê da mixabin bi berfirehî nehatîye şayesandinê û di nava destanê da cihekî xumam e. Di destanê da cihê kombûna van perîyan xwîyaye ku ne dereke ji rêzê û rûzemînî ye. Bi qasî ku tê xuyanê ev der derekî mîtîk û derasayî ye. Di destanê da herwiha mekanê din ê derasayî (arkaîk) bêguman mekanê ku xewna Memê Alan lê dibore ye. Di destanê da ev mekanê derasayî dibe sedemê zanîna çarenûsa Memê Alanî.

Di destana Odysseia da mekanên arkaîk zaf cih digrin. Belam di destanê da du mekanên arkaîk ango mîtîk li ber çav in. Mekana pêşîn a arkaîk bêguman cih û warê Yezdanên Olymposê ye ango Olympos bi xwe ye. Ev Mekanê arkaîk di destanê da gelek caran derbas dibe. Ev mekanê arkaîk dema tê beramberî me, em dibînin ku li wir Yezdanên Antîk gelek caran civînên xwe pêk dihînin, biryarên xwe didin û hevrikîyan li wir çareser dikin. Ev mekanê mîtîk guman ne tê da derekî xumam û nihênî ye. Di destanê da mekanê din

ê arkaîk çûyîna warê mirîyan ya Odysseus e. Em dizanin ku Odysseus ji bo zanîna çarenûsa xwe berê xwe dide warê mirîyan. Warê mirîyan bi qasî ku dihê şayesandinê mekanîkî tarî û xumam e.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da hebûna mekanên arkaîk nîrxê destanan berztir û qedîmtir dike. Di her du destanan da jî ev mekan diborin û destanên me xwirttir dikin. Destana Odysseia ji ber ku di serdemeke mêjûyî da derbasî nivîsê bûye lewma arkaîkbûna xwe di gellek waran da parastîye. Destana Memê Alan li gorî ya Odysseia ji ber ku di serdemeke nêzî sedeya me derbasî nivîsê bûye lewra arkaîkbûna xwe di gellek waran da winda kirîye ango di warê arkaîkbûnê da gellek deforme bûye. Belam her çiqas destana Memê Alan di demeke nêz da jî derbasî nivîsê bibe jî cardin arkaîkbûna xwe – kêma zêde- parastîye. Di her du destanan da jî mekanên arkaîk digel hin cudahîyên xwe pirr nêzî hev in. Di destana Memê Alan qîzên Padîşahê Perîyan wekî kesayetên mîtik cih digrin. Di destana Odysseia da jî Yezdanên Olymposê wekî kesayetên mîtik cih digrin. Di destanan da em dibînin ku him mekanê kombûna qîzên Padîşahê Perîyan heye him jî mekanê kombûna Yezdanên Olymposê heye. Di destana Odysseia da ev mekan ango Olympos derekî xumam nîne derekî eşkere ye û hatîye teswîrkirinê. Belam di destana Memê Alan mekanê perîyan derekî xumam e û şayesandina wê baş zelal nîne. Di her du destanan da jî ev mekan cihên giring digrin û digel hin nuasan ev mekanên arkaîk nêzî hev in.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da mekanê xewna Memê Alan û mekanê warê mirîyan du cihên din ên arkaîk û derasayî ne. Di destana Memê Alan da Mem ji bo zanîna çarenûsa xwe wê xewnê dibîne û ji çarenûsa xwe hayedar dibe. Di destana Odysseia da jî heman wisa Odysseus ji bo zanîna çarenûsa xwe berê xwe dide warekî xumam ango warê mirîyan. Di her du destanan da hebûna van mekanan û giringîya wan zaf nêzî hev in. Ji ber ku em dizanin di van mekanan da serlehang bi çûyîna bo wan mekanan ra hay ji çarenûsa xwe dibin. Peywira van mekanan wekî hev e. Di destana Memê Alan da ev mekanê xewna Memê Alan lê dibore derekî ronî ye ango ronîdar e belam di destana Odysseia da ev mekanê warê mirîyan mekanekî tarî ye ango bêron e.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da ji bilî mekanên arkaîk herwiha mekanên rastîn jî cihêkî taybet digre. Di destanan da mekanên rastîn û teswîrkirî li gorî yê arkaîk zêdetir cih digrin û li gorî wan zelaltir in.

Di destana Memê Alan da em dizanin ku mekanên heyî bêtir mekanên bejahîyê ne belam digel vê jî em li rastî mekanên avîn jî dihên. Di destanê da mekanên rastîn zaf in belam yê ku me ji xwe ra kirine mînak ev in: behr, çem (şet), çîya, zindan û koşk (qonax, qesr).

Di destana Odysseia da mekanên rastîn li gorî yê arkaîk zaf cih digrin û serborîyên Odysseus jî bêtir li wan mekanên rastîn derbas dibin. Di destana Odysseia da mekanên rastîn ên ku me ji xwe ra kirine mînak û em li ser rawestîyane bi giştî wiha ne: behr, çem (şet), çîya, şikeft û koşk (qonax, qesr).

Di destanên Memê Alan û Odysseia da mekanên rastîn zaf diborin. Ji ber ku destana Memê Alan bêtir li bejahîyê dibore lewma mekanên aîdê bejahîyê bêtir cih digrin. Belam di destana Odysseia da ji ber ku destan li mekanên avîn dibore lewma mekanên aîdê avê bêtir

ber bi çav in. Di destana Memê Alan da em dizanin ku mekanê ku Memê Alan çêbûye mekanekî nêzî behrê ye lewma Memê Alan bi qasî ku warê xwe ye em li rastî mekanên avîn dihên. Belam dema berê xwe dide Cizîra Botan êdî ji mekanên avîn dûr dikeve û mekan dibin mekanên aidê bejahîyê. Di destana Memê Alan da mekana behrê mekanekî erênî ye û hespê Memî Bozê Rewan ji wir derdikeve. Bi qasî ku me tesbît kirîye behr wek mekan ji serleheng ra nabe mekanekî astengêr. Herçî Destana Odysseia ye bêtir li mekanên behrî dibore û hebûna mekana behrê di destanê da aktîf e. Em dizanin ku him cihê çêbûna Odysseus mekanekî behrî ye û him jî piraniya serpehatiyên wî li derdora behrê derbas dibin. Di destana Odysseia da li gorî ya Memê Alan mekanekî erênî nîne. Ji ber ku dema em li destanê meyze dikin ev mekanê behrê ji Odysseus ra pirr daran dibe sedemê astengîyan. Odysseus ji ber ku nikare ji behrê derbas bibe û bigihije war û heskirîyên xwe lewma bi salan ji mala xwe dûr dimîne.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da yek ji mekanên derbas dibe çem (şet) e. Di her du destanan da jî ev mekan ji bo serlehengên destanan mekanên astengêr in. Di destana Memê Alan da dema ku Memê Alan nêzî Cizîra Botan dibe dixwaze ji wir derbas bibe. Belam di destpêkê da nikare û ev çem jê ra dibe asteng. Di destana Odysseia da jî dema Odysseus nêzî welatê Phaiakê dibe çemek heye ku jê ra dibe asteng. Di her du destanan da jî serlehengên destanan bi arîkariya hinan ji van çeman derbas dibin. Di her du destanan da jî peywira wan çeman yek e û ji bo serlehangên wekê mekanên astengêr in.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da wek mekan çîya jî cih digrin. Di destana Memê Alan da hebûna mekana çîyayî ne mekanekî astengêr û ne jî mekanekî erênî ye ji bo serlehengî. Em dizanin ku wek mekan çîya di destana Memê Alan da bêtir di dema şayesandina bajêrê wî da derbas dibe. Belam di destana Odysseia da wek mekan çîya derekî nerênî û astengêr e ji serleheng ra. Ji ber ku em ji destanê dizanin yek ji mekanên ku Odysseus dikeve xeternakîyan çîya ye ku li wir ji aliyê dêwekî ve tê asê kirinê. Di her du destanan da mekanê çîya di peywirên jev cihê da ne. Di destana Memê Alan da mekanê çîya mekanekî astengêr û arîkar nîne belam di destana Odysseia da mekanê çîya mekanekî astengêr û nerênî ye.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da hin mekan hene ku her çiqas mekanên ji hev cuda bin jî belam peywira wan a bo serlehangên wekî hev e. Di destana Memê Alan da ev mekan zindan e, di destana Odysseia da jî ev mekan şikeft e. Di destana Memê Alan da dema ku Memê Alan di zindanê da asê dimîne ev der dibe cihê lêhûrbûna Memî. Memê Alan di vê mekanê da bi giştî jîyana xwe raçav dike û dibe kesekî ji berê cihêtir. Di destana Odysseia da Odysseus jî dema ku di şikefta Kyklopî da asê dimîne ev mekanê şikeftê dibe mekanekî cihê lêhûrbûn û başfikirîna Odysseus. Odysseus di vê mekanê da ji bo rizgarîya xwe û hevalên xwe li ser gelek tiştan hûrûkûr diponije. Di her du destanan da jî wek mekan zindan û şikeft mekanên lêhûrbûn û têrfikirîna serlehangên e û di heman peywirê da ne. Di her du destanan da jî ev mekanên heyî mekanên tarî û taristan in. Odysseus piştî lêhûrbûna xwe bi awayekî jî vî mekanê tarî j' alî bedenî û zihnî ve azad dibe. Memê Alan jî piştî lêhûrbûna bi giştî a jîyana xwe ji vî mekanî azad dibe belam ne azadîyeke rastîn lê azadîyeke zihnî û ruhî.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da mekanê dawîn koşk (qesr, qonax) e. Di destanan da hebûna wan mekanaan ji bo serlehangên cihên erênî ne. Çimkî serleheng pirî caran

di van meknan ango qonaxan da dibin mêvan û herwiha serleheng xwedî qonax in jî. Wek meknan koşk di destanan da pirr hatine şayesandinê û ji bo serlehengan di peywireke erênî da ne.

1.3. Berawirdkirina Vebêjeran Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di destanên me da bêguman hebûna vebêjeran û vegêrana wan ciheke taybet e. Her du destan jî ji aliyê dengbêjên neteweyên cuda ve hatine vegotinê. Di destanan da dema ku vebêjeran dest bi vegotina destanan kirine bêtir bi vegêrana îlahî emilandine. Di destana Odysseia da çend beş bi devê Odysseus bi xwe hatîye vegotinê ango hefsar ketîye destê vebêjerê şexsê yekem. Belam her çiqas ev yek hatibe kirin jî bêtir di bin kontrola vebêjerê şexsê sêyem da ye.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da vebêjer bi çavekî sêyem li bûyer û rûdanên heyî radixe li ber çavan. Rewşa vegêrana îlahî di destanan da cih digire ku haya vebêjerên ji serî heta dawîyê ji her tiştê heyî heye. Di destanên me da em lê rast tên ku vebêjerên heyî dema qala bûyerekê dikin bi awayekî berfireh bi her awayî qala qê bûyera heyî dikin. Di destanan da vebêjer bêtir ne karakter in ew ji derveyî karakteran in û hay ji hemû tiştî henin. Di destanan da desthilatdarî û hefsar di destê vebêjerên îlahî da ne, ew dema bûyeran vedibêjin carna di bin venêrînekê da hefsarê axaftinê didine karakteran jî. Karakter li gorî vebêjerê îlahî daxive û hemî tiştê ku vebêjer dixwaze li gorî wî vebêjerî vedibêje. Di destanan da karakter dema diaxivin jî rewşa heyî ya karakterî derûnîya wî, mekane ku ew tê da ye, rewşa derdorê hiş û binhişê wî karakterî cardin vebêjerê şexsê sêyem radixîne li ber çavên me. Ev nîşaneyên wê hindê ye ku her çiqas vebêjer hefsarê axaftinê bide karkterekê jî cardin jî kontrol û serdestîya xwe aşkera dike.

1.4. Berawirdkirina Zimanê Destanan Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di destana Memê Alan da ziman, zimanekî sade, fesîh, fambar û xwerû ye. Em ji destanê dizanin ku destana me j'aliyê strîna dengbêjan pêk hatîye. Destana Memê Alan bi awayekî kafîyeyî ango bi awayekî rîtmîk û şairane derbasî nivîsînê bûye. Ji ber ku destana Memê Alan di demeke direng da derbasî nivîsînê bûye lewra bivê nevê, kêman zêde aliyê xwe yê arkaîk wînda kirîye. Di destana me da bandora zimanên erebî û tirkî jî li ber çavan e.

Di destana Odysseia da destan aîdê dewra berê ye û di dewreke mêtîyî da derbasî nivîsê bûye. Destana Odysseia jî biwezî û kafîye ye. Di destanê da wezna ku hatîye emilandinê wezna heksametron e. Heksametron, wezna epîk ya helbesta yewnanî ya daktîlî ye û heksametron yek vekirî û didu girtî ji şeş kîteyên wezna qalibî pêk dihên.⁵⁰⁷ Destana Odysseia ji ber ku di dewreke mêtîyî da derbasî nivîsandinê bûye lewma îro jî rasterast famkirina vê destanê ne ewqasî hêsan e.

Di her du destanên me da jî ziman, bingeha destanan pêk dihîne. Di destanan da zimanekî fambar û şairane heye. Destana Odysseia berîya destana Memê Alan derbasî nivîsandinê bûye lewma zimanê destana Memê Alan hê nêzî roja me ya îroyîn e. Her du destanan jî em dizanin ku j'aliyê dengbêjên wî gelî ve hatine vegotinê. Di destanan da zimanê

⁵⁰⁷ b.n, Tarih Öncesi Ege II, r.221.

her du destanan jî bi serwayekê pêk hatîye lewma vê yekê jî zimanê destanan kirîye zimanekî rîtmîk.

1.4.1. Berawirdkirina Şayesandinan Di destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di destanên me da yek ji hêmana hevpar şayesandin ango teswîrkirin in. Di destanan da şayesandin cihekî giring digre û lewma di van destanan da jî cihekî qewî girtîye. Di destanan da şayesandin cihê heyî yê ku bûyera destanê tê da diherike li ber çavên me şênbertir dike. Şayesandin, hissîyatek wesa li ba mirovî peyda dike ku dema xwînerê destanê wan şayesandinan texeyyul dike wekî ku li wir be, xwe hîs dike.

Di destana Memê Alan da bêhtir şayesandinên ku me ji xwe ra kirine mînak wiha ne: Şayesandina bajarê Mixribê, teswîra rûbarekî, teswîra dema ku Memê Alan li ber derîyê Celalîyan peya dibe, teswîra dema ku Zîna Zêdan xidama xwe Rihanê dişîne bo avê, teswîra çûyîna Memê Alan bo ser Kanîya Qestelê, teswîra hevdîtina Memê Alan û Zîna Zêdan ya li ser Kanîya Qestelê, teswîra lîstoka şetrencê û hwd. Di van teswîran da em dibînin ku ev teswîr tev di derdorên vekirî da pêk hatine. Ango dema ku dengbêjê ev bûyerên heyî teswîr kirine teswîrên wî tev ne di dereke tarî û girtî da lê bêtir di derên vekirî û derdorfihe da hatine teswîrkirinê. Di destanê da bêguman şayesandinên di cihên girtî da jî cih digrin û di wan cihan da ya herî berbiçav asêbûna Memê Alan ya di zindanê da ye.

Di destana Odysseia da teswîrkirinên ku me ji xwe ra wekî mînak amaje pê kirine wiha ne: Teswîra banga Yezdanan an jî Musayan, teswîra derdora xwazgînîyan, teswîra jinavcihan rabûna Telemakhos, teswîra di dema civîna Ithakeyîyan da derbasbûna du eyloyan, teswîra dema ku Telemakhos ji bo çûyîna li ba Menelaos dikeve rê, teswîra roja ku dê Odysseus ji cem Kalypsoyê biçe, teswîra ku Odysseus di nava avê da asê dimîne û hwd. Di van teswîran da jî dîyar e ku teswîrên di vê destanê da bêtir li cihên dorvekirî pêk hatine. Di destanê da teswîrên di cihên teng an jî tarî da jî derbas dibin hene belam bêtir şayesandin di cihên dorvekirî da ne. Di destanê da cihên tarî an jî asê bi qasî yên dorvekirî nînin. Ji bo cihên asê û teng mînaka herî liberçav bêguman, asêbûna an jî girtîbûna Odysseus ya di şikeftê da ye.

Di her du destanên me da jî şayesandin bêtir li ser mînakên dorvekirî ne. Di her du destanan da jî şayesandinên li ser mekanên teng kêma cih digrin. Di destana Memê Alan da şayesandin li gorî a Odysseia zêde berfireh nînin. Destana Memê Alan bêtir şayesandinên wê di cihên bejayî da derbas dibe lê destana Odysseia bêtir di cihên avî da derbas dibe. Di her du destanan da jî dema ku vebêjerê destanê derekê teswîr dike di nava teswîra wî da edebîtî, xweşgotinî û şairanetî heye.

1.4.2. Berawirdkirina Şibandinan Di destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di destanên Memê Alan û Odysseia da me bi berfirehî cih daye şibandin û mînakên wê. Me di wan destanan da, di binbeşa şibandinan da, ji xwe ra hin krîtîk girtin. Li gor ku me şibandinên xwe kirine, me bêtir şibandinên xwe li gorî çar hêmanên bingehîn ên şibandinan nirxandîye. Di her du destan da jî em li ser van çar hêmanên bingehîn ên şibandinan rawestîyane: tiştên ku tê şibandinê, tiştên ku hatîye şibandinê, alîyê şibandinê, daçeka şibandinê. Herwiha dema ev hêmanên şibandinan ji bo kesan hatibe kirin jî me rêzkirinek wiha lev anîye:

yê/ ya ku tê şibandinê, yê/ ya ku hatîye şibandinê, alîyê şibandinê, daçeka şibandin. Me di her du destanên xwe da jî tesbît kirîye ku her çar hêmanên şibandinê hatine emilandinê.

Di destana Memê Alan da wekê me anîye ziman, şibandin digel her çar hêmanên xwe cih digirin. Di destanê da tiştta ku tê şibandinê an jî kesê/a ku tê şibandinê, di mînakê me yên jêgirtî da wiha ne: marê teyar, çilkên barana nîsanê, çavên ejderhayan, pêlên behran, rewşa strîyan, kew, perên darên payîzê û hwd. Di destanê da herwiha li beramberî van tiştên ku hatine şibandinê an jî kesê/a ku hatîye şibandinê jî wiha ne: bisk û gulîyên Zîna Zêdan, rondikên Memê Alan, çavê Hesên, singê Hesên, porê Hesên, Zîna Zêdan, mêr û hwd.

Di destana Odysseia da jî şibandin bi awayeke xwirt di nava destanê da cihê xwe digel her çar hêmanên xwe girtîye. Di destanê da tiştta ku tê şibandinê an jî kesê/a ku tê şibandinê, di mînakên me yên jêgirtî da wiha ne: hingîv, şêr, şêr, golik, hêşa û hwd. Di destanê da herwiha li beramber van tiştta ku hatîye şibandinê an jî kesê/a ku hatîye şibandinê wiha ne: mey, Odysseus, xewa Penelopeiyê, Hevrêyên Odysseus, keştî û hwd.

Di her du destanan da jî alîyê şibandinê cih digre ku mirov dikare li gorî alîyê tiştta ku tê şibandinê ve, li wê tiştê li gorî derbasbûna wê şîroveyên xwe bike. Digel vê di destanan da daçekên şibandinê jî cih digrin ku ew jî weha ne: mîna, weke, wekî, wesa, wiha, heman wisa û hwd.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da vebêjerê destanan ji bo ku tiştta heyî xwirtir bikin, wateya heyî siviktir û fambartir bikin serî li şibandinan daye. Di her du destanan da jî ji bo bihêzkirina wateyê tiştê an jî kesê/a zeîf ber bi tiştê hêzdar ve hatîye şibandinê. Di her du destanan da jî şibandinên li ser ajalan hene. Di destana Memê Alan da kew û marê teyar li ber çav e di destana Odysseia da ji bo şibandinê şêr, golik û hêşa li ber çav e. Herwiha em dikarin bibêjin ku di her du destanan da jî ji bilî şibandinên çar hêmanî herwesa şibandinên ku ji çar hêmanan kêmtir derbas bûne jî, hene. Di her du destanan da jî vebêjerê destanan bi têra xwe edebîtiyeka bêhempa nizilandîye nava şibandinên xwe da.

1.4.3. Berawirdkirina Hin Taybetmendîyên Din Di destanên Memê Alan û Odysseia Da

Destanên Memê Alan û Odysseia bi têra xwe destanên têr û tijî ne bi girêdayî vê yekê her du destan destanên pirhêl in. Bêguman di her du destanan da alîyên cur be cur hene. Di bin vê binbeşê da em li ser şîret, dîdaktîkî, gotinên xweş, edebîti, wecîze, gotinên qalibî (gotinên dubare) ên di her du destanan da diborin, rawestin. Em ê bêtir li gor beşên berfireh ên her du destanan yên ku bi girêdayî vê binbeşê ne, rawestin. Hilsengandin, berawirdkirin û nirxandinên me jî dê li gor vê çarçoveyê be.

Di destana Memê Alan da şîret, tembî, nesîhet an jî dîdaktîkî zaf cih digrin. Di destanê da şîretên ku derbas bûne bêtir berîya ku dê bûyerek pêk were, dihê dayînê. Di destana Memê Alan da bêtir kesên ku wek şîretbêj ev kes in: Memê Alan, Zîna Zêdan, Xocê Xidir, Qîza Beko, Êsîr, Hesên û hwd.

Di destana Odysseia da jî şîret, nesîhet, tembî û dîdaktîkî ciheke giring digre. Di destanê da şîret ji bo kesinan tê gotin ku da ku nekevîne xetereyekê. Di destana Odysseia da

bêtir kesên wekî şîretbêj derdikevine li pêşberî me ev kes in: Odysseus, Penelopeia, Yezdan Hermeias, Kirke û hwd.

Di destana Memê Alan û ya Odysseia da wekê me anîye ziman şîret ciheke giring digre. Bi qasî ku me tesbît kirîye di van her du destanan da şîret bêtir ji bo serlehengî tê kirinê. Di destanan da sedemê şîretan rênşandayînek e da ku kesê şîret lê hatî kirinê nekeve tehlûke û xetereyan. Şîret di van destanan da xwedî roleke erênî ye ku peywira wê tim bo şîyarkirinekê ye. Di her du destanan da serlehengên destanan jî carna şîretan li kesinan dikin. Mirov bi rehetî dikare bibêje ku ev her du destan jî destanên dîdaktîk in ango dixwazin tecrube ji wan were girtinê.

Di destana Memê Alan û ya Odysseia da bêguman tişta herî berbiçav zimanê wan yê edebî ye. Di her du destanan da jî gotinên xweş, edebîtî, wecîze û gotinên qalibî cih digrin. Di destanan da çi şayesandin be çi şibandin be di nava wan da bi awayekî gotinên xweş û edebî cihê xwe digrin. Vebêjerên destanan anku dengbêjên destanan gotinên ji rêzê zêde tercih nekirine wan di nava destanên xwe da bêtir rengvedana edebîtîyê daye hîskirinê. Di her du destanan da carna yar bi awayekî edebî hatîye şibandinê carna serleheng carna rewşa serlehengî û carna jî teswîr. Di her du destanan da gotinên xweş, edebî û gotinên şairane bi awayekî aktîf cih digrin. Di destanan da ev gotinên xweş û edebî bêguman di asteka bilind da hatine bikaranînê û di her duyan da jî vê yekê payeya destanan bilind kirîye.

Di destana Memê Alan û Odysseia da wecîze jî hene ku wecîze jî ji layê gelek kesan ve hatine gotinê. Kesên ku ev wecîze di nava destanan da anîye ziman bêtir kesên xudan tecrube ne. Di destana Memê Alan da me gotinên pêşîyan û biwêj jî tesbît kirin û me ew wek mînak dan belam mixabin ji ber ku destana Odysseia werger bû lewma me nekarî em wan gotinên pêşîyan û biwêjan tesbît bikin. Herwiha di her du destanan da gotinên qalibî an jî gotinên xwe pir dubare dikin hene. Di destanan Memê Alan da gotinên qalibî û dubare bêtir li ser mêvanbûn an jî xerîbîya Memî ye. Di destana Odysseia da gotinên qalibî û dubare bêtir li ser hilhatina rojê û gotinan e.

1.5. Berawirdkirina Nirxên Çandî Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Ger mirov li destanekê binere dikare tê da bibîne ku ew civaka destanê bawer bi çi dikin, ji çi ditirsin, ji bo çi sîyaneta wan heye, çi dixwin, çi vedixwin, qedrê wan bo jin û mêran çi ye, ceza, zagon, nerît, kevneşopîyên wan çi ne û hwd. Di destanên Memê Alan û Odysseia da jî em dikarin van tiştên me hîlbijartî, peyda bikin. Em ê niha li ser hin binbeşên dîyar rawestî û kêr zêde hay ji jîyan, çand, tradîsyon, bawerî, civak, qedrê jin û mêran û hwd yên kurd û yewnan bibin.

1.5.1. Berawirdkirina Mêvanperwerîyê Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Bêguman di her du destanan da yek ji nirxên bilind ên destanan mêvanperwerî ye. Di her du destanan da jî di asteke bilind da mêvanperwerî heye. Em ê pêşîyê di destanan da li ser pêşwazîkirina mêvanan, sedemê hatina mêvan ji alîyê xwedîyê malê da çawa ye, asta fedakarîyê bo mêvanan û hin tiştên din rawestî. Em ê niha li ser vê nirxa giranbiha ya di her du destanan da digel hilsengandin û berawirdkirinên xwe rawestî.

Di destana Memê Alan da Memê Alan dibe mêvanê hin kesan belam bêtir û dirêj dibe mêvanê her sê Celalîyan lewma dê zîqbûna me jî pitir li ser mêvanperwerîya mala Celalîyan be. Memê Alan dema ku diçe mala Celalîyan an jî mala keseke din bo mêvanperwerîyê xwedîyên malê bêyî ku pîrsekê li wî bikin diçine pêşwazîya wî. Wî bi awayekî rêzgirtî pêşwazî dikin û sedemê hatina wî jê pîrs nakin. Di destanê da ji ber ku herî zêde li mala Celalîyan maye em dibînin ku li wir di roja sisêyan da Hesênê birayê mezin ê Celalîyan sedemê hatina wî bi girêdayî nerîteke xwe jê dipirse. Li gor ku Hesên di wir da destnîşan dike li ba kurdan hetta sê rojan li mêvanê hatî sedemê hatina wî nayê pîrskirinê. Piştî ku sê roj bi ser hatina wî da derbas dibe em dibînin ku Hesên sedemê hatina wî jê dipirse.

Di destana Odysseia da em dizanin ku Odysseus nêzî bîst salan di xerîbîyê da dimîne. Odysseus ji ber ku di demeke dirêj li xerîbîyê dimîne lewma dibe mêvanê gellek kesan. Belam em ji destanê dizanin ku çîrokên xwe serpehatîyên xwe û tiştên din bêtir li Welatê Phaiakê li mala Alkinoos derbas dike. Lewma em ê jî bêtir bala xwe bidine li ser mêvanperwerîya Alkinoos. Odysseus dema ku diçe derekê dibe mêvanê kesekê ev kes çî Alkinoos be çî keseke din be, ferq nake ti kes pêşîyê sedemê hatina wî jê napirse. Wî bi awayekî hurmetane pêşwazî dikin. Piştî ku zîkê mêvanê xwe têr dikin, digel wî hin wext derbas dikin sedemê hatina wî dipirsin. Hetta dema ku Odysseus li Welatê Phaiakê ye kesên li wir şahîyên mezin ji bo wî pêk tînin û kêfa wî xweş dikin û li ser van yekan Odysseus xwe bi xwe, xwe aşkera dike.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da jî dîyar e ku kesên xwedîyê malê ne, pêşîyê pêşwazîyêke baş û hurmetane ji bo mêvanî pêk tînin. Di her du destanan da jî pêşîyê xwedîyên malê ji mêvan sedemê hatina wî pîrs nakin. Di destana Memê Alan da şertê jêpîrsîna mêvan piştî sê rojan e. Xwedîyên malê hetta ku sê roj derbas nebin sedemê hatina wî jê napirsin piştî sê rojan jê dipirsin. Di destana Odysseia da bêtir xwedîyên malê zîkê mêvanê xwe têr dikin, kêfa wî tîne cih piştra sedemê hatina wî jê dipirsin.

Di destana Memê Alan da asteke mezin a fedakarîyê bo mêvanî heye. Memê Alan dema ku dibe mêvanê kesekî ew kes ji bo wî amade ye hemî tiştan bike. Dema dibe mêvanê kesekî kal kesê kal amade ye ku mal û milkê xwe hemîyê li ber pêyên Memê Alan raxe. Lê dema ku Memê Alan dibe mêvanê Celalîyan ev asta mêvaperwerîya ya madî him dibe manewî him dibe madî him jî dibe candfida yî. Dema ku Memê Alan dibe mêvanê Celalîyan em dibînin ku ew sondên mezin li ser şûrê xwe ji bo Memê Alan dixwin. Çekoyê Celalî dev ji heskirîya xwe ya bi salan berdide. Hesên ji bo mêvanê xwe amade ye dev ji jina xwe berde. Qeretacîn piştî ku dibîne Çeko li ber sozê dayî sist dibe bi fermana Hesên, amade ye birayê xwe bikuje. Celalî ji bo mêvanê xwe hertim amadeyi kuştin û fedakarîyan e. Hesên dema ku pê dihese Memê Alan di mala Mîr Ezîn da asê maye ji bo wî dewarên xwe qetil dike, qonaxa xwe dişewitîne û herî dawî jî em dibînin asta fedakarîyê digihije pileyêke bilind û kurê xwe davêje di nava êgir da.

Di destana Odysseia da ne tenê bo Odysseus herwiha ji bo kurê wî yê ku ketîye li dû şopa wî jî, mêvanperwerîyek heye. Di destanê da dema ku Telemakhos li dû şopa bavê xwe ye Nestor kurek xwe digel Telemakhos ji bo peydakirina Odysseus dişîne. Nestor ji ber ku navê Odysseus di meselê da heye lewma bêyî ku man û nemana kurê xwe bifikire wî dişîne.

Odysseus li pirr deran dibe mêvanê kesan li her cihê ku dimîne jî jê ra hurmetek tê dayînê. Dema ku li ba Kalypsoyê ye Kalypso ji bo mayîna mêvanê xwe nemirinê ango Yezdantîyîyê teklîfî wî dike û Kirke jî amade ye hemû mal û milkê xwe bide Odysseus ango mêvanê xwe. Dema ku Odysseus dibe mêvanê Alkinoos, Alkinoos ji bo her cure fedakarîyê ji Odysseus ra amade ye. Alkinoos ji bo mêvanê xwe yê navdar bêyî ku bifikire amade ye qîza xwe ya ciwan bidê. Digel dayîna qîza xwe amade ye ku wekê hevparekê Odysseus bibîne û qonaxan jê ra çêbike. Alkinoos ji ber ku dizane Odysseus jî şerê giran ê Troyayê hatîye lewma bang li beg û mîran dike û ew digel wan beg û mîran xelatên mezin dide Odysseusî. Qencîyên wî ji bo Odysseus berdewam dike hetta ku digel xelatan wî dişîne mala wî.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da asteke bilind û nirxeke mezin ji bo mêvanî heye. Lewma dema ku kesek ji wan ra dibe mêvan ew bêyî teredut amade ne ku mal û milkê xwe di rêya wî mêvanî da xerc bikin. Di destana Memê Alan da her sê Celalî sembola fedakarîyên mezin in. Di destana Odysseia da Alkinoos sembola fedakîyên mezin e. Di her du destanan da asta fedakarîyê gellekî nêzî hev e.

Di destana Memê Alan da em dizanin ku Memê Alan ji alîyê Mîr ve tê vexwedînê ji bo malê. Dema ku Memê Alan diçe mêvandarîyê ji bo wî şahîyeke mezin li dar dixin. Pêşîyê ji mêvanê xwe ra pezan ser jê dikin paşê jî ji bo kêfxweşîya mêvanî lîstik didine lîstinê û digel mêvan lîstikan jî dilîzin.

Di destana Odysseia da ji bo mêvanan xwedîyê malê zaf caran şahîyan didin. Heta gellek caran em lê rast tîne ku mêvan dema diçe bo mêvandarîyekê xwe di nava şahîyekê da dibîne. Dema Odysseus li Welatê Phaiakê ye ji bo wî j'alîyê welatîyên wir ve şahî tîne lidarxistinê. Odysseus jî di nava van şahîyan da cih digre û dilîze.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da em dibînin ku ji bo kêfxweşîya mêvanan şahî tîne lidarxistinê. Di şahîyan da lîstik tîne lîstinê û mêvan jî di nava wan lîstikan da cih digrin. Di destana Memê Alan da li gor ya Odysseia zêde şahî tîne nin. Em hew rastî şahîyekê tîne belam di ya Odysseia da zaf şahî cih digrin. Di şahîyên tîne kirinê da ya Memê Alan lîstik bêtir lîstikên stratejî û hişmendîyê ne ku ew lîstik jî kişik e. Lê di şahîyên Odysseia da şahîyên tîne kirinê da bêtir şahîyên wucûdê û bedenê ne ku ew jî bêtir tîravêtin e. Di her du destanan da serlehangên destana Memê Alan û Odysseus tevî şahîyan dibin û di şahîyan da kesên serkeftî ne. Bêguman di her du destanan da hebûna şahî û lîstikan di heman demê da hurmetnîşandana ji bo mêvanî ye jî.

Di her du destanan da xala hevpar ya xwedîderketina mêvanî bêguman xwe dispêre bawerî û dîne wan. Di ya Memê Alan da bi girêdayî kurdan ku li ba kurdan ji ber ku bi hişmendîya mêvan mêvanê Xudê ye tê dîtinê lewma mêvanhezîyek heye. Di destana Odysseia da jî heman wisa ev mêvanhebandin ji ber dîne û bawerîya wan dihê. Em dizanin ku pirranîya kesên xwedîyê malê, mêvanan wekî kesên ku ji Yezdanê wan Zeus hatibe, dibînin lewma ezimandîneke mezin nîşanî mêvanî didin.

Di destana Memê Alan da jî di destana Odysseia da jî kesayetên ne li gorî mêvanperwerîya di destanan da tevdigerin jî hene. Di destana Memê Alan da ev kes Bekoyê Ewan e. Di destana Odysseia da ev kes Kyklop e ango dêw e. Her du serlehang jî dema dibine

mêvanê van lehengên astengêr, ji alîyê wan ve xirabî tê nîşandan. Her du dijlehang jî dixwazin serlehangen bikujin. Belam ji ber jêhatîbûn û hişmendîyên xwe Memê Alan ji destê Bekoyê Ewan difilite Odysseus jî ji destê Kyklopî difilite.

1.5.2. Berawirdkirina Qurbanîdayînan (Boraqdayîn) Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di destanan da bêguman qurbanîdayîn xwe dispêre dîn û bawerîya gelan. Milet ji ber ku bawerî bi dînekê heye lewma ji bo Yezdan/ Yezdanên xwe qurbanan ser jê dîkin. Ev serjêkirina qurbanan di her du destanan da jî wekê rîtûelekê cihê xwe girtîye. Her wekî tê zanîn di beşên din ên her du destanan da me ji bo xwe krîtîk dîyar kiribûn û me li gorî wan krîtîkan hilsengandinên xwe ji mînakgirtinên ji destanan, kiribûn. Di her du destanan da jî em li ser pênc krîtîkan çûbûn ku ev pênc krîtîk ev bûn: heyrantî, şûkrandarî (spasî), dilxweşkirin (dilkirîn), boraqdayîn û kefare. Em ê niha li gorî van krîtîkên heyî her du destanan bidin berhev û bi girêdayî krîtîkên xwe, hilsengandinên xwe pêk bînin.

Di destana Memê Alan da yek ji hêmanên giring qurbanîdayîn e li wir da em dibînin her pênc krîtîkên me cih nagrin. Krîtîkên ku tê da cih digrin wiha ne: şûkranî (spasî), dilxweşkirin (dilkirîn) û boraqdayîn e. Ji derveyî vana her du krîtîkên me yên mayî cih nagrin.

Di destana Odysseia da hêmana an jî rîtûela qurbanîdayîna bo Yezdanan bi awayekî xwirt û hêz cih digre. Di destanê da em dibînin ku her pênc krîtîkên me jî cih digrin ango yên cih digrin wiha ne: heyrantî, şûkrandarî (spasî), dilxweşkirin (dilkirîn), boraqdayîn û kefare.

Di destana Memê Alan da ji derveyî van krîtîkan herwiha qurbanserjêkirinek jî heye lê ew ne ji bo Yezdanî tê kirinê. Li wir da em dibînin ku ew ji bo şahîyekê tê serjêkirinê.

Di destana Odysseia da jî ji derveyî pênc krîtîkan herwiha ji bo ku Odysseus dakeve warê mirîyan qurban tene serjêkirinê. Li vir da sedemê qurbanîdayînê ji rîtûelê dûr ketîye û ji bo zanîna çarenûsekê ev yek pêk dihê.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da qurbanîdayîna ji bo Yezdan an jî di rêya wî da qurbanserjêkirin cihekî giring digre. Belam em li ser berawirdkirina wan her du destanan rawestî em ê bi rehetî bibêjin ku di destana Odysseia da qurbanîdayîna ji Yezdanan ra li gorî ya Memê Alan xwirttir cih digre. Di destana Odysseia da digel ku her pênc krîtîkên me di xwe da dihundirîne herwiha bi timî teşwîqkirinek bo qurbanîdayînê heye. Destana Memê Alan ji bo qurbanîdayîna ji Yezdan ra li gor a Odysseia mixabin qelstir dimîne. Di her du destanan da jî qurbanîdayîna ji Yezdanan ra sembola bawerîya cîhana din e û herwiha giringîdayîna rîtûelê ye.

1.5.3. Berawirdkirina Tradîsyonan Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di her du destanên me yên giranbiha da yek ji mijarên cihêreng û balkêş tradîsyona di her du destanan da ye. Di her du destanan da jî tradîsyonên nêzî hev û ji hev cihê ne. Em ê niha li ser wan berawirdkirinên xwe û hilsengandinên xwe bikin.

Di destana Memê Alan da di bin sernavê tradîsyonê da em nêzî deh heb tradîsyonan rawestîyane. Digel ku em di wê binbeşê da li ser deh heb tradîsyonên jev cuda û balkêş rawestîyane herwiha di hin derên din ên destanê da jî em li ser tradîsyonan rawestîyane. Lê

em ê ji bo beşa berawirdkirinê pitir li ser beşa ku di bin navê tradîsyonê da derbas dibe rawestin. Di destanê da bi giştî em li ser van tradîsyonan rawestîyane: kevneşopîyên aîdê dewra baviksalarîyê an jî çend tiştên bi vî rengî, tradîsyona reşgirêdanê, tradîsyona jîbîrnekirina qencîyan, tradîsyona giringîpêdana mêvanperwerîyê, tradîsyona giringîya sozgirtinê û bicihînana sozan, tradîsyona li ser şûrî sondxwarin, tradîsyona li ser meseleya namûsê, tradîsyona şingirêdana rîtûelî, tradîsyona namegêrîyê, tradîsyona heyfhildanê û hwd. Ji bilî van herwiha di hin derên destanê da jî em li ser tradîsyona piştî şînê heyî porqusandin û tradîsyona bidawîanîna şer a ji alîyê jinê ve jî rawestîyane. Ji ber ku di hin derên din ên destanê da em li ser wan rawestîyane ji bo dubarenekirina xwe me ew di bin banê vî sernavî da nenivisandîye. Belam niha em ê wan jî daxilî vê beşa berawirdkirinê bikin. Lewra ev her du tradîsyon giring in û divê em li ser wan rawestin.

Di destana Odysseia da di bin beşa tradîsyonê da em li ser heft tradîsyonan pitir sekinîne. Di destanê da bi giştî em li ser van tradîsyonan rawestîyane: tradîsyona nobranwarî ya baviksalarîyê, tradîsyona şingirtin û porqusandinê, kevneşopîyên aîdê dewra baviksalarîyê an jî çend tiştên bi vî rengî, tradîsyona bidawîanîna şerî ji alîyê jinê ve, tradîsyona giringîpêdana mêvanperwerîyê, tradîsyona baviksalarî û sînorên jinê, tradîsyona heyfhildanê û hwd. Heriwha ji bilî van tradîsyonan em ê li ser tradîsyona reşgirêdana Penelopeiyê ji bo Odysseusî tradîsyona daxwaza zewaca digel jineke mêrê wê bêseraşûn (winda) û tradîsyona ji bo jinekê lîstina lîstikan rawestîyane ku me di bin vê beşê da, di destanê da, negirtîye. Em ê li ser van her sê tradîsyonan jî wek mînak rawestin. Ji ber ku her du jî tradîsyonên giring in û di hin derên destanê da diborin. Di vê destanê da bi giştî em li ser van cureyên wekî tradîsyonel diborin rawestîyane.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da tradîsyona ku di her duyan da jî derbas dibe û nêzî hev e bêguman kevneşopîyên aîdê dewra baviksalarîyê û sînorên jinê. Di her du destanan da jî em di bînin ku xetek ji bo jinê hatîye xêzkirinê. Di her du destanan da jî ev xet him ji alîyê mêran ve hatîye kişandinê û him jî, çî balkêş e ku, jinan bi xwe jî ev xet li ber xwe danîne. Di destanan da jin pirr ditirsin ku gotineke nebaş der heqê wan da derkeve û ev yek jî bibe sedemê navderketina wan. Ev yek di her du destanan da jinan dixê di nava sînorên namûsekê da. Di her du destanan da jî em dibînin ku jin bi tena serê xwe digel mêran nînin, ew bêtir di ciheke dorvekirî da digel hin qîzan diçine li ba yekî. Di destanan da, em di van deran da, rastî kodên nerîtên hişk ên ku aîdê dewra baviksalarîyê ne tînin. Di destanan da bi giştî ev xetê ji bo jinê hatîye xêzkirinê heye û ev xet zû bi zû nayê binpêkirinê. Di destanan da Zîn û Penelopeiyê ev xet him hundirandine û him jî li gor vê xetê gavan davêjin û ji vê xeta nobran derbas nabin.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da yek ji tradîsyonên nêzî hev û hema bêje weke hev bêguman tradîsyona reşgirêdana Zîna Zêdan û ya Penelopeiyê ye. Di destana Memê Alan da piştî ku Zîn û Mem hev dibînin bi eşqeke mezin evîndarê hev dibin. Zîn piştî dîtina Memê Alan heta hatina wî ya bo Cizîra Botan bi mehan ji bo Memê Alan dikeve rewşeke matemwarî da. Ew ji ber Memê Alan cilên reş li xwe dike û her li benda heskirîyê xwe dimîne. Ew van reşan li xwe nake heta ku hebandîyê wê dihê. Di destana Odysseia da jî em dizanin ku Penelopeia piştî zewaca xwe ya salekê nêzî bîst salan ji mêrê xwe dûr dimîne. Di wan bîst salan da Penelopeia her di nava rewşeke matemwarî da ye û mîna Zînê hertim rûketî

ye. Penelopeia ji ber mêrê xwe dev ji hemî tiştî berdaye û hew êşeke mezin dikşîne ta ku mêrê wê dihê. Di her du destanan da jî ev tradîsyona reşgirêdanê heye ku dilber li benda dildarên xwe ne. Tim wan difikirin, ji bo wan reşan girêdidin û di haletêke matemwarî da dijîn. Di her du destanan jî ev reşgirêdan sembola bûyerên nexweş û dilsoj e.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da yek ji tradîyona ku derdikeve pêşberî me tradîsyona porqusandina piştî mirî ye. Em dizanin ku ev yek di her du destanên me yê qedîmî da cih digrin. Digel ku di her du destanan da jî ev tradîsyone nêzî hev e herwiha nuaseke piçûk jî di navbera wan da heye. Di destana Memê Alan da dema ku Memê Alan dimire, Zîna Zêdan gulîyên xwe diqusîne ango dibire û davêje ser meytê Memî û şîneke mezin bo wî digre. Di destana Odysseia da dema ku kurê Nestor qala tradîyona xwe dike, dibêje ku em ji bo mirîyên xwe di nava girîn û qêrînan da porê xwe diqusînin. Di vê destanê da jî wekê ya Memê Alan porqusandinek li dû kesekî/ê heye belam li vir da piçekî ev rîtuel cuda ye. Di ya Memê Alan da em dibînin ku piştî şînê por wekî ya Odysseia tê qusandinê belam di wir da ya ku digrî Zîna Zêdan e. Belam di destana Odysseia da kesê ku qala şînê, girîyê û porqusandinê dike kurê Nestor e ango kesekî zilam e. Ev der di vê tradîsyonê da ciheke balkêş e û nuansa di navbera her du destana da ye. Di destana Memê Alan da em li rastî kesekî ku bo Memê porê xwe diqusîne an jî qala vê yekê dike, nayên. Belam di destana Odysseia da em li rastî vê yekê tên.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da tradîsyona mêvanperwerîyê an jî giringîpêdana mêvanperwerîyê bi tena serê xwe di her du destanan da jî bû serenavek tenê. Bêguman wekî em di beşên mêvanperwerîyê yê her du destanan da jî bi berfirehî li ser rawestîyan, ji bo van destanan mêvanperwerî nirxeke giring e. Di destana Memê Alan da cihê ku me bo xwe kirîye mînaka beşa tradîsyonê edetêke Cizîrîyan ya li ser mêvanperwerîyê ye. Li wir da Cizîrî li beramberî wê yekê ne ku kesek nebe mêvanê wan û di ser ra bixwaze ji bo mêvandarîyê mala yekî nîşanî wî bidin. Di destana Odysseia da jî cihê ku me ji xwe ra kirîye mînaka beşa tradîsyonê edetêke welatîyên Phaiakê ye ku divê ew li gorî wan edetên xwe mêvanê qesta wan kirîye xelat bikin. Di her du destanan da jî em raberî du edetên li hev cuda tên belam çiqas ji hev cuda bin jî kakîla her duyan li ser tradîsyona mêvanperwerîyê ango giringîpêdana mêvanperwerîyê ye. Di her du destanan da jî giringîyên taybet bo mêvanan heye. Kesayetên her du destanan jî di wê hewlê da ne ku fedakarîyê ji mêvanê xwe ra bikin. Dixwazin wî mêvanî baş biezimînin, wî xelat bikin û çî daxwaza wî hebe dixwazin bînin cih.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da tradîsyoneke din ya balkêş bidawîanîna şeran ji alîyê jinan ve. Di destana Memê Alan da Zîna Zêdan piştî mirina Memî nahêle ko Celalî biçin û tola Memê Alan ji Mîr Ezîn bistîne. Zîn dikeve navberê û zilamên wê dere guh didine Zîna Zêdan û bi girêdayî gotina wê dimînin. Di destana Odysseia da jî em dizanin ku dema qala şabanûya Phaiakan ango Areteyê tê kirinê di wir da li ser alîyê wê yê kemijandina şerên di navbera mêran da radiweste. Di destanê da em dizanin ku Arete jineke xudan qîmet e li ba xelkê Phaiakê lewma dema taybetmedîyên wê dihê kirinê yek ji taybetmendîya wê bidawîanîna şerên mêran e. Bêguman ev tradîsyona balkêş di xwe da zaf tiştan dihundurîne. Ji ber ku em dibînin di her du destanan da jî mêr bi gotina jinan dikin anko giringîyê didine jinan û nexweşîyên heyî bi gotina jinan, sergirtî dikin. Herwiha ev yek nîşanî me dide ku

civakeke dayîksalarîyê jî cihê xwe girtîye ji ber ku mêr bi gotina jinan dikin û nirxê didine gotinên wan.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da tradîsyona dawî ya hevpar tradîsyona tolhildanê ye. Di her du destanan da jî ev tradîsyon heye û digel hin nuansên xwe hema bêje weke hev e. Di destana Memê Alan da em dizanin ku dema xebera jehrîkirina an kuştina Memê Alan digihije Beglî, Beglî tavil bo tolvedana Memî berê xwe dide Cizîrê digel siwarên xwe. Piştra tê Cizîrê, Cizîrê serobino dike û heyfa prensê xwe ango Memê Alan li erdê nahêle. Di destana Odysseia da li ser tolhildanan li gorî ya Memê Alan zêdetir kereste hene. Odysseus di destanê da digel kê dijmin be an jî çî kesê fanî belayekê bîne serî wî û hezkarên wî, ew piştî tebatekê tola xwe nahije ji wan ra û wan kesan têk dibe. Belam di destanê da ya ku bo beşa tradîsyonê bûye mînak tolhildana Odysseus ya ji xwazgînîyan e. Em dizanin ku dema Odysseus vedigere bajarê xwe piştî demekê tola evqas kirinên nebaş ên xwazgînîyan, wan yek bi yek dukuje û heyfa kirinên wan ji wan ra nahêle. Di her du destanan da jî tolhildan hêmayeke giring bû. Belam em dizanin ku di destana Odysseia da li gorî ya Memê Alan ji aliyê keresteyan ve zêdetir mînak peyda dibin. Di destana Memê Alan da ev tradîsyon hew carekê diqewime. Belam ya Odysseia ev tradîsyone zaf diqewime û ji bo mînakan têr û tijî ye. Yek ji nuansên din ên her du destanan em dizanin ku xirabîyek dema pêk tê kesê ku xirabî lêhatîkirinê tola xwe hildide. Di destana Odysseia da yê ku tola xwe hildide ango tolhildêr Odysseus bi xwe ye. Belam di destana Memê Alan da yê ku tolê hildide ne Memê Alan e ango tolhildêr kesekî din e. Li ba Memê Alan hesta tolhildanê zêde peyda nabe belam li cem Odysseus ev hest bi awayekî xwirt li ber çavan e.

Di destana Memê Alan da hin tradîsyon hene ku ev tradîsyon di destana Odysseia da derbas nabin. Ew tradîsyonên heyî wiha ne: tradîsyona jibîrnekirina qencîyan, tradîsyona li ser şûr sondxwarinê, tradîsyona namegêrîyê, tradîsyona şîngirêdaneke rîtûelî û tradîsyona girîngîya sozê hatî dayînê. Di destana Memê Alan da em di bin beşên tradîsyonê da bi berfirehî li ser van rawestîya bûn lewma em cardin hewce nabînin ku bi berfirehî li ser van tradîsyonan rawestin. Belam divê em li ser van tradîsyonan jî çend gotinan li hev bînin di nava sînoreke ne berfireh da.

Di tradîsyona jibîrnekirina qencîyan da em li rastî taybetîyeka kurdan ya bo qencîyan dihên ku me ji bo tradîsyonê pirtûka Bayezîdî jî kiribû çavkanîyek. Di vê tradîsyona qedîm da qencîya heyî ti caran nayê jibîrkinê û bersiva vê yekê bi erênî dihête dayînê.

Di tradîsyona li ser şûr sondxwarinê da bêguman balkêşîyek taybet heye. Di destana Odysseia da her çiqas alav û amûrên şer ciheke giring jî bigirin nirxê wê bi qasî ya Memê Alan nîne ji ber ku di ya Memê Alan da ji bo cihîna soz li ser şûr sond dixwin. Ev sondxwarina li ser şûrî du tiştan nîşanî me dide yek şûr li ba kurdan amûrekî ne rêzê ye û amûreke miqades e. Ya din ji bo asta bicihanîna sozî şûr amûrekî giring e û amûrekî pêbawerîyê ye.

Di tradîsyona namgêrîyê da em li rastî tiştêkî nêzî dewra me dihên. Em dizanin ku destana Odysseia li gorî ya Memê Alan di demeke dêrîntir da derbasî nivîsê bûye lewma di hin tiştên aîdê dewra nêzîktir da bêpar maye. Di destana Memê Alan da namgêrî tradîsyonekî balkêş e û cihê xwe di nava civata kurd a berê da baş girtibû. Di destanê da li ser tradîsyona

namegêrîyê du mînak hene yek jê nameya Bekoyê Ewan e ku dide Memê Alan ji bo ku wî bixapîne ya din jî nameya ku Sitî ji bo Celalîyan dişîne ye. Bi giştî hebûna namgêrîyê tradîsyoneke giring e û hebûna vê tradîsyonê der heqê dîroka nêz a destana Memê Alan da jî agahîyan dide me. Her çiqas li ser vê dîrokê em bixwazin çend tiştan bibêjin jî belam sînoren heyî yên teza me, rê li ber vê yekê dibire. Ji ber ku şîroveya li ser vê yekê dê tezê ji mebesta wê derxîne û ber bi alîyeke din ve bibe lewma ev mijar dikeve di bin banê tezeke ji vê tezê berfirehtir da.

Di tradîsyona şîngêrandineke rîtûelî da li gorî yên din balkêşîyek û arkaîkbûnek heye. Wek dihê zanîn di her du destanan da jî em li ser şîngirtinan rawestîya bûn û me hilsengandinên xwe kiribûn. Belam vê derê tradîsyoneka arkaîk û derasayî dihête li pêşberî me. Di vê şîngêrandinê da em dizanin dema ku Mem dimire Sitî gazî qîzan dike, darê şînê datîne ser piştî Bozê Rewan û li dor qonaxê di nava girîn û keseran da digêrîne. Ev şîn li gorî yên dîtir tişteke balkêş e û heya niha em li rastî rîtûeleke wiha nehatine. Destana Odysseia her çiqas ji alîyê nivîsandina dîrokê ve ji ya Memê Alan dêrîntir be jî rîtûelên wiha taybet, bi qasî ya Memê Alan tê da cih nagrin. Ev şîngêrandin bêguman him çanda qedîm a kurdî dertîne pêşîya me, him arkaîkbûna destana me ispat dike û him jî giringîyeke mezin dide destana me.

Di tradîsyona giringîya sozî da ev tradîsyon em dibînin ku di tîpolojîyên Celalîyan da dihê pêşberî me. Ji ber ku di destanê da Celalî bi wesfên mêranîyê hatine nexşandinê lewma vebêjerî ev barê giringîya sozî danîye li ser piştî van mêrxasan. Li ba Celalîyan soz tiştêkî pîroz e belam ji ber ku Çekoyê birayê wan destpêkê li hember bicihanîna soza dayî sist dibe lewma Hesên û Qeretacîn bi awayekî tund li dijî vê yekê derdikevin. Destan asta giringîya sozî ewqas di pileyeke mezin û pîroz da nîşanî me dide ku heke birayê wan ji sozê xwe vegere ev yek dê bibe sedemê kuştina wî.

Di destana Odysseia da jî hin tradîsyon hene ku em di ya Memê Alan da li raberî van nehatin. Bi qasî ku me tesbît kirî ev her du tradîsyon wiha ne: tradîsyona daxwaza zewaca digel jineke mêrê wê bêseraşûn (winda) û tradîsyona ji bo jinekê lîstina lîstikan.

Di tradîsyona daxwaza zewaca digel jineke mêrê wê bêseraşûn (winda) da em li rastî nerîteka dema kevin a yewnan tî. Di destanê da em dizanin piştî çûyîna bîst salan ya Odysseus hin kesên malmezînin peyda dibin ji bo daxwaza zewaca digel jina wî. Ev yek kevneşopîyeke aîdê wê deme ya vî mîletî şanî me dide ku li gorî wê jineke ciwan û dewlemend piştî bêseraşûnbûna mêrê wê, dikarin pê ra bizewicin. Jixwe ji ber ku Odysseus bi salan winda ye malmezîninê derdorê jî li gorî vê tradîsyonê tevdigerin û tî jî bo Penelopeiyê dibine xwazgînî.

Di tradîsyona ji bo jinekê lîstina lîstikan da em dizanin ku Penelopeia ji xwazgînîyan daxwaz dike ku di nava wan da ji bo hîlbijartina mêrekî lazîm e lîstik bihê lîstinê. Piştî lîstikê kê ser bikeve dê bi wî ra bizewice. Bêguman ev lîstik di nava mîletê yewnan da lîstikek qedîm e û her hebûye. Em bînin bîra xwe ku dema Odysseus jî dixwaze bi Penelopeiyê ra bizewice ji hin lîstikan ra derbas dibe û piştî serkeftina ji lîstikan Penelopeia bi wî ra dizewice. Herwiha divê em li vir bînin zîman ku qest ji van lîstikan lîstikên bedenî ne ku tîravêtin yek ji wan e.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da tradîsyon mijareke giring û balkêş bû. Her wekî li jor jî em bi berfirehî li ser berawirdkirina wan sekinîn me dît ku di van tradîsyonan da her çiqas leheng li pêş bin jî lê ya giring di tîpolojîya kesayetana da millet in. Tradîsyon di heman deme da kodên gelan û nasnameya gelan di xwe da di hundurîn. Di her du destanan da jî tradîsyonên balkêş û giring hebûn. Belam ji aliyê pîrbûna keresteyên tradîsyonî ve destana Memê Alan ji destana Odysseia dewlemendtir bû. Di her du destanan da jî nasnameya miletan xwe raxistîye li ber çavên me.

1.5.4. Berawirdkirina Bawerîyan Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di destanên Memê Alan û Odysseia da bawerîyek bo Yezdan/Yezdanan an jî dînekî heye. Di her du destanan da jî em li rastî bêolîtîyekê an jî bê Xwedatîyekê nahên. Di her du destanan da bawerîyên ji hev cihê hene. Di destana Memê Alan da em li rastî dîne muqades ango îslamê dihên. Jixwe dema em bala xwe didine destana Memê Alan em dibînin ku wek serleheng Memê Alan bi xwe j' aliyê binyata malbatî ve xwe digihîne malbata pêxemberê dîne îslamê ango Qureyşîyan. Herçî ku destana Odysseia ye di wir da em li rastî dîneke paganîst dihên. Di wir da kesayetên ku cih digrin bawerîya xwe bi Diwazde Yezdanên antîk ên yewnanê dihînin. Ji ber ku destana Odysseia li gorî ya Memê Alan arkaîkbûna xwe parastîye lewma dîn û bawerîyêke paganîstî cihê xwe girtîye. Destana Memê Alan ji ber ku demeke dirêj derbasî nivîsê nebûye û di demeke dereng da derbasî nivîsê bûye lewma arkaîkbûna xwe neparastîye û bi demê ra j' aliyê dîn û bawerîyê ve ketîye jêtesîra dîne îslamê.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da bêguman bawerî cihêkî giring digire. Ji ber ku dema em li her du destanan bi giştî dinerin em dibînin ku çî j' aliyê kesayetên lehengan be çî jî aliyê muhtewaya destanê ve be her tişt ketîye bin tesîra bawerîyê. Kesên di destanê da jî mêvanperwerî, qurbandayî û civakê bigire heta nerît, edet, tore û tradîsyona wan tev ketîye bin rengvedana dîne wan. Kesên ku tiştinan dikin ango mêvanan xwedî dikin, qurban ser jê dikin, civaka xwe saz dikin û hwd bi giştî li gorî bawerîya xwe ya bo dîn û Yezdanên xwe tevdigerin. Ew ji ber bawerîya xwe ya bo dînen xwe tiştinan pêk dihînin.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da her çiqas jî aliyê dîn û bawerîyê ve gellek ji hev cuda bin jî lê cardin hin tiştên hevpar jî di xwe da di hewînin. Wekê me li jor jî anî ziman di her du destanan da jî muhtewaya destanan û lehengên destanan tev di bin bawerîya dînen xwe da ne ango ev yek di her duyan da jî hevpar e. Herwiha di her du destanan da yek jî cihên hevpar bêguman bawerîya wan a bo cîhana dîn e. Em dizanin ku him serlehengê destana Odysseia him jî serlehengê destana Memê Alan bi awayekê îrtîbatek digel cîhana dîn danîbûn. Bêguman hebûna vê yekê nîşanî me dide ku di van her du destanên qedîm da kesayetên cih digrin bawer bi cîhaneka dîn tînin.

1.6. Berawirdkirina Tîpolojîya Jinan Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di destana Memê Alan da jinên ku derdikevine li pêş Zîna Zêdan, Sitî û Qîza Beko Zînê ye. Di destanê da Zîn keseka mihafazarkar, girtî, evîndar û dilsoz e. Sitî li gorî Zînê keseka bêtir serbixwe ye û di rêvebirina malê da xwedî otorîteyekê ye. Herçî Qîza Beko ye ew sembola xirabî û neqencîyê ye.

Di destana Odysseia da jinên ku li pêş in Penelopeia, Helene, Nausikaa û Arete ye. Di destanê da Penelopeia keseka mihafazakar, wefadar û xudan otorîte ye. Helene li gorî

Penelopeiyê jineke serbixwetir û azadtir e. Helene di destanê da li gorî jinên din ji sînorên heyî derbas dike û sembola jina azad e. Çimkî di kirinên wê da mafê biryarê ya wê ye û nakeve bin tesîra ti kesî. Heçî Nausikaa ye ew jî mîna jineke serbixwe tevdigere û keseka xêrxwaz e. Dayîka Nausikaayê Arete di nava destanê da her çiqas keseka pasîf jî be lê cardin jî xudangotin e û kesên tên jî xwe pêşîyê davêjine bextê wê.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da jin ciheke giring digre. Di destana Memê Alan da Zîna Zêdan li pêş çav e û di destana Odysseia da jî Penelopeia li pêş çav e. Ger em danberheva van her du lehengan bikin, em ê bibînin ku her du jî di destanan da kesên mihafizekar in. Zîna Zêdan di destanê da keseka bi girêdayî nerîta xwe ye û zû bi zû naxwaze ji van sînoran derkeve. Penelopeia jî mîna Zînê keseka mifazekar e, girêdayî nerîtên bav û kalan e. Her du jî wekî du tîpojîyên jin, kesên wefadar ên heskirîyên xwe ne, xwazgînîyên her duyan jî pir in bes her du jî bi tenê dixwazin bi hebandîyên xwe ra bin. Di destanan da Penelopeia ji ber ku li gorî Zînê di temeneke mestir da ye lewma otorîteya wê pitir li pêş çavan e. Ew bi salan mala xwe bi rê ve dibe. Herçî Zîna Zêdan e ew jî xudangotin û otorîte ye li ser xelkê, bi gotina keç û qîzên beg û axan tavil kom dibin.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da jinên ku ji yên din azadtir in bêguman Sitî û Helene ne. Di destana Memê Alan da Sitî keseka serbixwe ye û sembola otorîteyekê ye. Sitî dema ku mêrê wê ne li mal e mîna rêvebirekê tevdigere, hakimîyeta heyî dixwe bin destên xwe û valahîyek otorîterwarî hebe demildest wê tije dike. Di destana Odysseia da Helene kesayeteke serbixwe û azad e. Ew her çiqas di destanê da bi qasî destana Ilyada çalak neyê li ber çavan jî lê dîsa jî di vê destanê da jî ew li ber çav e. Helene ti caran di sînorên heyî yên ku ji bo jinan hatine xizkirinê da, namîne. Sitî û Helene li gorî kesên din ên di destanên xwe da azadtir, serbixwetir û xwesertir in.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da herwiha hin jinên din jî cih digrin ku ew li gorî kesayetên li jorî zêde aktîv nînin. Di destana Memê Alan da Qîza Beko heye ku ew keseka xêrnexwaz û astengêr e. Di destana Odysseia da Arete û Nausikaa hene ku her du jî xudan hin azadîyan in û xêrxwaz in.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da ger bi gelemperî li tîpolojîya jinan binerin em dikarin hin hilsengandinên wiha pêk bînin. Di her du destanan da jî jin bi qasî mêran azad û serbixwe nînin. Her çiqas Helene ketibe li dû serencamekê jî lê cardin ew vegeryaye li ber destê mêrê xwe. Jin li gorî zilaman di her du destanan da jî her çiqas azad û serbixwe bin jî lê ev sînorê wan hindî yê mêran, azad û serbixwe nîne. Di her du destanan da bêtir yên ku serencaman dijîn mêr in jin bi qasî mêran serencaman najîn. Di destanê da ji jinan ra sînorek heye belam ji bo mêran nîne. Di her du destanan da jî em dibînin ku vebêjerên destanan bi qasî mêran agahîyên dorfireh li ser jinan nadin. Di agahîdayînê da jin bi agahîyên dorteng têne nasandinê.

1.7. Berawirdkirina Tîpolojîya Mêran Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Destanên ku bûye babeta vê lêkolînê em dizanin ku aîdê dewrên feodal in lewma di wan da bivê nevê mêr roleke, li gor jinê, aktîftir digre. Di her du destanan da zîqbûna vebêjêran ji jinan pitir li ser mêran e.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da mêr in yên ku dikevîne serencam û serborîyan. Mêrên di destanan da li gorî jinan zêde serbest û azad in. Ew ji malên xwe dûr dikevin, zewqan ditamijin, digerin, li gor dilê xwe azadîyekê dijîn û paşê têne li ba hebandîyên xwe. Em dizanin ku her du destanan jî navên xwe ji kesayetên mêr girtine. Memê Alan her wek ji navê wê jî dîyar e, ji kesayeta kesekî mêr ango Memê serlehengê destanê girtîye. Odysseia jî weke Memê Alan navê xwe ji serlehengê mêr ê destanê girtîye ku wateya Odysseia tê maneya Odysseusnameyê.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da bi giştî em dikarin bibêjin ku mêr di her warî da li gorî jinên di destanê da çalaktir in. Mêr berkesê jinan ji wan ra ti sînore nehatine xêzkirinê û herwiha yên ku ji jinan ra xêz çêkirine jî mêr bi xwe ne. Mêr di her du destanan da jî xudan desthilatdarîyê ne.

1.8. Berawirdkirina Civakan Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di beşên din ên her du destanan da em li ser vî binnavî rawestîyane. Her wekî em dizanin me li wir da ji xwe ra sînorek danîye û me li gorî wê sînorê hereket kirîye. Bêjeya civakê bêjeyeke pirhêl e lewma me jê qest bes ew e ka ew civak, civakeke dayîksalarî ye yan bavîksalarî ye.

Di destana Memê Alan da ji bo civaka dayîksalarîyê mînakî cih digirin. Di destanê da du mînakên here berbiçav ên civaka dayîksalarîyê ev in. Di destanê da dema ku dê Zîn biçê ser Kanîya Qestelê bi gotineke wê keç û qîz kom dibin û li ber fermana wê amade dibin. Herwiha dema ku Celalî dixwazin tola Memê Alan ji Mîr bistînin ya ku dikeve navberê û nahije ku şer biqewime cardin Zîn e. Di van her du mînakan da em li rastî taybetmendîyên civaka dayîksalarîyê tînin. Ji ber ku ev mînakên ji destanê rasterast hebûna vê civaka dayîksalarîyê derdixe pêş.

Di destana Odysseia da ji jî ji bo civaka dayîksalarîyê mînakî hene. Di destanê da sahnayên li ser Areyê civaka dayîksalarîyê pitir derdixe pêş ku di wan sahnayan da ev qewimîbûn. Odysseus dema ku berê xwe dide qonaxa Alkinoos, Athene ji Odysseus dixwaze ku ew bi lavahî û xwastek here li ba Areyê. Ji ber ku bi qasî Athene qala Areyê dike ew jineke aqilmend e, mîrê wê û civaka Phaiakan ji gotinên wê ra rêzê digrin, ew jin e ku ya daxwazan pêk tîne û şeran bi dawî dike.

Di destana Memê Alan da ji bo civaka bavîksalarî zaf mînak cih digrin. Di destanê da mezinahî û serwerî hertim ji bo mîrê ango ji bo bavîksalarîyê tê dîtinê. Mêr di destanê da bi giştî kesekî serwer e, rêvebir e û ji jinan bêtir rol girtîye.

Di destana Odysseia da jî ji bo civaka ku ji bavîksalarîyê pêk hatîye mînak zaf in. Di destanê da em dibînin ya ku ji zilaman ra xizmet dike jin e. Serwerîya heyî di destê mîrê da ye, yê ku ferman dide mîr e û yê ku daxwazên wî pêk tê cardin mîr e.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da her du civak jî digel mînakên xwe cih digrin. Di destana Memê Alan da dema ku mirov qala civaka dayîksalarîyê bike lazim e li Zîna Zêdan û Sitîyê binêre ji ber ku kirinên van kesan hin caran dibine mînakên civaka maderşahi. Di destana Odysseia da Arete bêtir li pêş e bo mînaka civaka dayîksalarîyê. Ji bo her du destanan jî mînakên bavîksalarîyê pir in lewma hewceyî bi navê kesan nîne. Bi giştî di her du destanan da jî him civaka dayîksalarî him jî civaka bavîksalarî digel mînakên xwe cih digrin. Herwiha di destana Memê Alan da Zîna Zêdan nahêle ku şerek biqewime û di ya Odysseia da jî Arete nahêle ku şerêke biqewime. Di her du destanan da jî hurmetek ji bo jinê heye û soza wê nayê bînpêkirinê.

1.9. Berawirdkirina Bûyerên Derasayî Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di destanên Memê Alan û Odysseia da bêguman zaf bûyerên derasayî yên nêzî hev û dûrî hev cih digrin. Belam di destanan da tiştên ku nêzî hev e û balê dikşîne li ser xwe bêguman çûyîna warê mirîyan a her du lehengan e. Em dizanin ku Memê Alan di xewna xwe diçe li wir û hay ji hin tiştan dibe. Odysseus jî mîna Memê Alan diçe li wir belam ew ne di xewnekê da diçe, rasterast diçe li wir.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da bêguman serleheng di gelek alîyan da dişibin hev û liv û tevgerên wan nêzî hev in. Di destanan da Memê Alan û Odysseus kesayetên balkêş û cihê ne. Ango liv û tevgerên wan ne mîna kesayetên din e. Dema ku her du jî diçin warê mirîyan li wir hay ji çarenûsa xwe dibin. Ew di warê mirîyan da digel kesên ne di jîyanê da ne diaxivin, li ser jîyana xwe hay ji hin agahîyan dibin. Memê Alan jî Odysseus jî bi çûyîna li wir ra digel çarenûsa xwe hay ji roja mirina xwe jî dibin. Ango ew êdî dizanin ku dê kengê bimrin.

2. Berawirdkirina Lehengan

Piştî ku em bi berfîhehî li ser lehengên destanên xwe sekinîn niha em ê li ser berawirdkirina her du lehengên sereke yê destanan bisekinin. Wek tê zanîn di hilsengandin û şiroveyên xwe yê li ser lehengan da bêtir me zîqbûna xwe dabû li ser her du lehengên sereke yê destanan. Dema ku em li ser wan lehengan jî radiwestîyan me li gorî hin taybetmendîyan ew nirxandibûn û me li ser wan hilsengandinên xwe kiribûn. Em ê niha li ser berawirdkirina van her du lehengên sereke rawestin. Em ê wan li gorî taybetmendîyên wan yê me pêk anîye bisekinin û li gorî van taybetmedîyên wan danberheva wan bikin. Ji ber ku bala me û zîqbûna me bêtir li ser lehengên sereke yê destanê ne lewma em ê Memê Alan û Odysseus; Zîna Zêdan û Penelopeia jî di bin sernavekî da û lehengên derveyî wan dimînin jî di bin sernavê Lehengên Din da binirxînin û li ser wan hilsengandinên xwe bikin. Di bin sernavê Lehengên Din da em ê du beşan li hev bînin. Beşa pêşîyê dê li ser Lehengên Arîkar be beşa û duyem jî dê li ser Lehengên Astengêr be.

2.1. Memê Alan û Odysseus

Li alîyekê lehengê sereke û bingehîn yê destana Memê Alan û li alîyê din lehengê sereke û bingehîn yê destana Odysseia. Her wekî ji navê wan jî xwîyaye van her du lehengan navê xwe dayîne van destanên heyî. Odysseia ger mirov rasterast wergera wê binere tê maneya “Odysseus-name” anku bi naveke sivik û fambar Kitêba Odysseusî.

Memê Alan wekê em dizanin ew kurê padişahê ye anku ew presek e. Ew li deverê avlêheyî ango li deverê deryayî tê cihanê. Ew tekanyê malbata xwe ye û welatê Mixribê di bin serwerîya wî da ye. Digel ku di temenek piçûk da ye jî ew ji bo evîna xwe dev ji hemû statuyan û malbata xwe berdide û rêya xwe vedigerîne bo evîna xwe Zîna Zêdan. Ji bo wê dikeve li ser rêya man û nemanê.

Odysseus jî kurê padişahê Ithakeyê ye û tekane şûnwarê welatê Ithakeyê ye. Ew jî mîna Memê Alan li deverê avlêheyî ango li deverê deryayî tê dinyayê. Odysseus jî tekanyê malbata xwe ye û mêrxasekî mezin e. Odysseus kesekî zewicî ye lê digel ku zewicî ye ew zêde nikare li welatê xwe bimîne û ji bo sefereke mezin berê xwe dide welatê bîyanîyan. Li ser çûyîna Odysseus salên dûr û dirêj derbas dibin, ew jî li pîr deveran li rastî gellek destkeftî û statuyan dibe belam ji bo evîna xwe dev ji van berdide û berê xwe vedigerîne hêlîna xwe ya yekem ango berê xwe vedigerîne li cem Penelopeiyê.

Em ê niha pêşîyê li ser hin alîyên wan yê di beşên din da jî em li ser wan sekinîne, rawestin. Em ê li gorî rêzê li ser lehengîyên wan, aqilmendîya wan, evîndarîya wan û hin taybetmendîyên din yê wan, bisekinin.

2.1.1. Berawirdkirina Lehengîyên Memê Alan û Odysseus

Memê Alan li welatê xwe kesekî xudan hukum û xudan navûdeng e. Ew ti caran ne ji tişteki ditirse û ne jî xwe li hemberî xeternakîyan dide alîyekî. Ji bo wî berî Zîna Zêdan serwerîyek berbiçav heye lê piştî naskirina Zîna Zêdan êdî dixwaze hemû potensiyela xwe ya heyî ji bo evîna xwe bide xerckirinê. Ew dema biryara çûyîna li dû heskirîya xwe Zîna dide bi lehengîyane tevdigere û dev ji hemû statuya xwe ya mezin berdide. Digel ku dizane rêwîngîyê zehmet û mezin li pêşîya wî ye lê ew cardin jî xwe nade alîyekê û dikeve rê.

Odysseus dema li welatê xwe ew jî serwerê Ithakeyê ye belam bi neçarî ji bo seferekê berê xwe dide bajarê Troyayê. Ew dema diçe wî şerê mezin ê Troyayê navûdengîya wî di nava dost û dijminan da berbelavtir dibe. Bi qehremanî dikeve şeran û bi salan şer dike ta ku ser dikevin. Piştî ku dixwaze vegere li ba hezkirî û jina xwe Penelopeiyê digel ku dizane dê di rêya vegeêrê da xeternakên mezin bêne serê wî û dê pîrr caran têk biçe jî lê cardin ew hemû tiştan dide li ber çavên xwe û dikeve rê.

Memê Alan, di destanê da kesekî zêde şerkar û şerxwaz nîne di destanê da em wî ti caran di nava şerekî da nabînin. Lê digel vana jî ew him li welatê xwe kesekî bêtirs e him jî li xerîbistanê. Ew digel ku li welatê Cizîra Botan darekî bi tenê ye û bawerîya xwe hew li xwe tîne lê cardin jî serî li ber ti kesî dananê. Dema ku Mîr Ezîn wî li mala xwe da dibîne û bi gotinên nexweş ji wî ra bilêv dike û dixwaze bi êrîşî wî bike Memê Alan li hember van yekan ti caran sertewandî û bêdeng namîne. Ew li hember gotinên Mîr Ezîn bi bêminetane lê vedigerîne, bi awayekî jixwebawer li ber wî dide. Dema ku dizane dê axaftina wan biçe ber bi şerekî ve, digel ku li mala Mîr da bi tenê ye û asê maye, lê cardin jî ew mûyekê li xwe şaş nake. Destê xwe davêje li ser şûrê xwe li hember Mîrê Cizîrê bi tena serê xwe li ber xwe dide û ji bo şerî di amadebaşîyê da ye. Memê Alan dema ku dizane lawikê Hesen ji ber wî avêtine nava êgir da bêyî ku canê xwe bifikire xwe ji bo kurê hevalê xwe, xwe davêje di nava mala agirpêketî da. Ew ti caran ne ji tehlûkeyan û ne jî ji kesan ditirse. Mêrxasekî mezin û xudan sîyanet e.

Odysseus, di destanê da bereksî Memê Alan kesekî şerkar û şerxwaz e. Em dizanin ku ew ji bo şerekî berê xwe dide Troyayê, kesekî talankar û dagirker e. Piştî ku welatê Troyayê dagir dike jî di vegeêrê da jî ji bo zewqê êrîşan dibe li ser gellek bajarên. Odysseus kesekî dilhar û dilêr e, ji ti kesî û ji ti tiştî natirse. Di destanê da sahnayên li ser şerî yê Odysseus zaf cih digrin. Di destanê da pîrr cara şerên Odysseus û êrîşbirinên Odysseus ji bo hevrêyên wî ye. Ew dema ku digel hevrêyên xwe di şikeftê da asê dimînin, yê ku cisaretê dide hevrêyên xwe û êrîşê dibe ser dêwekî ezamet Odysseus e. Ew ti caran ji mirina xwe natirse, li ber xwe dide û dijminên xwe bi hêsanî têk dibe. Odysseus dema ku vedigere warê xwe li wir dibîne ku xwazgînî ji bo jina wî hatine, zilmê li malîyên wî dikin û malê wî talan dikin. Ew vê yekê ji bîr nake, ji ber nareve û li ber xwe dide. Ji ber ku Odysseus mêrxasekî mezin e lewma tola xwe ji xwazgînîyan ra nahêle. Hemû alavên xwe yê şerî li hev kom dike û ewlehîya xwe baş digre. Piştî van kirinên xwe bi awazeke mêrane bang li wan dike û êrîşî wan xwazgînîyan dike. Ew xwazgînîyan hemûyan yek bi yek dikuje û serdikeve. Di destanê da mêrxasî û dilêrîya wî di asteka bilind da ye.

Wekê ji van taybetmendîyên wan yê lehengî jî dîyar e çî Memê Alanê mêrxas be çî Odysseusê dilêr be, ev her du leheng ti caran minetê li yekî nakşînin. Kesê ku li hember wan çî kesekî ji rêzê be çî kesekî payebilind û xudan sam be, qet ji bo wan ferq nake, ew li hember her cure zordarîyan li ber xwe didin. Li hemberî dijminên xwe ti caran ne li benda kesayetane ku bînan û wan ji halê heyî xilas bikin. Mêrxasîya xwe û dilêrîya xwe wan ji xwe ra kirîye rê û rêbaz û ji bo têkbirina dijminî li gor vê yekê tevdiagerin. Ger em bi pîranîya destanê binerîn em ê bibînin ku ji alîyê şerkirin û şerxwazîyê da Odysseus ji Memê Alan çalaktir e û zêde di nava şeran da ye. Memê Alan li gorî Odysseus zêde di nava şer û şerxwazîyan da nîne, di warê şeran da li gor Odysseus kesekî pasîf e. Memê Alan jî bi qasî Odysseus kesekî mêrxas û

dilêr e û her du jî ji hêza xwe ya lehengtîyê bawer in. Ew ti caran serî natewînin û li hemberî dijminî serî danaynin.

2.1.2. Berawirdkirina Aqilmendîya Memê Alan û Odysseus

Wekê mezinên me anîne ziman aqil taceke zêrîn û di serê her kesî da nîne. Di destanan da yek ji taybetmendîyên berbiçav û xurt yê her du lehengên sereke yê destanan bêguman hişmendî anku aqilmendîyên wan in.

Memê Alan di destanê da digel ku kesekî temenpiçûk e jî lê cardin ew bi hişmendane tevdigere û di kirinên xwe da ti carî bêyî fikirîn angò bêyî emilandina hişê xwe hereket nake. Mem ji derxistina Bozê Rewan bigre heta xweyîkirina Bozê Rewan tim li gorî zanîna hişmendîya xwe tevdigere. Wî hay ji hêza xwe heye lewma di destanê da li gorî zanîna şîyana xwe hereket dike. Dema ku dizane di binê behrê da hespek heye û ti kes nikare wî xilas bike tavil gazî xalê xwe dike ji ber ku ew dizane ji bilî wî ti kes nikare serederîyê bi wî hespî bike. Di çûyîna wî ya bo bajarê Cizîra Botan da gellek bûyer rû didin belam Memê Alan ji nav bûyeran bi saya hişmendîya xwe anku bîaqilane tevgeryana xwe rizgar dibe. Memê Alan piştî ku tê nêzî Cizîrê dibe ji bo ku ji rûbara heyî derbas bibe pirr rêyan digere. Qîza Beko dixwaze bi awayekî wî bixapîne belam Memê Alan bi awayekî hişmendane tevdigere û bawerîya xwe li xwe tîne. Piştî têrfikirîn û plangêrîya xwe ber bi şivanekî ve diçe û digel arîkarîya şivanî û aqilmendîya xwe ji vê rewşa heyî ya têtengasî rizgar dibe. Memê Alan dema ku digel Cizîrîyan diçe bo şerê li hember eceman, dizane ku ti kes li bajarê Cizîrê nîne û Zîn bi tenê ye. Lewma dixwaze bi fêlbazî hereket bike, di rewşa berteng da bi saya aqilmendîya xwe serdikeve. Ew kesekî plangêr e lewma planekê li hemberî Mîr pêk tîne û ji cem wan vedigere li ba Zîna Zêdan. Bêguman yek ji astên herî bilind ê hişmendîya Memê Alan qabilîyeta wî ya di lîstika kişikê (şetrencê) da ye. Wekî me amaje pê kirîye lîstika şetrencê lîstikeka stratejîyê ye, lîstikeke ne ji rêzê ye ku hemû kes bikaribe biserkeve û di wê lîstikê da divê mirov baş bifikire û li gor wê fikirînê baqilane tevdigere. Memê Alan jî baqilane tevdigere, xudan stratejî ye û li hember Mîr pirr caran serdikeve. Memê Alan di destanê da ji bo emilandina aqilê xwe kesekî çalak e û di rewşên tengasîyê da bi xêra emilandina aqilmendî û têrfikirîna xwe serdikeve. Di destanê da ew ji fikirînên ji rêzê dûr e û di asteka payebilind da aqlê xwe ji bo berjewendîyên xwe bi kar tîne.

Odysseusê ku bi fêlbazî û aqilmendîya xwe hatîye naskirinê di destanê da hertim li gor planekê tevdigere û di kirinên wî û serkeftinên wî da para aqilmendîya wî zaf e. Di destanê da li ser aqilmendîya wî çî Yezdan bin çî jî kesên ji rêzê bin zaf pesnê wî didin. Ji ber ku Odysseus kesekî aqilmend e û di tevgêrên wî da têrfikirîn heye lewma hemû kes vê dibînin û bi girêdayî vê tecrûbeyê pesnê didine aqilê wî. Dema em li ser aqilmendîyên wî yê di nava destanê da rawestin û bi gelemperî li wan binerîn em ê bibêjin ku Odysseus di kirinên xwe da ti caran bêyî fikirîna her ihtimalê, hereket nake. Odysseus dema dikeve rewşeke tengasîyê da bi her alîyan ve rewşê difikire û ya guncaw kîjan be piştî têrfikirînekê wê hildibijêre. Dema ku ji cem Kalypsoyê rêya çûyînê tê dîtinê ew dest bi çêkirina çardarekê dike. Piştî çardarê dikeve deryayê û berê xwe dide vegeerê. Piştî demekê di nava avê da çardarîka wî serobino dibe û Xwedawend tê arîkarîya wî û laçîkekê dide wî da ku ew dev ji wê çardarîkê berde û xwe ji vê çardarîkê rizgar bike. Belam Odysseus her tiştî baş difikire û bawerîya xwe bi tenê li xwe tîne û li gor wê hereket dike. Lema ji laçîkê wêdetir li aqlê xwe bawer e. Ew li gorî ya di serê xwe

da hereket dike lewma heta ku parçeyek ji çardarikê dimîne dev ji wê bernade û hew li xwe bawer e. Asta herî bilind a hişmendîya Odysseus bêguman ev der e. Ji ber ku ew ji aqilê xwe û ji fikirînên xwe şaş nabe û tekane sipartgeh û hêvîya wî aqlê wî ye. Odysseus dema ku digel hevrêyên xwe di şikeftê da asê dimîne li rêyên derketin û rizgarbûnê şev û roj difikire. Ew ketina şikeftê an jî asêbûna wê derê wekî derfetekê dibîne û her tiştî erênî û nerênî difikire. Her tiştî di serê xwe da pêk tîne, li gorî plangêrîya di hişê xwe da hereket dike û bi awayekî aqilmendane ji vê tehlûkeyê rizgar dibe. Dêw li hemberî aqilmendîya wî têk diçe û bi awayekî serkeftî ji destên wî rizgar dibe. Di pirranîya destanê da Odysseus bi fêlbazî, bi plangêrî û bi aqilmendane tevdigere. Di paşxaneyê her hereketeke wî da rengvedana têrfikirînekê heye.

Bêguman di destanê da di liv û tevgerên her du lehengan da û di serketina wan da para herî mezin ya aqilmendîya wan e. Çi Memê Alan be çi Odysseus be di destanê da li gorî aqilmendîya xwe tevdigerin. Dema ku dê hereketeke pêk bînin berîya wê, wê yekê baş difikirin li ser her aliyên wê diramin û ya çê ji bo berjewendîyên wan çi be, wê pêk tînin. Her du jî di rewşên berteng da li gorî plangêrîyekê hereket dikin û bi saya têrfikirînan xwe ji rewşa xeternak an jî ji rewşa negatîf rizgar dibin.

2.1.3. Berawirdkirina Evîndarîya Memê Alan û Odysseus

Çi destana Memê Alan be çi destana Odysseia be her du destanan jî li ser gelek hîman gul vedaye. Belam bingeha van her du destanan bêguman bêtir xwe dispêre evîndarîyê. Him Memê Alan him jî Odysseus ji bo ku bigihijine dilberên xwe dikevîne li ser rêyên dijwar. Di van rêyan da gelek xetere û tehlûke têne serê wan.

Destana Memê Alan her wekê me anîye ziman pişta xwe sipartîye evîneke nîyazpak. Memê Alan ku em dizanin ne di şertên asayî da Zîna Zêdan nas dike. Ew di rewşên awarte da Zîna Zêdan nas dike û dibe evîndar. Piştî Zînê naxwaze ti kesî bibîne û hew dixwaze bikeve li ser rêya Cizîra Botan. Di destpêka da malbata wî li hemberî fikra çûyîna Memê Alan in ji ber ku Memê Alan tekane ye û serwerê Mixribê ye. Anku xudan desthiladarî ye. Belam Memê Alan ji bo evîna xwe hemî tiştî dide li ber çavan û li hemberî hemû kesî derdikeve. Memê Alan ji bo Zîna Zêdan dev ji statuya xwe ya civakî berdide, dev ji padişahîya xwe berdide û herî dawî dev jî dev ji dê û bavên xwe berdide. Memê Alan ji bo ku bigihije Zîna Zêdan bi gotina tu kesî guhdar nake, li hemberî dê û bavên serî hildide û digel xeternakî û tehlûkeyan ew berê xwe dide Cizîra Botan. Memê Alan digel ku dizane Zîna Zêdan qelendîya Çeko ye jî lê ew vê yekê wekî asteng nabîne û xetereyên vê yekê dide li ber çavan. Memê Alan di destanê da her çiqas jî lehengê xwe tawîzan bide an jî li hemberî hin tiştan têk biçe bes sedemek wî heye ku ew jî evîna wî ya bo Zîna Zêdan e. Memê Alan kesekî mîrxas û leheng e belam ger mesela evîna wî be hemû tiştan li paşguh dike. Ew digel ku dizane neçûna şerr eybeke mezin e û ev yeke sedemê şermeke mezin e di nava gel da lê cardin jî ji bo evîna xwe van tiştan li paşguh dike. Memê Alan di warê hişmendîya da kesekî têr û tijî ye û ti kes nikare bi aqilê wî serederîyê bike belam dema evîna wî derdikeve li hemberî aqilê wî aqlê wî têk diçe. Di lîstîka staratejîk a şetrencê da ew kesekî serkeftî û şareza ye. Mîr nikare wî têk bibe lê dema ku çavên wî bi Zînê dikeve li hemberî vê dîmenê hêdî hêdî têk diçe. Memê Alan di rêya evîna xwe da kesekî kamil û qahîm e ti tişt nikare li hemberî evîna wî bibe serkirdeyek. Ew heta dawîya temenê xwe ji bo evîna xwe li ber xwe dide û ev evîn dibe sedemê têkçûna wî.

Odysseus kesekî evîndar e û digel heskirîya xwe dizewice belam hê ku Odysseus û Penelopeia baş evîna xwe xweş nekirine, Odysseus diçe bo şerekî giran. Odysseus bi salan dûrî evîna xwe Penelopeiyê dimîne û hesreta evîna wî her roj ji berê mezintir dibe. Odysseus piştî bîst salan dikeve rê û ber bi evîna xwe ve tê. Lê di vê hatinê wî ya bo warê wî û evîna wî da, zaf êş û kul hene. Digel ku wî bi salan êş û azar kişandine jî lê cardin ev êş û azarana dev ji wî bernadin. Odysseus qedera xwe ya têrkeser dizane, hemû tiştên neçê dide li ber çavan ji bo evîna xwe û dikeve rê. Xwedawend Kalypso ji bo ku Odysseus ji fikra wî ya çûyîne vegeirîne hemû derfetên xwe diemilîne. Hemû derfetên xwe li pêşkêşî Odysseus dike ku di nava van da teklîfa nemirkirina Odysseus jî heye. Odysseus van teklîfan û jîyana ligel Xwedawendê red dike û tenê yara xwe difikire. Ev yek asta hezkirin û evîndariya Odysseusî baş raberî me dike. Di rêketina wî da bela û elemên mezin têne serê wî, ew pir caran têk diçe. Hertim nexweşî têne serê wî belam ew ji ber îradeya xwe ya hezkirinê li hember van tiştan di nava sebreke mezin da serdikeve. Ew li her derê baş tê ezimandinê, qedrê wî tê girtinê û dixwazin Odysseus li ba wan bimîne belam Odysseus her car vê yekê red dike. Dema ku li welatê Phaiakan e, Mîrê Phaiakan dil pê heye ku qîza xwe bide Odysseus û wî bike kesekî xudan statû belam Odysseus ji ber pêta evîna xwe ya di dil da vê yekê qebûl nake. Êşa wî ya têrjan dema ku tê warê xwe jî, kuta nabe. Ew dema tê malê dibîne ku zaf xwazgînî ji jina wî ra peyda bûne û malê wî talan dikin. Odysseus li hember vê yekê baqilane tevdigere ji bo wuslata xwe têrsebr e û li gorî heskirina xwe hereket dike. Ji ber îradeya evîna xwe van xwazgînîyan yek bi yek têk dibe û arîşeyên heyî çareser dike. Odysseus ji bo evîna xwe kesekî xudan îrade û vîn e. Ji bo wê evîne amadeyî hemû cure kirinên xweş û nexweş e.

Memê Alan bi qasî Odysseus xudan talih nîne ji ber ku evîna wî û Zîna Zêdan naçe serî û her du jî dimirin. Odysseus bereksê Memê Alan digihije yara xwe ya salan û evîna wan digihije merama xwe. Ger em li liv û tevgerên Memê Alan û Odysseus binerin em dikarin bibêjin ku Mem jî Odysseus jî ji bo ku bigihijin hebandîyên xwe serî li hember her cure astengê hildane. Tekane fikra wan gihiştina yarê ye lewma ji bo ku bigihijin yara xwe hemû hêza xwe diemilînin. Li gorî hilsengandin û azmûngerîya me ya ser vê xebatê asta evîndariya Memê Alan ji ya Odysseusî bilindtir û zêdetir e. Çima? Ji ber ku em dizanin piştî ku Memê Alan hez bi Zîne dike êdî hew debar dike û ji bo wê dikeve rê. Ji serê destanê ta dawîya destanê Memê Alan ji bilî Zîna Zêdan ne ti kesê difikire û ne jî bi ti kesê ra radibe û rûdinê. Belam Odysseus bereksê Memê Alan e di vê mijarê da. Erê Odysseus bi tevahî ne ji evîna xwe dûr e û hez wê dike belam ew pir caran mîna Memê Alan ji heskirîya xwe ra sadiq namîne. Bi Xwedawendan ra radibe û rûdine. Bi salan digel wan mîna kesên zewicî dijît. Bi giştî her du evîndar jî di rêya evîna xwe da him serkeftinan û him jî têkçûnan dibînin. Armanca wan a sereke hertim gihiştina yarê ye.

2.1.4. Berawirdkirina Hin Taybetîyên Din ên Memê Alan û Odysseus

Memê Alan û Odysseus di nava destanê da xwedî gellek taybetmendîyên cur be cur in ango ew di destanan da kesên pirhêl in. Di nava vê pirrengîya taybetmendîyên wan da him tiştên erênî hene him jî tiştên nerênî hene.

Memê Alan ji ber ku kesekî aqilmend û xudanfîkr û hizir e lewma di gotinên wî da şîret jî parekî mezin digre. Ew dema ku tiştêkê pêk tîne li ser her alîyê wê tiştê radiweste, li ser wê difikire û ya baş kîjan be wê hildibijêre. Dema ku dê tiştêke baqilane pêk bîne gotinên

şîretane digel wecîzeyên xwe dixê di nava wê yekê da. Şîretên wî carna berîya bûyerekê pêk tîna carna jî piştî bûyerekê pêk tîna.

Odysseus jî mîna Memê Alan xwe pîrr caran dispêre hebûna gotinên şîretwarî û wecîzeyan. Odysseus jî ber ku kesekî xudanserborî ye lewma li gorî wan serborîyên xwe tev digere û tevnê şîretan jî dispêre van serborîyan. Di axaftinên wî da hertim wekê Memê Alan têrfikirînek û plangêrîyek heye. Ew jî ti caran bêyî fikirîna her alîyê meselê, hereket nake. Di şîretên wî da rengvandaneka mezin a jîyana wî xwe vedişêre lewma şîretên wî ne tiştên ji rêzê ne û ne jî belasebeb in.

Memê Alan jî bo berjewendîyên xwe pîrr caran serî li fêlbazî û derewan dide. Ew di bûyerekê da an jî di rewşeke tengasîyê da dizane ka dê çawa tevbigere. Dema dikeve tengasîyê tavil li fêlbazîyekê digere û dixwaze digel wê fêlbazîyê jî rewşa heyî bifilite. Heke fêlbazîya wî têrê nekir hingê bi rehetî dest bi derewan dike. Derewkirinên wî him jî bo kesên ji rêzê ne him jî ji bo hezkirîya wî ne. Di destanê da him fêlbazîyên wî him jî derewên wî, wî jî nava tengasî û bertengîya xilas dike.

Odysseus jî bi fêlbazî û derewên xwe navûndeng e. Ew cihê ku dikeve tengasîyê da serî li fêlbazî û derewan dide. Ji ber ku dizane ev yeke dê wî rizgar bikin. Li hemberî dijminên xwe an jî li hemberî kesên xirab yek ji amûra wî, fêlbazîya wî ye. Ew bi rêya fêlbazîyên xwe dijminê xwe têk dibe. Hin caran jî serî li derewan dixê sedemê vê bêguman mîna Memê Alan, berjewendîyên wî ne. Derewkirinên wî yên di nava destanê da zaf in û ew dikare bi rehetî ji kesinan ra derewan bike. Di dema derewkirinên wî da kesê li hemberî wî kî be ferq nake, hes ke bila kesên ji rêzê be hes ke bila heskirîya wî be.

Memê Alan di piraniya destanê da kesekî pîrr mêrxas û dilêr e belam hin caran li gorî vê yekê hereket nake, berkesê vê tevdigere. Dilsistîya wî ya herî mezin a di destanê da bêguman neçûyîna wî ya bo şerî ye. Ev yek kêmasîyeka wî ya mezin e belam divê meriv vê yekê jî ji bîr neke ku di paşxana vê bûyerê da pareke mezin a evîndarîya wî heye.

Odysseus bi mêrxasî û dilharîya xwe di nava destanê da deng vedaye. Ew hertim li hemberî dijminan di amadebaşîyê da ye. Belam carin tîna jî ku bereksê vê yekê tevdigere û dilsist dibe. Dema ku ew li hemberî xwazgînîyan şer dike pîrr caran sist dibe û çongên wî dilerizin. Dikeve di rewşeke nebaş da û nizane ku dê çi bike. Ev dilsistîya wî ya li hemberî şerî bêguman kêmasîyekî wî ya mezin e û bereksê dilêrîya wî ye.

Memê Alan di destanê da pîrr caran bi awayekî nobran tevdigere. Ew di destanê da zû hêrs dibe lewma dema hêrs jî dibe kesê li hemberî wî ne giring e ka kê ye. Ew asta nobrantîya xwe carna ewqas bilind dike ku ev nobratî vedigere li ser gefxwarinên mezin jî.

Odysseus jî wekê Memê Alan di destanê da pîrr caran bi nobranwarî hereket dike, çi jî heskirîyên xwe ra be çi jî kesên ji rêzê ra be ferq nake. Asta gefxwarinên wî carna digihije astek wisa ku kesê/a li hemberî wî jî ber van gefan matmayî û heyirî dimînin.

2.2. Berawirdkirina Zîna Zêdan û Penelopeia

Zîna Zêdan û Penelopeia her yek ji van xwedî roleke mezin û giring in di destanan da. Di destanan da bêguman em dizanin yek ji hîmên here mezin evîn e û sembola van evînan jî Zîn û Penelopeia ne. Bêguman her du lehengên sereke yên destanan dixwazin bigihijin yarên xwe belam li hember wan zaf zehmetî derdikevin. Ew ji bo bigihijin yarên xwe ango Memê Alan û Odysseus ji bo ku bigihijin yarên xwe Zîn û Penelopeiayê hemû xetereyan dide li ber çavan. Tabî di vê navê da çi Zîna Zêdan be çi Penelopeia be ew jî bi qasî evîndarên xwe êş û kulan dibînin. Em ê niha li ser Zîna Zêdan û Penelopeiayê bisekinin ku ew her du him sembola evîne ne him sembola fedakarîyê ne û him jî sembola wefadarîyê ne.

2.2.1. Berawirdkirina Evîndarîya Zîna Zêdan û Penelopeiayê

Zîna Zêdan em dizanin ku ew qelendîya Çeko ye belam piştî ku ew Memê Alan dibîne û aşîqê wî dibe, êdî naxwaze ji bilî Memê Alan ti kesî bibîne û ji bo Memê Alan dev ji qelendîyê xwe yê bi salan berdide. Ew jî mîna evîndarê xwe Memê Alan hemû xeternakî û tehlûkeyan dide li ber çavan ji bo evîna xwe. Zîna Zêdan bi dîtina Memî ra bi mehan ji oda xwe dernakeve, reşan li xwe girêdide, zaf ji wî ra rondikan dibarîne û dikeve di nava huzneka giran da. Ew hertim li hemberî hatina Memê Alan keseka bêhêvî ye ango qet bawer nake ku Memê Alan rojekê dê ji bo wê bihê.

Penelopeia bi dilekî hezkar digel Odysseus dizewice û digihijin hev. Belam piştî ku Odysseus diçe şerê Troyayê û di ser da jî salên dûr û dirêj derbas dibin, wêca li hemberî hatina Odysseus hêvîşikestî dimîne. Ew jî mîna Zîna naxwaze ji bilî heskarê xwe rûyê kesekî bibîne. Di nava destanê da bêhêvîyeka wê ya mezin a li hemberî hatina Odysseus heye. Ew ti caran ne di bawerîya wê yekê da ye ku dê rojekê mêrê were. Di piranîya destanê da ji ber nehatina mêrê xwe di nava reşbînîyeka kûr da ye û di nava dojeheka mezin da ye. Her roj ji bo mêrê xwe rondikan dibarîne û tim li ber xwe dikeve.

Zîna Zêdan dema ku dibîhîze Memê Alan ji bo wê hatiye bajêrî ji vê yekê bawer nake. Lê piştî ku pê bawer dibe yê hatî Memê Alan e, ew xem û bohema mezin li ser xwe davêje, bi îrade tevdigere gazî keç û bûkan dike û berê xwe dide ser Kanîya Qestelê. Ew baş pê ewle ye ku heke biçê ser kanîyê wê tekez Memê Alan ji bo dîtina wê were.

Penelopeia dema ku guh lê dibe Odysseus hatîye û li hember wê ye bi awayekî tund li hemberî vê yekê derdikeve. Jixwe ji destpêka destanê heta dawîya destanê ew her çiqas di xema Odysseus jî da be, wê tu caran li hemberî hatina Odysseus bawerî nîne. Lewra li hemberî hatina wî jî Penelopeia hêvîdar nîne. Digel ku Odysseus li hember wê ye jî û dixwaze êdî ew pê bawer be lê ew pê bawer nabe û dest bi ceribandinan dike. Piştî Odysseus ji ceribandînên wê derbas dibe piştê êdî bawerîya hatina Odysseus li ba wê qahîm dibe.

Zîna Zêdan keseka ewqas xudan talih nîne ku bigiije yarê xwe. Ew digel ku ewqas aşîqê Memê Alan e û Memê Alan jî aşîqê wê ye lê mixabin evîna wan naçe serî. Memê Alan di nava destê wê da dimire û ew jî li hemberî vê yekê bi tevahî têk diçe. Tawil porê xwe diqusîne û heta ku dimre xwe ji girîn û qêrînan nade alîyekî.

Penelopeia piştî ku bi salan kul, êş, jan û kesera evîna xwe dikişîne, digihije merama dilê xwe. Penelopeia ti caran ji bilî Odysseus zewaca digel yekî din nafikire, ew ji bo evîna xwe li ber xwe dide heta ku digihije armanca dilê xwe.

Di destanê da çî Zîna Zêdan be çî Penelopeia be her du jî evîndarên heskarên xwe ne. Ji bo ku bigihjin yarên xwe ew jî zaf zehmetîyan dibînin û gelek li ber xwe didin. Ev her du dilber ji bilî gihiştina yarên xwe û ji bilî yarên xwe bi kesên din ra zewicîn û yekbûnê nafikirin. Digel ku xwazgînîyên wan zaf in jî lê ew her du dev ji wefadarî, sadiqbûn û heskirinê bernadin.

2.2.2. Berawirdkirina Aqilmendîya Zîna Zêdan û Penlopeiayê

Zîna Zêdan bi qasî evîndarîya xwe ewqas jî keseka xudan hizir û aqil e. Di destanê da piranîya tevgerên Zînê di çarçoveya hişmedîyekê da ne. Ew jî bi qasî heskirîyê xwe Memê Alan xwedan tevdir e û aqilmend e. Zîn dema ku digel Memê Alan li ser Kanîya Qestelê hev dibînin, Mem him ji Zînê dixwaze hêzara ser rûyê xwe rake û him jî jê dixwaze ew tasek avê bide wî. Belam Zîna Zêdan keseka biaqile lewma baş dizane ku xelkê Cizîra Botan li wan temaşe dike. Ji ber vê yekê daxwazên Memê Alan bi tundî red dike. Memê Alan her çiqas li hember vê yekê gefan ji wê ra bixwe jî belam ew ji ya xwe şaş nabe. Ev aqilmendîya wê dibe sedem ku xelkê Cizîrê êrîşekê nebine li ser wan. Ew di destanê da hertim li gorî pîvanên aqlê xwe hereket dike û ji tevgerên ji rêzê dûr e.

Penelopeia jî mîna Odysseus keseka baqil e û heta em dikarin bibêjin ku ew tam xwandekarê Odysseus e. Ew jî mîna mêrê xwe di emilandina aqilê xwe da keseka serkeftî ye. Dema ku xwazgînî jê ra peyda dibin, Penelopeia bi hinceta dîrîna kifinekê ji xwezûrê xwe ra wan xwazgînîyan bi salan dixapîne. Ji ber ku ew hertim di naveroj da dest bi dîrîna kifinekê dike û dema dibe şev çî tişt dîrîbe wê ji nû ve ji hev derdixîne û vedike. Ev lîstika wê ye baqilane bi salan berdewam dike. Ev yek dibe sedem ku heta hatina Odysseus bi tu kesî ra nezewice. Penelopeia keseka xudan aqil e lewma jî kirinên wê jirêzebûnê dîr in. Ew di nava mala xwe da jî li hember valahîya desthiladarîyê li beramberî xwazgînîyan li ber xwe dide. Ti caran ji bilî Odysseus ti kesî nafikire lewma ev yek dibe sedemê wê ku ew tim bi awayekî baqilane tevbigere û ji zehmetîyan bifilite.

Di destanê da ji alî emilandina aqilê xwe ve û li gorî tevgerîna aqilî ne Zîn kêmi heskirîyê xwe ye ne jî Penelopeia kêmi mêrê xwe ye. Ew her du di nava destanê da bi gelemperî li gorî hişmendîyekê tevdigerin.

2.2.3. Berawirdkirina Delalîya Zîna Zêdan û Penlopeiayê

Zîna Zêdan bi delalîya xwe di nava destanê da deng vedaye. Piştî ku Memê Alan wê dibîne êdî hew li hemberî vê delalîyê debar dike. Ji bo ku bigihije vê delalîya delalan hemû xeternakîyan dide ber xwe û berê xwe dide warê wê. Em dizanin ku Memê Alan ji bo vê delalê dev padihaştîya xwe û hemû statuyên xwe yên civakî berdaye. Tenê ne Memê Alan evîndarê vê delalê ye herwiha pismamên wê jî ji ber Zînê pîrr caran hev êşandine. Her yek ji wan dixwaze Zîna Zêdan ji wan ra be û li hember vê jî ji kuştina hev ra amade ne.

Penelopeia digel ku keseka zewicî ye û li ser delalîya wê salên dîr û dirêj jî derbas bûne lê ew hêj jî keseka delal û xweşik e. Jixwe Odysseus digel salên dirêj hew debar dike û

dixwaze vegere li ba yara xwe. Odysseus ewqas tehlûke û xeternakîyan hew ji bo vê delalê dide li ber çavan. Yezdan dixwazin bi Odysseus ra bizewicin û wî bikin mîna xwe nemir belam Odysseus bes vê delalê difikire û ji bo wê xwe davêje di nava bûyerên xeternak da. Ne tenê Odysseus li hemberî vê delalê sermest e herwiha ji wê ra pirr beg û prens jî dibine xwazgînî. Her yek ji bo ku bigihijin vê delalê li ber xwe didin û mirina xwe didine li ber çavan.

Di destanê da çî Zîn be çî Penelopeia be bi delalîya xwe navûdeng in. Jixwe serlehengên destanan ji bo ku bigihijine delalên li ber dilê xwe evqas dikevîne xeternakîyan. Ji her du yan ra jî xwazgînî zaf in û ev kes ji bo wan amade ne şerbeta mirinê vexwin.

2.2.4. Berawirdkirina Hin Taybetmendiyan Din ên Zîna Zêdan û Penelopeiyê

Zîna Zêdan dema ku digel yekî daxive, yek ji taybetmendiyan wê ew e ku şîretan dixwe di nava gotinên xwe da. Şîretên Zîna Zêdan ji ber hişmendîya wê tê ji ber ku ew di vegotina şîretan da di çarçoveya hişmendîyê da tevdiqere. Ti caran şîretên ji rêzê nake û paşxana van şîretan xwe dispêre serborî û aqilmendiya wê.

Penelopeia jî jineka têgihîştî û şîretbêj e. Ew ji ber ku xudan temeneke lewma zaf tecrûbeyê wê hene. Bingeha van şîretên wê bêguman xwe dispêre aqilmendî û serborîyên wê. Di nava şîretên wê da hişyarî zaf cih digre û dixwaze kesinan bi şîretên xwe ra li hember bûyerên dê biqewimin, biparêze.

Zîna Zêdan di nava destanê da ji ber statuya xwe xudan otorîte ye. Ew ji ber ku qîza Mîr e ango prenses e lewma vê statuya xwe baş bi kar dibe. Pir xidam û beremrên wê hene. Dema ku ew dibihîze Memê Alan hatîye Cizîrê vê otorîteya xwe bi rê ve dibe û bang li qîz û bûkan dikin ku ew kom bin. Ew qîz û bûk jî li ser daxwaza prensesa xwe têne ba hev û berê xwe didine Kanîya Qestelê.

Penelopeia piştî çûyîna mîrê xwe bi zarê xwe Telemakhos ra tenê dimîne. Ew dizane ku di mala wê da ji ber nebûna Odysseus valahîyeke otorîteyê heye lewma heta ku zarê wê mezin dibe, ew mala xwe birêve dibe. Digel ku kurê wê mezin dibe jî lê ew dibîne ku kurê wê nikare di nava malê da bibe xudan desthilatdarî. Lewma ew pirî caran vê otorîteyê digre destê xwe û li hember vê bêotorîtebûna kurê xwe him wî rexne dike him jî ji bo ku ew bibe xudan otorîte şîretan li wî dike.

Zîna Zêdan her çiqas bi taybetmendiyan xwe yên erênî bê li pêşberî me jî carna sistîyên wê jî di nava destanê da peyda dibin. Ji bo carekê jî be em dibînin ku ew hêvîya xwe ji Memê Alan qut dike û dixwaze berê xwe veqerîne qelendiya xwe Çeko. Belam ev yeka wê zêde nadome piştî bihîstina xebera Memê Alan li ser xwe ve tê. Herwiha ew di destanê da hin caran mîna heskirîyê xwe dibe keseka dilhişk û dilkevîr. Dema ku ew hêrs dibe çavên wê ti kesê nabîne û bi dileke xedar ji wan kesan ra gefan dixwe.

Penelopeia jî carna mîna Zînê di nava tevgerên nerênî da ye. Di nava destanê da sistîyên wê zêde nebin jî, hene. Ew jî ji ber nehatina Odysseus dibe keseka şîyanşikestî. Ew bi salan e ji Odysseus ra bûye bendewar ji bilî wî ti kesî nafikire belam carekê be jî rûyê xwe jî vê yekê badide û dixwaze bi xwazgîniyekê ra bizewice. Belam ev yeka wê jî zêde nadome û

digel hatina Odysseus ev reşbînîya wê ji holê radibe. Herwesa ew jî mîna Zîna Zêdan ne zêde jî be carna dibe keseka nobran û li hemberî hin kesan zû hêrs dibe. Dema ku ew hêrs bibe bi awayekî rûhişk li hemberî kesan gefan dixwe.

2.3. Berawirdkirina Lehengên Din ên Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di destanên me da bêguman zaf leheng cih digrin. Em di beşên din da li ser lehengên li derveyî lehengên sereke, bi berfihî rawestîya bûn. Em ê niha van lehengên ku ji derveyî wan karakterên sereke mane, rawestin. Em ê di bin vî ser navî da du binenavan vekin ku dê di yekê da lehengên arîkar cih bigrin û di ya din da jî lehengên astengêr cih bigrin. Em ê di bin sernava lehengên arîkar da li ser lehengên ku ji serlehangen ra bûne arîkar rawestin. Di bin sernavê lehengên astengêr da jî li ser lehengên ku li dijî serlehangen tevdigerin, rawestin.

2.3.1. Berawirdkirina Lehengên Arîkar ên Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di her du destanan da bêguman ji bilî lehengên sereke herwiha hin lehengên din jî hene. Di nava wan lehangen da hinan bi hemû şîyana xwe ve berê xwe dayîne arîkarîya serlehangen. Ev lehengên arîkar bêguman ji bo ku serleheng bigihije armanca xwe çî ji destê wan tê ji bo serlehengî dikin. Ev arîkarîya wan carna maddî ye carna jî manewî ye.

Di destana Memê Alan da lehengên ku arîkarîya serlehengê destanê dikin zaf in. Belam di nav wan da yên ku bi awayekî aktîf cih digirin wisa ne: Beglî, Hesên, Çeko, Qeretacîn, Sitî, Xocê Xidir û Şivan. Ev lehengene di destanê da ji bo serleheng bigihije armanca xwe di nava têkoşînekê da ne. Di asteka fedakarane ya bilind da ji serleheng ra dibine arîkar.

Di destana Odysseia da jî lehengên arîkar ciheke giring digrin. Di destanê da kesên ku ji bo vegera Odysseus arîkar in zaf in belam yên ku di warê aktîfbûna arîkarîyan da wiha ne: Telemakhos, Nestor, Menelaus, Hevrêyên Odysseus, Welatîyên Phaiak, Athene û Şivan. Ev kesên navborî ji bo ku Odysseus bigihije armanca xwe çî ji destê wan tê ji bo wî dikin û xwe ji tiştên xeternak nadin alî.

Memê Alan di destanê da xwedî hevrêyên giring e di nava wan hevrêyan da Beglî, Hesên, Çeko, Qeretacîn cih digrin. Memê Alan dema ku li Mixribê ye hevrêyê wî yê arîkar Beglî ye. Beglî ji bo ku gotinek Memê Alan nebe didu çî ji destî tê dike û hertim li ber fermana Memê Alan di amadebaşîyê da ye. Dema ku Memê Alan bixwaze çalakîyekê an jî tişteke din bi cih bîne demildest van tiştana Beglî pêk tîne. Piştî biryara çûyîna bajarê Cizîra Botan Beglî hemû tişt û kêmasîyên wî pêk tîne. Beglî dema ku dibihîze Memê Alan hatiye kuştine hew xwe radigire û ji bo tolvedanê tê bajarê Cizîra Botan û heyfa prensê xwe ji wan distîne. Bêguman di destanê da hevrêyên ku herî zêde arîkarîya wan digihije Memê Alan her sê Celalî ne. Hesên, Çeko û Qeretacîn di nava destanê da sembolên arîkarî, mêvanperwerî, fedakarî û mêrxasîyê ne. Dema ku Memê Alan dibe mêvanê wan ev her sê bira amadehîya hemû cure xweşî û nexweşîyan didine li ber çavên xwe. Memê Alan ji bo Zîna Zêdan hatiye û haya her sê Celalîyan pê çêdibe. Ji ber ku Zîn qelendîya Çeko ye lewma di destpêka da vê yekê qebûl nake lê birayên wî bi kuştina wî jî be li ber wî disekin. Piştî hin gengeşîyan ew dev ji qelendîya xwe berdide û heta dawîya destanê jî bertekekê di vî warî da nîşan nade. Her sê Celalî ji bo ku Memê Alan bigihije merema xwe çî berpêlk hebin li pêşîya Memê Alan bi nîyazpakî wana ji holê radikin. Ew mêvanperwerîyek wisa nîşanî Memê Alan didin ku mirov

matmayî dimîne. Ji bo Memê Alan sondên mezin û giran dixwin, ji bo Memê Alan Hesên kurê xwe davêje nava agirî da, ji bo Memê Alan Sitîya Zêdan kuştina birayê xwe Mîr Ezîz dide li ber çavan û ji mêrê xwe dixwaze ku Memê Alan ji nav destên Mîr xilas bike.

Odysseus di destanê da her çiqas li raberî êş û kulên mezin bihê jî ji nava van êş û azaran da bi arîkarîya hin kesan serdikeve. Di destana Odysseus da du cure hevrêyên wî cih digrin, em dikarin van hevrêyên wî bikin du beş. Di beşa yekem da hevrêyên wî yên temenmezin, mîr û kesên navûdeng cih digrin. Di beşa duyem da jî hevrêyên wî yên ku li piştî şerê Troyayê da digel wî bûn, cih digrin. Ji bilî hevrêyên Odysseus herwiha Telemakhos û Welatîyên Phaiakê jî cih digrin. Odysseus berîya here şer lawikê wî Telemakhos berşîr bû. Piştî bi salan Telemakhos ji bo ku here bavê xwe peyda bike dide li ser şopajotinekê û berê xwe dide li ba hevrêyên wî yên Mîr. Mentor û Menelaus hevrêyên Odysseus yên berê ne û digel wî di şeran da cih girtine. Lewma dema ku dibihîzin Telemakhos hatîye û qesta wan kirîye ji bo arîkarîya peydakirina bavê xwe, ew çî ji destê wan tê dikin. Mêvanperwerîyek baş nîşanî Telemakhos didin, dîyarîya pêşkêşî wî dikin û heta Mentor di vê rêya dijwar da lawikek xwe jî bi Telemakhos ra dişîne. Telemakhos ji bo ku şopa bavê xwe peyda bike hemû xetereyan dide li pêş çavên xwe. Piştî ku bavê wî vedigere jî bi wî ra dikeve nava planan û mîna mîrxasekî digel wî bi xwazgîniyan ra şer dike. Welatîyên Phaiakê jî mirov dikare bibêje ku kesên xêrxwaz û arîkar in. Ew dema ku Odysseus li ba wan e her cure qencîyê lê dikin. Dema ku wexta Odysseus ya çûyîne tê jî bi tîra xwe dîyarîyan didine Odysseus û wî digihîjîne welatê wî. Herwiha hevrêyên Odysseus yên ku bi wî ra pîrr caran azaran dikînin jî hene. Odysseus dema ku dikeve li ser rêya vegeerê digel van hevrêyên xwe ye. Ev hevrêyên wî hin caran jê ra dibine berpêlk jî belam cardin jî di nava destanê da ew jî li ba Odysseus ji bo vegeerê li ber xwe didin û li ber emrên Odysseus tim amade ne.

Di destana Memê Alan da yek ji lehengê derasayî û arîkar bêguman Xocê Xidir e. Xocê Xidir di destanê da him dibe sedemê hatina Memê Alan a cîhanê him jî dibe sedemê arîkarîyên mezin bo gihiştina mebesta Memê Alan. Xocê Xidir di destanê da sembola arîkarî, rênîşandayîn û şîretan e. Xocê Xidir ji bo ku Memê Alan here Cizîra Botan çî ji destê wî tê dike. Di derên berteng da tê arîkarîya Memê Alan, ji bo ku ew ji hin berpêlkan derbas bibe şîretan li wî dike û ev şîret û rênîşandayînen Xocê Xidir dibe sedem ku Memê Alan bêyî astengan bigihije Cizîra Botan.

Di destana Odysseus da jî yek ji lehengê mîtolojîk û arîkar Xwedawend Athene ye. Athene jî serê destanê hetta dawîya destanê ji bo Odysseus ji destê wê çî bihê, dike. Ew dema ku dibîne Odysseus di haleke nebaş û berteng da ye tê moralê didê, xwasteka vegeerê dixê dilê wî. Dema ku dê Odysseus biçe derekê berîya ku tiştek nerênî pêk were jê ra şîretan dike. Odysseus bi xwe jî van arîkarîyên Atheneyê dizane, dibîne û kesên ku di destanê da jî cih digrin dizanin ku Athene arîkarîyên mezin dide Odysseusî. Dema ku Odysseus tê welatê xwe jî, cardin Athene li ser dikê ye. Ew di şerê li hemberî xwazgîniyan da cisareteke mezin dixê dilê Odysseusî û ev yek dibin ku sedem ku Odysseus ji astengîyên mezin bifilite.

Di destana Memê Alan û Odysseia da bêguman lehengeke din ê balkêş yê arîkar heye ku ew jî Şivan e. Di destana Memê Alan li ser wî, navê wî û taybetmendîyên wî mixabin zêde agahdarî tine belam di destana Odysseus da em lê rast tên ku wî şivanî nav heye û

taybetmendîyên wî li ber çav in. Bêguman di her du destanan da mîna lehengeke arîkar Şivanek heye. Ev lehengê Şivan biqasî ku me tesbît kirî di piranîya destanên cîhanî da dibore û sembola arîkarîyê ye. Di hin çîrokên mîtolojî da û destanan da şivan wek sembola qencîtî û xêrxwazîyê wiha cih digrin. Em dizanin ku Parîs yek ji kurên Priamos e, lê Parîs berîya ku bê dinê, dîya wî Hekabe xewneke nebaş dibîne. Dema ku vê xewna xwe ji çend kesan ra dide şîrovekirin, rola nebaş a Parîs dibîne lewma dema ku Parîs tê dinê wî dide xizmetkarên xwe da ku wî bavêjin yan jî bikujin. Lê xizmetkar gunehên wî bi savabûna Parîs tê û wî dibe dane daristanekê. Li wê derê hirçek pêşîyê xudan lê derdikeve piştê jî şivanek wî dibîne û wî xwedî dike heta ku mezin dibe.⁵⁰⁸ Di Şehnameya Fîrdewsî de jî cardin şivanek derdikeve pêşberî me. Li vir de Ferîdûn li hember gefa Dehhaq, jîyana wî di xeterê da ye loma dayika Ferîdûn wî radestî şivanekê dike û şivan jî li wî xwedî derdikeve û mezin dike.⁵⁰⁹ Di van destanên Memê Alan û Odysseia da lehengê şivanî cih digre û di her duyan da jî peywira wan yek e ku ew jî qencîtî û arîkarî ye.

Çi destana Memê Alan be çî destana Odysseia be di her duyan da jî lehengên arîkar zaf cihekî muhim digrin. Lehengên arîkar ji bo ku serleheng bigihjin armanca xwe çî ji destê wan dihê, dikin. Di serketinên serlehangên da pareka mezin a lehengên arîkar heye. Asta arîkarîya lehengên arîkar hertim di astekî fedakarîyê da ye.

2.3.2. Berawirdkirina Lehengên Astengêr ên Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di destanên me da hin leheng hene ku mirov dikare wan di bin navê lehengên astengêr da kom bike. Ew di her du destanan da jî ji bo ku serleheng têk biçin serî li her cure nexweşî û hîlebazîyan didin. Lehengên astengêr her wekê ji navê wan jî dîyar e dixwazin ji gihiştina evîndaran ra bi timî bibin asteng. Em ê niha li ser van lehengên her du destanan hilsegandinên xwe pêk bînin.

Di destana Memê Alan da bêguman lehengê herî negatîf, xêrnexwaz û astengêr Bekoyê Ewan e. Ew di destanê da hertim li dû nexweşî û xêrnexwazîyan e. Ji dema hatina Memê Alan a bo Cizîra Botan heta ku ew tê jehrîkirinê, bi timî li dû têkberina Memê Alan û evîna wî ye. Ew di destanê da beremrêkî Mîr Ezîn e, zehlê wî ji camêrdî û mêrxasîyê diçe lewma her gav bereksê van kesan tevdigere. Ew ji berê da hez mala Celalîyan nake û bi hatina Mem ra jî ev lênehezkin digihije asteka bilind da. Bekoyê Ewan kesekî remilavêj e, piştî ku dizane Memê Alan tê bo Cizîra Botan qîza xwe dişîne li pêşîya wî da ku wî bixapîne belam planên wî têk diçin. Beko ji ber ku bi tena serê xwe nikare Memê Alan û her sê Celalîyan lewma dixwaze bi fitne û fesadîyan Mîr Ezîn bikêşe alîyê xwe da ku bikaribe Memê Alan û hevrêyên wî têk bibe. Wekî xwasteka wî her tişt diçe û ew Mîr Ezînî dike pêlîstokek di destê xwe da. Beko piştî ku Mîr Ezînî dike amûrê xwe yê dijayetîya Memî êdî hêza wî ya li hemberî Memê Alan heta astekê mestir dibe. Ew di destanê da ti caran nikare bi tena serê xwe li hemberî Memê Alan û her sê Celalîyan reaksiyonekê pêk bîne lewma dema ku bixwaze tişteke bike vê yekê bi arîkarîya Mîrî dike. Beko ji destpêkê heta dawîyê tim li dijayetîya Memê Alan da ye, ji bo ku ew têk biçê hemû hêza xwe diemilîne û hertim xwe davêje bextê xêrnexwazîyan.

⁵⁰⁸ h.b, Tanrıların Masalları, r.111.

⁵⁰⁹ Fidevsî, Şahname, Kabcacı Yayınları, Wer. Prof. N. Lugal, Ankara 2009.

Di destana Odysseia da lehengê herî astengêr bêguman Poseidon e. Ji destanê jî em dizanin ku Poseidonî hêrseke mezin ya wî bo Odysseus heye. Poseidon bi salan li hemberî Odysseus bi awayekî nexweş tevdigere û ji bo ku wî têk bibe hemû hêza xwe diemilîne. Di her têkçûneke Odysseus da kêma zêde karigerîya Poseidon heye. Poseidon sedemê zehlçûyîna xwe ya li hemberî Odysseusî dispêre çavkorekirina lawê xwe. Em ji destanê dizanin ku dema Odysseus di şikefta Kyklopekî da asê dimîne, bi awayekî xwezayî dixwaze ji wir derkeve û ji bo derketinê jî astengêrê mezin anku wî Kyklopî kor dike. Piştî vê êdî hêrsa heyî ya Poseidon her ku diçe zêdetir dibe. Ew dema ku têkbirinekê dihîne serê Odysseusî tim xwe dispêre vê hincetê. Poseidon ji ber ku Yezdanekî mezin ê Olymposê lewma zû bi zû ti kes nikare dijayetîyekê li hemberî wî pêk bîne. Ew jî vê yekê baş dizane û xezebên mezin dihîne serê Odysseusî. Odysseus dema ku ji alîyê Phaiakîyan ve dihê mala xwe hinga hêrsa xwe badide ber bi alîyê Phaiakan. Ew kesên ku Odysseus birine, li hember wan hêrs dibe û wan tevan serobino dike anku dikuje. Poseidon ne tenê dijminê Odysseus e, ew herwiha dijmin dostên Odysseus jî. Di destanê da ew tim ji bo xêrnexwazî û têkbirinan tê beramberî me.

Di destana Memê Alan da yek ji kesên xêrnexwaz û astengêr Qîza Beko anku Zîn e. Qîza Beko jî mîna bavê xwe tim li dijayetîya serleheng da ye. Qîza Beko ji destpêka hatina Memê Alan a bo Cizîra Botan da tê beramberî me û dixwaze Memê bixapîne. Ji ber ku nikare bixapîne lewma rêyên şaş dide li ber wî da ku Memê Alan winda bibe. Belam di fêlbazî û hîlebazîyên xwe da bi ser nakeve. Qîza Beko di têkbirina Memê da xwedî rol e. Ew mîna bavê xwe sembola xêrnexwazîyê ye lewma jî bi hîlebazî tevdigere. Qîza Beko diçe hinarekê tîne dide Zîna Zêdan û wê dixapîne ku Zîn jî bi wê dixape. Piştî wê yekê Zîna Zêdan bêyî ku jê hayedar be diçe hinarê dide Memê Alan û Memê Alan ji ber hinara jehrîkirî dimire. Qîza Beko piştî bavê xwe astengêra herî mezin a li dijî serleheng e.

Di destana Odysseus da yek ji astengêr Kyklopî ye û ew kurê Poseidon e. Kyklop jî lehengekî dijayetîyê ye û kesekî xêrnexwaz e. Dema ku Odysseus dihê û xwe davê bextê wî, ew bi namerdane tevdigere û Odysseusî digel hevrêyên wî di şikefta xwe da asê dike. Her çiqas Odysseus û hevrêyên wî bi awayekî pozîtîf jî li ber wî bigerin belam ew her nexweşîyê digere. Kyklop piştî asêkirina Odysseus û hevrêyên wî her şev çend ji wan dixwe. Li hember vê Odysseus bîaqilane tevdigere, Kyklopî kor dike. Piştî korkirinê jî bi awayekî ji destê wî difillite. Kyklop ji ber ku tiştek ji destê wî nayê lewma hew nifîna ji Odysseus ra dike û Poseidon jî nifînên wî diqebilîne. Kyklop astengêreke mezin e û naxwaze Odysseus ser bikeve.

Di destana Memê Alan da astengêrê dawîn yê ku em li ser bisekinin Mîr Ezîn e. Mîr Ezîn mîrî Cizîrê ye û ew jî li dijî Memê Alan e. Di destanê da ew hertim di bin bandora Bekoyê Ewan da ye û ji bilî wî nikare gavekê jî bavêje. Di destanê da Mîr Ezîn bûye kesekî pêlistok û li gorî daxwazên Beko tevdigere. Di têkçûna Memê Alan da para wî mezin e û ew jî kesekî xêrnexwaz e.

Di destana Odysseia da astengêrê dawîn yê ku em li ser wan bisekinin xwazgînî ne anku xwazgînîyên jina Odysseus in. Di nava destanê da xwazgînî di profileka nebaş da hereket dikin. Ew ji lawikên mîr û malmezinan pêk dihên. Ji ber ku di hizra mirina Odysseus

da ne lewma dixwazin bi jina wî ra bizewicin û malê Odysseusî jî yek ji wan ra bimîne. Piştî ku Odysseus tê wan tevan dikuje û ew têk diçin. Ew tev sembola xirabî û xêrnexwazîyê ne.

Di destana Memê Alan da jî û di ya Odysseia da jî çawa ku lehengên arîkar hene heman wisa lehengên astengêr jî hene. Lehengên astengêr ji bo ku serleheng têk biçin çî ji destê wan dihê dikin. Ew tim di têkçûna serlehang da xudan rol in û ji bo ku serleheng negihije merama xwe tim jê ra dibine asteng.

2.4. Berawirdkirina Lehengên Mîtolojîk (Derasayî) û Tiştên Sembolîk Di Destanên Memê Alan û Odysseia Da

Di destanên Memê Alan û Odysseia da digel lehengên ji rêzê herwiha lehengên mîtolojîk jî ciheke giring digirin. Di her du destanan da hebûna van lehengên derasayî û mîtolojîk destanên qedîm arkaîktir dike. Di her du destanan da jî hebûna van lehengên mîtolojîk bi awayekî girêdayî serleheng e, di serkeftinên an jî têkçûnên serleheng da roleka wan ya berbiçav heye.

Di destana Memê Alan da lehengên mîtolojîk û derasayî zaf nebin jî cih digrin. Di destanê da lehengên mîtolojîk û derasayî wiha ne: Xocê Xidir, Mîrê Cinan (Perîyan), Tavbano, Heyvbano, Stêrbano û Bozê Rewan e. Di nav van lehang da Xocê Xidir digel derasayîtiya xwe herwiha wek kesayetekî xêrxwaz ê dînî jî tê li hemberî me. Xocê Xidir ji bo Memê Alan wek lehengekî arîkar e û di hin serkeftinên Memê Alan da rola wî heye. Xocê Xidir di destanê da lehengek arîkar, şîretdar e û erênî ye. Herwiha wek lehengek mîtîk Mîrê Perîyan jî heye ku di nava destanê da em hew li rastî navê wî dihên û dema perî soz dixwin jî xwe dispêrin kitêba Mîrê Perîyan. Ji xeynî van tiştan em li himberî ti rolekî an jî tevgerêkî Mîrê Perîyan nayên. Di destanê da her sê qîzên perîyan ango Tavbano, Heyvbano û Stêrbano di destpêka destanê da bi awayekî aktîv cih digrin. Di hin deran da em li rastî dîyalogên di nava wan da dihên. Ev her sê perî ji bo serleheng lehengên arîkar û erênî ne. Ji ber ku bi saya van lehengên mîtolojîk dibe evîndarekî mezin. Wek lehengek mîtolojîk ê dawîn Bozê Rewan jî di destanê da cihê xwe bi awayeke aktîf, li gorî lehengên din digire. Bozê Rewan di serpêhatiyên Memê Alan da li ba wî ye û heta mirina Memê Alan jî ew di destanê da bi awayeke çalak cih digre. Bozê Rewan wek lehengeke mîtolojîk ji bo Memê Alan lehengekî arîkar e.

Di destana Odysseia da ji ber ku destanê arkaîkbûna xwe parastîye lewma lehengên mîtolojîk û derasayî zaf cih digrin. Di destana Odysseia da lehengên mîtolojîk û derasayî wiha ne: Athene, Poseidon, Kalypso, Kirke, Kyklop, Zeus, Hermias, Aphrodite û Here. Bêguman ji xeynî van kesayetên mîtolojîk jî gelek lehengên din ên mîtolojîk cih digrin. Belam di destanê da me pitir bala xwe daye van lehang û em li ser wan rawestîyane. Di nav van lehengên mîtolojîk da Athene li gorî lehengên din di destanê da aktîftir cih digire. Di destanê da Athene ji bo serkeftina Odysseus û vegera wî ya ji bo warê wî çî ji destê wê dihê dike. Athene di destanê da lehengeka arîkar û şîretdar e. Poseidon di nava van lehang da piştî Atheneyê lehengê herî aktîf ê mîtolojîk e. Di destanê da ji bo têkçûna Odysseus çî ji destê wî dihê dike. Ev lehengê mîtolojîk lehengekî astengêr û xêrnexwaz e. Ji xeynî van lehang Kalypso jî lehengeka mîtolojîk e û ew digel Odysseus bi salan wek mêr û jin dijî. Ji bo Odysseus lehengeke astengêr e ji ber ku naxwaze Odysseus ji ba wê biçê. Kirke jî di destpêkê da wek

lehengeka mîtolojîk astengêr e belam paşê ji Odysseus ra pîrr dibe arîkar û Odysseus bi saya wê hay ji çarenûsa xwe dibe. Lehengeke din ê derasayî Kyklop e ku ev lehengê derasayî kurê Poseidon e. Kyklop jî wekê bavê xwe karakterekî astengêr û xêrnexwaz e. Ji bilî van karakteran Zeus, Hermias, Here û Aphrodite jî cih digrin. Ev lehengên mîtolojîk (Zeus, Hermias, Here û Aphrodite) li gorî lehengên din di destanê da zêde çalak nînin. Zeus di destanê da mezinê hemû Yezdanên Olymposê ne û lehengên mîtolojîk jî li gorî biryara wî tevdiagerin.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da her wekî me anîye zimên lehengên mîtolojîk ciheke giring digrin. Di destanan da ev lehengên mîtolojîk hin ji wan jî serlehangen ra dibin arîkar hin ji wan jî jî serlehangen ra dibin asteng. Di destana Memê Alan da Xocê Xidir kesayetê xêrxwazî û arîkarîyê ye. Di destana Odysseia da jî li beramberî vî lehengî Athene lehengê mîtolojîk ê xêrxwazî û arîkarîyê ye. Him Xocê Xidir him jî Athene ji bo ku serleheng bigihijin armanca xwe çî ji destê wan dihê dikin û berpêlkan li ber pêyên wan radikîn. Dema serleheng li rastî tehlûke û xeternakîyan werin ev leheng dikevîne çalakîyê û bi şîret û arîkarîyan, serlehangen ji van tiştên nerênî xilas dikin. Di her du destanan da peywira Xocê Xidir û Atheneyê yek e.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da lehengên xêrnexwaz ji hev cihê ne. Di destana Memê Alan da Bekoyê Ewan bi hebûna xwe lehengekî xêrnexwaz û astengêr e belam ew ne lehengekî mîtolojîk e. Erê hin deran kesekî derasayî ye belam pitir wek lehengekî ji rêzê ye. Belam di destana Odysseia da Poseidon lehengekî mîtolojîk ê xêrnexwaz û astengêr e. Ew ji bo ku serleheng têk here bi timî di nava liv û tevgeran da ye. Peywira Bekoyê Ewan û Poseidon di her du destanan da yek e û naxwazin serleheng ser bikevin.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da ji xeynî van lehengên mîtolojîk ên sereke herwiha me anîbû ziman ku lehengên din ên mîtolojîk jî cih digrin. Di destana Memê Alan da Mîrê Perîyan, Tavbano, Heyvbano û Stêrbano kesayetên mîtk in. Di destana Odysseia da wek kesayetên mîtk ên li beramberî vana Zeus, Here, Aphrodite û Athene ye. Di her du destanan da jî lehengekî mîtolojîk ê mezin heye. Di destana Memê Alan da ev lehengê mîtolojîk ê mezin Mîrê Perîyan e, di destana Odysseia da ev lehengê mîtolojîk ê mezin Zeus e. Zeus li gorî Mîrê Perîyan bêtir aktîf e di destana xwe da belam Mîrê Perîyan hew navê wî dibore. Van her du lehengên sereke jî qîz hene û qîzên wan ihtiramê ji bavê xwe ra digrin. Peywira Mîrê Perîyan û Zeus yek e di destanan da.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da lehengên ku peywira wan nêzî hev e ne pîrr jî bin hene. Ji xeynî Mîrê Perîyan û Zeus herwiha qîzên wan her du lehengên mîtolojîk jî cih digrin. Di her du destanan da jî sê qîzên wan li ber çavan e. Di destana Memê Alan da qîzên Mîrê Perîyan Tavbano, Heyvbano û Stêrbano li ber çav in. Di destana Odysseia da qîzên Zeus Here, Aphrodite û Athene li ber çav in. Di her du destanan da wekî alîyê hişî ve Stêrbano û Athene nêzî hev in. Çimkî em ji destana Memê Alan dizanin ku ya ku destpêka evîna Mem û Zînê dayî destpêkirinê Stêrbano bû. Ew bi hişmendîyane tevgerîya bû û hay ji hin tiştan bibû. Athene jî li gorî xwişkên xwe Here û Aphroditeyê hişmendîtir e di destanê da. Di her du destanan da ev kesayetên mîtolojîk wek peywir nêzî hev in.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da herwiha hin leheng hene ku li beramberî wan ti lehengên mîtolojîk cih nagrin. Di destana Odysseia da ji ber ku lehengên mîtolojîk zaftir in li gorî destana Memê Alan lewma hin lehengên mîtolojîk di destana Memê Alan da li beramberî ti lehengan nayên. Ku ev lehengên mîtolojîk wiha ne: Kyklop, Kirke, Kalypso û Hermias. Ev lehengên navborî di destana Odysseia da bi awayekî aktif cih digrin. Belam di destana Memê Alan da li beramberî van lehengan ti lehengên nêzî wan cih nagrin. Herwiha di destana Memê Alan da wek lehengeke mîtolojîk ê ajal Bozê Rewan cih digre. Ev lehengê mîtolojîk ê ajal di destana Memê Alan da taybet cih digre û di destana Odysseia da li beramberî wî ti lehengên mîtolojîk ê ajalî cih nagre.

Di destanên Memê Alan û Odysseia da ji bilî tiştên nêzî hev herwiha tiştên ku di hin destanan da cih digrin û di hinan da jî cih nagrin, hene. Di destana Memê Alan da hin tiştên simbolîk hene ku ev yek taybet e bo destana Memê Alan û li beramberî van tiştên simbolîk ti tiştên simbolîk di destana Odysseia da cih nagre. Di destana Memê Alan da wek dihê zanîne em li ser du mêweyên simbolîk û balkêş rawestîya bûn. Di destanê da sêw wekî simbol dihate beramberî zurrîyetê ango dîndeyê û ev sêw dibû sedema berdewamîya nijadan. Herwiha di destanê da hinar jî wek simbol dihate beramberî mirinê. Ev tiştên simbolîk bes di destana Memê Alan da hene û li beramberî van tiştên simbolîk ti tişt di destana Odysseia da cih nagre.

ENCAM

Di xebata xwe ya bi navê “Berawirdkirinek Li Ser Destana Memê Alan û Destana Odysseia” da em bi berfirehî li ser destanên heyî rawestîyan. Di destpêkê da destana Memê Alan û destana Odysseia her çiqasî ji hevdu cuda bêne xuyanê jî mebesta me ew bû ku em nêzikatîya her du destanan digel ferq û cudahîyên wan çî ji alîyê lehengên destanan be çî jî ji alîyê muhtewayê be, digel şîrove û hilsengandinên xwe, raxînin li ber çavan.

Her wekî em li jor jî bi berfirehî li ser lehengên sereke yên destanan rawestîyane jî, me dît ku di liv û tevgerên xwe da Memê Alan û Odysseus pirr dişibin hev. Dema ku rûdanek pêk were her du leheng jî li hember rûdanan bi awayekî hişmendîyane, digel têrfikirîna planekê hereket dikin. Di her du destanan da ev serleheng çî ji alîyê lehengîyê be çî jî ji alîyê evîndarîyê be liberxwedanên wan nêzî hev in û sedemê vê yekê jî xwe dispêre wuslata bo yarê. Serlehengên destanan bi gellek alîyan va dişibin hev ku yek ji wan ev e her duyan navê xwe dayîne destanan. Ev her du destan ji serpêhatîyên van serlehengan pêk dihê. Memê Alan jî Odysseus jî tekane kurên mîrên mezin in, her du jî li derên avîn ango cihên behr lê heyî dihêne cîhanê. Çî Memê Alan be çî Odysseus be kesên bêtirs û dilhar in. Ferqa mezin a di navbera Odysseus û Memê Alan da ev e ku em dibînin di piranîya destanê da Odysseus weke kesekî şerxwaz e belam Memê Alan li gorî wî di vî warî da pasîftir e. Memê Alan jî mîna Odysseus hez bi yekê dike û heta dawîyê jî ji bo gihiştina yarê li ber xwe dide. Di her du destanên qerase da em dibînin ku sahneya li ser rûbaran hema bêje di her du destanan da jî wekî hev e. Di her du destanan da jî serleheng dema dihêne ber rûbarê pirr dikevî nava bertengîyan û bi arîkarî hinan jî wir rizgar dibin. Di destanan da em lê rast dihên ku mekanên teng ango mekanên tarî ji bo serlehengên her du destanan dibe sedemê kûrfikirîn û biryargirtinan. Serleheng di warên qelsîyê da jî pirr dişibin hev, her du jî her çiqas bi giştî erênî û baş bihêne berçavkirinê jî carna di asteka bilind da dibin kesên dilhişk û nobran. Ev nobratîyên her duyan jî mîna hev in û li hemberî heskarîyên xwe jî nobran dibin. Yek jî alîyên pirr dişibin hev yên Odysseus û Memê Alan ev e ku her du jî bi awayekê diçine warê mirîyan. Di destana Memê Alan da Mem di nava xewnekê da diçe li wir lê di destana Odysseia da Odysseus di nava rasteqînîyeke xumamî da berê xwe dide li wir. Her du jî dema li warên mirîyan in li wir hay ji çarenûsa xwe ya mayî û roja mirina xwe dibin.

Di destanên me da ji derveyî lehengên sereke herwiha lehengên din jî cih digrin. Di destana Memê Alan da Zînê Zêdan û di destana Odysseia da Penelopeia hezkirîyên her du serlehengan in. Çî Zîn be çî Penelopeia be li hemberî rewşên heyî û liv û tevgeran da pirr dişibin hev. Her du jî li hember bûyerên berteng mîna hezkirîyên xwe bi plangerî û hişmendîyane tevdigerin. Her du jî heta dawîyê ji hezkirîyên xwe ra sozdar, wefadar û sadiq dimînin. Ji bilî van lehengan herwiha lehengên arîkar û yên astengêr jî cih digrin. Di destanan da peywira lehengên arîkar wekî hev in. Di her du destanan da lehengên arîkar beremrê serlehengan da ne. Li alîyê din lehengên astengêr jî tim li dijî serlehengan û têkçûna wan in. Di destana Memê Alan da Mem xudan hevrêyên çak û çalak e, ew pirr cihan Memê Alan di rewşên asê da rizgar dikin. Belam di destana Odysseia da Odysseus pirî caran li hemberî rûdanan bi tenê dihê teswîrkirinê.

Di destanan da ji bilî tîpolojîya lehengan herwiha destanên me ji alîyê muhtewayê ve jî pirr dişibin hev. Di destanan da herçî ziman be em dizanin ku zimanên destanan ji hev cihê

ne. Ji ber ku destana Odysseia berîya Memê Alan derbasî nûsînê bûye lewma xwe zêdetir parastîye belam destana Memê Alan ji ber ku dereng derbasî nûsînê bûye bi girêdayî vê bandora zimanên din jî li ber çav e. Destana Odysseia bi awayekî derasayî hatîye vegotinê belam destana Memê Alan bi awayekî sade, lihevhatî û heçku zimanê îroyîn be wesa hatîye vegotinê. Ango zimanê Memê Alan fambartir û fesîhtir e. Di destanan da şayesandin yek ji hêmanên giring bû di her duyan da jî şayesandin em dibînin li ser cihên dorvekirî ne. Di destanan da cihên dorteng gelek kêr cih digirin. Herwiha di her du destanên me da şibandî, şîret, wecîze, gotinên qalibî, gotinên edebî û hwd zaf cih digrin. Her du destanan jî di warê ziman û edebîyê da xudanhêz in.

Di destanan da em li ser nîrxên çandî yên her du destanan bi berfirehî rawestîya bûn, bi girêdayî van yekan em gihane wê encamê ku di gellek waran da destanên me dişibin hev. Di destanan da mêvanperwerî ciheke giring û taybet digire. Çi li ba yewnanan be çi jî li ba kurdan be, mêvanperwerîya wan rengvedan li ser destanên wan jî kirîye. Di destanan da asta mêvanperwerîyê, ezimandina mêvanî, qedirdana mêvanî, fedakarîyên bo mêvanî, şahîdayînen bo mêvanî û tiştên bi vî rengî hema bêje di der du destanan da jî wekê hev in. Di her du destanan da jî em lê rasthatin ku him li ba yewnan him jî li ba kurdan qîmetdanînek bo mêvanan heye. Di her du destanan da jî sedemê qîmetdayîna bo mêvan yek in ango sedemê qîmetdayînan ji bawerîyên wan yên ji bo dîn û Yezdanên wan dihên. Digel mêvanperwerîyê di destanan da yek ji tiştên din ên ku xwe dispêre bawerîya wan bêguman qurbandayînan an jî qurbanserjêkirin e.

Di destanan da em li ser tîpolojîya jin û mêran jî bi giştî rawestîyane. Di wan da jî em gihane wê encamê ku jin û mêr di her du destanan da wekî cihgirtinê mîna hev in. Di her du destanan da jî mêr li gor jinan bêtir li ser dikê ne, vebêjerên her du destanan jî bêtir agahîyan li ser mêrî didin. Di destanan da yên ku bêtir serpehatîyan dijîn mêr in. Di destanan da em lê rasthatin ku him ji bo civaka dayîksalarîyê him jî ji bo civaka bavîksalarîyê mînak peyda dibûn. Peydabûna mînak di her duyan da jî wekê hev e. Di destanan da bêguman nasnameya herî berbiçav tradîsyona gelan e. Di destanên xwe da em lê rasthatin ku çi li ba yewnanan be çi jî li ba kurdan be ji aliyê kevneşopîyên dêrîn va pîrr mînahevtî hene. Bo nimûne em di destanan da lê rasthatin ku tradîsyonên aîdî dewra bavîksalarîyê, tradîsyonên reşgirêdanê û piştî mirina yekî porqusandinê, tradîsyonên giringîpêdana bo mêvanan, tradîsyonan bidawînan şer j'aliyê jinan ve, tradîsyonên tolhildanê û hwd pîrr dişibin hev. Hetta mirov dikare bi rehetî bibêje ku heçku ev tradîsyonên me jimartî ne aîdî du civakan in lê aîdê heman civakê ne. Digel tradîsyonên mîna hev herwiha em li rast tradîsyonên cihê jî hatin. Di her du destanan da jî tradîsyon bi awayekî xwîrt cihê xwe girtîye. Belam bi giştî bi qasî ku me tesbît kirîye di destana Memê Alan da ji ya Odysseia bêhtir tradîsyon cih digrin û mînak jî jê zêdetir in. Di her du destanan da jî em dizanin ku bawerî ciheke giring digre û pîrr tiştê heyî xwe dispêre vê yekê. Di destanan da çi li ser lehengan be çi jî li ser muhtewaya destanan be rengvedana bawerîyê xwe radixîne li ber çavan. Di her du destanan da jî her çiqas bawerîyên jihevcihê hebin jî hema bêje li ser hemû tiştî, di destanan da, bi îlleh karîgerîyeka bawerîyê heye.

Di destanan da herwiha mekan jî hîmeke giring digre. Em dizanin ku serlehengê destanan li mekanên avîn ango deryalêheyî hatine dinê. Di destanan da derya bêguman cihekî

giring digre. Ev giringîya deryayê di destana Memê Alan da di destpêkê da cih digre belam piştî ku Memê Alan berê xwe dide Cizîrê êdî sahneyên bi girêdayî deryayê hema bêje qet nayê li hemberî me. Di destana Odysseia da ji serî heya dawî em dibînin ku mekanên deryayî û avîn zaf cih digrin. Bi girêdayî van yekan di destana Memê Alan da mekanên heyî bêtir girêdayî mekanên bejahîyê ne. Di destana Odysseia da mekanên heyî bêtir mekanên avîn e ango deryayî ne. Di destanan da herwiha mekanên arkaîk jî hene, di destana Odysseia da em dibînin ku mekanên arkaîk bêtir in û aktîftir in.

Destana Odysseia dihê gotinê ku b.z di sedsalên heft an jî heştan da hatîye nivîsandinê lê xuyaye ku ev bûyerên di serê Odysseus da derbas bûne xwe digihîne mêjûyek ji wê kevntir. Destana Memê Alan digel ku mêjûyeka wê ya nedîyar heye jî ew pêşî di dîwana Melayê Cizîrî da ku dîroka vê qirna şazdehem e paşê jî di mesnawîya Ehmedê Xanî da ku qirna vê jî sedsala hevdehem e, dihê li hemberî me. Dihê rîwayetkirin ku destana Memê Alan destaneke dêrîn û xudanmêjû ye. Belam mixabin ev destana tekûz di sedsalên nozdehm û bîstehem da derbasî nivîsê dibe. Li gor van yekan em dibînin ku destana Memê Alan li gorî destana Odysseia bi sedsalan piştra derbasî nivîsê bûye. Lewma bi girêdayî vê yekê ihtimal heye ku destana Odysseia di hin alîyan da, bêtir jî alîyê serpêhatîyên Odysseusî da, karîgerî li ser destana Memê Alan kiribe. Çimkî em dizanin kurd û yewnan di erdnîgarîyeke nêz da jîyane lewma bivê nevê reaksiyon/têkilî di nava her du neteweyan da çêbûye. Belam li hember rûdanan liv û tevgerên serlehengan û li hember kesayetên din helwestên wan nîşan dide ku ev serlehengên ji hev cihê ne, her çiqas bandorlêkirina alîyekê bo alîyê din hebe jî. Sedemê vê yekê jî ev e ku dema miletek dikeve di nava dan û standinekê da tiştê ku kêrî wan dihê ji xwe ra digrin û ji nû ve şîrove dikin. Yek ji sedemên din jî vebêjer e. Vebêjer jî dê li gorî cîhanbînîya xwe rewş û bûyeran ji nû ve vejîne, şîrove bike û dê bixwaze ku tiştên tekûz û tiştên ku ew dixwaze di destanê da, pêk bîne. Jixwe mebesta edebîyata berawirdî kê bandor li kî kirîye an jî kê ji kî çî standîye, nîne. Ji ber ku têkilî karekî tekez e. Ya girîng kîjan taybetmendî hatîye ecibandî, jê hatîye standî û ev yek çawa hatîye şîrovekirinê ye. Ku ji bo keşîfkirina vê yekê mebest divê berêxwedana li ser rêya alemgiştî be.

Wek lefza dawî em dikarin vana bibêjin ku di vegotinên gelêrî yên kurdî da ji bo peydakirina rêçên edebîyata cîhanî – çî rojavayî çî rojhilatî be- em pêdivî bi rêbazên edebîyata berawirdî ya ji bo sepandina li ser edebîyata gelêrî dibînin. Bi vê yekê ra keresteyên folklorîk yên bi salan e dihêne berhevkirinê dê bi ekolên nû ve bihêne nirxandinê, bidestxistina van daneyan ra jî em dê wek millet bi çavekî objektîftir li xwe û berhemên xwe, vegezin.

ÇAVKANÎ

Adak, Abdurrahman, Edebîyata Berawirdî, pirtûkçeya çapnebûyî, Mêrdîn, 2015.

Akbalik, H., Değerler Eğitimi Bağlamında Haçî Bektâş-ı Veli'nin Eserlerinde Yer Alan Eğitsel Unsurlar, Teza Lisansa Bilind a Çapnebûyî ya Zanîngeha Atatürk ya Enstîtûya Pedagojîyê, Erzurum, 2015.

Alakom, R., Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987). Weş. Deng, İstanbul, 1991.

Alan, Remezan, Destpêkek ji bo Zanista Edebîyata Modern, Weş. Peywend, Stenbol 2015.

Alıç, Fulya-Delikgöz, Ömer, “Osmanlı İstanbul’unda Bulunan Bazı Müslim ve Gayrimüslim Mezarlıklarındaki Kimi Semboller”, Hacettepe Üniversitesi, Türkîyat Araştırmaları Dergisi 13 (Payîz), Ankara, 2010.

Amêdî, Sadiq Bahaeddîn, Folkloru Kurdî, Weş. Lîs, Dîyarbekir, 2013.

Artun, Erman, Türk Halk Edebîyatına Giriş, weş. Karahan kitabevi, ç.6, Adana, 2001.

Atı, Hikmettin. “Lêkolîneke Folklorî Li Ser Destana Mem û Zînê, (Teza Masterê ya neçapkirî) Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2013.

Aydın, Kamil, Karşılaştırmalı Edebîyat Günümüz Postmodern Bağlamında Algılanışı, Weş. Birey (çap 2), İstanbul, 2008.

Baba, Mustafa Okan, Halk Edebîyatı Terimler Sözlüğü, Weş. Heyemola, İstanbul, 2007.

Bayat, Fuzui, Mitolojîye Giriş, Weş. Ötüken Neşriyat, İstanbul, 2016.

Bayezîdî, Mela Mehmudê, Adat û Rusûmatnameê Ekradîye, Ravekirin, tîpguhêzî û lêkolîn Jan Dost, Weş. Nûbihar, İstanbul, 2012.

Bazîdî, Mele Mehmudê, Mem û Zîn, Weş. Lîs, Stenbol, 2007.

Bebek, Adil, “Cennet Meyveleri Örneğinde Ahiret Hayatına Kelami Bir Bakış”, Fırat Üniversitesi, İlahîyat Fakültesi Dergisi 10: 2, Elazığ, 2005.

Bekki, Selahaddin, Türk Mitolojisi’nde Kurban, Akademik Araştırmalar, Jimar 3, Zivistan, 1996.

Boratav, Pertev Naili, 100 Soruda Türk Folkloru, Weş. Gerçek, İstanbul, 1994.

Cindî, Hecîyê & Evdal, Emînê, Folkloru Kurmanca, Weş. Avesta, Stenbol, 2008.

Celîl, Ordîxanê & Celîl, Celîlê, Zargotina Kurda (du cîld), Weş. Aram, Amed 2004-2014.

Cemiloğlu, Mustafa, Halk Hikayelerinde Doğum Motifi, Bursa, 1995.

Chyet, Michael L., Mem û Zîn, Çira, Kovara Kulturî ya komaleya nivîskarên kurd li Swêdê, Sal 2, Hejmar 7, Payîz, 1996.

- Çetili, İsmail, *Metin Tahlillerine Giriş 2, Hikaye-Roman-Tiyatro*, Ankara, 2004.
- Develioğlu, F., *Osmanlıca Türkçe Ansiklopedik Lügat*, Weş. Aydın, Ankara, 1982.
- Döğüş, Selahattin, *Anadolu'da Hızır-İlyas Kültü Hıdırellez Geleneği*, Teza Çapnekirî, Sütçü İmam Üniversitesi, Fen-Edebîyat Fakültesi, Tarih Bölümü.
- Dumezil, Georges, *Mit ve Destan 1, Hint-Avrupa Destanlarında Üç İşlev İdeolojisi*, Wer. Ali Berktaş, Weş. Yapı Kredi, 2012.
- Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, (amd. Huseyn Şemrexî) Weş. Nûbihar, Stenbol, 2011.
- Eliade, Mircea, *Mitlerin Özellikleri*, wer. Şema Fırat, Weş. Simavi, İstanbul 2001.
- Erginün, İnci, *Mukayeseli Edebîyat*, Weş. Dergah, İstanbul, 2011.
- Erginün, İnci, "Tanpınar ve Semboller", *Türk Dili Dergisi*, Sal 2000.
- Erhat, Azra, *Mitoloji Sözlüğü*, Weşanên Remzi Kitabevi, ç.6, Stenbol, 2015.
- Erşahin, İbrahim, *Halk Kültürü ve Edebîyatı Sözlüğü*, Ötüken Yayınları, İstanbul, 2011.
- Firdevsi, *Şehname*, Kabala Yayınları, Wer. Prof. N. Lugal, Ankara, 2009.
- Göktürk, Akşit, *Çeviri: Dillerin Dili*, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2006.
- Hekarî, Evdîrehîm Rehmî, *Memê Alan*, Weş. Lîs, (çapa duyem), Dîyarbekir, 2016.
- Homeros, *İlyada*, Wer. Azra Erhat- A. Kadir, Weş. Türkîye İş Bankası Kültür, İstanbul, 2014.
- Homeros, *Odyseia*, Wer. Azra Erhat- A. Kadir, Weş. Türkîye İş Bankası Kültür, İstanbul, 2014.
- Jahn, Manfred, *Anlatıbilim*, Werger: Bahar Dervişcemaloğlu, Weş. Dergah, Stenbol 1994.
- Jean-René Jannot, "The Lotus, Poppy and Other Plants in Etruscan Funerary Contexts", *Etruscan by Definition: The Cultural, Regional and Personal Identity of the Etruscans*, Papers in honour of Sybille Haynes, MBE, Edited by J.Swaddling-P.Perkins, British Museum Research Publication 173, London 2009.
- Karadağ, B., *Sünnette Misafirlik ve Misafir Ağırılama*, Teza Lisansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Marmarayê Enstîtûya Zanistên Civakî, Stenbol, 2008.
- Kaya, Doğan, *Ansiklopedik Türk Halk Edebîyatı Terimler Sözlüğü*, Weş. Akçağ, Ankara, 2007.
- Kefeli, Emel, *Karşılaştırmalı Edebîyat İncelemeleri*, Weş. Kitabevi, İstanbul, 2000.
- Komxebata Kurmancîyê, *Rêbera Rastnivîsînê*, Weş. Weqfa Mezopotamyayê, Dîyarbekir, 2018.

- Köhlmeier, Michael, Tanrıların Masalları, Wer. Atilla Dirim, Weşanên Yurt, Ankara, 2014.
- Lescot, Roger, Memê Alan, Weş. Avesta, Stenbol, 2010.
- Melayê Cizîrî, *Dîwan*, (amd. Selman Dilovan), Weş. Nûbihar, Stenbol, 2012.
- Narlı, Mehmet, Romanda Mekan ve Zaman Kavramları, Kovara Zanistên Civakî.
- Notên Dersa Edebîyata Gelêrî ya Remezan Pertev.
- Pertev, Ramazan, “Danasîn û Rewşa Giştî ya Xebatên li ser Folklor û Edebîyata Kurdî ya Gelêrî” Edebîyata Kurdî ya Gelêrî, *Dîrok-Teori-Rêbaz-Lîteratur-Berawirdî-1*, Weş. Avesta, Stenbol, 2015.
- Rayman, Hayrettin, Halk Edebîyatı Anlatı Türleri, Weş. Gazi Kitabevi, Ankara, 2010.
- Seyidoğlu, Bilge, Mitoloji Üzerine Araştırmalar, Metinler ve Tahliller, Weş. Bizim Gençlik, Kayseri, 1995.
- Stover-Mercure; Matt Bennett, “The Pomegranate: Marker of Cyclical Time, Seeds of Eternity”, *International Journal of Humanities and Social Science*, Vol.1, No.19, Decemvir 2011.
- Thomson, George, Tarih Öncesi Ege II, Wer. Celal Üster, Weş. Payel, İstanbul, 1991.
- Wellek, Rene- Warren, Austin, Edebîyat Teorisi, wer. Ö. Faruk Huyugüzel, Weş. Dergah, İstanbul, 2013.
- Xezna, Doğan, Lêkolînek li ser Pirtûka “Wêjeya Kurdî Duh û Îro” ya Nivîskar M. Nezîr Osê, Kovara Vesta, Weş. Aram, Stenbol.
- Yılmaz, Ferhat, Berawirdkirinek li ser Şivanê Kurmanca û Sêbareya Maksîm Gorkî, (Teza Masterê ya neçapkirî) Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn, 2015.
- Yılmaz, M. Nuri, Kuran-ı Kur’an ve Meali, Ankara Weş. Kürsü 1998.
- Yitik, Kamûran-Çeper, Ramazan, Ferhenga Mîtolojîya Kurdî, Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2017.
- <https://candname.com/dostanîya-xoceya-xizir-u-musa-pexember>.
- <https://tr.m.wikipedia.org>.



VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü



18/07/2019

Tez Başlığı / Konusu

BERAWIRDKIRINEK LI SER DESTANA MEMÊ ALAN Ê DESTANA ODYSSEIA

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 253 sayfalık kısmına ilişkin, 18/08/2019 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından %4 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı % 4 (Yüzde Yedi) dir.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimedenden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

19/08/2019

Şehmuz CEYLAN
Adı, Soyadı, İmza

Adı Soyadı :Şehmuz CEYLAN

Öğrenci No :16950001001

Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Programı : Örgün Eğitim

Statüsü : Y. Lisans Doktora

DANIŞMAN

Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

19/08/2019

**ENSTİTÜ ONAYI
UYGUNDUR**

19/08/2019

Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ
Anabilim Dalı Başkanı